Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî 4

# Kurtîyek ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan

## Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê

Mohemed Emîn Zekî Beg

Werger Dr. M.S. Cuma

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV.-K.L
4503

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Berlin, di 17. 6. 1999 de

**Kurtîya jîyana min di nava çend rêz û dêran de**

Ez di dawîya gulana sala 1937 de li gundê Kêstek de li Herêma Cezîrê de li Kurdistana Surî de ji malbata Başokê Yezîdîyî Musulman de hatime bizayîn; jiber ku fermana Bav û kalên min li ser destên Selteneta Osmanî de der sedsalê nozdehan de li Şingalê de hate birakirin û bi darê zorê ve gumgume bi destên me ve dane bihilgirtin.

Min xwendina xweyî dibustanê li bajarê Qamişlo û Şamê de ji sala 1946 tanî sala 1959 de di nava hin dibustanên Suryanî de date bidawîkirin.

Di pêşî de di payîza sala 1959 de min li bajarê Şamê de di zanistgeha wê de di berê felsefê de date bixwendin.

Di pişt re di buhara sala 1960 de li Elmanya Fêderalî de li bajarê Monîx de di zanistgeha wê de di berê zanistîyên dewletê de tanî sala 1963 de date bixwendin.

Di payîza sala 1963 de bi saya Partîya Demokratî Kurdistan ve xwendin li Elmanya Demokratî de bi destên min û neh Hevalên dinî Partî ve hate bikevtin û min li Berlina Rojhilat de di Kolêca Aburî de aburîya siyasî date bixwendin.

Di tîrmeha sala 1967 de min têde Diplom di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin û herwehajî têde di reşmeha sala 1972 de min Doktora di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin.

Ji sala 1972 - 1975 de min di warê wergerandinê de didate bikarkirin.

Ji sala 1975 tanî sala 1992 min li zanistgeha Hombold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa aburîya siyasî de bi

Institut kurde de Paris

giştî ve û di mêjûwa aburîya siyasîya Dewletên paşkevtî de bi taybetî ve didate bikarkirin.

Ji sala 1953 de min xwe bi zimanê meyî şêrîn û perest ve didate bimijûlkirin û wî û herwehajî mêjûwa me tevaya bala min bi ser xwe ve didatin birakişandin. Bi xewna zarotîya min ve dihate biderkevtin, ku ez di warê wî û herwehajî mêjûwa me de bidim bikarkirin û wan bidim bipêşvexistin, da ku miletê Kurd ji sedsalên navî û bendîtîyê de bête birizgarîkirin û bi serxwebûnê ve di nava Kurdistanê de bête bitackirin; jibervêjî ve ez ji bona xwendekarîyê ji bona Ewropa hatim biçûyîn.

Cîhanbînîya min di têgihiştina diyalêktîka jînê de li ser felsefa Zerdeştî, Aristo, Xanî, Hegel û Marx de tête bibingehkirin û têgihiştina min di çarekirina pirsa kurd de û pêkanîna Dewleteke Milîyî ser bi xwe ve di nava Kurdistanê de li ser rêbazê Barzanî û felsefa Xanî de tête bicî û biwarkirin.

Ji sala 1953 de û hêjî ez bi Endamê Partî ve têtim biderkevtin û her û her ez bi jêhatî ve di nava rêzên wê de bi mîna Endamekî ve didim bikarkirin.

Di nava salên 1979 tanî sala 1993 de bi Endamê Komitîya Nawendî û Endamê Mekteba Siyasî ve dihatim biderkevtin.

Di sala 1996 de ez bi Nîşana Barzanî ve hatim bixelatkirin û herwehajî bi Rawêjkarê Siyasî ve ji bona Mesud Barzanî hatim bidestnîşankirin.

Ji sala 1964 de min jinek Elmanî dayite bianîn û lawekî me bi navê Ciwan ve tête bidîtin, yê ku ew bi yekekî ve ji Zanistvanên Gencên Elmanî ve di Zanistîya Elektironik de têle biderkevtin.

Min di jîna xwe de ji xwe re bi zimanê Erebî, Ingilîzî, Suryanî, Farisî, Elmanî û Rusî ve dayête bixwendin; belam min Suryanî û Rusî dane bijibîrakirin.



Institut kurde de Paris

Li vêderê de ez hinek ji karên xwe li ber destên Xwendevanên giramî de didim bidanîn û ew jî evin; tevî ku armanca min di jînê de tête biderkevtin, ku ez sed nivîstan bi Kurdî ve bi zaravayê kurmancî ve ji bona nivîstxana Kurdî bidin binivîsandin:

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1931-1958
Mesud Barzanî

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1958 - 1961
Mesud Barzanî

Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê
Mohemed Emîn Zekî Beg

Mêjûwa Dewlet Û Mîrneşînîyên Kurd Di Pêla Musulmantîyê De
- Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd Û Kurdistan -
Mohemed Emîn Zeki Beg

Pirsiyarîya Kurd
Mêjûwa Kurdan û Neha Wan
(Civata Xweyîbûnî Kurdîyî Welatperwer)
-Belavoka Pêncem -
Dr. Bilêc Şêrkoh

Kurd
Rûnkirin û Dîtin
Kurd Nevîyên Mîdîyan
V. F. Mînoriskî



Institut kurde de Paris

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de
Profisor A. Hesretyan

Der Barê Sitratîcîya Siyasî û Sipahî ya
Tevgera Welatîyî Kurd
-Temaşekirinek ji bona Mêj û Neha, herwehajî yekeke din
ji bona Ayinjî de-
Ismet Şerîf Wanlî

Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şêweyê wê,
Pêşkevtina wêna, Rûnkirinên li ser Mêjûwa Kurdistanê û
Dîroknivîsandina Rojhilatê de
Doktor Ismet Şerîf Wanlî

Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de
Akadimiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadimiya Zanistîya Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di sala 1987 de

Mîr
Nikolo Mikavili

Peymana Civakî
Jean-Jacques Rousseau

Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê
Friedrich Engels

Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merovan
Friedrich Engels

Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de
Lenin

Institut kurde de Paris

Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê
Lenin

Zîneta Zimanî di nava Heremên Kurdî de
R. I. Tissabolov

Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
-Çend bîr û bawerî li ser hin rudanên siyasîyî de ji sala 1956 - 1975 de-
Dr. M. S. Cuma

Herrwehajî min di sala 1966 de namilkeyek di bin nav û nîşana: Li ser tirba Þêro de date bibelavkirin

Herwehajî min Manêsta Partîya komunist ji bal Karl Marx - friedrich Engels de di sala 1975 de ji bona zimanê Kurdî zaravayê kurmancî date biwergerandin û ew di weşanên Ronahî de di sala 1976 de hate biçapkirin.

Herwehajî min di gelaveja sala 1986 de: Sî sal mêjûwa Komela Xwendevên Kurd li Ewropa date binivîsandin. Ew ji bal Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di gelavêja sala 1986 de li bajarê Berlina Rojava de hate biçapkirin.

Dr. M.S.Cuma

Institut kurde de Paris

Naunîşan : Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê
Nivîskar : Mohemed Emîn Zekî Beg
Werger : Dr. M.S. Cuma

Çapa yekem : Kurdî - Kurdmancî - 1999
Çapxana : Rewşenbirî - Hewlêr - Kurdistan
Dane : 1000
**Leyawt: Govend M.H. - Berig: Serdem**
Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardinê (110) li sala 1999

Institut kurde de Paris



Di bîrweriya 37 salide ji mirina
Mohemed Emîn Zekî Beg

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî (4)

# Kurtîyek ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê

Mohemed Emîn Zekî Beg

Werger Dr. M. S. Cuma

Institut kurde de Paris

Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Institut kurde de Paris

# Navrok

Çend gotinên Werger ........................................ 6

Pêşgotin ........................................ 8

Pêşgotina Daner Ji Bona Wergerandina Erebî ........................................ 15

Derîyê Yekem ........................................ 16
1. Li Gora Mêjûwê de ........................................ 16
2. Li Gora Ciyografîyê de ........................................ 23
1. Kurdên Îranê ........................................ 27
Serjimara Kurdên Îranê ........................................ 32
2. Kurdên Turkîyê ........................................ 33
3. Kurdên Îraqê ........................................ 39
4. Kurdên Rusya ........................................ 45
5. Kurdên Surî ........................................ 46
6. Kurdên Bilucistan, Hindistan û Afxanistan ........................................ 47

Derîyê Duwem ........................................ 50
Bîr û Bawerîya Von Minoriskî ........................................ 52
Bîr û Bawerîya Sêr Sindni Simis ........................................ 62
Bîr û Bawerîya Daner ........................................ 70
A. Qata Yekem: Miletên Zagrosê ........................................ 72
1. Lolo-Lollo yanjî Lolloobom ........................................ 72

Institut kurde de Paris

2. Goti-Guti ........................................ 73
3. Kasaites-Kasay-Kosi-Koşo ........................................ 77
4. Xalidi-Orarto ........................................ 78
5. Subari ........................................ 78
B. Qata Duwem (Mad û Pêvgirêdayên wî ve) ........................................ 80
1. Medes-Med ........................................ 81
2. Nairi-Nayrî ........................................ 82
3. Karduchio-Kardoxuy ........................................ 83

Derîyê Sêyem ........................................ 92
1. Ji Heyamên Kevnar de tanî Heyamê Mîdya ........................................ 92
1. Lollo ........................................ 93
2. Guti-Goti-Coti ........................................ 99
3. Kassites-Kasay ........................................ 103
4. Mitan-Mîtanî ........................................ 106
5. Khaldi-Xaldi ........................................ 108
6. Subari ........................................ 109
7. Nairi-Nayri ........................................ 110
2. Ji dema Med tanî derkevtina musulmantîyê ........................................ 114
8. Medes-Med ........................................ 114
3. Kurd ji derkevtina musulmantîyê de tanî vekirinên Turk de ........................................ 128
Kurd di Pêla Al Boyê de ........................................ 139

Derîyê Çarem ........................................ 143
1. Tanî Pêla Îlxanî De ........................................ 143
2. Kurd di Pêla Etabekan de ........................................ 149
3. Kurd li Pêla Xuwarzimî û Êlxanî (Megolî) de ........................................ 155

Derîyê Pêncem ........................................ 164
1. Kurd Tanî Pêla Sefewî ........................................ 164
2. Kurd di Pêla Sefewî de û di pêşîya Dewleta Osmanî de ........................................ 168
Serhildana Kurê Can Pola ........................................ 186
Rûdana keleha Dum Dum ........................................ 188
Vegurandina Eşîrên Mukri ........................................ 193
Liberrabûna Eşîrên Mukri ........................................ 198

Institut kurde de Paris

Derîyê Şeşem ........................................................................202
1. Kurd Tani Pêla Nadir Şah ..........................................................202
2. Kurd Tanî Navîna Sedsalê Sêzdehemînî Koçî Ve - Nadirşah- ..........................................................208
3. Kurd Li Dawîya Sedsalê Heştdehemîn De û Di Sesdalê Nozdehemîn De ..........................................214
Daxwazên Eb-Dul Rehman Paşayê Baban .................223
Daxwaza Mohemed Paşayê Rewanduzê.......................224
Pêrabûna Ismail Paşayê Badinan ..............................229
Ehmed Paşayê Baban ..................................................231
Tevgera Mîr Bedirxan Beg............................................231
Li Duwayî Mîr Bedirxan De ..........................................234
Ize -Dîn Şêrê Botanê ...................................................236
Tevgera Şêx Ubeydul-Lah ............................................236
Sûd Li Kurd De Wergirtin Û Bikaranîna Wan ............242
Pêwendîyên Kurd Ligel Ermenîyan De ........................247
4. Kurd Di Sedsalên Bîstan De ........................................248
Ibrahim Paşayê Milî......................................................248
Serhildana Bedlîsê..........................................250
Şerê Gewre 1332-1336 k.- 1914-1918 z.........................250
1. Zîyanên Bidagirtina Giştî ..........................................250
2. Zîyanên Şer.................................................................251
3. Zîyanên Ji Hêzên Cengînî Bi Xwe Ve ........................252
4. Zîyanên Ji Barkirinê Û Vegurandinê ...........................253
5. Zîyanên Birçîtîyê Û Nexweşîyê ...................................254
6. Zîyanên Wêrankirinên Cengê ......................................255
Serpereştîyeke Cîhî li Sulêmanîyê de ...........................256
Serhildana Ismaîl Axayê Simko ......................................256
Şûreşa Kurdên Dêrsimê....................................................257
Peymana Lozanê................................................................258
Pirsiyarîya Musilê..............................................................259
Alîkarîya Kurd Ji Bona Turka Di Tevgerên Wanî Welatî De ..........................................................260
Serhildanên Kurdistanîyî Vê Dawîyê ............................261

Derîyê Heftem ........................................................................270
1. Reng, Reweşt Û Jîyana Civaka Kurd .............................270
2. Ayîn Û Oldarî ..................................................................273
Ayîna Zerdeştî ..................................................................275
Bîr Û Baweîyên Zerdeştî ..................................................277

Institut kurde de Paris

Bawermendîya Elî Îlahî ........ 284
Bawermendîya Yezîdî ........ 288
3. Ziman ........ 292
Lîsta beramberkirina Kurdî ligel Avesta û Farîsî êsta de ........ 304
Kurmancîya Rojhilatî ........ 311
Kurmancîya Rojavayî ........ 311
1. Beşê Îranî ........ 312
2. Kurmancîya Rojhilatî ........ 312
3. Kurmancîya Jorî û Rojavayî ........ 312
Beramberkirin di navbera zaravayê Jorî û Jêrî de ........ 315
Lor ........ 317
Beramberikirina Farîsî ligel Lorî de ........ 318
Beramberkirina Lorî ligel Kurmancîya Jêrî de ........ 319
Beramberkirina hemû zaravayên Kurdî ligel hevdû û Farisî de ........ 320
4. Civat, Wêje Û Çapemenîyên Kurdî ........ 324
1. Civat ........ 324
2. Wêje ........ 325
Hin ji Zanistvanên kurd, yên ku bi pirbûn ve bi Kurdî ve dane binivîsandin ........ 327
3. Kovar û Rojnamên Kurdî ........ 348

Derîyê Heştem ........ 352
1. Di Destpêka Musulmanîyê De ........ 352
2. Di Pêla dewleta Kolemenî-Memalîkî Misrî de di sedsalê heştehemînî koçî de ........ 357
Pêvekirin ........ 365
3. Eşîrên Kurdî li Pêş Şerê Gewre 1914-1918 Zayînê de ........ 368
1. Kurdên Nîvgerokên Deşt û Çiyayên Jêrî Kurdistanê. ........ 369
2. Eşîrên Rûniştî di nava Çiyan de. ........ 370
3. Eşîrên Nîvgerok û Çiyaneşîn ........ 371
Herema A ........ 371
Herema B ........ 387
Herema C ........ 391
Herema D ........ 400
Herema E ........ 403
Herema F ........ 407

Institut kurde de Paris

# Çend gotinên Werger

Xwendevanên hêja û birêz

Vaye ez Mêjûwa Kurd û kurdistanê bergê yekem û piştî demeke kurt bergê duwem jî bi zarava kurmançî ve li ber destên we de didim bidanîn. Ez naxwazin pêşgotinê ji bona vê wergerandina hanê bidim binivîsandin; jiber Birayê Ismet Şerîf Wanlî bi dûr û dirêjî ve ji bona bergê yekem û duwemê Mêjûwa Kurd û Kurdistan ji bona Xwendevanên Kurd di Pêdeçûnekê de dide bipêşkeşkirin.

Ez dixwazin bes û bi tenha ve çend gotinan ji bona Xwendevanên giramî bidim bitomarkirin.

Kur û kêmanîyên vê wergerandinê dê pirî zorbin. Ez ji dil û can ji Xwendevanan û Rexnevanan hêvîya lêbuhurandinê didim bidaxwazkirin. Ev karê biçûk xewin û nigaşa zarotîya min ji bona pêşvexistina zimanê meyî perest û bêtir ronahîkirina mêjûwa me ji bona Tudeyê Kurd dûr yanjî nêzîk dide biciânîn. Tevaya zanistî û zanebûna min bes û bi tenha ve dê di warê ziman û mêjûwa me de bête bitirxankirin; jiber giringbûna zimanê me û mêjûwa me ji bona hebûna me, azadîya me, serxwebûna me, pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe di seranserî Kurdistanê de û hêjîbêtir xweşbûn û geşbûna jîna civaka me hemû bi hemû ve di rêya pêşvexistina zimanê me û ronahîkirina mêjûwa me de tête bidîtin. dujminên me her û her him şerê zimanê me û himjî şerê mêjûwa me didin bikirin. Di mêjûwê de pir milet hatin biwindakirin, gava ku wan ziman û mejûwa xwe ji nava destên xwe dane biberdan. zimanê me bi hemû zaravayên xwe ve mîna hemû zimanên Rojhilat bi saman û dewlemend ve tête bidîtin. Ew bi karanîna kevnarîya pir qert ve tête bidîtin. Pê ji pêtir hezaran sal

Institut kurde de Paris

Avesta hatîye binivîsandin. Destûr, qanûn û yasayên bi nav û bangên merovanyê pê hatine bitomarkirin. Mêjûwa me bêtir ji pênç hezar sal di nava Kurdistana me de di kanîyên Somerî de hatîye bitomarkirin. Hîç mêjûwa Rojhilata Navînî bê mêjûwa Kurd û Kurdistanê nayête biliberkevtin. Em divê tevaya xebata xwe di her warekî jînê û serûştiyê de li ser bingehê zanistîyê de bidin bidanîn. Hêjîbêtir divê ku em tevaya zanebûn û zanistîya merrovanîyê bi zimanê Kurdiyî perest li ber Tudeyê Kurd de bidin bidanîn. Karê me nebes tenê ku em Kurdistan azad bikin, divê em Kurdistanê ji bona xwe û nifşên tên bidin biavakirin, bigeşkirinn, bixweşkirinn û bibextiyarîkirin. Kurdistan bi saya dilsozîya me, zanebûn û zanistîya me ve dê bi serxwebûnê û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve bête bitacûxelatkirin. dewleta me di Kurdistana Jêrîn de hêvîya jîna me ye. dujminên me jiber wê taya mirinê dane bigirtin. Ew ji tevaya dunyayê re serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe di seranserî Kurdistanê de dide bimujdekirin.

Min bingehê wergerandina xwe li ser bingehê koka Kurdî-zarvayê Soranî de dayite bibidanîn. Min pir sûd ji wergerandina Erebî dayite biwergirtin. Bi servekirinên di wergerandina Erebî de min ew dane biwergerandin. Rûnkirinên Daner Mohemed Emîn Zekî Beg hemû hatine biwergerandin, bêyî ku navê wî di dawîya wan de bête bitomarkirin. Rûnkirinên Mohemed Elî Ewnî hatine biwergerandin û di dawîya wan de Mohemed Ewnî (M. E) hatîye binivîsandin.

Ez dixwazim li vêderê de tevaya sipasîya xwe ji wan Mirovan re bidim bipêşkeşkirin, yên ku wan pir yarmetîya min di vî warî de dane bikirin û bi taybetî ez sipasên xwe ji bona Fewzî Esed didim bipêşkeşirin, jiber ku bi saya serê wî ve hemû karên min têtin bilêvenerandin û birastkirin. Herwehajî ez Dr. Ciwan Cuma didim bisipaskirin; jiber ku wî tevaya alîyên teknîkî di hemû nivîsandinên min de ji bona ser milên xwe dane bihilgirtin.

Dr. M. S. Cuma
Berlin, di 12. 2. 1994 de

Institut kurde de Paris

## Pêşgotin

Institut kurde de Paris

Ev nivîsta hanê çawan min daye binivîsandin?

Piştî ku gotina Osmanî hate bihilanîn û li cihê wê peyva Turk û Toranî ji xwe re cihê wê date biwergirtin, bi serûştî jî ve mîna hemû Neferên Miletên tir min jî li nava wê civakê de bêtir bi rûmeta xwe ve dane bipêhestkirin û payebûna Milî ez dame bineçarîkirim, ku li hemû kêsekê de vê pêhestbûna xwe bidim bixuyanîkirin.

Lêbelê derbare bi bunyand û mêjûwa Miletê xwe ve hîç min nedida bizanîn; jiber tanî wê demê jî ne di bistanan de remaneke weha bi me ve hatibû bidan û ne jî di pişt re jî me pêwistîya lêvenerîna mêjûwa Kurdan didate bidîtin; jiber peyva civaka "Osmanî" damarên me tevan tanî radeyekî dabûn bisist û bixavkirin.

Her di navberekê de min ev pirsa han ji xwe dida bikirin!
Miletê Kurd ji çi Netewyekî tête biderkevtin, ci bi ser de hatîye bikevtin?

Belam min netuwanî berseveke baş ji bona vê pirsê bidim bidozandin. Bi neçarî min ji çend Gewreyên Kurdan date bipirsîn, ji wan jî dudwên wan li Mamostên mêjûwê de bûn.

Yekekî ji wan koka Kurdan bi goyeke pir tevlihev ve bi ser Kurdê Kurê Emroyê Qehtanî de date birdin, yêtir jî em bi Netewê Dêwekî (Casad) ve dane bikirin.

Ez bi rastî ve pir li ber hîç û pûçbûna van herdu bersevan ve hatin bikevtin û min ligel bextê xwe de soz date bibirîn, ku ez bi xwe ve li vê veşartoka hanê dê bidim bigerandin. Wê çaxê jî ez li Istenbolê de bûm û kêseke baş bû.

Dema paş îşê xwe min ji bona van lêvenerandinan date bidanîn û di destpêkirina 1328 koçî de min dest bi serdana nivîstxanên Istanbolê de date bikirin. Kêsa vî karê min kêm bû: jiber hemû salek şeş heft mehan ligel Komisyona Sînor de li derve de xerîk bûm.

Ji vê kêsê min piçekî sûd ji xwe re date biwergirtin û tanî dawîya sala 1330 koçê de çend sed ji nivîstên cuda û kaniyên mêjû pir min dane bixwendin û jibergirtinên zor min ji wan ji xwe re date biwergirtin.

Bext û şans di sala 1330 de bi karmendiyeke mîrî ez bi Ewropa ve datim bigihandin. Li Elemanya û Firensa de zor nivîstokxane û mozeyom min datin biserdanîkirin û zor nivîstên giranbuha çavên min bi wan ve hatin bikevtin û notekî zor ji wan min dane bikomkirin. Derbarê kurdayetî jî sî çil nivîstên başî min ji xwe re dane bikirîn; belam li dawîya vegerandina min de zorî pê nehate biçûyîn, şerê gewre date bidestpêkirin; karmendîyê ev lêvenerînên hanê datin biduwaxistin.

Li duwayî şerê gewre de ez ji bona Istenbolê hatim bicûyîn, ser li nû de min destpêkirina xwendina nivîstên taze û baş date bikirin. Notên xwe min datin birêkxistin û dest bi nivîsandinê date bikirin. Min du sed lapere datin bilikarxistin.

Ewende pêneçû, li sala 1337 k.-1919 z. û li cejna gorîyê de ez tûşî belayeke gewre hatim bikirin; di demekê de ku ez li malê nebûm, gerekê me agir têperbû û xanîyê min jî li wê navê de ew jî hate bisütandin û hîç tiştek ji min re ji nav agir nehate biderçûn. Bi serûştî

Institut kurde de Paris

jî ve xebata pênc şêş salên min jî ji dest çû. Ne jiberwergirtin man û ne jî nivîst man.

Vê bela gewre bi rastî ve ez zor dame bibêhêvîkirin û bi naçarî ve min li karê xwe de waz date bianîn.

Li dawîya vê bedbîniya bi dehan sal de di sala 1929 z. de rojekê li nivîstkxana Civata Wêneran de çavên min bi "Insikilopêdîya Musulmantîyê" ve hate bipêkevtin û min ew ji bona xwendinê ji xwe re bi sipartin ve date biwergirtin.

Min ji xwe re li vê nivîsta bi nerx û taze ve date bitemaşekirin, ya ku ew di sala 1905 de ji bal Encûmeneke Karnas de hatibû bidestpêkirin û hiştajî ew nehatîye bidawîkirin.

Di bergê duwem de lêgerînek bi taybetî ve der barê Kurdan de têde dihate bipeydakirin, ku ew ji bal Rojhilatnasekî û Zanistvanekî zor bi nav û bange ve Fon Minoriskî hatîye binivîsandin.

Bi dilekî pir germ ve min ew bêtir ji du sê carî ji xwe re date bixwendin. Vê xwendina hanê mêldarîya kevin date bitazekirin. Ser li nû de min biryarîya xwe date bidan, ku ez li ser wî bingehî de "Kurtîyeke Mîjûwa Kurd û Kurdistanê" bidim binivîsandin.

Di pêş hemû tiştekî de min ew lêgerandinên ligel Kurd û Kurdistanê de pêwendîyên wan dihatin bidîtin, tev de min ew dane biwergerandin û di pişt re li gora serçavîyên wê de ew nivîstên, yên ku bi wan ve hatibûn binîşandan, min ji bona peydakirina wan date bikarkirin. Hinek ji wan bi destên min ve hatin bikevtin û hêjî bi serdejî min hin nivîstên taze jî ji xwe re datin bipeydakirin.

Hinekan ji Dostên min jî li babetî peydakirina hinek ji nivîstan de zor yarmetîya min dane bikirin. Herwehajî li amojgarî û remanên Zanistvan Sêr Sidnî Simis de Sermiyanê Serpereştîya Şopên Îraqî min ji xwe re zor sûd datin biwergirtin.

Wî ji min re pirtûka xweyî bi pir nerx ve ligel hin ji nivîstên din de ji bona min date birêkirin û herwehajî wî ji bona min gotareke pir baş jî di derbarê Kurdistanê de date binivîsandin.

Institut kurde de Paris

Êtir li dawîya komkirina van nivîstan de, yên ku navên wan di dawîya vî bergî de hatine binivîsandin, min di destpêka sala 1930 de dest bi kar ve date bikirin.

Nebûna karmendîya minî mîrî ji bona min kêseke baş bû û bi karekî li dûhev de nêzîka salekê xerîkbûm.

Di vê demê de ev bergê yekem, yê ku ew Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê ye, ligel beşekî ji bergê duwem de, yê ku ew Mêjûwa Dewletên Kurda ye, ligel Mêjûwa welatê Sulêmanîyê de û beşekî jî ji nivîsta Peyên Gewreyîn Kurd de min datin binivîsandin.

Hinekan ji Dostan wistin, ku ez van nivîstên hanê bi Erebî ve yanjî bi Turkî ve bidim binivîsandin. Belam bi rastî ev li layî min de bi başî ve nehate bidîtin, ku mêjûwa Kurd û Kurdistanê li layê Kurdekî de û ji tevanjî hêjîbêtir ji bona Kurd ne bi zimanê Kurdî ve bide binivîsandin.

Mele Idrîsê Bedlîsê nivîsta xweyî Heşt Buhuşt bi Farisî ve ji bona Sultan Beyazîd date binivîsandin, ev bi xwe ve zîyana wê nebû; çunge ew mêjûwa Osmanî bû. Belam di bawermendîya min de Şeref Xanê Bedlîsî ne dibû, ku ew Şerefname bi zimanê Farisî ve bide binivîsandin, ya ku ew mêjûwa Kurd bû.

Bi kurtî ve bi vê bawermendîyê min ev nivîsta xwe bi Kurdî ve date binivîsandin. Lêbelê di vê nivîsandina hanê de du tişt min bi bingeh ve dane bidanîn

1. Bigotinên Kurdî wekû dibêjin, weha min ew datin binivîsandin, belam gotinên Erebî û Farsî min ew têk nedan, çunge yekem ew mafeyê min ne bû, duwem renge serî jî min li Xwendewaran bida bitêkdan.

2. min li şûna tipên Kurdî I, E, U, t de tpên Erebî Yê, He, Waw datin bidanîn: jiber min nexwest, ku ez tipên din bidim bibêtirkirin. Bi rastî jî ve peyva (L), (R) û (U) jî di zimanê Kurdî de bi çend rengan ve têtin

bipeydakirin, lêbelê jî ev jî di cih de bi guhpêdana wan ve ji hev têtin bibicudakirin.

Ez bi hîc corekî nabêjim, ku ev nivîsta hanê mêjûyeke Kurdîyî bê kur û kêmasî têtê biderkevtin, belkî bi servajê vê jî ve ez vê dibêjim, ku kêmasîyên wê pirî zorin; ligel vê jî de ev hate biderkevtin, ku encamê lêvenerandina dused û pêncî bergên ji nivîstên Igilîzî, Firensî, Elmanî, Erebî, Turkî û Farisî têtê biderkevtin, dîsan jî hêjî bi kêmasî ve têtê biderkevtin û ew bi tenha ve ji bona Law û Xwendewarên Kurd bingehekî dide bidurustkirin, ku ew tuwanin bi başî ve bidin biserbixistin.

Ji bona saxkirina mêjûwa Kurdîyî kevnar, ji hemû bêtir jî min date bikarkirin û çar caran ev lêgerandina hanê ser li nû de min ew date binivîsandin; bi pileyekî ve bi yarmetîya şopên taze û bi nerx ve min ew daye bisaxkirin.

Heger ev nivîsta hanê ne birast ve bête biderkevtin û ne bi bê kêmanî ve ev lêgerandina bêtin biderkevtin- wa ezanim- şaşbûna min niye; çunge şop û belgeyên êsta ewende yarmetiya min dane bikirin. Belam umêdîya min heye, ku karên germîyî li dû hevdû de ji yên Encûmenên Şopên kevnar li ayîndeyeke nêzîk de dê vê lêgerandina hanê bêtir bide bironahîkirin.

Li beşê bûyînên mêjûwa Kurd û Kurdistanê jî bûyînên bi hevgirêdayî ve û bi rêxistî ve ligel hev de nayêtin bidîtin. Hoyê vê jî ji nebûna lêvenerandineke taybetî der barê Miletê Kurd de bi xwe ve têtê biderkevtin.

Şopên Rojhilat û Rojava li ser Kurd û hinekî ji perçên mîjûwa wî de û li ser Peyên Gewreyên wî de bes û bi tenha ve ligel hinekî ji buyînên û kirinên wîna de hatine biderkevtin. Û ev lêgerandinên hanê jî waha nayêtin bidîtin, ku yek li dû yên din de têtin biderkevtin, piranîya wan jî bi kêmasî ve têtin biderkevtin û ew ji hevdû bi çiryayî ve têtin biderkevtin. Ji bona nimûne Alkamil li ser Cafer dide biaxivtin, ku ew navekî Gewreyê Kurdin, ku wî du carî Leşkerê Xelîfeyê Ebasî El-Mutesem li şaxên Dasin de dayite bişikenandin, belam der barê bi kok, bunyad û serguzeşta wî ve hîc agehdariyek nedaye bidan.

Institut kurde de Paris

Ibin Meskuye li nivîsta Serpêhatiyên Netewan de li ser Ehmedê Kurê Zehakê Kurd de dide biqisekirin, ku ew di nava Leşkerê Misrî de di bin Rêberîya Ibin El-Semasime de bû. Di wê dema ku Leşkerê Misrî beramber bi Rom ve li Surî de hate bişikenadin, Ev Qehremanê Suwarê hanê bi tenha xwe ve Leşkerê Romê date bitiraşkirin û xwe bi Serdarê Romê ve date bigihaştin û wî ew date bikuştin. Weha ew bi sebeba biserketina Leşkerê Misrê bû (sala 381 koçê). Lêbelê der barê bi kok û dawîya jîna vî Qehremanî ve hîc agehdariyekê nade bidan.

Bi kurtî li kanîyên Erebî û Rojhilatî de der barê bi mêjûwa Kurd de agehdarîyên rêk û pêk nayêtin bidîtin, yaxud bi min ve hêjî ew nehatine bidozandin.

Bi dûr niye, ku heger bi dûhevdûbûn ve li ser mêjûwa Kurd de lêvenerandin bêtin bikirin, dê ev kêmasîyên hanê jî piranîya wan bêtin bihelgirtin û ev bi xwe jî ve bi kar û karmendîya Lawên îro û sibehê ve têtin biderkevtin.

Di vî warê hanê de ez zor tikayan li we dikim, ku weku hinekan ji Nivîsvanên Kurdên donê û îro di nivîsandina mêjû de xwe bi hest û xewnan ve nedin bigirêdan û jiber xwe ve hîç şaşbûnan nebestin û bûyînên Mêjûyî weku hatine bikirin, weha bidin binivîsandin û wan mîna belgeyekî pêrûniştî bi nişan ve bidin biderxistin. Heger ew wisa nedin bikirin, dê karên wan bi xurayî ve bête biçûyîn û nivîsînên wan hêjabûneke zanistî ji xwe re nadin bidîtin. Ji aliyekî din jî xwe û herwerjî Miletê xwe jî didin bişermezarîkirin.

Ez li gora livenerandin û bidûketinên xwe ve bi tewawî ve têde hatim bigehaştin, ku Miletê Kurd û mêjûwa wî jî hîç pêwistî bi van tiştan ve nayête bikirin, Serbilindîyên Mêjûyî zorin, divê ji bona wan li wan de bêtin bigerandin û bidozandin. Evayajî bi xwe jî ve bi erkê Pêgihiştvanên Kurdan ve bi xwe ve têtе biderkevtin.

Ji bona pirozbayê kara çapa pêşîyî kurdîyî vî bergê hanê ez ji bona Yaneyî Serkewtin bi diyarî ve didim bikirin. Heger ev Civata Zanistîyî Kurdî kêm bext hinekî ji vê kara karê hanê bête bidestkevtin, ezê zor bextiyar bim.

Heger ku Xwedê gote erê, li dawîya vî bergê duwem û mêjûwa welatê Sulêmanîyê û Nivîsta Peyên Gewreyên Kurd de yek li dû yan din de dê li çapê de bêtin bidan. Ev jî ji bona hoyên dilgermbûna xamê di nava destên Pêgihiştvanên kurdan de bi xwe ve tête bikirin.

15. avdara sala 1931 de
Mohemed Emîn Zekî
Wezîrê pêşîyî serdarîya Îraqê

Institut kurde de Paris

# Pêşgotina Daner Ji Bona Wergerandina Erebî

Institut kurde de Paris

Koka vê nivîsta kurdîyî hanê bi pêşgotinekê ve hate biderkevtin, ku min di wê de gotîye: Ez pêrûdinim, ku ev nivîsta hanê yekemîn nivîste piştî Şerefname di mêjûwa Kurd de ye. Ev bi xwe jî di pir deqên xwe de jî bi diyarkirin û dirêjbûnê pêwistî têtê dîtin. Bicihanîna vî karê hanê bi xwe jî ji alîyê zanistîyê ve ew Yekeke ji giringtirîn erkê pêwistîyî nifşê kurdîyî nuhhatî têtê bidîtin.

Lêbelêjî tevî derbasbûna seş salan jî li ser çapbûna vê nivîsta bi zimanê kurdî jî hêjî tiştekî weha nehatîye biderkevtin, ku ew dide mûjde kirin, ku belê yekek bi wî erkê zanistîyê û welatperwerîyî pêhatîye rabûn

Tevlivêjê ev yeka hanê jî bi xwe jî carakê ji caran jî min bêhêvî nade kirin. Jibervêjî her û her ez li ser xwendekarîya xwe di vî warê hanê de diçim û bi hêvîyeke pir bînfireh ez çavdêriya derketina hinêndin,ji mîna vê nivîsta hanê ji bal Xortên Kurdên şareza, bihiş û zana dikim.

Ez bawerim, ku ev pêvekirinên hanêyî bîtir li ser bergê yekemî Erebî de dê pir wan valabûnên ya kurdîyî kokê bidin bidagirtin û hêjî biserdejî dê ew hêjabûna vê nivîsta hanê bidin biberz û bibalakirin.

5. 2. 1938 Mohemed Emîn Zekî

## *Derîyê Yekem*

# Kurdistan, Cigeh û Serjimara Kurd
# Bi ku ve hatîye bigotin?

Institut kurde de Paris

### 1. Li Gora Mêjûwê de

Nivîstên mêjûwa kevnar hin car û bi taybetî li dawîya heftê pêş zayînê de li ser welatê Kurdoîn û yanjî heremekê jê dane biaxivtin. Ev berseva hanê -li gora neqşên Sêr Mark Sayks û hin ji kanîyên din detêde bidan, ku ew di navbera kanîyên Zeyê gewre, Diclê û li jêrî gola Wanê de tête bikevtin[1].

Li gora bawerêya Kurozon de ku herema Namrî, ya ku ew li jorî herema Lulu de tête bikevtin, ew di dema Aşûrî de yanjî berî wan jî herema Kurdistanê bû yaxud bi kêmanî jî beşek jê bû[2].

Sin Martin di bîrxistina xweyî mêjûyî û ciyografî de dide bigotin, welatê Kurdoîn di kevnar de bi navê Kurd Çîx hatibû binasîn[3], ku ev jî gotineke bi Ermenî ve tête biderkevtin, têgihiştina wê jî bi xwe jî ve bi Eremenîya Kurdî ve tête biderkevtin.

---

[1]nivîsta Şopa Xulefayên Dawî

[2]Îran, bergê 2, R. 1

[3]Kurd Çîko bi zimanê Şerkesî yanî welatê Kurd. (Mohemed Ewnî-M. E.).

Li Jorî vî welatê hanê de herema Wasporkan[4], li Jêrê wî de Aşûr, li Rojhilatê wî de Erministan[5] û li Rojavayê wî de Korey Mox[6] tête bikevtin.

Di vî babetê hanê de kanîyeke[7] din weha dibîje: cih û warê Miletê Kurd ji kendava Farisî tanî derya Xezer diçû..

Di dewrana dewltên Mekdonî, Romê, Eşkanî û Sasanî de welatê Kurdistan bi navekî taybetî ve nehatîye binavkirin, lêbelê beşê Navrastî Kurdistanê her û her bi navê Ermînya û Erministanê ve hatîye binavkirin.

Di pêşîya musulmantîyê de û di dema Xilafeta Umer de, Xwedê jê razî be, beşekî gewre ji welatê Kurd di nava welatê Azerbêcan de bû û beşê Navrastî jî bi navê welatê Cezîrê ve hatibû binîşandan û Walîyê wîyî pêşî jî Vekirvanê bi nav û deng Iyadê Kurê Xenem bû[8] Xwedê jî razîbe.

Di dewrana Xilafeta Emewî û Ebasî de jî bi cudabûneke kêm û zor ve di nava wan parvekirinên serpereştîyê de hatibûn biwergirtin û welatên Kurdistanê di nava welatên Cezîrê, Îraqê, Çiyan, Azerbêcan, Mokan, Aran, Ermînya û Romê de dihatin bidîtin.

Institut kurde de Paris

[4]Ev herema Heştemîne ji Heremên Panzdehemîne, yên ku ew ji bal Musa Al-Xorînî Armînya Mêjûyî ji bona Serpereştîyê ve di sedsalê pêncemînî Zayinê de hatîye biparvekirin. Ev herema hanê ji Wanê tanî Necuwanê tête bidirêjkirin.(Meltebron, Wergerandina Erebî, bergê. 3, R. 62. ( M. E.)

[5]Ew herema Hevtemîne, ji wan Heremên ku ji wan re "Purs Ermenî" yanî Ermînya Farisî tê gotin. Ew Heremeke Ermenîye. (Kanîya pêşî, R. 61). (M. E.).

[6]Ev herema pêncemîne ji Heremên Ermînya Mêjûyî bi navkirî ye û jêre Muxa yanjî Moxtête gotin. Ev herema hanê (Muş)a niha ye. (Kanîya pêşi vê, R. 61). ( M. E.).

[7]mêjûwa Rojhilata Kevnar, Norman.

[8]Islam Tarîxî, Hedretê Umer, Wergerandina Umer Rida.

Nivîsta Teqwîm-Elbuldan jî tanî pileyekî van parvekirinên serpereştîyê piştgirtîyê lê dide bigirtin û welatên Kurd di nava pênc hereman de dide binîşandan, ku ew jî evin:

Heftemîn Herem[9], Cezîre: Ew li Diyarê Meder (Reqa), Diyarê Rebîe Musil[10] û Diyarê Bekir Amîd de dihate bipêkhatin.
Heftemîn Herem, ji Îraq: Helwan jî dihate bipêkhatin;

Hevtdehemîn Herem, welatê Romê, Meletyê, Toqad û Sîwas dihate bipêkhatin;

Heştdehemîn Herem, ji Ermînya, Aran, Azerbêcan: Wan, Berzee[11], Tebrîz, erdebîl û Meraxe jî dihate bipêkhatin[12];
Nozdehemîn Herem, ji Çiya: Sultanûye, Hemedan, Qermisîn, Erbîl, Şarezor.. hd. dihate bipêkhatin.

Lêvervanê bi nav û deng ve Mister Le Strange di nivîsta xweyî baş de[13] derbarê parvekerina serpereştiyê de di dewrana Xulefa de rûnkirineke daye biderxstin û li ser neqşê jî de dayite bikişandin. Li gora vê kanîya hanê welatên Kurd -bigir her wek Ebû-El-Fida elê- di navbera Xuzistanê, Çiyan, Îraq, Cezîrê, Ermînya, Aran, Mokan[14] û

Institut kurde de Paris

[9]Li nêrina Teqwîm Elbuldan de nêta Daner dide biderxistin, ku ev Heremên hanê yên Serpereştîyê bûn û ew yên rastî bûn. Jiber Cezîrê di nava herema Çaremî de bû. Wehajî Îraq bi pirbûn di nava herema Sêyem de dihate bidîtin. Ermînya jî ji herema pêncem bû. welatê Romê jî ji herema pêncem û Şeşem bû. herema Çiya ji herema Çar û Sêyem bû. (M. E.).

[10]Li sedsalê Çaremî Koçî de Xelkê Musilê bi rengegî giştî Kurd bûn. (welatên Rojhilatîyî Xilafetê, Strange-Sitrênc, R. 88).

[11]Ev Şarê hanê Navînîya Aran bû û ew li ser ava Korî bû. (Dibe, ku nava bajarê Arîvanî niha ji vî navê hanê hatibe. M. E.).

[12]Di beynekê de ev bajarê hanê Navînîya Azerbêcanê bû. Li vêderê de Nesridînê Tosî Dîdexana xweyî bi nav û deng date dan avakirin.

[13]The Land of the eastern Caliphate, Lodon, 1905.

[14]Ew di navbera Erdebîl û Ava korî û Aras de Heremek bû. (Herwehajî koreyê Mox jî pê dihate bigotin. (M. E.).

Azerbêcanê de têtin bikevtin. Li jêrî navnîşana Kurdistanê de yekitîyeke serpereştîyê nehatîya bidîtin.

Koka navê Kurdistan -weku goyê dide bivegerandin- ji bal Silcoqîyan de ji bona herema di navbera Azerbêcan û Loristan de û yaxud bi welatên Rojavayî Zagrosê ve hatîye bidan[15].

Wisa li gora goya pêşî de divê her ji bona welatê Sine, Dînewer, Hemedan û Kermanşan hatibe bidanîn û li gora goya duwem de jî her ji bona welatê Şarezor û Koye divê hatibe bidanîn.

Mister Le Strange di nivîsta xwe welatên Rojhilatîyî Xulefa de perê 192 de dibêje:
Li Naverastîya sedsalê şeşemînî koçê de Sultan Sencerê Silcoqî layê Rojavayî Çiyayî, yê ku ew ligel Kermanşan bû, date bicihêkirin û ew bi navê Kurdistanê date binavkirin û Birazyê xwe Sulêman Paşa li ser de date bidanîn û ew du salan 554-556 koçî têde hate bimayîn. Di paş de ew li cîgehê Mamê xwe ji bona herema Îraqeyn bi gewreyê Silcoqîyan ve hate binîşankirin.

Evaya bi xwe ve bi goya Hemdula-El-Mustewfî ve tête biderkevtin, ya ew ku dide bigotin:
Di dema Sulêman Paşa de Kurdistan gelekî hate bipêşvexistin û hatinên wê nêzîka du melyon dinar (nêzîka melyonek lîrê Ingilîzî) dihatin biderkevtin [16].

Mêjûvan bi xwe ew Hejmêrê hatinên Megol bû, ew dibêje:

di dewrana Megolan de di sedsalê heştem de hatina Kurdistanê bi ser dehyek ve hate bidakevtin.
Sulêman Şah keleha Buharê ji xwe re date bicihkirin. Di dema Megolan (Teter) de ji bal Olçayetu Sultan li Sultan Abad (Çemçemal) de cigehekî din ji xwe re date bipeydakirin.

[15]Ev Navê rêza Çiyayên di navbewra Ararat û Xuzistanê de ye, yê ku êsta sinorê Turkiyê û Îraqê ligel Îranê de ye.

[16]Ew bigir nêzîka melyon û Nîvek Cineh derdikeve. (M. E).

Institut kurde de Paris

Bajarên bi nav û dengên vê Kurdistanê li gora neqş û nasîna Le Strange de evin:
Kermanşan, Helwan, Çemçemal, Alîştar, Kingur, Dinawer, Şarezor û Buhar.

Li layekî din jî de Şerefname dide bigotin, ku ev bi navnîşana hanê ve her bi welatê Dêrsim ve hatîya bidan[17].

Danerê Necat û Ehkam [18] dide bigotin, ku ew her bi herema "Çemşukuzk" ve tête bigotin.

Mêjûvanê bi nav û deng Hemdula El-Mustewfî[19] di nivîsta xweyî Farisîyî hêja de Nuzhet-El-Qulub der Mesalik û Memalik[20] de dide bigotin, ku li pêş de şarê Buhar bi paytextê herema Kurdistanê ve dihate biderkevtin [21]. Di dawîya dawî de ew ji bona Sultan Abad hatîye biveguhestin [22].

[17]Nivîstokeke derbarê Mêjû û Ciyografîya Kurdistanê ye. Ew bi zimanê Farisî ji bal Mîr Şerefedînê Bedlîsê ve di sala 1005 k. de hatîye binivîsandin. Ew di cara pêşî de ji bal Zanistvanê Rojhilatnasê Rusî Wilyanov Zirnov ve di sala 1865 li Rusaya hatiye Çapkirin. Herwehajî carekê din li Qahire de di sala 1930 ligel du Pêşgotinan de hate Çapkirin. Pêşgotina Yekem ji Çapa Ewropîyî ya bi zimanê Firensî ye. Pêşgotina duwem li ser Bîr û Bawerîyên nuhî li ser Kurd û Kurdistanê de ne. Ew ji bal min hatîye bidanîn, gava ku min li ser çapkirin û rûnkirinê Serpereştî dikir. (M. E.).

[18]Li ser vê Nivîstokê de em tu tiştî nizanin.

[19]Ew li paş sala 740 k. de miriye, piştî ku wî ev nivîsta xwe daye binivîsandin. (M. E).

[20]Nivîstokeke Farisî ye, ew ji bal Hemdulah ibin Ebi Bekir Ibin Nesir El-Mustewfî El Qezwînî ve di nîvê Yekemî de ji sedsalê Hîjdehê Kocî de hatîye binivîsandin. (Daner).
(Weha ev nivîsta wîyî Farisî li London de di sala 1915 de hatîye çapkirin. Wergerandina wêyî Ingilîzî jî di sala 1919 de li London de hatîye çapkirin. Vî Nivîsarê hanê herwehajî nivîsta Gezîdeyê Farîsî di Mêjûwê de dayite binivîsandin. Ew jî bi Farisî li London de di sala 1910 z. de hate çapkirin). (M. E.).

[21]Ew bigir Heşt Mîlekî li Jorî Hemedanê de tête bikevtin.

[22]Ew li nêzîka Çiyayê Bîston de ye û ew bi Sultana Abadê Çem-Çemal ve bi nav û

Institut kurde de Paris

Welatê Ermen û Cezîrê li nava Kurdistana Rojava de dihatin biderkevtin, Hewlêr- Erbîl- û Amêdî-Emadiye- li ser welatê Cezîrê bûn. Li gora vê kanîyê de bi xwe jî ve li sedsalê heştemê koçî de Kurdistan ji şazdeh eyalatan dihate bipêkhatin[23].

Bi rastî jî ve Danerê nivîsta Welatên Rojhilatîyî Xulefa jî li ser neqşa xweyî pêncemîn de û li jêr navnîşana Kurdistanê de bi tenha ve welatê Kermaşan û Şarezor dide binivîsandin.

Weha têtc bidiyarkirin, ku navîna wêna jî Kermaşan-Qermisîn bû û ev Eyaleta hanê jî yekek ji çar eyaletên Kurdistan, Hemedan, Rê, Esfehan bû, ji yên ku ew ji herema Çiya yaxud Îraqa Ecem dihate bipêkhatin. bajarên bi nav û dengên vê eyalatê Helwan[24], Kerend, Alîştar, Çemçemal-Sultan Abad, Kengawer[25], dunyawer, Sîsar, Bîstun[26]-Wastam-Bestam û Şarezor[27] bûn.

---

deng bû.

[23]Ev Şazde Eyalatanan evin: Alanî, Alîştar, Buhar, Xeftiyan, Derbendê Tac Xatun, Derbendê Zengê, Darbîl û Yezbîl (Rastir Dezbîl M. N), Dinawer, Sulatan Abad, Şehrezor, Kermanşah, Kerend û Xoşan, Kengawer, Mahî Deşt, Wastam-Taqê Bîston.

(Ev Eyalatanan Panzdeh derdikevin. Yek jê kême. Li gora Kanîya Farisîyî wê Eyalata Hersîn jî bi ser wan ve tê. Weha jimara wan bi Şanzde dibe). ( M. E.).

[24]Şarê Helwan di navbera Qesra Şîrîn û Kerend de ye û ew li cigehê Serpil)î îro de bû. Di navbera vî Şarî û Kerend de Mezaristanek bi nav û bang hebû, ku têde goristana Serdarê Sasanîyî Behram Gorîyê bi nav û bang dihate bidîtin.

[25]Ji bona vî bajarê hanê Mêjûvanênm Ereb Qesir El-lisos gotine. Li gora Ibin Reste Taqa, ku Ferhhad ji bona Şîrînê taşîye, ya ku ew der zemanê Xusro Perwîz bûye, ew li nêzîka vî bajarê hanê de têtc bikevtin.

[26]Navê vi bajarê hanê ji bal Mêjûvanê Ereb ve Ibin Hewqel û Istexrî ve bî Bihiston hatîye bitomarkirin. Li dor berên vî bajarê hanê gelek Şopên Axemen û Sasanî hene. Mustewfîyê Qezwînîyî Mîjûvanê bi nav û bang di sedsalê Heştemînî Koçî de li vê derê de serdanî kirîye. Ew dibêjê: ku li nêzîka vî bajarê hanê de gundê Sasanî hebû, ku têde hin Goristanên Şahên Îranî hatibûn bidozandin.

[27] Şarekî avedan û baş bû. Ew li cîgehê Yasîn Tepeyê êsta bû.

Institut kurde de Paris

Renge, li ber pêwstîyên serpereştîyê de ku Helwan di nava Îraqa Ereb de bête bikevtin û hin welatên din weku Zengan, Sablax-Sawcbolaq, Lorê Gewre, Lorê Biçûk, Birucerd, Xurem Abad. Esed Abad di nava Îraqa Ecem de bêtin bikevtin û Xoy, Selmas, Şino, Seraw, Dexwarkan. Mako di nava Azerbêcanê de bêtin bikevtin; Melaz Gerd û Wan jî di nava welatê Eremenî de bêtin bikevtin.

Mêjûwa Zefername[28], ya ku ew ji bona rûdanên dema Tîmorleng hatîye binivêsandin, ew kêmekê li ser Kurdistanê de dide bipeyivandin û Mîrê Şerefedînê Bedlîsê bi gewretirîn Peyayî Kurdistanê ve dide bidanîn.

Danerê mêjûwa Selimname[29], yê ku ew Mele Idrîsê Bedlîsêyî bi nav û deng bi xwe ve tête biderkevtin, dide bigotin, ku ew li Tebrîzê de hatiye bivegerandin, Yawiz Sultan Selim ferman pê date bikirin, ku li Urmiyê de li Şino-Oşno tanî Diyarbekir û Melatya de her çend Mîrên Kurd bêtin bipeydakirin, ku divê ew ji bona jêrdestîya wî bide bixistin û li ser peymanên bawermendîyê û musulmantîyê de ew sozan ji Melek û Mîrên Kurdan re ji bona hogirîya wan di bin ala Osmanî de bidim biwergirtin.

Bi vî corî ve û li ser vî bingehî de Mêrneşîniyên Kurdan hatin bidamezirandin. (Li Şerefname, Olyaçelebî, Siyahetnamesî[30], Kurdistan Diyarî de ji xwe re bidin bitemaşekirin).[31]

---

[28] Ev nivîsta hanê ji bal Elî Yezdî hatîye binivîsandin. Ew Destnivîseke Farisîye û ew niha li Nivîstxana Nur Osamanî de li Istenbolê de di bin jimara 3267 de tête bidîtin.

[29] Bi rastî navê Danerê vê Nivista hanê Mohemed Ebu El-Fedil Kurê Mewlana Idrîsê Bedlîsî ye. Wi ev Nivista xwe bi Pêvekirina Nivista Bavê re Heşt Biheşt date binivîsandin, ya ku jê Daneyek li Nivistxana Misrî de tête bidîtin.

[30] Gera Olya Çelbî ew Nivstokeke Turkîyî pir hêja ye. Ew li ser cih û welatan, li ser Rêstikên Osmanî, li ser Rabûn, Rûniştin, Rêwend, Sincî û Evsanên Dever û welatên Jêrdestîya dewleta Osmanî de hatîye binivîsandin. Ew di Şeş Perçan de û di Sê bergan de li Istenbolê de di sala 1314 k. de hatîye çapkirin. (M. E.).

[31] Tanî niha em li ser vê Nivista hanê de tîştekî nizanin. Dibe, ku ew Nivîstokeke Turkî be, ya ku ew li ser Mêjû û Ciyografîya Kurdistanê de hatibe binivîsandin.

Institut kurde de Paris

Lêbelê vê zîneta hanê ewende ne date bidirêjkirin û serpereştîya Kurdistanê, -weku li dawî de emê li ser de bidin biaxivtin-, bere bere ji bona nava destên Walîyên Diyarbekir, Wan, Bexda, Erzerom... hd. hate bikevtin.

## 2. Li Gora Ciyografîyê de

Insiklopêdîya musulmantîyê[32] gotina Kurdistanê bi xwe jî ve ji bona wan cihan daye bikaranîn, yên ku Kurd di nava wan de hatine bijîyandin û hêjî ew têde têtin bijîyandin, mîna ku çilo Îranî bi welatê Kurdîyî Xuresanê ve bi Kurdistana Xuresanê ve didin bigotin.

Ev Insiklopêdîya hanê welatê Kurdistanê bi biçûk ve dide binîşandan û ew dide bigotin, erdekî dirêjlokeye û ew ji Jêrî Rojhilat ji Loristanê tanî Jorî Rojavayî Meletyê têtê bidirêjkirin. Dirêjaya wî nêzîka 600 mîlî têtê biderkevtin û Navpanyaya wî ji 120 tanî 150 mîl têtê bidîtin. Panaya wîyî herî zor di navbera Musil û Eraratê de têtê bidîtin, ku ew jî bi nêzîka 250 mîlî bi xwe ve têtê biderkevtin.-Tarîxî Cîhannema[33]-.

Li layê min de bi wisa ve têtê biderkevtin, ku ev nasîna hanê bi kêm ve têtê bidîtin.

Yek: Loristan di derveyî wî de hatîye bidanîn,

Duwem: Sînorê wîyî Jorî tanî Alşigerd û Erzeromê têtê biçûyîn.

Institut kurde de Paris

[32] Ev Ferhengege hêja ye. Ew di Çar bergan de ye. Tanî niha Sê Bereg jê hatine belavkirin. bergê Yekem li pês Cenga Cîhanê Yekem de, bergê duwem di sala 1927 de û bergê Sêyem hinek jê derçû ye, Belam hêjî nehatîye dawîkirin. Ew ji bal Encûmeneke pêkahatî ji Rojhilatnasên Miletên cuda de bi zimanên Firensî, Igilîzî û Elmanî têtê biderkevtin.

[33]nivîsta Hecî Xelîfe ye, li Istenbolê de di sala 1145 k.- 1732 z. de hatiye çapkirin.

Mêcer Firîdrik di nivîsta xwe de Jiyaneke lipaşvemayî di nava Kurdan de li ser Kurdistanê û sînorên wê de weha bi kurtî ve dide bigotin:

Peyva Kurdistanê di dewranên kevnar de li ser cih û warên gelê Kardok de dihate bidanîn, yên ku ew li çiyayên Hekarê de dihatin bijîyandin.

Weha ji zanistîya ciyografîya mêjûyî tête biwergirtin, ku wilayeta Wanê di nava Patîşahîya serdarîya Ermenê de dihate bidîtin. Kurdistana Navrast û Jêrî ew bi xwe ve Aşûr û beşekî ji Mizopotamya ve Cezîra di Navbera Herdu Çeman de dihate biderkevtin. Pir bi dijwarî ve tête bidîtin, ku em sînorekî nîşankirî ji bona Kurdistanê bidin bidanîn. Herwehajî bi vî rengî jî ev bi xwe jî ve ji bona Erminstanê jî tête bigotin; jiber sinorên van herdu welatên hanê her û her ew li gora dil û daxwazên Vekirvanên wan de ji Netewên Bêganên Gewre de dihatin bibiçûk û bimezinkirin. Erministana kevin ji Jor de bi çemê Ker û çiyayên Lazistanê ve, ji Jêr de bi çiyayên Toros ve, ji Rojhilat de bi Mîdya ve û ji Rojava de bi Kebadokya ve dihate bisînorkirin [34].

Di vê dema niha de peyva kurdistanê cihê peyva Ermînya ji xwe re dayite bigirtin, ya ku ew niha bi carekê ve di ser guhan re hatîye biavêtin. Weha em xwe bi neçar ve didin bidîtin, ku em Ermînya kevin bi peyva Kurdistana nuh ve bidin binavkirin.

Weha Kurdistana Osmanî ji Jor de bi çiyayên Eraratê û welatê Gorcan ve, ji Jêr de bi wilayeta Bexdadê û welatên dorhîla wê ve , ji Rojhilat de bi Îranê ve û ji Rojava de bi Lazistan û welatên Asya Biçûk[35] ve tête bisînorkirin. Bê gûman ev sînorên hanê bi xwe jî ve carek ew bi sînorên serûştî ve ne dihatin biderkevtin; jibervêjî ew her û her dihatin biveguhertin.

Kurdistan berî Cenga Qerm (1853-56 Cuma) cenga Turk û Rûsan ji welatên Paşewîyî Yekta dihate bipêkhatin, ku wê jî ev wilayetên hanê ji Wan, Hekarê, Beyazîd û Musilê di nava xwe de didan biwergirtin.

[34]Ew herema Siwasê, Amasya û Qeyserîyî niha ye, ya ku ew di Komara Turkî de ye. (M. E.).

[35]Ew welatên di navbera Xêza kişandî de ji Jorî Terabzon tanî Jêrî Iskenderon têtin bikevtin, mîna ku ew di nivîstên Yunanî û Romanî de dihatin binivîsandin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Lêbelê piştî van cengên hanê herema Kurdistan bi serhev de hate bigivaştin û ew bi Paşetîya Erzeromê ve hate bipêvekirin.

Da ku em bi başî ve li ber têgihiştina rastîya peyva Kurdistanê de bêtin biliberkevtin, divê em li wan wilayetan û welatan de bidin bitemaşekirin û bivenerandin, yên ku di wan de bi xwe ve Kurd têtin bineşînîkirin û ew jî bi xwe jî ve li ser jî de bi peyva Kurdistanê ve têtin binavkirin. Weha em dibînin, ev heremên fireh ji Jor de çiyayên Ereratê û welatê Gurcan didin bisînorkirin, ango heremeke ku dirêjbûna wêyî Rojhilatî 43,02 bigirad ve tete biderkevtin, ku welatê Qarsê jî jê têtе biderkevtin, yê ku têde Kurd û Gurc di nav hev de têtin bitêkelkirin.

Weha heger ku em xêzekê ji Qarsê di nava Erzeromê, Erzencanê, Dêrsimê, Xarpûtê, tanî Diyarbekrê de û ji wê li ser dirêjîya çemê Diclê de tanî bi çiyayê Hemrînê ve bidin bikişandin, wê çaxê dê ev xêza hanê sînorê Rojavayî Kurdistana Osmanî bide bipêkanîn.

Di vê xizê de Kurd ligel Turkan, Ermenîyan û Ereban de têtin bigihaştin û ligel wan jî de têtin bitêkelkirin.

Weha Mirov vî sinorê Rojavayî Kurdistanê bi rengê xweyî ciyografî ve xerîb dide bidîtin. Bê gûman ev rengê xerîb ligel siyaseta Osmanî nayête bilehevkirin; jiber Êl û perçeyên din, yên ku ew ligel Kurdan de li ser seranserîya vê xêza hanê de pêwendîyê didin bikirin, tevî siyaset û pêrabûnên serdarêya Osmanî jî hêdi hêdî ew bi Kurd ve têtin bikirin.

Hêç jî gûman têde nayête bidîtin, ku beşê Jorî Rojhilatîyê vê xêza hanê jî bi xwe jî ve ew dirêjbûne ji Kurdistanê bi xwe ve têtе biderkevtin. Xelkên ku ew di navbera bajarê Erzeromê û sînorê Îranê de têtin bijîyandin, tevde yanjî piranîya pir ji wan xurû ji Êlên Kurdan têtin biderkevtin.

Weha li bajarê Erzeromê de bi xwe jî ve piranîya wêna bi Xelkê Kurd ve têtin biderkevtin, tevî ku wê jî bi turkî ve didin bidanîn.

Institut kurde de Paris

Belê heger ku Mirovekî Biyanî ji Musulmanekî vî bajarî li ser tuxmê wî de date bipirsîn, ew dibîje, ku ew Turke, tevî ku ew Kurd bi xwe ye. Ev rewşa hanê bi bêgûman ve tête biderkevtin, ku ew bi xwe ve zayîna mêldarîya xwe bi pêvekirina tuxmê Serdar û Vegirtvanan ve dide bigirêdan, yên ku ew têtin bipayekirin.

hegerjî ji wî jî li ser pêgirêdana wî de bi tuxmê turkî jî ve belge bête bixwestin, ew nikare wê rastîyê bide biderxistin. Bavê wî yaxud Bapîrê wî bi xurû ve Kurd têtin biderkevtin û hêjî ew di nava mala xwe de bi kurdî ve didin biaxivtin. Hêjî biserdejî ve rûçik, dimen, cil û bergên wî, reweşt û rewendên wî tev bi hev re bi kurdîtîya wîna ve didin bideng û biqîrînkirin, tevî ku ew jî jiber hoyên li jorîn de turkbûna xwe dide biderxistin.

Wehajî Musulmanên Wanê jî, yên ku wan ji berî deh salan tîpeke turkî jî nizanîbûn, niha ew jî xwe bi turk ve didin bidîtin. Raste, ku hinek kom û serserî ji Zarokên Vekirvanan û Sipahên Inkişarî ji çend sed salan de li van alîyan de hatine birûniştin, lêbelê Zarokên wan Xelkan piştî çend Bavan hatin bikurdkirin û wan koka xweyî turkî yanjî ya teterî dane bijibîrkirin.

Ez bi xwe ve weha didin bidîtin, ku hoyê bi tenha ve ji bona hinekan ji wan Kurdan, yên ku ew dibêjin, em turkin, ji pişt wan bi destketinan ve tête biderkevtin, gava ku ew bes û bi tenha xwe ve bi tuxumbuna Serdaran ve didin bigirêdan. Bi saya vê gotina hanê pir ji Xelkên Wan û Erzeromê xwe ji nava lepên sitem û zordarîya Turkan didin birizgarîkirin.

Devera di navbera Erzeromê û çiyayên Dêrsimê de bi Êlên Kurdayî xurû ve tête bineşînîkirin. Rojekê ji rojan Xelkên van çiyayên Kurdên mêrxas û gernas serên xwe ji bona serdarîya Turkan re nedane bitewandin. Lêbelêjî hêjî biserdejî ve ew her û her bi ser hêzên Hêrîşvan ve hatine bikevtin, yên ku wan ji xwe re çiyayên wanî bi rûmet ve xwestine bidin bigirtin.

Kurdên vê devera hanê bi sipehîbûna xwe, bi rû û rûçikên xwe ve, bi bejin û bala xwe ve, bi şal û şapên xwe ve pir bi nav û dengin. Herwehajî Pîrekên wan jî pir di warê ceng û şer de bi zana û hozan ve

Institut kurde de Paris

têtin biderkevtin. Ew jî mîna Peyên din di nava ceng û şerên germ û giran de likarin.

Weha sînorê Kurdistanêyî Jêrî bi çiyayê Hemrînê ve têtê biderkevtin. Li ser vê xêza hanê de Kurd ligel Ereb de têtin bitevlehkirin û ew ligel hev de bi bazirganîyê, bi jinanînê ji hev, bi wergirtina hinek ji reweşt û rewendan têkelîhev dibin. Sînorê Rojhilatîyî Kurdistana Osmanî bi xwe ve ew bi rêzên wan çiyan ve têtin biderkevtin, yên ku ew li ser sînorê Îranî û Osmanî de têtin bikevtin.

Olyaçelebî li sala 1065 kocê de li hemû welatê Kurdistanê hatîye bigerandin, ew dibêje:

Kurdistan sînorê wêyî Jorî bi diyarê Erzeromî ve têtê biderkevtin û ji wêderê de bi ser Wanê, Hekarê, Cezîrê, Amîdîyê, Musilê, Şarezorê, Erdîlan-Derne û Derteng ve tanî Besra têtê bicûyîn. Dirêjaya wêna bi heftê qonaxê ve û panaya wêna ji vê kêmtir nayête biderkevtin. "Bergê 4, r. 75".

Miletê Kurd li pêş sala 1914 de sê beşbû û ew di navbera dewletên Osmanî, Îranî û Rûsî de dihate biparvekirin.

Li 16 avdara sala 1921 de li navbera Turk û Rûsan de li bajarê Birêst Litovisk de peymanek hate bigirêdan û li gora wê beşî zorî Kurdê Qefqasya ji bona Turkan hatin bidan.

Cigeh li vêjî de li ser çarekirina dawîyî Pirsiyarîya Musilê de beşê Kurdê vê wilayetê jî ji nava destên Turkan hatin biderkevtin û ew ji bona nava dewleta Îraqê hatin bikevtin.

Li dawîya van veguhertinan de paşî Şerê Gewre zînet û parvekirina Miletê Kurd hate biveguhertin û bigir weku ku em dê li xuwarê de li ser de bêtin biaxivtin, weha bi serê wî ve hatîye bikirin.

## 1. Kurdên Îranê

Li gora ragiyandinên mîrî û lêkolînên Rojhilatnasan mîna Minoriskî, Dr. Roso, Sêr Malkom, Hasil, Juwanen û Mîrê Şerefedînê Bedlîsî de welatê Loristan, Kermenşah, Erdîlan û Mukrî=Sawçbolaq û bigir Nîvê Jêrî û Jêrî Rojhilatê Ezirbêcanê bi giştî ve bi Kurd ve têtin biderkevtin. Her li Wilatê Ezirbêcanê jî de li melbenda Xoyî jî de beşê

Institut kurde de Paris

zorî wê bi Kurd ve tête biderkevtin û li melbendên Selmas û Ormiyê de zor Kurd têtin bidîtin. Li melbenda Mako de bigir hemûyî wê bi Kurd ve têtin biderkevtin.

Bicge li van welatên Kurdan de herwehajî li devera Tehranê de Eşîreta Pazokî; li Xuresanê de Eşîrên Şahidlo, Zeferanlî, Kîwanlo û Emanlo têtin bidîtin. Cihê navînîya Eşîra pêşî bi Bocnurde ve tête biderkevtin. Hersî Eşîrên din Quçan bigir ew mîna du Mîrneşînan di hundurê xwe de serbixwe dijîn û navnîşana van herdu Mîrneşînîyan bi Ilxan ve têtin binavkirin.

Dibêjin, ku Şah Ebasê Mezin ev Eşîrên Kurdîyî hanê ji Ezerbêcanê ji bona van deverên hanê dayite biveguhestin. Serjimara wan nêzîka çaryek melyon kes tête biderkevtin. (Îran C-1 P. 179).

Li Hemedanê de Eşîrên Cozkan; li Mazenderan de Eşîrên Mondanlo[36] dijîn. Li Fars de Eşîrên Şuwankare-Şubankare[37] dijîn. Li raqa Ecem de Eşîra Embarbo û çend Tîrên Eşîra Lek[38] dijîn, ya ku ew pir bidesthilat û giring ve tête biderkevtin. Li welatê Qezwînê de û li Jorî Rojavayî vî şarî de û di navbera welatê Gîlan de Eşîra Umerlo tête bidîtin, ku Qebaqranlo, Şemkanlo, Behadirlo, Şahkolanlo û Beşanlo tevde bi Tîrên wê ve têtin biderkevtin.

Delên, ku ew li layê Nadir Şah de ji Xurestanê ji bona hêre hatine biguheztandin. (ji xwe re li gotara Mêcer Edmonds de di Kovara Civata Asya Navîn de bide bitemaşekirin). Li Kerman, li Gîlan, li Xuzistan li Qehistan jî de Kurd têtin bidîtin. (Kurdler. P. 32 ).

Kirozon li perê laperê 228 de bergê yekem de ji nivîsta xwe (Îran) elê:

---

[36]Kurdler, Lêkolandinên Mêjûyî û Civakî, Dr. Frech-Frêç, Istenbol, di sala 1334 k.- 1916 z. de, R. 35.

[37]Eşîreke gewre ye û bi hinere. pênc Berên wê hene. Wê di serdemekê de Dewletek Serbixwe di nava Cergê Faris de date bidamezirandin. Di dawî de dê emê li ser bidin biaxivtin. (Insiklopêdîya Musulmatîyê bergê 4, R. 241).

[38]Kurdler, R. 51.

Institut kurde de Paris

Li Sincistana Îranî jî de Tîreke ji Kurdan di bin navê Kurd Gelî de têtê bidîtin, ku ew pirin û pir jî sert û dirin. Ew demekê ji deman ji bona van welatan hatine bibarkirin û wan di sala 1245 z. de dikarîbûn ji xwe re dewleteke serbixwe di bin nav û nîşana Melekê Kurd yaxud Memleka Kurd de bidin bidamezirandin. Wê jî tanî sala 1338 z. de date bidirêjkirin.

Hinek ji Rojhilatnasan jiber hin cudabûnên di şêweyê ziman de, yên ku di navbera Kurdên cigehên tir û Loran de têtin bidîtin, ew Eşîrên Lorên Gewre û Biçûk ji Miletê kurd didin bicudakirin û wan bi Kurd ve nadin bidanîn. Li layê min de wehaye, ku hoyên Rojhilatnasan ji bona vê bîr û bawerîya hanê dane bikişandin, ew pir bi lawaz ve têtin biderkevtin û ji bona piştgirtina vêna li ser min de dide piwistîkirin, ku ez hin rûnkirinan bidim biderxistin:

*Tayîfa Lorî*

Tarîxî Gezîde, ya ku di derbarê Loristana kevin de gelekî agehdarîyên baş dane biderxsitin, delê:
ku ev Lor ji Derbendê Man-rud hatine biderkevtin û li nêzîkî vî Derbendê hanê de cigeyek, -li gora bawerîya Istexrî[39] de bajarek- bi navê Lor=El-lor dihate bipeydakirin[40]. Weha bi hoyê vî bajarî yanjî vî cigehê hanê ev Miletê hanê bi navê Lor ve hatîye binavkirin.

Mêjûvanê Yaqutê Hemewî[41] delê:

[39]Navê wî Ebû Ishaq Ibrahim Ibin Mohemed El-Isterxî ye. Ew di Nîvê dawîyî ji sedsalê Sêyemî Koçî de hatîye zayîn. Wi di sala 307 k.- 919 z. de nivîsta xwe El-Eqalîm dayite binivîsandin.

[40]Ew li Layê Rojhilatî Dêzful de ketîye.

[41]Navê wî Ebu Ebdelah Şehab Eldîn Yaqut Elrumî Elhemewî ye. Ew di sala 564 k.- 1169 z. de hatîye zayîn. Ji Şopên wîyî bi nav û bang Mucem Elbuldane, ya ku ew li Elemanya li bajarê Leipzig- Laypzig de li sala 1924 de di Heft bergan de hate çapkirin. Çapeke wê Misrî jî heye.

Institut kurde de Paris

Lor ew bi Miletê Kurd ve tête biderkevtin, yê ku ew di nava wan çiyan de têtin bijîyandin, ew çiyayîn ku ew di navbera Xuzistanê û Esfehanê de têtin bikevtin. Ji bona cihê wan welatê Lor yanjî Loristan têtê bigotin. (Insikilopêdîya Musulmantîyê).

Miletê Lor bi çar beşên gewr ve têtin biderkevtin:

Mame Sanî, Kuwe Gulwî, Bextiyarî, Lorê Esli rêça wanî mîrî şîeye.

Beşê zorî Eşîrên Lek beramber bi Kurdîtîya wanve hîç gûman lênayête bikirin, rêça wan jî Alî Îlahî ye û ji bil van jî Eşîrên Segewend, Gelewend, Papî û Bedrayî jî li ser wê rêçê de dirin.

Li jor de me date bigotin, ku hinek ji Rojhilanasan jiber hoyê cudabûneke kêmî şêweyeyê ziman Miletê Lor ji Miletê Kurd didin bicudakirinn û dibêjin, çunge, zimanê wan nala zimanê Farisî têtê biderkevtin, divê ku ew bi xwe jî ve ji Netewê Farisî bêtin biderkevtin.

Ev gotinaya li layê min de weha ye, ku ew rast niye. çunge, yekem zimanê beşê çaremînî Lor (Lorê Eslî=Feylî) ji Farisî bêtir bi nêzîkî Kurdî ve têtê biderkevtin û hêjîbêtir bi serdejê ve ew bi xwe jî ve dibêjin, ku em Kurdin.

Li sala 1916 z. de bi karmendîyeke mîrî ve ez ji bona Loristana Biçûk çûm, ku niha jêre Piştkoh dibêjin. Deh rojan ez li bajarê Amile de li herema Kebîr Koh de mam û li wêderê de min hin lêvenerandinên xwe li ser ziman û Etnografî de date bikirin. Piranîya demê bi kurdî ve peyv ligel min de dihate bikirin û bi hêsanî ve em li berhevdû de dihatin bikevtin. Bi rastî jî ve di navbera zimanê wan û zimanê Sulêmanyê de cudabûnek têtê biderkevtin û hîç di demekê de ev cudabûna hanê li cudabûna zimanê Badînanî û zimanê Sulêmanyê de bêtir nayête biderkevtini. (Di vî warî de û li ser mebesta ziman de hinekî rûnkirin pê têtin bidan).

**Bi xwe jî ve li gora lêkolandinên Dr. Frech-Frêç[42] Miletê Lor bi Kurd ve têtin biderkevtin û Îranî ne û Kurdên Îranê derbarê ziman de du beşin:**

[42]Lêkolandinên vî Rojhilatnasê hanê ji bal Civata Zanistîyî Rojhilatî li Berlinê de

Institut kurde de Paris

Kurd ziman û Lor ziman. Di navbera van herdu beşan de derbarê zarave û peyvînkirina wî de û li alîyê Sincî, Rabûn û Rûniştinan, Rewend û Reweştan de pêwendîyeke zor xurt tête biderkevtin.

Beşekî ji Rojhilatnasên bi nav û bang ve mîna Sêr Con Malkom, Lorêh, Hasil û Birawn bi yekitî û kurdîtîya van herdu beşan ve pê hatine birûniştin.

Herwehajî Danerê la nasiyonê Kurdnasê bi nav û deng ve jî Lorê Biçûk û Gewre bi Kurd ve dide bidanîn. Herwehajî Mêjûvanê .Osmanîyî hêja Ehmed Cewdet Paşa li bergê yekemî mêjûwa xweyî bi nav û deng ve dide bigotin:

"Lor, Bextiyarî, Goran, Lek hemû bi yek Miletî ve têtin biderkevtin û koka wan jî bi yek kokê ve tête biderkevtin û ji her yekî ji van çend Qolek jê hatin bivekirin û ev bi xwe jî ve ji Xelkên Îranêyî kokî ve têtin biderkevtin.

Ew li welatê Hurmuz de li Faris de tanî bi Mereş û Melatya ve hatine bibelavkirin. Eşîra Zendî jî ji vanin". (P. 342).

Bi kurtî ve kêm û zorîya cudabûna ziman ji bona gorîna Miletekî nade bitêrkirin. Ev rengê cudabûnê di nava beşên li yek dûrî hevdûyî Miletekî de tête bidîtin, wehajî di navbera beşên nêzîkî hevdû jî de tête bidîtin.

Ji bona nimûne, ez tuwanim bilêm, ku bi xwe jî ve li wilayeta Sulêmanîyê jî de çend rengê kurdî têtin bipeydakirin. Sulêymanî dibêje bihîne- biniye. Hemewendî elê Bare û gundî dibêjin bihîre.

Ev cudabûna zarava ye, weku li Kurdî de wehajî li zimanên tir jî de ev tête bipeydakirin. ji bona nimûne, weku cudabûna zaravayê Îraqî, Surî, Misrî, Hicazî û cudabûna di Zarvayên Rusî, Surbî, Bulgarî, ... hd. de têtin biderkevtin.

Li layê min de weha ye, ev rengê newekhevbûn û cudabûna zaravan ji encamê kêmbûna zanebûnê tête biderkevtin. Li wan welatên

Institut kurde de Paris

hate Çapkirin. Ew ji bal Serpereştîya Barkirvanan li Turkîyê de hate wergerandin û ew di sala 1334 k.- 1916 de li Istenbolê de di bin Nav û Nîşana Kurdler de hate çapkirin.

ku zanebûn bi pêşve hatine bikevtin, cihêbûn û cudabûn yan nemane yaxud kêmbûne. Nimûne jî li ser vê jî de zimanê London û Sikotlenda, zimanê Pars û Mîdî, zimanê Berlin û Bavarya, ku di pêş de cudabûn zor bû, êsta ew cudabûnên hanê zor kêm bûne. Hîç gûman niye, ku heger Kurd zanebûnê di nava xwe de bide bibelavkirin, li paş demeke kurt de ev cudabûnên hanê jî zor kêm dibin û Miletê Kurd jî bi xwedîyê zimanekîyî giştî ve bi rêk û pêk ve tête biderkevtin.

*Serjimara Lor*

Serjimara Lorê Gewre û yên Biçûk ango Xelkên Pişt Koh û yên pêş Koh li gora Krozon de di sala 1881 de bi 421.000 Kes hatîye bitexmînkirin. Ji vê jimarê 170.000 Kes bi Bextiyarî ve, 41.000 Kes bi Koh Guloyî ve û 210.000 bi Lorê Biçûk ango Feylî ve têtin biderkevtin. Di sala 1904 de Rojhilatnas Rabino li ser jimara Feylî de dayite bikolandin. Li Pêş Koh de 31.650 mal (nêzîka 130.000 Kes) û li Pişt Koh de 10.000 mal (nêzîka 50.000 Kes) wî dayite bitexmînkirin.

Serjimara Kurdên Îranê

Insiklopêdya Musulmantiyê dibêje, ku Serjimara Kurdên Îranê li nîv melyon bêtir de nayête biderkevtin. Di dema ku Encûmena Hevgirêdana Netewan ji bona pirskirina Xelkê û lêkolandina li sala 1925 de ji bona Wilayeta Musilê dabû bikirin, ew di Raportê xwe de dibêje, ku Kurdên Îranê bi texmîn ve 700.000 bi Kes ve têtin biderkevtin. Her bi xwe ev Insiklopêdî li ser Sablaxê - Sawcbolaq de dibêje, ku li vî welatê Kurd de serjimara wî bi 200.000 Kes ve tête biderkevtin, (Bergê 3, P. 188), li ser Kermanşan - Kermanşah de dibêje, ku serjimara vî welatî bi 300.000 Kes ve tête biderkevtin û beşê zorî wî jî bi Kurd ve têtin biderkevtin. (Bergê 2, P. 1035).

Welatê Ezerbêcanê bigir serjimara wî du melyon kesin, Beşê Rojava, Jêrî û Rojhilatî Jêrî gola Urmiyê bi welatê Kurd ve tête biderkevtin. Herwehajî li melbenda Selmas de 13.000 Kurd têtin bidîtin. Zorî Xelkê melbenda Xoye û Mako jî, ku ew li Jorî Rojavayî

Institut kurde de Paris

gola Urmiyê -Ormiyê de têtein bikevtin, disan jî Kurdin. Bi gora van serjimaran ve Kurdên Ezerbêcanê bi layê kêmî ve û bicgeh li Ostanê Sablaxê de renge li du sed hezarî de bi bêti ve bêtin biderkevtin.

Welatê Erdîlan - Erdelan ku ew nawendîya Sine ye, bigir hemû Kurdin û serjimara Neşînvanên wêyî Kurdî bi 150.000 kes ve tête biderkevtin û serjimara Eşîrên Koçer û Nîvkoçer bi 22,200 mal ve tête biderkevtin, ango tevaya serjimara Kurd bi 250.000 kes bîtir ve tête biderkevtin[43].

Weha tête biderkevtin, ku serjimara Kurd li van çar welatan de bi nêzîka yek melyonê ve tête biderkevtin. Heger ku em serjimara Kurdên welatên din jî weku Xuresan, Kerman, Faris, Tehran, Qezwîn û Hemedan jî ligel serjimara Loristan de bidin bixistin, renge, dê ew li du melyon de têper bête biderkevtin.

Belam rastîya wê wetov tête biderkevtin, ku serjimara rastîyî Kurdê Îranê bi diyar ve nayête biderkevtin. Ew jimara ku Rojhilatnasan dane bixuyanîkirin û ya ku me li jor de li ser de dayite biaxivtin, ji bazinê texmînê nayête biderkevtin. Nîşankirina jimareke rastîyî serjimarê inca li dawîyî amereke zanistî û bi rêk û pêk de dikare bête bikirin.

## 2. Kurdên Turkîyê

Institut kurde de Paris

Miletên Neturkîyî dewleta Osmanî ji ber hoyê Cenga Mezin tûşî bedbextîya mal û wêrankirineke zor bûn. Ji cihên xwe hatin biderkirin. Birçîtîyê, nexweşîyê, vegirtina dujmin, daxwazên pir lidûhevî diravîyî dewletê ew Miletên hanê tev de pir dane biperîşankirin. Pir jê mirin û jihev hatin bitarûmarkirin. Herwehajî li dawîya Cenga Mezin de ew tûşî pir belên mezinî cudabûn û mal wêranîyê bûn.

Di nava van de jî Kurd ji hemû Miletên tir bêtir tûşî birçîbûnê û perîşanîyê bûn. Di sala 1917 de, ku gava Sipahê Osmanîyî duwem tûşî birçîbûn û belayên mezin bûn, beşê zorî Kurdên alîyên Diyarbekrê

[43]Insiklopêdîya musulmantîyê, bergê 4, R. 226.

hatin bihilgirtin û ew ji bona alîyên Musilê, Helebê û Edena hatin birêkirin. Gelek ji van Rebenan jiber birçîtîyê û sermê hatin bimirin.

Ewên ku wê demê li Musilê de bûn, wan bi xwe ve dane bidîtin û bibihîstin, bê ka li nava kolanan de rewşa wan çawa bû. Bi hezaran ve li valî û li walî perên kolanan de dihatin bikevtin û ew dihatin bimirin.

Biçge li vê jî de li sala 1921 de şûreşa Dêrsimê hate bivêketin û Kurdên wê jî bi tûşî sergerdanîyeke pir dijwar ve hatin bikirin. Ew bi darê zorê ve ji cihên wan dane biderkirin û bibarkirin.

Di dawîya sala 1925 de şûreşa Şêx Seîd û li sala 1930 de şûreşa Ihsan Paşa hatin birûdan û Kurdên Kurdistana Navînî perîşan û malwêran bûn, pir ji wan hatin bikuştin, Beşekî zor ji wan bi valî û walî ve dane bibelavkirin û bitarûmarkirin û pir bi sertî û tundî ve siyaseta turkirinê derbarê wan de dane bichanîn.

Ji ber van hoyên hanê pir bi zorî ve tête bidîtin, ku Merov bikaribe bide bigotin, ku li filan cigeh ewende Kurd têtin bipeydakirin, belam tanî radeyekî ji bona xuyanîkirina agehdarîyên nêzîkî rastîyê bi neçarî ve divê em li agehdarîyên berî Cenga Gewre de bêtin bivegerandin.

Sêr Mark Sayks Rojhilatnasê bi nav û deng ve, Nivîsvanê The Caliphs, last heritage[44] di vê nivîsta xweyî bi nerx d e derbarê Eşîrên Turkîyê de agehdarîyên zor baş, bi dûr û dirêjî dide bidan.

Belam li ser serjimara Kurdên ne ji Eşîran nade kirin. Weha bi gora Neqşa wîna derdikeve, ku xêza tîrbûna serjimara Eşîrên Kurdîyî Selteneta Osmanî li Alşûgurd-Erzerom-Erzincan-Zara-Egîn-Meletyê-Behsinî-Bûreçek-Orfa-Jêrî Tor Abidîn-Devê Zeyê Gewre têtê bidîtin.

[44]Ev Rojhilatnasê hanê derbarê Kurd de li hemû Kesî de bêtir Lêkolandindin û Gerandin kirîye, yên ku ew encamên Xwendekarîyeke dirêje û berê gerandineke 7500 Milî li Kurdistanê û serdana wê heft caran nę.

Û ji bona beşê Xelkên gund û bajaran Nivîsvanê Two years in Kurdistan dide bigotin: ku sînorê Kurd û Erban bi xêzeke rast ve di navbera devê Zabê Biçûk û Mendelî de tête bikişandin. Sînorê Rojhilatî bi serûştîya xwe ve sînorê Osmanî û Îranê bi xwe ve têtê biderkevtin.

Rojhilatnasekî tir Rittir, P.144 dibêje: ku li alîyên goma Wanê de Ermen û Kurd têkelin û sînorê Jêrîyî tîrbûna serjimara Kurd di navbera herdu çeman de di xêza Fişxabûr-Samsad de têtê bidîtin.

Rojhilatnasekî tir Tranter delê: ku sînorê Jêrî tîrbûna serjimara Kurd di xêza Diyorîk-Erzeromê-Qars yanjî Erîvanê de têtê bidîtin. Bêgûman Kurd di banîya Erzeromê de ligel Turk û Barkirvanên Qefqasyan ji Çerkes û Osêtan de têkelin [45].

Biçge li vê herema gewre de Kurd li Jêrî, li Rojavayî û Rojavayî Jêrî vê herema hanê jî de hatine bibelavkirin. Zîneta wanî giştî li neqşa milîyî Kurd de tanî radeyekî hatîye binîşandan.

Insiklopêdîya musulmantîyê li ser serjimara Kurdên Turkîyê de dibêje: li gora amara ku li Mosko li sala 1925 de hatiye bibelavkirin, Kurd bi 1,5 melyon dide bidanîn. Belam belgeyên Turk serjimarên Eşîrên Koçerên Kurdan bi 96 hezar ve didin bitomarkirin. Serûştîye, ku ev jimarên hanê derbarê serjimara Kurd de bîr û bawerîyek baş nadin biderxistin. Hemû dizanin, ku beşê Koçer zor bi kêm ve têtê biderkevtin û ew jî roj bi roj ve kêmtir jî têtê bikirin; çunge zîneta wanî civakî û şêweyê jîyanê wan didin bineçarkirin, ku ew bêtin bineşînvanîkirin.

---

[45]Dibe, ku Ev Osin yanjî Osîtin Berekî ji Miletê Çerkesin. (Ew Miletekî Iranî ne û ew li Qefqasya dijîn. Coma). Meletê Çerkes ji Ositin, Kesk, Ereks û Tereks têtê bipêkhatin. Osîtin bi zimanê Çerkesî yanî bêdengî yaxud liserxwe têtê liberketin. Herwehajî Koh bi zimanê Çerkesî mîna zimanên Arî bi têgihiştina Çiya têtê liberketin. Osîtin, Alan, Burc hersê yek Miletin, ku ev navên hanê di Zinet û Rewşên cuda de li wan hatine kirin. Alan bi têgihiştina Mêrxasan têtê liberketin û Burc navê Mirovekî bû. Weha yekekî ji Zanistvanên Hêjayî Çerkesan ev gitîye. (M. E.).

Leglvîjî de tête bitexmînkirin, ku jimara melyon û nîvekê bi rastî nayête biderkevin; çunge: her Insiklopêdîya musulmatîyê bi xwe ve li bergê çarem de, P. 440 de elê:

ku serjimara welatên Erzeromê, Wanê, Bedlîsê û Xarpûtê li pêş Cengê de bi 2.642.ooo kes ve dihatin biderkevtin û ji van 1.828.ooo Kes bi Musulman ve dihatin biderkevtin. Eşkere ye, ku bigir nîvê serjimara welatê Erzeromê bi Kurd ve têtin biderkevtin û welatên din jî bi Kurd ve bi nav û dengin û beşekî kêm ji Turkan di nava wan de têtin bidîtin. Jibervêjî dibe, ku Kurdên van çar welatan li melyon û nîvekê de bi kêmtir ve neyêtin biderkevtin.

Li gora lêvenerandinên Sêr Mark Sayks û Dr. Firêç li welatên dînî Turkî jî de jimareke zor Kurd tête bidîtinh. Li deşta Qezil Irmaq de û li nava welatên Enqerê û Qonyê de 18 Eşîrên Kurdan têtin bidîtin, ku jimara malên wan bi nêzîka 17.000 ve têtin biderkevtin[46].

Di nava welatê Sîwasê de û li Rojhilatê şarê Sûwasê û Zara de Eşîra Koçgîrî tête bidîtinh û pênc Tîrên wê jî di navbera Erzencan û Zara de têtin bidîtin. Ew ligel Tîrên xwe de bi 12.000 mal ve têtin biderkevtin.

Li liwayên Mereş, Meletyê û li Jor û Jorî Rojavayî Kendava Inskenderon de 14 Eşîr têtin bidîtin û xaneyên wan ji 12.000 bêtir têtin biderkevtin. Di nava Liwa Orfê de Eşîra Berazî tête bidîtin, ku ew bi duwanzde Bavik û Tîria ve tête biderkevtin. Jimara xanîyên wan bi nêzîka 17.200 ve tête biderkevtin [47].

Tevaya amarên van Êşîran bi 58 hezar mal ve têtin biderkevtin, ku serjimara wan bi nêzîka sêsed hezar kes têtin biderkevtin. Heger ku serjimara Kurdên liwa Qars û Erdehan jî biser de bidin bivekirin, cigeh li Kurdên Îraqê û yê Suryê de bes li Turkyê de îro serjimara Kurd ji du melyon bi kêmtir ve nayête biderkevtin.

[46]M. Gorges Perro Lêgerandina xweyî hêja li ser Kurdên Deşta Xeymane de di Kovara Revue de deux mondes di Jimarên sala 1865 de date belavkirin.

[47]Mark Sayks, The Caliphs last Heritage, R. 572, 588.

Institut Kurde de Paris

Di nivîsta Zerî dewleta Firensî de, ya ku ew di sala 1892 z. de hatîye çapkirin, serjimara Kurd li Turkyê de bi 3.012.879 Kes dayite texmînkirin.

Ceneral Zêlendçî-Zelendji, yê Rusî jî li pêş Cenga Gewre de kurdê Turkiyê bi 2.800.475 Kes dide texmînkirin.

Dewleta Osmanî jî bi xwe jî ve di sala 1914 de (bi bê serjimara liwa Dêra Zorê û wilayeta Musilê jî ve) serjimara Kurd bi 2.527.840 kes ve daye bitexmînkirin[48] .

Ligelvêjî de divê em pê bêtin birûniştin, ku texmînkirina serjimara Kurd li Turkiyê de di vê rojê de zor bi dijwar ve tête bidîtin:

Yek. Serjimara dawî, weku ku peyv li ser de tête bikirin, bi serketî ve nebû.

Duwem. Li vê serjimara hanê de Pirsa Milet û bi taybetê ve Miletê kurd guh pê nehatîye bidan û ew ji bona bîr û bawerîyên siyasî di serguhan re hatîye biavêtin.

Ca li ber van hoyan de derbarê texmînkirina Kurd de li Turkiyê de peydakirina remankirineke rast û durûst zor bi dijwarî ve tête bidîtin.

Ji ber van hoyan û kirinên din, ku me ew li jor de dane bixuyanîkirin, serjimara Kurd li Turkiyê de mîna pêş Cenga gewre nayête biderkevtin, bi serûştê ve ew bi kîmtir ve hatîye bikirin.

Ji bona nimûne: Insiklopêdîya musulmantîyê (bergê-2, P. 226) delê: ku li pêş Şerê Gewre de serjimara liwa Hekarê bi 300.000 kes ve dihate biderkevtin, di dema ku (Elmenak Cotî 1929, P. 1336) de dibêje: ku li gora amara mîrîyî sala 1927 de serjimara vî welatî her bi 25.ooo kes ve dihate biderkevtin. The statesman year Book, 1926, P. 1309 vê serjimarê bi 31.568 kes ve dide bidanîn.

[48]Ji xwe re li nivîsta Pirsiyarîya Kurdistan û Turk de bide temaşekirin.

Institut kurde de Paris

Welatê Bedlîsê li pêş Şerê Gewre de çar Liwa bû: Bedlîs, Muşê, Sêrtê û Genc serjimara wwan bi 398.900 kes ve dihate biderkevtin. Insiklopêdaya musulmantîyê, bergê 1, P. 715, li gor amara taze serjimara van çar liwayan de bi ser 282.578 kes ve hatîye birawestandin; Şarê Bedlîsê jî, ku ew li pêş Cenga Gewre de bi 38.000 kes ve dihate biderkevtin, êsta serjimara Rûniştvanên wê ji 9.000 kes pêve bêtir nayête biderkevtin. (Elmenak Cotî, sala 1929 de).

Li dawêya Peymana Berlinê de Encûmenek ji Bêker Paşa (Ingilîz), Serkê Şûrayê Dewletê Seîd Paşa (Kurd) û Minas Efendî (Ermenî) hatibû bipêkhatin, da ku ew ji bona nîşakirina jimara Xelkê ji bona Kurdistanê hatibûn binarandin. Li gora Raportê vê Encûmenê de serjimara welatê Diyarbekrê bi 840.000 kes ve dihate biderkevtin û ji wan serjimara bi Musulmanan 600.000 kes ve dihatin biderkevtin. Serjimara vî welatî di sala 1310 koçî de bi 482.940 kes ve hatibû bidakevtin[49]. Serjimara piştî Cengê liwa Diyarbekir, Mêrdîn û Maden li gora Aamara sala 1927 de bi 377.500 kes hatibû bidakevtin. (ji xwe re li bibîrxistina Şêrîf Paşa ji bona Konfirensê Aşîtîyê de li Paris, sala 1919 de bide binêrîn).

Herwehajî li bajarê Istenbolê de bi xwe jî ve jimareke nekêm jî ji Kurdan li wêderê de têtin bidîtin, mîna ku Mamosta Meusd Fanî di La Nasiyon Kurd, r. 23 dide binivîsandin.

Hoyên vê kêmbûnê di serjimara Kurdan de pir bi zor ve têtin biderkevtin, ku di pêşîya pêşî de barkirina Kurdan bi darê zorê ve û duwem ew şer û şûreşên li dûhev de li Kurdistanê de hatine bivêketin, yên ku Kurdistana nawendî ji wan re her bi gorepana ceng û şer ve dihate biderkevtin. Ligel vê jî de renge serjimara Kurdên mayî li melyon û nîvekê de gelekî bi bêtir ve bête biderkevtin.

[49]Nivîsta Memalik Osmanî, Tarix û Ciyografiya Luxatî-welatên Osmanî, Mêjû û ciyografîya zimanî, Eli Cewad, Istenbo sala 1313 k.

Institut kurde de Paris

3. Kurdên Îraqê

Li gora amarên sala 1923/24 de (Insiklopêdya musulmantîyê, bergê 2. P.1131) de serjimara Kurdê welatê Musilêyî kevin bi 494.007 kes ve dide bidanîn. Zîneta milîyî wan li layê Encûmena Lipêrskirina Hevgirêdana Netewan de li sala 1925 de li du neqşan (jimara 6, 8) de nîşan bi wan ve hatîye bidan û ew ligel Raportê xwe de dane bigirêdan. Wêneyê parvekirina serjimara Kurdan li van her çar Liwayên Îraqîyî Jorî de li gora Lêvenerandina Encûmena Hevgirêdanê de P. 93, 94, 95 li Jêr de hatîye binivîsandin:

Institut kurde de Paris

| | |
|---|---|
| Di nava Liwaya Musilê de | 83. 000[50] |
| Di nava Liwaya Hewlêrê de | 170. 000 |
| Di nava Liwaya Kerkukê de | 47. 000 |
| Di nava Liwaya Sulêmanyê de | 189. 900 |
| Tevde | 496. 050 kesin[51] |

Mîralayî Wêlson, yê ku ew ji demekê de Cîgerê Komisarê Ingilîzîyê Bilind li Îraqê de bû, di nivîsta xwe de di Nava Herdu Çeman de ji sala 1917 tanî 1920 de dibêje:

[50]Von Hammer li bergê Çaremî mêjûwa xweyî dewleta Osmanî de pêçekê bi ser mêjûwa Cîhan Name dide dan û ew dibêje: "Xelkê Bajêr jî hemû Kurdin û ew jî bicge li Kurdî bi Erebî, Turkî û Farisî jî diaxivin".

[51]Raportê Encûmenê, R. 93-95. serjimara Mîrî ji bal dewleta Iraqê di salên 1933-1936 de ji bona hemû Wilayeta Musila kevin de, ya ku ew niha Çar Wilayetin, 1041513 Kes bûn û piranîya wan Kurd bûn. serjimara Kurdan li gora Endazê Encûmena Hevgirêdana Netewan bi 700 hezar Kes tête derkevtin. serjimara tevaya Xelkên Iraqê di hemû Wilayetan de bi 4466666 Kes dihate derkevtin.

ku jimara Kurd li wilayeta Musilê de bêtir ji nivê Xelkên vê wilayetê tête biderkevtin. (R. 127).

Di navbera vê texmîna hanê de û tomara Mufesel Ciyografîya Îraqê[52] de 46.ooo kes bi cudabûn ve têtin bidîtin -R. 97- û hoyên vê cudabûna hanê nedaye bidiyarkirin.

Li layê min de weha ye, ku texmînkirina Encûmena Hevgirêdana Netewan û ya Mufeslê Ciyografîya Îraqê bi xwe jî ve di hin deqên xwe de bi rastî ve bi kêmî livenerandinê û bicihkirineke zanistî ve têtin biderkevtin.

Yekem. Wekû Mufeselê Ciyografîya Îraqê li r. 83 de elê: jimara serjimara Îraqê tanî êsta bi rengekî zanistî nehatîye bicihkirin. Û serjimarên ku li salnaman û hin nivîstan de têtin bidîtin, di encam de hemû bi ser wan texmînan ve têtin biçûyîn, yên ku ew ji bal Karmendên Ingilîz de li salên 1920 û vê dawîyê de hatine bikirin. Hêjî bi ser dejî ve ji bona liwayên Jorî de encamên lêvenerandina Encûmena Hevgirêdana Netewan jî têtin bidîtin, ku ew li layê min de ji texmînên pêşûyî bi baştir ve têtin biderkevtin.

Biçge li van herdu bingehan de encamên tomarkirinên mîrîyî dewletê jî têtin bidîtin, ku ew di salên 1927-1929 de hatine bikirin û di wan de serjimara Eşîran nayête bidîtin. Kurtîya vê jî li Mufeselê Ciyografîya Îraqê de hatîye binivîsandin.

Wa dizanim, ku bi xwe jî ve serpereştîya serjimara giştî jî pê tête birûniştin, ku ev tomara hanê jî zor kêmanîyên wê têtin bidîtin.

Li gora lêgerandinên xwe de ji min re hate bidiyarkirin, ku bi xwe jî ve ewê hatine bitomarkirin, bi carekê jî ve ew bi rast ve nayête biderkevtin. Çunge Xelkê xwe ji tirsa serbazîkirina giştî xwe ji tomarkirinê didan biparastin û heger zorî li wan de bihata bikirin, wan

---

[52]Mufesel Ciyografîya Iraqê- Bidirêjî ciyografîya Iraqê. Taha Haşimî Serekê Cenga Sipahê Iraqî. (M. E.).

Institut kurde de Paris

li Karmendan de derew didan bikirin. Ev kêmanîya hanê jî li herdu bingehên pêşî de jî tête bidîtin.

Weku Mufeselê Ciyografîya Îraqê delê, ez jî weha dizanim, ku serjimara Îraqê li wan texmînên tanî êsta hatine bikirin, ew bi bêtir ve têtin biderkevtin. Wehajî ev ragirtina hanê bi ber hiş ve derbarê serjimara Kurdan jî de divê bête bikevtin.

Duwem. C nge li ser Milîbûnê Êtnografî de têtê bikolandin, nabe, temaşeyî cudabûna bawermendîyê û dîtinên xwe bête bikirin. Her weku Mufeselê Ciyografîya Îraqê li beşê Kildanî, Suryanî, Cuhû û Xelkên dinî Îraqê de ji destê milîyî Ereb dide bidanîn. R. 89. Wehajî ji bona desteyê Yezîdî, File û Cuhên nava Kurdan jî divabû bihata bikirin; jiber ew di koka xwe de bi Kurd ve têtin biderkevtin, mîna ku Sêr Mark Sayks li Êtnografîya xwe de daye binîşandan û her weku Nivîsvanê Du Sal li Kurdistanê de li r.39 de delê, wehajî divabû ew wan ji Kurdan bidana bidanîn.

Encûmena Hevgirêdana Netewan di perê 58 Raportê xwe de dibêje: "Yezîdî bi Kurdî ve didin biaxivtin, bi Kurdî ve didin binivêjkirin û hêjî bi serdejî ve bêtir bi bawermend ve têtin biderkevtin, ku Xwedanê wan jî bi Kurdî ve dide biaxivtin". Li perê 59 de mêldarîyê li ser lêkolînên Rojhilatnas Sêr Mark Sayks de dide bikirin, yê ku ew bi xwe ve ji bona Sincarê hatîye biçûyîn û li wêderê de wî der barê vî desteyî hanê de lêkolandinên zanistîyî baş daye bikirin û ew dibêje:

"Ev Yezîdî bi durûvê xwe jî ve bi Kurd ve têtin biderkevtin û kurdbûna wan jî her li ber zimanê wanî kurdî bi xwe ve nayête biderkevtin, bejin û bala wan jî zor li Kurdên Dêrsime de têtin biderkevtin û renge, li dawîya hêrîş û vegirtinên Têmorleng de ew ji bona şaxê Sincarê hatibin bibarkirin". Sêr Mark Saks bi vê bawerîyê desteyê Yezîdî ve bi carekê ve di nava Liste û Neqşa Eşîrên Kurd de dide bidanin. (Dawîya Warîsatê Xulafa, r. 553, 588).

Li layekî din jî de Rojhilatnas Dr. Firêç jî dibêje: "Di nava Eşîrên Kurd de gelek rêç mîna Yezîdî, Qezelbaş.. hd. têtin bidîtin" û bi vî rengî ew Yezîdî ji Kurd nade bicihêkirin. (Kurdler. R. 7).

Institut kurde de Paris

Wehajî bi xwe jî ve Mufeselê Ciyografiya Îraqê jî bi vê peyva hanê, ku Yezîdî jî ji Gelê Kurd têtin biderkevtin, vê remana hanê ew dide bipiştgirtin. (P. 109).

Ji bil destê Yezîdî jî her li liwaya Musilê de desteyê Sarli, Bacoran û Şebek jî têtе bidîtin, ku ev jî bi xwe jî ve bi Kurd ve têtin biderkevtin û lêkolînên Encûmena Hevgirêdana Netewan jî vê yekê dide bipiştgirtin û ew dibêje: "ku zimanê wan jî bi Kurdîyeke tozekî têkel û pêkele ve têtе biderkevtin û bawermendîya wan jî têtе bicihêkirin". (R. 60).

Insiklopêdîya musulmantîyê jî Xelkê Sincarê bi Kurd ve dide bidanîn û ew li ser benda Şebek de li ser van her sê destên dawî de dide bipeyvkirin ûew dibêje: "ku Şebek rêça beşê li Kurdên Musilê ye û li gora texmînên Karmendên Ingilîzî de serjimara wan jî bi deh hezar kes ve têtе bidîtin. Musulmanên wan navan navê Ewec yanî Çewt ji wan re didin bigotin. Ev jî li melbenda Sincarê de li dêhatê -gundê- Elî Reş, Yekîce, Xizne, Talar ... hd. têtin bidanîştin û ew ligel Yezîdîyan de dirawsetîyê didin bikirin. Li gora bîr û bawerîya Eb Instansê El-Kiremilî de ev jî bi rêçeke pir xwîngerm ve têtе biderkevtin.

Beşê salarî ji Eşîra Kakayî têtе biderkevtin û ew bi rêç û ayîna wan ve têtin bigirêdan. Herwehajî li wan navan jî de Eşîra Bacoranê Kurdî jî têtе bidîtin. Bawermendî û rêça wan bi nehênî û poşandî ve têtе biderkevtin û ew jî bi Elî Îlahîn ve têtin biderkevtin. Ew li gundên Umerkan, Toprax Ziyaret, Tel yaqob, Baş Pîta ... hd. têtin bidanîştin.

Li gora Raportê Encûmena Hevgirêdana Netewan de serjimara van hersê beşan ligel desteyê Yezîdî de serjimra wan bi hev re bi 26.000 kes ve têtin biderkevtin.

Siyem. Bi navê zanistîyê û rastîyê ve divê li ser me de em pê bêtin birûniştin, ku Kurdê Îraqê nebes tenê ji Kurdên wilayeta kevnî Musilê têtin biderkevtin; li liwaya Bexdadê, Diyalê û Kut jî de jimareke baş ji Kurdan têtе bidîtin. Mufeselê Ciyografiya Îraqê ev beşê hanê ji Kurdan di ser guhên xwe re dayite biavêtin û herwehajî li nîşankirina sînorê Êtnogirafî jî de li rastîyê de hatiye bidûrkevtin. Bes û bi tenha

ve ji bona diyarkirina rastîyê divê li ser van herdu deqan de em bidin biaxivtin:

1. Serjimara Kurd li liwa Bexdadê de, bigir hemû Kurd li şarê Bexdadê de dijîn, jimara wanî rastî her çend jî diyar niye, belam renge di navbera 25 û 30 hezar kes de bête bidîtin.

Serjimara Kurd li liwa Diyalê de baştir hatîye bicihkirin. Navçeyê Horîn-Şêxan, Qorato-Xorato hemû bi Kurd ve têtin biderkevtin. Navça Navînî û bajarê Xaneqînê bi xwe jî ve piranîya pir ji Xelkên wê bi Kurd ve têtin biderkevtin. Herwehajî li Navçeya Qizilrebat jî çi li nîvî nava navçe de yanjî li derveyî wê jî de û herwehajî li melbenda Şehreban jî de beşek Kurd tête bidîtin[53].

Li melbenda Mendelî jî de Eşîra Qere Ollûs, ku bigir ew bi nêzîka 500 mal ve têtin biderkevtin, tevde bi Kurd ve têtin biderkevtin. Li navça Qezaniyê de hin Eşîrên Lor têtin bipeydakirin. Gundê Dêyê Şêx û Dero bi Kurd ve têtin biderkevtin. Herwehajî beşekî zor jî ji navîna navçeyê bi Kurd ve tête biderkevtin û ew ji Bavikê Qezanloyî Bacilan têtin bidakevtin. Li bajarê biçûkî Mendelî de, ku ew bi sê gerekan -tax-ve tête

[53]Ji pêrabûna dewleta Îraqê di sala Çûyî de û ya berî wê de derbarê amarê de, ku wêneyekî wê divê li nik Wizareta Hundurû de bête biparastin, tête derkevtin, ku di melbenda Xaneqîn de 21 Eşîrên Kurdîyî Biçûk û Mezin têtin bidîtin, ku Serjimara wan 16000 Kes tête bidanîn. Di bajarê Xaneqînê de bi xwe Taxa Hemêdîyê hemû Kurdin. Taxên din Ebdula Beg, Ereb û Axa piranîya wan Kurdin. Di Taxên din de Jimareke, nekêm ji Kurdan di nava wan de têtin bidîtin. Di Navçîya Melbendê de gundên Elyawe, Bawe Pilawi û Dekeke hemû Kurdin. Herwehajî piranîya Xelkên Xaneqînê, Kehrîz, Hacî Qere û Qole Kurdin. Herwehajî di bajarê Qizlerbat de du Tax hene, ku Yek ji wan bi carekê ve Kurdin û ew bi navê Taxa Çolek tête binavkirin. Di vê Navçeya hanê de Eşîra Zerkoşî Kurdî û hinek ji Eşîra Deloyî Kurdî dijîn. Herwehajî têde Berekî ji Eşîra Sore Mîri di navbera Şehreban û Ebû Cisre de dijîn.

Institut kurde de Paris

biderkevtin, yekek ji wan bi carêke ve bi Kurd ve têtin biderkevtin.

Li melbeda Bedre de di navçeya Zurbatîyê de û di navça Şêx Seed de li gundê Begsaye-Baxê Şahî de hin ji Eşîr û Cotkarên Lor têtin bidîtin. Renge, ev Kurdên melbenda Xaneqîn, Mendelî, Şehreban, Bedre û Şêx Seed li çil hezar kes bi kêmtir ve neyêtin biderkevtin.

2. Sînorê Jîrîyî Êtnografîyî Kurd li gora Mufeselê Ciyografiya Îraqê de divê bi Xêza Zaxo-Rojhilatê Hewlêrê-. Kerkuk-Kefrî bête biderkevtin. Weha bi vî rengî ev Xêza hanê ne ligel lêkolandinên û beqşa Eşîrên Kurd de ji bal Sêr Mark Sayks de, ne jî ligel agehdarî û pêrûniştinên Kapitên Hay-Hê[54]de û ne jî ligel neqşa Êtnografiya Lêvenervanê berêz Mêcer Longirik[55] de hev dide bigirtin. Herwehajî ew ne ligel neqşa milîyî ya Encûmena Girêdane Netewan de, zîneta li rastê û rastîyê de tête biderkevtin.

Kapitin Hê di nivîsta xwe de dibêje: "Biçge li beşekî Xelkêyî Hewlêrê de û hin ji Filên Eyn Kawe, Şeqlawe, Koye û çend gundên Ereb li Şemamk û Qereçolê de hemû Xelkên liwa Hewlêrê bi Kurd ve têtin biderkevtin". (Du Sal di nava Kurdistanê de, r. 35).

Biçge lê vê jî de her kes li melbenda Mexmur de kêm yanjî zor ji xwe re hatibe bigerandin, ew bi xwe jî ve hatîye bişarezabûn, ku ew erdên di navbera Zabê Biçûk û Mezin de Eşîra Dizeyîyî Kurd li ser de tête bijîyandin, ya ku ew di dema Mêstir Hê de serjimara wê bi sî hezar kes ve hatîye bitexmînkirin. Li gora texmînên vê salê (1930) de divê çend hezarek bête bibêtirkirin.

[54]Hay Two Years in Kurdistan 1921, Lêgervanê Serpereştîyê li Hewlêrê de.

[55]Four Centuries of modern Iraq, London 1925.

Institut kurde de Paris

Lêbelê li gora Mufeselê Ciyografiya Îraqê di navbera herdu Zab de ne Kurd û ne jî Eşîra Dizeyî têtin bidîtin. Evaya jî bi xwe jî ve bi carekê ve dijê rastê û rastîyê bi xwe ve tête biderkevtin.

Heger ku em ji xwe re li neqşa Êtnogariya Encûmena Hevgirêdana Netewan de, li neqşa Çar Sedsalên Dawîyî Îraqê de, li neqşa Duwayî Warisatê Xulefa de bidin bitemaşekirin û ji xwe re Du Sal di navbera Kurdistanê de bidin bixwendin, dê ji me re bête bidiyarkirin, ku sînorê Jêrîyî milîyî Kurd -bi şêweyekî giştî ve- bi Xiza di navbera Mendelî Devê Zeyê Koye -Zeyê Biçûke- ve tête biderkevtin. Ji xwe re li neqşa milîyî Kurd bide bitemaşekirin, ya ku ew di dawîya vî bergê hanê de hatiye bidanîn.

Bi kurtî ve, li gorî wan dirêjbûnên de, yên ku ew li jorê de hatine biraxistin, zor renge, ku serjimara Kurdê Îraqê ji 6.000.000 kes bêtir bête biderkevtin.

Eger serjimara Îraqê bi Sê Melyon Kes pê bête rûniştin, weha andazê Kurdê Îraqê li gora Serjimara giştî divê li dor û berê 20 % de bête biderbikevtin.

Institut kurde de Paris

### 4. Kurdên Rusya

Di sala 1910 de li welatê Qefqasya de serjimara Kurd bi 125.000 kes ve dihate biderkevtin. Dewleta Rusya Kurdên liwaya Elîzabêt Pol[56] ango Kurdên Zenge Zor, Cuwan Şêr, Cibraêl û Araş ji bona nava vê serjimara hanê nedabû bixistin.

Îro Kurdên van her çar navçeyan melbendeke ser bi xwe ve didin bipêkanîn. Jiber hoyê têkelbûna wanî zor ligel Turkên Ezerbêcana Rusî de di nava zimanê wan de hin ji gotinên Turkemanî hatine bikevtin.

[56]Ew bajarê Genceyî Kev ne.

Rojhilatnas Corsin, tenya derbarê Kurdên van her Çar Navçeyan de Nivîstokek di sala 1925 de daye binivîsandin û ew li Teflîsê de li Çapê de daye.

Li Gurcistanê de û li herema Exsexe jî de jimareke giringî Kurd têtê biderkevtin û ew di nava nozedeh navçeyan de têtin bibelavkirin.

Dewleta Bolşevîk, ya ku wê Komara Eremenîyî Erîvanê date bidamezirandin, hin ji Kurd jî ji bona nava wê dane bixistin û ji van jî Kurdên Qere Bax têtin biderkevtin, yên ku ew çend ji Bav û Tîrên Eşîra Zîlan têtin biderkevtin û binê vê Eşîrê li welatê Beyazîdê de têtê bidîtin.

Êsta ku serjimara Kurdê Qefqasya, yên ku ew di nava Komara Erîvanê, Ezirbêcanê û Gurcistanê de têtin bidîtin, bi carekê ve bi diyar ve nayêtin bidîtin. Bi rastî ve Mufeselê Ciyografiya Êraqê serjimara wan bi 50.000 kes daye bidanîn.

Lêbelê ez bawernakim, ku evaya dê bi rast ve bête biderkevtin, çunge bi tenya ve ew beşê ku ligel welatê Qarsê de bi dest Turkîyê ve hatîye bikevtin, li gora serjimara welatê Qarsê bi 63.107 kes ve dihatin biderkevtin. (The Statesmans Year Book, P. 1309).

Eve inca bi 25 tanî 30 hezar kes têtê biderkevtin. Di dema ku serjimara Kurdên mayî li Qefqasya de li gora amara sala 1910 de divê ji 150.000 kes kêmtir neyête biderkevtin.

5. Kurdên Surî

Ji kevnar de li Suryê de û bi taybetî ve li beşê Jorî de di zîneta Eşîrtîyê û bajartîyê de Kurd têtin bijîyandin.

Xwedîyê lasiyon Kurd Mamosta Mesud Fanî dibêje: Ku Kurdê Surî têde ji dema Eyûbiyan de bi nav û dengin. Ew bi ser ve dide bivekirin û dibêje, ku bes û bi tenha ve serjimara Kurdan li bajarê Şamê de bi xwe ve bi nêzîka bîst hezar kes ve têtê biderkevtin. Li ser bîr û bawerîya M. Deniker de ku Xelkên Lubnana Rojava, File û Dirûzên

Institut kurde de Paris

çiyayê Şêx û Horanê ew bi xwe ve ji tevlihev û têkelbûna Kurd ligel Xelkên cih û dorhêlê de hatine bipêkhatin. (R. 20, 21).

Dr.Frêç dibîje: li wilatê Helebê de 27 Eşîrên Kurd têtin bipeydakirin. Pêş Cenga gewre li liwaya Helebê de bi xwe jî ve gelek Eşîr dihatin bipeydakirin, li bajarê Helebê de bi xwe jî ve jimareke Kurdî baş têtê bipeydakirin. Li Harim, li Cebel El-West, Bilan, li dor û berê Çemê Asî û li Çiyayê Kurd de gelek Eşîrên Kurd têtin bidîtin. Bi xwe jî ve li bajarê Şamê jî de jimareke Kurdî baş têtê bidîtin ( Dr. Frech- Firêc , Kurdler, P. 74-79).

Konsulê Rusî li Helebê de Misyo Zimirman jimara Kurdê Jorîyî Suryê bi 125 hezar kes ve daye bitexmînkirin. Li layekî tir jî de ew dibêje, ku tanî Ava Asî û Bilan, yên ku ew di bin desthilatîya Firensî de têtin biderkevtin, bi nêzîka 20 hezar Kurd ve têtin bidîtin .

Bi kurtî ve li gora texmîna pêş Cengê de Mesyo Zimirman bi bê Kurdên wan beşên welatê Helebê, yê ku ew li Turkîyê Mane, serjimara Kurdê Jorî Surî û yên navîna wêna bi 70.000 tanî 80.000 Kes ve dide bidanîn.

Institut kurde de Paris

## 6. Kurdên Bilucistan, Hindistan û Afxanistan

Li Bilucistanê de Eşîrên Biraxoyî hemû yanjî beşekî zor jê bi Kurd ve didin bidanîn. Ev Eşîre hanê bi zor ve têtê biderkevtin û beşê gewre jê li Bilucistanê de têtê bidîtin û navîna wêna di şarê Îxê de têtê biderkevtin. Sînorê Jorîyî herema vê Eşîrê bi bajarê Ketna ve têtê biderkevtin û ew di ser Kelat re têtê biderbaskirin û tanî Las-Bela têtê biçûyûn. Weha bi vî rengî ve dirêjbûna vê herema wê bi nêzîka 250 mîlî ve têtê bidirêjkirin. Ev Eşîra hanê di Koka xwe de bi du beş û pênc Bav û Tîr ve dihate biderkevtin: Beşê yekem jê bi Serawan-Biraxoyê Serû ve û beşê duwemî tir jê bi Cahilan=Biraxoyê Xuwarû ve têtin biderkevtin. Bav û Tîrên wê jî evin: Kamberanî, Mîrewanî, Gorkenarî, Şomalanî û Qelderanî.

Insiklopêdîya musulmantîyê di (bergê 1, r. 630) de hin diyarkirinan derbarê bi vê Eşîrê de dide biderxistin û ew dibêje: Biraxoyî weku

Biluc mîna ku goye dibêje, ew ji alîyê Helebê ve hatine. Bi rastî jî ve renge, ku ew ji Rojava ji bona vî welatî hatibin û renge, ku koka wan jî koç bin; ku ew li pêş hatina Bilucan de ji bona Kerman ewji bona Makran hatibûn û ew ligel wan de hatine bitêkelbûn.

Têgihiştina koç bi liberketina Gerok ve tête biderkevtin û Idrîs[57] jî dibêje, ku ev Eşîrên hanê jî desteyekî ji Kurd têtin biderkevtin. Bi rastî jî ve Merov dide bidîtin, ku bi navê û dengên wan hemû Biraxoyî li Las-Bela de bi Kurdê Gelî ve têtin biderkevtin û li gora vêna jî de dibe, Merov bide bigotin, ku koka vê Eşîrê ji Kurdên Rojavayî Iranê tête biderkevtin û ew ji wêderê ji bona Bilucistanê hatine bibarkirin.

Serjimara Biraxoyê Bilucistanê bi nêzîka 300.000 kes ve tête biderkevtin.

Li Hindistanê jî de, li welatê Sind jî de ji Eşîra Biraxoyî bi 48.108 Kes ve têrte biderkevtin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê, bergê 1, r. 630).

Rojhilatnas Tedesko-Tedescu di navbera Miletê Biluc û Kurd de jî hin ji girêdan û pêwendîyan daye bidozandin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê, bergê 2)

Li gora Şerefname de ji Efganistanê hin ji Eşîrên Zengene ji bona Bilucistanê hatine bikockirin. Li gora vê jî de divê Kurd li Efganistanê jî bêtin bidîtin.

Bi xwe jî ve Morgenestirin jî dibêje, dibe ku li dorhêla Rojavayî Herat jî de hin ji Xelkên Kurd ziman bêtin bidîtin.

Ji bona peydakirina remaneke giştî derbarê rewş, zînet û belavkirina Kurd de divê li neqaşa milîyî Kurd de li dawîya vî bergê hanê de bête bitemaşekirin.

---

[57]Nêt li vir de Şerîfê Idrîsîyê Çiyografî û Gervanê bi nav û bange, yê ku ew xwedîyê Nizhet El-Muştaq fî Ixtiraq El-Afaqe, ya ku ew li London di sala 1866 de hate çapkirin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Li gora van diyarkirinên hanê de renge, ku serjimara giştîyî Kurd bi vî rengî ve bête biderkevtin:

| | |
|---|---|
| Kurdê Îranê | 2. 000. 000 kesin[58] |
| Kurdê Turkiyê | 1. 500. 000 kesin |
| Kurdê Îraqê | 600. 000 kesin |
| Kurdê Rusya û Surî | 230. 000 kesin |
| Kurdê Bilucistan û Hindistan | 350. 000 kesin |
| Hemû | 4. 680. 000 kesin[59] |

[58]Kurozon dibêje, ku ji Xwendekarîyên hêja ji yên Misyo Zoltalov ji bona Civata Asyayî Rusî di sala 1888 de têtê biderkevtin, ku serjimara Kurdan li Iranê de ji bil li Wilayetên Xuresan, Sicistan û Faris de 1380000 kesin, ku ji van 780000 kes ji Lor û Bextiyarin. Îran, bergê 2, R. 494.

[59]Li Nameya Dr. Belec Şêrkoh , ya ku ew bi zimanê Erebî de li jêr nav û nîşa Pirsiyarîya Kurd de hatîye nivsîndin û ew li Misrê de li sala 1930 hatîye biçapkirin, dibêje: "serjimara Kurdîyî giştî Heşt Melyon û hinek derdikeve. Ew dibêje ev serjimara hanê li ser Bîr û Bawerîya Alexander Japa di nivîsta wî de hatîye, ya ku ew li sala 1860 li Petersburg hatîye biçapkirin". Lêbelê ew tu kanîyên din nade bidan, da ku ew pişta vê bidin bigirtin.
Ji alîyekî din de Danerê Pirsiyarîya Kurd beramber Turk ve, R. 46 de dibêje: "Kurd dibêjin, ku tevaya serjimara wan berî Cenga Cîhanî Yekem weha dihate biderkevtin:

| | |
|---|---|
| Li Turkîyê | 2987960 |
| Li Surî | 289940 |
| Li Îraqê | 749380 |
| Li Îranê | 1300000 |
| Li Ermînya | 60000 |
| Gişt | 5387280 kes bûn" |

Firidriş Milingin, yê ku ew bi Xwendekarîyên xweyî hêja li ser Kurd û Kurdistan ve pir bi nav û denge, dibêje, ku serjimara Giştî ji bona Miletê Kurd bi pênc Melyon kes têtê derbikevtin. (Jiyaneke Lipaşvemayî di nava Kurdan de, R. 144-152).
Lêbelê Xwedîyê Lanasyon Kurd piştî wî pir texmîn û bidanînnê serjimara Kurd

Institut kurde de Paris

## *Derîyê Duwem*

# Koka Kurd

Ev lêgerandina hanê beşê herî dijwartirî vî nivîsta hanê bi xwe ve dide biderxistin; jiber ku dozandinên Şopên Kevnarîyê Dirawsên Miletê Kurd û herwehajî li Kurdistanê de bi xwe ve derbarê koka Kurd de agehdarîyên bi carekê ve hêjî nehatine bidan. Jibervîjî ji bona xuyanîkirina remaneke bi carekê ve der barê vê Pirsiyarîya hanê de hêştanjî dema wê hêjî nehatîye bihatin.

Pirofêsor Von Minoriskî ji Hemtayên xwe bêtir ligel pirsiyarîyên Kurd û Kursistanê de xwe daye bimijûlkirin. Di vî warê hanê de bi rastî ve hunervanîyek û nasîneke wîyî pir berz û bela tête bidîtin.

Vê carê wî der barê kok û mêjûwa Kurd de kurtîyek zor bi nerx ve ji bona Insiklopêdîya musulmantîyê dayite binivîsandin.
Bi xwe jî ve ji bona nivîsandina vê nivîsta hanê jî wê xwe li ber dilê min de date bişêrînkirin.
Ew kurtbûna hanê bigir ku ew bingehê vê nivîsta hanê dide bipêkanîn. Beşê girêdayî bi koka Kurd ve bi rastî ve ew bi encamê

---

date dan. Wî got, ku serjimara Kurdan 2789000 kes têtê derbikevtin. Ji wan Melyonek li Turkîyê de, 494 hezar li Îraqê de, 125 hezar li Qefqasya de, sed hezar li Surî de, 700 hezar li Îanê de, 350 hezar li Bilucistan de û Bîst hezar li Efxanistanê de têtê bidîtin. (R. 41).

karekî zor dirêj ve tête biderkevtin û bigir ew bi xwe ve kurtbûna hemû şop û remanan dide biderxistin, yên ku ew tanî êsta der barê Kurd de hatine binivîsandin yanjî hatine bigotin..

Li layekî tirjî de min wist, ku ez li agehdarîyên Serpereştê Biroya Şopên Iraqêyî Kevnar Sêr Sindny Simis de sûd ji xwe re bidim biwergirtin. Ev Zanayê hanê jî bi karnasekî Mêjûvanê Rojhilata Nêzîk ve tête bidîtin û di nava Rojhilatnasan de cihekî wîyî taybetî û bilind tête bidîtin.

Vî Zanayê hanê di vî warê hanê de alîkarîyeke baş ji bona min date bikirin û der barê Kurdistana Kevnar de xwendekarîyên xwe date binivîsandin û ew ji bona min date birêkirin.

Remana van herdu Karnasên bi nav û deng ve bi xwe jî ve li jêr de, wek hatîye biderkevtin, ez didim binivîsandin û di dawîya wan de di benda sêyem de xwendekarîyên xwe û herwehajê bawerîya xwe jî didim bixuyanîkirin, ji yên ku ew encama lêvenerandinên hin ji nivîstên bi nav û deng ve hatine biwergitin.

Ez hêvîdarim, ku bi vê raxistina hanê ve der barê koka Kurd de dê remaneke giştî û baş bête bipeydakirin.

Institut kurde de Paris

-1-

## Bîr û Bawerîya Von Minoriskî

Ev Karnasê hozanê bi nav û deng ve dibêje:
Zor dibe, ku Miletê Kurd li Rojhilat ango ji Rojavayî Îranê de ji bona Rojava Kurdistana êsta hatîye bikoçkirin û bicîgîrîkirin. Lêbelê hatina vî Miletê hanê bergîrî nade bidan, ku li hatina wîna de Miletekî tir û yanjî çend Miletên din têkel ligel hev de bi navekî mîna Kardo ve, ku ew li navê wî de tête biçûn, li Kurdistana navînî de nedihate bijîyandin û li paş de ligel wî de hatibû bitêkelîkirin...

Rojhilatnas Tureau Dangin-Turo Dangîn li Kovara Asuryolocî de bi du depên nivîsandî ve çavên wî bi wan ve hatîye bikevtin, ku mêjûwa wê nivîsandinê bi du hezar sal pêş zayînê ve tête biderkevtin. Ew li ser welatekî "Kar-da-ka" de dide bipeyivandin û ev welatê hanê jî bi dirawsê Xelkê "Su" ve dihate biderkevtin, yê ku ew di nava erdên Jêrî gola Wanê de hatibû bineşînkirin. Şerefname dibêje, ku li herema Bedlîsê de keleheke kevnî bi navê Suyî ve tête bipeydakirin.

Li dawêya vê mêjûwê de bi hezar sal ve Tiglath Pileser-Tiglat Pilêzer[60] ligel Miletekî de şerek dayite bikirin, ku navê wî bi Kurti-Kur-ti-e ve û ew li şaxên Azu de tête bijîyadin, û ew di wî şerî de hatîye bişikenandin. Rojhilatnas Driver-Dirayver dibêje: Ev şaxên hanêyî Azu bi xwe ve bi şaxê Hazu ve tête biderkevtin, ango bi Sasonê êsta ve tête biderkevtin.

Heridot li rûdanên sedsalê pêncemî pêş zayînê de li ser navekî weha de nade biaxivtin, lêbelê li gora peyva xwe de dibêje, ku sêzdehemîn welatê dewleta Achaemenid-Axmen), yê ku ew di pişt re ligel Ermînya de hate bigirêdan, Buxte Wêx bû. Li gora Rojhilatnasên Noldke, Gepert, M. Hartman de ev navê hanê ligel navê Boxtan-Bohtan de bi yek ve tête biderkevtin.

---

[60]Li gora Şopên kevnarî Aşûrî de Tiglat Pileser-Pilêserê Yekem di navbera 1098-1068 Pêş Zayînê de daye biserdarîkirin.

Institut kurde de Paris

Xenophon-Zinefon Li ser Vegera Deh Hezaran de li sala 400-401 pêş zayînê de peyvê li ser Miletê Kardoka dide bikirin û ew dibêje, ku welatê wan tanî Bohtan dihate biçûyîn.

Di wê dema hanê de êtir li kenarê çepê şapê Diclê de[61] û li dorhêla çiyayê Codî de Merov li vî navê hanê de lê tête birasthatin.

Ji bal Nivîsvanên bi nav û deng ev herema hanê bi Curduene -Kurduîn dihate binavkirin. Dibejî, ku guhertina peyva vî navê hanî jî jiber dijwarîya peyvîna tîpa (G) ji bal Samiyan de hatibe bikirin. (Driver-Dirayver).

Bi zimanê Aramî ve bi vî welatî ve deşta Kardo didatin bigotin û bi bajarokê Cezîret Ibin Emirîyî êstajî ve Gazartayê Kardo didatin bigotin. Li nav Ermeniyan de ev welatê hanê bi Kordudh-Korduz ve û li nav Ereban de, weku Bilacorî û Teberê dibêjin, bi peyva Bakarda-Baqerde ve didin binavkirin[62].

Yaqûtê Hemêwî ji Ibin Esîr dide biwergirtin û ew dibêje, ku welatê Beqrda beşek ji welatê Cezire ibin Emir bû û têde du sed gund û dê dihatin bipeydakirin.

Bajarên Elsemanîn, Cûdî, Feyrûz û Şapûr li kenarê çepê şapê Diclê de û li beramberî Bazabda de dihatin bikevtin. Bazabda li kenarê rastî Dicl de dihate bikevtin. Li paş de ev navê Bakardayî hanê, yê ku ew ji bona welatê wî bû, di nava nivîstên musulmantiyê de hate

[61]Peyava Dicle bi zimanê Farisî beramberî wê Arrou-Arû tête bekaranîn. Ev Çemê hanê weha tête binavkirin; jiber xurtbûn û leza wî ye. Bi Îbrî navê Çî Dikel lêtête kirin, ku ew jî beramber bi Arû ye. Peyva Tigris ew ji peyva Tighla Zendî têtê bipêkhatin. Ev jî ji peyva Tig-Tîjî Sensikrîtî têtê bipêkhatin, ya ku ew bi têgihiştin Tîj-Tûj têtê liberkevtin. Ev Çemê hanê li nêzîka Not Mîlî ji Avkenda Farisî de lige Çemê Furatê dighêhev. Dirêjbûna wî 1146 Mîl têtê biderkevtin. (Wergerandina mêjûwa Kortyos, Derîyê 4, R. 37). Hêjî peyava Tîj di zaravayê Sulêmanyê de bi vê Têgihiştinê têtê bidîtin.

[62]Ji xwe re li Exabar El-Tiwal ya Ebî Henife El-Denorî, R. 3 û li Teberî bergê 10, R. 175 de bide temaşekirin.

Institut kurde de Paris

biwindakirin û li çîgehê wî navî de Ceziret Ibin Emir, Bohtan ... hd. hate bipeydakirin.

Li gora goyên Zanevanên Ereb û Ermenî de erdên Kardo cihekî wîyî zor biçûk têtê bidîtin. Bi rastî jî ve li ser tuxûb û sînorên Kurduîn de li nik me de tu agehdarîyên baş nayêtin bidîtin. Her li ser sê bajarên wî de, yên ku ew bi Sareisa-Sarêza, Stalka-Sitalka û Pinaka-Fênik ve têtin biderkevtin û li qeraxê şapê Dicle de dihatin bikevtin, hatîye bipeyivandin.

Lê Raportê Rojhilatnas Strabo- Sitrabo de, yê ku wî ew di vî warê hanê de daye binivîsandin, zor bi giringî ve têtê biderkevtin û li gora vê Raportê hanê de têgihiştina kurdewaye demekê bi navê çiyayên di navbera Diyarbekir û Muşêyî êsta de dihate biderkevtin.

Bi kurtî ve Kardoxuy li her layekî de be, hîç gûman têde nayête biderkevtin, ku ev navê hanê bi rengegî tir ve dîsan her dihate bidîtin. Peyva dawîyî "Xuy" renge, ku ew li cigehê Kh hatibe bikaranîn, ku ew di zimanê Ermenî de alavê pirîbûnê dide biderxistin. Inca li gora vê de renge, Ku Lêvenervanên Yunanî û Romê ev navê hanê di nava nivîstên Ermenî de dabin bidîtin?

Li layê Zeynefon de weha têtê biderkevtin, ku Miletê Kadoşuy-Kardko ne bi Artakesres-Ardeşîrekan[63] û ne jî bi dewleta Ermenî ve dihatin bigirêdan. Li sedsalê pêşî zayînê de welatê Kurduîn ji bal Dikranê duwem de hate bizeftkirin û wî Qiralê wêyî bi navê Zarbinus date bikuştin.

Li sala 115 de di paş zayînê de Qeralê Kurduîn bi navê Manisarus ve dihate binakirin. Li gora peyva Rojhilatnas Habişman de dewleta Ermenî bes bi nav welatê Kurduîn ve hatibû bizeftkirin.

Li dema Zenifon de, heger ku Eşîreke Îranî li Jorî Dicle de hatibe bidaniştin, ne dûre. Lêbelê bi hebûna navekî weha ve ji bona Miletekî Kurdoşî bi kok ve nayête bidanîn. Ev navê hanê bingehê wî û

[63]Mebest ji peyva Artaksîres-Erdeşêrekan Şahê Erdeşêrê bi nav û bang û Dûmayînên wî ne.

Institut kurde de Paris

wergirtina wîyî zimanê Samî dide biderxistin[64]. Bi zimanê Aşûrî ve -Kardo- bitêgihiştina- bi hiner ve yanjî bi Pahlewan ve tête biliberketin û Karado jî bi hinerbûn ve tête biliberketin.

Li layekî tirjî de hinek wekhevbûna peyvê ligel navê Xelkê Khaldi-Xaldi de tête biderkevtin û ev Xaldi li jêr nav û nîşana Uratu-Orato yaxud Urashtuyî Aşûrî de baştir hatine binasîn û ew li dora Ereratê de hatine birûniştin.

Ev Miletê Xaldi li dawîya sedsalê nehan de li pêş zayînê de di Ermînya de hatine bidîtin û li paş de li dorhêla gola Wanê de dewleteke bi hêz û hiner ve wan ji xwe re dane bidamezirandin û vê dewleta hanê tanî destpêkirina sedsalê şeşemîyî pêş zayînê de ji xwe re daye bidirêjkirin.

Rojhilatnas Lêman Hawpt li gora nivîsta Gotingin de, ya ku ew li sala 1907 de hatîye biderkevtin, dibêje: Li nava van Xalidiyan de hin ji Barkirvanên Bêgane hatine bidîtin. Mayer li bingehê welatê vî Miletê hanê de li Araks-Arasa nawendî de lê hatiyê bigerandin.

Bi kurtî ve di sedsalê heftemîn de di pêş zayînê de û li dema hatina Ermenîya de ji bona Kurdistanê ev Xalidî hatine bibelavbûn û ew ji bona şax û çiyayên dorhêlê hatine biçûyîn[65]. Belam navê wan li herema gola Wanê de her zindî bû û di bajarê Xelatê de, yê ku ew li kenarê serî gola Wanê de tête biketin, divê şopên van Xalidi yan bêtin bidîtin [66].

---

[64]Mebest li Netewê Same, yê ku ew kurê Nuhe-Xwedê lê xweş be-Aşûrî, Kildanî, Ereb, Ebrî, Fênêqî û Qertaçi jî li vî Netewî bi xwe ne.

[65]Li Mufeselê Tarîxî Umûmi Iraq-Dirêjbûna giştîyî mêjûwa Iraqê de Ehmed Refîq Beg dibêje, ku Miletê Xaldi li Cîgehê xwe maye û ew ligel Ermenîyan de hevgirtî û têkelbûn (bergê 1, R. 347).

[66]Insiklopêdîya musulmantîyê dibêje, ku Xîlat yanji Xelat li nêzîka Terabzûnê tête bikevtin. Ev bi xwe rast niye. Nivîsvanê Mufeselê Tarixî Umum di lêgerandina xwe de li ser dewleta Xalidî de dibêj, ku zimanê van Xalidîyan bi xwe nala zimanê Gurcî yanjî zimanê Laz tête bidîtin û ew ligel zimanê Samî de hîç pêwendîyeke wî niye. Paytexta dewleta Xalidî Toşpa-Wan bû.
Tiglat Pilêzerê Qeralê duwemê Aşurî di sala 743 Pêş Zayînê de hêrîşî ser wan kiriye

Institut kurde de Paris

Miletê Kardo çi Samî be û çi Xelkên kokîyî vî welatê hanê bin, gûman lê nayête bikirin, ku welatê Kardoşoyê kevin îro bi navîna koka Kurd ve têt biderkevtin. Heger weha be, divê pê bête birûniştin, ku "Kurdoşoy" ligel peyva "Kurda" de bi navekî hevbeş ve têt biderkevtin. Vê remana hanê jî di despêkirina sedsalê bîstan de ji xwe re liberketineke sade dayite biwergirtin.

Heger tozeke tir jî em lêkbidin, dê emê bibînin, ku Miletê Kurd bi carekê ve ligel "Xalidî" de bi yek ve têtin biderkevtin. Rojhilatnas Rieske-Rîske di diyarkirina xwe de, ya ku wî der barê Konstantin Poro Fîroj Netus dayite bikirin, dayite binivêsandin û ew dibêje: ku gotinên "Xaldi, Kurdi û El-kurd ligel Kurdayî navekî hevbeşî didin bipêkanîn". Remaneke wetovî tirî jî li pêşgotina nivîsta Lerch-Lêrç de hatiye bixuyanîkirin [67].

Lêvenerîn û lêgerandinên M. Hartman, Noldke û Visbax ev pirsa hanê bi ber berekî taze ve dane bixistin. Ev Hozanên hanê dibêjin: ji bona zanîna cudabûnê di nava herdu şaxên Kurd û Kardo de lêvenerandinên zimanî didin bipêwistîkirin. Bi alîkarîya nivîst û şopên Lênerînvanên bi nav û dengên ve Mîdya û Îranê divên di nava Kurtîwi û Cyrtii-Sîrti de Kurd bêtin binîşankirin. Herwehajî bi xwe jî ve hebûna Eşîrên Kurdîyî zor li Fars de di pêla Sasanyan de pişta vê remanê dide bigirtin. (Ji xwe re li Karnamaya Erdeşêr Babkan de bidin bitemaşekirin) [68].

heger cudabûneke peyvî di navbera navê Kurd û Kardo de bête biderkevtin, ev cudabûna hanê ewende kêrê ji bona çarekirina vê pirsa

---

û ew tanî Toşpa-Borsîpa-Toroşpa hatîye bihatin.
Lêbelê vî Miletê hanê, yê ku ew dildarê Serxwebûn û Azadîya xwe bû, zor bi mêrxasî liberxwe didan. Dawî û nema dewleta wan ji bal Mîdya hate kirin û Xelkên wê ji bona nava Çiyan hatin bikevtin (bergê 21. R. 346).

[67] Ev nivîsta hanê li sala 1273 k.- 1856 z. de hatîya çapkirin: Richeches sur les Kurd et sur leurs ancetrs, les Chaleen-Septentrionans).

[68] Ev nivîsta henê ji bal Rojhilatnas Noldke û Gotingen hatîye wergerandin û di sala 1296 k.- 1879 z. de hatîye çapkirin.

gewre nade bidan. Bi rastî ve çilo û kengî Sîrti - Kurdê Îranê ji bona Rojavayî Zaxros hatine bihatin û li cîgehê Kardoyî kevin de û li Jorî Surî û çiyayên Entî Tewros[69] de cîgîr bûne? Ev pirsa hanê hêşta zor bi lêvenerandinê ve tête biniyazmendîkirin.

Yekem. Vegirtinên Mîdya û Îranê dibe, ku ew ji bona guhestineke mêkanîkî ji bona pir ji Xelkên Îranê bêtin bidîtin. Numûne jî li ser vêna barkirina beşekî de ji Asagartya tête biderkevtin, yên ku koka cihê wan li Sîstan de dihate biderkevtin. Wehajî di pêla Aşûryan jî de ev Eşîra Asagartya li deşta Aşûrya û li dewr û berê Erbîla=Erbîl de dihatin bineşînîkirin û Serokê wan Citran Takhma bû. Ew ji bal Dara de hate bikuştin û wêneyê wî li ser taşe berdekî gewre û bilind de li çiyayê Bîston de ligel wêneyekî Dara û heşt Serokên din de hatine bineqşkirin. Wêneyê wî rûçikekî Kurdîyî xurû dide biderxistin[70].

Li salên 220 tan 117 p. z. (pêş zayînê) de di şerên navbera Roma, Silcoq û Qeralê Pirgamon de Sîpahên bi kirê girtiyên Sîrti jî ve dihatin bidîtin. (Ji xwe re li Liway, Puli Biyuz û Visbach bidin bitemaşekirin).

Li ciyografiya Ermenîyî sedsalê heftemîn de rûpelekî poşandî derbarê bi welatê Korcekh-Korçex ve hatîye bidîtin[71]. Di pêla Fostiyus Bizantiyus de, ango di sedsalê çaremîn de Korçex melbendek bû û ew nêzîkî Selmas bû. Li dawî de ew bi welatek bû, ku ji Çolemerg heta Cezîret Ibin Umer ew hate bifirehkirin û ev melbendên hanê di nav de bûn: Kordox, Şêh Kordrîx Kordîx, Aytonix, Îgarx, Mosolox-Osolanx, Orsîrox-Orsiyanx, Karasonîx- Sarayonîx, Çahok û Bakê Biçûk. (Hartman, Hubşman).

Ew pêşketin û guhertin, yên ku ew li êre de li ser xwe de hatine birûdan, li van her sê melbendan Kordox, Kordîx û Temorîx bûne, yên

[69]Ev Çiyayê Kurdistan û Asya Biçûke. Ew di koka xwe de ji du Rêzên mezin ji Çiyayê Erarateyî bi nav û bang ve tête biparvekirin. Yek ji wan bi navê Toroşê û yê din bi navê Anti-Dijî Torosê têtin binavkirin. (M. E.).

[70]The Sculptur of Bihiston, London 1325 k. 1907 z.

[71]Li gora Rojhilatnas Adontz Danerê nivîsta Ermînya de, ku peyva Korçex ji Kurîtç-Ex hatîye û ew li vir de dibêje, ku Korîtç bi têgihiştina Kurd tête biliberketin.

Institut kurde de Paris

ku Rojhilatnas Faustus-Fawistus wan bi cihê Korduînî kevnar dayite binîşandan. Kordox bi yek melbenda Korçex ve hatîye bikirin û Temorîx li nav de hatîye binemankirin û ew ligel Kordrîx de hatine biyekkirin. Bi vî corî ve melbendên layê Jorî, yên Naverast û yên Xuwarî hev dane biyekgirtin.

Rojhilatnas Hubschmann-Hubşman ji bona dozandina cudabûnê di navbera Kordrîx-Kordîx, Kortîwi de pir kar dayit bikiriin û ligel vî jî de bi xwe jî ve ew cudabûna zimanî ya ji bal Hartman û Noldkê de hatine bicihanîn, dîsan ber li ber de nayête bigirtin, ku rengekî wîyî tevlihev neyête bidîtin. Bi xwe jî ve Noldkê gurûhekî sêyemîn dayite bidozandiin û ew dibêje: Aramî Kartuay-Karteway û Erebî Kartawiye bi carekê ve pê Miletê Kurd didin binîşankirin. (Hofman, Auszüge).

Ji vê tête biderkevtin, ku di pêla vebigirtinên Ereb de navekî tek Kurd, ku pirbûna wî bi Ekrad ve didin bigotin, ew ji bona Miletekî tevlihevî Iranî yanjî ji bona dirawsê Îran re bi nîşan bû. Di nava vî Miletê hanê jî de hin ji Xelkên kokêyî cih mîna Kardo, Temorîx - Tamoraye dihatin bipedakirin, ku ew li heremekê de dihatin bidaniştin, ku Navîna wêna Alki [72] yaxud Elek bû; Xuyeysa-El-Xuweysiye[73] li melbenda Xuwîtî (Saso) de bû; Ortayye- (El-ertan) li qeraxê Firatê de bû. Hinek ji Miletan Samîbûn. (Nivîsta, Ensabê Umumîyî Eşayirê Kurd).

Hinek ji wan jî renge, ku ew Ermen bin. Dibêjin, ku koka Eşîra Mamekanê Kurd Mamîkonyanê Ermenî bûye.

Li vî sedsalê bîstemîn de hebûna perçeyekî îranîyî Ne Kurdî (wek Goran, Zaza) di nava Kurdan de bi carekê ve hatiye bicihanîn. Li hin cihên tir jî de weku Sulêmanîyê, Sablax, Qotor... hd. hin Binemal û Eşîr hebûn, ku ew ji derve hatibûn û serdarî dane bikirin, mîna ku li Qotor de li nava Şikaka de mayînên Koresûnli têtin bidîtin.

[72]Dibe, ku keleha Elkey ji Kelehên Hekarê be, mîna ku ew ji bal Ibin El-Esîr di bergê 11, R. 6 hatîye. Dibejî, ku Ev Elkeya hanê ji Erebkirina Koye- Koyesinceq hatibe.

[73]Weha di Teberî de bergê 11, R. 45 de hatîye. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Bi Kurtî ve lêvenerandin û dozandinên bi rêk û pêk ve zor dibe, ku ew şûna wî Miletê kevnar bête bidozandin, yê ku ew îro li penayê Miletê Kurdî êsta de hatîye biwindakirin û bi diyarî ve ew bi yek ve têtin biderkevtin.

Kurd netewê kêye -Bavikên wî- û ew ji ku hatîye?

Nivîstên musulmantîyê, çîrok û çîvanokên Kurd ji bo çarekirina pirsiyarîya kok û binyada vî Miletî ewende bi kelk ve nayêtin bidîtin. Mesud li Miruc El-Zeheb de dide bigotin: ku Kurd bi netewê wan Îranîyan ve tête biderkevtin, yên ku ew ji ber destên Zehakê xwînxuwar dane bibazdan. Ev goya hanê jî bi xwe jî ve li Şerefname de ji bal Firdewsî de bi xweşxuwanî baştir ve hatine biwênekirin [74].

Di sal 1812 de Morê li Second Journey de li laperê 357 de li ser Zemawendî -Demawend- dide biaxivtin, ku hemû salekê li 31 gelawêj de bi hatina rizgarkirina Îranê ve ji nava lepên Zehak-Pîwer Aspê sitemkar bi şahîyê ve têtin birabûn û bi vê zemawendîya hanê ve çejna Kurdî[75] pê dibêjin[76].

Institut kurde de Paris

---

[74]Li gora Şahname ev Şahê sitemkar du mar li ser şanên wî peyada bibûn û bi mejîyê Mirov dihatin xwedîkirin. Jibervêjî hemû rojek mejîyê du Mirovan jê re dibirin. Ji tirsan Xelkê firyarkirin. Li dawi de Kawayê Hesinger liser rabû û Xelkê yariya wî dan û Zehak ji ser Text dakirin û biderkirin.
Lêgerandinên tazeyî Mêjûvanan weha ye, ku Zehak nebes tenê Mirovekî hebû, lêbelêjî Mabalteke Serdar bûye, ya ku wê Aşur dayite zeftkirin û hezar salî bi ser de serdarî dayite kirin. Li vê Pêlê de li Jorî Aşur de dewleta Lordho Malbata Zehakî sergêj û serêş kiribûn. Malbata Zehakî hin ji Eşîrên Îranî ji bona Kurdistanê anîn û wan ew cigîrkirin. Van Eşîrên hanê bere bere dewleta Lordho nabûdkirin û Bavpîrên Kurdan datin pêkanîn.

[75]Miruc El-Zeheb bi vê Cejnê Mehrecan dibêje.

[76] Nivîsvanê mêjûwa Îran Sêr Con Malkom dibêje, ku Goya Cejin-Ceşina Kurdî bi xwe ew Nimûneyeke ji nimûnên Zordarî û Setemkarîya Faris li ser Kurd de ye.
Lêbelê Mêjûvanê Von Hammerê Elamanîyî bi nav û deng dibêje: "Ev Goya Cenja Kurdî bi xwe ew ji bona Miletê Kurd rûpelekî Mêjûyî ye û divê guhpêdanek pê bête dan: Roj perestî li Îran de û Ehrîmen peresî li Kurdistan de bûye. Bi rasti jî Ev Yezîdîyên Kurdistanê ew bi xwe ji Iranê hantine. Ji vê tête encamkirin, ku li Îranê de Beşekî ji Xelkê Ehrîmen perest dikirin û Beşekî din Hormuz perest dikirin. Beşê

Li layekî tir de koka Kurd bi ser Ereb ve tête bidan; ji bona nimûne Miruc El-Zeheb dibêje: Bavpîrê Gewreyê Kurd Rebie Ibin Nezer Ibin Muad de û li layê hin Mêjûvanên tir de Meder Ibin Nezere. Ev herdu Merovên Gewreyên hanê bi Mîrê welatê Rebie- Diyarbekir û Diyar Memder-Reqa ve dihatin biderkevtin.

Zanistvanên Ereb jiber xwe dibêjin, ku Miletê Kurd li encamê rûdanekê de[77] ligel Xesaniyan de ji civaka Ereb hatine bicihêkirin û ew bi ser şax û daxan ve hatine bikevtin û ew ligel hin ji Miletên Bêgane de hatine bitêkelbûn û zimanê wanî Erebî ji bîra wan hatîye biçûyîn. Hêjî ji vê jî xerabtir eve tête biderkevtin, ku li ser rêza Bavik û Bavpîrên Kurdan kurd Ibin Mard -Mardoy, Dirwasên Kurdin- Ibin Seesee Ibin Herb Ibin Hizan dide bidanîn.

Li gora Mesudî Kurd de Ibin Isfendyar Ibin Minoçehere. Ibin Hewqel dibêje: Kurd Ibin Mard Ibin Unere.

Li van hemû Bav û Bavpîran dibe, ku leteki ji rastîyeke mêjûyî de tête bête bidîtin[78]. (weku li tevlihevbûna Eşîrên Zagros û Faris de Miletekî Samî bête biiranîkirin).

---

Yekem li dawî de neçari barkirinê bûn û ew ji bona Kurdistanê hatin" Kurdler, R. 11).

Ev Bidîtina Von Hammer li gora hin ji Nivîsandinên tir mîna mêjûwa Giştiyî Murad Beg, bergê 1, R. 216 ewende rast niye.

Bi rastî jî di pêla Aşurî û Kildanyan de Îran yekbû û ew Yezdan perestbû. Biserdejî Hormuz û Ehrimen jî weku Yarîderên Perestên Pak û Bed bûn. Li dawî de li ser amojgarîyên Zend Avesta bere bere Ateş perestî peydabû û ew tanî peydabûna musulmantîyê hate bidirêjkirin.

Oldarîya Roj perestî di koka xwe de ew bi xwe li welatê Aşur û Kildan de hate bipeydakirin; jibervêjî Perestên wanî pir hebûn. Beel û Bel gewreyên wan Perestan bûn û ew bi têgihiştina Rojê dihatin liberketin.

ca dibe, ku Cejna Kurdî, weku Dr. Frech-Firêc (Kurdler) dibêje, Şahîya rizgarbûna Sitembarîya Zehak bi xwe ye.

[77]Şikestina Derbendê Marebê bi nav û bang Seylê Erem li Yemenê de ye.

[78]Lêdilovanê Alosî Mehmud Efendî di liberxistona Canê Têgihiştinan bergê 8, R. 149 de li koka Kurd de dibêje: li gora Ferhenga Muhit Bavê Kurdan bi Kurd Kurê Umro Muzîqya Kurê Emir Ma Elsema Imrîyê yanjî Emir Kurê Harise Elxetrîs Kurê Imru Elqeys Elbetrîq Kurê Selube Kurê Mazen Kurê El-Ezd Kurê El-Ews Kurê Malik Kurê Zeyd Kurê Kehlan Kurê Sebe Kurê Yeşcub Kurê Yerub Kurê Qehtan Kurê Emir û yanjî Şalic Kurê Erfexeşd Kurê Sam Kurê Noh.
Hinek Goyên din mîna van gotinan têtin bidîtin, lêbelê hemû bi carekê ve nerastin û

Institut kurde de Paris

Di dawî de li van gerandinan û peydakirina van Bav û Bavpîran de terxemî nehatîye bikirin, weku ku Merov li Miruc El-Zehb de dide bidîtin, ku xebat ji bona girêdana navê Kurd ligel peyva Kerrade de hatiye bikirin, ku ew bi xwe ve bi gotineke Erebî ve bi xwe ve tête biderkevtin. Li gora peyvên Hinekî din de dibêjin, ku Miletê Kurd Netewê Dîlên Cahîl û Casadê Dêw bûn, ku ev Dêwê hanê ji bal Hezretî Sulêman de (Xwedê jê razîbe) hatiye biderkirin. Hinên din navê Kurdan ligel peyva Farsîyî Gord-Palewan de didin biyekkirin. Ev remana hanê jî bi hebûna "G"yî Pehlevî ve hatîye bipeydakirin. Di demên dawî de gelek caran Eşîr bi navê Gewreyên wan ve hatine binavkirin. Li gora Şerefname de divê Miletê Kurd ji herdu Eşîrên Bacnawî û Boxtî ji Bacan û Boxt hatine bipeydakirin. Navê Bacnawî renge, ku ew li Basen-Avê de hatibe biderkevtin, ku ew yekeke ji Eşîrên kevnarî Diclêyî dihatihe biderkevtin.

Li gora Evsaneke tir de Miletê Kurd li pêş de du Qol bûn: Mîlan û Zîlan bûn. Mîlan li Erebistanê de bûn û Zîlan ji Rojhilatê ew hatine bibarkirin. Ev Qolê duwem maqûl nebû. (Mîlan) jê bi rêztir bû.

Institut kurde de Paris

---

ew xwe li ser belgeyên Zanistî bi pê nakin.

-2-

## Bîr û Bawerîya Sêr Sindni Simis

Ew agehdarîyên, yên ku ew tanî êsta derbarê Kurdistan de bi dest ve hatine bikevtin, zor têkel û kêmin û ew ji bona peydakirina remaneke bi carekê ve û bi dirêjbûn ve nadin bitêrkirin.

Li demên kevnar de agehdarîyên kêm û zor li nik me de derbarê wê nayêtin bidîtini. Ew heremek bû, ku sînorê wêyî Jorî kenarê gola Wanê bû, li Rojava de tanî Newala Xabur bû, li Rojhilat de tanî Kerkûk û li Jêrî de tanî Babilistanê diçû. Ev herema hanê li layê Miletekî de bi navê Subari-Şubari hatibû bigirtin. Ev herema hanê yanjî beşek jê car carî bi jêr serdarîkirina Sumeriar-Sumeri ve hatibû bikevtin, yên ku ew bi Serdarên bajarên gewreyên Jêrî ve dihatin biderkevtin[79].

Ew zimanê ku Xelkên wê heremê pê didatn bipeyvînkirin, ligel zimanê Samî de yaxud zimanê Hindo-Ewropî yanjî zimanê Sumerîyan de hîç lihevhatinek û pêwendîyek nedihate bidîtin. Hin ji Zanistvanên Elemanîyî vê demê didin bigûmankirinn, ku zimanê Şubari ji nifşê zimanên Qefqasya têtе biderkevtin.

Li pêş sala 2500 pêşî zayînê de Miletek, ku zimanê wî Samî bû -Aşûrî-, lêbelê renge, ku ew bi xwe ve bi Samîyekî xurû ve neyête biderkevtin, hatê biderkevtin û ew li beşê xuwarî welatê Şubari de yanî li herema dewr û berê Aşûr de yaxud keleha El-Şerqatî êsta de hate bicihkirin.

Li nêzîka 2525 de li pêş zayînê de hemû welatê Kurdistanê bi beşek ji Patîşahîya Sargon Qeralê Akad û Naram Sînê Lipaşhatîyê wî ve dihate biderkevtin û li dewra siyemî dewleta Ur de yanî li nêzîka 2300-2150 de pêş zayînê çend hêzek ji bona ser hin beşên biçûkî

[79]Li pêş bipêkhatina dewletan de di hereman de li bajarên welatên Somer û Akad de Dewletên Serbixwe mîna dewleta Kîş, Lagaş, Ur ... hd. 2900 li Pêş Zayînê de hebûn.

Institut kurde de Paris

Kurdistanê de dane birêkirin, ku ew li Rojhilatî Diclê de dihatin bidîtin, mîna Simurru-Sîmoro, ku renge, ew herema dora Altun Koprî be, Lullubu-Lolobo yanî Helwan, Sasro û Urbillum yanî Erbîl. Tête bidiyarkirin, ku her çend Xelkên vê heremê jî bi yek Milet ve diahtin biderkevtin, lêbelê jî di nava wan de yekitîyek nesihate bidîtin.

Di sedsalên nozdeh û heştdehê pêş zayînê de di navbera Miltên Asya Biçûk de hin tevger û vejandinan datin birûdan û wan bi tevaya Rojhilat de datin bikêrkirin. Tevaya van tevgerên hanê, weha derdikeve, ku wan beşên cudayî ji Miletên Hindo-Ewropayî gelekî têde datin beşdarkirin.

Miletê Hittite-Hitit, ku zimanê wan li beşê Centum-Sentum yaxud li Latinî de tête biderkevtin, Surî dane bizeftkirin û Babilon dane bitalankirin.

Miletekî lipaşvemayî bi navê (Umman-manda Oman-Manda) ve li dawî de ligel desteyê Mede de Mîdya û Sythians-Sîs de cihê bû û ew li qeraxê Rojhilatî derya Reş de cigîr bû.

Li reha Hindo- Îranî de beşekî biçûk rêga ji bona xwe date bivekirin û ew tanî Rojavayî Kurdistanê hate bihatin û cigîr bû û yek ji Xanedanên wan bi navê Mitanni-Mitani ve dewletek date bidamezirandin û navîna wêna li ser ava Xabur de dihate bikevtin.

Ji destpêka vê mêjûwê beşê Rojavayî Şubaro li jêr navê Khurri-Xurri de li beşê Rojhilatî de hate bicihêbûn. Zimanê wî jî bi wî navî ve hate binavkirin.

Di wê navê de li dawîya sînorê Rojhilatîyî Kurdistanê jî de hin veguhertin û pêşketin ji bal Miletê Kassites-Kasî de hatin biberpakirin û hin ji Gewreyên vî Miletî li paş vegirtin û wêrankirina Hitîtan de li Babil de dewletek datin bidamezirandin. Renge, ku hin gotinên zimanê vî Miletê Kasî ligel zimanê Îranî de pêwendî û lihevhatinek bide bipeydakirin.

Di sedsalên şanzdehan de li pêş zayînê de Serdarên Mîtanî demeke kurt li ser tevaya Kurdistanê de bigir tanî Arrapkha-Arapxa-Kerkuk de desthilatî dane bikirin; herwehajî serdarîya wan li Aşûr û deşta

Institut kurde de Paris

Hewlêrê de hate bikirin. Lêbelê şer û herayên navxweyî li dû hevdû de di nava vê dewleta hanê de di encamê wê de ev dewleta Mîtanî hate bidukert kirin: Beşê koka Mîtanî yaxud beşê deşt, beşê welatê Xurî yaxud herema dawînîyî şaxên Tor Abidin

Her di vê dema hanê jî de Xanedanekî Serdarê tir ango ji Bavikê Xani Galbat-Khnigalbat hate biderkevtin û wî dewleteke serbixwe date bipêkanîn û wê demekê bi ser Aşûr ve date biserdarîkirin. Paytextê vê dewletê Nisêpîs bû, ya ku ew li dawîya dawî de bi Nisêbînê ve hate biveguhertin.

Dewleta Mîtanî di pêşîya sedsalê çardehan pêş zayînê de ligel Hitit de li ser Surî de hate bişerkevtin. Di vê kêsa hanê de desthilatîya Aşûrî bere bere bêtir bû û di encam de Beramberê xe date bişikenandin û wê dikarîbû ji xwe re beşekî ji Kurdistanê ango ew heremên Jêrî Rojhilat bide bigirtin û ew ji bona jêr serdarîya xwe bide bianîn, yên ku ew ji bal Qeralên Kasîyê Babil de dihatin bizal û biserdarîkirin.

Belam li dawêya sedsalê çardehan de Miletekî taze hate bipeydabûn û wî wist, ku ew li qeraxê Rojavayî şapê Diclê de û li nêzîka şaxê cûdî de ji xwe re bête biwarkirin. Ji bona vê mebesta hanê Miletê Aramî û hinî tir ji beşên deşta Jorîyî Surî ligel Aşûrîyan de hatin bişerkevtin. Di encam de ev pêgirtina cigîrbûnê serî negirt. Hoyek ji vê eve bû, ku Orduwê Aşûrî li sedsalê sêzdehan de bi hêz û hiner bû, Hoyê tirî li wê demê de cigîrbûna Miletekî taze di navbera goma Wanê û goma Urmiyê de hate biderkevtin.

Û ji destpêkirina vê mêjûwê de ev herema hanê bi navê Urartu-Orartu hatîye binavkirin û yanjî bi Erarat ve mîna ku ew di nivîsta perest de hatîye binavkirin.

Di cara pêşîn de li layê Shalmaneser-Şelmaneserê Yekem de li sala 1260 pêş zayînê de li ser de hatîye bixeberdan. Navê Xelkên vê herema hanê bi carekê ve nayêtin binasîn. Belam bi gûmana giştî ve weha tête biderkevtin, ku çunge, Perestê wan bi navê Xalidyan ve hatîye binavkirin, Xelkên wê jî ji bal Romaniyan de bi navê Chaldioi-Xaldyowî ve hatine binavkirin û evaya divê bi hûrbûn ve ji Chaldasans yanî ji gotina Kildanî bête bicudakirin.

Institut kurde de Paris

Zimanê ku ev Xalidî pê dihatin peyivandin, li layê Karnasan de ew li beşê Qefqasî de dihate biderkevtin. Li gora belgeyên wan şopên kevnar de, yên ku ew li Wanê de bi xwe ve û li şarê kevnarî Topraq Qele de, yê ku ew nêzîkî Wanê ye[80], hatine bidozandin, dibe, ku ev Miletê hanê ligel bajartîya kenarên derya Sipî de pêwendîyên wî dihatin bidîtin.

Kêra vêna li Jorî Kurdistanê de eve bû, Ku Xelkên kokîyên wî cihî li Jêrî gola Wan de hatin bineçarîkirin, ku ew ji bona aliyê Jêrî û Rojava bidin bibarkirin. Ev zîneta hanê bi hoyê pêkanîna hin ji Mîrneşînîyan hate biderkevtin, yên ku ew ji bal Aşûrîyan de bi navê welatên Nairi-Nayri hatin binasîn. Ev Mîrneşînî bi rengekî giştî ve bi serokitî û serdarîya "Urartu" pê hatibû birûniştin.

Di tevaya hebûnên di sedsalê yanzdehê b. z. de û li nemankirina Imperetorya Hitit de hemû ev welatê Jorî Kurdistanê ji bal Miletê Mushki-Muşki de hate bizeftkirin û ew nêzîka pênçî salî di nava destên wan de hate bimayîn.

Vi Miletê taze erdên Jêrîyî Capadscia-Kapadokya û Cilicia-Kilikya[81] jî date bidagîrkirin û ew tête hatin bineşînbûn. Roman ji vî Miletê hanê re Meschoi-Moşwî didatin bigotin. Di paş de van Moşkîyan xwestin, ku ew sinorê serdarîya xwe tanî Rojhilatê gola Wanê bibin bidirêjkirin, belam li lay Serdarê Aşûrî Têglatplayzer de li pêş sala 1100 b. z. de hatin bişikenandin.

Di sedsalê dehemîn û di destpêkirina sedsalê nehemîn de li b. z. de Miletê Aramaenn-Aramî hêriş bi ser deşta Xabur de date bibirin û dawîya Xurîyê kevin ango Şubariyê Rojavayî bi carekê ve dane bidagîrkirin. Belam Şubariyê Rojhilatî ji bal dewleta Aşûrî de di vê demê de ango di sedsalê çardehan de û tanî sedsalê nehemîn de hate biparastin.

[80]Topraqê Qelhe niha ew Navîniya melbenda Elşugurd li Wilayeta Beyazîdê ye. Ligel Wanê nêzîkbûnek û pêwendîyek niye. Weha derdikeve, ku ev Topraq Qelhe cihekî tire û ew li nêzîkî Wanê tête biderkevtin.

[81]Ew Wilayeta Edenayî niha ye. (M. E.).

Ligel vê jî de dewleta Aşûrî bi ser van heremên nepêve girêdayê li Rojhilatî Kurdistanê de çavên xwe date biavêtin, yên ku Xelkên wê her û her beramberî wan dihatin birabûn. Li gora belge û bi tomarkirinên şopên Aşûrîyî sedsalê sêzdemîn ve wisa tête biderkevtin, ku li vê herema hanê de ji bil biderkevtina Miletekî tazeyî Paphi-Paphî guhertineke tir nehatîye bidîtin. Ev navê hanê tanî vê dema dawîyî bi Korti ve dihate bixwendin û hinekan jî ew bi ser navê Kurd ve didatin bibirin; lêbelê tomarên kevin li Boxazkowi[82] ve datin bixuyanîkirin, ku ew li ser Miletekî tir de didin bixeberdan, ku navê wî bi Papanhi-Papanxi ve tête biderkevtin. Dibe, ku ev ligel Papxi de bi navekî hevbeş ve bête biderkevtin û ew li pêş de bi şaşbûn ve hatibe bixwendin.

Miletê Hitit di vê demê de, ango di sedsalê sêzdemînî pêş zayînê de li ser Aşûrî de bi devavêtinê, dek û dolab û vîlêk gerandinê ve dane bidestpêkirin, belam ewende ew bi serketî ve nebûn. Eve jî divê li ber çavan de bête biderkevtin, ku Xelkê Kurdistana Rojhilatê li jêr Serdarî û desthilatîya bajartîya Şûbarî, kildanî û Aşûrî de dihatin biderkevtin.

Ev jî di belgeyên mafeyî û bazirganî de li Kerkuk de hatine bidozandin. Ev belgeyên hanê jî bi sedsalê panzdemîn û şazdemînê pêş zayînê ve têtin bigirêdan.

Bi rastî jî ve li nava Xelkê de hin cudabûn û pevçûn jî dihatin bidîtin, lêbelîjî ol, yasa, reweşt û rewendên civakîyî Xelkên êre li jêr navên welatperwerîyê de û li nav bajartîya deşta şapê Diclê de dabûn biyekkirin.

Tomarên sedsalên nehem, heştem û heftemê Aşûrîyî pêş zayînê de waha didin binîşandan, ku ciyografiya siyasîyî Kurdistana Rojhilatê bi

[82]Ew li Çorm de di nava Wilayeta Enqera Kevin de tête bikevtin. Ji xwe re li Gotara Mamomste Qeyser Sadir Endamê Komela Şopênkevnarî Surî bide temaşekirin. Ew Gotar di Desembera sala 1936 de û di Yenayera sala 1937 de li ser Çanda Hisiyîn de li Esya Biçûk de li Jorî Surî de û herwehajî li ser Hemsayên wan ji Mitanî û Xorîyîn de hatiye binivîsandin. Ew Gotareke pir hêja ye. Ew perdê ji ser gewretirîn dewleta Mêjûwê dide hildan. (M. E.).

Institut kurde de Paris

hoyê barkirina Miletekî Hindo-Ewropî ve ji Rojhilatê derya Reş ji bon heremên Jêrî tûşî veguhertinan hatibû bikirin.

Navê Medes-Mîdya cara pêşî ji bal Şelmanaserê pêncemîn ve (823-810 pêş zayînê de) hatîye bigotin. Li paş vêna de ew ji bona dewleta Aşûrî her û her bi hoyekî metirsiyê ve dihatin biderkevtin. Vî Miletê hanê di pêşî de Rojhilatî Mîdya date bivegirtin, belam ji destpêkirina sedsalê heftemîn de Mîrên wan hemû ew welatên, ku li paş de bi Mîdya ve hatine binavkirin, ew bi jêr desthilatîya xwe ve dane bixistin.

Di vê pêla hanê de Mannai-Maney bi navê Miletekî ve tête biderkevtin, yê ku zimanê wan ne bi diyar ve tête biderkevtin, wî heremeke biçûk li Jêrî Rohilatê gola Urmiyê de ji xwe re date bivegirtin.

Herema Parsuas-Parsuwas, ya ku ew li Jêrî Rojavayî gola Urmiyê de tête bikevtin, renge, ji bal Miletê Parsîwi, Persai-Persay niye, hatibe bivegirtin, ku ev Miletê hanê di dema Patthian-Pars de li layê Rojhilatê Caksaret de[83] dihate birûniştin.

Ev hemû perçeyên siyasîyî taze pêşekîya barkirina Miletên Gewreyî tir didin biderxistin. Bi rastî ve li destpêka sedsalê heftemînî pêş zayînê de Miletê Seythians-Sîsî bi talankirina Şahînşahîya Aşûrê ve date bidestpêkirin. Di pêla Esarhadden-Îserhaden Aşûrê de hatin bineçarkirin, ku ew ligel wan de Peymaneke Dostanî bidin bigirêdan û bi vî rengî başîyî hanê ve dan û sitandina wan tanî dawîya sedsalê heftemîn date bidirêjkirin.

Belam li nêzîka sala 625 pêş zayînê de Nahopolassor-Nabopolaser[84], yê ku wî xwe bi xwe ve Keyê ser bi xweyî Babilistanê ve date bidanîn, ligel Mîdya û Sîsî de beramber bi

[83]Yaxartes-Yaksart ew heremeke nêzîka ava Cihun li Turkistanê de bû.

[84]Ev Zatê ji bal dewleta Aşurî ve bi Walî li ser Babil de hate bidanîn. Gava ku wî dît, ku Dewlet lawaz bû, wî Serxwebûna xwe date dazanîn û biserdejî wî ligel dujiminê Aşurî de yanî ligel Qeralê Mîdya de hevpeymanî date bigirêdan.

Institut kurde de Paris

dewleta Aşûrî de peymanek date bigirêdan û li nêzîka sala 616 pêş zayînê de şer date bidestpêkirin û li sala 612 de bajarê Nîneva hate biwêrankirin û dewleta Aşûrîyî dawî pêhate biqirkirkirin.

Di dema qirkirina Aşûrî de di paştir de[85] hin caran li ser Kurd de hatîye beyivandin û nemaze ji alîyê Xenophon-Zeynefon de li çîroka Vegerandina Deh hezar de daye bixeberdan, ya ku ew li sala 401 pêş zayînê de hatîye birûdankirin. Di navbera nava herdu deman de du sed sal dirêjî tête biderkevtin. Ev dema hanê jî bi xwe jî ve bi demeke kêm ve nayête biderkevtin. Belgeyên mêjûyî bi tenha xwe ve dikarîbûn li mêjûwa Kurdistanê de bidin bikêrkirin û bi taybetî ve kêlên nivîsandina mêjûwa Şahên Achaemenia - Akmenîyên[86] Îranî têtin biderkevtin, yên ku ew tu rastîyê li ser pirsa koka Kurd de nadin bikirin.

Mirovê, ku ew li ser koka Kurd dide biaxivtin, nabe ew li bîra wî de biçe, ku ew perçên cuda, yên ku ew li nava şax û daxên Kurdistanê de ligel Xelkên kokê de dihatin birûniştin, çi Kurd, çi Ermenî, çi Aşûrî û çi Turkumanî be, koka pirsê deqa rehê niye, belkî alîyê zimanê wî bi xwe ve têtê biderkevtin. Kardouchoi - Kardoxowîyê Zinefon bi Kurd ve têtin biderkevtin û ew mêldarî serxwebûna xweyî milî bûn, çunge, zimanekî wanî cihê û serbixwe ve dihate bidîtin.

Di vê dema me de dîtina li ser zimanê Kurd de zor hatîye biveguhertin. Li gora remanên wan Karanasan de, ji yên ku Merov dikare birwa bi wan ve bide bikirin, zimanê Kurdî bi zaravayekî derketî yanjî şaş û maşoyî Farisî nayête biderkevtin, belkî zimaneke, ku pêşketineke wîyî rastîyî û kevnarî têtê biderkevtin û ew ji zimanê Farisîyê kevnarîyî li ser kêla Darius-Dara de bi kevnartir ve têtê biderkevtin.

[85]Mistêr Hall-Hol di nivîsta mêjûwa Rojhilata Nêzîkî Kevnar de, R. 511 dibêje: Aşur Napal-Banapal, yê ku ew Serdarê Aşûrîyî dawî bû, Qeralê Manî sertewandî kir. Belam wî hîç li Kurdan netuwanî bida kirin (626 Pêş Zayînê).

[86]Ew ji Qata duwemî Şahên Îranîyên Kevnin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Heger evaya rast be, bi serûştî ve bi mafeyê Zanistvanên mêjûwê ve têtê biderkevtin, ku ew bibêjin: ku zimanê Kurdî di sedsalê şeşemîn de li pêş zayînê de dihate bipeydakirin û ew bi zimanekî serbixwe ve dihate biderkevtin; Miletê Kurd jî ji Miletên Hindo-Îranî têtê biderkevtin û ew di dema Mad de ji bona Mîdya hatine bihatin û Parsî ji bona Îranê hatine bihatin û Kurd jî ji bona Kurdistanê hatine bihatin.

Ca li vê de wa derdikeve, ku mêjûwa texmînkirina hatina Kurd ji bona Kurdistanê divê li dawîya 650 p. z. de bête biderkevtin. Çunge, tomarên Aşûrîyî pêş vê mêjûwê hîç li ser wan de nade biaxivtin[87].

Renge, hatina Miletê Ermenîyî Hindo-Ewropî jî ji bona Ermînya encamê tevgereke weku wê barkirinê bête biderkevtin û ew bi xwe jî ve di wê demê de bi xwe jî ve hatibû birûdan. Ligel vê jî de divê bête bizanîn, ku ev dîtina hanê li gora ziman de hatîye bidanîn û ewên ku dibêjin, zimanê Kurdî bi Farisîyeke tîkel û pêkel ve têtê biderkevtin, divê ew bi carekê ve bizanibin, ku berên lêgerandinên mêjûyî servajîya vê bîr û bawerîya wan didin biderxistin.

Dîtina girêdana Xelkên kokîyî Orarto - Urarto ligel Kurdan de her çende hêjî ew nehatîye bicihkirin, lêbelê jî di demên kevnar de wênerkirina Miletên cuda ji bal Miletê Kurd de bi dîtineke pir bi hêz û hiner ve têtê biderkevtin.

Institut kurde de Paris

[87]Mistêr Hall-Hol di nivîsta mêjûwa Rojhilata Nêzîkî Kevnar de, R. 456 dibêje: Adad Nîrariyê Sêyem Qeralê Aşûrî li sala 812 Pêş Zayînê de Eşîrên Kurdên Jorî datin sertewandin. Ev rûdana hanê jî li gora Belgeyên Aşurî de weha dide biderxistin, ku Miletê Kurd li Kurdistanê de zor pêş mêjûwa 650 Pêş Zayînê de dihate bidîtin.

-3-

## Bîr û Bawerîya Daner

Li benda yekem û duwem de bîr û bawerîya du Karnasên bi nav û deng ve der barê Kurd û Kurdistanê de bi xwe ve min ew dane binivîsandin, Weha min bi baş ve date bizanîn, ku ez encamê livenerandinên xwe jî li benda sêyem de bidim biraxistin.

kesek ku bivê mêjûwa Miletê xwe û yanjî Miletekî din bide binivîsandin, di pêşî de divê ew li şûna kok û Pêkhatina wî Miletî de bête bilêgerandin û di vî warê hanê de ew tûşî dujwarîyeke kêm yanjî bêtir têten bikirin, çunge ji bona kok û binyada wî agehdarîyên bi rêk û pêk ve û li dû hevdû de bi dest ve nayête bikevtin.

Bi rastî jî ve bi encamê kar û xebata hêjayî Zanistvanên Şopa Mêjûwê ve hêjî ev alîyên hanê ji me re bi carekê ve nedane birûnkirin.

Ca jiber vê mêjûnivîsandin bi neçarî ve duçarî reman û dîtina hinan ji Zanistvan û Rojhilatnasan têtê bikirin, ku ew li reh, ziman û welatê wî de têtê biderkevtin, pir caran jî ev sê diyarî jî lê di Pêkhatina yek de kom nayêtin bidîtin û her bi hêztirinî van diyarîyan ve jî ziman bi xwe ve têtê biderkevtin.

Ji bona nimûne em dibînin, ku Miletekî Samîyî bi koka xwe ve ji Cezîra Ereb rûwê xwe ber bi Babilistanê de di sala 2225 p. z. de date bivekirin, wî welatê Akad ji xwe re date bizeftkirin û yekemîn dewlet têde ji xwe re date bidamezirandin. Miletê Ereb bes û bi tenha ve, jiber ku hatina wî Miletê kevnar ji Cezîra Erebî û ji reha Samî têtê biderkevtin ew jî xwe bi ser wan ve didin birakişandin.

Hîç bi dûr ve nayête biderkevtin, ku beşê Akadî jî, yê ku ew çend sedsalan li pêş wî Miletî de Babilistan ji xwe re dabû bidagîrkirin, wî ji xwe re dewleta Akadî date bidamezirandin, ew bi xwe jî ve ji reha Samî bû û ew ligel koka Ereb de bi lihevhatî ve têtê biderkevtin.

Biçge li vêjî de em dibînin, ku Miletê Turk jî, jiber hoyê wekhevbûn û lihevhatîyên kêm û zorî ziman ew koka xwe bi ser reha Hon yanjî Qon ve didin bibirinn, ku ew jî ji dundên Şang Yung têtin biderkevtin, yên ku ew li Jorî Çîn de dihatin biderkevtin û li dora ava Orxon de dihatin bijîyandin. Bi vê raxistinê ve destpêka mîjûwa Miletê Turk di sedsalê bîst û heştemînî p. z. de têtе biderkevtin.

Weha jî em jî di vê lêkolandina xwe de li ser wî şêwî de têtin biçûyîn. Welatê Kurdistanê li gora rûdanan de divê bi cîgehê peydabûn û belavbûna reha duwemî mirovanyê ve bête biderkevtin û li destpêka mêjûwê de Miletên Zagrosê têde dihatin bidîtin. Ev Miltên hanê jî bi: Lollo, Gotî, Kasay, Xaldî-Kaldî û Subaro-Horî ve dihatin biderkevtin.

Li dawîtirina Rojhilatî wan jî de Miletê Êlam dihate biderkevtin; li gora ji hin lihevhatin û wekhevbûna zimanê wan de hin ji Rojhilatnasan dibêjin, ku ew ji reha Qefqas têtin biderkevtin. Biçge li Êlamî de divê koka herî kevnarî van Miletan tevan bi Kurd ve bêtin biderkevtin û wan di dewr û dewranên Somerî, Akadî de û li destpa dewrana Aşûrî de kar û barên jêhatîyî siyasî pê hatine birabûn

Şepolên barkirinên reha Hindo-Ewropî û yanjî Arî ji bona Zagros di pêşî de û ji bona Rojhilat û Rojavayê wî de di paş de, (renge, van barkirinên hanê di sedsalên dehem û nehemî p. z. de[88] daye bidestpêkirin), divê mayînên Xelkên kokîyî Zagros û Kurdistanê bere bere bi jêr desthlatîya xwe ve dane bixistin û ew bi Arî ve dane bikirin. Perçeyê herî zor û bi hêz û hinerê ve ji van barkirinên hanê Mad bi xwe ve hatîye biderkevtin. Di pêşî de ew li Rojhilatê goma Urmiyê de hatiye bidamezirandin û li dawîya wî de Miletên Parsî, Maneyî, Parsîwî, Pars û Kardoşowî.. hd. hatin bihatin. Renge, hatina vî Miletê dawî ango Kardoşowî, yê ku Zênefon li 401 p. z. de li wan de hatîye birasthatin, li sedsalê heftemînî p. z. de bête biderkevtin. (Sêdnê Simis).

[88]Kruzon di pêşgotina Çûna xwe de ji bona Îranê dibêje: pir dibe, ku ev barkirina hanê berî Zayînê bi Bîst sedalan hatîye kirin.

Institut kurde de Paris

Ke wabû, kok û binyada Kurd, weku hin ji Zanistvanên şopan dane bigotin, ligel Qata pêşî de -ango Koma Zagroseyî kevnar de- zor bi pêwendî ve têtin biderkevtin. Li gora vêna de divê li lêgerandina koka Kurdan de bi başî ve li Qata yekem û duwem de bête bilêverandin.

## A. Qata Yekem: Miletên Zagrosê

### 1. Lolo-Lollo yanjî Lolloobom

Institut kurde de Paris

Ev Miletê hanê li herema Zehaw - Şahrezor - Sulmanîyê hatîye bidîtin. Mêjûwa hatina wan ji bona vî welatî nehatîye bizanîn. Ew têkelî Miletê Gotî bûn û bi hev re ew li herema Sulêmanîyî niha de dihatin bijîyandin û welatê Halman jî bi destên wan ve hate bikevtin[89]. Ew şopên li alîyê Kerkuk de û hin ji belgeyên tirî dozandî[90] derbarê vî Miletê hanê de pir agehdarîyên di nava wan de têtin bidîtin. (Di pêşgotina bergê duwem de dê bêtir dirêjbûn bête bidan). Li gora hin ji wekhevbûnên ziman de weha têtê bigûmankirin, ku hin ji Serdar û Qeralên Aşurî di sedsalên nozdeh û hijdehan - heştdehan pêşî zayînê de ji Miletê Lolo dihatin biderkevtin. Renge, ku hinek ji vî Miletî jî li Surî de dihatin bipeydakirin. (Miletên Mozopotamya, Sipayzer).

Orduwê Asurî li destpêka sedsalê sêzdehemînî pêş zayînê de ligel Miletê Lolo bi pêwendîkirî ve dihate bidi^tin. Bi saya vê Pêwendîya hanê ve di belgeyên Aşurî de gelek agehdarî derbarê vî Miletî û welatê wî de hatine bidan.

---

[89]Ew bajarê Helwanî Mêjûyî ye.

[90]Ev Belgeyên hanê têtin bipêkhatin: 1. Berekî nivîsandî ji pêla Naram-Sîn Qeralê Akad. Ew ji bal Mêcer Edmonds de li Derbendê Gawir de di Çiyayê Qeredax de hatîye bidozandin. Wî li ser wî de gotareke giring di Rojnama ciyografî date binivîsandin.

2. Belgeyekîtir Berekî nivîsandîyê Qeralê Lollo Anno-Banîni ye, yê ku ew li Zehaw hatîye bidozandin. mêjûwa Belgeyê Berê Yekem ji bona Sî û Heftê sedsalê Berî Zayînê têtê bivegerandin. mêjûwa Belgeyê Berê duwem ji bona Bîst û Heştê sedsalê Berî Zayînê têtê bivegerandin.

Zimanê vî Miletî li gora lêgerandinên Rojhilatnas Husing-Hozing de divê ew ji zimanê Komela Êlamî bête biderkevtin. Ev bîr û bawerîya hanê li ser dîtina hin ji navên taybetîyî Lolo de hatîye bidan; tevlivêjî de di navbera zimanê vî Miletî û Horî de hin wekhevbûnên peyvan hatine bidîtin[91]. (Sipayzer).

Li gora belgeyên dewrana Aşur Nasirpalê duwem de welatê Lolo zor bi avedanî ve dihate biderkevtin û Xelkên wê di bajartîyê û çêkirinê de b: radeyekî weha ve li pêş de dihatin biderkevtin, ku vî Qeralê hanê zor Merovên Çêkirvan ji vî welatî ji bona welatê Aşurî dane bibirin. (Olmsitêd).

Pirofêsor Sipayzer van Loloyên hanê bi Bavpîrên Lor ve dide bidanîn.

Institut kurde de Paris

## 2. Goti-Guti

Ev Miletê hanê jî Meleteke ji Miletên Zagrosêyî bi nav û bang ve têtê biderkevtin. Wî di demekê de (2649 pêş zayînê de) welatên Somer û Akad date bizeftkirin. Serdarîya wan di nava wan welatan de 125 salan û çil rojî date bidirêjkirin.

Em di nava Lista Şahên Gotî de, ya ku ew li Nîpor de hatîye bidozandin, navên bîst û yek Şahî ji Şahên Goti didin bibîtin. Weha têtê bidîtin, ku dewleta Goti dev ji paytextê xwe li Erîxa de dayite biberdan û li welatên Akad û Somerî de nala welatên vegirtî serdarî daye bikirin. (Kambirêc, mêjûwa Kevnar, bergê 1, r. 423).

Bi nav û bangê Qeralê Akad Naram-Sin ve beramber bi orduwa Goti ve hatîye bişikenandin û dewleta wî ji dest çû.

Serdarê here bi hêzî Lagash-Lagaş jî ve bi Guti ve hatibû bigirêdan û Qeralê wanî dawî jî bi navê Tirigan ve dihate binavkirin[92].

---

[91]hate bidîtin, ku Hurî yanî Xorî ew ji Beşê Rojavayî Miletê Sobarî ne.

[92]Xwedîyê mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzkî Mistêr Hall-Hol li Lîsta Serdarên Kevnar de R. 210 dibêje, ku Annatum Qeralê Gotîyî Yekeme, yê ku wî ligel Êlamî de di sedsalê Sî û Yekê Pêş Zayînê de şerkiriye. Li sedsalê Bîst û Heştê Pêş Zayînê de Anno-Banîni bi Qeralê Gotî digotin. Bi gora vêna welatê Akad li Naran Sîn wan zeftkir. Godi Batîs Serdarê Lagaş jî di pêla dewleta Gotî de bû. Dibe, ku ew bi xwe jî Gotî be. Divê pêla dewleta Gotî li Akad û li Babilistanê de ji du sedsalî bêtir

Pirofêsor Sipayzer dibêje, ku li gora wekhevbûna navan de divê di dewrana dewletên herî kevnar de beşên Goti ji bona nava Şomer hatibin bikevtin. Li dawîya peydakirina desthilatîyeke zor wan welatê Akad jî dane bizeftkirin. Pêşveketin û avedanyaî Lagaş li jêr serpereştîya Goti de (di sala 2600 pêş zayînê de) bi pirbûn ligel pêla dewleta Goti de li hev de tête birasthatin. Ev jî bi xwe jî ve şopeke weha jiber xwe niye. (Sipayzer, Miletên Mizopotamya, R. 99).

Dewleta Akad Eşîrên Goti ji bal Qeralê Ur de di destpêkirina sedsalên bîst û şeşên (2524) pêş zayînê de dane bilinavbirin. Eşîrên Goti piştî vê şikenandina hanê ji bona nava Zagrosê hatin bivegerandin.

Di nîvê sedsalê heştdehemînî pêş zayînê de, gava ku Eşîrên Kasay hêrîş bi ser Babilistanê ve dane bikişandin, ligel wan jî de Eşîrên Goti dane beşdarîkirin..

Ji vê Pêlê tanî peydabûna dewleta Aşurî derbarê Goti peyv û dengek nayête biderkevtin. Tanî sêzdehemînî p. z. de dewleta Aşuri hêzeke wêyî weha nebû, ku ew Dirwaseyên xweyî Zagrosê bi ber tirsê ve bide bixistin, belkî bi serdejî ew bi pwistê alîkarî û parastina Lollo û Goti ve dihate bidîtin.

Şelmanaseri Yekem Qeralê Asurî ji nên berên xwe pêve bêtir ligel Miletê Goti de xerîk bû. Li gora şopên dozandinên vî Qeralî de Eşîrên Goti zor dir û nebezbûn. Welatê wan ji sînorê Oratrê-Erministanê tanî Kemoxê-Torabidînê dihate bidirêjkirin.

Bi kurtî ji go û şopên Qeralên Aşurî weha didin biderdixistin, ku navîniya çiyayên Zagrosê bi cih û welatê Miletê Goti-Koti ve dihate biderkevtin.

---

(sedsalê 27 û 26) hatibe bidirêjkirin. Bi rastî jî li Lîsta Serdarên Akad de li duwayî Naram-Sîn de piranîya Qeralê Ur bi ser dewleta Akadî-Gotî de (Destpêka sedsalê Bîst û pêncan) bi Serdarî nehatine bitomarkirin.

Institut kurde de Paris

Debara em ji bona ser pêwendîya peyva Goti û Kurti bêtin bivegerandin.:

Li ser du ferşên dozandî de di zemanê Tokolti-Înorta Qeralê Aşuri de li ser yek rûdanê de li ser ferşekî de navê Kurti û li ser ferşê din navê Goti hatîye binivîsandin. Ji vê tête biderkevtin, ku ev herdu nav bi xwe ve navê yek Miletî bû, yanjî Kurti û yaxud Kurhi navê beşekî gewreyî Goti bû.

Beşekî zorî ji Rojhilatnasan peyva Kortioi- Kortîwi, ya ku ew di derbarê peyvînê de zor li peyva Kurti diçe, pir lê dane bivenerandin. Di nivîsta pêwendîya zimanî de ji bona navê Kurd hatîye biderkevtin, ku peyva Kurtioi-Kurtiwi ji bona koka Xelkê Kurdistanê bi bingehekî pir giring ve tête biderkevtin. Rojhilatnas Driver-Dirayver di vê nivîstê de remana xwe dide bigivaştin û ew dibêje: "...Karda, Kardoxi, Kortoxi, Gordi, Kardak, Sîrti, Kîrti, Gordyayi, Gordoini, Kardo, Karda, Kardawîye, Kardaye, Katawaye û yanjî Kurdayya ... hemû tevî neyekbûna peyva wan jî hemû ji yek kokê têtin biderkevtin". Bi vî rengî ev Rojhilatnasê hanê Kurdê îro bi ser Kardoxoyê Zinefon û Kardayê Somerî ve dide bibirin, yên ku ew li gora goyekê de ji dewrana sêyemê dewleta Ur de bi navê Eşîrekê ve dihate biderkevtin[93].

Ji van diyarîyên hanê weha em têtin biliberketin, ku pêwendîya navê Kurd ligel navê kevnarî Kurtîwyi de bi rast û durust ve tête bidîtin. Têgihiştinên ciyografîyî Kardoxoyi, Kordoin mîna wan peyvên bi hevbeşî ve têtin biderkevtin, ku ew ligel navroka belgeyên kevnarî Kurti de ewende lihevtên, ku beşekî giringî ji Mêjûvanan bi pêrûniştina van gotinan ve bi navên hevbeşî ve tu dudilî bi wan ve nedane bikirin. Ligel vê jî de, çunke, bi cihêkirina Kurti ve li Goti de nikare bête bikirin, divê Miletê Goti di nava Xelkê Kurdistana îro de bi rastî vebête bidîtin .

Dr. Sipayzer li vê Lêkolînê de di nivîsta xweyî Miletên Mizopotamya de, r. 117 de dibêje: "Ev Êl û Xilatê, yên ku ew îro li

[93]Ev Kêla, ku li ser wê ev Goya hanê hatîye binivîsandin, ew bi ser pêla Arad-Nanar Qeralê Lagaşe ve di destpêka sedsalê Bîst û Pencan de têtê bivegerandin. Navê vê Eşira ku ew bi Karda têtê peyvkirin û bi peyva Kardaka, dibe bikaribe, bête xwendin.

Institut kurde de Paris

jêr navê Kurdî Giştî de têtin bijîyandin, hîç demekê ji êsta bêtir Qefqasî nehatine bidîtin. Ev Eşîrên hanê çi di warê ziman de, çi di warê reweşt û rewend de bêtin biderkevtin, hin cudabûn di nava wan de tête bipeydakirin. Kurdekî Xelkê Sulêmanîyê ligel welatîyekî xweyî Badînanî de bi hêsanî ve nikare bide biaxivtin[94]. Li gora mêjûwê de bi serûştî ve têtе biderkevtin, ku di nava Kurdên êsta de hinek ji Ermen, Samî û Arî têtin bipeydakirin. Ca ku waha bû, em nikarin bêjin, ku Kurd ji yek kokê têtе biderkevtin. Zor renge, ku Xelkên kevnarî Kurdistan ji çend Qolan hatine bipêkhatin, ku ew di heyamên kevnarî pêşîyî mêjûwê de ligel hinek Gerokên Aşûri û Arami de di nava çiya û kohên xwe de dihatin bijîyandin. Di dawî de li paş biserkevtina Arîtîyê de bi ser vî welatî ve hinek ji perçên Îranî jî hatin bicîkirin û ew ligel wan de hatin bitêkelbûn. Ev dîtina hanê li gora mercên nihayî welêt û zimanî Kurdî de têtе bingehkirin.

Ligel vê jî de hebûna hinek ji perçeyên Xelkên kevnarî Zagrosê de di nava Kurdan de nayêtе binayînîkirin. Çi li van diyarîyan de û çi li Lêveneradinên zimên de weha em têtin biliberkevtin, ku Miletê Kurd di bingeh de bi Qolekî gewre ve ji beşên Miltên Zadrosê têtе biderkevtin. Her çend jî ew tûşî bi vegirtinên bêgane ve hatine bikirin, belam di dema tengav de wan xwe ji bona nava çiyan dane bivekişandin û ew piştî rabuhurandina lehîyên Vegirtvanan ji bona nava cih û warên xwe hatine bivergerandin û wan welatê xwe ser li nû de careke din dane biavedanîkirin.

Institut kurde de Paris

[94]Ev bi xwe Wilayeta Hekarê ye, ya ku ew li jêrî Komara Turkîyî niha ye. koka wê Beha El-Dinan jiber Malbata Beha Eldîn têtе binavkirin jiber ku ev navê yekekî ji Serdarên cih bû, mîna ku ev di Şerefname de hatîye binivîsandin.

3. Kasaites-Kasay-Kosi-Koşo

Ew ew Mileteke ji Miletên Zagrosê tête biderkevtin. Yekemîn car ew li herema Kermanşan-Kermanşah-Qermesîn de hatine bidîtin. Hatina ji bona vê hêlê bi diyar ve nayête biderkevtin, lêbelê ew mîna hemû Miletên Zagrosê bi Xelkên cihîyî kokî ve têtin biderkevtin û wan mîna Samî û Hamî nedane bibarkirin. Li paş demekê de ew wirde wirde ji bona nava Zagrosê hatine û têde neşîn bûne. Di pişt re wan rûwê xw ber bi Rojhilatî Babilistanê ve ango ber bi kenarê çepî Dicle ve dane bivedan û wan xwe li wêderê de bi cotkarîyê û candinîyê ve dane bimijulkirin.
Akadîyan ew bi navê Kaşo ve dane binavkirin û ew di Incîlê de bi navê Koş hatine binavkirin.

Li nîvê sedsalê hijdehemînî-Heştdehemî pêş zayînê de wan Babilistan dane bizeftkirin û wan dewleteke bi hêz ve li Somer û Akad de dane bidamezirandin, ya ku jêre dewleta Kardonyaş dihate bigotin. Vê dewleta hanê nêzîka şeş sedsalî date bidirêjkirin, ku hîç dewleteke wisa ewende Babilistan nedaye biparastin.

Eşîrên Kasî li dawîya li navcûna dewleta wan de ew ji bona nava çiyayên Zagrosê (Loristana îro) hatin bivegerandin. Senharib di destêpa sedsalê heftemînî p. z. de ji bona ser wan de hat birakişandin û wan şerekî xurt ligel wî de dane bikirin.

Di heyamên dewleta Axmeni de van Eşîrên Kasî beramber bi parastina rêya Babil - Akbatan[95] de her salekê komek nîşankiri ji mal ji dewleta Îranê didatin bisitendin. Iskenderê Gewre jî şerekî tund ligel wan de daye bikirin. Herwehajî Serdarê Roma Intîvonos di nava Eşîrên Kasî re di Derbendê Peli -PiraTeng Gelo re hatîye biderbasbûn.

Bi kurtî ev Miletê hanê tanî destpêka zayî de di Loristana niha de hatîye bijîyandin û divê ew bi Bav û Bavpîrên Lorên îro ve bêtin biderkevtin. Renge, ku beşê Jêrî Kasî demekê li jêr serdarîya Êlamî de

[95] bajarekî kevnare. Ew li Nêzîka Hedana niha de tête bikevtin.

Institut Kurde de Paris

hatibin bimayîn. (Ji xwe re li derîyê sêyem de ji vî bergê yekem bidin bitemaşekirin).

4. Xalidi-Orarto

Renge, ku ev Miletê hanê ji demeke nenas de ji Rojhilatê Asya Biçûk ji bona devera gola Wanê hatîye bibarkirin. Ji goyên Aşurî û nemaze dozandinên şop û belgeyên girêdayî bi taybetî ve ligel şerên Sergonê Qeralê Aşurîyî duwem de tête biderkevtin, ku sinorên vê dewleta Xildi di çaxekê de ji Jor de tanî gola kokçe û Elêksender Pol li Qefqasya de, ji Rojava de tanî rûbarê Furatê, ji Jêr de tanî Rewaduz û çavîyên rûbarê Zab û ji Rojhilat de tani gola Urmiyê dihatin bidirêjkirin. Herwehajî wê demekî jî li Jorî Surî jî de dayite biserdarîkirin. Paytextê wê bajarê Tospasi-Wan bû. Renge, ku ew ji bal Qeralê Sardorîsê Yekemî Xalidî de di sala 840 p. z. de hatiye biavakirin.

Vê dewleta hanê di dawîya sedsalê heftemînî p. z. de jiber xurtbûna desthilatî û kêra Mîdya serxwebûna xwe date biwindakirin. Ew demekê li jêrdestîya wan de hate bimayîn. Di dawî de jiber biderkevtina desthilatîya Ermenî de, yên ku ew li Rojavayê welatê Xalidi de hatibûn birûniştin, ew bi carekê ve hatin biqirkirin.

Institut kurde de Paris

5. Subari

Ev navê hanê cara yekem li ferşekî keviri de li dewrana dewleta Logal-Anti-Mondo de li sedsalê sîyemînî pêş zanyînê de bi rengê Subir ve hatîye bidozandin. Ew li şopên Naram Sîn de bi Subartîm ve hatîye bitomarkirin.

Ew têgihiştineke ciyografî bûye û ew li ser sînorê Jorîyî Rojavayî Êlam de bûye û tanî şaxê Amanos[96] dihate bidirêjkirin, (ji bona

[96]Navê Çiyakî ye, yê ku ew li Asya Biçûk li Rojavayî Çemê Feratê de di navbera Iskendron û Edena de têtê bikevtin. (M. E.).

rûnkirinê ji xwe re li derîyê sêyem de bide bitemaşekirin). Ev têgihiştina hanê di dawî de bi navê Miletekî hatîye biderkevtin.

Hemorabî jî ev têgihiştina hanê ji bona welatekî dayite bikaranîn, ku têde Miletekî Serbixwe ve hatîye bijîyandin. Li belgeyên Aşurî de ew têde bi Subaro ve hatîye binîşandin.

Bi kurtî ve weha tête biderkevtin, ku li jêrî vê navnîşana hanê de Miletek li Mozopotamya, li Surî û Enadolê de dihate bipeydakirin. (Miletên Mozopotamya, Sipayzer).

Dibe jî, ku beşê Mozopotamyayî Hurî jî li jêr navê Subaro de hatibin binaskirin. Vî Miletê Subaro ligel Orduwê Aşûrî de zor wan daye bişerkirin.

Li dawîya dewleta Aşûrî de navê Subaro hatîye bigomkirin û li cîgeyê wî de navê Miletê Nayri ber bi pêş ve hatîye bikevtin. Zor dibe, ku ev Miletê nuh bi Qolekî Gewreyî Subaro ve tête biderkevtin û di encam de wî hemû Eşîrên Subaro daye biwênerîkirin. Şop û Nevîyên vî Miletê Nayrîyî hanê jî hêsta jî hêjî li herema Şemdînan[97] de têtin bipeydakirin.

Sêr King û hin ji Rojhilatnasan dibêjin, ku Mîtanî bi Qolcleke Kasayî ve tête biderkevtin. Belam Pirofêsor Sipayzer dibêje, ku Mîtanî bi beşekî Subarî ve tête biderkevtin. Ev Miletê hanê li deşta Furatî navîn de deşta Belex û Xabur de hatîye birûniştin. Li nîvê duwemê hezar salê p. z. de wî dewleteke bi hêz û hiner ve dayite bidamezirandin. zimanekî wanî taybetîyî Serbixwe ve dihate bidîtin.

[97]bajareke li Wilayeta Hekarêyî nihayî di Komara Turkî de tête bikevtin. Ew cihê Dilovanê Şêx Ubeydulahê Zanistvan û welatperwerê bi nav û bang bû. (M. E.).

Institut kurde de Paris

## B. Qata Duwem (Mad û Pêvgirêdayên wî ve)

Mêjûvan Hêrvî Robinson û Hênrî Birêstîd[98] dibêjin: bi wan Miletan û Dirawsên Merovên wan ve hin caran Arî pê tête bigotin û reha Hindo-Ewropî jî ji wan hatîye biderkevtin.

Ew li nêzîka mêjûwa 2500 p. z. de li Rojhilat û Jorî Rojhilatê derya Xezer de hatibûn birûniştin. Hinan ji wan xwe ligel cotkarî û çandinîyê de didan bimijulkirin, lêbelê jî hêjî ew li dewrana Kevir de dihatin bidîtin û bi tenya ve beşekî biçûk ji wan Mêtal -Lajwerdî- didan bikaranîn.

Li nik wan de ji bil cenawerên malê pez û dewar jî dihatin bidîtin. Wan hesp jî didan bixwedîkirin û ew bi pileyekî pêşveketinê ve hatibûn bigihaştin, lêbelê ew fêrî nivîsandinê nehatibûn bikirin. ( Birêstîd, r. 171 û pêde)

Hin ji van Êlên Arî[99] ji bona Hindostanê dane bikoçkirin. Li nivîsta perestî wan de, ya ku wan ew bi zimanê Sansikrîtî ve hatîye binivîsandin û ya ku jêre Vedas dibêjin, derbarê bi demên pêşî û jîyana wanî nebajartîyî van Miletên hanê de hin ji agehdarîyan têde tête bidîtin[100].

Institut kurde de Paris

---

[98]mêjûwa Giştîyî Ewropa, Boston 1924.

[99]J. H. Breasted-Brêstêd Nivîstvanê Pêlên Kevnar R. 135 dibêje: Peyva Arî tevlihevbûneke bi nav û bange û ew ji bona Miletên Hindo-Ewropî hatîye û tête bikarhatin. Peyva Arî ku jê Îran û Îranî lêhatin bipeydakirin. Bes û bi tenha ew nîşana Eşîrên Îranê dike, yên ku ew ji Miletên Hindo-Ewropî beşekin.

[100]Ev zimanê Sansikrîtî ye, yê ku ew ji bal Vekirvanên Arî ve di sedsalê duwazdehemîni Pêş Zayînê de ji bona nava Hindistanê hatiye xistin. Li sedsalê Sêyemî Pêş Zayînê de Nivista Vêdas pê hatîye nivîsandin û ew ji bona zimanê nivîsandinê bûye. Peyva Sansikrîtî ji Sacae, ya ku ew navê Serokê Barkirvanên Arîyê Hindistanê ye, û kîr yanjî kî-el, ya ku ew bi têgihitşina NivîSin yanjî ziman tête liberketin, tête suwarkirin. Pirsiyarîya Kurdistan û Turk, R. 23).

1. Medes-Med

Weku ku me li serî de date biaxivtin, ku ev Milet bi Hindo-Ewropî ve yanjî bi Arî ve dihate biderkevtin û ew ji Rojhilatê derya Xezer "Kaspiyen", (renge, ku ew ji welatê Baxteryan bête biderkevtin) û li sedsalê nehemîn de û yanjî paştir de ji bona Rojavayî Jorî Îranê ango ji bona welatê Mîdya hatibin bigihaştin û bere bere wan welatên Dirawsên xwe ji xwe re dane bivegirtin û bi derbasbûna demê ve hin ji Miletên din jî weku Manay-Manî, Sîs û Kîmmeri ligel wan de hatine bitêkelbûn.

Hatina vî Miletî li tomarên Aşurîyî de di sedsalê heştemînî pêş zayînê de tête bidîtin. Aşuryan bi vî Miletê hanê ve Amada û Mada dane bigotin. Vî Miletê hanê li dawîya sedsalê heştemî pêş zayînê de dewleteke serbixwe ve date bidamezirandin û Miletê Merev -Xizim- û Dirawsê xwe Parsay jî, yê ku ew li Jêrî Rojavayî Îranê de hatîbûn bicigîrîkirin, bi xwe ve date bigirêdan. Wî bajarê Aqbatanê date bidurûstkirin û ew bi baytextê xwe ve date bikirin[101].

Cara pêşîyî pêwendîya Aşurî ligel vî Miletê hanê de li dewrana Şelmanaser (835 p. z.) de hatîye nikirin û tanî li navçûna wan jî de her ew ligel vî Miletê Med de li şer û hera de dihatin bidîtin. (Dirêjbûn li bergê duwem de).

Pirofêsor Says dibêje: Mada ji Eşîrên Kurd bûn û ew li Rojhilatê Aşur de cigîr bibûn. Welatê wan jî tanî Jêrî derya Xezer diçû. Beşê zor ji wan li batê ziman de bi Hindo-Ewropî ve dihatin biderkevtin û li alîyê rehê jî de Arî bûn. (Mêjûwa Giştîyî Mêjûvanan, bergê 2).

Hin ji Karnas û Rojhilatnasan dibêjin: Zimanê Miletê Mad-Med ew bi xwe ve bi zimanê kurdî îro ve tête biderkevtin û yanjî ew bi xwe ve bi bingehê wî ve têne biderkevtin. (Îrana Kevnar, Mûşîrê El-Dewle. R. 57 ).

[101] Hekmetan yani Hemedana kevnare.

Institut kurde de Paris

Zanistvanên Mêjûwê dibêjin, ku li dawîya nabûdbûna dewleta Mîdya de çi di warê diravî de yanjî çi di warê sincî de kêrên Miletê Parsî beşekî Mîdyayî têkelî nava xwe dane bikirin û beşê din jî ligel Kurdan de zor pêwendî û dirawsetî hebû, ew ligel Milet û Eşîrên Kurd de dihatin bitêkelkirin.

Miletê Part jî herwehajî bi vî rengî jî ve ew di nava Parsî û Kurdan de hate biwinbûn û Pars û Kurdan bi başî ve wênerîya wan didane bikirin.

Mirovatîya -Xizmitîya- di nava Îranê û Kurdên îro jî de divê li ser bingehê Med û Part de hatibe bidîtin (Pirsiyarîya Kurdistan Beramber bi Turk ve, r. 21).

Bi kurtî ve li ser dîtina vê remana hanê de û li gora welat û zimanê milîyî Med de divê Ev Miletê hanê ji Qata duwem li koka zor nêzîkî Kurd de bête bidîtin.

2. Nairi-Nayrî

Ev Miletê hanê li pêş barkirina dawî de li Kurdistanê de bûn. Bi rastî jî ve li tomarên kevnarî de navê van Eşîran nehatîye biderkevtin û li dewrana dewleta Aşurî de li ser wan de hatîye biaxivtin.

Zor renge, ku ew beşekî ji Miletê kevnarî Subaro û Gotî bête biderkevtin û wî bere bere biserketin ji xwe re dayite bisitendin û ew bi ser hemû Xêlatên tir ve hatibe bizalkirin û ew dane biwênerîkirin û navê wî cigehê gotina Subaro û Gotî ji xwe re dabe biwergirtin. Ew Miletekî dir, şerker û nebez bû.
Aşurîyan ligel wan de zor şer dane bilidarxistin. Dêhat û Êlên navçeya Neyriyî Şemdînan divê bi şopên mayîna Nayri ve bêtin bderkevtin.

Karnasê bi nav û deng ve Von Minoriskî jî di vê bîr û bawerîyê de têtê biderkevtin.

Institut kurde de Paris

Rojhilatnas Toro Dangin li nivîsteke[102] xwe de dibêje: Nayri yanjî Hobşkiya bi dola Botanê ve tête biderkevtin û ev jî bi beşê Rojhilaltî Nayri) ve tête biderkevtin û ew bi dewleteke serbixwe ve dihate biderkevtin.

li gora remana ji hin Rojhilatnasan û Mêjûvanan de ev Miletê Nayri piştî derkevtina dewleta Mad-Med ew ligel wan de hate bitevlihevbûn û Miletekî Gewre ji wan hate bipêkhatin.

Di vî warê hanê de Mêcer Son dibêje: "heger ku em ji xwe re li pêla Gotî de di navbera sedsalê panzdeh û duwanzdehan de bidin bitemaşekirin, li Kurdistan nawendî de em ji xwe re Miletê Nayri didin bidîtin, yê ku ew Dûndên Mad bûn.

Di dema berzbûna wan de nav û dengê wanî gewre û azaya wan hemû Dirawsên wan dabûn bitirsandin û ew li paş de li jêr navê Kurdan de hatin bijîyandin.

Di wê demê de welatê Nayri li deşta naverastî Zeyê Gewre de tanî çavîya wî çemî dida bidirêjkirin.

Xelkên Mîdya li dawîya linavçûna dewleta wan de wirde wirde ew ji bona vî welatî hatine bibarkirin û ew têde jî hatine bideyandin"[103].

Institut kurde de Paris

### 3. Karduchio-Kardoxuy

Derbarê bi van Eşîrên Kardoxuy hanê de, yên ku Zinefon li Bi Vegerandina Deh Hezaran de rû bi rû ve tûşî wan hatîye bibûyîn, du dîtin beramberî wan têtin biderkevtin:

Yekek ji wan dibêje: Ev navê hanê bi navekî guhertîyî Gotîyî kevnarîyî Taqa yekem ve tête biderkevtin. Peyivandina wîna bi

---

[102]nivîsta Hevgirêdana Heştemînî çûna Sargon, Paris 1912 z.- 1330 k.

[103]nivîsta Gereke Veşartî li Mizopotamya û Kurdistanê de. Lodon 1912 z.- 1330 k.

derbasbûna hayaman ve hatîye biveguhertin û ew bi Gotî û Kortî ve di dema Tokoliti-Nîrari Qeralê Aşûrî de hatîye bikirin.

Li gora lêverandin û encamwergirtina Rojhaltnas Mistêr Dirayver çi ev peyva Kortî û çi jî Karda ya dema Arad-Nanarê Qeralê Lagaş û çi jî peyvên tirî mîna vê hemû bi carekê ve ji bona Miletê Kurd bi nîşan ve têtin biderkevtin.

Heger ev dîtina hanê bi rast ve bête biderkevtin, divê ku Kardoxuy mayînên bi Miletê bi nav û dengê Gotî ve bêtin biderkevtin.

Dîtina duwem -Li gora remana- Sindni Simis- bi weha ve tête biderkevtin, ku ev Miletê Kadoxuyê hanê dibe, ku ew di demekê de ji bona Med û Prasê de yanjî li dawîya wan de û li nîvê sedsalê heftemînî p. z. de ji bona Kurdistanê hatibe bibarkirin û bicigîrîkirin.

Li dawî de bere bere wî Eşîrên Kurdistanê di nava xwe de dabin bixwarin. Bi xwe jî ve beşekî ji wî Miletê hanê dibe, ku wî ji bona Îranê rû girtibe û li wêderê de hatibe bicigîrîkirin. Çunge di dema dewleta Sasanîyan[104] de gelek Eşîrên Kurd li Îranê de dihatin bipeydakirin. Sêr Sidni Simis pişta vê bîr û bawerîya hanê dide bigirtin û ew dibêje: Ev Eşîrên Kurdîyî hanê xwedan zimanekî cihê û serbixwe bûn û ligel Farisî de pêwendîyên wî nebûn. Ew ji Farisî kevnartir bûn. (Ji xwe re li dêrên dawîya dîtina duwem bidin bimeyzekirin).

Li gora dîtina yekem de Kardoxuy bi Netewê Vekirvanê Somer û Akad ve tête biderkevtin, Ango bi Gotîyê kevnar ve tête biderkevtin û ew bi reha Koma Zagrosê ve tête bigirêdan.

Li gora remana dîtina duwem de ew bi Hindo-Ewropê ve tête biderkevtin û ew ligel Med û Parsi-Parsa de ji yek Kom û Rehê têtin biderkevtin. Bi servêdejî ve di navbera Qolên Gewreyî Kurd jî de

[104] Di dema hatina Misulmantîyê de di Heremên Farisî de mîna Faris, Kerman û Mekran de gelek Kurd dihatin bidîtin. Di Nivîsatokên Mêjû û Vekirinên welatan de pir Bînvanî li vê de di Elezderî, Elbilazerî û Yaqobî de têtin bidîtin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

gelek beşên hewre û biçûk jî dihatin bidîtin, ku di belgeyên kevnar de car caran jî li ser wan jî de tête biaxivtin. Ji bona nimûne Sêr Olmistêd dibêje, ku Eşîra Musri- Misori bav û Kalên wan Eşîrên bi Mîsori-Mizoriyî îro ve têta biderkevtin[105], ya ku ew di pêla Sennacherib-Sinaxerib de (705-682) p. z. de di pêş de û her wehajî hêsta jî hêjî ew di navbera herdu Qolên ava Xazer de têtin bidîtin[106] (Mêjûwa Aşur, r. 332).

Sîrtîyê[107] pêla Aşurî jî, renge, ku ew bi Eşîra Siperd ve bête biderkevtin, ya ku Sêr Mark Sayks li Jorî Zaxo de tûşî wan bûye.

Herwehajî Mêjûvanên Ermenî jî li nava Miletê xwe de li ser hin dewletan dane biaxivtin, ku ligel navên hin ji Eşîrên Kurdîyî Islamîyî niha de bi wekhevbûneke zor ve têtin biderkevtin. Ji bona nimûne Memekonyan, Bageratonyan, Ruşdniyan û Mendîkyan li wekhevbûneke lihevrasthatî de ligel bêtir pêwendiyan de ligel Eşîrên Kurdîyî Mamîkanlî de, Begranlî, Roşkotanlî û Mendîkanlî de têtin biderkevtin. (Turas El-Xulefa El-Exir, r. 252).

Kotayî: Kok û binyada kevnarî Kurd çi ew jî ji Taqa yekem bin, weku hin ji Rojhilatnasvan dibêjin, çi jî Qefqasî bin û li paş de bi şepolên barkirinên sedsalên nehem û heştemîn ve bi Arî ve hatine bikirin û yan jî weku beşekî zor ji wan dibêjin, ku çi Arî û yaxud Hondo-Ewropî bin.

Birina Kurd bi ser kokeke kevnar de bi dîtineke pir xurt ve tête biderkevtin û ji bona ev dîtina hanê bi carekê ve bête bisaxkirin, hêşta jî kêmasîya wê bi hin şop û belge ve tête bidîtin.

---

105 Ev Eşîra hanê û gundên wê niha Navçeyekê ji melbenda Dihokê dide pêkanîn.

106 Rûbareke ji Rûbarên Zabê Bilin de. Ew ligel Zab de li nêzîka tevlêkirina wîna de ligel Dicele de têta tevlêkirin.

107 Dibe, ku ev navê Sîrtî, yê ku ew di pêla Aşurî de li ser Kurdên Îranê dihate kirin, ji peyva Chirti Firengiyî hatîye derkevtin û ew bi Kurtî û Sirtî hatîye erbîkirin: jiber Tipa C Se yanjî Sin hincaran bi Tîpa K têta peyvîn. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Hêvîdarî tête bikirin, ku dê bi dozandinên taze ve bi vê kêmasîya hanê ve dawîyê bidin bianîn.

Ligel vê jî de bawermendîya min waha tête biderkevtin, ku dîtina hatina Miletê Kurd li navîna sedsalê heftemînî pêş zayînê de zor bi lawaz ve tête biderkevtin, bi vajabûna wê dîtina Pirofêsor Sipayzer û Mînên wî ve Bapîrên Kurd bi Xelkên kokîyî zor kevnarî Zagrosê û yanjî Kurdistanê ve didin bidanîn. Ev dîtina hanê gelekî bi hêz û hiner ve tête biderkevtin û ew li hiş jî de bi nêzîktir ve tête biderkevtin. Bi rastî jî ve li rûdanên mêjûyî Eşîrên Kurdan de bi hin navên cihê cihê ve hatine bibîrxistin, ku Merov weha lê dide bigûmankirin, ku ev navên cihê cihê bi Xêl û Êlên cihê cihê ve têne bigirêdan.

Bi xwe jî ve ev bi gûmana hanê durûst ve nayête biderkevtin, çunge guherandina wan navan bi pêweistîya serûştîyê û rabûn û rûnştinên Miletên wê demê ve dihate biderkevtin.

Pirofêsor Sipayzer jî piştgirtina rastîya vê rewşê dide bigirtin ew wê bi xwe jî ve dibêje "Proper names are apt to be modified when used by other peoples" (Miletên Mezopotamya, P. 116).

Bi rastî jî ve di axivtina li ser Miletê Horî de ji bal Pirofêsor Sipayzer de neh navên cihê cihêyî têtin biderkevtin: Horlîli, Horlaş, Horlo, Hori, Korhorohe, Horûhe, Hari, Mori, Horît hatine bitomarkirin.

Wehajî li ser axivtina Mîtanî jî de ew van herdu navan Mîtanî-Mîtlani dide bibîrxistin. Ew di nivîsta mêjûwa Giştîyî Mêjûvanan de li ser Mîtanîyan de dibêje: Xelkên Misrê pêyan Nehari didatin bigotin û nivîsta Perest Tewratê bi Aram ve -Naharem bi nav ve dan bibirin.

Bi Miletê Lollo ve -Lollobo- Lollomi- Noller jî pê didatin bigotin. Med- Amada- Mada; Kasay- Kasi-Kaşşo -Koş bi wan ve hatîye bigotin.

Her bi vî corî ve di dimên kevnar de navê Kurd jî ji bal hin Miletan de bi têgihiştinên nenas nenas û cihê cihê hatîye bipeyivandin.

Institut kurde de Paris

Li gora liberketina hin ji wan Rojhilatnasan ew bi têgihiştinên gotinên mîna hev ve têtin biderkevtin û her weku li xwarê de ew hatine binîşandan, ew ji bona Kurd yan navên hevbeşin û ya weku êsta çilo li jêr navnîşana Kurd de û bi navên cuda ve zor ji Eşîr û Xêlkên têtin bipeydakirin. Di demên kevnar de bi van navên Xwarê ve gelek ji Qolên Kurd dihatin binavkirin:

| | | |
|---|---|---|
| Someri û Akadi | ji Kurd re gotine | Goti, Coti, Cudi |
| Aşûrî û Aramî | - " - | Goti, Koti, Kurti, Karti, Kardo, Kardaka, Kardan, Karketan, Kardak |
| Îranî | - " - | Gortîwi, Sîrti, Kurdreha |
| Yunan û Romayî | - " - | Kardoswi, Kardoxuy, Kardok, Kerdoki, Kerdoxi, Kardwîkay |
| Ermenî | - " - | Kordoen, Korçex, Kortûx, Kerxi, Korxi |
| Ereb | - " - | Kotoyane, Kurdi, Kardwi, Baka, Kartawye, Curdi, Cu, Kotoyane, Kurdi, Kardwi, Bakarda |

Institut kurde de Paris

Evaya bi tenha ve bi reman û bawerîya min bi xwe ve nayête biderkevtin, weku li bîr û bawerîya Pirofêsor Sipayzer de "derîyê 2, benda 3" çavên me hate bipêkevtin, gelek ji Rojhilatnas û Lêvenervanên bi nav û deng ve wek Mêstir Dirayver, Noldke, Hofman.. hd. bi xwe jî ve wê dîtinê bi xwe ve didin bipiştgirtin û bi serdejî ve navê "Kaldi, Kaldîwi" jî bi yekekî ve li van navên hevbeş de didin bidanîn.

Ev zîneta ku me li serî de date bixuyanîkirin, ango rewşta guhertina navên taybetî li alîyên Miletên cuda de êsta jî tête bidîtin.

Bi rastî jî ve Ereb Bunduqîye dibêjin, Latin Vênîsya dibêjin û Turk Venêdik dibêjin, tevî ku ev her sê jî bi navê bajarekî Îtalî ve têtin biderkevtin.

Dîtina hinekan ji Rojhilatnasan bi weha ve tête biderkevtin, ku Miletê Kurd li nîvê duwemî sedsalê heftemî pêş zayînê de li Hindistanê de ji bona Kurdistanê hatîye biderkevtin. Bi rastî jî ve heger ev dîtina hanê jî bi carekê ve rast bête biderkevtin û her vê Koma taze bi koka Kurd ve hatibin bidanîn, wê çaxê dibe, ku du ragirtinên xurt lê bêtin bigirtin:

1. Ev Komela Barkirvanên taze çilo li Kurdistanê de hatine bicigîrbûn?

2. Miletên hebûn çawa wan ew hatine bilinavbirin?

Hemû dizanin, ku li sedsalê heftemînî pêş zayînê de Kurdistan bi çol be nidihate biderkevtin, tanî ev Miletê taze bi sivikî û asayî ve bête bihatin û bête bicigîrîkirin.

Li Kurdistana navînî de bi xwe ve Miletê Korti û Nayri û li Jor de Orarto = Xaldi, li Rojhilat de Mad, Manay, Sîs, Lollo, li Jêrî wî de Aşurî, li Rojavayî wî de Moşki, Hîtît û Arami de dihatin bidîtin. Ku weha bû, divê ev Komela Barkirvanên taze di nava dewleta Mîdyayî de bi şer û ceng ve hatibin bihatin û bi zor ve Kurdistan ji xwe re dabin bivegirtin.

Bi her awayî ve evaya jî ji hiş dûre, çunge heger tiştekî weha jî bihata bikirin, bêgûman dê ew li tomarên Aşurî û Xaldi de bihatana binivîsandin, çunge ev herdu dewlet hêşta di wê demê de nehatibûn bilinavçûbûn.

Bi remana min ve ji bona pirsa yekem berseveke wêyî lihevhatî têtê biderkevtin, divê ku em bêjin: Ev Komela taze bi Kurd ve tête biderkevtin, beşekî duwaketîyî ji pereçeyên hebûn û ew li paş de hatine bihatin û ew ligel koka xwe de bi sivikî û asayî ve, bi bê şer û ceng ve ligel hev de hatine bidaniştin.

Institut kurde de Paris

Ca heger berseva pirsa yekem eve **bête biderkevtin,** dîtina pêrûniştina Miletên kevnarî "Goti, Lollo, Kasay, Med, Nayri...hd." bi koka Kurd ve xurtbûnê ji xwe re dide biwergirtin.

Berseva ragirtina duwem-li layê min de bi weha ve tête biderkevtin,- ew bi girantir ve tête biderkevtin-. Ew neqşên Miletên kevnar, yên ku Merov wan di nivîstên Zanistvanan û Rojhilatnasan de dide bidîtin, Komela Kurduîn yan Kardwikay, ya ku ew divê bi Komela Bar' rvanên taze ve bête biderkevtin, li heremeke zor biçûk de dide binîşandan. Ji bona nimûne li neqşa sedsalê şeşemî p.z. de ya Sêr Mark Sayks de di navbera Diyarbekir û kanîyên Zeyê Gewre de didin bidîtin, ku ev firehbûna hanê tanî sala 188 p. z. de nehatîye biveguhertin.

Li neqşa bergê sêyemî (Kambirêc: Mêjûwa Kevnar) de, bigir ku ew jî zîneta sedsalê şeşemî pêş zayînê de dide binîşandan, herema Kurduîn li ava Batmanê[108] tanî Jêrî gola Urmiyê tête bicûyîn û ji Jor ve çiyayê Cudi û Botan[109] tête bivegerandin.

Ev herema hanê li gora welatên Mad, Nayri, Lollo, Kasay, Goti, û Subari de belkî li deh de yek nayête biderkevtin. Ca heger Kurduîn bi Miletekî weha biçûk ve bête biderkevtin, çawan li dema du sedsalan de yanjî li du sedsal û nîvan de wan hemû Miletên kevnarî Kurdistanê dikaribûn bibin bilinavbirin û yanjî çawan wan dikarîbûn bi xwe ve bidin bigirêdan û bidaqurtandin.

Bi rastî jî ve em hemû jî dizanin, ku dewleteke weha bi hêz û hiner ve mîna dewleta Aşurî çend sedsalan jî ew ligel wan Miletên kevnar de her û her xerîk bû û şerên pir zor ligel wan de dayite bilidarxistin. Lêbelêjî tevlivêjî di encam de nebes tenê wê nikarîbû wan li nav de bide bibirin, belkîjî nedikarîbû wan bi carekê ve ji bona jêrdesthilatîya

Institut kurde de Paris

[108]Ew Rûbareke, yê ku ew li nêzîka bajarê Hesen Kêfê Şernexa niha de ji Jor de tev li Diclê tête kirin.

[109]Evaya herema Cezira ibin Umere, ya ku ew li ser Dicle de û di navbera Musil û Diyarbekrê de tête bikevtin. (M. E.).

xwe bide bixistin, ew dûçarî neçaryê bû, ku ligel wan de hogiryê û dostanîyê bide bidanîn.

Ji bona nimûne Pirofêsor Ragozîn dibêje:
"Bi rastî jî ve dan û sitandinên başî Têglat Pilayzerê Qeralê Aşurî ligel Şahên Nayri de bi ser xwe ve bîne bikişandin. Ev hogirî, dostanî, dan û sitandinên baş bi carekê ve bi servajî rewşt û serûştîya Serdarên Aşurî ve dihatin biderkevtin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku bi veguhertina van rewşt û rewendan ve ew bi nêta hogirî, dostanî û rêkevtinê ve hatîya bikirin".

Alîyekî tir jî tête biditîn, ku Zinefon pê tête birûniştin, ku ji welatê Aşurî tanî nêzîka Terabzon li destê Miletê Kurduîn de nehatîye birizgarkirin. ku bi weha ve bête biderkevtin, divê pê bête birûniştin, ku Miletê Kurd di dawîya sedsalê pênc de nebes tenê heremeke biçûkî xwarî gola Wanê daya bigirtin, belkî jî ji çavîyên Zabê Gewre tanî nêzîka derya Reş ji xwe re daye bidagîrîkirin. Eve jî nîşaneke ji bona vê ye, ku Miletê Kurd, ne weku hin ji Rojhilatnsan dane bigûmankirin, ew ji Miletekî taze hatîne biderkevtinn, belkî gelekî jî li pêş sedsalê heftemînî p. z. de bi navekî tir ve li Kurdistanê de dihhate biderkevtin.

Heger dîtina hatina Qolekî tirî Miletê Kurd li navîna dawîya sedsalê heftemîn de bi rast ve bête biderkevtin, ev Qolê hanê jî ligel koka xweyî kevnar de divê hatibė biyekgîrîkirin. Ligel vê jî de divê bête bizanîn, ku ev reman, bîr û bawerîyên hanê bes û bi tena ve dîtin û liberketinan didin biderxistin. Ta êsta belgeyekî weha cihê bawerîpêkirinê nehatîye bidozandin, ku ew vê pirsiyarîya kok û pêkhatina Kurd bi carekê ve bide biçarekirin.

Bi rastî jî ve Miletê Kurd divê ji bona Dr. Sipayzer sipasê bide bipêşkeşkirin, çunge bi nivîsta xweyî ciwanî Miletên Mêzopotamya, Bostin 1930 de, rastîya wê tarîya poşandî li ser mêjûwa kevnarî Kurd de tanî radeyekî date bihilgirtin û bi belgeyên pêbawerbûn û nîşanên zanistîyê koka Kurd bi ser Miletê Guti-Gotiyî ve bi nav û deng ve date bibirin.

Ligelvêjî de hêştajî tem û tomanên li ser mêjûwa kevnarî Kurd de bi carekê ve ji ser nehatine biçûyîn. Ew hêjî bi kêmasîyî nivîstên din

Institut kurde de Paris

ve tête biderkevtin. Jibervêjî divê em çavdêrîya kar û barên lêkolînên û kolandinên EncûmenênşŞopên kevnar bidin bikirin.

heger li bajarên kevnarî Kurdistanê de mîna Şori, Erîdi, Eni, Mîsîr, Ezîmri, Dagar, Harher=Karşarogîn, Atlîla, Kînabo, Xoboşkya .. hd. lêgerandinên baş bêtin bikirin, bê gûman ev pirsa hanê bi carekê ve tête biçarekirin. Ca ke weha bû, êsta ji vê bêtir dirîjkirina vê pirsiyarîya hanê bê sûd tête bidîtin.

Institut kurde de Paris

## *Derîyê Sêyem*

### 1. Ji Heyamên Kevnar de tanî Heyamê Mîdya

Li ser mêjûwa kevnarî Kurd û Kurdistanê de axivtin, -bi rastî jî vebeşekî herî dijwarîyî vê nivîsta hanê bi xwe ve tête biderkevtin. Hoyê vê jî nebûna agehdarîyên rêk û pêk der barê bi Miletên kevnarî Kurd de û serpêhatîyên zimanê wan bi xwe ve tête biderkevtin.

Bi rastî jî ve karên pir bi nerx û jêhatbûn ve dirêjbûna du sedsalan ji yên Zanistvanên Rojavayî û Zanistvanên şopan û bi taybetî ve bi - dozandinên taze ve hin ronahî bi ser mêjûwa Kurd ve date biavêtin. Lêbelê evaya bi têr ve nayête biderkevtin, bi taybetî ve çunge tenya li ser rûdanên şer de û yanjî li ser pêwendîyên wan de ligel Dirwasên wan de tête biaxivtin û li ser derbasbûn û serpêhatîyên wan de zor peçir peçir û yek negirtî têtê bidîtin.

Jibervêjî nivîsandina bi carekê ve li ser derbasbûn û serpêhatîyên wan de nedikare bête bikirin. Ligel vê jî de dil pê rê nade bidan, ku bi vê mehna hanê ve li ser vê mebestê de bêtim bicûyîn û hîç li ser de nedim biaxivtin. Bi vê remana hanê ve bi kurtî ve temaşeyî mêjûwa wan didim bikirin.

Zor bi cihê daxê ve tête biderkevtin, ku destpêka Mêjûwê hêştajî ewende bi ronak ve nayête biderkevtin, ku Merov bikaribe der barê

Institut kurde de Paris

Merovên wê demê de remaneke rast û giştî de bide bipeydakirin. Merov dide bitemaşekirin, ku Mêjûvanên herî bi nav û deng jî ve li vê deqa hanê de bi tawî û bawî ve têtin biderkevtin.

Bi giştî ve em nizanin, ku Somerîyê welatê kenar û Êlamîyê Susa kî bûn, li ku û çi demê ew hatibûn. Bi tenya ve mêjû dibêje: Xelkê Somerî li somer de û Êlamî li dola karun de hatine bidîtin. Renge, li pêş Someriyan de, Miletekî pêş Somer Hori hebûn û ew li welatê kenar de û di navbera Herdu Çeman jî hatibe bijîyandin.

Dîsan her bi vî corî ve dibêjin, di dema Someryan de li şaxên Zagrosê de hin Milet hebûn û ji wan re Êlamî, Lollo, Goti, Kasay û Hori (Sobîri-Sobaro) yên Koma Gewreyî Zagrosê digotin. Lêbelê ev Miletên hanê kok û binyada wan çiye? kenkî û ji ku ew hatine? Bi giştî ve nehatîye bizanîn.

Miletê Êlam her çende, ku ew li Koma Zagrosê de tête biderkevtin, lêbelê ligel koka Kurd de hêştajî pêwendî û girêdanên wî nehatîye bidozandin; jibervêjî em li ser wî nadin biaxivtin. Em li Lollo û Goti de didin bidespêkirin, yên ku ew bi du Qolên gewre û hevwelat ve têtin biderkevtin û koka wanî zor kevnarî bi Kurd ve têtin biderkevtin.

Institut kurde de Paris

1. Lollo

Ev Miletê hanê li welatê Sulêmanîyî îro de dihatin bipeydakirin. Sînorên wan her çend jî ji me re bi agehdar ve nayête biderkevtin, belam li kêleke kevirî de li dozandinên Zehaw de, yê ku ew bi ser Inno-Banîniyê Qeralê Lollo û Goti ve tête bivegerandin, ew di sedsalê bîst û heştemî pêş zayînê de hatîye binivîsandin, dibêje, herema Halman, ya ku ew bi welatê Helwanîyî pêla musulmantîyê ve dihate biderkevtin, bi herema Zehawî êsta ve tête biderkevtin, ew jî di nava destên Lollo de dihate bidîtin.

Li gora Lêvenerandinên Dr. Sipayzer renge, ku hinek ji Serdarên Aşurîyî sedsalên nozdeh û heştdehê pêş zayînê de ji Miletên Lollo bêtin biderkevtin, dibe jî, ku Qolekî jî li Surî jî de hatibin bijîyandin.

Di dema Sargonê Qeralê Akad de Padşahê Lollo bi Lasirab ve dihate biderkevtin. (Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk, r. 186).

Li gora kêla kevirîyî nivîsandî tête bidîtin, ya ku ew li Derbendê Gawir[110] de hatîye bidozandin, ya ku ew bi ser Naram Sînê[111] Qeralê Akad de tête bivegerandin, ku Sipahê Akad di bin rêberîya vî Qeralê hanê de bi ser welatê Lollo ve daye bihêrişkirin û ew daye bizeftkirin[112].

Li ser deng û dirêjîya wî şerî de li wê kêlê de hatîye binivîsandin. Her li heyamê vî Naram-Sîn de bû, ku Leşkerê Goti Leşkerê Akad date bişikenandin û dewleta Akad dane bilinavbirin. Bi saya vê biserketina hanê ve welatê Lollo jî hate birizgarîkirin û wî ji xwe re serxwebûna xwe date bisitandin.

Li dawîya pêla Naram-Sîn de bêtir kêm navê Lollo dihat biderkevtin. Li goyên Qeralên Aşurî de Lollo ligel Goti, Kasay û Sobaro de bi têkel navên wan ve hatîye bikirin û bi cihê ve li ser wan de nedane biaxivtin.

Belam li dawîya danekî de nêzîka du hezar sal de em dibînin, ku Qeralên Aşurî Tîglat Pilayzer, Edad-Nîrari û Tokolti-Nînorta ligel Miletê Lollo de didin bişerkirin.

Aşur Nasir Palê duwemî jî di navbera 884 û 880 p. z. de çar caran Leşker bi ser Lollo de dayite bikişandin. Di cara pêşî de welatê vî Miletî bi destê Serdarekî Babilî ve hate bikevtin û navê vî Serdarî bi Nor Adad ve dihate biderkevtin.

Institut kurde de Paris

---

[110]Ev Berê hanê ji bal Edmonds hatîye bidozandin. Wî derbarê vî Berî de Gotarek pir baş li Rojnama Mêjûwê de di bin nav û nîşana du Şopên Kevnar di Kurdistanê date binivîsandin. Derbendê Gawir li ser Çiyayê Qeredax de tête bikevtin.

[111]Ev Serdarê hanê li sedsalê 28 Pêş zayînê de serdari dayite kirin. Ew Lidûvanê Sargonê bi nav û bag bû.

[112]Nivîsvanê mêjûwa Rojhilata Nêzîk di rûpelê 210 û li Lîsta Serdarên kevnar de Satuni bi navê Qeralekî Lollo dide bidanîn, ku ew Hemsayê dema Naram-Sîn bû. Renge, ku Orduwê Akadê ev Qeralê hanê dabe şikenandin.

Li gora vê de divê ev welatê hanê bi dewleta Babil ve hatibe bigirêdan. Ligel vêjî de serxwebûna wanî navxweyî jî dihate bidîtin. Sipahê Aşurî li Derbendê Baziyan de, ku di wê demê de Babît pê dihate bigotin, derbasî nava welatê lollo hatîye bikirin. Ev Derbendê hanê bi dîwarekî xurt ve hatibû bigirtin û li pişta wî de keleha Uzi dihate bidîtin. Sipahê Aşurî li rêya şax de pişt bi Derbend ve hatin bikevtin û wan ew dane bigirtin.

Li paş de bajarê Babît de[113], Digara, Bara, kakri û bîst bajarên tirîjî dane bizeftkirin. Zimri[114], ku ew bi navîna Lollo ve dihate biderkevtin, dane bigirtin. Qeralê Lollo, ku navê wî Amikha-Amîxa bû, wî xwe ji bona şaxên çiya date bikişandin.

Li gora Sêr Olmstêd wî ligel hin ji Serokên Sipah de li keleha Nisîr-Kînba-Pîre Megrûn[115] de xwe dane biqayimkirin. Sipahê Aşurî li jêr rêberîya Şûngirê Şelma Naser"de bi ser wan ve hate bidakevtin û hêrîşa wanî pêşî nehate biserkevtin û Hêrîşvanên Aşurî hatin bilinavbirin, belam weha tête biderkevtin, ku li dawî de ew ligel Liberxwedanan de hatin birêkevtin. Aşur Nasir Pal bi vê biserketina hanê ve zor serbilindî daye bikirin. Wî li nêzîkî sitûnên biserketinên Têglat Pilayzer û Tokolti jî de sitûneke biserketinê dayite bidanîn.

Şelmanaserê duwemîn jî li 859 o. z. de bi ser welatê Zamoa ve hate bidakevtin û wî tanî hevrazê çiyayên Nîkdîm û Nîkdi Îra[116] ji xwe re date bizetfkirin. Her vî Qeralê hanê bi xwe ve li sala 844 p. z. de Sipah bi ser welatê Namri[117] de dayite bikişandin. Renge, ku ew di nava welatê Zamoa de hatibe birûştin. Qeralê Namri, ku navê wî Merdok--Modamîk bû, ji bona serên çiyan

[113]Renge, ku ev bajarê hanê nêzîka keleha Ozî bû.

[114]Dr. Sipayzer di nivîsta xweyî hêja de dibêje, ku Navînîya welatê Zamoa bajarê Arakedi bû.

[115]Navê Çiyayekî ji Çiyayên Sulêmanyê ye û ew li Jorî wê de têle bikevtin. (M. E.).

[116]Diyare, ku ev herdu Çiyayên hanê Tasolcet û Kelezerde ne.

[117]herema Namri li gora Neqşê de ew Navçeyê Pişder û Serdeşte.

Institut kurde de Paris

hate bihilatin.

Li sala 829 p. z. de Qeralê Aşurî herema Kaxi[118] jî date biwêrankirin. Salekê li paş vê çûnê de welatê Zamoa ji bona Aşurîya hate bisaxbûn û ew bi devereke Aşurî ve hate bidanîn.

Li dawîya şikenandina Şelma Naserê Sêyem de 883-773 p. z. beramber bi Sardorîsê Qeralê Orarto welatên Lollo beynekê bi destê alîyê biserketî ve hate bikevtin.

Li navîna sedsalê heştemî p. z. de welatê Zamoa bi destê Apliya ve hate bikevtin, yê ku ew Serdarekî Asêyî Aşurî bû û li dawîya vî sedsalî de welatê wî ji bal dewleta Aşurî de bi navê lollom ve hate binavkirin[119].
Têglat Pilayzerê Çarem 745-727 p. z. hinek ji Aramîyên Mêzopotamya ji bona vî welatê hanê date biveguhestin (Forer, r. 43).

Bi kurtî ve ev welatê Lolloyî hanê li dawîya dewleta Aşurî de demeke zor li nava şer, şor û serhildanên Mîrên Aşurî de hate bimayîn. Di dawîya dawî de bi peydabûna dewleta Mîdya û linavçûna dewleta Aşurî ve ew welatê hanê bi destê dewleta Mîdya ve hate bikevtin. Sêyemî Padşahê vê dewleta nuhatî cara duwem, gava ku wî xwe bi ser Nîneva ve date birakişandin, di ser vî welatê Lollom de ew hate biderbaskirin.

*Bajartî-Çanditî (Kultur).*

Weha tête biderdikevtin, ku Ev Miletê Lollo bi xwedan bajartîyeke lihevhatî ve dihate biderkevtin. Li dawîya pêwendîyên wan de ligel Miletê Akad de bêtir ew hatin bipêşveketin. Di nivîsîna zimanê xwe de wan Alfe Baya Akadi ji xwe re dane bihilgirtin.

[118]Diyare, ku welatê Karxî Deşta Şehrezorê ye, ya ku ew bi nav û bange.

[119]History of assyris A. T. Olmstead, London 1923, P. 245.

Institut kurde de Paris

Çêkirvanên hunervan bûn û Bînvanê vêjî goya Qeralê Aşurî Aşur Nasir Pal bi xwe ve tête biderkevtin. Vî Qeralê hanê gelek ji Çêkirvanên Hunervanên vî welatî ji bona bajarên Aşurî dane bibirin. Awaza wî jî bi belavkirina çêkirinê û ciwankirina bajarên Aşûrî ve dihate biderkevtin. Welatê wan pir bi avedanî ve dihate biderkevtin. Li gora belgeyên Aşurî de bajarên wan bi pir ve dihatin biderkevtin, ku evjî nîşana xweşîyê û bajartîyê dide biderxistin.

### *Ziman*

Li gora Rojhilatnas Hausing-Hawsing divê zimanê vî Miletê hanê li zimanê Êlamî yanî de li beşê Qefqasî de bête biderkevtin. Ligel vêjî de heger temaşeyî navên taybetîyî Lollo bête bikirin, Merov dide bidîtin, ku ew ligel zimanê Hori de hin wekhevbûnê dide biderxistin. Rastîyeke jî eve ye, ku şopên dozandî derbarê zimanê vî Miletê hanê de agehdarîyên bi hêz û têrkirî ve nadin bidan.

Institut kurde de Paris

### *Ciyografî*

Sînorên welatê Lollo bi giştî ve bi nenas ve tête biderkevtin. Belam li gora neqşên Mîjûwên kevnar de û hin ji agehdarîyan, yên ku ew hatine bidozandin, tête biderkevtin, ku divê sînorên wan li Jorî Zamoa herema Namri de bête bikevtin, li alîyê Rojhilatê navçeyê Somi, Haşmar, Harhar[120], Halman-Narman[121] de bête bikevtin, li nav jî de divê navçeyên Lara, Sîmaş, Kîmaş dihatin bidîtin[122]. Li alîyê Jêrî de ew ligel welatên Barasi û Tokrîşî Êlamî de bi dirwase ve dihatin

[120]Ev bajarê hanê tûşî hêrîşa Sargonê Akadî di sedsalê 28 Pêş zayînê de bûye. Wi navê wî ji bona navê Karşarogîn ango bajarê Sargon date biveguhertin. Renge, ev bajarê hanê di cîgehê Helebçeyî niha de be u yanjî li nêzîkî wî de be. (R.90, 92)
11. renge, ku navê Hewraman ji navê Narman hatibe, yê ku ew li heremê de bi xwe ye.

[121]renge, ku navê Hewraman ji navê Narman hatibe, yê ku ew li heremê de bi xwe ye.

[122]Renge, ku Soradaşa nihajî navekî Lolloyî kevnar be.

bidekevtin. Li alîyê Rojava de welatê Errafa= Erebxa ango Kerkûka êsta dihate biderkevtin.

Bajarên wêyî bi nav û deng ve bi Babît, Dagar, Bara, Kakri, Zîmri, Hodon, Meso, Arzîro, keleha Uzi û Kinba ve dihatin biderkevtin. Şaxên wêyî bi nav û deng ve Nîsîr[123] yaxud Kînba-Şaxê Zergari, Nîkdîm, Nîkdi-Îra, Sîmaki, Aziru-Azîrva= Ezmir, Kullar-Kolar, Lalar, Suani û Nispi- Nîşî=Şaxê Hewremanîyî niha ve dihatin biderkevtin. Çemê Randu"û Adir jî bi nas ve dihatin biderkevtin. (Sipayzer).

Institut kurde de Paris

[123]Li gora Goya Babilîyan de Keştîya Hejayê Noh, 'Silavên Xwedê li ser bêtin kirin, li dawîya Lehîyê de li ser Çiyayê Nîsîr de neşinbû.
Aşur Nasirpal Qeralê Aşurî dibêje, "ku ev Çiyayê hanê li Rojhilatî welatê Aşur bû. Ew Çiyakî bi tenha xwe bû û Serê wî mîna serê Rimekê tûj bû".
Qurana Berêzjî dibêje "Weistewet ela El-Cudî" (li ser Çiyayê Gotî de hate neşînkirin. Cuma).
Danervanên Ayînvanên Filetîyê jî dibêjin, ku Keştîya Hêhayê Noh, Silavêv Xwedê li ser bêtin kirin, li ser Çiyayê Cûdî hatîye neşînkirin. Ev peyva Cûdî Sêr King wê û Nîpor bi navê yek Çiyayî dide bidanîn. Ev navê Cûdî hanê divê li Gotî-Cotî hatibe. Veguhestvanên vî navî Ereb bûn, yên ku ew Tîpa G bi C peyvdikin, mîna ku ew ji Magdeburg re Macedaborc û ji Ingilîz Incilîz dibêjin. Herwehajî pêwendîya di navbera T û D de nayête veşartin.
Bi vî rengî peyva Gotî Mêjû di Nivîstên Ereb de bi şêweyê Codî hate neqişandin. Li gora vê Rûnkirinê de Cebel Cûdî ew Çiyayê Gotî-Kotî-Kortî-Kurdi ye. Bi rastî jî mîna ku ji belgeyên Mêjûyî tête biwergirtin, ku Keştyaî Noh, Silavên Xwedê li ser bêtin kirin, ew li ser Çiyayê Nîşîr-Rizgarîyê niha de di welatê Gotî de hatîye neşînîkirin.
Ger weha bû, divê Dorhêla Nîsîr jî Cigehê duwemî peydabûn, zorbûn û belavbûna Merovanyê bête bidîtin. Zor dibe, ku li dawiya demeke dirêj de Merov li dawîya Lehyê de pirbûn, hêdî hêdi ew hatine belavbûn, mîna ku Hirvi Ribinson û Hinri Bristêd vê dibêjin: ku Beşekî ji wan Merovan berê xwe Jêrî Rojavayî de mîna Surî, Felestin û Efrîqya de daye û Beşê din berê xwe ber bi Pişt Çiyayê Qefqasyê-Çiyayê Qaf de daye. Bere bere ew li Rojhilat û Jorî derya Xewzer û tanî Deşta Danobî xuwarî de hatîye belavbûn. Dibejî, ku hinek ji wan Merovan jî li cihê xweyî kokî de mabin.
Mistêr M. Streck li Insiklopêdîya musulmantîyê de bergê 1, R. 106 de dibêje: Nivîsvanên File bi Çiyayê Cûdî Çiyayê Kordoen-Kordoîn gotin. Bi rastî jî Çiyayê Nisîr jî di nava welatê Kordoen-Kordoîn de bû.
Di dema Aşurî de welatê Botan û Aşurî bi Gotyom ango bi welatê Miletê Gotî-Kotî nasyar bû. Renge, ev navê hanê di destpêka musulmantîyê de hiştajî jibîr necûbû û peyva Cûdî jê hatibe bipeydakirin.

2. Guti-Goti

Mîna ku me li benda sêyemî derîyê duwem de daye biaxivtin, Ev Miletê hanê jî li Komela Gewreyî Zagrosê de têtê biderkevtin. Li gora reman û bawerîya hinekan de ji Rojhilatnasan bi eşkere ve koka wî zor kevnarî bi Kurd ve têtê biderkevtin û li Zagrosê de heremeke gewre di dest de bû û dewleteke wîyî serbixwe jî hebû.

Li gora lista Serdarên (Mîjûwa Rojhilata Nêzîk) de divê yekemîn Qeralê Nasrawê wî bi Annatum-Annatom ve bête biderkevtin, yê ku wî ligel Êlamî de daye bişerkirin û ew li pêla Qeralê Lagaşê de (li sed-salê 31 Pêş zayînê de) dihate bipeydakirin.

Di wê listê bi xwe ve li ser Logal Zagîsî Guti de têtê biaxivtin, yê ku ew li sedssalê 29 p. z. de bi Qeralê Erech-Erîx û Sommer ve dihate biderkevtin. Yekek ji Qeralê Goti jî bi Vergirtvanê halmanê Annoba-nîni ve dihate biderkevtin, yê ku ew li pêşî pêla Sragonê Adakadi de dihate bikevtin.

Dr. Sipayzer li nivîsta xweyî hêja (r. 99) de dibêje, li gora navên taybetîyî Sommerî de dibe bête bigotin, ku li dema dewleta herî kevnarî jî de li welatê Sommer de perçên Goti dihatin bipeydakirin.

Di dawîya vêna de, ku van Eşîrên Goti hêz û desthilatîyek zor li wî welatî hanê de ji xwe re dane bipeydakirin, inca hêrîşa xwe bi ser welatê Akad ve dane bikutandin. Qeralê Akadiyî bi nav û deng ve Narm Sîn li sedsalê 27 p. z. de hate bişikenandin û li pişt demekê de welatê Akadî jî date bidagîrkirin. Li dawîya şikenadina Naram Sîn de waha têtê biderkevtin, ku welatê Akad bi destê dewleta Erîx ve hatîye bikevtin[124].

---

[124]Li dawîya şikenandina Narm Sîn de weha derdikeve, ku welatê Akad bi destê dewleta Erîx ve hatîye bikevtin. Pirjî dibe, ku ew bi destê Qeralê Gotî de bû. pênc Serdarên Erîx Bîst salan li ser Akad de serdarî dane kirin. Li dawîya vêna de înca Eşîrên Gotî Akad dane bivegirtin. (mêjûwa Rojhilata Nêzîk, R. 189).

Institut kurde de Paris

Pir dibe, ku ew di destê Qeralê Goti de pênc Serdarên Erix bist salan têde Serdarê dabin bikirin û li dawêya van de inca Eşîrên Goti Akad dabin bidagîrkirin û nêzika dused salî serdarî têde dane bikirin (Mîjûwa Rojhlata Navînî Kevin. R. 189).

Li nava Rûdanên, yên ku ew ji şopên dozandî dane biderxistin, weha tête biderdikivtin, ku welatê Sommer û Akad demeke zor bi destê dewleta Goti ve hatibûn bimayîn û Serdarên herî bi hêzî Lagash-Lagaş jî ve bi wan ve dihatin bgirêdan. Bi rastî jî ve pêla bextiyarîya lagaş li jêrî serpereştîya Gudea-Pates Godi de (2500 p. z. de) ligel pêla dewleta Goti de li hev de tê birasthatin. Renge, ku Godi bi xwe jî ve ew bi carekê ve bi (Goti) ve bête biderkevtin. Zor bi cigehê mexabûnê ve tête biderkevtin, ku der barê bi rûdanên mêjûyîyî vê dewleta hanêyî herî kevnarî Kurd ve agehdarîyên têrkirî bi dest ve hêjî nehatine bikevtin.

Em nizanin, di pêla wê dewleta hanê de (di nêzîka dused salî de) çi hatîye bikirin, Çend Qeralan serdarî dane bikirin û navên wan çi bûn.

Li Lista Serdaên kevnar de xwedîyê (Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Navînî Nêzîk Mister Hol) li nav nivîsta xwe de dane binavkirin, di navbera Naram Sîn û vegirtina Akad ji bal Ur de ango ji 2700 tanî 2500 p. z. de navê hîç Qeralekî nehatîye binivîsandin. Belam Dr. Sipayzer li nivîsta xwe de dide bigotin, Dawîvanê Serdarê Gotiyî Akad bi Tirigan ve dihate biderkevtin.

Li gora Lista Mêster Hall-Hol (R. 210) de divê li sedsalê 28 p. z. de Sargonê bi nav û deng ve, yaxud Shargani-Sharri-Şargani-Şarri ligel Qeralê Goti Sharlak-Şarlak de dabe bişerkirin û wî ew dabe bibezandin. (Mêjûwa Kevarî Rojhilata Navînî Nêzîk, r. 186).

Di dawêya vê dewleta Goti de, ya ku ew ji bal Utu-Hegalê Qeralê Ur-Urok[125] de li nav de hate bibirin, Eşîrên Goti ji bona welatê xweyî

[125]Mistêr Hall-Hol dibêje: ku Akad bi destê Qeralê Lagaş hate bikevtin, yê ku ew Somerî bû. Piştî nemana vê Malbatê ew bi destê Serdarê Ur ve hate bikevtin, ku ew jî Somerî bû. Di piştî vêna de ew bi destê dewleta Nîsînî Samî ve hate bikevtin, ya ku desthilatîya wê tanî Babilistanê diçû. Vê desthilatîya hanê weha date bidirêjkirin, tanî ku dewleta Amorî li Surî de ew date bivegirtin.

kevnar ango ji bona şaxên Zagrosê hatin bivegrandin. Êtir wan welatê Akad nema bêtir dane biêşandin.

Bes û bi tenha ve li hêrîşa Eşîrên Kasay ji bona ser Babil de Miletê Goti jî yarmetî ji bona wan date bidan. Goti ligel Lollo de têkelaw bûn û ew bi beşekî ji welatê Lollo ve dihatin biderkevtin. Eşkerebûn li ser vê jî de ketina çiyayê Nîsîr li nava welatê herdu Miletan de tête biderkevtin û hebûna bajarekî Goti li welatê Zamoa de tête bikevtin, ev bajarê hanê jî divê bi Ollobolag-Ablax vebête biderkevtin, yê ku ew ji bal Nivîsvanekî Aşurî ve bi rengê Tagalaga, Lagab û yaxud Galaga ve hatîye binivîsandin.

Ji vê mêjûwê de û pêve tanî destpêkirina dewleta Aşurî de der barê zînet û mêjûwa Goti de belgeyek nehatîye bidozandin. Bi xwe jî ve li sêyemê çarî duwem hezar salê p. z. de dewleta Aşurî ji hin dewletên biçûk biçûk û bi bê hêz ve dihate bipêkhatin.

Vê jî nedihişt, ku ew bitwanin ligel Miletên çiyayî de xerîk bibin, belkî ew bi xwe jî ve li jêr desthilatî û kêra wan de hatin bimabûn û demeke zor jî li jêr serdarîya Mîtani) de hatibûn bimayîn.

Em dibînin, ku yekem Serdarê Aşurî -renge, ku ew li sedsalê 23 p. z. de be- Kurê Iakulaba-Iyakulaba bû, ku ew li navekî Goti de tête biçûyîn. Oşpiya û Kîkya jî Serdarên kevnarîyî Aşurî bûn, ku ew bi xwe jî ve di wî sedsalî de dihatin biderkevtin. Wa tête bidiyarkirin, ku ew jî Mîtan dihatin biderkevtin. Yekekî li Qeralên Aşurîyî sedsalê nodehemînî p. z. de bi navê Adasî ve dihate bidîtinbû, divê ew bi Zagrosî ve bête biderkevtin.

Li dawîya vî jî de Lollolay bi navê Qeralekî wan ve dihate biderkevtin, ku ew bi carekê ve ji Miletê Lollo dihate biderkevtin. Bi kurtî ve li dawîya hezar (nêzika 1100) p. z. de inca Aşurî bi xwedan serxwebûneke siyasîbûne ve û ew ligel dirawsên xwe de bi ceng û şer ve dihatin bikevtin.

Adad-Nîrariyê Qeralê Aşurî 1310-1281 p. z. de li şopeke dozandî de dide bigotin, ku Sipahên kasay, Goti, Lollo û Subari me date bişikenandin. Ev Miletê Quti-Goti, yê ku ew li vêderê de li ser wî de tête

Institut kurde de Paris

biaxivtin, ew bi xwe jî ve bi Miletê Guti-Goti ve bi xwe ve tête biderkevtin, yê ku ew li tomarên Sommer û Akad de têtin bidîtin.

Şelmasaserê yekem 1280-1261 p. z. de bazinê vekirina xwe ta Uruarto ango Erminya û Xani Galbat dayite bifirehkirin ew dibîje: "Miletê Goti, yê ku ew di esmanê vê demê de mîna estêran dide bigeşkirin, nebes tenê bi zordarîya xwe ve, lêbelêjî ew bi vîn, xurtbûn ve û bi gerewbûna tar û markirinên xwe ve bi nav û deng ve dihatin biderkevtin. Ew li beramberî min de hatin birabûn, her û her wan dujminatîya min didane bikirin".

Ev goya hanê der barê bi hêzbûn, diratî, sincî û serûştiyên vî Miletê hanê ve wêneykî pir rast û durûste dide biderxistin û Eşîrên nebezî û netirsî Kurdistanîyî îro jî bi ber çavên me ve didin bianîn.

Dawêya vî şerî weha bû, ku Sipahê Aşurî ji bona demekê dujminên xwe dane bişikenandin, bi corekî ve ku zor, sitem, dirbûn û hovîtîya Qeralên Aşurî beramberî bi wan ve bi bê nimûne ve dihate biderkevtin.

Şelma Neser dibêje: "Ji sînorê Oratri tanî dighê Kemmoxi di nava vî welatê gewreyî hanê de xwîna Goti weku avê hatîye birijandin".
Ji vê goyê weha em têdighên, ku herema liberabûna Miletê Goti ji Ermînya tanî çiyayî Tor Abidûnê tête biçûyîn. Bi kurtî ve çi bi dîtina vî belgeyî ve bête biderkevtin û çi bi goya Tokolti-înorta û Qeralên kevnarî Aşurîyî tir ve bêtin biderkevtin, divê hemû herema Zagrosê Navrastî bi neştîmanê Miletê Goti ve bête biderkevtin.

Pirofêsor Sipayzer li ser peyva xwe dire û ew dibêje: Miletê Goti yan Koti - Korti derbarê ziman de ew li Komela Zagrosê de tête biderkevtin; jibervêjî nabe bi çavê Sami û yan jî bi Hindo-Ewropi ve li wan de bête bitemaşekirin.

Bi rastî jî ve hin ji Miletên Hindo-Ewropî têkel bûne û li nîvê duwem hezar salê p. z. jî de hin ji Miletên Arî li Mozopêtamya hatine bidîtin. Herwehajî li pêşîya hezar salê p. z. de beşê zorî Zagrosê bi Hindo-Ewropî ve û yanjî bi Arî ve hatibûn bikirin, belam bi bûna Goti

ve bi Hindo-Ewrop ve eşkerebûnek bi carekê ve nayête bidîtin. (Miletên Mozopêtamya, r. 96-119).

3. Kassites-Kasay

Miletê Kasay, yan jî Kaşşoyê Akad û yan jî Koşê Incilê û Babilî ew Li Komela Zagrosê de dihate biderkevtin. Bere bere Rojhilatê Bibilistanê ta qeraxê Dicle datin bidagîrkirin. Zor car wî welatê Babilistanê dida biserêş û bitalankirin. Tanî ku Ami Zadogayê Qeralê Babilê çaremî piştî Hemorabi 1977-1956 p. z. de ji bona berbestkirina hêrîş û wêrankirinên Miletê Kasay ligel Êlamîyan de peymaneke liberxwedanê date bigirêdan. (Mêjûwa Rojhilata Nêzîkî Kevnar, r. 198).

Eşîrên Kasay di dema Saso-llona de hêrîş bi ser Babilistanê ve datin bibirin, belam ew bi wan ve nehate bizetfkirin.

Di dema yanzdemînî û Dawîvanê Qeralê Babil Samso-Dîtanayê Amorî de Miletê Khatti-Xatiîyî Enadolê şepolên talankirin û wêrankirinên wan bi Babilistanê ve hatin bigihandin û ew welatê hanê hate bikavil û biwêrankirin û ew di nava hêstiran û xwînê de datin bicîhiştin û ew ji bona welatê xwe hatin bivegerandin. Ev rûdana hanê bi hoyê linavçûna dewleta Anorî ve hate biderkevtin.

Belam li layekî tirjî de vê rûdana hanê jî kara mebesta siyasîyî Miletê Kasay date bikirin[126]. Li dawîya vê vegirtinê de renge, ku du sedsalî dîsan welatê Babilistanê bi destê dewleteke xwemalî ve hate bimayîn, lêbelê derbarê vê jî de hîç agehdarî nayête bidîtin.

Li dawîya vê pêlê de Miletê Kasay bi alîkarîya Eşîrên Merevên xwe Goti, Lollo ve û li jêr serpereştîya Gandish-Gandişê Serok de hêrîşek bi ser Babilistanê ve date bidan û ew date bizetfkirin. (1760 û li gora Sipayzer de 1746 p. z. de). Vekirvanê tazeyî Babil tanî demekê

[126]Mistêr King li mêjûwa Babil, R. 211 de dibêje: ku ev hêrîş û vegirtina hanê ew ji bal Miletê Hitit-Hisis de hatîye rûdan.

destdirêjî nava îş û karên siyasîyî dewleta Babilîyî Jêrin nedida bikirin.

Vê dewleta hanê nêzîka Ss sedsalî hebûna xweyî siyasî date biparastin . (2068-1710 p. z. de). Ev dewleta Jêrîyî hanê bi dawîya reha Sommerîyî kevnar ve hate biderkevtin.

Li dawîya linavçûna vê dewletê de Miletê Sommerî jî win bûn. zimanê wan jî bi zimanekî mirî bû û bes û bi tenha ew ji bal Keşan de dihate biparstin.

Di dema dewleta Ea-Gamil-Î-Gamil[127] de dawîya dewleta Sommerî hate bihatin, (bi pirî li 1710 p. z. de). Vî Qeralî wist, ku ew welatê Êlamê bide bizeftkirin, lêbelê ji bona wî ev neçûserî, ew şikest û xwe bi berû paş ve date bivegerandin.

Di vê bihnê de yekekî ji Serokên Kasay bi navê Ulam-Buriash -Ulam- Burayiş ve kês ji xwe re date bigirtin û wî hêrîş bi ser Î Gamil ve date bibirin û dewleta wî ji nav destên wî date bisitandin. Ew bi Serdarê welatê Sommer ve hate bikirin, yê ku ew bi Qeralê Babil ve hate bigirêdan, yê ku ew Bavê wî bû û ew bi navê Burna Burarish-Burna Burariş ve dihate binavkirin. Li dawîya çend salan de li paşî vê rûdana hanê de Qeralê Kasayê Bibilistanê Agumê sêyem, yê ku Birazyê Ulam Burayiş bû, keleha dawîyî Xelkê welatê kenar date bigirtin, ya ku ew bi dur Ea-Dûr Î ve dihate biderkevtin.

Li dawîya vêna de, ku welatê kenar-welatê Sommer bi tewawî ve hate bizetfkirin, Qeralê Kasay navnîşana Kardonyaşî ji bona herdu welatan Sommer û Akad ji xwe re date biwergirtin û bi vê navnîşana taze nêzîka şeş sedsalî li 1746-1171 p. z. de li gora Sipayzer de ev dewleta hanê bi nav û deng ve, bi hêz, hiner û saw ve date bidirêjkirin. Firehbûna Patîşahîya vê dewletê ji firehbûna devera Hemorabi jî bi bêtir ve dihate biderkevtin. Miletê Hîtît bi tewawî ve hate bişikenandin û Pûtên Babilî ji wan hatin bisitendin.

[127]Peyva Ea-Ê navê Perestê derya bû. (mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk, R. 489).

Institut kurde de Paris

Bi rastî ve ne Hemorabi û nejî pêşî û Dondên wî bi xwe jî ve ji bona xwe bi tenha ve nikarîbûn welatê Sommer jî bidin bisaxkirin. (Der barê dewleta Kasay de li bergê duwem de dirêjbûn têtin bidan).

Miletê Kasay mîna Eşîrên Goti li dawîya linavçûna dewleta wan de ew jî ji bona Zagrosê hate bivegerandin.

Di pêla dewleta Roma de hindek li Eşîrên Kasay li Xuzistanê de û li dora Sus de dihatin bidîtin. Li şopên kevnar de weha têtê biderkevtin, ku beşê êrî Rojhilatîyê Kasay beynekê ew li jêr serdarî û desthilatîya Êlamî de de dihate biderkevtin. "Insiklopêdîya musulmantîyê"[128].

Bi kurtî ve weha têtê biderkevtin, ku ev Miletê hanê tanî zayînê û belkî jî tanî dawî jî her bi wî navî ve li welatê Loristanê de dihate bidîtin. Bere bere ew nav win bû û li cigehê wî de Eşîrên Lor hatin bipeydabûn. Bi rastî jî ve di navbera peyva Kasay - Kaşo - Koşi û Lor de tu wekhevbûneke peyvî nayête biderkevtin.

Têgihiştina Lor her wekû dîtina Pirofêsor Sipayzer ew bi nêzîki peyva Lollo ve têtê biderkevtin, belam hîç bi dûr niye, ku peyva Lor navê beşekî ji Kasay bête biderkevtin û li dawî de ew ji bona hemû Eşîran bi nav û nîşan ve hatibe bikirin.

### *Reh û Oldarî*

Beşê zorî Rojhilatnasan di wê bawerîyê de têtin biderkevtin, ku ev Miletê hanê ji reha Arî têtê biderkevtin. Pirofêsor Sipayzer û hinekî tir jî dibêjin: li gora zimanê wan de renge ligel reha Qefqasî de bêtin bigirêdan û pêwendîyên wan bêtin bipeydakirin. Miletê Kasay wekû dirawsên xwe bi Pût perest ve dihatin biderkevtin. Û herî Perestê wanî gewre bi Seryaş ango bi Xwedanê Rojê ve dihate biderkevtin. Pere-

[128]Rojhilatnas Rawilson dibêje: renge, ku Deşte Kaşvan-Kaşwan bi navê Kaşo hatibe binavkirin. Herwehajî Hêrtsfeld, yê ku wî Xwendekarîyeke qol li ser Loristanê de daye kirin, dibêje: ku herema Koh Gîlo, ya ku ew di navbera Sosa û Îranê de hatîye bikevtin, renge, ku ew cihê Korşê Gewre-Kîxosroyê bi nav û bang be, ango welatê Înşan-Enzan be.

Institut kurde de Paris

stên wanî tir Xarb, Donyaş, Şax, Şîpak, Şokamona .. hd. dihatin biderkevtin. Têgihştina Xwedan bi zimanê Kasay ve bi Bogaş ve dihate biderkevtin. Derbarê bi ayîn û perestîyên vî Miletî ve agehdarîyek nayête bidîtin. (Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk).

*Ziman û Bajartî*

Li gora Mitir Hol de zimanê Kasay bi Arî ve dihate biderkevtin, ji bona nimûne weku navê Înda Bogaş, ku bi rastî ve bi gotineke Arî ve têtê biderkevtin û beramber wê bi Parsi ve Întafernes têtê biderkevtin.

Rojhilatnas Pincher-Pinçer derbarê bi zimanê Kasay ve nivîstek dayite binivîsandin, belam ewende bawerî pê nayête bikirin. Ligel vê jî de pêwendîyên zimanê Kasay ligel zimanê Komela Zagrosê de bi bê gûman ve têtê biderkevtin. (Miletên Mêzopotamya).

Rojhilatnas Husing dibêje: Zaravê Kasay li zimanê Jêrî Êlamî de dire. Ji alîyekî tir jî hin ji navên Kasay li navê Hori de dirin.

Bi kurtî ve hêjî bi tewawî nehatîye bisaxkirin. Derbarê bi bajartîya vî Miletê hanê ve agehdarîyên wetov nayên bidîtin.

Tevlivêjî wa diyare, li pêş pêkhatina dewleta Babilî de derberê bi çandinyê ve karineke wanî pir berz dihate bidîtin. Resenekî ji hespan ji bona rakişandina Ereban û ji bona siwarbûnê jî didane bikaranîn. Û ev Bargîra berz ji layên wan de ji bona Babilistanê hatîye binardin. Li paş vegirtina Babil de bajartîya babilî jî ji xwe re dane biwergirtin û li nivîsandin û çanda-Kultura wan de sûd ji xwe re dane biwergirtin.

4. Mitanni-Mîtanî

Nivîsvanê Mêjîwa Babilistan Sêr King vî Miletê hanê bi Qoleke Kasay dide bidanîn û ew dibêje, ku ev Miletê hanê ji reha Arî têtê biderkevtin. Belam rûnkirên (Miletên Mozopêtamya, r. 128-135) rengekî tir dide biderxistin û ew dibêje, ku Mîtanî beşeke ji Miletê Subaro - Subarto têtê biderkevtin. Li Feratê naveratst de di navbera

Institut kurde de Paris

Musil-Cerablus de dihatin bidîtin. Bigir li sedsalê şazdehemînî p. z. de dewleteke bi hêz ve datin bidamezirandin. (Dirîjbûnên vê li bergê duwem de). Yekek li çar dewletên gewre (Misir, Hîtît, Kardonyaş û Mîtanî) bû. Paytextê wê bajarê Washshuganni - Vaşşogani bû. Li nava pelên amarna[129] de li ser pêwendîyên Mîtanî de ligel dewleta Misri de tête biaxivtin. Nameyeke Tushratta-Tuşrattayê Qeralên wan hetîye bidozandin. Ew bi zimanê Mîtanî ve hatîye binivêsandin û ew 600 dêre; tevîjî ku zimanî siyasîyî wê demê jî Akadi bû. Rojhilatnas Bork dibêje:zimanê wê namê ji perçeyên zimanên Qefqasî tête biderkevtin.

Welatê Mîtanî bi navnîşana Subari ve hatîye binavûdengkirin. Li herema Kerkukê de çend hezar belgeyên Mîtanî û Suryanî derbarê bi Subari û Mîtanî ve hatine bidozandin. Li Bogazkowi jî de gelek şop hatine bidozandin.

Rojhilatnas Gensen-Cênsin dibêje: Têgihiştina Mîtanî ji bona Xanedanên dewletê bû û koka Milet Subari bûn û navê welatê wan Hani Galbat bû. Ev têgihştina hanê ligel ferşên kevirî de ji dozandinên Kerkukê ligel hev de nayête biderkevtin.

Ev dewleta Mîtanî li pêla serdarîya Aşur Nasir Palê Sêyem de hindik hindik welatê wê ji bal Aşurîyan de dihate bizetfkirin û dewleta wan hate bilinavçûn. (Mêjîwa Tevaya Mêjûvanan).

Mîna ku emê dê li bergê duwem de bidin bidîtin, ku ev dewleta hanê demekê zor bi desthilat ve dihate biderkevtin. Surî, welatê Amori, beşekî Kurdistanê ta Arafa-Kerkuk û welatê Aşurî li jêr serdarîya wê de dihatin biderkevtin. Xelkên Misrê bi van Mîtanîyan ve Nahari didatin bigotin û li Tewratê jî de bi Aram ve -Naharem hatîye binavbirin. (Mêjûwa Tevaya Mêjûvanan, b. 2, r. 381). Li gora vî navî de hîç bi dûr ve nayête biderkevtin, ku navê Nayri ji Nahari ve hatîye biderkevtin[130].

[129]bajarokê kevnarî Til Emarayî bi nav û bange û ew li Jorî Misrê tête bikevtin. (M. E.).

[130]Bi rastî jî Xelkê Kurdên herema Nayrîyî kevnarî hêjî ew bajarê Şemdînan di vê herema hanê de bi navê Nehrî-Neyrî didin binavkirin.

5. Khaldi-Xaldi

Renge, ku ev dewleta hanê li dawîya sedsalê nehemînî p. z. de hate bipêkhatin. Zor Qeralên wê li pêş Sardorîsê de yekem Kurê Arî û Dondên wî hebûn. Sardorîs di pêla Qeralê Aşurî Şelemneserê sêyem de bû. (889-824 p. z. de).

Vî Qeralê hanê bajarê Tospas-Wan date biavakirin. Kurê wî û Şûngirê wî Îsponîs zimanê Xildi li şûna zimanê Aşurî de date bidanîn, yê ku ew tanî wê çaxê li Orarto de bi zimanê nivîsandin û wêje ve dihate biderkevtin.

Şopên dozandî li Derbendê Kêle Şînê de li hêla Jorîyî Rayat de vegirtinên Îsponîs didin biderxistin. Ew kêlê kevirîyî hanê bi zimanê Aşurî ve hatîye binivîsandin.

Kêr û desthilatîya vê dewleta hanê di pêla Qeralê Mînwas de bi berzbûna xwe ve hate bigihaştin. Şopên dozandî li ser zinarên keleha Wanê de û li dorhêla bajarê Eliksender Pol-Kemri de vekirinên pirî vî Qeralî didin biderxistin. Şopên dozandî li dorhêla wî bajarê dawî de şopên wî Qeralî dane bimayînîkirin, mîna ku Bihiston jî şopên Dara datin bimayînîkirin. Vî Qeralê hanê bêtir ji 14 cengan date bidadan.

Piranîya cengên Şelemneserê çarem (782-772 p. z. de) ligel vî Qeralê Xalidi de hatin bikirin; jiber di vê pêla hanê de dewleta Xalidi hember û berberê dewleta Aşurî bû. Wî ew di desthilatî, kêr û hebûna wê de dida bihejandin û bi nemanê ve ew dida bitirsandin.

Wehajî pêla Kurê û Şûngirê wî jî bi navê Sardorîsê duwem de demeke zêrînîyî vê dewleta hanê hatibû bidîtin. Desthilatîya wêna bi berzbûna xwe ve hate bigihaştin. Jiber hêrîşên Xildiyî li dû hev de ji bona ser dewleta Aşurî desthilatîya wêyî navînî hate bilawazîkirin, ku vê jî date bihiştin, di nava hundurê welatê Aşur de şer û cegên navxweyî bêtin bivêxistin.

Institut kurde de Paris

Bi vî rengî ve vê zîneta hanê date bidirêjkirin, tanî ku Pol Serokê şûreşa sipahî desthilatîya xweyî bi carekê ve li ser welêt date bizalkirin. Ev Serokê Polê hanê di pişt re bi navê Têglat Pilêzerê sêyem ve hate binavkirin. Wî sipahê Aşurî bi ser dujminên wî de date birakişandin.

Di pêşî de wî Eşîrên kurdîyî dir li Jor de ew dane biserkutkirin û di pişt re wî pêçek ji bona Jorî Surî date bikirin û ew jî ji xwe re date bivegirtin.

Li paş vê de wî dikarîbû Orarto û Hevalbendên wê yek li dû yên de di bide bişikenandin. Ew bi cararekê ve bi xwedanê dorhêlê ve hate biderkevtin. Weha dewleta Xildî bes û bi tenha ve li ber parastina welatê kokîyî Orarto de didate bikirin. Tanî nemana pêla Senharîbê bi nav û deng ve jî weha Xildi bi bêdeng ve hatibûn bimayîn.

Di dawîya dawî de di pêla Rosayê duwem de careke din ji nû ve dewleta Xildi hate bivejandin. Wê li Rojava Moşki, Hîsi, Halîzon û Alzi-Palo ji xwe re date bivegirtin.

Evaya dawîya berzbûna vekirinên wê bû. Serdarîya Orarto tanî pêla Germiya (625 p. z. de) date bidirêjkirin û wê bi hebûna xweyî siyasî ve date biparastin. Di pişt re ew demekê di bin parastina dewleta Mîdya de hate bijîyandin. Jiber şûreşên Gotiyan, ango Eşîrên Kurd di sala (585 p. z. de) li ser wê de ew bi carekê ve hate binemankirin (Kambirêc, Mîjûwa Kevnar).

## 6. Subari

Ev navê hanê li pêş de ango di dewrana Akad de bi têgihştineke ciyografî û navê welatekî zor gewre ve dihate biderkevtin. Ew li sînorê Jorî Rojavayî Êlam ve tanî şaxê Amanos de dihate biçûyîn[131].

[131]Ew li welatê Edenê Cîyakî gewre ye û Şiva Hesînî Edenê-Helebê di Jêra wî re dire.

Institut Kurde de Paris

Li dawî de ew ji bona Êşîrên zorî Kurdistanê bi nav û nîşan ve hate bikirin. Ev Eşîrên hanê ji Miletên bingehîyî Zagrosê ve hatin bicihêbûn. Beşekî ji Miletên Subari li Mêzopotamya, Surî û Enadolê jî de dihatin bipeydakirin. Weku ku me li serî de dayite bigotin, hinek ji Rojhilatnasan Mîtanî jî bi Qoleke Subari didin bidanîn û ew dibêjin: Renge, ku Qolê Mêzopotamyayê Hori jî li jêr navê Subari de hatibe binivîsandin (Sipayzer). Sêr (Sidni Simis) dibêje: Beşê Rojavayî Diclêyî Subar bi navê Hori hatibûn binasîn.

Derbarê bi mêjûwa siyasîyî vî Miletê hanê de agehdarî bi zor kêm ve têtin bidîtin. Tenya li belgeyên hin şerên Qeralê Aşurî de, yên ku wan ligel wan de dabûn bişerkirin, navên wan hatine bianîn.

Têglat Pilayzerê yekem (1110-1100 p. z. de) yekekî li bajarên Subarîyî bi nav û deng ve dora wî date bizeftkirin, yê ku ew bi navê Şerîş bû.

Li vî şerî de Eşîrên Subari ligel Moşki û Karti de hevbigirtin û liberxwedaneke mêrxasî dane bikirin. (Mêjûwa Aşur).

Li dewrana dewleta Aşurî de ev navê Subari hêdî hêdî win bû û li cîgehê wî de navê Nayri hate biderkevtin û wan Aşurî zor dane biêşandin.

Institut kurde de Paris

7. Nairi-Nayri

Ev Miletê hanê dir û gewre bû. Weku ku me li derîyê duwem (benda 3) de li ser daye biaxivtin, wî hemû Miletên Kurdistanê date bidaqurtandin û cîgehê Subari bi carerke ve ji xwe re date biwergirtin. Zor cîgehê daxe, ku derbarê mêjûwa vî Nayri jî de agehdarîyek der destên me de nayête biderkevtin.

Qeralê Aşurî (Êglat Pilayzerê yekem ligel bîst û sê Qeralên Nayri û çend hevalbendên wan li deşta Melaz Gerd de şerekî gewre dane bikirin. Li ser kanîyên Diclê de sitoneke biserketinê ji bona vî şerê hanê wî date bidanîn û nav û dirêjîyên şer li ser de datin binivîsandin. (Insiklopêdya Musulmantîyê).

Li 910 p. z. jî de leşkerê Aşurî bi ser welatê Kotmox de çû û li navbera Cudi û Diclê de şer ligel Nayri de date bivêxistin û wî ev welatê hanê bi jêrdestên xwe ve date bixistin. Tokolti Nînîbê duwem (890-844 p. z.) jî disan careke din zor ligel wan de xerîk bû.

Bi kurtî ve kêm Qeralên Aşurî hebûn, ku wan ligel van Eşîrên dirî Nayri de kêm yanjî zor xerîk nebûne û ev jî weha niye, ku ew her û her bi rengê hêrîşê ve hatibe bikirin. Gelek caran Eşîrên çiyayîyî Nayri Aşurî dane bilerizandin û laşkerê bi tenha ve ji bona parastina welatê xwe ligel wan de dihate bişerkevtin. Ji bona nimûne em dibînin, ku Eşîrên Nayri li 743 p. z. de li Jorî Rojhilat de rû li welatê Aşûr ve dayite bigirtin û ew tanî navrastî wî hatine biçûyîn û Têglat Pilayzerê çarem bi hezar derd ev Eşîrên hanê ji Aşurê dane biderkekirin û wî ew tanî pişt çiyayê Cudî dane bibirin. (Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk, r. 462).

Senaxerîbê Qeralê Aşurîyî bi nav û deng ve (705-682 p. z.) jî li 699 p. z. de li dora çiyayê Cûdî de pehlewanî ligel wan de date bikirin û ev hatina xwe bi hatina pêncem ve date bitomarkirin.

Rojhilatê bi nav û deng ve Mêcer Son li lêkonadina Nayri de dibêje:

"Welatê Nayri her beşî layê Jorîyî Zeyê Gewre-Zabê Gewre ne bû. Bi rastî jî ve Têglat Pilayzer û Nevîyên wî bi wî Miletî ve Nayri didatin bigitin, yê ku ew li çavîyên Dicle û Firatê de û li Jorî Nîfatis de ango li welatên Diyarbekir, Xarpût û Dêrsima êsta de û li çiyayên Bedlîsê û Toros de hatibû birûnişin. Ev welatên hanê jî ew welate, yê ku ew li dawîya li navçûna dewleta Mîdya de û li navîna dewran dewleta Achaimenes-Axmenî Farisî de (401 p. z. de) Miletê Kordoînê qehreman têde hatîye bidîtin.

Ev Miletê hanê jî bi xwe jî ve bi Bavpîrên Kurdê îron ve têtc biderkevtin û Nevîyên Medê bi nav û dengên donên ve têtin biderkevtin".

"Ji vê mêjûwê û pêve Kurdistan welatê bi hin Miletan ve dihate biderkevtin, yên ku zimanekî wanî kevnar û netêkelav dihate

Institut kurde de Paris

biderkevtin; Eşkerebûn li ser vê bêjê jî de eve ye, ku li wê demê de, ya ku Komelên Gewreyên Miletên Arî ji cîgehên xweyê kevnar de rûyên xwe ber bi welatên Faris, Mîdya û beşekî Ewropa de dane bivekirin, Miletê Kurd jî ji bona nava şax û daxan hatin biwarkirin û ew têde hatin bidaniştin. Bi xwe jî ve em -Ingilîz- jî Nevîyên (Sakson) bi xwe ve bi xizmên Kurd ve têtin biderkevtin. Miletê Kurd xwîna wî ligel xwîna Miletên tir de nehatîye bitêkelbûn û her û her mîna zimanê xwe wan xwîna jî li têkelbûna ligel xwîna perçeyên din de dane biparastin".

"Li dawîya vê de, gava dewleta Med û ya Parsi li dest de çû, Miletê Parsi serê xwe ji bona hêza Serdar ango ji bona Parsî[132] date bitewandin, Belam Miletê Med xwe ji bona nava qelan û çiyan date bikişandin. Ji vê demê û pêve mêjûwa wan dî bin nav û nîşana Kurdoîn ango Kurd de date bidirêjkirin".

"Zinefon tûşî vî Miletê Kordoîn bû û bi wî ve Kardoxoyî pê date bigotin, wî ji destên wan azareke pir zor daye bikişandin. Her kesê Vegerandina Deh hezaran ji xwe re dayite bixwendin, ew divê bizanibe, bê ka çi bi serê Zinefon ve hatîye bikirin.

Vî Ser Leşkerê Yunanî Miletê Kordoîn li Anti Toros de dayite bidîtin, yê ku em îro pê Hekarê yanjî Kurdistana navînî jê re didin bigotin.

Heger em temaşeyî layê Jorîyî Asya Rojava bidin bikirin, emê bidin bidîtin, ku ew bi tirade şer, ceng, veguhertin û şûreşên gewre û giştî ve hatîye bikirin. Girtin û vegirtinên Ser Leşkerên bi nav û deng ve, ku navên wan li mêjûwa cîhanê de bi nav û bang ve dihatin biderkevtin, li vî welatê hanê de ew bûyînên hanê hatine birûdan. Ev vekirvanên hanê jî bi Aşurî, Parsi, Yunanî, Romayî, Erebî, Megol û Turk ve dihatin biderkevtin. Em dibìnin, ku karîna Liberxwedana Kurd bermaberî bi van ve ji liberxwedana Miltên tir bêtir dihate biderkevtin.

132Pars: ji bona herema Pars-Xuresan tête gotin û Eşkanî: ew Erşk-Eşk ji bona Damezrandvanê dewleta wan tête gotin. Îrana Kevin, Hesen Pîrinya. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Di navbera Miletên tirî vî welatî de her bi tena xwe ve Miletê Kurd dihate biderkevtin, ku wî dikarîbû beramber bi hemû leşkerkî xwe ve bide biragirtin û pakbûna ziman û xwîna xwe bide biparastin. Bi rastîjî ve Miletê Kurd hin ji serbilindîyên wîyî rehî jî hatine bidîtin, ku ew hîç li nik Merovekî bi bext jî ve nikare rêzê li wan de nede bigirtin".

Mêcer Son li ser vê lêkolandina hanê de dire û ew dibêje:
"Ev deşt û çiyayên hanê (li layê Jorîyî rêya Orfê-Musilê de), ku ew di destpêkirina mêjîwa nivîsandî de, di navbera welatên Jorî û Jêrî Cezîrê (Mêzopotamya) de ser sînorekî siyasî û serûştî dihate biderkevtin. Ew çiyayê tarîk û berz, (nêt li Tor Abidîne), ku navê wîyî kevnar bi Nîfat ve dihate biderkevtin, êsta ew ji bîra me çûye, ew li ser çavîya Dicle-Tîgrîs[133] de tête bikevtin. Li dema Têglat Pilayzerê Qeralê Aşurî de (1100 p. z. de) sînorê wî layê Jorîyî Aşurî bû û li pişta wî de welatê nezanyarî-Nayri) hebû; vî Qeralê Gewre her û her karkirîye, da ku ew wî ji xwe re bide bidagîrkirin.

Di dawî de navê welatê Nayri bi Kordoîn ve hatibû bikirin, ku ew bi carekê ve bi Kordoîn yanjî Kurd ve tête biderkevtin. Li vê de weha em têdighên, ku Miletê Kurd li destpêkirina mêjûwa reha Arî de ji bona vî welatê hanê hatîye bigihandinû ew hatîye bicigîrîkirin.

Sipahên Miletên gewre mîna Yunanîyan, Pars (Eşkani) û Roma li ber devê pesarên van çiyayên hanê de rûwên wan ber bi deştên Jêrî ve hatine biwergerandin.

Ev şaxên berz Bînvanên şikandin û vegerandina gelek ji Miletên Rojhilat têtin biderkevtin. Bes û bi tenha ve Aşurîyan dikarîbûn, ku ew derbasî nava welatê Nayri-Kordoên bêtin bikirin, ku Xelkên wî di meyla xwe de ji bona serxwebûna xwe li Kurdên îro de bi duwa ve nehatibûn bikevtin.

[133] Navê Tigrîs ew ji gotina Tighra Mîdî hatîye, ku ew bi Kurdî û Farsî bi têgihişina Tîr tête liberbîkevtin.

Institut kurde de Paris

Bi rastî ve ev Miletê hanê, ku ew bi jîyana xweyî sadeyî ve, bi azayî û remana xweyî parastinê ve bi nav û deng ve dihate biderkevtin, bi tewawî ve têkelnebûna wî ligel Vekirvanên gewre de bi cihê ser sûrandinê ev tête biderkevtin ...

Ev kêra, ku Miletê Kurd di nava dilê Rojhilanasan û Mêjûvanan de dayite bihiştin, eve ye: Kurd nayête bitewandin, nayête bişikenandin û li nav de nayête bibirin[134]. Ew hez ji bajartîyê û pêşketinê dide bikirin, ew welatê xwe bi kesekî ve nade bidan, ew hez li çarên wan Miletan de nade bikirin, yên ku ew dixwazin li ser wî de serdarêyî bidin bikirin. Ew divê, ku ew li nava şax û dolên xwe de milîbûn û zimanê xwe bide biparastin"[135].

Institut kurde de Paris

## 2. Ji dema Med tanî derkevtina musulmantîyê

### 8. Medes-Med

Li derîyê duwem de em li ser vî Miletê hanê hatine bipeyivandin û me date bigotin, renge, ku li sedsalê dehemîn yanjî nehemîn de ji bona welatê Mîdya hatibe bibarkirin.

Di pêşî de bi carekê ve jîyana koçeryê dayite birabuhirandin û her Êlek bi serêxwe ve bi dewleteke biçûkî serbixwe ve dihate biderkevtin.

Leşkerê Aşurî li dema Şelmaneserê duwem de û li mêjûwa 835 p. z. de li sînorê Rojhilatê de tûşî Eşîrên Med hatibû bikirin. Van Eşîran hin diyarî ji bona wan datin bibirin. Qeralê Aşurî ev diyarîyên hanê bi

[134] Dilovanê Mehmud Efendi El-Alusî mîna hemû liberxistvanên Quranêyî din de dibêje: ku ew Miletê li Suretê Fetih "Dê Hûnê beramberî Miletekî mêrxas û gernas bibin ..." hatîye, ew Kurdin.

[135] Bi Veşarti li Mozopotamya û Kurdistan de, Lodon 1912.

xûkîtî ve li ser wan de dabû bidanîn û di nava wan de demekê Serlaşkerekî Aşurî date bidanîn.

Bi rastî ve hîç li Mîdya de desthilatîya Aşurîyan nedihate bidîtin û wan jî destdirêjî ji ser Aşurîyan nedidatin bikirin.

Edad-Nîrariê sêyem jî (812-783 p. z. de) çaremîn car ligel Eşîrên Med de hate bişerkevtin. Lêbelê di demaTêglat Pilayzerê çarem de (745-727 p. z. de), bi hoyî ji bona dewleta dirawsê xwe Orarto yarmetî dayite bidan, vî Qeralê hanê sipah bi ser wan de daye bikişandin û li gora goya xwe de tanî dawîya çiyayê Demawend hatîye biçûyîn. (Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk, r. 446).

Şelmaneserê Sêyem Qeralê Aşurî di sala (836 p. z. de) sipah bi ser Mîdya ve pir caran date bikişandin. Şer û cengên Aşurî û Mîdî tanî pêla Sergon datin bidirêjkirin, tanî ku wî di dawî de dikarîbû Serokê Mîdî Deiaces-Diyosis, (dibe ku ew Kîqîbadê Îranî be), di sala 715 p. z. de bide bidîlkirin. Mîdya li jêr destê Aşur de tanî pêla Phaortes-Feraort de hate bimayîn. Vî Mîrê hanê dikarîbû dewleteke serbixwe li Mîdya de bide bipêkanîn. (Mêjûwa Miletan, B. 26, r. 1004).

Di dema Esarhaden de (681-669 p. z.) de Mîdya ligel hevalbendên xwe de Manî, Sîs, Kaskaşşi û Eşîrên Kurdistanê dayite bixwestin, ku ew lêdaneke baş li Aşurîyan bide bixistin.

Belam Qeralê Aşurî bi siyaset ve Miletê Sîs jê dane bicihêkirin û ew bi hevalbendên xwe ve dane bikirin. Bi vî rengî ve wan xwe dane birizgarîkirin. Li dawîya vê de Med her û her ji xwe re li kêsekê de dihate bigeryan, tanî ku di pêla Serdarê duwem Phraortes-Feraort de hêrîş bi ser Aşurî ve di sala (634 p. z,) de date bibirin, belam ew mehatin biserkevtin.

Di dawîya dawî de Ki Axsar hêvîya wan date bicihanîn û wî Aşurî dane bilinavbirin.

Bingehê dewleta Mîdya, weku dê hûnê li bergê duwem de bi dirêjbûn ve bidin bidîtin, li sala 701 p. z. de hate bidamezirandin. Di

dema Ki Axsar xurtbûneke mezin date bipeydakirin. Sînorên wê li Baxterane-Buxara ji Rojhilat ve tanî çemê Qizîl Îrmeq ji Rojav de û ji derya Xezer ji Jor de û tanî kendava Farsî ji Jêr de dihate biçûyîn. Di dema Isîtag Qeralê Mîdî de û li mêjûwa 550 p. z. de ji bal Cyrus-Korş ango ( Ki Xusrevê Gewreyê Exmenî) ve dewleta Mîdya hate bilinavçûn.

Li dawîya herifandina dewlata Mad de hemû welatên Kurdistanêyî bi destên Mîdya ve bi destên dewleta Axemenî ve yaxud Kiyanî ve hatin bikevtin[136]. Tanî vegirtina Iskender bigir dused salî ew bi deswtê dewleta Îranî ve hatin bimayîn. Di dema ku Daryosê yekem bi Babilistanê ve hatibû bimijûlkirin, welatê Mîdya li bin serpereştîya Ferewertîş de şûreşeke gewre dijî Farisan date bilidarxistin. Daryos leşkerek ji bona ser Mîdya date birêkirin, belam bê sûd bû. Li paş vegerandina Babil de Daryos bi xwe ve bi ser Mîdya ve çû û wî di sala (512 p. z.) de Şûreş date bitemirandin.

Di Vegerandina Deh Hezar de Zinefon[137] li nivîsta Anabazîs de dibêje, ku ew ji bal karduchoi-Kardoşoy de zor tûşî azar û hêrîşan bû.

Institut kurde de Paris

[136]Mêjûvanê hêja Hesen Pîrinya Mûşîrê Dewletêyî pêşî di nivîsta xweyî bi nerx de di Îrana Kevnar de dibêje: Şeş Xanedanên Mad li Paytextê dewleta Axemen-Hexamenş de bûn. Ev Xanedanên hanê di cih, nav û nîşanên xwe de lidû Şeş Xanedanên Pars dihatin. Şûn û Karmendîyên Bilind di Dewletê de ji bona van Herdu Xanedanan hatibûn nîşankirin.

[137]Ev Orduwê bi kirê girtîyê Yunanî 13000 kes bûn. Ew li jêr serdarîya Kelerxos de di sala 401 Pêş zayînê de ji bona yarmetîya Kîxisro-Korşê Birayê Şahê Îranê Erdeşêrê duwem de hatibû. Kîxisro-Korş ew Walîyê Kepadokya bû. Wî xwest, ku ew Textê Dewletê ji Erdeşêr bide sitendin. Wî ligel vî Orduwê Yunanî de û Orduwê Kepadokya de berê xwe ber bi Babil date vedan. Li Jêrî Babil de û li nêzîka Xan Iskenderê niha de ew berangarî Orduwa Birayê xwe Erdeşêr bû. Di nava wan de şerekî qurs û giran hate lidarketin. Her çend jî Leşkerê Kîxisro biserketî bû, belam çunge Kîxisro ligel Heşt hezar Şervanên xwe hate kuştin, di dawî de biserbikevtin ji bona Erdeşêr hate hiştin.

Leşkerê Yunanîyî mayî piştî ku Serdarên wan bi vîlikên Tîsafrin hatin kuştin, wan ji xwe re Xenophon-Exenofon-Zînefonê Şagirdê Sokrat-Soqrat (*430 +354 Pêş zayînê-Cuma) bi Serok dane helbijartin. Di bin Rêberîya wî de wan berê xwe ber bi Jor ve dane vekirin. Çiyayên Kurdistanê tanî Tirabzun birîn. Ji wê de kenar û kenar bi Istenbolê ve ew hatin gihaştin. Ji wir di rêya derya re ew bi Yunanê hatin gihaştin. Ev çûna hanê bi Vegerandin Deh hezar bi nav û denge. Zinefon Nivîstokek li ser vê

Navê vî Miletê hanê tanî wê gavê jî kesekî nebihîstibû û eve cara pêşî bû, ku Zinefon li ser wan de daye biaxivtin. Vî Miletê hanê li Derbendê Zaxo de leşkerê Zinefon date bitengavkirin, Şerekî bi rêk û pêk ve di nava wan de hatîye bilidarxistin û tanî nêzîka Terabzûnê li kol wan de ne bûn. Zinefon li nivîsta xwe de hin ji rûnkirinan derbarê vî Miletê hanê de dayite bidan û ew dibêje: Miletê Kardoşoy hîç li jêrdestîya Îranê de nebûn.

Carekê ji caran jî yekekî ji Şahên Îranê bi 120 hezar kes ve bi ser wan ve çû, belam leşkerê wî bi carekê ve hate bitarûmarkirin. Eşîrên Kurd di dema dewleta Mîdya de û herwehajî di dema dewleta Axmen jî de serxwebûna xweyî hundurû dane biparastin û ew nîv biserxwe bûn.

Ev mafeyê xweyî hanê jî di dema dewletên Makdonya de, Pars û Sasanya de, Ereb û Turkan jî de disan dane biparastin. (Pirsiyarîya Kurd Beramber biTurk ve, r. 23).

Darayê sêyem, ku ew duwanzdemînî Serdarê Axmeni-Hexmanşiyî Îranî bû, li pêş patîşahîya xwe de ew Walîyê Ermînya û welatê Kordoîn bû û ew tanî Patîşahîya xwe di sala 338 de p. z. de karmendîtîya xwe li wir de didate bikirin.

Di vê pêlê de Kordoîn-Kardoykay li çavê Zeyê Badînan de ta ser çavîyê Dicle diçû. Li nemanbûna dewleta Axmeni-kiyani) de Îran bi dest Iskenderê Mekdonî ve hate bikevtin.

Serûştîjî bû, ku welatê Kurd jî Mad û Kordoên jî di nava van - mayînan de bû. Li dawîya mirina Iskender de li Babil de (323 p. z.) de ev welatên hanê ji bona nava beşê Selevkos de hatin bikevtin, yê ku ew yekek ji Serleşkerê wî bû. Ew welatên hanê sed salekî bi destên Dondên wî ve hatin bimayîn.

Belam her û her şer û hera têde dihatin bikirin. Di dawîya dawî de bi yarmetîya Meherdadê yekemî Serdarê Aşkanî beşê layê Jorîyî Kurdistanê li çarê yekemî sedsalê duwemî p. z, de bi destê dewleta Er-

Vegerandinê de di bin nav û nîşana Ena Bazîs de date binivîsandin.

Institut kurde de Paris

menî ve hate bikevtin û beşê xuwarê jî bere bere û tanî despêkirina sedalê p. z. de bi destê vê dewleta hanê ve hate bikevtin. Navîna wê jî bi Amed-Diyarbekir ve dihate biderkevtin.

Mêjûvan Sitrabû li peyivandina xwe de li ser dewleta Ermenî de dibêje: Miletê Kurd Çêkirvan û li hemû kar û barê andaz de kone, hunervan û hozan bûn. Qeralê Ermenî Tîgran ji bona van karan her û her ji Kurdan dayite bisûdbiwergirtin. Pilo Torxis jî ji bona van peyvên hanê pişta wan dide bigirtin.

Di çar duwemî sedalê yekemî p. z. de sedrarê Roma Likollos bi ser Erministanê ve hate birakişandin û li nêzîka Diyarbekir de Qeralê Ermenî Dîgran date bişikandin û hemû welatê wî date bizeftkirin.

Di navbera salên 69- 60 p. z. de Serdarê Aşkanî Ferhadê sêyem hêrîş bi ser welatên Kordoîn û Adyaben ve date bibirin, lêbelê ew hêrîşa hanê bi bê encam ve hate bidekevtin.

Di pêla sêzdemînî Serdarê Aşkanî Orudê yekem de di navbera sipahê Aşkanî û Roma de li nêzîki Heranê de şerekî giran hate bikirin û Serdarê Roma Kirasos hate bikuştin û sipahê Roma hate bierîşanîkirin. (53 p. z.).

Li sala 36 p.z. de Kurdistan bi jêr destê Mark Entuwanê Serdarê Roma ve hate bikevtin, yê ku ew ligel sipahê Pars-Aşkanî de li şer de bû; di encam de sipahê Roma hate bişikestin û talanekî zor bi destên Parsan ve hate bikevtin.

Dewleta Madê Biçûk,ya ku ew li Ezirbêcana îro de bû, li wî şerî de ligel sipahê Aşkanî de dihate bibşdarîkirin. Çunke li pirsiyarîya dabeşkirina talan de hate bibîntengkirin, bi dizî ve ligel Serdarê Roma Mark Entuwan de date bidan.û bisitandin û ew ji bona şerkirinê date bidilbijandîkirin.

Bi rastî jî ve ev Serdarê hanê jî bi remana tol wergirtinê li sala 34 p. z. de bi sipahê xwe ve bi ser Erministanê ve hate bidakevtin û wî ew date bizeftkirin, ya ku ew ligel Pars de dihate bidîtin.

Institut kurde de Paris

Li dawîya vêna de bi beynekê ve Serdarê Aşkanê Ferhadê çarem bi leşkerê xwe ve bi ser dewleta Madê Biçûk ve çû û li dawîya şerekî de Serdarê wê wî date bidîlkirin û Erministan jê date bisitendin û ji Merovên xwe Qeralek li ser de date binîşankirin. Salekê li pêş zayînê de dewleta Aşkanî peymanek ligel dewleta Roma de date bigirêdan, ku têde wê Erministan û Kurdistan bi dewleta Roma ve date bidan.

Di pêla Erdewanê sêyem[138] de dîsan di navbera Pars û Roma de li Erministanê û Kurdistanê şer û herayekî zor hate bivêkevtin. Piştî Erdewan Kurê wî Gohderz ji bona ser banê serdarîyê di 40 p. z. hate bigihaştin.

Vî Şahê hanê ligel Qeralê Erministanê Meherdad de date bişerkirin. Wî sipahê xwe di pêşî de li pesarên Helwanê de li nêzîka rêzên çiyayên Sunbulet de bi serhev ve date bicivandin û di pişt re wî xwe ji bona paş çemê Qereson li layê Kermenşah de date bikişandin.

Meherdad jî Adyayîn date biderbaskirin û beramberî Gohderz bû. herdu leşker jî li pesarên Bihiston de pêrgî hev hatin bikirin. Şer û ceng di nava wan de hate bilidarxistin.

Felek li ser serê Meherdad de hate bigerandin. (Çûna Xuzistanê, Rawilson, r.42). Di dema Qeyserê Romayê bi nan û deng ve Niron de leşkerekî Roma bi ser Erministanê û Kurdistanê ve hate birakişandin û wî ew hemû date bizeftkirin.

Li dawîya cengeke dûr û dirêj de di navbera Pars û Roma de Tîrdad bi rezamendîya hedru layan ve bi Qeralê Erministanêve hate bikirin. (63 zayînê)[139].

---

[138] Erdewan li Mîdya Biçuk Serdar bû. Ew di sala 16. zayînê li ser Textê Îranê de hate rûniştin. Serdarê berî wî ji bona Erministanê revaya û wî xwe li ser de bi Serdar date bidanîn. Lêbelê ew neçarbû, ku ew devjiserdarîya Erministanê bide biberdan; jiber Erdewan gerden lê date tengkirin. Îrana Kevnar, R. 161).

[139]Dîn Kert yek ji nivîstên Ayîna Zerdeştî ye, ya ku ew di vê demê de hatîye komkirin.

Institut kurde de Paris

Vê carê aşîtîyê di navbera herdu dewletan de nîv sedsalekî date bidirêjkirin.

Di vê bînê de Erministan, kurdistan û welatê Mad-Medê Biçûk Ezerbêcan tûşî hêrîşa Miletê Alan[140] û Gorcî bû û zor tûşî wêrankirinê û talanyê bû. dewleta Pars parastina wan nedakirî bida bikirin, lêbelê Xelkên cihî liberxwedanek û keftilefteke zor bi mêrxasî û gernasî ve li berxwe de dane bikirin û zor bi wan ve zîyan û kuştin dane bidan. Hîç jî ew jêrdestên wan nebûn. (Şopên Dawêyî Xulefa).

Di sala 100 zayînê de Imperatorê Roma Trajan leşkerek bi ser Erministanê de date binardin û Tîrdadê Qeral date bilinavbirdin.

Trajan bi xwe ve li dawîya 115 zayînê de bi sipahekî gewre ve bi ser Surî ve rûwê xwe ber bi Erministanê û welatên Kurd ve date bivekirin û bi carekê ve dewleta Ermenî bilinavbirdin. El-Cezîre, Adyabin[141], El-Heder-Hatra û Babil jî date bidagîrkirin û tanî kendava Farsî jî hate biçûyîn.

Li sala 122 z. de Imperatorê Roma Hadriyan çemê Feratê bi sînor ve date biwergirtin û ligel dewleta Pars de aşîtî date bigirêdan.
Li sala 161 z. de Belaşê sêyemî Serdarê Aşkanî leşker bi ser Erministanê de date bidadan û ew date bigirtin. Belam li dawî de beramber bi Kasyosê Serdarê Roma ve hate bişikestin û beşê Rojavayî welatên Kurd û Ermen dîsan bi destê dewleta Roma ve hatin bikevtin.

Di dema Erdewanê pêncem de, yê ku ew Dawîvanê Serdarê Pars-Aşkanî bû, dîsan li nava herdu çeman de Îran û Roma bi paxilê hev ve hatin bikevtin û leşkerê Pars bi ser sipahê Roma ve hate biserkevtin, Belam bi bê encam ve hate biderkevtin.

---

[140] Ev Miletê hanê Arîyî Îranî bû û ew li pêş de li nêzîka Derbendê Daryal de li Qefqasya Jêrîyî Rojhilatî de dadinîştin. Di dawî de ew bere bere tanî Deşta Volga hatin belavkirin. Di sedsalê Heftemî Koçî de, di dema ku Megolan ew Hêl ji xwe re datin vegirtin, Miletê Alan ruwê xwe ber bi welatên Rojava de dane vekirin.

[141] Li Beşê Rojhilatî Diclêyî Liwaya Musilêyî îsta de melbenda Zaxo, Dihok û Akrê di kevnar de bi welatê Adyabîn bi nav û bang bû.

Institut kurde de Paris

Derketina Erdeşêr Papekan[142] û nemana Binemala Aşkanî li-hevhatina vê demê bû. (224 z.).

Ji destpêka sala 228 paş z. de Qeyserê Romê Elekşender ligel Erdeşêr de li Cezîrê û Ermînya de dest bi şer ve date bikirin.

Li encam de Heran, Nisêbîn û li paş jî de Ermînya û welatê Kordoîn jî bi destê Erdeşêr ve hate bikevtin.

Oldarîya Zerdeştîyê-Serdeştîyê di vê pêlê de û ji layê Erdeşêr Papekan ve ji bona tevaya Îranê bi oldarîya Mîrî ve hate bikirin.

Di dema Şaporê yekem de li Ermînya û Kurdistanê de şûreşeke mizin hate bivêketin û li beşê Rojhilatî de ji Cezîrê jî têkçû. Şapor şûreş date bivetemirand û Heran û Nisêbîn jî date bivegirtin; belam ewende pê neçû, welatê Cordien-Kordoîn disan hate biserabûn û leşkerê Valêryanê Iperatorê Romê ji bona nava Cezîrê hate birakişandin û wî jî li Tisîfon- Medayin de çardorî lê date bigirtin. Beşekî ji leşkerê Romê ligel Xelkên Kordoîn de bi şer ve hatin bikevtin û Qeralê wan date bikuştin.

Şûngirê wî ligel Îrsnê de hate bihajkirin û bi vî rengê hanê ve Erministan û Kurdoîn bi Îranê ve hatin bigirêdan. (224 z. de).

Di nava 258 û 260 z. de dîsan di navbera Şapor û Valerien-Valêryan) de şer hate bihelgîrsandin û Imperatorê Roma Valêryan li Edêsa-Elruha-Orfa de ligel leşkerê xwe de ji bal Îranîyan de hate bidîlkirin.

Di sala 296 z. de Imperatorê Roma Dioclétin-Diyoclêtin di pêla Nersî de, yê ku ew heftemînî Şahê Sasanî bû, Tîrdad bi Qeralî ser welatê Erministanê ve date binîşankirin û ew bi leşkerekî zor gewre ve

[142] Ew Damezirvanê Binemala Şahên Îranêyî Sasanî ye. Ev Binemala hanê di destpêkirina Musulmatîyê de ji bal Ereban hate nabûdkirin. Navê Bavê wî Papek bû û ew li ser Heremekê li Faris de Mîr bû. Di pişt re ew li ser tevaya Îra bi Şah bû. Ew bi navê Erdeşêr Papekan hate binavkirin (226-241 z. de). Ew bi Sasanî hatin binavkirin; jiber Bavpîrê wan Sasan bû. Îrana Kevnar, Muşir El-Dewle.

Institut kurde de Paris

date piştgîrîkirin û vî Qeralê hanê hêrîş ji bona Ermînaya û Kurdoîn date bibirin û ew datin bidagîrkirin. Li paş de leşkerê Îranê careke din ew date bisitandin, piştî ku ew ligel leşkerê Roma de li nêzîkî Heranê de hatin bitêkel û bilankirin û leşkerê Roma pîs hate bişikenandin. (296 z. de).

Di sala diwayî vê de Serdarê Roma Galèruis-Galêryos hêrîşî ser Ermînya date bikirin. Leşkerê Îranî date bişikanandin û bi xwe jî ve Nersî hate bibirindarin. Li dawî de li ser daxwaza Îrînîyan de hajbûn hate bikirin.

Îranê pênc welatê Erzon, Mok[143], Zabde, Recime, Kardo ji bona Roma date bicîhiştin û ligel hin mercên qurstirî din de Dicle bi sînor ve pê hate birûniştin. (297 z. de).

Li paş vê biserkevtina hanê de dewleta Roma li dora goma Wanê de Erministanek date bipêkanîn û Tirdad li ser de bi Qeralî ve date bidanîn û beşê layê Jorîyî Kurdistanê jî bi ser vê dewleta hanê ve date bipêvekirin.

Li paş çend salekî de Ola fîletîyê ji bal Imperator Qustentin ve li gora Fermana Mîlan de bi Oldarîya Mîrîyî Roma bû (313z.)"
Li sala 338 z. de dîsan jî şer di nava Şaporê duwemî Xwedan Mil de û Roma de dest pê kir û duwanzedeh salan wî date bidirêjkirin.
Di sala 342 yanjî 348 z. de Şapo Şahê Îranê li dorhêla Sincarê de pêrgî sipahê Roma bû. Serdarê sipahê Roma Kostantinos sipahê Îranî pîs date bezandin û Şûngerê Şahê Îranê jî date dîlkirin (Kambrêc, Mêjîwa sedalê Navîn, bergê 1).

Çend sal li vê û pêş de oldarîya fîletîyê li nava Erministanê de hatibû bibelavkirin. Ermenîyan û Qeralê wan Tîrdad ev oldarîya hanê bi remaneke siyasî ve ji xwe re datin biwergirtin.

---

[143]Renge, ku welatê Martîropolis Miyafarqîn be.
(Dibe, ku ew Mûşa nihe be. Erzon ew Erzen-Xerzana niha ye. Zabide û Kardo ew Bazebda û Beqerda Mêjûyî ne- M. E).

Institut kurde de Paris

Ji wê mêjûwê û pêve oldarîya filetîyê û ayîna zerdeştî ligel hev de bi keftileftî ve hatinbikevtin.

Xelkên şax û çiyan (Kurd) li ser ayîn'a zerdeştîyê hatin bimayîn û ji xwe re oldarîya filetîyî nedan biwergirtin. (Şopa Xulefayên Dawî).

Ev oldarîya tazeyî hanê her di navbera Xelkên bajaran û Bazirganan de hatibû bibelavkirin; kêra wê di nava dora bajaran û bajarokan de nedihate biderkevtin.

Di dema Yezdgurdê duwem de Îran cengeke ayînî li Erminstanê date bidestpêkirin û gelek ji Serokên oldarî û Gawirên wê dane bikuştin. Ev şerê û merên ayînî di dema çend Serdarekî de date bidirêjkirin.

Di sala 350 z. de Şapor çardorê Nisêbînê date bigirtin û bi bê zeftkirina wê ve wî ew date bicîhiştin.

Li sala 360 z. de dîsan ew ji bona Kurdistanê hate bivegerandin û keleha Amed- Diyarbekir[144] lê date biçardorîgirtin û ew date bizeftkirin, li dawîya vê jî de Bazbedê li nêzîkî Cezîret Ibin Emro de date bigirtin.

Qeyserê Rom Julien-Julyen bi leşkerîkî gewre ve di sala 363 z.de li Feratê de hate bitêperbûn û Feyrûz Şapor û çend bajerekî tir di Navbera Herdu Çeman de date bigirtin. Li dawî de ew li Dicle de hate bitêperbûn û bi qeraxa çepî wî ve çû. Dûmayîna leşkerê wî li Firatê de bi kenalê Şahî ve derbasî Diclê bû û ligel leşkerê bejayî de hate bitêkelbûn. Julyen tanî Medayin hate bigihaştin. Li paş de li ser rêya Şehrezor, Maranx-Maranks û çiyayî Hemrîn de di ser Hugumbra ango Yaqûbîye de hate bivegerandin. Nêt ew bû, ku ew di rêya Kerkukê de derbasî nava welatê Kordoîn bête bikirin. Lêbelê leşkerê Îranê ji nişkêve li leşkerê Roma de çardorî lêdate bigirtin û ew neçarî şer kir.

144Ev keleha hanê ew ji bal Imperator Kostentin baş hatibû asêkirin. Wî têde Xanîyê Çekirinê ji bona sazkirin û durustkirina Çekên Cengînî dabû avakirin. Dergûşa Merovanyê, R. 29.

Institut Kurde de Paris

Şerekî germ di 6 axleva sala 363 de li nêzîkî bajarokê Eski Kefrîyî niha de ango Phrygia-Fruciya hate bivêketin. Di vî şerê hanê de Imperator Julyen hate birindarkirin û ew bi birîna xwe ve di 6/7 axlêva sala 363 de hate bimirin.

Li paş wî de Şûngirê wî Jovian-Jovyan[145] li ser Banê Imperatoryê hate birûniştin. Wî leşkerê Roma li rêya Toz Xormato, Gelîyê gewre de ji bona Sumer-Samura) date bikişandin. (Pirsiyarîya Babilî, r. 125, 126).

Li dawî de di navbera herdu dewletan de aşîtî hate bigirêdan û bigir Kurdistan û Erministan bi carekê ve bi destê Şapor ve hate bikevtin[146]. Lêbelê li pêş bicihanîna mercên aşîtîyê de careke din şer hate bidestpêkirin.

Li sala 367 de bi parastina bêlayîbûnê ve derbarê bi Erministanê û Gurcistanê de herdu dewlet hatin birêkûpêkkevtin. Di dema Şaporê sêyem de (382-388 z.de) Erministan di navbera dewleta Îran û Roma de hate bidabeşkirin, ango bi Dewlet ve hate bikirin û Serdarên wan jî ji Şahzadeyên Aşkanî bûn.

Di dema Behramê çaremîn de sêzdehemînê Serdarê Sasanî Xusrowê Serdarê Ermînyayî Îranî li ber Îranê de hate birabûn û leşkerê Îranî di sala 393 de date bilinavbirdin.

Di dema Behramê pêncem (Behramê Kor) jî de welatê Kurdistanê ji bona şer û cengê qad û mêrg bû û her di dema vî Serdarî jî de dewleta Ermenî bi wilayetekê Îranî dihate bidanîn. (Sala 422 z. de).

[145]Di Îrana Kevnar de Hesen Pîrniya dibêje, ku ji bona Yonyan-Jonyan Rêberîya sipahîyî Bilind hate pêdan û ne cihê Imperetorî pê hatibû dan. Li paş de ew bi Imperetor bû. (M. E.).

[146]Şapûr Zul-El-Ektaf 70 salî ji 310-379 z. de serdarîkir. Di vî babetê hanê de ew bênimûne bû.
(Di pişt wî de Erdeşêr duwem hat û ew tanî 382 z. M. E.).

Institut kurde de Paris

Qubadê yekem Şahê Sasanî di destpêkirina sedsalê şeşemîyî zayînê de leşker bi ser Rom ve date bikişandin û Kurdistan bi jêr destên wî ve hate bikevtin û Erzerom û Diyarbekir ji^datin bizeftkirin.

dewleta Romayî Rojhilatî li Konstantînê de kêsa mijûlbûna sipahê Îranê li Qefqasya de ligel Hûn de ji xwe re date bisitendin û leşkerekî gewre ji bona ser Diyarbekrê date bikişandin û çardorîyeke xurt li dora wê de date bigirêdan. Herwehajî wê hêzeke din jî ji bona ser welatên li jêr destên Îranê de date birêkirin û ew tanî Erzenyan hate bi bipêşveketin. Wan li wê derê de kûştdarî, talan, raw û rûtkirin, kavil û wêranîkirin dane bikirin û Zarok, Menal û Pîrek dane bidîlkirin.

Van şer û cengan tanî axlêva sala 506 z. de datin bidirêjkirin. (Kambirêc, Mêjûwa Sedsalên Navîn, b.1).

Dîsan her li sedsalê şeşemîn de Eşîrên Goranîyên Kurd li jêr serpereştîya Serokê xwe de,yê ku navê wî Goatanza bû, dewleteke gewre date bidamezrandin û paytextê wê Kermaşah bû û welatê Ezerbêjanê jî di nav de bû. (Pirsiyarîya Kurdistanê û Turk, r.24).

Di sala 502 z. de şerkî gewre di navbera Serdarê Îranê Guwazêfeyrûz û leşkerê Roma de hate bilidarkevtin û Kurdistana navînî bi destên Îranîyan ve hate bikevtin û Xelkên Miyafarqînê ji bona Xuzistanê dane biveguhestin.

Di van şer û cengên gewreyî hanê de dorlêgirtina Diyarbekrê sê mehan date bidirêjkirin. Bi fen û xapandinê ve ew bi destên Îranyan ve hate bikevtin. Sê rojan piştî ketina bajêr kuştin, talanî û raw û rûtkirinê date bidestpêkirin. Bi vî rengê hanê ve jimara Kuştîyan li nava bajêr de ji Xelkên wê û Serbazên Roman bi heştê hezar kes ve hate bigihaştin. Tevlivêjî bi demeke nedirêj ve careke din bajar ji bona serdarîya Roma ve hate bivegerandin, ev jî bi kêra Mîrekî ji Mîrên Eşîrên welatperwer ve li hêlê hate bikirin. (Dergûşa Merovanyê, r. 29).

Di sala duwayî de dîsan li Cezîrê û Kurdistana Jêrî de Şer û Keftileftê di navbera Îranê û Qeyserê Rom de date bidirêjkirin.

Institut kurde de Paris

Xusruwê yekem bi nav û bangê Anû Şîrwanê Adil ve, yê ku ew li sala 562 z. de ji bona Lazîka[147] çû, bi ser Kurdistanê ve vebuhurî û li dawî de, di dema ku ew ji bona serkutkirina destêyê Xezer çû, dîsan ew di nava Kurdistanê û Erministanê de li ser xêza cengê de derbas bû.

Di sala 572 z. de, gava Qeyserê Roma bi ser Nisêbînê ve hate birakişanidin û çardora wê date bigirtin. Anû Şêrwan bi leşkerekî ve rûwê xwe ber bi Qeyser date bivekirin û leşkerê Romê date bişikenandin.

Vî şerê hanê nêzîka pênc salan date bidirêjkirin; girtina keleha Darê ji bona herdu Layan bi armanca şer ve hatibû bikirin.

Di navbera Behram Çobîn û Xusrû Perwîz de cudabûn çêbû û rûdanên di nava wan de aramî li Kurdistanê de date bitêkûpêkdan û bûyînên pir mezin li wê derê de hatin bikirin; ji ber Behram Çobînê Serdar bi leşkerê xwe de serê xwe ve li ber dewleta Îranî de di pêla Bavê Xusro de dabû bihildan. Wî serê xwe ji bona Xusro Perwîz neda bidanîn, yê ku wî cihê Bavê xweyî Hurmuz date biwergirtin, li piştî ku ew li Medayîn de hate bikuştin.

Beharm Çobîn xwe bi ser paytextê dewleta Îranî de date birakişandin. Wî zora leşkerê Xusro date bibirin û wî ew date bişikandin.

Xusro bi revê ve neçar bû û wî ji xwe re li nik dewleta Bizentî de penahindetî date biwergirtin. Li paş vê de Behram Çobîn xwe li ser welatê Îranê de bi Patîşah ve date bidanîn.

Xusro Perwîz ligel leşkerekî zor de, yê ku Imperatorê Bizent dabûyê, xwe bi ser Akbatan de date bikişandin. Di vê demê de bi xwe jî hêzeke dinî Bizentî xwe ji Ermînaya bi ser welatê Ezerbêcanê jî ve dida bikişandin, ligel vê hêza hanê de Bendoye Xalê Xusrû û Kuştîyê Hurmuzê Bavê wî jî dihate bidîtin. Hêza pêşî, ya ku ew ligel Xusro de

[147] Ango herema Lazistan- welatê Laz Beşê Rojava Gurcistanê. (M. E.).

Institut kurde de Paris

bû û di bin Rêberîya Serdarê Nirsisê Romê de bû, li rûbarê Diclê de derbas bû û berê xwe ber bi Erbilê de date bivekirin. Wî ji wir ji xwe re rêya Rewanduz û Şino date bigirtin û berê xwe ber bi Rojhilat ve date bivekirin.

Di vê demê de bi xwe jî ve Behram jî bi leşkerekî zor giran ve li dola Zabê Biçûk de çavdêrîya wî dida bikirin. Tevî ku Behram ber bi gola Urmiyê ve diçû, piştî derbasbûna wî di ser Serdeştê re, da ku herdu hêzên dujmin bi hev ve negihin, da ku ew yekê li du yan din de bide bibezandin. Lêbelê ew pêrgî leşkerê nebû, yê ku ew ji Ermînya dihat birêkevtin. Weha herdu hêzên bi navkirî ve li Şîrcanê de li dorhêla Ekbatanê de bi hev ve hatin bigihaştin.

Weha Beharam şevekê ji şevan ji nişkê ve hêrîş bi ser Leşkerê dujmin ve date bikişandin. Lêbelê ew di vê hêrîşa xwe de nehate biserkevtin û ew neçar bû, ku ew xwe ji bona alîyê keleha Sayin bide bikişandin.

Weha li nêzîka Qazanqa-Textê Sulêman de berî ku şûr bi rêk û pêkî ve xwe ji kalanên xwe ve bidin kişandin û şer bête bidetspêkirin, piranîya pir li leşkerê Behram de tev li leşkerê Xusro de hatin bikirin.

Bi vî rengî ve Behram bi carekê ve hate bibezandin û ew neçar bû, ku ew ji bona nik Oksos Xaqanê Turk di sala 591 z. de dujminê xweyî kevnar penaditîyê ji xwe re bide biwergirtin. (Çûyînek ji bona nava Kurdistana Îranê, Rawilson, r. 74-80).

Xusro Perwîz jî li sala 605 z. de rûwê xwe ber bi Jorî Cezîrê ve ji bona Darê û Diyaberkirê date bivekirin û hin ji welatên tir jî ji dewleta Roma date bizetfkirin. Herwhajî wî leşkerekî din jî bi ser Jorî Kurdistanê ve rûwê wî ber bi devera Kepadokya ve date bivekirin.

Ji destpêka sala 622 zayînê de-1. koçê de- Qeyserê Romê Hirakilyos dest bi hêrîşî ve date bikirin. Bi leşkerekî ve wî rûwê xwe ber bi Erministan û Kurdistanê ve date bivekirin û li wê derê de leşkerê Şeherberazê Serdarê Îranî date bişikenandin û wî dest bi talanî, raw û rûtkirinê û wêrankirina Îranê ve date bikirin.

Wî ateşgehên Îranî û bi taybetî ateşgeha pir bi nav û deng ve Azer Kuşnasib date bitalan û biwêrankirin. Sala duwatir jî li Kurdistanê de wî leşkerê Îranî date biperçeperçekirin û bişikenandin.

Li sala 627 z. de li nêzîkî Nîneva kevnar de şerekî tir di navbera sipahê Hêroklis û Xusro de date birûdan û sipahê Romê hate biserkevtin. Li wî salê de bi xwe jî ve welatê Kurdistanê û nemaze beşê Jêrî û Rojhilatî Şarezorê tûşî bi kavilkirineke zor ve hate bikirin û tanî sala 639 zayînê de bi destê Hêroklis de hate bimayîn. Hêroklis ji bona bi dûkevtina Xusro ve di ser herema Şarezorê de hate bitêperîn. Wî reşmeha sala 628 z. de li Şarezorê de date birabuhurandin. Wî bajar û gundên vê heremê bi carekê ve datin biwêrankirin û bisûtandin û li paş de wî rûwê xwe ber bi Erdelanê ve date bivekirin. (Insîklopêdîya musulmantîyê, bergê 2, r. 1034).

Ev rûdanên hanê ligel dema derkevtina musulmantîyê de hate bilihevrasthatin, ya ku tavaya rêberkirinê wê li asûwê pîrozî Meka Rûmetkirî de hate bihilatin û wê bere bere dest bi ronahîkirina welatên dorhêla xwe ve date bikirin[148].

## 3. Kurd ji derkevtina musulmantîyê de tanî vekirinên Turk de.

Li pêş zayîna Îsayê Hêja de bi şeş sedsalan ve oldarîya zerdeştî li Îran û Mîdya de hate bipeydabûn; li dawîya vê de ew ji bal yekekî ji Serdarên Rojhilatî Îranê Kuştasib de hate biwergirtin û ew bi oldarîyeke Mîrî ve hate bidanîn.

Miletê Kurd jî li paş beynekê de wî jî ev oldarîya hanê ji xwe re date biwergirtin.

[148] Zayîna Hêjayê Mohemed-Silavên Xwedê li ser be- di sala 571 z. de bû. Destpêkirina wî di 611 z. de û Mirina wî di 632 z. de bû. Koçkirina wîyî pîroz, ku ew destpêkirina mêjûwa Koçkirinê ye, ew beramberî 622 z. de tête derbikevtin.

Institut kurde de Paris

Oladarîya Îsa jî li sala 33 z. de bi Erministanê ve hate bigihaştin, Belam wêna ewende dilbijandin nedît û tanî destpêkirina sedsalê çarem zor kêra wê nebû. lêbelê li dawîya vê mêjûwê de bi komeka dewleta Roma ve ser li nû de ji Surî wê rûwê xwe ber bi Erministanê û Kurdistanê ve date bivekirin û Qeralê Ermenî Tîrdad û Miletê wî ev oldarîya hanêyî taze ji xwe re datin biwergirtin; lêbelê Xelkên derve û Çiyaneşînan guhên xwe wan pênedan. Ew li ser ola zaroastri-zerdeştîyê de hatin bimayîn û kar û dilbijandina Keşan kêrek li wan de neda bikirin. Li gora goyekê de beşekî zor kêm ji wan ji bona nava vê oldarîya hanê hatin bikevtin[149].

Li derketina musulmantiyê de û her li pêşîn pêwendîkirina wan ligel Musulmanan de wandatin biremankirin û bidîtin, ku ev oldarîya taze bi tevayî ve ligel serûşt û bextên wan de têtе bilehevkirin.

Jibervêjî, weke ku Sêr Mark Sayks dibêje, bi asanî ve wan bere bere ew ji xwe re dane biwergirtin, bi piliyekî wetov ve, ku inca Berberên Afrîqya û Turkên Turkistanê bi wî rengê dilbijandinê ve ew ji xwe re dane biwergirtin. (Şopên Xulafyên Dawî, r. 252).

Miletê Kurd, her weku Mêjûvanên Erebên cihêbaweryê dibêjin, li şazdehemînê sala koçê de û li dawîya vekirina Helwan û Tekrît de ligel sipahê Musulman de pêwendî dane bikirin.

Lêbelê pêwiste, ku em bizanibin, li pêş vê mêjûwa hanê jî de hin pêwendî û hatina ser rê li nik Kurd de hatîye birûdan.

Ji bona nimûne, Dilovanê Alosî Mehmûd Efendî li jihevkirina Rûh El-Meanî-Canê Têgihştinan) de di nava Hevalên Pêxember de (li ser wî de Silav) li ser Caban-Gaban Kurdî û Meymûnê Kurê wî dide biaxivtin, Navnîşana Meymûn Ebi Besîr bû. Ev agehdarîyên hanê bi ser nivîsta hêjayî Hafizê Ibin Hecir ve dide bivegerandin, ya ku ew bi El-Îsabe fi Temyîz El-Sehabe ve bi nav û deng ve têtе biderkevtin. Ev nivîsta hanê derbarê bi Gabanê Kurdî ve çend bêjên wî û bi taybetî ve

[149]Pirsiyarîya Kurd beramber bi Turk, R. 25 dibêje: renge, Nestorîyê îro Kurdbin û wan Dînê Isa ji xwe re biwergirtin

Institut kurde de Paris

li ser jinanînê de û di warên din de dide biveguheztin. Dibe jî, ku hin Hevalên Pêxemberî din jî bi Kurd ve bêtin biderkevtin.

Mêjû dibêje, ku rêzlêgirtîyê Seed Ibin Weqas li dawîya vegkirina Medayin de li jêr serdarîya Haşim Ibin Uteybe[150] de û li mêjûwa 16 koçê de di avdara sala 637 z. de leşkerek bi ser Cilola de date binardin[151]. Ji ber leşkerê Firs li wê derê de gird bibû û Yezdecurd jî li Helwanê bû.

Leşkerê musulmantîyê li paş şerekî baş de Firs datin biderperandin û rêzlêgirtinê Qeqa şûna wan date bigirtin û keleha Helwan jî date bizeftkirin.

Bi vî rengî ve yekemîn pêwendîya Kurd û welatê wan ligel leşkerê musulmantîyê de hate bikirin. Li paş vekirina vê keleha hanêyî giring de, ya ku ew li ser sînorê Sewad û Çiya de dihate bidîtin. Hinek dibêjin, ku Rêzlêgirtvanê Umer ewende mêla pêşketinê ji bona welatê Firs nebû[152].

Li dawîya vekirina Tekrît[153] de û di sala 18 koçê de Rêzlêgirtvanê Seed Ibin Weqas li bin serdarîya Îyad Ibin Xenem de û li ser Fermana Rêzlêgirtvanê Umer de, Xwedê jê razî be, ji bona vekirina Cezîrê[154] leşkerekî sê Qolî date birêxist:

---

[150]Haşîm îbin Uteybe îbin Ebi Weqas mîna ku ew di Vekirina Şam de ji bal Lazerdi hatîye binivîsandin. Ew li Ewropa hatîye çapkirin.

[151]Celola Şarekî kevin bû. Renge, ku ew li çigehê Sitasyona Qilbata nihayî Iro de ye. (Di Ibin El-Esir de hatîye, ku ew di Zil-Qude sala 16. k. de hatîye vekirin. M. E.).

[152]Di Teberî bergê 4, R. 184 piştа vê gotinê têtе girtin.

[153]Ebdula îbin El-Mutem di Çemada sala 16. k. de piştî dorlêgirtina Çil Rojî date vekirin. (M. E.).

[154]welatê Cezîrê yaxud Mozopotamya ji Diyar Meder, Diyar Bekir û ji bajarên giring mîna Heran, Reha-Orfe, Reqa, Serê Kanîyê, Nisêbînê, Sincarê, Xabûr, Mêrdîn, Amed, Miyafarqîn, Musil ... hd. têtе bipêkhatin. (Netewên Musulman, bergê 1).

Institut kurde de Paris

Qolê yekem li jêr Komandarîya Suhêl Ibin Edî de rûwê xwe ber bi Reqa date bivedan; Qolê duwem bi serpereştîya Ebdula Ibin Utban de bû û wî rûwê xwe ber bi Nesêbînê[155] date bivekirin; Qolê Sêyem bi serdarîya Uqbe Ibin El-welîd ve rû xwe ber bi Cezêrê ve date bivekirin.

Mebesta Umer, Xwedê jê razî be, li vê livandinê de him vekirina Cezîrê bû û him jî nehiştina yarmetîdana Rom di rêya Cezîrê de ji bona Surîyê bû.

Rêzlêgirtvanê Iyad ligel Qola duwem de bi ser Orfa de çû û li dawîya vekirina wê de ji Nisêbînê jî hate bigihandin û ew date bigirtin û wî rûwê xwe ber bi jor ve ji bona layê Mêrdinê, Diyarbekrêû Erminstanê[156] date bivekirin. (Netewên Musulmantîyê, bergê 1).
Hêjayê Iyad; Hebîb Ibin Muslime El-Fehriyî[157] ligel hêzekê ji Kurdistanê ji bona ser Meletîyê date binardin û wî ew date bizeftkirin; lêbelê ev bajarê hanê li paş beyneke din de dîsan ji destê Musulmanan derçû.

Di dema walitîya Muawîye Ibin Ebi Sufyan de li Şamê de (di wê demê de bi xwe jî Cezîre û Erministan jî pêve hatibûn bigirêdan).

Li sala 36 Koçê de Muawîye dîsan Hebîb Ibin Muslimeyî ji bona ser Meletyê date binardin û wî dubare ew zeftkir (Insiklopêdîya musulmantîyê, bergê 3).

Li sala 21 koçê - 642 z.- de Umer, Xwedê jê razî be, Uzre Ibin Qeys ji Helwanê ji bona Şarezorê date birêkirin. Wî xwest, ku ew wî bajarî bide bivekirin; lêbelê ev pê nehate bikirin.

---

[155]Walîyê Heran û Reha ye, Mîna ku ew li nik Ibin El-Esîr û Teberî de hatîye.

[156]Ango Ermînya Çarem ya ku Osman Ibin Ebi El-As bi nava wê ve hate bikevtin û ew tanî Bedlîs û Xelatê çû.

[157]Ew bi navê Şêrînê Romê bi nav û bang bû; jiber hêrîşên wîyî pir li ser welatên jêrdestên Roma dihatin kirin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Li paş de Umer Uteybe Ibin Ferqed li ser serê hêzek baş de ji bona Şarezorê date birêkirin. Li dawîya şerekî qurs de wî bajar date bizeftkirin. Li vî şerê hanê de bi Kurd ve gelek zîyan û malwêranî hate bipêkevtin û bi leşekerê Musulmanan jî ve çi li şer de û çi jî bi kêra pêvedana tûpêşkên Şarezorê ve zor li wan de hatin bikuştin. (El-Kamil li Ibin El-Esir, r.16, bergê 3).

Di navbera sala 18 k.- 639 z. û 23 k.- 644 z. de ji bona liberxwedana Ehwaz[158], Fasa[159] û Dara Bucurd[160] de Kurd ligel Îranîyan de biyekbûn û bi serûştî jî ve yarmetîya wan bi dil û can ve û bi xurtî ve didan bikirin.
Jibervêjî ji bal leşkerê Musulmanan de zor zîyan, rav û rûtkirin, talanî, kuştdarî û wêranî bi can û malên Kurdan ve hatin bikevtin.

Careke din jî her di dema hêjayê Umer de, (Xjrb) -Xwedê jê razî be-, hinan ji Kurdan welatê Kerxayê navînî yanjî (beşê Saymara[161] û Masabazan) dane bidagîrkirin; li ser vê jî de hêjayê Umer, (Xjrb), Qeys Ibin Sulme El-Eşceî[162] ji bona ser wan Kurdan date binardin û wî ew datin bisertewandin. (Mêjûwa Netewên Musulman, r. 329).

Ibin El-Feqîh[163] dibêje: Miletê Ereb li pêş derkevtina musulmantîyê de ji bona nava Şarezorê hatibûn bikevtin. Lêbelê bajarên Bazabda û Samvan inca li sala 22 k. de û li paş şerekî zor sengîn û tûj de bi destên Musulmanan ve hatin bikevtin.

[158]Di Ibin El-Esîr de bergê 3, R. 16-18 de, ku Ebi Musa El-Eşerî li Bibîtroz de li Ehwaz de pêrgî Kurdan bûye.

[159]Yanjî Pesa ew ji bal Sarîye Ibin Zenîm El-Duelî hate dorlêgirtin û vekirin.

[160]Peyva Ekrad Faris di R. 18, bergê 3 Ibin El-Esîr de hatîye.

[161]Ew bajarê herema Çandeqa kevnare.

[162]Di Ibin El-Esîr de ew Selmet Ibin Qeys El-Eşceî ye. (M.E.).

[163]Ew Ebu Bekir El-Hemezani ye, yê ku wî Kitaba Elbuldan-nivîsta welatan di 290 k.- 903 z. de dayite binivîsandin.

Institut kurde de Paris

Li sala 25 k.- 666 z. de û di dema serdarîya wilayeta Ebu Musa El-Eşerî de li Besra de du caran Kurd li Ehwaz û Fars de serê xwe dane bihildan.

Di pêla Xilafeta Ebdul-Melek Ibin Merwan de Kurdan yarmetîya Ebd-El- Rehman Ibin El- Eş-es[164] dane bikirin; jibervêjî ew tûşî zordarî û kîna El- Hecac Ibin El-Yusif El- Seqefî bûn û wî kuştdareke zor li nava wan de date bikirin.

Li sala 108 k.- 726 z. de û di pêla walitîya Muslime.de welatê Ezerbêcanê û di sala 112 k. 730 z. de mayînên Kurdistanê jî tûşî vegirtin û wêrankirinên Turkên Xezer bûn[165]. Walîyê Kurdistanê Cerah li bajarê Erdebîl de çardorî lê date bigirtin û ew li wir de hate bikuştin.

Şepolên Vegirtinên wan tanî Musilê hatin biderkevtin. Li vir de Seîd El-Cerşî hêzeke pirî pir li Xelkên wan navan de date bikomkirin û wî ew Vegirtvanên hanê date bişikandin, ew ji Kurdistanê dane biderkirin û talanî jî ji wan date bisitandin. (Musewer Tarix El-Islam).

Belam li cîgehê xelatkirinê de Xelîfe Hîşam Seîd lilabird. Di pêşî de ji dilva Seîd Birayê wî Musulme û di paş salekê de Mohemed Ibin Merwan[166] li ser Kurdistanê de bi Walî ve date binîşankirin.

Li sala 129 k.-734 Z de Kurdan yarmetîya leşkerê Xelife Merwanê duwem beramber bi Sulêmanê[167] Serhildayê li Kurdistanê de dijî Mer-

---

[164]Ev Merovê hanê li ber Hecac de rabû û wî ligel Kurdên Faris de di sala 83 k.- 702 z. de peymanek date bigirêdan û hêrîşî ser Hecac de date kirin û wî ew pîs date şikenandin û bajarê Kofe jê date sitendin. Ji alîyê din jî de Kurdên Faris welatê Faris jî datin bidagîrkirin.

[165]ango Walîyê Ermînya û Ezirbêcanê. Ew El-Cerah Ibin Ebdulah El-Hekemi ye. Ew di sala 111 k. de, weku di Teberi de berge 8, bi Walî hate nîşankirin.

[166]Di Teberî de bergê 8, R. 217 ku Merwan Ibin Mohemed û ne Mohemed Ibin Merwan di sala 111 k. de bi Walî li ser Ermînya û Ezirbêcanê hatîye nîşankirin. (M. E.).

[167]Ew Sulêman Ibin Hişam Ibin Ebdul-Melike. Wî xwest Merwan bide xistin, jiber

Institut kurde de Paris

wan dane bikirin. Bi xwe jî ev Xelîfe ye, yê ku ew li layê Dêya xwe jî de Kurd bû. Li dema walitîya Bavê xwe de ew li Kurdistanê bi Dunyayê ve hatibû[168] Ew li paş Bave xwe jî de ji bona Cezîrê û Ermînya bi Walî bû. Merwan, yê ku wî beramber bi Xelîfe Ibrahîm[169] serê xwe date bihildan, bi leşkerekî Kurdistanî ve bi ser Şam ve çû û di navbera Balebek û Şam de Orduwa Xelife date bişikenandin û Şam date biwergirtin û Xilafeta xwe di sala 132 k. -749 z.- de date bidazanîn.

Li herayê daxwaza Ebasî û Serhildana Ebi Muslimê Xuresanî de[170] beramber bi Emewî ve Qehtube Ibin Şebîb bi xwe ve Eba El-iyûn Ebdul-Melik El-Xuresani[171] ligel leşkerekî de bi ser Şarezorê ve date binardin û wî leşkerî ligel Serleşkerê Xelifê Mewrwan Osan Ibin Su-

vêjî ew li ser wî rabû. Deng bi Merwan ve gihişt. Ew wê demê li Beqreqîsya bû. Wî bi Leşkerê xwe li nêzîka gundê Xesaf de li ser Xakê Qensirîn de Şer ligel Sulêman kir. Di Encam de Sulêman revya.

[168]Ew Mohemed Ibin Merwan Ibin El-Hekem El-Emewî ye. Ew mîna Kurê xwe li ser Cezîrê û Ermînya de Walî bû, berî ku ew bi Xelîfe be. Bavê wî gava Ibrahîm El-Eşter kuşt, Wî ji nik wî Jineke Kurd ji xwe re bir û ev Merwanê hanê di sala 70 k. de ji Wê Pîrekê jê re bû.

[169]Ew Ibrahim Ibin El-Welîde, yê ku Birayê wî Yezîdê Sêyem jê re sozê Şuna xwe dayê û di piştî wî re sozê Şunê ji bona Ebdul-El-Eziz Ibin El-Hac Ibin Ebdul-El-Melek da. Gava Birayê wî Yezîd mir bi Şungîrîya vî Ibrahimî Merwan Ibin Mohemed Ibin Merwan Walîyê Cezîrê û Ermînya pê nehate rûniştin. Ew bi leşkerê xwe ve ji Cezîrê ji bona ser Şamê çu. Wî Şam girt. Xelkê ew bi Xelîfe kir. Ibrahim bazda û lê hate buhurandin. Mêjûvan vî Ibrahimî bi Xelîfe danayînin. Ev di sala 127 k.- 744 z. de bû. Ew ne di sala 132 k.- 749 z. de bû; jiber di vê salê de dewleta Emewî hate rûxandin û dewleta Ebasî hate destpêkirin.

[170]Ew Ebdul-Rehman Kurê Muslime, yê ku ew bi navê Muslimê Xuresanî bi nav û bange. goyên cuda li ser Malbata wî de têtin bidîtin. Bi pirbûn ew ji koke Kurdîyî kevnare. Hin ji Xweşxuwanên Ebi Delamet li nik Xelkan-Xelîlkan de û Jîyana Cenawer de li ser Şêr dibêje:
Te di dewleta Mensur de xwestîye bêbextîyê lêbide kirin
Bavpîrên teyî Kurd her bêbextîyê li Xelkê de didin kirin

[171]Ji xwe re li Ibin El-Esir bergê 5, R. 159, 162 de û herwehajî li Musewer Tarîx El-Isalm de (Ebu El-Iyon) bide temaşekirin.

Institut Kurde de Paris

fyan de date bişerkirin û li sala 131 k. -748 z.- de wî bajar date bidagîrkirin. Sala duwayî Qehtube ligel Ibin Hureyre [172] Serleşkerê Xelifê Merwan de li Helwanê de date bişerkirin û ew jî date bidagîrkirin. (El-Teberî, b. 9, r. 131).

Di pêla Xilafeta Ebu El-Ebas Ebdulah El-Sefah de Walîyê Cezîrê, Kurdistan û Ezerbêcan de Ebû Cafer El Mensuri Biryê wî bû. Di vê pêlê de leşkerê Rom hêrîşî ser Kurdistanê date bikirin[173].

Ebû Muslim li nêzîkî Nisêbînê de li sala 137 k. -763 z.- de Ebdula Ibin Elî date bişikenandin[174].

Kurd li pêla Xilafa Ebu Cafer El-Mensur de têkelî serhildanên Kurdistan û Hemedanê bûn[175].

Li sala 147 k. -774 z.- de Xuwarzimê Isterxan ligel orduwekî Turk de hêrîş bi ser Jorî Kurdistan û Ermnistanê de date bibirin û ew welat dane bitalankirin. Li paş jî de Teflîs-Teblîs jî date bizeftkirin û bitalankirin.

Serekê Eşîra Rawendi Herb Kurê Eb Dula li ber wî de gelekî beramberî û liberxwedan date bikirin û li encam de ew hate bikuştin[176].

Institut kurde de Paris

[172]Ew Yezîd Ibin Umer Ibin Hureyre ye. Ew ji bal Merwanê Duwemê Emewî bi Mîrîtî li ser Îraqê hate bidanîn.

[173]Di Teberî de û Ibin El-Esîr de ku Rom hêrîş ji bona ser Cezîrê û Ermînya birin û wan Meletyê û Kilîkya bi alîkarîya Ermenan ji xwe re zeftkirin.

[174]Ew Apê Mensure. Ew li ber wî rabû û wî ji xwe re Xilafet dixwest. Ebu Muslim li nêzîkî Nisêbînê de ew date bezandin. (M. E.).

[175]Bi nav û bangtirîn Şûreşa Sindebadê Megosî-Mecosî li Xuresanê de ye û pitşgirtina wê ji alîyê Xelkên Çiya ye.

[176]Di sala 158 k. Mesrur El-Belxî şerek li ser Kurdên Yaqubî dayite vêxistin. (Teberî, bergê 10).

Xelife Mehdi li duwayî şerê Bîzantî 163 k. -779 z.- de Harun El-Reşîdê Kurê xwe bi Walî ve li ser Kurdistan, Ezerbêcan û welatên Rojavayî de date bidanîn.

Miletê Xezer di pêla Harun El-Reşîd[177] jî de hêrîşa Kurdistanê date bikirin û zor sitemkarî û vegurandin dane bikirin, lêbelê Xelîfe jî bi tundî ve beramberîya wan date bikirin, zor ji wan dane bikuştin û ew ji nava welêt dane biderkirin. (183 k. -799 z.- de).

Keleha Sîser-bajarê Sune-Senendec û Êlên Kurdîyî li dora wê de ew li jêrdestîya Xelife Mamûnê Ebasî de bûn. Wî ji wan di cengên xwe de ligel Birayê xwe Amîn de li ser Xilafetê de sûd ji xwe re ji wan date biwergirtin.

Piştî derbasbûna pêlekê yekekî ji Xulefa ew Eşîrên Kurd ji bona hin wilayetên din dane biveguhestin. (Welatê Xulefayî Rojhilatî, r. 190).

Di pêla Xilafeta Mutesem Bil-lah de û li sala 225 k. -840 z.- de li dorhêla Musilê de serhildaneke Kurd li jêr serpereştîya Caferê Meher Hesen-Mîr Hesen[178] de hate birûdan. Cafer yekek li Xanedanê Kurd bû.

Di pêşî de ew beramberî hêzên Xelîfe li Baba Kêş de hate bişikenandin; belam li dawî de li şaxên Dasîn de orduwê Xelife date bişikenandin û gelek ji wan date bidîlkirin.

Cara duwem li Jêr Komandarîya Turk Aytax de û li sala 226 k. de orduwekî tir Xelife bi ser de date binardin. Şerîkî giran date birûdan.

---

[177]Di Teberî de hatîye, ku Reşîd di sala 174 de ji bona Baqerdê û Bazebdê hatîye û wî li Baqerdê Kaxek daye avakirin. Xweşxuvanekî gotîye:
Li Baqerdê û Bazebdê de Havîngeh û Mêrgên pirin
li nava wan de Ava pirî sar û şêrin mîna Selseblin
Li Bexdada malwêran de xak û ava wê her germin

[178] Di Teberî de bergê 11, R. 227 de Cafer Kurê Meher Hesen Kurdî ew li hêla Mateîs de hate bezandin.

Institut kurde de Paris

Cafer hate bişikestin û Aytax kuştarekî zorî zor date bikirin. Kuştin û vegurandin bi pileyekî ve hate bigihaştin, ku bi rastî jî ve beramberî vê vegurandina hanê mêjû bi rûsar ve tête biderkevtin[179]. Cafer dîsan jî xwe neda biberdestkirin û bi xwe ve jehr date bivexwarin û bi peyayî ve hate bimirin. (El-Kamil, bergê 6, r. 208).

Li sala 231 k. -846 z.- de li Isfehanê de , li Çiya û Fars de serhildaneke tirî Kurd date birûdan û ew ji bal leşkerekî taybetî ve li bin Komandarîy Wesif de hate bitemirandin.

Kurd li sala (252 k. -866 z.- de têkelî Raperîna Mensor-Mesawirê[180] Derketîvan bûn.

Li sala 262 k. -875 z.- de Kurd beşdarî herayên Dîlê Reş Esrayê Zincî[181] û yaqubê Sefar bûn[182]. Kurd di nava wan heran de bi karên pir mezin ve hatin birabûn û nemaze yekekî ji Serokên Kurd bi navê Mohemedê Kurê Eb-Dulahê hezar Merd ve pir îş dane bikirin û tanî sê salan wî xwe ji bona wan daxwazan niwand û ew yeke Peye bû.

Li sala 281 k. -894 z.- de Kurdan ji bona damezrandina dewleta Hemdanî zor komek pê dane bikirin[183].

Di sala 293 k. -906 z.- [184]de Mohemedê Kurê Hilal, yê ku ew Gewreyê Eşîra Hazbeni bû, ligel Eşîra xwe de serhildan dane bikirin û tanî

[179]Ev Îtaxê sitemkar li ser hinek setemkarî û sitembarîya wî di dawî de Xelîfe El-Mutewekil Ela El-lah hate tûrekirin. Wî ew ji bona nava binê Zinadanê date avêtin. Ew ji tîna mir û wî siza karên xweyî bed wergirt.

[180]Ew Musawir Kurê Ebdul-Hemide, El-Şarî bi bewazîca ji Musilê derket (Teberî bergê 11, R. 200, 256).

[181]Şûreşa Zenc li dora Besara de ji sala 255-270 k. de date bidirêjkirin.

[182]Ew Yaqubi Kurê Leys El-Sefare. (M. E.).

[183]Di Teberî de, bergê 11, R. 243 de ew Ebdulah Ibin Azarmerd El-Kurdi.

[184]Di Teberi de, bergê 11, R. 324 de di vê salê de Kurd û Ereb li Cezîrê de havgirtin.

Institut kurde de Paris

nêzîka Musil hate bigihandin. Taze Walîyê Musilê Ebû El-Hica Eb-dulah Ibin Hemdan xwe bi ser wan ve date bikişandin û ew li Merobe li ser Xazer[185] de tûşî wan bû û ew bi nava hev ve hatin biketvin.

Lêbelê Ebu El-Hica nehate biserkevtin. Yekek li Merovên wî bi navê Sulêmanê El-Hemdanî ve li vê herayê de hate bikuştin û Ebu El-Hica bi dilşekestî ve ji bona Musilê hate bivegerandin.

Wî yarmetî ji Xelîfê Ebasî El-Muktefî Bil-lah de date bidax-wazkirin. Sala duwayî komek ji bona wî hate bikirin û ew bi şûn Hazbenî ve hate bikevtin. Pênc hezar mal ji vê Eşîrê bi nava çiyan ve hatin bikevtin û gava ku ew tengnav bûn, Serekê wan bi fêl ve daxwaza hajbûnê date bikirin û wî bi vî rengî ve Ebu El-Hica date bixapandin, tanî ku Eşîra wî der çû û rûwê xwe ber bi welatê Ezerbêcanê ve dane bivekirin. Mohemed bi xwe ve ew li çiyayê Qendîlê de hate bimayîn. Li dawîya dawî de Ebu El -Hica dor lê date bigirtin û ew date bitengavkirin; lê ev jî sûda wê nebû. Mohemed jî xwe rizgarkir û ew jî bi Ezerbêcan ve hate bigihaştin. Cara duwayî yarmetîyeke tir ji bal Xelife ji bona Ebu El-Hica hate binardin. Vê carê bi hêzeke pirî zortir ve wî disan bi ser wan ve date bidadan û li hemû layekî de dor li wan de date bigirtin û Kurd berdest bûn. Mohemed Kurê Hilal li Musilê de date bidanîn û ev hera hanê hate bikujandindin. (El-Kamil, b. 7, r. 213)[186].

Li dema Xelife El-Muqteder Bil-lah jî de hin serhildanên din mîna serhildana Ebdul-lah Kurê Ibrahim[187] ligel deh hezar Kurd de li dora Isfehanê de û serhildana dora Musilê de hate birûdan.

Institut Kurde de Paris

---

[185]Rûbarekî Biçûke ji Rûbarên Zabê Bilinde. (M. E.).

[186] Die, ku ev di Çapa Ewropî de; jiber di Çapa Misrî de jimara Rûpelê 192 de ye.

[187]Di Teberî de di bergê 11 de di sala 295 k. de weha hatîye: Ebdulah îbin îbrahim El-Mesmeî li Isfehanê di vê sale de hate biderbikevtin û Deh hezar Kurd xwe li dora wî danehev ... Di Kamil de bergê 8, R. 5 de hatîye: Ew Kurdeki di vê salê de li ser Musiê de biserketîbû.

Di vê navê de ji bal Deysem Kurê Ibrahim[188]de bingehê dewleta Hazbenî hate bidanîn û li dawî de ji bal Kurên Mohemed El-Rewadi de serdarî li ser de dane bidanîn û dewleta Rewadî lê hate bipeydabûn û wî tanî sedsalê heftemûn date bidirêjkirin. (Temaşeyî bergê duwem bikin). Eşîra Hazbeni li çûna Ezerbêcanîyî Hisên Hemdani de ligel wî de bûn û ew tanî Selmas çûn. (337 k. -948 z.-)

Li sala 340 k. -951 z.- de yekemîn dewleta Kurd dewleta Şedadi li Jorî Ezerbêcan û Jêrî Rojavayî Qefqasya de hate bipêkhatin û wê tanî sala 595 k. -1164 z.- de date bidirêjkirin[189].

Li sala 348 k. -959 z.- de duwemîn dewleta Kurd Hesnewûye-Berzîkani li welatê Çiya de hate bipêkhatin û wê tanî 406 k. -1015 z.- de date bidirêjkirin[190].

Institut kurde de Paris

## Kurd di Pêla Al Boyê de

Di dema Muez El-Dewle de bajarê Şarezorê çend caran şer û mer têde hatin bikirin û têde hin serhildan hatin bipeydabûn. Hacibê[191] Sebketkîn li sala 344 k. -955 z.- de bi leşkerekî bi hêz ve bi ser Şarezorê ve hate bidakevtin û demekê çardora wê date bigirtin û di

[188]Di Kamil de, bergê 8, R. 123, 136 de hatîye: ku Deysem îbin Ibrahim El-Kurdî digot, ew û Bavê xwe li Ser Rêça El-şurat bûn.(M. E.).

[189]Li ser Dewletên Kurd de di bergê duwem de ji vê nivîsta hanê dê emê bi dirêjî biaxivin. Li vir de bes û bi tenha emê li ser mêjûwa bipêkhatin û dirêjbûna serdarîya wan dewletan bidin biaxivtin.

[190]Ew Hesnewîyê Kurê Husênê Kurdê Berzîkanî ye, mîna ku ev di Ibin El-Esîr de, bergê 8, R. 55 de hatîye. Ew di sala 369 de li Sermac de Mirî ye. Ew li ser Leşkerekî jiberzîkan Mîr bû, ku jêre Berzînîye dihate gotin. Xalên wî Wendad û Xanim kurê Ehmed bûn. Ew du Mîrên bi rengî din bûn û ew bi Eyşanîyê bi nav dibûn. Ew li dorhêla Dinur, Hemedan, Nehawend, Samgan û hin cihên din ji Ezirbêcanê tanî sînorên Şarezorê pêncî salî hatibûn biserbikevtin. Her yekî ji wan serdarîya bi hezaran Leşker dikir. Xanim di sala 350 k. mir. Kurê wî Bavê salim Deysem Kurê Xanim cihê wî keleha Qesnan bû. Ew ji bal Ibin El-Emîd hate nabûdkirin.

[191]Di Ibin El-Esîr de hatîye, ku El-Hacib Sebketkîn ji bal Meez El-Dewle ji bona Şahrezorê hatîye binardin. (M. E.).

dawî de ji bona yarmetîya Rikin El-Dewle devjê date biberdan û ew ji bona Rê çû.

Li dema Muez El-Dewle de Keyên Hemdanî jî hin ceng û şer li Kurdistana navînî de pê hatin birabûn. Seyf El- Dewle Serdarê Helebê li sala 354 k. -965 z.- de li Bedlîs û Xelatê date biçardorîgirtin. Ev bajarên hanê bi destê Birayê Xulamekî wî ve bûn, yê ku wî li ber wî de serê xwe dabû bihildan. ( Serpêhatîyên Netewan, bergê 2).

Li rûdana Ebu Texeleb de, Eded El-Dewle ji bona peyketina wî Ebu El-Wefa bi leşkerekî ve ji bona Kurdistana navînî date binardin[192] û bajarên wî bere bere dane bizeftkirin. Miyafarqîn li dawîya sê mehan de ji dorlêgirtinê û fen û xapandinê ew date bivegirtin. Ebu El-Wefa[193] bi leşkerekî ve Amed çardorîkir û li dawîya reva Ebu Texeleb de bajar di sal 368 k. -978 z.- de date bigirtin.

Li sala 369 k. -979 z.- de Eded El-Dewle leşkerek bi ser Kurdên Şarezorê ve date binardin û nêta wî jî ev bû, ku ew wan li Eşîra Beni Şeybanê Erebî de bide bicihêkirin: jiber Kurdên vî welatî ligel vê Eşîrê de biyekbûn û hevtêkelbûn. Leşkerê Eded El-Dewle şarê Şarezorê date bigirtin û Erebên Benî Şeyban ber bi Biyabanê ve ji xwe re reviyan. Ew bi şûn wan ve hate bikevtin û kuştarekî zor li wan de date bikirin. (El-Kamil, bergê 8).

Sala li pêş vê herayê de Kurdê Kurê Bedoye[194] bi yarmetîya Hemdani Ebû Texleb ve li Erdameş[195] de dewleteke serbixwe date bidamezirandin. Belam ewendi pê neçû, ku Eded El-Dewle ew têkda û ew bi jêrdestê xwe ve date bixistin.

[192]Ew Fedil Elah Ibin Nasir El-Dewle Ibin Hemdan ne. Dêya Fatîme Keça Ehmedê Kurdî ye. Ew di Sefer de di sala 369 k. hate kuştin, Piştî ku Keyetîya wî li ser destê Eded El-Dewle de hate nabûdkirin.

[193]Ibin El-Esîr bergê 8, R. 5. (M. E.).

[194]Ne di Kamil de û nejî di Ibin El-Esir de li ser Rûdanên Hemdanîyan û yên din de tu agehdarî bi destên min ve nehatin bikevtin.

[195]Bi vî bajarî Gawaşi jî dibêjin. Li gora Yaqut El-Hemewî El-Rumî di Ferhenga welatan de ew li nêzîka Cudî tête bikevtin. (Renge, ku ew Armişat be, yê ku navê wî di Şerefnama Farisî de hatîye. M. E.).

Eded El-Dewle li sala 370 k. -980 z.- de orduyek ji bona ser Kurdên Hekarê date binardin û çardora wan date bigirtin û li paş soza parastina jîyan û malên wan de ew berdest bûn. Lêbelê tevî soz û peymana xwe ji bona wan jî wî hemû kuştin. (El-Kamil).

Di vê pêlê jî de Baz Ebu El-şuca[196] bigehê dewleta xwe date bidanîn. Ew bi xwe jî ve Serokê Eşîra Hemêdî bû. Di nava bîst salan de li Kurdistana navînî de li Diyarbekir, Arcîş û Miyafarqûn de xwe date bifirehkirin. Li paş de Xuwarzê wî Ebu Eli Kurê Merwan şûna wî date bigirtin. Ev dewleta hanê pir bi hêz û hiner bû û wê tanî sala 489 k. - 1096 z.- de, ango nêzîka sed û deh salan date bidirêjkirin. (Ji bona dirîjbûnê temaşeyî bergê duwem bidin bikirin).

Li dewrana Xilafeta El-Qadir bil-lah de Mêjûvan li ser yekekî ji Serokên Kurd de dide biaxivtin, ku navê wî Ehmedê Kurê Zehak bû. Ev Merovê hanê li mêjûwa 381 k.- 991 z. de ligel leşkerê Misri rûwê xwe ber bi keleha Afaye ve date bivekirin, ya ku ew li qeraxê çemê Asî[197] bû. L'eşkerê Misrî di bin serpereştîya Cîş Kurê Mohemed El-Semam[198] de bû, ew pîs şikest. Bes û bi tenha ve navîna wîna li ser pênc sed Suwarî de hatė birawestandin. Li vê bêhnê de Ehmedê Kurê Zehakê Selîl xwe bi ser Komadarê Rom ve date bikişandin û ew date bikuştin. Weha bi vî rengî ve orduwê Rom hate bişikenandin. (Serpêhatîya Netewan)[199].

Di navbera 366 k.- 976 z. de û 388 k.- 998 z. de zor şer û mer li ser maldarîya Corcan de di navbera Al Boye û Ziyri de bûye, Kurd jî di nava wan şer û meran de beşdar hate bibeşdarbûn; Mehmud Xazan[200]

---

[196]Weha di kokê de ye. Di Kanîyên Ereb û yên kevnarîyî din de Baz-Bad El-Kurdî hatîye. Ji xwe re li Kamil, bergê 9, R. 13, 23 bide temaşekirin. Di Wir de hatîye, ku ev Bazê Kurdî navê wî Ebu Ebdulah El-Husên Ibin Dostek bû û ew ji Kurdê Hemêdî ye. Wi pir hêrîşa hêla Diyarbekrê dikir û bi vê navê wî hate biderbikevtin.

[197]Herwehajî ew bi navê Çemê Servajî tête binavkirin.

[198] Serleşkerekî ji Serleşkerên Fatimî bû.

[199]Ji xwe re li R. 118 Çapa Misrîyî sala 1333 k.- 1915 z. de li Qahire de bide temaşekirin. (M. E.).

[200]Diyare, ku ew Mehmudê Xeznewî ye û ew ne Laxazê Megolî ye.

Institut kurde de Paris

jî beramber bi Turkên Qerexani ve zor ji hêza Kurd sûd ji xwe re dayite bisitendin. (El-Utbi).

Di vê pêla hanê de 380 k. -990 z.- jî de dewletek Kurdîyî bi deng ve bi navê Beni Inaz[201] ve hate bipêkhatin. Geh ew biserxwe bû, geh jî ew vegirêdayî bû. Wê heftê salî date bidirêjkirin.

Kurd li şer û merên navxweyî Alboye de û li hêrîşên Eşîra Beni Uqeyl de bi ser Musilê ve û li şerê Alboye de li Fars û Xuzistanê de jihatîyên gelek niwandin.

Li sal 397 k. -1007 z.- de Beha El-Dewle leşkerek bi ser Kurdên Bendîcan ve date binardin û şerekî giran di navbera wan de hate bilidarketin. Leşkerê Beha El-Dewle hate bişikestin û talnîyeke pir bi destên Kurdan ve hate bikevtin[202].

Di sala 411 k. -1020 z.- de Şemis El-Dewle[203] serhildana leşkerîyî Turk bes û bi tenha ve bi yarmetîya Kurd ve date bivemirandin û leşkerê Turk date bilinavbirdin. (El-Kamil, bergê 9)[204].

Institut kurde de Paris

---

[201]Ji wan jî Ebu- El-Fetih Enaz Qerqemîs di sala 400 k. de dane vegirtin, mîna ku ev di Ibin El-Esîr de, bergê 2 hatîye. Ji Şerefnama Farîsî li ser Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd tête biderbikevtin, ku rastîya vî navî Eyar û ew ne Enaze. Dibe, ku di kanîyên Erebî de mîna Ibin El-Esîr û yên din de ew ji veguhertina Eyar hatibe biwergirtin. Li nik Ibin El-Esîr de di bergê 9 de li ser şer de di navbera Ebî El-Fetih Ibin El-Şok Ibin Mohemed Ibin Eyaz de û Apê wî Ebi El-Macid Muhelhel Ibin Mohemed Ibin Enaz hatîye.

[202]Di Ibin El-Esîr de, bergê 9, R. 71 di bin nav û nîşana Birxistina Cengê di navbera Leşkerê Beha- El-Dewle û Kurd de hatîye, ku di vê salê de Emîd El-Ciyuş sipahek di bin Rêberîya Serleşkerekî Dêlêmî de ji bona ser Bendîncibîn bir.

[203]Ew Şems El-Dewle Ebu Tahir Ibin Fexir El-Dewle Xwedîyê Hemedanê ye. Ev Gelacîya hanê di nava Leşkerê wîyî Turk û Kurd de hate vêxistin. Wê Herduwên pêşî dane nabûdkirin.

[204] Di sala 417 k.- 1026 z. de di navbera Ela-El-Dîn Kakwîye û Kurdên Cozqanê de şer bû. Ela-El-Dîn Eba El-Fereh El-Baboyî li ser wan bi Serek date bidanîn. Ew ji Tirekî ji wan bû. (Kakwîyî bi Farîsî ango Xal- ji Ibin El-Esir). Diyare, ku ev di Kurdîya welatê Faris de tête bikaranîn.

## *Derîyê Çarem*

### 1. Tanî Pêla Îlxanî

Oxoz, yê ku ew Pêşrewê Silcoqyan bûn, ji welatê Rê helsan û berê xwe ber bi welatên Rojava ve di sala 420 k. -1029 z.- de dane bivekirin. Yekekî ji Serleşkerê Xeznevî bi navê Taş Feraş ve[205] ligel sê hezar Suwar de, yên ku beşekî ji wan Kurd bûn, rêgeh li wan de dane bigirtin û şer di nava wan de hate bivêketin.

Lihev hate birasthatin, ku Gewreyê Kurd bi destê Oxoz ve hate bikevtin û bi zor ve pê Kaxezek ji bona Kurdên din date binivîsandin, da ku ew li şer de dest bidin bihilgirin. Weha bi vî corê hanê ve Oxoz hatin biserkevtin û ew hatin bipêşveketin.

Li sala 429 k.-1037 z. de Oxoz bi dewr û berên Şarê Meraxe ve hatin bigihaştin û wan Şarê Meraxe dane bitalan û biwêrankirin û zor ji Xelkên wê dane bikuştin. Li dawîya vêna de wan hêrîş bi ser Eşîra Hazbeni ve dane bibirin û kuştarekî zor li wan de dane bikirin.

Di dawîya dawî de Elên Kurdên li wê navê de ligel Serdarê Ezerbêcanê[206] de peymanek dane bigirêdan û wan ligel hev de beramberîyeke zor dijî Oxoz bi tundî ve dane bikirin. Bi vî rengî ve

[205]Ew Hacib El-Sultan Mesude. (M. E.).

[206] Mîna ku li nik Ibin El-Esîr de hatîye, Serdarê Ezirbêcanê Wehsozanê Kurê Mehlan bû. (M. E.).

Institut kurde de Paris

wan Oxoz dene bivegerandin. Taqimekî tir ji wan ta Ermînya çûbûn. Li wê derê de kuştarek û talanîyeke zor wan dane bikirin. Ew ber bi paş ve hatin bivegerandin û ew ji bona dor û berên (Ormiyê-Wirmiyê) bi ser Xêlatên Êlên Ebu El-Hicayê Hazbeni[207] ve hatin bikevtin.

Van Kurdên hanê bi serûştî ve şerekî qurs ligel wan de dane bikirin, belam zora Oxozan li encam de Kurd dane bişerpezekirin û ew ji hevdû dane bibelawelakirin.

Li sala 420 k.-1029 z. de dewleta Rewadîyî Kurdî li Tebrîzê hate bipêkhatin. Danîvanê vê dewleta hanê Wahsozanê Kurê Mamelan bû[208].

Vê dewleta hanê tanî sala 426 k.-1035 z. de[209] date bidirêjkirin. Dewleta Dêsem pêşrevê vê dewleta hanê bû[210].

Li sala 421 k.-1030 z. de dewleta Şubankare-Şivankareyê[211] Kurd li welatê Faris de hate bidamezirandin û wê bi her rengî ve tanî sala 756 k.-1355 z. de date bidûmkirin.

Li sala 432 k.-1040 z. de Wahsozanê Kurê Mamelan bi fêl û fen ve tevaya Serokên Oxozan date bigirtin. Hemû bi dest û pişt ve dane bibestkirin û hêrîş bi ser leşkerên wan ve date bibirin. Zor li wan de date bikuştin.

Institut kurde de Paris

---

[207]Ew Ebu El-Hîca El-Dewle El-Kurdî bû. Ew Serokê Kurdê Ezirbêcanê bû û Xuwarzê Wehsozanê Kurê Mehlan bû (îbin El-Esîr, bergê 9, R 163).

[208]Diyare, ku ew Wehsozanê Mehlanê Serdarê Ezirbêcanê yê. Ji xwe re li El-Kamil bergê 9, R. 145, Çapa Misrî bide temaşekirin.

[209]Mêjû bi şasî hatîye biwergirtin.

[210]Di sala 421 k.- 1031 z. de Hêrîşa Fedlon El-Kurdî bû. El-Xezer di Ibîn El-Esîr de bergê 9.

[211]Ji xwe re li Farisnama Capkirî li Ewropa de bi zimanê Farîsî, li Mesalik El-Ebsar ya Fedle-Lah Ibin El-Emri Destnivîsa li Nivîstokxana Misrî de jimara 8 M û. li Şerefnama Farisiyî çapkirî li Mosko 1860 û li Qahire 1930 bide temaşekirin.

Belam Qolê Ormiyê li vê rizgar bû. Wan rû ber bi welatê Hekarê ve date bivekirin, ya ku ew wê çaxê ji wilayeta Musilê bû. Wan li wê derê de talankirinek zor dane bikirin.

Di wê gava ku ew di nava çiyan de gîro mabûn, Kurdên wan navan li hemû alîyekî de dora wan dane bigirtin û hezar û pêncsed kes ji wan dane bikuştin. Zor jî Dîl ji wan dane bigirtin. Talanekî baş jî bi dest wan ve hate bikevtin û li nava wan Dîlvanan de heft Mîrên Oxoz jî hebûn.

Bi nêzîkbûna orduwa Toxur Beg ve[212] Oxoz ji tirsa nemankirina xwe hatin bipêşveketin. Qolekî ji wan li jêrî Komandarîya Mîrekî ji wan de bi navê Mensur ve bi ser zozan ve rûwê xwe ber bi Cezîra Ibin Umer ve date bivekirin.

Hêjî ew li Rojhalatî vî welatê hanê de bûn, Qolekîtir ji wan di bin Komandarîya Boxa-Boqa de rû ber bi Diyarbekirê ve date bicedan û dest bi talankirina naveçeyê Kardo-Kardi[213], Bazabda, Hesînîyê[214] û Pêşxabûr-Fişxabûr[215] date bikirin.

Serdarê Cezîrê Sulêmanê Kurê Nesir[216] El-Dewleyê Merwanî gelekî Hozan bû û zanî, ku ev Oxozên hanê li pêş buharê de ew li welatê Cezîrê de netuwanin tê biperin; jiber vê jî wî bi ser bala xwe ve

Institut kurde de Paris

[212]Ev sipahê hanê di bin Rêberîya Ibrahim Yenal Birayê Sultan Toxril de bû.

[213]yanjî Kerda, Kardo Kurdo bû. Ew li Rojhilatî herema Cezîrê tête bikevtin. (M. E.).

[214]Li gora Yaqutê Hemewî ev bajarê Hesîniyî di navbera Musil û Cezîrê de bû. A. le Strange-Sitrênc dibêje, ku ew li ser Ava Xabûr û nêzîkî Zaxo bû; jibervêjî ew bi Xabura Hesîne dihate binavkirin.

[215]Ev Xabûrê Cezîrê ye. Ev ji welatê Hekarê û zozanê Derdikeve û ew bi ser Diclê de dire. Xabûrê duwem ew li Jorî Mozopotamya de ye. Ew bi Furatê li nêzîka Qerqîsa de, ya ku ew di Mejûwê de bi nav û bange, tête gihaştin. (M. E.).

[216] Di koka xwe de Sulêman Ibin Nasir El-Dewle El-Merwanî bû. Rastkirina wî ji bal Ibin El- Esîr bû.

date bixistin û bi vêlik ve Mensurê Komandarê Oxozan date bigirtin û bi yarmetîya Kurdên Başnavîyê Fênik ve[217] bi ser wan de date bihêrîşkirin û tanî dewr û berên Nisêbînê datin bibirin û zor ji wan dane bikuştin. Belam tevlivêjî welat ji zîyan û wêrankirina wan nehate biparastin.

Di dawîya dawî de wan xwe bi Diyarbekirê ve dane bigiyandin û hemû alî dane bitalan û biwêrankirin. Sedarê Diyaberkrêyî Merwanî malekî zor bi Oxozan ve date bidan û wî ew ji Diyarberê ve datin bidûrxistin..

Li dawî de wan rû ber bi dor û berên Musilê ve dane bivedan. Wan bajarê Musilê bi xwe jî ve du carî dabûn bizetfkirin. Wan talanî û kuştarekî bê jêmar dane bikirin. Qerwaşê Mîrê Musilê ji bona libewrxwedana Musilê hewara xwe bi ser Mîrên Ereb û Kurd ve date bibirin[218].

Li sala 463 k.-1071 z. de Romanos=Armanosê çeram Imperatprê Roma li deşta Melazgurd de hate bişikenadin û bidîlkirin. Hemû Ermînistan û Kurdistan bere bere bi destê dewleta Silcoqîyê Alp Ersilan ve hate bikevtin.

Ew Dewlet û Mîrneşînîyên kurd, yên ku ew hebûn, yek li dû yek de linavçûn û welatên wan bi destê Sulcoqîyan ve hate bikevtin[219].

Institut kurde de Paris

---

[217]Kelehek ji Kelehên mêjûyîyî Cizîra îbin Umer bû. Pir ji Kelehên Kurdî sengîn bû, ya ku têde Kurdên Peşnewî Beşekî ji Buxtî didan serdarîkirin. Şerefname dibêje, Kurdên Cezîra îbin Umer ji Kurdên Buxtî û Bencawî bûn.

[218]Di Ibin El-Esîr de bergê 9, R. 204 de dibêje, Kurdên Hemêdi li Akrê û dorhêla wê de bûn û Kurdên Hezbanî li Hewlêr û dorhêla wê bûn. (M. E.).

[219]Dewletên Selcoqî ji pênc Beran dihatin bipêkhatin:

1. Dewleta Selcoqên Xuresan, Rê, Çiya, Cezîrê, Faris û Ehwaz di sala 492 k.- 1099 z. de hate bipêkhatin û wê 93 salan date serdarîkirin.
2. Dewleta Selcoqên Kerman li sala 432 k.- 1040 z. de hate bipêkhatin û wê 150 salî date dirjêkirin.
3. Dewleta Selcoqên Iraq û Kurdistan di sala 511 k.- 1117 z. de hate bipêkhatin û wê 79 sala date bidirêjkirin.

Li sala 493 k..- 1100 z. de Dawîvanê Serdarê Merwanî, yê ku ew li Exlat-Xeylat-Xelatê de hatibû bimayîn, jiber bedbûna serpereştîya xwe û kîna Xelkê jê ve ew jî hate binemankirin û welatê wî be destê Sukman Qutbi ve Xulamê Etabikîyê Tevrîzê ve hate bikevtin.

Bi kurtî ve li vegirtinên Turkan de welatên Kurd, yên ku ew li ser rêyên wan de dihatin bidîtin, zor, zor ziyan bi wan ve hate bikevtin.

Ew dujminayetî û berberîya di nava wan de bû, wê nehişt, ku ew bi Komelî û Biratî ve beramber bi wan şepolan ve bi hêz û hiner ve bêtin birawestandin; jibervêjî beramberîya bi tenha ve bê kar û sûd bû. Bi ser û mal ve zor zîyan dîtin û hîç Miletekî tir bi qed Kurd ve li jêr dest û pê de neçûn.

Bi xwe jî ve ji destpêkirina mêjûwê de û tanî îro jî, heger em ji xwe re bi kûrî têde bidin biremankirin, dê emê bibînin, ku bedbextî û malwêrankirina vî Miletê hanê hemû bi carekê ve bi encamê berberî û duberîyên wan ve dihate biderkevtin.

Wehajî bi vî rengî jî ve tanî ev rewşa wanî hanê jî bide bidirêjkirin, dê ew jî her û her li jêr pê de bêtin bimayîn.

Bi rastî jî ve destana vegirtinên Turk ji bona Kurd zor bi tund ve dihatin biderkevtin, belam tevlivêjî çavên wan jî nehatin bişikenandin.

Serûştîya zikmakîya wan nehişt, ku ew bi bêhîvî ve bêtin bimayîn û ew serên xwe ji bona Vegirtvanan bidin bibitewandin. Hîç kêsek ji nava destên xwe nedidan biberdan, ku ew her û her ji bona mafeyê xweyî talankirî û serxwebûna xweyî windakirî li ber xwe de nedin bidan.

---

4. Dewleta Silcoqên Surî- Şam di sala 487k.- 1094 z. de hate bipêkhatin û wê 24 salan date bidirêjkirin.

5. Selcoqên welatê Rom (Enadol) di sala 470 k.- 1077 z. de hate bipêkhatin û wê 230 salî date bidirêjkirin ( mêjûwa Netewên Musumanan, El-Xudeyrî Beg, bergê 2, R. 468-471).

Institut kurde de Paris

Ew dihatin bikuştin û wan jî didane bikuştin, ew dihatin bitalankirin û wan jî didane bitalanîkirin. Hîç carekê ji caran jî bi tewawî ve ew girtîyê hîç Serdarîyekê û hêzekê ne hatibûn bikirin.

Di sedsalên yanzdeh û duwanzdehên zayînê de bi jêhatîyên bêhempa ve di mêrxasî û azaya xwe de di warên ceng û ser de ew pê hatin binîşandan.

Xelife û Patîşahên Turk di dema tengavîyên xwe de ew pêwistî bi yarmetîdana Kurd ve dihatin bikirin.

Bi rastî jî ve em dibînin, ku Melekşahê Sulcoqî beramber bi Qaûrtê Mamê xwe ve, yê ku ew Serdarê Kerman bû û wist, ku ew dewleta wî lê bide bizetfkirin, ji Kurd ji xwe re sûd date biwergirtîn. Beramber bi vê yamertîya hanê ve li nava Kermanê de erdên zor ji bona Kurdan hatin bidiyarîkirin. (Mesûd Ibin Xelkan).

Institut kurde de Paris

Li sala 499 k.- 1105 z. de[220] orduwê Mohemedê Kurê Melekşah li jêr serpereştîya Çawli Seqa[221] de bi ser Musilê ve hate bidakevtin.
Serdarê Hewlêr Ebu-El-Hicayê Hazbeni[222] ligel Serdarê Musilê Cegermiş de rê li wan de date bigirtin û şerekî qurs ligel wan de date bikirin.

Li sala 502 k.- 1108 z. de, gava ku orduwê Sultan Modud ji bona ser Çawli Seqa hate birakişandin, Ebu El-Hica û Nesri Kurê Muhelhel Ebu El-Şewqî ligel de bûn[223].

Li salên 496, 497, 503 k.- 1102, 1103, 1109 z. de di şerên Decîl, Mêrdîn û hin cigehên tir de bermaber bi pêrabûnên Kurd ve bi taybetî ve li ser wan de hatîye binivîsandin.

---

[220] Di El-Kamil de bergê 10, R. 158 de ew di sala 500 k. de bû.

[221] Li nik Ibin El-Esîr de Cawlî Seqawe bi du Wawan hatîye binivîsandin.

[222] Navê wî Ebû- El-Hîca Ibin Mosek El-Kurdî El-Hemezanî bû.

[223] ji xwe re li nik Ibin El-Esîr de li bergê 10, R. 172 de bide temaşekirin.

Li sala 504 k.-1110 z. de li çûna Mohemedê Kurê Melekşah de ji bona ser Surî de[224] Serokê Eşîra Rewadiyî Kurd, Serdarê Meraxa Ehmedîl Kurê Ibrahimê Salarê Kurê Wahsozan[225] û Mîr Ebû El-Hica Serdarê Hawlêrê bi xwe û leşkerên xwe ve ligel de hatibûn bibeşdarbûn.

Dewleta Fedlewîyî Loristan li nîvê sedsalê koçî de hate bipêkhatin û wê tanî nîvê sedsalê nehemîyî koçî de date bidirêjkirin. (Temaşeyî bergê duwem ji xwe re bidin bikirin).

## 2. Kurd di Pêla Etabekan de

Dewleta Erteqî-Ertekî: Bidanînvanê vê Dewletê Erteqê Peyê Melekşah bû. Ew li sala 495 k.- 1101 z. de li Hesen Kêfê hate bidamezirandin. Di dawî de di sala 502 k.- 1108 z. de bi du Beş bû: Hesen Kêf û Mêrdîn. Beşe Yekem di sala 620 k.- 1223 z. de û Beşe duwem di sala 811 k.- 1508 z. de ji bal Dewleta Qereqoyonlîyê Turkumanî hatin nabûdkirin.2. Dewleta Şah Eremen: ew di sala 583 k.- 1187 z. de li Xelatê de li ser destê Sokman Qutbî Peyê Qutib El-Dîn îsmaîlê Silcoqî Serdarê Tevrîzê-Tebrîzê hate bidamezirandin. Ew di sala 604 k.- 1207 z. de ji bal Dewleta Eyubî de hate nabûdkirin.3. Dewleta Zenkîye: ew li Musilê de ji bal Îmad El-Dîn Zenkî Ibin Iqisteqrî Peyê Melekşah di sala 512 k.- 1127z. de hate bidamezirandin. Ew zor fireh bû û jê Çend Qol peydabûn:Qolê Musilê: Wî Tanî sala 660k.- 1262 z. date bidirêjkirin. Megolan ew date nabûdkirin.Qolê Surî-Şamê: Ew ji bal dewleta Eyubî de di sala 577 k.- 1181 z. de hate nabûdkirin.Qolê Sincarê: Ew di sala 566 k.- 1170 z. de hate bipêkhatin

[224]Cûna sipahê Sultanî ji bona şerê Ferengan di sala 505 k.- 1111 z. de mîna ku ew li nik îbin El-Eşir de bergê 10, R. 183 hatîye.

[225]Ev Mîrê hanê di sala 510 k.- 1116 z. de li hêla Batinîyê de hate kuştin. Ji xwe re li El-Kamil bergê 10, R. 194 de bide temaşekirin.

Institut Kurde de Paris

û ew di sala 617 k.- 1220 z. de ji bal dewleta Eyubî de hate linavbirin.Qolê Cezîrê: ew di sala 576 k.- 1180 hate bipêkhatin û ew di sala 645 k.- 1247 z. de ji bal dewleta Eyubî de hate linavbirin.Qolê Hewlêrê: Ew di sala 539 k.- 1144 z. de hate bidamezirandin û ew di sala 630 k.- 1253 z. de ji bal dewleta Eyubî de hate qirkirin.4. dewleta Etabikê Ezirbêcanê: Ew ji bal Mîr Îldkiz di sala 536 k.- 1141 z. de hate bidamezirandin û wê tanî sala 630 k.- 1225 z. de date bidirêjkirin. Ew ji bal Xuwarzimîyan de hate nabûdkirin.5. dewleta Etabikê Loristan: Ew di sala 543 k.- 1148 z. de li ser destê Ebu Tahir Komandarê Etabika Faris de hate bidamezirandin û wê tanî sala 827 k.- 1424 z. de date bidirêjkirin. Ew ji bal Tîmorleng hate tar û markirin. (mêjûwa Netewên Musulmanan bergê 2)..

Beşekî ji van Etabekan de li Kurdistanê û dorhêlên wê de dewletek dane bidamezirandin û wan gelek îş di nava wan de dane bikirin; jibervêjî ligel mêjûwa Kurd û Kurdistanê jî de zor têkelîya wan tête biderkevtin. Ji Serdarên vê Xanedanê Îmad El-Dîn Zengî gelek cî û welatên Kurd ji xwe re dane bizetfkirin û ew ligel Kurd de her di şer û heran de dihatin biderkevtin.

Li sala 528 k.-1134 Z de Şarê Tanza[226], yê ku ew li qeraxê çepê ava Botan de bû, date bizeftkirin û ew bi xwe jî ve ligel Teymor Taşê Serdarê Mêrdînê de bi ser Diyarbekrê ve çûn û demekê jî çardorî lêgirtin. Lêbelê neyan tuwanî bidin bizeftkirin û wan ew bi cî ve date bihiştin.

Li vê demê jî de hêzeke tirjî ji bona ser Eşîra Hemîdiyê date binardin û hin ji kelehên wê mîna Akrê, Şûş ... hd. ji wan date bizetfkirin.

Hoyê vê hêrîşa Îmad El-Dîn eve bû, ku vê Eşîra hanê li jêr sermiyandarîya Serkê xwe Mîr Îsa de li çardorgirtina Musilê de wan yarî ji bona Xelîfeyê Ebasî El-Musterşêd dabûn bidan.

[226]Ji xwe re li Ibin El-Esîr bergê 11, R. 39 de bide temaşekirin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Serdarê Hewlêrê, Aşîb û wan navan Abu El-Hica Kurê Ebdul-lah[227] ji bona Musilê layê Îmad Ed-Dîn çû û ew li wê derê de ma, tanî ku ew mird.

Li dawîya Ebu El-Hica di navbera Dondên wîna de şer û pevçûn hatin bihelgirsandin. Îmad Ed-Dîn ev ji xwe re bi maneha destdirêjyê ve date bikirin û Şarê Aşîbê ji wan date bisitendin û keleha wê jî li sala 537 k.- 1142 z. de date biruxandin. Li vî şer û pevçûnê de wî pir ji Mîr û Axayên Kurd date bikuştin. Bere bere wî kelehên Xanedanê Ebu El-Hica ji xwe re datin bizeftkirin. Welatê Hekarê, şaxên Zozanê, çiyayên Sor, Heror, Şabanê, Rebîye... hd. wî yeke bi yeke ve ew ji bona jêr serdarîya xwe date bianîn. (Ibin El-Esîr, El-Kamil, bergê 11, r.6)

Imad Ed-Dîn li paş beynekê de keleha Celab-Gelab jî date bizeftkirin û ew li paş nûkirina wêna de bi navê xwe ve Imadîyê date binavkirin[228].

Imad Ed-Dîn li sala 534 k.-1139 z. de welatê Şarezorê ji Mîrê Qepçaqê Kurê Erselan taş de date bizeftkirin. Li sala 537 k.-1142 z. de hêzeke tirjî ji bona ser Hekarê wî date binardin û keleha Şabani date bizetfkirin û ew date binûkirin[229].

Li sala duwa pêş de wî îron, Xêzan, Sêrt, Husin El-Doq, Husin Zil-Qerneyn û hin ji kelehên tirjî dane bidagîrkirin û li dewrên

Institut kurde de Paris

---

[227]Yekek li Kurên vî Ebu El-Hîca de, ku navê wî Ehmed bû, bi Serdarê keleha Tûş hatibû bidanîn. Mîr Seyf El-Dîn Eli El-Meştobê bi nav û bang Kurê vî Ehmedî bû. Di dema ku Xaçperestan keleha Ako-Eka dor lê datin girtin, Ev Mîr Seyf El-Dîn ji bal Selah El-Dîn bi Komandarê keleha Eka hate bidanîn.

[228] Li gora çîroka Hemdul-Lah El-Mustewfî navê Îmadîyê ji navê Îmad El-Dewle Mîrê Deylemî hatîye, ku ew di sala 338 k.- 949 z. de têde dihate tîtin. Li layekîtir de Yaqut El-Hemewî dibêje, ku ev keleha hanê bi navê Imad El-Dîn Zenki hatîye binavkirin û ew li ser Kavilên keleha Aşîb hate durustkirin û Xelkên wê li Êlên Hekarê ne.

[229]Ew ji Kelehên Kurdên Mehranîne. Mîna Elqî, Serwe, Elşabanî, Fereh, Koşer û El-Zeferan. Ibin El-Esîr. (M. E.).

Mêrdînê jî de hin cîgehên tirjî date bigirtin û dubare bi ser Diyarbekirê ve hate biçûyîn û çardorî lê date bigirtin.

Serdarê[230] Rabiyê[231] û Eleka-Elek Mîr Elî bi arzuwê xwe ve serê xwe ji bona Îmad Ed-Dîn date bibitewandin.

Li dawîya bêneke tir de wî leşkerek ji bona ser Mîr Husam-Edîn date binardin, yê ku ew Gewreyê Eşîra Başnavî û Serdarê keleha Fênik bû[232].

Lêbelê di dema dorlêgirtinê de di sala 541 k.-1146 z. de Îmad Ed-Dîn hate bimirin û leşkerê wî hate bivegerandin.

Etabkên Erteqîye-Ortokiye Diyarbekrê jî gelek car ligel Kurdên wî welatî de şer û herayên wan hebûn. (Ebu El-Fida).

Xulefayên Ebasî hin caran ji bona şikenandina hêz û kêra Turkan xwestine sûd ji Kurd bidin biwergirtin. Evejî bi rastîjî ve wan dane bikaranîn.

Li sala 528 k.-1134 z. de kişandina Mîr Îsayê Serokê Xêlatên Hemîdiyê ji bal Xelîfe Musterşêd de nimûneyekî vê siyaseta hanê bi xwe ve tête biderekvtin. (El-Kamil).

Di vê pêla hanê de yekemîn damezrandina dewleta Eyubî date bidestpêkirin û li sala 569 k.-1173 z. de li Misrê de wê bi serxwebûneke tewawî ve ji xwe re date biwergirtin û ew zor hate bifirehkirin.

Institut kurde de Paris

---

[230] Ew Mîr Eli Ibin Ebdul-Lah Ibin Îsa El-Kurdî xwedîyê KelehênRabiyê, Elqey, Fereh û yên din bû. Pişti ku ew tev li Zenki bû, ew bi bêbextî li ser destê Serleşkerekî Zenki hate kuştin (El-Kamil, bergê 11, R. 6). (M. E.).

[231]Li gora Şerefname de Bolaqe.

[232]keleha Fênik nêzîkî bajarê Cezîrê ye.

Li vegirtin, şer û cengên Sultan Selah El-Dîn de gelek Eşîr û Mîrên Kurd dihatin bipeydakirin. Eşîrên Hekarê, Mehranê, Soranî, Hemêdî û Zerzarî di nava komên wan Eşîran de dihatin biderekvetin, yên ku ew ligel Sultan Selah El- Dîn de dihatin bidîtin. (El-feteh El-Qesi fî El-Feteh El-Qudsî, r. 302).

Miser, Surî, El-Cezîre, Kurdistan û Ermînistan hemû di nava vê dewleta hanê de dihatin biderkevtin[233].

Bi rastîjî ve ev pêla Selah El-Dîn dema zêrînî vê dewletê bi xwe ve tête bidîtin. Li dawî de ev dewleta hanê bi çend beşve hate bikirin û beşê herî dirêjkirî Eyubîyê Husin Kêf bû, yê ku ew tanî destpêkirina pêla Osmanî hatibû bimayîn[234]. (ji bona dirêjbûnan ji xwe re temaşeyî bergê duwem bidin bikirin).

Li duwayî dewleta Zengî de li Cezîreyî Ibin Umer de dewleta kurdîyê Ezîzan[235] hate bipeydabûn. Goye weha ye, ku ev Xanedanên hanê ji Dondên hêjayê Xalid Ibin Wlîd bûn. Ev dewleta hanê tanî pêla dewleta Bayenderî[236] hate bidirêjkirin û ew ji bal wê de ji bona demekê hate bilinavbirin. Lêbelê li paş beynekê de dîsan li Cezîrê de hate bipeydabûn. Ev dewleta hanê di dema girêdana Kurdistanê bi dewleta Osmanî ve wê jî serî ji wan re date bidanîn. (Insiklopêdîya Musulmantîyê, bergê 1).

Li sala 581 k.-1185 z. de li pêla Xilafeta Nasir El-Dîn El-Lah de navbeyna Kurd û Turk têk çû û şerekî Milî date bidestpêkirin[237], ew

[233]Herwehajî di nava wê de Yemen, Terablusa Rojava û Berqa jî dihatin bidîtin.

[234]Ew di sala 921 k. de bû.

[235]Li gora navê Ebdil-Eziz Kurê Sulêman Kurê Xalid de, mîna ku ew di Şerefname de hatîye. Ji vê Binemala Serdar di Cezirê de Bedirxan Paşa bû, yê ku ew têde Mîrê Dawî Mîr bû.

[236]Dewleta Rurkimanîyî Aqqowîlî ye, ya ku ew di Diyarbekir û Kurdistanê de berî Dewleta Sefewî de hatibû bidamezirandin. (M. E.).

[237]Ibin El-Esir, bergê 11.

Institut kurde de Paris

gelekî fireh bû û wî li Surî, Kurdistan û Ezerbêcan de du salan date bidirêjkirin û ew ji bona herdu layan bi zîyaneke zor ve hate biderkevtin. Li paş de bi remaneke oldarî ve hajbûn di navbera wan de hate bikirin û ji bona beramberkirina Fileyên Ermenî, Aşûrî li Cezîrê, Suryê û Kapadokya de hevdû dane bigirtin.

Lêbelê mexapin, ku vê hevgirtina hanê ewende nedate bidirêjkirin û li ser hin ji daxwazên Mulk de Kurd û Turk careke din bi gij hev ve hatin bikevtin. Li dawîya şer û herayekî zor de Kurdên Surîyê û Kilikya-Edena- cihên xwe dane biçolkirin.

Ibin El-Esîr dibêje: "Di wê mîjûwê de bi xwe jî ve[238] di navbera Kurdên dora Musilê û Cezîrê de li ser daweta jinanîneke Turkumanî de şerekî hate birûdan û gelek kes têde hatin bikuştin. Di dawî de Mucahid El-Dîn Qaymaz Wezîrê Serdarê Musilê navçîtî di nava wan de date bikirin û ew dane birêkxistin. Wî ew hera hanê date bikujandin. (bergê 11, r. 234).

Rûdanên Mêjûwî weha didin binîşandin, Ku Miletê Kurd bi bêvajê vê jî ve ligel Turkan de zû zû têk diçû, lêbelê ligel dirawsên xweyî File de her û her bi aştî ve bi hev re ditain birabuhurandin û gelek caran jî hewrdu layan çakî jî ji bona yektir bi hev re didan bikirin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê bergê 1).

Di dawîya mirina Sultan Selah El-Dîn de 26. Sefer 589 k. -3 avadara 1193 z. de Zengîyan cîgehên xwe li Kurdistanê de dane biqayimkirin. Li sala 607 k. -1210 z. de Kurê Biçûkî Erselan Şahê Zengî Îmad El-Dîn[239] bi navê Mulkdarîyê li Nur El-Dîn Birayê xwe de kelehên Akra û Şûşê date bisitandin. Li sala 619 k.- 1225 z. de Îmadîyê jî bi şer ve date bidagîrkirin. Serdarê Musilê, yê ku ew Birazyê wî bû, hêzek ji bona ser wî date binardin, lêbelê ew nehate

[238] Di Ibin El-Esir de derbare rûdanên sala 581 de, bergê 11, R. 211, Çapa Misrî.

[239] Navê wî li nik Ibin El-Esir de Nur-El-Dîn Arselan Şah Ibin Mesud Ibin Modud de. du Kurên wî hebûn. Yek bi navê El-Melik El-Qahir Iz-El-Dîn Mesud bû. Yê duwem Imad El-Dîn Zenki bû. Nur El-Dîn Zenkiyê li vêderê de bi navkiri ew ne Birayê wî ye, lêbelê ew Kurê Birayê wî El-Melik Elqahir Iz El-Dîn Mesud de.

biserkevtin. Li dawî de Îmad Ed-Dîn hin ji kelehên Hekarê û keleha Kuwaşê dane bizeftikirin. Çunke dan û sitandina wî ligel Xelkê de bi çak ve nedihate biderkevtin, Xelkê rûwê xwe lê datin biwergîrandin û xeber ji bona Bedir El-dîn Luluê Cîgerê Musilê datin binardin û wan jê hêzek dane bidawxazkirin. Bigihiştina vê hêza hanê kelehên Hekarê û zozanê bi destên Serdarê Musilê ve hatin bikevtin.

Di sala 619 k.-1222 z. de Şûş û li sala 612 k.-1215 z. de keleha Îmadîyê jî li dest çû. (El-Kamil, bergê 11).

Li sala 622 k. 1125 z. de ji bona Îraqê û Cezîrê zordarî hate bibelabûn; Hejandina erdê, giranîyê, fertenê, baran û avrabûnê dunya date bişewandin.

Bi mal û can ve ziyanên bê sînor hatin bikevtin. Sala duwayî Ela Edîn Kîqbadê Silcoqê[240] Serdarê Qonyê bi fermana Celal Edîn Şahê Xuwarzemî ji bona ser Diyarbekirê hat birakişandin û hin ji kelehên wî date bizeftkirin û zîyaneke zor li wî welatî de date bidan[241].

Institut kurde de Paris

## 3. Kurd li Pêla Xuwarzimî û Êlxanî (Megolî) de

Li sala 614 K-1217 z. de Kurdên deştê û çiyayên Zagrosê tûşî vegirtin û wêrankirina Xuwarzimiyan bûn; jiber Sultan Mohemedê Xuwarzimi[242] orduwek ji bona ser Nasir Ed-Dîn Al-Lah Xelifê Ebasî dabû birêkirin. Ev orduwa hanê bi serûştî ve di pêşî de ligel Kurdan de hate bialakirin. Di navbera Hemedan û Kermanşah de ew tûşî serma û soleyekî pir xurt bû.

Di vê bêhna şeperzbûnê de Kurdên Benî Hekar û Turkumanên wan navan hatin birabûn û hêrîşî ser wan dane bikirin û zor ji wan dane

[240]Ji xwe re li Ibin El-Esir bide temaekirinş. (M. E.).

[241]El-Kamil, Begrê 12, R. 189, Çapa Misri.

[242]Ew Xuwarzemşah Ela El-Dîn Mohemed Kurê Ela El-Dîn Tekeşe. serdarîya wî Bîst û Yek salê û çend Mehan date direjkiri.

bikuştin. Bîcgeh li Sultan Mohemed û Perekî ji hêza wî pêve tevde hatin biqirbûn. (El-Kamil, b. 12, r. 130).

Kurê Sultan Mohemed[243], ku ew Celal El-Dûn bû, li dawîya şikestinên wîyî mezin de ligel paşmayên sîpahê xwe de li Hemedanê de rûwê xwe ji bona hêlên Îraqê date bivekirin. Li dawîya talan û wêrankirina hêlên Bedre, Yaqube û kavilkirina keleha Daquqa de û kuştarekî zor ji Xelkên wan welatan de wî berê xwe ji bona Hewlêrê date bivekirin; belam Serdarê Hewlêrê Muzefer El Dîn kokberi[244] bi jîrbûna xwe ve ew ber bi paş ve dane bivegerandin.

Li dawî de Celal El Dîn rû wê xwe ber bi Ezerbêcanê de date bivekirin. Di pêşî de Meraxe date bigirtin. Di sala 621 K[245] -1224 z. de Tebrîz jî date bizeftkirin. Piştî hêrîşa wî ji bona ser Gurcistanê wî xwe di sala 623 k.-1226 z. de ji bona ser bajarê Xîlat -Exlatê- date bikişandin û çend caran jî wî ew date bitengavkirin; belam Xelkên wê bi jêhatbûna Serdarê wêyî Eyubî Hacib Husam El-Dîn ve û bi bînferhbûn û liberxwedana wanî bî hempa ve Celal Ed-Dîn bi bêhêvîbûn ve hate bivegerandin.

Di vê cengê û şerî de welatê Xîlat hate biwêranbûn û di şerê navbera Imad Ed-Dîn û Nûr Ed-Dîn de dorhêla Imadîyê û Zozan hatin biwêrankirin.

Bi kurtî ve Kurdistana Jorî û Jêrî zîyaneke pirî gewre pê hate bikevtin. Ev rewşa hanê bi hoyê pir belayên mezin ve hate biderkevtin; ji bona nimûne giranîyek hate bipeydabûn û zor Xelk ji birçîbûnê hatin bimirin. (El Kamil, b.12, r. 190 û 200).

Di pêşîya şewala sala 626 k.- 1231 z. de Celal El-Dîn Xuwarzemşah dîsan ji bona ser Xelatê hate bivegerandin û çardorî lê date bigirtin, li paş de bi ser Mûşê ve date bihêrîşkirin û ta çiyayê

[243]Ji xwe re li Ibin El-Esir, bergê 12, R. 175 de bide temaşkirin. (m. E.).

[244]Ew Kurê Zeyd El-Dîn Eli ye.

[245]Di Ibin El-Esir de 17 Receb sala 622. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Cûdî çû. Wî ew welatên, yên ku ew di nava wan re dihate biderbasbûn, ser li nû de didatin biwêrankirin û wî pir zor û şermezarî didane bikirin. Xelk weha çav tirsandî bûn, ku beşekî pir ji wan welatê xwe datin bicîhiştin û ew ji bona dorhêla Helebê hatin biçûyîn.

Serdarê Xîlat Xelatê- Hacib Husam El-Dîn, yê ku ew ji bal Melek Edilê Eyubî ve hatibû binîşankirin, li çardorgirtina Celal Ed-Dîn de bi rastî ve mêrxasî û qehremanîyek bê hempa nuwand, tevlivêjî ew ji bal Melek Eşref de ji cihê wî hate biderxistin û Ezedîn Îbîk[246] ew bi bêbextî ve date bikuştin. Celal El-Dîn li duwa mirina Husam El-Dîn de dîsan xwe ji bona ser Xîlat-Xelatê date birakişandin. Li paş neh mehê dorlêgirtinê de ew date bizeftkirin û hemû Xelk û Liberxwedanên wê tevde dane bikuştin. Zordan û sitendineke bi pîsîtîyî bê namûsî derbarê Jin û Mendalan date bikirin.

Li sala 627 k.- 1230 z. de Celal El-Dîn beramber bi Ela El-Dîn Sultanê Rom û Melek Eşrefê Eyubî Melekê Şam ve hate bişikenandin. Li wî şerê hanê de Komandarê orduwê Şamê ango orduwê Melek Eşref Ize Dîn Umerê Kurê Elî bû, yê ku ew ji Eşîra Hekarê bû. Di vî şerî de orduwê Celal El-Dîn pîs hate bişikestin û ew pir perîşan bû. Ew tanî Xoy hate bikişandin û bi neçarî ve hajbûnî date bikirin.

Li sala 628 k.- 1231 z. de orduwê Tatar Celal El-Dîn pir date bitengavkirin û Ezirbêcan ji destên wî datin bisitandin. Celal El-Dîn bi serpoşî ve ji bona dora Xelatê hate bivegerandin. Êtir mêla wîyî şerî nebû. Ji tirsa Tatar wî xwe ji bona nava Kurdan û welatê wan date biavêtin, yê ku wî ew çend caran dabûn bitalan û biwêranîkirin. Tevaya dunyayê li ser pir sitemkarî, bênamûsî, hovîtî û bêşermezarîya wî lê didin bitufkirin.

Bi kurtî ev Serdarê hanê, yê ku ew ji Xwedê neditirsiya û bê xwedan bext bû, bi zîneteke pir pîs tanî dora Diyarbekir hate bigihandin, li wêderê jî de Tatar kês pê nedan û dora wîna datin

[246]Memluk El-Melik El-Eşref El-Eyubî Serdarê Dimeşq, Cezirê, Xelatê û di dewleta wî de Mîrekî gere bû. Ibin El-Esir, bergê 12, R. 200. (M. E.).

Institut Kurde de Paris

bigirtin, talanî û kuştarekî zor li orduwa wî wan dane bikirin û wan ew jihev dane bibelawelakirin.

Ev orduwa bedkar û bedbext parçe parçe ji bal Eşîrên zorlêkirî de hate biqirkirin û hinekan ji wan jî xwe ji bona bextê Ela El-Dîn Kîqubadê Sulcoqê Serdarê Qonyê datin biavêtin.

Belam welatê Kurdistanê hêşta li ruwê Celal El-Dîn rizgar nebibû, welatê Diyarbekrê û ew rêya ku ew pê hatibûn, hemû ji bal Tatar ve ser li nû de hate biwêrankirin. Ew beşên, yên ku ew ji belayên Celal El-Dîn rizgar bibûn, hinek ji wan ji bal Tatar de hatin binabûdkirin.

Li şarê Diyarbekirê de wan jîndar nehiştin. Heger Eşîra Kerîşîyê Kurd[247] rêge pê nedaba bigirtin û rûwê wan nedabana bibergirtin, dê wan kes li wan welatan de nedana bihiştin.

Bi rastî jî ve bi cihê mexabinyê ve tête biderkevtin, ku Qolekî Tatar li rêgeyekî tir de tanî Mêrdînê û Nisêbînê hate bigihandin û ew nav jî wan dane biwêranîkirin. Qolekî tir jî li Ezirbêcanê de xwest, ku ew ji bona ser Hewlêrê bête birakişandin. Serdarê Hewlêr û Musilê jî li Daquqe de orduwên xwe dane bilikarxistin û Xelîfe jî biçekî alîkarîya wan date bikirin. Belam çak bû, ku Tatar bi ser wan ve ne hatin birakişandin[248].

Debera em careke din jî ji bona ser pirsa Celal El-Dîn Xuwarzemşah bêtin bivegerandin. Li dawîya vê ku orduwa wî ji hev hate bibelavkirin û kesek li dora wî nema, ew neçar bû, ku ew xwe ji bona nava Êleke Kurd di sala 628 k.-1231 z. de bide biavêtin.

Vebêj dibêje, Kurdekî, yê ku zor sitemkarî û xerabî wî lê dîbû û li şerê Ixlat-Xelatê de Birayekî wî jî ji bal Leşkerê Celal El-Dîn de hatibû bikuştin, bi bê xebera Xaneyê xwe ve ew date bikuştin[249].

---

[247]Ji xwe re li Ibin El-Esir, bergê 12, R. 206 bide bitemaşekirin.

[248]Ji xwe re li Ibin El-Esir, bergê 12, R. 207 bide bitemaşekirin.

[249]mêjûwa Gezîdeyî Farisî dibêje, ku Celal El-Dîn Xuwarzim Şah di dawîya jîna xwe de zor tûşi Meyvexwarinê bibû. Di gava kuştina wî jî de ew mest bû. Nuri El-Dîn Menşi ev Çarîna hanê derbarê wî de dayite gotin:
Şaha geran çi berxewahed xewast

Institut kurde de Paris

Bi vî rengî ve ev Serdarê Sitemkar li nava nîvê meha şewala sala 628 k.- 1231 z. de hate bilinavçûn. (Ji xwe re li El-Cuwîni, Mohemed El-Qezwîni El-Kamil bide bitemaşekirin).

Bela vî Celal El-Dînî ji bona Kurd zor gewre bû û hatina Tatar jî ji sala 633, 634 k.- 1236, 1237 z. de taybetî ve li rûwê vî Setemkarî bû.

welatê Diyarbekir, Erzen, Miyafarqîn, Sêrt, Xelat, Mêrdîn û Nisêbînê bi carekê ve hatin biwêranîkirin. Xelkên mayî hinekan ji wan xwe ji bona nava serên çiyan û dolan dabûn bikişandin û beşekî jî ji wan rû ji bona welatên din dabûn bivedan. Welatê xwe wan dane biçolkirin. Bi kurtî ve zîyana mal û can li Kurd de bi bê qam ve dihate biderkevtin.

Celal El-Dîn Xuwarzemşah heger ewende Sitemkar, Xwînxuwar û Bedxwo nebûwa, bi mêrxasîya xwe û azaya xwe ve dê bikarîba xwe li layê Kurdan de xweşewest bida bikirin û ji bona sitendina mafeyê xwe ji Tatar ji hêza Kurd kar bida bigirtin. Belam sitemkarî û bêşermazarîya wî û bi taybetî ve sincî û reweşta wî ji alîyekî de bi hoyê nemana wî ve hate bikirin û li layekîtir jî de Kurdistan date biwêranîkirin û Miletê Kurd jî tûşî malwêranî û sergerdanîyê date bikirin.

Li sala 645 k.-1247 z. de welatê Şarezor û li sala 650 k.-1252 z. de cara duwem devera Diyarbekrê li jêr zordarî û talankirina Megolan de perîşan bû.

Li sala 648 k.-1250 z. de Sultan Bedir El-Dîn Luluyî Serdarê Musilê bi mehna sitendina mefeyê Keça xwe leşker bi ser Melek Mes-udê Serdarê Cezîrê de date birêkirin, yê ku ew dawîvanê Dondê Etabikyan bû. welatê wî li dest de date biderkirin û Melek Mes-ud jî date binemankirin.

Wezemesti bi geran ci berxewahed xewast
Se mest û cihan xerab û dujmen pes û pês
Peydast kih zîn miyan iç berxewahed xewast.

Institut kurde de Paris

Dewleta Resulî li bajarê (Te-ez) ji destpêkirina sala 626 k.-1229 z. de li Sen-a Yemen de bi carekê ve cigîrbû[250]. Zorî Mîr û Karmendên wêyî gewre jî û herwehajî hinek ji Mîrneşînîyên wê jî kurd bûn û ew jî hêjî ji dewra Eyubî mabûn. (Insiklopêdîya Musulmantîyê, b. 4, r. 151).

Di pêla hera û şerên Ilxanî (Mengolî) de zor kêm li ser de hatîye bigotin. Mêjûwa Cîhankeşa dide bixuyanîkirin, ku wilayetên Kurdistanê di pêla Mongolan de ji bal Mîr Ergon Axa de dihate biserdarîkirin, yê ku ew Bavê Mîr Newrozê bi nav û deng bû.

Ji vê tête biderbikevtin, ku Kurd, yê ku ew di ceng û şerên Eyubî de ewende bi nav û deng bû, di vê pêlê de di jêr serpereştîya Serokekî Gewre weku Sultan Selah El-Dîn de nedikarîbû bête bikirin, ku ew wan bide biyekkirin û wan berbestî belayên Celal El-Dîn û lehîyên Mengolan bide bikirin.

Duberî û berberîya Navxweyî nehiştin, ku yekbûn û liberxwedana Mêjûyî bête bikirin. Ew neçar bûn, ku ew xwe ji bona nav çiyan û cihên sext bidin bikişandin û ew çavdêrîya palpêdana bi belayên Mengolan ve bête bikirin.

Li dawîya derbasbûna çar pênc salan de bela Holako bi ser Kurdistan û Iraqê ve rû date bikirin. Malik Ibin Todan, yê ku ew Bavê Mîr Çopanê bi nav û deng û Komandarê Pêşdarê orduwa Mengolan bû, di destpêkirina sala 655 k.-1257 z.[251] de rûwê xwe ji bona Hemedan û Kurdistana Îranê ve date bivekirin[252], ya ku navîna wêna keleha Buhar bû. Wî ew date birûtkirin.

Di vê salê de Holako bi xwe jî ve ji bona Bexdadê çû: Serûştî bû, ku Kermanşah li ser rêgayê de wî bû û ew tûşî talanî û kuştarekî zor

[250]Ev Binemaleke Turkimanî bû û ew ji Peyên Eyubî li Yemenê de bûn. (m. E.).

[251] Li gora mêjûwa Musil, R. 243 evaya di sala 649 k.- 1251 z. de bû.

[252]Nêt jê Yekek ji Wilayetên herema Çiyayî bi nav û bang di deme Selcoqî û Teter de bû. Peyva Kurdistan ji bona cihê hemû Kurdan nuhe. Ew him ji Wilayeta Kurdistan re têtê gotin û him jî tevaya welatê Kurdan re têtê gotin.

Institut Kurde de Paris

bû. hêzeketirî Mengol berê xwe ber bi Hewlêrê ve date bivekirin. Serdarê vê Kelehê, ku ew Tac El-Dîn bû, wistî serê xwe ji bona Mengolan bide bidanîn, belam Liberxwedanên Kelehê, ku ew Kurd bûn, bi fermana Serdar ve nedane bikirin û wan liberxwedaneke aza dane bikirin. Li dawîya dawî de Bedir El-Dîn Luluyê Serdarê Musilê ligel Mengolan de hate birêkevtin û li çardorgirtina kelehê de yarmetîya wan date bidan. Bi vî rengî ve Hewlêr li paş beynekê de bi destên Mengolan ve hate bikevtin.

Li paş kevtina Bexdadê û nema Xilafeta Ebasî de Xelkên Şarezorê û hin cîgehên tir welatê xwe dane bicîhiştin û wan ji bona alîyên Surî û Misrê dane bibarkirin. (D. Obssun).

Zor jî dibe, ku hebûna du Eşîrên Kurd mîna Ladîn û Badîn li Cezayir de bi encamê vê barkirina hanê ve hatibin biderkevtin. (Ibin Xeldun. Mêjuwa Berber).

Holako di sala 657 k.- 1259 z. de li Tevrîzê-Tebrîzê de rûwê xwe ber bi Surû ve date bivedan. Orduwî Mengolî di rêya xwe de welatê Hekarê ser li nû de date biwêrankirin û her kesek bi nava pencên wan ve dihate bikevtin, wan ew dida bikuştin. Li Cezîrê[253], Diyarbekrê, Miyafarqînê û Mêrdînê de kavilkirin û kuştara Mexolan bê jimar bû.

Li dawîya mirina Fermandarê Musilê Bedir El-Dîn Luluy de, yê ku ew Peyê dilsozê Mengolan bû, kurê wî bi navê Melek salih ve cihê wî date bigirtin, belam ewende pê neçû, tanî ku ew bi peyvên Birayê xwe ve hate bixapandin û wî Musil date bicihişt û li nik Melekê Misrê ji xwe re penahindeyî date biwergirtin. Li ser vê de hêzeke Mengolî li Cezîra Ibin Umer de bi ser Musilê ve hate bidakevtin. Lê Liberxwedanên wê, yên ku ew ji Kurd, Turkuman û Şol hatibûn bipêkdihatin[254], li jêr serpereştîya Elem El-Dîn Sincer de şerekî baş wan ligel Mexolan de datin bikirin.

[253]Ew li Turkiyê bi navê Cezirê tête binavkirin. Ew bajarê Ceziret Ibin Umerî ye, yê ku ew di Nivistên Mêjûwê de bi nav û bange. (M. E.).

[254]Ew li Xelkên Şolistanî Farisin û yanjî ew Berekî Qeşqayê Eşira Turkimanin.

Li Surî jî de Kurd ligel orduwa Memluka de beramber bi Mexolan ve gelekî şer dane bikirin. Sultanê Misir El-Zahir Bîbris wî xwe jî di kaxeza xwe de ji bona Serdarê Mexolan Xan Bereke bi serbilindî zor pesnê şerkirina orduwê xwe dide bikirin, ya ku ew ji Turk, Kurd û Ereb dihate bipêkhatin.

Li dawîya şikenandina Mengolan-Mexolan de li sala 680 k.- 1281 z. de yekekî li Serdarê sipahê musulmantîyê de di navbera Turkuman û Kurdan de hajbûn date bikirin û beşek ji Kurdan ji bona alîyên Kilikya-Edenê date bibirin û ew li wê derê de datin bidamezirandin.

Pir serî li Merov de tête bisurandin, tevî li dujminatîya di navbera Kurd û Mexolan jî de hin Kurdên Faris ligel Mexolan de hatibûn biyekkirin û li dema Olcay-Toxan jî de ew orduwê Mengolî, yê ku wî di sala 706 k.-1306 z. de Gîlan date bizetfkirin, beşekî wî jê Kurd bûn.

Serekê Eşîra Kurdî Rahba, yê ku ew Bedir El-Dîn bû, di sala 712 k.- 1312 z. de beramber bi orduwa Mexolan de liberxwedaneke pir tund nuwand.

Di vê pêla hanê de welatên Kurdan bi serûştî ve ji bal Mîrên Mexol de dihatin bisermiyandarîkirin. Li hin cîgahan de weku Hewlêr û Musilê şer û mer zor hatin bidirêjkirin. Li orduwa Mexolî de hin File jî dihatin bidîtin, ku bi wan ve keyacî pê didatin bigotin. Beşekî ji van, yê ku ew di nava Parêzvanên Hewlêrê de bûn, ligel Serokê xwe Zey El-Dîn Balo de Kurd û Erebên wê navê beramber bi Mexolan vê hatin birabûn. Ev heraya ji sala 697 k.- 1297 z. de bigir sêzdeh salan date bidirêjkirin. Mexolan li dawî de bi hezar dujwarî ve Fileh ji keleha Hewlêrê datin biderkirin.

Di vê pêla çardorlêgirtinê de Mexolan yarmetî ji Kurdan datin bixwestin, belam Serokên Kurdan nebixwestin, ku Liberxwedanên Hewlêrê tevde bêtin kuştin; jiber vî jî wan yarî bi Mexol nedan (Tarîx Marya Balaha, Çapa Paris, sala 1313 k.- 1895 z.).
Di vê pêla hanê jî de di sala 696 k.- 1296 z. de Xazan Xanê Ilxanî hêrîş ji bona ser Kurdên welatê Çiyayî date bibirin; jiber wan mêldarîya Mîr Newroz didane bikirin. Wî welatê wan date biwêran û bitalankirin û pêncî hezar kes ji wan date bikuştin.

Institut kurde de Paris

Nivîsta Mêjûwa Îraq di navbera herdu vegirtinan de di vî warê han de dibêje: Talanî, raw û rûtkirin weha gewrebû, ku golikek bi pênc dirhama, miyek bi dirhemekî û Xortekî duwanzde salî bi duwanzde dirheman ve dihate bifiroştin. (Bergê 1, r. 377). Li cîgehekî din de ew dibêje: Xwedanbende Melekê Mexolan di sala 705 k.- 1305 z. de hêrş bi ser Kurdên Gilan ve date bibirin, belam ew hate bişikenadin û Serleşkerê wî bi navê Qetilxşah ve hate bikuştin. Ew bi destên Şemis El-Dîn Dubac Melekê Gilan hate bikuştin. (B. 1, r. 404).

Di navbera Hewlêr û Meraxe de ji bona orduwa Mexol bibû Şeqam; wan ji xwe re çûn û hatina xwe di wê rêyî de didan bikirin. Bi xwe jî ve beşê alîyê Şino û Sablaxê jî li jêr destê serpereştîya wan bû.

Di pêla Olcay toxan de navîna welatê Kurdistanê ji bajarê Buharê ji bona bajarê Sultan Abadê hate biveguhestin.

Firehbûna û dewlemendbûna vî welatê hanê li nivîsta Nuzhet El-Qulub de hatîye binîşandan, Belam hemû layekî wî wêran û vala bû, bi piyelekî ku hatina wî di vê pêla hanê de yek ji dehê pêla Silcoqî bû.

Di dema li nav çûna dewleta Îlxanî de du Xanedanên Mexolî ligel hev de li ser serdarîyê de bi Qayîş û Berberîyî ve hatin bikevtin.

Gewreyê yekê ji wan bi navê Suldoz ve û Gewreyê tir bi navê Celayer ve dihatin binavkirin. Li dawî de di sala 738 k.- 1237 z. de welatên Mexolîyî mayî ji bal van herdu Xanedanan de di nava xwe de dane biparvekirin. Kurdistana Îranê û Xuzistan ber bi Xanedanê Suldoz ve hate bikevtin, yên ku ew Kurên Mîr Ekrenc bûn.

Li salên 784, 785 k.-1382, 1383 z. de Mîr Bayezîd El-celabiri ji xwe re Padîşahîyeke gewre di derveyî Kurdistana Îranê û Îraqa Ecemî de date bidamezirandin. (Lanpol Dosman).

## *Derîyê Pêncem*

### 1. Kurd Tanî Pêla Sefewî

Dewletên Turkumanî li Asya Rojava de her û her ew berber û dujminên Mexol bûn. Li dawîya linavçûna dewleta Îlxanî de wan bere bere Kurdistan ber bi jêr serdarîya xwe ve dane bixistin. Dewleta Qere Qoyonliyî Turkumanî tanî navrastî Kurdistanê hate bigihandin û Eşîrên Kurd tûşî şer û merekî siysî û rêçî date bikirin[255]. Ev zîneta hanê bi hoyê cihê gorîneke zor ve ji bona Xelkê hate biderkevtin. Bi rastî jî ve di vê pêla hanê de Kurdên Mukrîyên Jêrî gola Urmê ango welatê Sablaxê wan date bidagîrkirin.

Li dawîya şepolên belayên Mexolan de û li pêş vê de, ku welatên musulmantîyê bikaribin windakirinên xweyî mal û can kêm yanjî zor bidin bivegerandin, belayên Tîmorleng rû têde date bikirin.

Vê Serdarê Sitemkar li dawîya vê de, ku wî li Isfehanê de ji heftê hezar serîyên Belengazan Ehrameke hov date bidurustkirin, li dawîya vê jî de li ser rêya xwe de şepolên xwînê date biherikandin û Sultan Ehmedê Celayerî li Bexdadê de date biderkirin.

Ji bona vêgirtina Qefqasya ew bi ser Kurdistanê ve hate bibuhurandin. Wî Diyarbekir û Cezîra Ibin Umer ji xwe re datin bizetfkirin û ew datin biwêrankirin. Tirseke bê qam di tevaya wê navê de date bipêxistin û welatê Kurdistanê zor date bitengavkirin û Xelek ji tirsa xwe ji bona nava çiyan û dolan hatin bikişyan. Di pêşî de wî li

[255] Ev Desteyê Qereqoyonlî ye û ew Şiîyê pir xwîngermin.

Institut kurde de Paris

Mîrê Hekarê de li keleha Wanê de çardorî lê date bigirtin û kelehê rêyên din jî datin bitengavkirin û hemû wî ew datin bizeftkirin.

Li çûna xweyê sala 796 k.-1394 z. de li dawîya vegirtin û wêrankirina Bexdadê û Tekrîtê de wî di ser Musilê re rû wê xwe ber bi Kurdistanê ve date bivedan. Mîrên Kurd mîna: Serdarê Hewlêrê Elî, Serdarê Cezîrê Mîr Ize El-Dînê Kurdî, Serdarê Hesen Kêf Mîr Sulêman, Serdarê Mêrdînê Tahir El-Dîn ligel Serdarê Musil û Erzen -Xerzan- de bi hêvîya parastina welatên xwe ew ji bona nik Tîmorleng hatin biçûyîn û jêre wan serên xwe dane bitewandin. Bi vî rengî ve wan xwe ji şerê Tîmorleng dane biparstin.

Institut kurde de Paris

Tîmorleng berê xwe ber bi Helebê ve date bivekir û Celal El-Dîn Mîranşah Kurê xwe bi ser Kurdistanê ve date bicîhişt. Ev Şahzadeyê hanê li ser şûna Bavê xwe de hate biçûyîn. Wî sitemkarî û kuştarekî zor date bikirin, bi taybetî ve wî li Hesen Kêfê, Diyarbekrê û Tor Abidînê de kuştar û serbirîneke giştîyî pir bi hov û diritî ve date bikirin. Li vê zordarîyê û xwînrijtinê de Xelk ji canê û malên xwe hatin bibêzarbûn û bi neçarî ve serên xwe datin bihiladan.

Mîrê Cezîrê Ize El-dîn yekek ji Mîran bû, ji yên ku wan serî li ber Tîmorleng de dabûn bihildan. Weha li çûna Tîmorlengî pêşî de Mîr Ize El-Dîn ligel wî de hatibû birûniştin. Lêbelê li Sitemkarîya Toranşah de[256] ew hate bizarkirin û ew ji gotina wî hate biderçûn.

Tîmorleng eve date bibihîstin, zor riqê wî helsa û li çûna duwem de li sala 804 k.-1401 z. de wî ji bona tol wergirtinê berê xwe bi Kurdistanê ve date bivekirin.

Herçi avaniyek ber bi destên wî ve hate bikevtin, wî ew dane biwêrankirin û kuştarekî xwînxuwarî têde date bikirin. Li Hewlêr, Musilê û Cezîrê de zindî wî nehiştin. Xwedîyê nivîsta Mêjûwa Musilê, r. 253 de dibêje: Her bi tenê ve gundek bi navê Erbo ji gundên Cezîrê bi alîkarîya Keşê wê ve hate birizgarkirin.

---

[256] Weha di kokê de hatîye binivîsandin, lêbelê ew Mîranşah Kûrê Tîmorlenge. (M. E.).

Mîr Şeref El-Dînê Bedlîsî, ji bona ku ew welatê xwe û herwehajî pêrejî Neşînvanên xwe jî ji şerên Tîmorleng bide birizgarkirin, ew ji bona layê Tîmorleng hate biçûyîn û ew di navbera Diyarbekirê û Mûşê de pêrgî wî bû.

Tîmorleng zor rêz lê date bigirtin û pirjî rûmeta wî date bigirtin û ji bona xatirê çakîya sincîya wî û bi nav û dengdana dadwerîya wî ve di nava Kurdan de ew li cîgehê wî de date bihiştin.

Orduwê Tîmorleng li vegera xwe de ji Bexdadê ji bona Tevrîzê di sala 803 k.-1400 z. de li rêya xwe de ew tûşî hêrîşa Kurdan bû.

Di dawêya mirina Tîmorleng de di sala 807 k.-1405 z. de Qere Yusivê Mîrê Qereqoyonli, yê ku ew ji tirsa Tîmor revya bû, ew ji bona Kurdistanê hate bivegerandin û ew li bal Mîr Şemis El-Dîn Bedlîsî de pena bû, yê ku wî Keça xwe lê dabû bimarkirin û bi yarmetîya Mîrê Bedlîsê ve ser li nû de wî dewleta xwe date bidamezirandin. Di sala 820 k.-1417 z. de Mîr Qere Yusiv bi Mîrîtî ve bi serxwebûna mîrneşînîya Bedlîsê ve pê hate birûniştin.

Di sala 824 k.-1421 z. de Şahrex Mîrzayê Kurê Tîmor Leng ji bona Erminya hate bigihaştin. Mîr Şemis El-dîn Bedlîsî, Melek Mohemed Serdarê Hekarê, Melek Xelîl Serdarê Hesen Kêfê ligel Mîrê Xêzan û hin ji Mîrên Kurdên tir de ji bona layê Şahrex Mîrza çhatin biçûyîn û aşîtî û dilsozîya xwe ji bona wî dane bipêşkeşkirin. Kurdên welatê Xoyî jî bi vî rengî ve wan jî datin bireftarkirin. Weha bi vî corî ve wan xwe ji şer û zîyanên Tîmor Leng dane biparastin.

Dewleta Bayenderi, ya ku jê re jî Aq Qoyonlî pê didatin bigotin, li dawî de wê dewleta Qere Qoyonlî date bilinavbirin û ew li Diyaberkirê de bi tewawî ve hate bidamezirandin[257]. Vê Dewleta hanê ligel Melek û Mîrên Kurd de dest bi şer û heran ve date bikirin, da ku

[257]Hesenê Dirêj-Ewzon Hesen Nevîyê Denînvanê vê Xanedanê ye. Piştî şikenandina Ebu Seîd Nevîyê Tîmorleng ji bal Hesenê Dirêj wî Paytextê xwe ji Diyarbekirê ji bona Tebrîzê date biveguhestin.

Institut kurde de Paris

ew bere bere dewlet û mîrneşînîyên Kurd li nav de bide bibirin. (Şerefname, Vegirtina Xanzadehayê Kurdistan).

Ji bona bicihanîna vê siyaseta hanê ji bal dewleta (Aq Quwînlî) de terefdarîya Mîrên Kurd ji bona Xanedanên Qere Qoyonlî bi mehne ve date bikirin. Evaya jî bi xwe ve ligel rastîyê de nedihate bilihevhatin; jiber hoyê cudabûna rêçî di navbera Kurd û Qere Qoyonlî de zor xerab bû û her ew ligel hevdû de di şer û mer de bûn.

Hesenê Dirêj jî ji bona bicihanîna vê remana xerab wî jî mîna hemû Bêganeyên tirjî ji duberî û berîya di nava Kurdan ji xwe re kar date biwergirtin. Wî layê hinekan ji wan date bigirtin û ew bi gijî yên din ve didatin biberdan.

Weha wî bi hêzên Kurd ve û bi destên Kurd ve dewletên Kurd datin bilinavbirin. Bi rastî jî ve ev cihê mexabinê ye, ku ev hêza ji hev belavkirîyî Kurd jiber hoyên nezanetîyê, duberî û berberîyê her û her ew bi hoyên şikestin xwarinê ve hatine biderkevtin û wan nedizanin, ku divabûn, ew ji bela û derdên raburdû serpşhatîyê ji xwe re bidin biwergirtin û ew beramberberî vê hêza lawaz û biyanî xwe bidin biyekkirin.
Lêbelê bi carekê ve bi ser û vajî vê jî wan xwe di nava destên Hesenê Dirêj de bi aleteke hişik û jêrdest ve xwe dane biveguhertin.

Bi rastî jî ve em dibînin, ku Eşîrên Çemşkezk bi gotineke Melekê Aq Qoyonli ve bi gij dirawsên xwe ve dihatin bikevtin, yên ku ew hev Milet bûn.

Komandarên Hesenê Dirêj Sofî Xelîl û Erbşah bi yarmetîya van Eşîrên hanê bi gij Eşîrên Dumilî -Dunbilî- ve li Botan de hatin bikevtin û Hekarê wan date bizeftkirin. Herwehajî bi vî rengê hanê jî ve welatê Cezîrê li sala 875 k.-1470 z. de bi destên Aq Qoyonlî ve hate kevtin.

Li gora Şerefname de Sulêmanê Bêjin Serleşkerê Hesenê Dirêj Bedlîs ji destên Mîr Ibrahim Xan date biderxistin. Ev Mîrê bedbext jî bi xwe jî ve li dawî de ji bal Kurê Hesenê Dirêj Yaqub ve hate bikuştin. (Insiklopêdiya Musulmantîyê bergê 2).

Institut kurde de Paris

## 2. Kurd di Pêla Sefewî de û di pêşîya Dewleta Osmanî de

Şah Ismayilê Sefewî[258] di şerên xweyî pêşî de ligel Dewleta Aq Qoyonlî de Ermînya hate bidestkevtin. Li sala 908 k.- 1502 z. de li nêzîkê Hemedanê de ligel Sultan Muradê Aq Qoyonlî de şerekî gewre date bikirin û Îraqa Ecem, Xuzistan û Faristan yek li dû ya din de date bizeftkirin.

Li sala 909 k.- 1503 z. de leşker bi ser Sarim Beg ve date bikişandin û hêlên Urmiyê û Şino datin bitalankirin û kuştareke zor di nava wan de date bikirin.

Sala duwayî rûwê xwe ji bona Kurdistana navînî date bivekirin û li nêzîkî El-Bustan de Ela El-Dîn Zu El-Feqar date bişikandin û ew ji bona ser Diyarbekirê hate bivergerandin û ew date bigirtin. (Tarîxa Alem Ara).

Reweşta Şah Ismayil derbarê Kurd de mîna reweşta Aq Qoyonlî bû, ew zor Sitemkar bû; çunge Kurd Sunî bû û bi carekê ve bawerîya wî bi wan ve nedihate biderkevtin.

Bawerîya wî her û her bi Turkumanan ve dihete biderkevtin; çunge ew ji Rafidîn û xwîngerm bûn. Li hemû kêsekê de wî dita bixebatkirin, da ku ew derd bi ser wan ve bide bibarandin û Kurd bide binabûdkirin.

Di vî barê han de li dema ku ew ji bona Xoy hatibû, Yanzde kesên Ji Mîrên Kurd ji bona layê wî çûn û ji bona wî mil û hustên xwe datin bitewandin.

Institut kurde de Paris

---

[258]Ev Malbata Sefewî ji Zaruwên Şêx Seyf El-Dînê Erdebîlin. Ev Şêx Zahîdekî Siî bû. Wi xwe bi Nevîyê Îmamê Heftem Musa Kazim dida bidanîn. Sê Kurên wî bi navê Elî, Ibrahîm û Cenîda hebûn. Wan bi Zuhud û Milîperwerîya xwe ve nav û bangê vê Malbatê pir bilindkirin. Şêx Cenîd ji tevan bêtir bi nav û bang bû; jibervêjî ew ji bal Sultan cihanşahê Qereqoyonlî pir caran hate tengavkirin. Ew bi revê neçar bû, ku ew ji bona Diyarbekrê ji bona nik Hesenê Dirêj here. Wi Keça Hesenê Dirêj li Kurê xwe Heyder marekir. Şah Îsmaîl berê vê jinanînê bû.

Weha bi vê rengî ve ji dilva hêvîya wan wî ew datin bigirtin û bizindakirin û li cigehên wan de Walîyên Qezilbaş wî datin binîşankirin.

Yekek ji van Mîrên Belengaz Melek Xelîlê Serdarê Hesen Kêfê bû, yê ku ew Mêrê Xweşka Şah Ismayil bû. Wî ew sê salan li binê zinada Tevrîzê de date bihiştin.

Inca li dawîya şikenandina Şah Ismayil de li Çaldêran de 920 k._ 1514 z. de hate birizgarkirin.

Şikestina Şah Ismayil li Çaldêran de di sala 920 k.-1514 z. de hêz û hinera dewleta Sefewî zor date bikêmkirin û hin ji Biserketvanên Nevîyên Şah Ismayil bi pileyekî wetov ve nehatin bigihaştin, ku ew hêz û hinera xweyî şikandî bidin biavakirin û tanî Rojavayî şaxên Zagrosê bidin bicikirin.

Institut kurde de Paris

Siyaseta Kurdistanîyî Şah Ismayil weku dewletên pêşî ew jî dihate bipêkhatin, ji bona linavbirina dewlet û mîrneşînîyên Kurd bû û li cigehên wan de damezrandina hêz û desthilatîya Qezilbaşên Şîî bû.
Ev dan û sitendina hanê ligel Kurdan de bi carekê ve ser û vajî wê siyaseta Osmanî bû, ya ku ew di rêya Berêzê bi nav û dengê Idrîsê Bedlîsî ve li ser Kurdistanê de dihate bicîhanîn.

Aramanca wê siyaseta hanê jî pêkanîn û giştîkirina Yasa û Qanûneke baş bû, da ku dewleta Osmanî di rêya damezrandina hin ji dewletên cihîyî milîyî Kurd de bi carekê ve Kurd li xwe de bide birazîkirin.

Sultan Selîm li çûna xweyî Çaldêran de li ordugahê Amasyê de çend caran Mewlana Idrîsê Bedlîsê ji bona Kurdistanê date birêkirin, da ku ew Eşîr û Serokên Kurdan beramber bi dijbûna Şîîyan û Şah Ismayil ve bide dilbijandin. Bi rastî jî ve rabûn û bizavên Mewlana Idrîs kêrekeke zor gewre dane bikirin.

Li dawîya cenga Çaldêran de li nava Kurdistanê de li hemû layekî de serhildan û liberrabûnê dijî Iranîyan datin bidestpêkirin.

Xelkên Diyaberkirê Mohemed Xan Kurê Ostancelî Serdarê Kurdistanê ji bal Şahê Îranê de dane biderkirin û wan serên xwe ji bona dewleta Osmanî datin bidanîn. Di vê pêla hanê jî de Şeref Beg Mîrê Bedlîsê ala Osmanî date bihildan û Xalid Begê Birayê xwe, yê ku ew ji bal Serdarê Ecem hatibû binîşankirin, date biderkirin.

Wehajî Melek Xelîlê Serdarê rewayî Hesen Kêfê û Sêrtê jî, yê ku ew ji binemala Xanedanê Eyubî bû, bermaber bi Şah Ismyil ve serê xwe date bihildan, belam ew ji bal Şah Ismayil ve hate bigirtin û welatê wî ji bona Qere Xan Birayê Ostancelî Zade date bidan. Bi rastî jî ve Qere Xan Sêrtê date bizeftkirin û çend caran jî wî hêrîşî Hesen Kêfê date bikirin, belam ew di wan de nehate biserkevin.

Mîrê Sasonê Mohemed Beg welatê Herzen -Xerzan-[259] ji Mîrê Suwarên Şah Ismaîl date bizeftkirin. Seyid Ehmed Begê Zirqi bi yarmetîya Xelkên Diyarbekrê ve bajarên Ataq û Miyafarqîn deta bidagîrkirin. Qasim Beg jî Egîl date bidagîrkirin.

Wehajî Merdîsê Cemşîd Beg jî Palo bi navê Sultan Selîm date bivegirtin. Bextî Beg[260] Serdarê Leşkerê Îranî li Cezîra Ibin Umer de ligel sipahê Îranîyî wê navê de date biderkirin. Mîrê Soran Seyid Beg Kurê Şah Ali Kerkuk û Hewlêr date bidagîrkirin. Bi kurtî ve bicgeh li van jî de şanzde Mîrên Kurdên tir jî hevalbedîtîya xwe ji bona Sultan Sulêman datin bidazanîn.

Sultan Sulêman beramber bi vê zîneta hanê jî ve dîsan Mewlana Idrîs date bilikarxistin, da ku ew ji kenarê gola Urmiyê ve û tanî Meletiyê hemû welatên Kurdistanê ji bona Sultan Sulêman bidebi misogerkirin.

---

[259]Ew welatê Erzenê Diyarbekrê ye, yê ku ew di nivîstên Mêjûwê û Vekirinên welatan de têtê binavkirin. Ew ne Erzena Romê ye, ya ku ew keleha berêyî Kalîkya-Qalîqya bû û ew niha keleha Erzeromê ye.

[260]Bi rastî Bedir Begê Bextî Serdarê Cezîrê hêzek date binardin, da ku ew nehêlin, îranî hêzên xweyî li Mêrdînê de dorlêgirtî bidin rizgarkirin. (M. E.).

li dawîya derketina Sultan Selîm de bi serketî ji Tevrîzê ve, Şah Ismaîl ji bona Tevrîzê hate bivegerandin, ya ku ew wê demê paytextê Sefewî bû. Wî Qere Xan bi hêzekê ji bona ser Diyarberkirê date binardin. Qere Xan di ser rêya Çepaqçor re çû û hêzên Îranîyî li kelehên Mêrdînê, Ruhayê û Hesen Kêfê jî ligel xwe de datin bihilanîn û bi ser Diyarberkê ve hat bidakevtin û çardora wê date bigirtin. Xelkên Diyarbekrê bi azava ve li ber xwe de datin bidan û wan Peyên xwe ji bona nik Sultan Selîm li Amasyê de datin binardin û jê yarmetî datin bixwestin. Sultan di bin Serleşkerîya Hacîyê Yekta[261] de hin hêz ji bona wan date binardin. Vê hêza hanê xêza dorlêgirtinê date bidirandin û xwe bi nava bajêr ve date bigihaştin.

Şah Isamaîl hin hêzên tir ji bona Qere Xan date binardin. Ev hêza hanê li dora Ercêşê de di nava çiyan û dolan de bû. Di vê demê de bi xwe jî Mewlana Idrîs jî hêzên Jihevbelavkirîyî Bedlîsê, Xerzanê, Mekes û Sasonê lihev didan bikomkirin û wî ew ji nivşkê de bi ser hêzên Ecem ve li Ercîşê de datin biberdan û ew jihev dane bitarûmarkirin.

Dorlêgirtina Diyarbekir ji salekê bêtir date bidirêjkirin. Kurdên liberxwedanên bajêr ji şer û nexweşîyê yanzde hezar kes li wan de hatin bimirin. Lê ev Qehremanên hanê çarde salan li dûhevdû de li ceng û şer de bûn. Wan tanî dawî biryara liberxwedane xwe dabûn.

Gava ku Mewlana Idrîs bi Hesen Kêfê ve hate bigihaştin, wî li Sultan Selîm kaxezek date biwergirtin. Li vê kaxaza hanê de Sultan dabû binivîsandin. ku wî Beyqîliyê Mohemed Paşa[262] ligel leşkerekî de ji bona yarmetîya Diyarbekrê dayite binardin. Mewlana ev xebera hanê li sere kaxezekê de nivîsand û wî ew bi baskê kevokê ve date bibestandin û ew ji bona Dorlêgirtvanan date binardin.

Sultan Selîm di kaxeza xwe de dabû bifermankirin, ku Mîrên Kurd divên hevbigirin. Mewlna ew hemû dane bikomkirin û ew li ser vê fermana hanê de dane biagehdarkirin. Herwehajî Sultan ji bona

[261]Di Mêjûma Hamer de Haci Yekta Ehmed de. Di Taca mêjûwa de ji bal Seed El-Dîn de, ya ku ew kevintirîn mêjûwa Osmanî bi zimanî Turkî ye, navê Yek Ehmed û ew di koka xwe de ji Xelkê Amede û ew ji Peyên dorhêla Sultanin. (M. E.).

[262]Ew Mohemed Paşa Ebu Şaribe. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Mohemed Paşa jî dabû binivîsandin, ku ew li Hesen Kêfê de ligel Mewlana de hevbibînin.

Bi rastî jî ve Mewlana ligel leşkerê Qasim, Cemşîd û Husên Beg de. yên ku ew deh hezar kes dibûn, li Hesen Kêfê de ligel Bîqelî Mohemed Paşa de hevdû dane bidîtin û wan tevan bi hev re rûwê xwe bi ser hêza Qurd Beg ve datin bivekirin û wan ew datin bi şikandin û li dawî de wan rûwê xwe ber bi Diyarberê ve date bivedan. Qere Xan newêrî bû, ku ew li dora Diyarbekrê de bête birawestandin. Zû wî şar date bicîhiştin û ew tev li leşkerê xwe de ji bona Mêrdînê çû. Ewende pê neçû, leşkerê Mewlana û Bîqli Mohemed Paşa bi Diyarbekrê ve hatin bigihiştin û ew ji bona nava bajêr çûn.

Li dawîya rizgarkirina Diyarbekrê de li ser temînîya Mewlna Idrîs de biryara çûna ser Mêrdînê hate bidan. Melana belav nameyek ji bona Xelkên Mêrdînê date binivîsandin û bi ayeteke Quranê jî date bixemilandin, da ku ew bêtir li ser Xelkê bide bikêrkirin.

Xelkê Seyid Alî ji bona lêbuhurandinê ji bona nik Mewlana dane binardin. Seyid Alî li dawîya gift û goyê de ligel Melek Xelîl û Mewlana de hate bivegerandin û biryara bû, ku ew dergehê bajêr ji wan re bidin bivekirin û Pasevanên Ecem bidin biberdestkirin. Bi xwe jî ve Qere Xan bi leşkerê xwe ve ji bona alîyê Şingalê çûbû. Di dawî de Mewlana û Melek Xelîl ligel hêzeke Kurd de çûn û bajar dane biwergirtin.

Belam Pasevan ji bona kelehê çûbûn û ew berdest nebûn. Ev keleha hanê zor sext û seng bû. Du carî Tîmorleng çardora wê dabû bigirtin, lêbelê pê nehate bigirtin.

Li dawîya vegerandin Şadi Paşa de li pêş zeftkirina Mêrdînê de Mewlana Idrîs kaxezek ji bona Sultan Selîm date binivîsandin û têde daxwaza alîkarîyê jê date bikirin. Li ser vê fr Sultan Selîm Xusro Paşa bi hêzekê ve (li buhara sala 1516 z. de û di destpêkirina sala 922 k. de) date binardin. Leşkerê Xusro Paşa bîst hezar kes bû.

Qere Xan li vê de linavçûna di navbera Bîqili Mohemed Paşa û Şadi Paşa de ji xwe re jê sûd date biwergirtin û Pasevanîya keleha

Mêrdînê date bixurtkirin. Ji Serbazên Şahîyî Taybetî 600 Qoroci[263] ligel Mîrê Hemedan û Gulşeher[264] de rûwê wan wî ji bona Şingalê dare bivedan. Li wêderê de ew tûşî Ebu El-Mewahib Çelebi yê Kurê Mewlana Idrîs û Mîrê Cezîrê bû. Li dawîya şerekî sivik de Ebu El Mewahib û leşkerê xwe rizgar bûn. Vê hêza Ecem xwe bi Mêrdîn ve date bigiyandin.

Keleha Mêrdînê û Hesen Kêfê jî hêjî ew bi destên Eceman ve bûn. Xusro Paşa û Bîqli Paşa yekdîgerbûn û Mewlana destbicî bi hêrîşkirinê ve bi başî ve date bidîtin. Mohemed Paşa waha nekir, lêbelê wî çar hezar kesek ligel Serdarê Xarpûtê Hesen Beg de[265] ji bona dîdarîyê date binardin. Ev hêza hanê tûşî hêrîşa Ecem bû û bi hezar bela ve jê hezar kes hate birizgarkirin.

Orduwên Bêqli Mohemed Paşa û Qere Xan li nêzîka Qoçhesarê[266] de tûşî yekbûn. Xusro Paşa li destê rastê de û Mewlana Idrîs ligel Melek Xelîlê Eyubî, Mohemed Begê Samsonê, Mîrên Şerwanat, Qasim Begê Egîlê, Seref Begê Bedlîsê, Daud Begê Nemranê, Ehmed Begê Zirqê, Şah Weled Begê Sulêmanî de ligel çar hezar kesekî de li destê çepê de bûn. Bîqli Mohemed Paşa di navînê de bû. Şerekî bi tûjî ve hate birûdan. Qere Xan zû bi guleyekî ve hate bikuştin. Navtêdana Mewlana hêrîşa Mêrîn Kurdan date bitûjkirin û wan Ecem tanî nêzîka Mêrdînê datin bezandin.

Di encamê vê biserketina hanê de Erxenê, Sincarê, Til Efer, Çermîk, Siwêrek û Bîrecek bi destên Osmanîyan ve hatin bikevtin. Şarê Mêrdînê dîsan bi destên orduwa Biserveketî ve hate biketin.

[263]Qoroçî yani Pasevan û Parêzvan. Ew rengekî ji Pasevanên Şahînîyî Îranî bûn.

[264]Weha di kokê de hatîye. Ew ji bal Hamer, bergê 4, R. 165 ji Wergerandina Turkî hatîye biwergirtin. Ji xwe re bêtir li Taca Mejûwan de ji bal Seed El-Din de bide temaşekirin.

[265]Ji Xarputê re mina ku li nik Ibin El-Esîr û Kamil de di Pêşiya musulmantîyê de keleha-Husun Ziyad pêdihate gotin. Ew niha Navîniya El-Ezîzê di Turkîyê de ye.

[266]Diyare, ku ew Dinîsera bajarê Mêjûyî kevnare. (M. E.).

Institut Kurde de Paris

Belam keleha wê her ma û ew berdest nebû. Serleşkerê wê Sulêmanê Xanî Birayê Qere Xan bû. Ev keleha hanê li layê Xusro Paşa de salekê dor lêhate bigirtin, belam sûdê wê nebû. Di dawîya dawî de li paş şerê Surî de Sultan Selîm Bêqli Mohemed Paşa ligel Topên gewre û leşkerekî de bi ser keleha Mêrdîne ve date binardin û ew date bizeftkirin. Hesen Kêf, Ruha, Reqa û Musil jî pê bi pê ve ji bal Mohemed Paşa ve hatin bidagîrkirin.

Li dawîya zeftkirina van kelehên sengîn, welat û bajarên tirî van navan jî tevan ji bona Osmanîyan serên xwe datin bitewandin. Eşîrên Kurdîyî Rûşûnî, Herîrî, Sincarî, Estacili, Cezîrî û Eşîra Erebîyî Mewalî jî yeko yeko serên xwe ji bona Osmanîyan datin bitewadin.

Bi kurtî ev welatên Kurdistanê bi jêhatbûn, şarezayî û siyaseta Mewlana Idrîs ve û bi mêrxasîya Mohemed Paşa ve bi vî rengî ve ji bona Osmanîyan tevde saxbûn.

Mewlana Idrîs li paş vê de dest bi damezrandinên serpereştîyê ve û bi rêk û pêk rêxistina kar û barên van welatan date bikirin. Kar û barên pêrabûnên wî ji bal Sultan Selîm de bi başî ve hatin bidîtin û ferman li ser wan de jê re hate bidan. Sultan heftdeh al û pêncsed bergên xelatê ji bona Serdarên dewletê û mîrneşûnîyên Kurdan, yên ku wan bav li dû bav de şûna hevdigirtin, date birêkirin[267]. Herwehajî ji bona Mewlana Idrîs jî bîst û pênc hezar Dokeyê Zêr jî datin birêkirin[268].

Institut kurde de Paris

[267]Weha di kokê de hatîye. Ji xwe re bêtir li ser vê de li Hamer de bide temaşekirin. (M. E.).

[268]Ev Peymanên, ku ew ji bal Mewlana Idrîs de bi navê Yawir Sultan Selîm de ligel Mîrên Kurdan hatine kirin, bi texmîn ev Bendên hanê di wan de hebûn:

1. Serxwebûna Mîrneşînîyên Kurd tête biparastin.
2. serdarîya Mîrneşînîyê ji Bav ji bona Kur dimîne, yanjî ew li gora rabûn û rûniştina cih de tête birêxistin. Sultan bi Fermanekê Şûngir dide nîşankirin.
3. Kurd li hemû Şerekî de yarmetîya Turk dide kirin.
4. Beramber bi Hêrîşên Derve Turk yarmetîya Kurd dide kirin.
5. Kurd Pêşên Ayînî-Risûmê Şerî bi Xanîyê Malî-Xizna Xelîfe divê bidin.

Ev Peymanname di navbera Sultan û Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd de di sala 920 k.-1514 z. de hate bigirêdan. Belam piştî Panzdeh salan dewleta Osmanî bi servajî vî sozî

Mewlana Idrîs ji bona hêsankirina serpereştîyê Diyarbekir ji bona çend melbendan date biparvekirin. Ev bi rêkxistina hanêyî baş ve li paş jî de bi ser Ruha û Musilê jî de hate bicihanîn. Taybetîya zîneta vî welatî, remana serbixweyî Serokên Eşîran, serazadîya Xelkê û mêldarîya wanî her û her ji bona şer û mer alîkarîya serpereştîyeke dewletîyî raste rast nebû.

Çunge Mewlana bi ezyeteke zor ve û bi xebateke dirêj ve ev welatên hanê bi navê Osmanîyan ve bi dest ve dabûn bixistin, wî dixwest, ku ew wan bi dan û sitendineke baş ve bi dewleta Osmanî ve bide bigirêdan. Ev jî pêwistî bicihanîna serpereştîyeke cihê bû, ji yên ku ew li welatên Osmanîyên tir de dihatin bicihanîn.

Sultan Selîm di vî warî de zor bawerîya wî bi Mewlana ve habû. Pirî caran wî Fermanên valan ji bona wî didan binardin, da ku ew bi aruzûwê xwe ve bide binivîsandin û bi her kesî jî li gora kêfa xwe de bide bidan[269].

---

wirde wirde ji bona linavbirina van Mîrneşînîyan destpêkir û wê tanî sala 1850 dawîya wan hêna.

[269](Ez li vir de Wergerandina Kurmancî ji Xwendevanan re didim pêşkeşkirin. Di bergê Kurd de bi zaravayê Soranî bes û bi tenha Nivîsandina hinekî ji koka wêyî Turkî ji Hammer, bergê 4 hatîye biwergirtin û nivîsandin. Di bergê Erbî de Peyman hemû ji bona zimanê Erebî hatîye biwergerandin. Ji vê wergerandina hanê wergerandina Kurmancî hatîye bikirin. Cuma):

Hêjayê Hêjan, Nîşana Qencan, Rêwîyê Rêya rast, Rêberê Kanîyên Ayînê, Bidîtinvanê dujwarîyên Oldarîyê, Berê Av û Axê, Hogirê Şah û Sultanan, Nîşana Xelkên Xwedanê Yektayî û Perestên wî Mewlana Şehrezayê Oldarîyê Idrîs, Xwedê hêjabûnên bêtirbike.

Debera, ew bizanibe, gava ku ev Fermana Bilindî Hayonî
pê bête gihaştin, ku Nameya we bi destên minî bextiyar hate bigihaştin. Ew bi vekrina tevaya Wilayeta Dirbekrê dide bimizgînîkirin. Evaya jî tevde başbûna Oldarîya we, pêsipartina we, dilsozîya we û rastîya we dide biderxistin, mîna ku ev tevde ji we tête bihêvîkirin. Xwedê Ruwê we bide bisipîkirin.

Ger Xwedayê Bilind xwest, dê tu bi hoyê vekirina tevaya Wilayetan bête bikirin. Tevaya Guhpêdanên mînî bilindî Patîşahî ber bi we ve têtin vekirin û ew ji bona we likarin.

Ligel Manganeyên weyî taybetî tanî Meha Şewala piroz du hezar Zêrê Filorî, Kurkekî Simore û yekekî Weşeq, du bergên Hirî, du bergên Çox, Kurkekî Hirî bi Kurkekî

Institut kurde de Paris

Simore betankirî, Kurkekî Hirî bi Kurkekî Weşeq betankiri û Şûrekî Zêrkirî bi Kalenekî pêcayî bi Coxekî Firengî ez didim birêkirin. Gava ku ew bi te bêtin gihandin, ger ku Xwedayê Merd xwest, dê tu wan bi Xweşi û bextiyarî bide bigirtin û tê wan ji bona xwe bide bixerckirin. Debera, tu bi Xweşi bijî; jiber tu bi hêjayî bi van rengên pir ji Dilovanîyên minî Patîşahîyî bi nerx tête biderbikevtin. Evanan jî tevde ji bona karên te û Diyarîne ji bona Rastî û Dilsozîya te ji te re têtin bipêşkeşkirin.

Jiber Mîrên, yên ku ew ji Diyarbekir hatin û wan bi dû te dan, tu li ser zîneta wan, li ser Nav û Nîşanên wan, li ser Sinceqên Wilayetê, yên ku ew ji bona wan divê bêtin binîşankirin, li ser Dostanî, Dilsozîya, Karnasî û kar û barên wan agehdare; jibervêjî min ji te re Fermanên Patîşahîyî Bilind Sipi bi Mora minî Bilind hatîye morkirin û ew ji bona Rûmetvanên Mîrên Mezin, Pîşta Serbilindên Gewre, Xwedîyê karin û rêzlêgirtinê, Xwedîyê Nav û Nîşanan, Piştgirtvanê bi rengên pir ji layê Xwedayê mayînê, Mîrê Mîrên Diyarbekir Mohemed Xwedê ber wî xeş bike.

Divê hûn belgeyên Sultanî li ser zîneta Sicenqên, yên ku hûn wan ji bona her Mîrekî didin nîşankirin, bidin binivîsandin. Herwehajî Nav û Nîşanên wan jî, erdên bi wan dayî bi rengekî baş û bitomarkirina wêneyên wan belgeyên Sultanî bi dûr û dirêjî û perên ji bona wan nîşankiri di Deftereke taybeti de bête nivsaîndin û ew ji bona nik min bête binardin. Da ku ew li vêderê de bête hilanîn û her tişt diyar û liberketî be. Herwehajî ligeljî bîrxistinek dûr û dirêj li ser şinceqan-melbendan, yên ku te ew ji bona Mîran dane pêşkeşkirin û çawabûna dana wan, şêweyê nivisandina nav û nîşanên wan û Diyariyên wan bi mercekî ev biparvekirin û û danên hanê bi kokê nedin kêrkirin, da ku ew pêwendîyên di nava wan de neyêtin lawaz û lerizandin.
Herwehajî min ji te re pelên Sipî morkin bi nîşana Bilindî Sultanî datin rêkirin, da ku tu wan ji bona wan Mîran bide binivîsandin, yên ku tu nivisandina wan baş dibîne. Tu li gora kêfa xwe dikare wan bide binivîsandin û wan ligel Diyarîyên Patîşahî bide rêkirin. Di pişt re tu dikare wêneyên wan belgeyên Sultanî, çawbûna diyarîyên wan û şêweyê reftarkirina ligel wan de di deftereke taybetî de bide bitomarkirin û wê ji bona nik cihê min bide rêkirin, ya ku ew penebûna dunyayê ye. Da ku her tiştek bi dûr û dirêjî diyar be.

Guhpêdana Sultanî di vî warê hanê ew li ser mebesta minî qenc bû. Ger ku Xwedayê Bilind xwest, dê mêldarîya min li ser wî wari de bête bigirêdan. Bawerbik, ku Mêldarîya min li ser wan Mîran pir ji hêvîya wan mezintir têtê biderbikevtin.
Niha Ismaîl El-Delalî Kurê Şêxê erdebîlî Hesen Beg û Behram Axa ji Peyên xwe bi Peyamberî ji bona nik cihê min dane rêkirin. Wan kaxezeke nivîsandî bi xwe re anîne, ku ew têde pir rengên jêrbûnê, berdestîyê, xwebiavêtine, şelafîyê û donkirinê ji bona bigirêdana Lihevhatinê û Aşitîyê didin biderxistin. Ew dibêjin, ku ew bi tevaya daxwaz û xwestîyên me bê qeyd û şert pê têtin birûniştin. Lêbelê divê bawerî bi peyvên wî û nêta wîyî pak neyête kirin; jibervêjî min fermana zindankirina Herdu Peyamberan di keleha Dîmotqe de û Peyên wan di keleha Kilîd El-Behir de date dan. Divê li ser te, tu jî ji alîyî xwe de bi baştirîn pêrabûn beramber bi yê navkirî bête rabûn, da ku ew pir bi pêgîrî ji bona kar û barên û berjewendîya dewleta minî hermayî

Institut kurde de Paris

Welatê Diyarbekrê ji bona nozdeh melbendan hatibû biparvekirin:

Yanzde ji wan weku damezrandinên Enedolê raste rast li jêr serpereştîya Torkan de dihatin bidîtinû heştên din jî bi rengekî ve her yek bi tenha xwe ve li jêr serpereştîya Mîrên Kurd de hatibûn bimayîn, ev jî:

Saxan, Qolp, Mihraniyê, Tarcîl, Ataq, Pertek, Çepaqçor û Çermîk bûn.

Sermiyandarîya van melbendên hanê bi destên Mîrên Kurdan de bûn û ew Şûngirî bûn, ango ew ji Bav ji bona Zarokên wî diman.

Biçge li van jî de pênc dewletên xweser bi Sultan ve vegirêdayî têde hate bipêkhatin. Ev jî evin:

Dewleta Egîl, dewleta Palo, dewleta Cezîra Ibin Umer, Xazo û Genc bû.

Li gora Cihannema de, li dawî de dewleta Xabur û dewleta Malşukur jî bi ser wan dewletên hanê ve hatin bibêtirkirin û Serdarên van dewletên pêvegirêdayî bi nîşana Mîrên Mîran ve hatibûn binavkirin Ew di sermiyandarîya xwe de bi carekê ve serbixwebûn. (Şerefname, Olya Çelebî, Muzenzade, Hammer).

Ev rengên pêkanînên hanê jî her bes ji bona Diyarbekirê bi tenya xwe ve nebûn. Li welatên Kurdistanê tirjî de hatin bicihanîn. Weku ku em li welatê Wanê jî de didib bidîtin, sî û heft melbend û çar dewletên Kurdîyî Pêvegirêdayî hatibûn bipêkhatin, yên ku ew xweser bi Sultan ve vegirêdayîbûn:

---

di dirêjbna rojan de bi kêrbin.

Di dawî de ez hêvîya kar û barên bilind û bi şop ji te didim bikirin.
Vê bizan û pişta xwe bi Nîşana minî pak bide bigirtin.
Di Navîna Meha Şewala Pîrozî sala Nehsed û Bîst û Yekê Kocî de di cihê Xanîyê Xilafetê de hatîye binivîsandin. Ederne.

(Pêşîya November sala 1515 z. de)

Institut kurde de Paris

1. Dewleta Hekarê: hêza wêyî çekdarîyî hergav deh hezar Şervan bûn. Di dema ceng û şer de hêza wêyî çekdarî bi çil, pênçî hezar Şervanan ve dihate bigihaştin.

2. Dewleta Bedlîsê: Derbarê hêza wêyî çekdarî de biger ew jî nala Hekarê bû.

3. Dewleta Mehmudî: Ew li Rojhilatê wanê de bû û nêzîka sed û bîst Êlekê dihate biderkevtin: Hergav şeş hezar Suwarên wê hebûn.

4. Dewleta Penyanş: Ew dirawsê dewleta Mehmudî bû. Her gav şeş hezar Serbazên wê hebûn.

Institut Kurde de Paris

Olyaçelebî bîcge li vanan de li ser pênc dewletên tir jî de dide biaxivtin, ku ew di dema wî de bi welatê Tevrîzê ve dihatin bigirêdan.

Ev dewletên hanê jî:

Qotor, Pîredozê, Colanê, Demdemê û Dunbilî bûn. (B. 4, r. 178).

Ev regên parvekirinên serpereştîyên hanê, yên ku ew berê hozanî û siyaseta Mewlana Idrîs bûn, bi rastî ve ew zor li ser pêwistî û dawxwazên cih de dihatin bilihevkirin.

Welatekî mîna Kurdistanêyî sext, Xelkekîyî wehayî şerker û serhildayî bi rengegîtir ve serpereştî nidihate bikirin û dê nehata bikirin.

Bi vî rengî hanê ve ev 46 Mîrneşînîyên, yên ku ew li Kurdistanê de li pêş pêla Sultan de hebûn, beşên wanî giring bi rengegî mîrî û Qanûnî ve hatin bihilanîn.

Mewlana Idrîs li dawîya tewawkirina pêkanînên epereştîyê de bi destên xwe ve û bi navê Sultan Selîm ve ji bona Serdar û Mîrên Kurd al û dahol dane bidan, ku evanan jî nîşana mîrîtîyî mîrneşînîyan bûn.

Melek Xelîlê Nevîyî dawîyî Sultan Selah El-Dîn jî di nava van Mîran de bû. Sultan Selîm ligel Mewlana Idrîs de bi rengekî pirî baş ve dida û distend û ji bona wî rêzlêgirtin û guhpêdaneke pir pê dida

bidan. Wî ew ligel xwe de di vegera xweyî Îranê de date bibirin û herwehajî ew li çûna Misrê jî de ligel Sultan de bû.

Bi vî rengî ve bi saya dan, sitendin û bikarkirina hozanîyî Mewlana ve welatekî zor sext û asê bigir bê şer û mer û bi arzû û helbijartina Xelkên wî ve ji bona dewleta Osmanî hate bimisogerkirin.

Ev rûdana hanê di mêjûwê de jirêderketî ye; Çunge ev welatê hanê ji pêla Aşuryan de û tanî wê roja hanê jî bermber bi hemû Vegirtvanan ve hatibû birawestandin. Hîç demekê ew bi carekê ve bi destên kesekî ve nehatibû bikevtin.

Aşur, Îran, Pars, Roma û Yunan hêza xweyî herî baş li van welatan de dane biwindakirin, ligel vê jî de weku Mewlana Idrîs ew ji bona Sultan Selîm date bisaxkirin, ew ji bona hîç yekekî tir ji bona wanên gotî nehatîye bisaxkirin.

Li dawîya mirina Şah Ismaîlê Sefewî de[270] Serdarê Kulhur û Mîrê Eşîra Mosloyî Kurd Zul-Feqar Xan bi leşkerekî baş ve rûwê xwe ji bona Bexdê date bivekirin. Di wê demê de Serdarê Bexdê Ibrahîm Sultan bû. Zul-Feqar Xan bi xwe û hin ji hevalbendên xwe ve ji bona layê Ibrahîm Sultan çûn.

Ji nivşkê wî hêrîş bi ser Ibrahîm Sultan ve date bibirin û wî ew date bikuştin. Li dawîya kuştina wî de tu kesî newêrî bû, beramber bi Zul-Feqar Xan ve bête birawestandin. Bi vî rengî ve Bexda bi hêsanî ve bi destên wî ve hate bikevtin. Di mizgeftên wê de Xutbe bi navê Sultan Sulêman ve hatin bixwendin û Zul-Feqar Xan bi navê wî jî ve serpereştîya Bexdê date bikirin. Bi vî rengê hanê jî ve Bexda bê şer ji bona nava serdarîya Osmanî hate bikevtin. Mîr Zul-Feqar ewende Merovekî aza û Serdarekî bidesthilat bû. Ew li serpereştîyî jî de şahreza bû. Wî gelekî kar ji bona Bexdadê date bikirin.

[270]Ew Ismaîlê Yekeme, Yê ku wî ji sala 907 k.- 1505 z. de tanî sala 930 k.- 1524 z. de Desthilatî wergirtibû. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Lêbelê dewleta Îranê dest lêhelnegirt. Şah Tehmaseb[271] bi leşkerekî ve li sala 936 k.-1530 z. de bi ser Bexdê ve hate birakişandin û demekê ew date biçardorî û bitengavkirin, belam pê ew bisernekevt. Li dawî de wî rêya fêlbazîyê bi pêş xwe ve date bigirtin. Bi dizî ve wî Birayên Zul-Feqar Xanî Alî Beg û Ehmed Beg date bixapandin. Van Birayên bêbext û bêhiş di dema nivîstinê de bi bêbextî ve Zul-Feqarê Xanî dane bikuştin û dergehê bajêr ji bona Şah dane bivekirin.

Di encam de wan bi xwe jî ve hîç li Şah nedîn û bajar bi xwe jî ve tûşî kuştin û kuştarîyeke giştî û dan û sitendineke naşirîn bû.

Ev rûdana zeftkirina Bexda û hin ji pirsên tir weku penabûna Şeref Xanê Bedlîsî ji bona Îranê û Olame Beg ji bona nik dewleta Osmanî ser li nû de navbera herdu dewletan hate bitêkdan û ew bi hoyê şer û merekî dûr û dirêj ve hate bikirin.

Şeref Xan Serdarê Şûngirîyê Bedlîsê, yê ku ew Kalê Xwedîyê Şeref Name ye, li ser hinek zinetên genî û gelacîyên beramberên xwe de li nik Sultan de gûman lêket û ew ji bona nik Şah Tehmaseb date penakirin. Olame Begê Teke jî, yê ku ew di pêşî de ji bona Îranê dabû bibazdan, di vê navê de wî ji bona nik Sultan Sulêman date penakirin. Sultan Sulêman Begler begitîya Bedlîsê û Hesen Kêfê pê date biqencîkirin. Weha ev pêqencîkirina hanê dijî sozê Sultan Selîmê Yekem ji bona Mîrên Kurdan bû; çunge ev herdu melbedên hanê dewleta wanîyî Şûngîrî hebû. Yekek ji hoyên turebûna Şerf Xan eve bû. Wehajî gava ku ev Olame Bege ji bona Bedlîsê hate birakişandin, Şeref Xan ew date bişikenandin û biderkirin.

Bi kurtî ve dewleta Osmanî ligel Îranê de ceng date bilidarxistin. Şah Tehmaseb destpêşgerî kir û ew ji bona ser Wanê hate birakişandin û çardorî lê date bigirtin. Ji bona hilanîna vê çardorlêgirtinê ducarî ji bal Serek Wezîr de hêzên Yarmetîdarî hatin binardin, belam her herdu hêz jî hatin bişikenandin. Serek Wezîr Ibrahîm Paşa bi Orduyekî ve li Payiza sala 940 k.-1533 z. de li Istenbolê de dest bi

[271] Ew Tehmasebê Yekeme, Yê ku wî ji sala 930 k.- 1524 z. de tanî sala 984 k.- 1576 z. de Desthilatî wergirtibû. (m. E.).

Institut kurde de Paris

rêkir; zivistanê wî li Helebê date birabuhardin. Li paş de di buharê de berê xwe wî ji bona Tevrîzê date bivekirin.

Li rê de xebera kuştina Şeref Xan pêgihişt û Şemse El-Dîn Kurê Şeref Xan cîgehê bavê xwe date biwergirtin û ew bi Serdarê Bedlîsê bû. Orduwa Osmanî bê şer û dujwarî di yekê muhereme 941 k.-tîrmeha1534 z. de ji bona nava bajarê Tevrîzê hate bikevtin. Li paş bîneke de Sultan Sulêman jî ji bona vî şarî hate biserdanîkirin. Li dawîya bînvedanekê de, tevî ku dunya zivistan û berf û baran bû. Sultan bi ser Hemedanê ve rûwê xwe ber bi Bexdadê ve date bivekirin.

Li rê de ezyeteke zor wî date bikişandin û bi taybetî ve di navbera Hemedan û Kermanşahê de gelek top û barên xweyî giran wî bi cî ve datin bihiştin. Di dawî de Serdar Ekrem Ibrahîm Paşa li cemada dawî de 941 k.- befirbara 1534 z. de ji bona nava Bexdadê hate kevtin.

Serdarê wêyî Ecem Mohemed Beg li pêş gihiştina orduwa Serdar de bajar dabû bicîhiştin û ew çûbû; jibervê jî sitendina Bexdadê bê şer û mer dikarîbû bête bikirin. Li dû Serdar Patîşah jî de ji bona Bexdadê hat.

Sulêman Paşayê Walîyê Diyarbekrê ligel hinek hêzan de di bin nav û nîşana Waliyetê (yekemîn Walîyê Osmanî) de li Bexdadê de hate bidannîn. Sultan di 28 remezana 941 k.-avdar 1535 z. de ji Bexdadê hate birêketin û bi ser Kurdistan û Meraxe ve ji bona Tevrîzê hate biçûyîn.

Yekek li rûdanê seyrî û destanî vê çûnê de kuştina Şefqet Beg Mîrekî Kurd û heft Peyên wî bû. Li gora bîr û bawerîya Mêjûvanê Hammer[272] de hoyê kuştina van Rebenan eve bû: Ku Sultan Sulêman di çûna xwe de hîç tûşî tu şerî nebû, wî xwest van vekirinên xwe bi carekê ve bi rijtina xwînê ve bide biperestkirin; bi vê remanê jî ve wî ev tawankarîya hanê jî ji xwe re date bihelbijartin!

[272]bergê 5, R. 159 ji Wergerandina Turkîyî ji bal Mohemed Eta. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Sultan Sulêman di 10 şubana sala 944 k.- 8 rêbenda sala 1538 de ji bo Istenbolê hate bivegerandin. Vî Serdarê hanê li çûna xweyî sala 955 k.-1548 z. de beşekî Kurdistana Îranê jî ji xwe re date bizeftkirin û li paş de rûwê xwe ji bona Tevrîzê date bivekirin, Belam çunge dewleta Îranê dor û piştên welatê Tevrîzê bi carekê ve dabû biwêrankirin, da ku leşkerê Osmanî jê sûd nede biwegirtin, Sultan Sulêman çûn li ser çûna xwe nema pê hate bikirin.

Ew ji bona ser keleha Wanê hate bivegerandin, ya ku ew zor sext bû û ew tanî wê demê jî hêjî bi destên Eceman ve hatibû bimayîn. Serdarê vê keleha hanê Alî Sultan Çeknîyê Kurd bû. Sultan ji Erzeromê topên gewre ji bona wê datin bihînanîn û di navbera neh rojan de wî Keleh date bizeftkirin, lêbelê bi hoyê zivistanê, serma û sole ve leşker zû hate bivegerandin. Şah Tehmaseb di vê kêsê de hêzek ji bona ser Qarsê date binardin, Behram Mîrza û Isamîl Mîrza jî ji bona ser Bayiburd date binardin, leşkerek jî ji bona ser Exlatê û Ad El-Ciwaz date binardin û wî jî bi xwe jî ve ruwê xwe ber bi Mûşê ve date bivekirin.

Sultan Sulêman di vê beynê de li Diyarbekrê de bû. Ji bona berbestîkirina pêşbikevtina Şah wî leşkerek di bin rêberîya Ehmed Paşa de date binardin. Ev hêza hanê li nêzîka Kemaxê de Qolekî Ecemî date bişikenandin. Birayê Şah Tehmaseb Şahzade Ilqas Mîrza[273] ligel Sultan Sulêman de bû, ligel pênc hezar Kurd de bi ser Kerkoye -Kerkuk- û Şarezorê ve rûwê xwe wî ber bi Îraqa Ecemî ve Hemedanê date bivedan. Olame Beg jî bi leşkerekî ve ji bona layê Erzeromê çû.

Mebesta Sultan Sulêman li van culandinan de peydakirina vêxistina serhildanan di nava Îranê de bû.

[273] El-Qas Mîrza li Wilayeta Şîrewan de Serdar bû. Di dema ku Şah Tehmaseb ligel şerê Gurcistanê de beşdar bû, vî Şahzadê hanê Şerxwebûna dewleta xwe ji Birayê xwe date dazanîn. Wî Pûl bi navê xwe dane lêdan. Şah Tehmaseb bi Leşkerekî pir xwe bi ser de date rakişandin. Şahzade xwe ranegirt û ew ji bona Daxistanê revya. Ji wir ew li Kefe de siwarî Gemîyê bû, ji bona Istebolê çû û ew li nik Sultan Sulêman penahinde bû. Di dema vêketina Cengê de ew bi hêvîtîya Şahîtîyê ligel Sultan de hat.

Bi rastî jî Ilqas Mîrza li nêzîka Hemedanê de têper bû û wî Qum date bigirtin.

Hinek hêzên Kurd ji bona alîyê Rê date binardin û wî bi xwe jî ruwê xwe ber bi Kaşan û Efsehanê ve date bivekirin. Belam gava ku wî bihîst, ku leşkerekîyî Qezilbaşî bi ser wî ve tête bihatin, wî rûwê xwe ber bi Fars ve date bivekirin û li wêderê jî de hîç pê nehate bigirtin û ew li dawîya aşîtîyê de ji bona Bexdadê hate bivegerandin.

Sultan Sulêman Şahzade ji bona Istenbolê date bibangkirin, Belam Ilqas Mîrza neçû û ew li ber Sultan Sulêman de hate birabûn. Dewleta Osmanî li sala 948 k.-1551 z. de Mîrên Amîdîyê, Hekarê û Biradostê bi leşkerên wan ve ji bona ser Şahzade datin binardin û wan ew ji nava xakê Osmanî bi revandin û biderkirin ve dane bipengizandin. Ilqas Mîrza xwe ji bona nava Erdelanê date bihavêştin û Mîr Surxab ew date biparastin. Belam leşkerê Qezilbaş li Merîwanê de ew date bitengavkirin û wan li keleha Merêwanê dor lê datin bidadan. Di dawîya dawî de Surax Beg ew date biberdestkirin. (Mêjûwa Cîhanê, Arayê Ebas).

Şah Tehmaseb li sala 961 k.-1554 z. de ser li nû de ruwê xwe ji bona Kurdistana navînî date bivekirin. Tanî Ezerbêcan û Diyarbekrê wî date bitalanîkirin û avedanî nehiştin. Li dawîya çend mehan de dewleta Osmanî dazanîna nengê date bikirin. Şah dîsan ji çar semtan ruwê xwe ber bi Kurdistanê ve date bivekirn. Welatên Wanê, Bedlîsê, Adilciwaz, Ercîş û Muşê tev bi carekê ve date bitalankirin û kuştarekî zor di nava wan de date bikirin. Exlatê-Xelatê wî date bizeftkirin û li dawîya dorlêgirtineke çar mehan de Ercîş jî date bigirtin û li dawîya vêna jî de li Bargerî jî de date bidorlêgirtin.

Ismaîl Mîrza jî bilLeşkerekî ji bona ser Erzeromê çû û wî li wê derê de Iskender Paşa date bişikenandin û wî ew nava hanê date biwêrankirin. Li paş de ew ji bona layê Şah hate bivegerandin.

Vê carê jî ew ligel Qoroci Başi Sondok de ji bona vegirtin û wêrankirina Kurdistana mayî ferman pê date bidan. Bi rastî ve hov û dirîtîyeke weha wan li Kurdistanê de datin bikirin, ku bi carekê ve vegirtina Holako û Tîmorleng didin bijibîrbirin.

Bi kurtî ve Sultan Sulêmanê Qanûnî di dema serdarîya xwe de çend caran leşker bi ser Îranê de date bibirin, di encamê van hemû şerên xwinavî de Îraq, Şarezor û Balek[274] ji bona wî hatin bimayîn.

Beramber bi vê ve Kurdistan, ya ku ew di nava van hemû şeran de cihê bingehîyî şer û ceng bû, bê qam tûşî mal wêranîyê û kuştarekî giştîyî çend salan bû.

Çi li leşkerê Qezilbaş de û çi li orduwê Osmanî de Kurdistanê şer û zîyaneke pir date bidîtin. Dewleta Osmanî bi hoyên destdirêjîyên Şahzade Hemze Mîrza ve leşkerek din bi serdarîya Serek Wezîr û Serdar Osman Paşa ve ji bona ser Îranê date binardin, Hemze Mîrza Pêşdarên leşkerê Osmanî li Sofiyan de zor bi pîsî ve date bişikenandin û wî qolekîtir jî date biperîşankirin. Osman Paşa xwe bi Tevrîzê ve date bigiyandin û wî ew date bigirtin û sê rojan wî kuştina giştî têde date bikirin.

Li 12 El-zul-Qude sala 994 k.- 25 çirîya pêşîyî sala 1585 z. de Hemze Mîrza orduwê Cexale Zade Sinan Paşa jî date biperîşankirin û zor jî lê datin bigirtin; li dawîya çar rojan de ew tûşî leşkerê Serek Wezir bû û wî ew jî date bişikandin.

Bi kurtî ev Şahzadeyê aza li dawîya çil pêncî şerên biserketî de bi bêbextîya Eşîrên Turkumanî ve, yên ku ew hevalbendên Osmanî bûn, bi dizî ve gava ku ew nivistî bû, hate bikuştin.

Li sala 998 k.-1589 z. de Cexale Zade Sinan Paşa ji Bexdadê ruwê xwe ber bi Îranê ve date bivedan û tanî Nehawed date bidagîrkirin. Li ser vê Şah Ebas[275] Heyder Mîrza ji bona Istenbolê date binardin û wî daxwaza Aşîtîyê date bikirin.

Di newroza sala 998 k. 21. avadar 1590 z. de peymaneke aşîtîyê hate bigirêdan.

[274]Navê Eşîreke Kurde, ya ku ew niha li nêzîka Rewanduzê de li Jorî Îraqê de ye.

[275]Her ew Ebasê Yekeme, yê ku wî ji sala 995 k.- 1587 z. de tanî 1037·k.- 1628 z. de Desthilatî wergirti bû. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Li gora vê peymanê de welatên Ezirbêcanê, Şîrwan, Gurcistan, Loristan û Şarezorê bi destên dewleta Osmanî ve hatin bikevtin.

Herwehajî divabû rêça Şiîtî jî ji Îranê bihata bihilgirtin, lêbelê eve bi xwe jî ve xewneke xav bû. Aşîtîya vê carê sêzdeh salan date bidirêjkirin.

Di pêşîya sala 1012 k.-1603 z. de disan ji nû ve nîşanên şer û mer dihatin biderkevtin. Hêza Parastina Tevrîzê bi mehneyekê ve hêrîş ji bona ser Xazî Beg Serdarê Selmasê date bibirin û ew welatê hanê date bitalan û biwêrankirin. Xazî Beg xwe ji bona layê Şah Ebas date biavêtin.

Li ser vê jî de Şah bi Orduwekî ve ji bona ser Tevrîzê ve hate birakişandin û wî leşkerê Osmanî date bişikandin û bajar jî date bizeftkirin. Li dawî vê de wî ruwê xwe ber bi Rewan -Arîwan-Arîvanê- ve date bivekirin. Her avanîyek li rêga de bû, ew dihete bitalan û biwêrankirin. Di vê çûna hanê de jimareke baş li Kurd de di bin serpereştîya Mustefa Begê Mako û Serdarê Alşugurd de di yarmetîya Şah de bûn.

Sala duwayî jî şer date bidirêjkirin[276]: Serdar Cexale Zade leşkerekî Turk û Kurd ji bona layê Xoy û Nerend date binardin. Serleşkerê wan Mustefa Paşa bû û ew tanî Xoy hat bigihandin û li wê de wî Sulêman Begê Serokê Eşîra Mehmudî ji bona Merend date binardin û wî ew navaya pê date bitalankirin. Di wê salê de bi xwe jî ve Şah Ebas leşkerekî ligel El-lah Wîrdî Xan de ji bona ser Wanê date binardin û Serdarê Turkî jî li wê de bû.

Leşkerê Qezilbaş ew nava hanê date talankirin û hate bivegerandin. Şah Ebas bi xwe jî ve ligel leşkerekî zor de ji Xoyê ve ruwî xwe ber bi Eşîra Mehmudîyî Kurd ve date bivekirin. Mustefa Begê Serokê vê Eşîra hanê di keleha Mako de baş li ber date bidan . Belam leşkerê

[276]Insiklopêdîya musulmantîyê dibêje: ku vê rûdanê di Mêjûwê sala 1013 k.- 1604 z. de rûdaye. Belam Mejûwa Alem Arî Ebasî Farisî dibêje: ku ev rûdana hanê di sala 1014 k.- 1605 z. de hatîye rûdan.

Institut Kurde de Paris

Ecemî jî Xakê Mehmudî date bitarûmarkirin û têde talanî û kuştarekî zor date bikirin[277].

Di wê salê de bi xwe jî ve Serek Wezîr Cexale Zade bi orduwekî gewre ve û ligel Serdarê Cezîrê Mîr Şeref, Mîrên Mehmudî, Behsenî, Hekarî, Zekerîya Xan û Birayên wî û Mayên Mêrên Kurdên tir de li dawîya payizê de ruwê xwe ji bona Ezerbêcanê date bivekirin û tanî Selmasê hate bigihandin û li şeş fersexan de dûr ji Tevrîzê ligel orduwê Qezelbaş de bi şer ve hate bikevtin û ew zor xerab hate bişikestin. (Ev şerê hanê di 24 Cemada dawî de sala 1014 k.- 7 çirya paşîna sala 1605 z. de hate bivêketin). Li dawîya vî şerê hanê de hin ji Mîrên Kurd ji orduwê Osmanî cihê bûn. Kurê Canpola ji bona Wanê vegerîya û Mîr Şerefê Cezîrê jî ew ji bona Cezîrê çû.

Li 4 sefer sala 1015 k.- 1606 z. de Delê Ferhad Paşa bi Serdarê Leşkerên Rojhilatê ve hate bidanîn, çunge Cexale Zade li dawîya şerê Tevrîzê de hatibû bimirin. Belam dewleta Osmanî bi hoyê serhildana Kurê Can Pola û Celalîyê Enadolê hîç pê nedihate bikirin.

Institut kurde de Paris

### Serhildana Kurê Can Pola

Xanedanê Can Polayê Kurd Serdarê Şûngirîyê Keles bû. Di pêla Cexale Paşa de Gewrê vê Malbatê Mîr Hisên bû û ew ji bal Serek Wezîr ve bi Begler Begê Helebê ve hatibû bikirin. Belam her çilo bû, ew ji bona şerê Îranê neçû. Li ser vê jî Serek Wezîr gir lêhelgirtibû.

Li dawîya şikestina Tevrîzê de gava Serek Wezîr jê vegerîya, wî ew ji bona nik xwe date bangkirin û wî ew date bikuştin. Mîr Alîyê Birayê wî gava ev xebera hanê date bibihistin, ew ji bona Helebê çû û wî li dewleta Osmanî de rûwê xwe biwergerand. Li dawîya beynekê de wî Terablusê Şamê jî date bigirtin û dor û berên Şamê dane

[277]Iskenderê Menşi, yê ku ew danerê Mêjwaû Alem Arî Ebasê Farîsî ye, dibêje, ku Talanî ewende zor bû, ku Mihek li nik sipahê Îranî de bi 50 Dînarî, ango bi Bîst Qeranan û Gayek bi 200 Dînarî dihate firotin. Çend hezar Jin û Mendal jî bi Dîlî hatin girtin. bergê 2.

bitalankirin û bi serxweyî dest bi serpereştîya dewletê date bikirin. Orduwekî baş date bipêkanîn, Xutbeyên Înê bi navê xwe date bixwendin û pûl jî datin bilêdan. Ligel Qeralê Toskana[278] Arşîdok Ferdinad de li 10 cemada dawî de sala 1016 k. çirîya pêşîya 1607 z. de peymanek date bigirêdan û xerîk bû, ku ew ligel dewletên din peymanên wisa bide bipêkanîn.

Serek Wezîrê bi nav û deng ve Qoyoçi Murad Paşa ji bona temirandina liberrabûna li Enedolê de hatîbû bikarmendîkirin. Li pêş Enedolê de wî rûwê xwe ber bi Can Pola ve deta bivedan. Wî wist di pêşî de di navbera xwe û Can Pola de kar û barên xwe bide bisafîkirin. Kurê Can Pola jî bi xwe jî ve wî xwe ji bona vî karê hanê dabû bilikarxistin û bi leşkerekî giran ve (20. 000) Suwar û ewendejî Piyade Derbendê Baxrasê dabû bigirtin. Wî li wêderê de çavdêrîya Leşkerê Osmanî dida bikirin.

Qoyoci Murad Paşa bi leşkerekî pir zor ve ruwê xwe ber bi Can Pola ve date bivedan. Di nava orduwa Osmanî de û li jêr serpereştîya Zul-Feqar Paşa de 40.000 Kurdên Zu-Qedriyê[279] hebûn. Murad Paşa cîgehê leşkerê Can Pola ji bona xwe yarîderê şer nedît; jibervêjî ew di Derbendê Erselan Belê de tê per bû û Layê Can Pola girt. Du Leşker li deşta Oroc de di 3. receba sala 1016 k.- 24. çirya pêşîya 1607 z. de berengarî yekbûn. Şerekî giran di nava wan de hate bidadan. Nîvê leşkerê Can Pola linavçû û ew hate bişikestin. Can Pola jî bi neçarî ve ji bona Helebê vegerîya. Belem li bajêr jî de koncek jî ji bona wî nebû. Ew helsa û ji bona Istenbolê çû. Sultan Ehmed[280] lêbuhurî û Begler Begîtîya Temşuwarê[281] dayê. Birayên wîyî Biçûk jî li Enderonê

[278] Yekek ji Dewletên Biçûkên Italîyî berî Yekitîyê ye. (M. E.).

[279] Yanjî Dolgader mîna ku li nik Ibin El-Werdî de hatîye. Ew Mîrneşînîyeke Turkumanî li sala 740 k.- 1339 z. de tanî 928 k.- 1521 z. de li Mereş û Bustan de bû. Ew li jêr destê dewleta Memalîkê Misrî de bû. Ew ji bal Osmanîyan hate nabûdkirin. (M. E.).

[280] Ew Sultan Ehmedê Yekeme, yê ku wî Desthilatî ji sala 1012 k.- 1603 z. de tanî 126 k.- 1617 Z de wergirtî ye.

[281] Yekek ji Heremên welatê Nemsawî-Utruşê ye, ya ku ew wê demê li jêrdestîya Dewlet dê bû. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Hemawend de date biwergirt. Belam vê lêbuhurandina Sultan kîna Murad Paşayê Xwinxuwar neda birawestandin. Wî ferman date binardin û ew li Belgirad de date bikuştin.

## Rûdana keleha Dum Dum

Ev destana gernasîya Eşîrên Biradostîyî Mukrî û liberxwedana keleha Dum Dum li gora pîvana nivîsandina vê mêjuwê em nikarin wê direjbûn û firehbûnê pêbidin; bi rastî ve zor pêwiste, ku derbarê vê nimûna bilindî merdayetîya Kurd nivîsteke serbixwe ji bona Netewê Kurdî îro û sibeynê bi yadgarî ve bête bicîhiştin.

Ev qehremanîya bê sinor enewende balkişandî û bilinde, ku bi servajî ve xwîngerbûna rêçî jî û bendegirtina mîrî jî -Iskender Menşi[282] neçarkir, ku ew wê şabaş û pesin bide bikirin.

Rojhilatnas Misyo (Oskar. Mann) bi hemû bilindayetî û berzbûn ve vê destana hanê bi bîranîn dide bixistin û bi zimanekî pir bi rêzlêgirtin û hêjakirin ve wê dide biwênekirin.

Qehremanê vê destana hanê Mîr Xanê Yekdeste. Ev ciwanmêrê hanê ji Mîrên bi nav û dengên Eşîra Biradost bû û li şerekî de wî yarmetîya Umer Begê Serdarê Sorani date bikirin û destekî wî di wî şerî de birya bû. Mîr Beg li dawîya vê de, ku Şah Ebas Ezerbêcan date bisitendin, ji bê guhpêdana Turk ji bona wî tûre bû û ew ji bona layê Şah Ebas çû. Şah Ebas li wî de rêzlêgirtineke pir lê date bigirtin û destekî zêrînî ji bona wî date biçêkirin û ew li cîhê destê birî date bidanîn. Navnîşana Xan ligel dewleta Tergever, Mergever, Ormê-Urmiyê, Şino û Serokitîya Eşîra Biradostê Şah pê date bidan. Ew ji bona nava Xakê xwe hate bivegerandin. Li wêderê de li cîgehê keleha Dum Dum de keleheke sext wî date biduristkirin[283].

[282]Iskender Menşi Nivîsvanê mêjûwa Alem Arî Ebas di dema Şah Ebas de ew Mêjûnivîsvanê dewleta Îranî bû.

[283]Li gora goyên wê Navê de ev keleha hanê di pêla Şahê Sasanî de avedan bû û ew Sê Fersexan ji bajarê Wirmiyê-Ormiyê dûre.

Institut Kurde de Paris

Mîrên Şîe bi hoyê cudabûna rêçî û milîbûnê ve dilê wan pê nexweş bû. Wan li layê Şah de boxtan pêdikirin; bi taybetî ve derbarê durustkirina keleha wî bû, ku ew bê destûtra Şah bû. Vê jî bi xwe ve hoyê pirkirina buxtanan dida bibêtirkirin.

Pîr Bodaq Begê Serdarê Azirbêcanê destê xwe dirêjî nava vî karê hanê date bikirin û Şah li desturdanê ji bona avakirinê kelehê date bipoşmankirin. Wî xwest, ku Mîr Xan ji bona avanîya kelehê destên xwe bide bihilgirtin.

Mîrê Biradostî li vê de bînteg bû û wî guh nedayê. Keleha xwe wî avakir. Di vê pêlê de bist hezar Çeteyên Celalî ji tirsa Qoyoci Murad Paşa ji xakê Osmanî ji bona xakê Îranê revîyan.

Şah Ebas -bi remaneke dawî ve- wist, ku ew heşt heza kesek ji van li nava Eşîra Biradost de bide bidanîn. Evan ligel Hesen Xan û leşkerekî de ji bona layê Mîr Xan datin binardin. Şah xeber jî ji bona Mîr Xan date binardin, ku ew bi xwe û yanjî Kurekî xwe ve ligel hin ji Serokên Biradost de û du sed Suwarekî jî bi kêleka wan ve bide bixistin û biçin, da ku ew Çeteyên Celalî bidin bicigîrkirin.

Mîr Xan ji tirsa dawîya vê û pênerûniştina Eşîra xwe ev fermana hanê bicîhneanî û Kurd, Qezilbaş[284] û Celalî[285] ligel hev de bişerkevtin. Leşkerê Hesen Xan hîçî pê nehate bikirin).

Di dawîya dawî de li jêr Fermandarîya Wezîrê Gewre Mutemed El-Dewle de leşkerekî zorî tir Şah ji bona ser Mîr Xan date binardin. Li dawîya karekî bê sûd de ji bona razîkirina Mîr Xan Wezîrê Îranî di 26 şebanê sala 1017 k.- 5 befirbara sala 1608 z. de li keleha Dum Dum çardorî lêdate bigirtin.

---

[284] Qezilbaş bi Turkî ango Sersor. Ev navnîşana hanê ji bona Îranîyan re di pêla Sefewî de dihate gotin; jiber ew bi Sersorî pêçayîbûn. Di pişt re ew ji bona tevaya Şiîya û ew nemaze ji bona Xwîngermên wî dihate gotin.

[285] Celalî ew demekê li Enedolê de di bin Serokitîya Celal-El-Dîn de li ber Dewletê rabûn. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Li gora peyvên Iskender Menşî de, yê ku ew bi xwe jî ve di nava vî şerî de bû, ev keleha Dum Dumê zor sext bû û bi tenha ve di derbarê avê de ew lawaz bû.

Li nava wêna de golek ji bona ava baranê û çalek ji bona civandina berfê hebû. Li dora wê jî de kanîyek hebû û li jêr erdê ji kelehê Tanî kanîyê rêyek hebû.

Leşkerê Qezilbaş -ku bi texmînî ve bîst û sê carî ji liberxwedanvanan bêtir bû- li dawîya çar mehên bombebarandinê de û hemû rojekê şer û kuştar inca dikarîbûn rêya kanîyê bidin bigrtin.

Tanî wê de deme jî beramber bi hêrîşên Kurd ve û bi şevgirtinên wan ve ji bona ser leşkerê Îranî zîyanên zor bi Îranyan ve didan bixistin; pir Şerkerên wanî bi nav û deng ve li kîs çûn.

Ceteyên Celalî jî, yên ku ew hoyên vî şer û merê hanê bûn, tanî vê mêjûwa hanê jî wirde wirde jihevbelavbibûn û ew ji bona xakê Osmanî çûbûn. Lê li gerandina xwe jî de wan li talankirin û kuştina Qezilbaşan de terxeminî nekirin!

Li dawîya, ku kanî bi destên leşkerên Qezilbaşan hate bikevtin, Dorlêgirtvanan nêzîka bîsst rojan bi ava genîyî baranê û ava çalêyî berfê ve dane birabuhurandin. Wan dev ji şerê xwe bernedan û şer ji nava kelehê ji bona derveyî wê dane biderkirin. Tev li vê jî de li derbarê avê de ew bê dest bûn. Bi qudreta Xwedê ve di wan rojan de, ku ew di pêşîya zivistanê de, bareneke zor barî û nêzîka mehekê wê date bidirêjkirin. Gola kelehê bi ava baranê ve pirbû û kêmasîya wanî avê ji bona şeş mehan hate bimisogerkirin.

Serdarê leşkerê Qezilbaşan ku ev zanî, bi neçarî ve biryarîya zeftkirina Kelehê date bikirin; bi şêweyekî rêxistî ve leşkerê Îranî ji bona nêzîkbûna kelehê hate bipêşvexistin.

Li dawîya çend mehan de ji ezyet û zîyaneke zor burcek bi tenha ve, ya ku ew li jêr serpereştîya Qera Beg bû, hate biruxandin, Liberxwedanvanên wê hatin bikuştin û ew bi destên Qezilbaşan ve

Institut kurde de Paris

hate bikevtin. Ev biserketina hanê îşê Qezilbaşan date bisivikkirin û kar û barên Liberxwedanvanan date bigirantirkirin.

Lihev hate birasthatin, ku li dawîya vê rûdanê de Wezîrê Gewre ket û pir hate bimirin. Şah li cîgehê wî de Mohemed Begê Begdeli bi Serdarî ve date bidanîn û ew date binardin. Li dawîya beynekê de bi kêra bombebarandinê ve burceke tir jî kunek têde date bivekirin û li dawîya şerekî bêhêvî de Liberxwadanvan hemû hatin bikuştin û burc bi destên Qezilbnaşan ve hate bikevtin.

Zorî pe neçû, burceke tirjî, ya ku ew li jêr serpereştîya Kurê Mîr Xan de bû, ji bal Pîrbodaq Xanê Serdarê Tevrîzê hate bizetfkirin.

Bi vî rengî ve karina Liberxwedanvanan zor kêm bû û li hemû layekî de li jêr barandina gulên top û tivingan de bûn ew li cîhekî piri teng de bûn û biderbikevtin jê ji bona wan pirî bidijwar bû.

Diwarên kelehê li hemû layekî de dihatin biherifandin û leşkerê Ecem ji bona nav Kelehê çûn, ji bil Xaniyê Mîr Xan ve, yê ku ew bi keleha Narîn ve bi nav û deng bû.

Cigehekîtir bi destên Liberxwedanvanan ve nema. Mîr Xan beramber bi vê rewşa hanê ve çav ji liberxwedanê berda û xeber ji bona Serdarê Ecem date binardin û ew berdest bû.

Lêbelê li dawîya berdestbûnê de wan xwestin tevan bidin bikuştin; jiber vê jî dîsan wan ji bona çekan destên xwe datin biavêtin.

Dest bi dest, rû li rû, sing li sing ve şer ligel Mîr û leşkerên Qezilbaşan datin bidadan û zor ji wan datin bikuştin. Lêbelê dawî pê nehat. Di Encamê dawî de hemû bi merdanî ve hatin bikuştin û yekekî sax di nava wan de nema.
Bi kurtî ve burc û rexên Dum Dum nêzîka salekê li şopên gernasî, mêrxasî û qehremanîya Mukrî ji xwe re lê didan bitemaşekirin. Di dawîya dawî de wê gewdeyên perestî wan Gorîvanên rûmeta welatê xwe jî li jêr xakê xweyî pak de bi wan cilên wanî xwînavî ve date biveşartin.

Institut Kurde de Paris

Keleha Dum Dum li dawîya şeş salan de careke tirjî bi destên Kurdên Biradost ve hate bikevtin, belam li pêş ku Liberxwedanvanên wê xwe bi baş ve bidin birêkûpêkxistin û xwe bi serhev ve bidin bikomkirin, Gewreyên wan tûşî belabûn û Liberxwedana kelehê bi wan ve nehate bipêkirin.

Qehremanê vê carê Elog Beg bû. Şah Ebas keleha Dum Dumê bi Mohemed Bêgdelî ve dabû û wî jî Qubad Xan Birayê xwe li ser de danîbû.

Elog Beg bi rêya hin ji Kurdên di nava kelehê de di şevekê de, gava ku Qubad Xan li wê de nebû, bi xwe û çil kesî ve û li kunekê de ji bona nava kelehê çûn û Parazvanên wêyî Qezilbaşan hemû kuştin û Keleh jî zeftkirin.

Li dawîya vê de Aqa Sultanê Serdarê Meraxê bi leşkerekî Sivikbar ve xwe bi Dum Dum ve date bigihandin. Li rêga de ew tûşî 150 kesên Kurdên, yên ku ew di hewara Elog Beg hatibûn, bişerkevt. Wî ew şikandin û ligel Qubad Xan de wan hevgirtin.

pîr Bodaq Xanê[286] Serdarê Tevrîzê û Şer Sultanê Mukrî jî di hewara wî de hatin û wan bi hev re çardorî li Kelehê de dane bigirtin.

Di wê gava ku Elog Beg de barûd bi ser Peyên xwe ve didate bidabeşkirin, bikarîna Xwedê barûdê agirgirt, dev û çavên wî hatin bisutandin û hinek ji Hevalên wî jî birîndar bûn. Êtir kesekî weha nema, ku ew sermiyandarîya Liberxwedanvanên Kelehê bide bikirin.

Bi neçarê ve di bin tarîya şevê de Elog Beg li ser Wilaxekî de datin bidabestandin û keleh wan datin bicîhiştin û ew derçûn. Tenha neh rojan Dum Dum bi destên wan ve bû.

Institut kurde de Paris

[286] Ev Pîr Bodaqê hanê Yekekî zor Dujminê Sunîyên Kurd bû. Bi karîna Xwedê li sala 1025 k.- 1616 z. de ew bi destê Zînel Xan Mîrî Kurdê Mehmudî ve hate kuştin û tola Mîr Xanê Yekdest jê hate sitendin.

Vegurandina Eşîrên Mukri

Di pêla Sultan Muradê Siyem[287] de di sala 991 k.-1 584 z. de Serdarê Mukri Emîre Paşa bû. Di wê demê jî de orduwa Osmanî li dora Tevrîzê de derbarê Xelkên Şîeyî Seldoz, Miyan Do Ab û Meraxe de hin sitemkarî dabû kirin û melbenda Qeraçoq jî, ya ku ew ji Maldarîyên Şah bû, dabû bitalankirin.

Herwehajî li zemanê Emîre Paşa jî de Kurê wî Şêx Heyder Serekê beşekî ji Mukri bû. Ew ji bal dewleta Osmanî ve bi Begler Begîyê ve hate binavkirin. Belam li dawî de ligel Cafer Paşa Serdarê Tebrîzê de têkçû. Di wê gava çûna Şah Ebas de ji bona ser Ezerbêcanê ve Şêx Heyder ji bona layê wî çû û jêre dilsozîya xwe date binîşandan. Şah Ebas welatê Meraxe jî bi ser ve pê date bidan.

Li dawîya dawî de ligel Şah de ew diçû û dihat û ew li şerekî de ji şerên Şah li Rewanê de hate bikuştin. Şah Ebas Kurê Şêx Heyder, yê ku ew hişta Menal bû, li cîgehê Bavê wî de date bidanîn. Ji bal Dayika wî de sermiyandarîya Mîrneşînîyê dihate bikirin. Belam Xizmên wî bi vê sermiyandarîya hanê ve hatibûn bidiltengkirin.

Li dawîya dawî de Şah li Qubad Xanê Kurê Şêx Heyder de tûre bû. Çûnge bi hoyê cudabûna rêçê ve ew ligel Mîrên Ecem de nedihate birêkkevtin û her her wan li nik Şah de boxtan pê didane bikirin.

Di wê Pêlê bi xwe jî ve Evdal Xanê Mameş jî serê xwe date bihildan û ew ji bona nik Mîr Xanê Biradostê çû. Her çilo jî bû, li gora fermana Şah de wî beşdarî ji bona ser keleha dum dum neda bikirin; jiber vê û li ser gelacîyên tirîyî Mîrên Şîe jî de di dawîya dawî de Şah Ebas biryarîya qirkirina Eşîrên Mukri date bidan.

Di sala 1019 k.-1610 z. de Şah Ebas bi xwe ve berê xwe ji bona Meraxe date bivekirin. Li layekîtir jî de Şah gelekî nermûn û dildarîya

[287]Wi Desthilatî ji sala 982 k.- 1574 z. de tanî sala 1003 k.- 1595 z. de date biwergirtin. (M. E.).

xwe beramber bi Qubad Xan ve date biderxistin. Bi vê nermûn û dildarîya hanê de Qubad Xan hate bixapandin û ew ligel hinekan de ji Mîrên Mukri û du sed û pêncî Suwarî de ji bona layê Şah hatin biçûyîn. Gava ku ew derbasî Diwana Şahî bûn, Şah Qubad Xan û Peyên Maqolên din dane bikuştin û bi fîlbazî ve wî xwest, ku ew wanê tirjî bide bikuştin, belam ew hatin bitêgihiştin. Wan liberxwedan û hatin bişerkevtin.

Li dawîya dawî de hemû hatin bikuştin. Şah ji wê ve ew ji bona ser kelaha Kavdo çû û wî dest bi kuştina giştîyî Eşîrên Mukrî û Dîlkirina Afret û Menalan ve date bikirin. Wî kuştarekî pirî pîs date bikirin.

Qolekî tir jî ji leşkerê Ecem ve ruwê xwe ber bi Girmerod ve date bivedan, ya ku ew navînîya Mîr Xan Begê Birayê Şêx Heyder bû, Li pêş vê de, ku ew pê bizanin, leşkerê Ecem Mîr Xan û Mîrên din tevde dane bikuştin û wan dest bi kuştina giştî ve dane bikirin.

Kar û barên weha pîs, dir û hov wan dane bikirin, ku hîç kesek pê nayête bilêbuhurandin. Bi xwe jî ve Şiî jî li dû rojeke weha jî de dihatin bigerandin, da ku ew Tola xwe ji Siniyên Mukri bidin bisitendin.

Di vê destana hanê jî de belê hinek ji Eşîrên tirî ne Mukri jî tûşî kuştina giştî bûn. Li dawîya çend rojan de ji kuştina giştî bîntengbûna Şahê Sefewî sar bû.

Ji Mîrên Mukri Şêr Beg bi tenha xwe ve mabû; ev jî jiber pêwendîya wîyî kevin ligel Textê Şahînşahî de bû û herwehajî jiber alîkarîya Birayê wî Meqsud Beg jê re; jiber Meqsud Beg ligel Şah de bû û Îşek Axasîyê wî bû. Weha bi vî rengî ve alîkarîya Şêr Beg hate bikirin, ku ew li dora Şah de bimîne û ew neyête bikuştin.

Ev destana Mêjûyî bi vî rengê hanê ve dawîya wê hate biderkevtin.

Institut kurde de Paris

Di sala 1019 k.-1610 z. de Qoyoci Murad Paşa îş û karên veguhertinên hundurû bi dawî anîn û wî bi orduwekê ve berê ji xwe bona Tevrîzê date bivedan û ew tanî dora vî Şarî hate bigihandin. Li gora rabûn û rûniştina wê demê de wî ew welat date bitalan û biwêrankirin. Li paş vde ew hate bivegerandin.

Şah Ebas di 25 cemada dawî sala 1020 k.- 1611 z. de daxwaza aşîtîyê date bikirin. Bi xwe jî ve di wê beynê jî de Murad Paş hate bimirin û Nesuh Paşa[288] bi Serek Wezîr û Serdar bû.

Sala duwayî peymana aşîtîyê hate bigirêdan û sînorên kevnî Sultan Selîm bi bingeh ve hatin bidanîn. Ev mercaya jî têde bû, ku dewleta Îranê yarmetîya Helo Xanê Serdarê Şarezorê û Erdelanê nede bikirin.

Vê aşîtîya hanê jî ewende dirêjî neda bikêşandin. Di rebîê Yekemê sala 1024 k. -22 Cotana sala 1615 z. de dîsan ceng di navbera herdu dewletan de hate bidadan.

Serek Wezîr û Serdar Damad Mohemed Paşa di pêşîya buharê de ruwê xwe bi ber Îranê ve date bivekirin. Mîrê Kurd Seyid Beg bi leşkerekî ve berê xwe ji bona Nexcuwan date bivekirin û wî li vî bajrê hanê û Rewan -Erîvan- de çardorî lê date bigirtin. Belam zorî pê neçû, wî ziyanên pir dan û ew hate bivegerandin.
Bi kurtî ve şerê vê carê zor dirêjî date bikêşain.

Di sala 1025 k.-1616 z. de Kurê Xazi Begê Kurdê Melîlan keleha Qarni Yarîq -Qarniyarq-, ya ku ew bi navîn û melbenda Selmasê ve hatibû bikirin, hatibû bitengavkirin.
Pîr Bodaq Xanê Serdarê Tevrîzê bi leşkerê xwe ve ruwê xwe ber bi Kurdên Melîlan ve date bivekirin. Kurê Xazi Beg jî daxwaza yarmetîyê li Mohemed Paşa Begler Begiyê Wan û Mîrên wan navan de date bikirin. Mohemed Paşa bi leşkerê xwe ve û Zeynel Xanê

[288] Ev Nesoh Paşa zor ji Xwedê neditirsiya. Gava ku ew Walîyê Diyarbekrê bû, wî Kelehek ji Kelehên Kurdên Aşitî date bizetfkirin. Wî Çar hezar Zarok û Jinên Kurd di nava Dokel de datin fetisandin. Dadwerîya Xwedê di dawî de ev Sitemkarê hanê tûşî sizakir. Bi Fermana Sultan Ehmed di 13 Rojîyê de sala 1023 k. de ew hate xenikandin-xeniqandin.

Institut kurde de Paris

Mehmudîyê Serdarê Xoşabê û Mîrên dinî Kurd bi şeş heft hezar kesekî ve bi hewara wî ve hatin bigihandin.

Gava ew tûşî hevbûn, li dawîya şerekî kurt de leşkerê Tevrîzê hate bişikestin û Pîr Bodaq Xan jî bi destê Zeynel Beg ve hate bibirîndarîkirin û zorî pê neçû ew hate bimirdin. welatê Ezirbêcanê tirs û lerz pê hate bikevtin, Belam Mîrên Kurd li dawîya şer de hatin bivegerandin.

Li sala 1026 k.-1617 z. de Şah Ebas di bin serpereştîya Qerçeqayê Xan de leşkerek ji bona ser Erzeromê date binardin. Wî ew nav dane bitalan û biwêrankirin. Mohemed Paşa Begler Begê Wanê ji bona sitendina vî mafeyê hanê Serokên Kurd dane bikomkirin û ligel leşkerê xwe de hêzeke zorî Kurd de date bixwestin, ku ew ji bona ser Ezirbêcan bêtin biçûn. Belam xebera çûna Qerçeqayê Xan ji bona ser Wanê û wan navan bi Serokên Kurd ve tirs bi wan ve hate bikevtin û bala wan ji bona ser paraztina Mulk û Eşîrên wan çû.

Diya El-Dîn Xanê Kurê Şeref Xanê Bedlîsê ligel deste û hevalên xwe de bi bê pirsa Mohemed Paşa ji Bedlisê hatin bivegerandin. Yehya Xanê Kurê Zekeriya Xan Serokê Eşîrên Hekarê jî xwest, ku ew jî bête bivegerandin, lêbelê Mohemed Paşa rê pêneda. Wî ew ji bona layê xwe date bibangkirin, bi nêta ku ew wî bide bikuştin. Şer di nava wan de hate bivêketin, herdu têde hatin birîndarkirin ew linavçûn. Bi vê bûnê di navbera Kurd û Turkan de xwîneke zor hate birijandin.

Di vê demê de leşkerê Qezilbaşan ji bona Wanê hate bigihaştin. Avedanî û dexil wan têde nedane bihiştin, wan talanî û kuştarekî bêqam dane bikirin.

Di vê salê jî de Serekwezîr Turk û leşkerekî ji Tataran zivistana xwe li Diyarbekê de datin birabuhardin û wan ev welatê hanê dane biwêrankirin.

Di dawîya salê de li 6 şewala 1027 k.-27 kewçirînka 1618 z. de dîsan peymana aşîtîyê hate bigirêdan.

Institut kurde de Paris

Di dema gift û gokirina vî aşîtîyê hanê de bû, Şah Ebas ji bona berbestkirina hêrîşên Turkuman nêzîka yanzde hezar malên Kurd ji bona Xuresanê date biveguhestin û ew li wêderê de dane bicigîrikirin.

Nek her ji bona parastina tuxûb û sînoran, belkî li şer û cengan de her û her dewleta Îranê zor ji Miletê Kurd sûd daye biwergirtin.

Eşîrên Mukri bingehê herî bi hêza orduwê Ecem bû. Şah Ebas bi hêzên Mukri ve zor pişt sitûr bû. Di hemû demekê de li orduwa herheyî de beşekî gewreyî wî ji bona Kurd dabû bicihêkirin.

Li vanan jî zor Serevser û Serleşkerên pêgehiştî hatin bidîtin: Nala Elî Can Sultanê Şikaki, Gedayi Sultan Kolani, Qelender Sultan Kelegîr, Mam Qeli Sultan Cengi... hda. evanan ji hinên Pêgehiştvanên pêla Şah Ebasê yekem têtin biderkevtin (ji xwe re temaşeyî nivîsta: Kurdên Bi Nav û Deng bide bikirin).

Şah Ebas di sala 1034 k.-1624 z. de leşkereki Îranî ser li nû de date birêkxistin, gelek ji perçe û beşên wî ji Eşîrên Mukri date bipêkxistin û wî bi vê orduwa hanê ve zor caran dewleta Osmanî pê date bişikenandin. (Insiklopêdiya Musulmantîyê).

Orduwa Hafiz Ehmed Paşa ji bona sitendina Bexdadê ji Bekir Sobaş[289] ve wî ruwê xwe ji bona Bexda date bivedan, beşê zorî vî leşkerî Kurd bû.

Şah Ebas, gava ku ew ji bona ser Bexdadê ve hate birakişandin, ev Şarê hanê ji destên Bikir Sobaş bi fêlbazî ve date bisitendin. Şah Ebas di vê gavê jî de leşkerek di bin Rêberîya Liserleşker Qer Çeqayê Xan (37) de ji bon ser Musilê ve date binardin û wî li dawîya

[289]Bexda li sala 1031k.- 1621 z. de bi destê Bekir Sobaşê Yekîçîrî-Inkişari ve hate bikevtin. Hafiz Paşa ji bona sitendina wê bi ser wî de hat. Belam wi bi dizî ji bona Şah Ebas xeber şand û daxwaza yarmetîyê jê date kirin. Gava Hafiz Paşa ev bihsît, ji bona xatirê ku Bexda bi destên Qezilbaşan ve neyête bikevtin, wî Bekir li ser Baxdê de bi Walî date bidanîn û ew vegeriya.
Belam Şah Ebas Leşkerek ji bona ser Bexdê date binardin û li paş jî de ew bi xwe jî hat û bajar Çardorîkir. Wî nav di Kurê Bekir da û Dergehê Kelehê pê date vekirin û ew darbasî nava Bajêr bû û wî Bekir kuşt.

Institut kurde de Paris

çardorlêgirtina Şar de ruwê xwe ji bona Diyarbekir û Mêrdînê date bivekirin û wî ew welatên hanê date bitalan û biwêrankirin. Li dawîya vê jî de ew ji bona ser Musilê careke din jî hate bivegerandin û wî ew jî date bizeftkirin. Xan Ehmed Xanê Erdelanê jî bi leşkerekî ve ji bona ser Şarezorê û Kerkoye -Kerkukê- ve çû û wî keleha Kerkukê date bizeftkirin.

Liberrabûna Eşîrên Mukri

Li paş serhildana Qubad Xan û vegurandina Eşîrên Mukri de di sala 1019k.- 1610 z. de Şêr Beg bi Serekê Eşîrên Mukri ve hate bidanîn.

Ev Şêr Begê hanê bi hoyê pîsbûna serpereştîya Îranî ve û kîna di navbera Şie û Sunî de di sala 1034 k.-1625 z. de liber dewleta Îranî de hate birabûn. Wî welatê Meraxe date bitalankirin û kuştarekî zorî li nava Şîe de date bikirin.

Şah Ebas li jêr serdarîya Zeman Beg de leşkerek bi ser wî ve date binardin. Şêr Beg bi xwe û Eşîrên xwe ve xwe ji bona nava çiyan dane bivekişandin. Bi leşkerê Qezilbaşan ve ji bil hin talan û gund sutandinê şitekî tiri pê nehate bikirin û ew hate bivegerandin.

Li dawîya mirina Şah Ebas de Serek Wezîrê Turk Xusro Paşa bi leşkerekî ve ruwê xwe ber bi Îraqê ve date bivedan û wî zivistana sala 1039 k.1629 z. de li Musilê de date birabuhurandin.

Mîrê Emadîyê Seyid Xan û Mîre Begê Soran ligel leşkerên xwe de ji bona komekê ji bona layê Serdar hatin biçûyîn. Serokê Eşîra Bacelan jî bi xwe ve û çil hezar kesekî ve ji bona layê Xusro Paşa hate biçûyîn û sî hezar ser mer jî bi diyarî ve wî bi xwe re ji bona orduwê date banîn. (Mêjûwa Neîma, bergê 3).

Xusro Paşa li dawîya şêwirdarîyê de ligel Mîrên Kurd de weha bi başî zanî, ku ew di pêşî de Serdarê Erdelanê bide bişikenandin û ew wî welatî bide bizeftbikin û li duwayî de ew ji bona ser Bexdadê be^te

Institut kurde de Paris

biçûyîn. Li ser vê biryarê de bi ser Şarezorê ve wan berê xwe ber bi Erdelanê ve dane bivekirin. Ordu bi Şarezorê ve hate bigihiştin û Xusro Paşa keleha Xor Malê date binuhkirin. Ev keleha hanê ji bal Sultan Selîm de hatibû biavakirin.

Li dawî de Şêx Ebdula, yê ku ew bi Şêxo ve bi nav û deng bû û keleha wî bi navê Zalim Elî bû ew li ser Çavê Zelem bû, ji bon nik Xusro Paşa ji bona serbitewandinê hat bigihandin û herwehajî du sê kesekî tir jî li Serokên Kurd ji bona nik Xusro Paşa ji bona sertewandinê ew jî hatin bigihandin. Xusro Paşa ruwê xwe ji bona navînîya Erdelanê, ku ew Hesen Abad bû, date bivekirin. Li rêya xwe de wî keleha Mehreban -Merîwanê- date bizeftkirin û li ber devê vê kelehê de wî orduwa Zeynel Xan jî date bişikandin û ew tanî Hemedan çû.

Li sala 1040 k.-1631 z. de Xuro Paşa ji Îranê vegerîya û wî ruwê xwe ber bi Bexdadê ve date bivedan. Li Çemçemal û Dertengê de dîsan wî orduwê Ecem date bişikandin. Li paş de ew ji bona ser Bexdadê ve hate birakişandin û wî lê çil rojî dor date bigirtin. Lê bajar pê nehate bizetfkirin û ew hate bivegerandin.

Xan Ehmed Xanê Erdelanê bi hêzekê ve bi şûn orduwa Osmanî ve hate bikevtin û wî Şarezor ji xwe re date bidagîrkirin. (Mêjûwa Neîma, Von HAmmer).

Institut kurde de Paris

Înca li sala 1048 k.-1638 z. de Bexda li layê Sultan Muradê çarem de hate bisitandin[290]. Mîrê Amêdîyê Qubad Beg ligel orduwa Behdîna û Serokên Eşîrên Musilê, Hewlêrê, Kerkukê û Şarezorê de ligel hêzeke baş de di vekirina Bexdadê de bi Sultan Murad re bûn.

Li dawîya salekê de di navbera herdu dewletan de peymana aşîtîyê hate bigirêdan. Ew xêza sînorê, ya ku ew li gora vê peymana aşîtîyê de hate binîşankirin, tanî sedsalê nozdemînî zayînê de hate bimayîn û serdarî û desthilatîya Îranê jî bi carekê ve ji bona Rojhilatê Zagrosê ve hate bikevtin. Li gora vê peymana aşîtîyê û sînorên taze de Eşîra Caf beşekî wê di Îranê de hate bimayîn.

[290]Wi ji sala 1032 k.- 1623 z. de tanî sala 1049 k.- 1640 z. de Desthilatî date biwergirtin. (M. E.).

Di vê mêjûwê de Bedlîs, Amêdîyê û Hekarê serbixwebûn û ew li jêr serpereştîya Mîrên Kurd bûn. Înca di mêjûwa 1070 k.-1660 z. de van dewletên hanê xwe bi dewleta Osmanî ve dane bigirêdan. (Ji xwe re li Raportê Mêcer Son li ser Liwaya Sulêmanîyê bide bitemaşekirin).

Puxtîya peyvê ev ceng û şerên gewreyî noyî li dûhev de di navbera Sultanên Osmanî û Şahên Sefewî de giringbûna siyasîyî Kurd bi carekê ve ji bona Kurd date biderxistin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

Belem Kurd li vê amojgarîya başî mêjûwê de nikarîbûn û nedizanîn jê serpêhatîyê bidin biwergirtin û ji cihê xweyî qenc sûd bidin biwergirtin û Komelek yekdil bidin bidamezirandin û ew beramber bi şepolên Hêrîşvanên Bêgane ve yek li du yek de bi Komeleke yekgirtî ve bi hêz ve bêtin birawestandin.

Ew belayên, yên ku wan Kurd li vê xwe hevgirtinê de nehiştin bêtin biyekkirin, em hemû dizanin, ku ew nezanî, perîşanî û berberî bû. Kurd li jêr vî barê giran de pişt xûz bibû. Rûdanên siyasî û zordarîya Karbidestan ew tûşî belayên nexweşîyên xweyî civakî Kurd bibû. Li batî ku ew pişta xwe bi pişta hevbidin û bi dilsozî ve ji bona rizgarîya xwe û rizgarîya welatê xwe bidin bikarkirin, ew her û her bi gij hevdiçûn û wan şûrên xwe di laşên hev de datin bisûtin. Bi rastî ve, mîna ku di bergê duwemî vê nivîsta hanê de dê bête bixuyanîkirin, Kurd gelek dewletên xurt û bi serdejî ve gelek mîrneşînîyên biçûk jî datin bidamezirandin.

Belam evan hemû bi hoyên dujminatîya navxwe ve û zoryan jî her bi destên wan ve bi xwe ve linav de hatin bibirin. Emê bi dirêji ve di bergê vê nivîsta hanê de bidin biraxistin[291].

[291] Ev bergê hanê hate Çapkirin. Di navroka wî de mêjûwa Dewlet û Mîrneşînîyî Kurdiyî pir ji demên kevnar de tanî demên Musulmantîyî vê dawyê de tête bidîtin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Şeref Xanê Bedlîsî (Dilovanîya Xwedê li be) di vî babetî hanê de gelekî wî xwe têde daye biêşandin. Li gora rewşa wê demê de wî rêyeke baş ji bona Kurd dayite binîşandan.

Wî daxwaza pêkanîna Yekitîyeke Siyasî di navbera dewlet û mîrneşînîyên Kurd de dayite bikirin. Bi rengekî ku Fiderasyon-Dewletên Hevgirtî jê tête biderkevtin û Navînîya van Dewletên Hevgirtî jî bi Cezîra Ibin Umer dihate biderkevtin.

Belam bi rastî jî ve cîgehê mexabinê ye, ku di bin kêra gelacîyên hêzên Serdarên Bêgane de, yên ku wan her û her ji bona bêtirkirina dujminayetîyê û cudabûnê di nava Kurd de şev û roj jê re kar û xebat dane bikirin û mebesta wan jî li ser rêzana Mêkavilî Feriq Tesud-Perçe bik û Serdarîyê bik, vê şîreta baş kêra xwe di nava Mîrên Kurd de neda bikirin û ew li ser şûna xweyî kevin de hatin bireweştin û ew bere bere mîna ku em dibînin, ew hemû li nav çûn.

Institut kurde de Paris

*Derîyê Şeşem*

# Zîneta Kurd Tani Îro

## 1. Kurd Tani Pêla Nadir Şah

Kurdistan li gora nasîna Şerefname de di dema xwe de zor gewre bû. Gelek dewlet û mîrneşînî têde dihatin bidîtin. belam li dawî de siyaseta Turk ew bere bere dane biçûktirkirin.

Peymana di sala 1049 k.- 1639 z. de ne bes tenê Îranê derketina wêna ji xêza Zagrosê de rê lêhate bigirtin, lêbelê dewleta Osmanî di pêla Şahên Sefewî de hêdî hêdî hemû welatên Rojavayî Îranê ligel perçeyê Qefqasya de ji bona jêr serdarî û desthilatîya xwe ve date bianîn. (Von Hammer).

Di encamê veguhertina vî sînorê siyasîyî hanê de zorî Kurd û Kurdistanê ji bona jêr serpereştîya Osmanî ve hate bikevtin; çunge, dewleta Osmanî nema bêtir pêt bi Îranê ve pê didate bikirin, wê bere bere di Kurdistanê de siyaseta xweyî navînîyê didate bikirin û wê ew didate bicihanîn.

Meseta wê ji vê siyaseta hanê ve bes û bi tenha ve şikenandina desthilatîya mîrneşînîyên Kurd bû, bere bere jî li nav birina wan bû û bi hîmkirina serdarî û desthilatîya xweyî navînîyî Turkî di nava Kurdistanê de bû. Ji vê bêtir şitekîtir nebû.

Institut kurde de Paris

Yekekî ji wan kesên, yê ku ew ji bona bicihanîna vê siyaseta hanê zor likarbû, ew Melek Ehmed Paşa Zavayê Sultan Muradê çarem bû.

Ev Merovê hanê li dawîya vekirina Bexdadê de ji bona Walîyê Diyaberkir hate bidanîn, da ku ew desthilatîya Mîrên Kurd bide bişikenandin û wan linav bide birdin. Her û her ew li şûn mehnan de dihate bigerandin û wî hîç kêsek di ser xwe re nedihşt bête biderbaskirin.

Li sala 1048 k.- 1638 z. de ji Diyarbekrê wî hêzek ligel xwe de date bibirin û ew ji bona ser Mîrê Mizurê û Amêdîyê Yisiv Xan çû. Wî welatê wî date bizeft û bitalankirin û ew jî bi xwe jî ve ligel xwe de ji bona Diyabekir date bianîn û ew ji bona zindanê date biavêtin. Li dawîya mirina Sultan Murad de wî jê 100 kîs tawankarî date bisitendin, înca wî ew date biberdan. (Olya Çelebi).

Di vê salê bi xwe ve wî mehneyek li Mîrê Bedlîsê jî de date bigirtin û leşkerek bi ser ve date bidadan. Li dawîya navcîtîya hinekan ji Mîrên Kurd de û bi wergirtina bertîleke giran ve înca wî waz lê hêna[292]. Her ew bi vê hêzê hanê ve bi ser Sincarê ve çû û wî çardorî lêdate bigirtin. Wî têde kuştarekî zor û wêranîyeke bê qam date bikirin.

Li sala 1050 k.- 1640 z. de Walîyê Erzeromê jî her bi wê remanê û wê mebestê jî ve bi mehna gilîkirina Eceman ve leşkerek bi ser Mîrê Şûşek ve[293], ku ew Mustefa Beg bû, date bigirtin. Keleha wî bi yarmetîya Kurdên wan navan ve date bizeftkirin û welatê wî jî ser bi ser ve date bitalankirin. (Olya Çelebi, bergê 2).

Melek Ehmed Paşa li sala 1o66 k. - 1666 z. de bi Walîyê Wanê bû. Mîrê Bedlîsê pir bi pirî jê re karkir û diyarî û xelatên zorî dayê. bi vî rengî ewende pê neçû, wî behaneyek li ser Mîr de dozî û leşkerek bi ser Mîrê Bedlîsê Evdal Xan ve date bidadan.

[292] Ev Sizadanî li gora goya Olya Çelebi de 80 Tûr-Kîs kirya rê, 10 Qitar Hêstir, 6 Tewîlê Hesp û Deh Peye û Qîzek bû. Bertîla Evserên Leşker ji wanên Jorî cihê bûn.

[293]Keleheke bi nav û bang bû. Ew di liwaya Beyazîdî nihayî li Rojhilatê Erzeromê de ye. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Hoyê rastîyî vê hêrîşê weha ye, li dawîya vekirina Bexdadê de ji bona pîrozkirinê neçûna Evdal Xan bû, ku Sultan Murad li ser vê de lê ture bû. Bi kurtî ne daxwaza lêbuhurandina Mîr Evdal Xan û ne jî dana pera kêra xwe date bikirin. Melek Ehmed Paşa bi Orduwekî zor ve, ku beşekî wîyî gewre dîsan li Mîrên Kurd de hatibû bipêkhatin, bi ser Bedlîsê ve hate birakişandin. Li dawîya dorlêgirtinê û şerekî qurs de wî bajar date bigirtin û bitalankirin. Mal û dewlemendîya Mîr Evdal, ku demek bû, Mîrên Turk diranên xwe lê dabûn bitûjdikirin, bi carekê ve bi destên wan ve hatin bikevtin. Evdal Xan bi mala xwe û Mendalên xwe ve bi hazar dujwarî ve xwe ji nava pencên wî date birizgarîkirin. (Olya Çelebi, bergê 4)[294].

Zor xerîbe, ku li vê hêrîşê û destdirêjîya hanê de ewên zorî zor ji bona nabûdkirina Mîrê Bedlîsê didan bikarkirin, dîsan ew her Kurd bûn û li hemûyan de bêtir jî Kurdên Mehmûdî bûn!

Vî Melek Ehmed Paşa bi vê siyaseta xweyî fewitandinê ve îşê xwe bi radeyekî ve date bigihandin, ku Kurdistana Gewre bi carekê ve ve biçûk bû û ew biserhev ve ji bona welatê Wanê hate bigivaştin. (Isiklopêdîya Musulmantîyê, b. 2).

Ji Xerîbîyên vê pêlê jî de derketina Mehdîyekî Kurd li devera Musilê de di sala 1066 k. -1666 z. bû. Ev Merovê hanê Şêxzadeyek bû. Di dawî de Serdarê Musilê û Amêdîye bi dû wî ve hatin bikevtin û wan ew date bigirtin. Sultan Mohemedê çarem ev îşê hanê bi lêbuhuhrandin û dilovanî ve birî û Mehdî bi girtî ve ji bo Istenbolê date bianîn û ew li dora xwe de date bidanîn. (Hammer).

Institut kurde de Paris

---

[294]Olya Çelebî bi xwe ligel Encûmenekê ji bona nivîsandina Lidûhiştîyên Ebdal Xan hatibû karmendkirin. Ew dibêje: Lidûhiştîyên Evdal Xan ji bil Barên Heft Devan hêjî nivîstên pir bi nerx di Nivîstxana Mîr de dihatin bidîtin. Nêzîka Çar hezar nivîstên hêja û giranbuha hatin bitomarkirin. Ev nivîstanan bi carekê ve Destnivîstbûn. Ew di babetê Oldariyê de, ziman de, zanistîya Cenewar, Şînahî, Pijijkî, Biyolocî de û Diwanê Xweşxuwanîyê bûn. Pir rengên Neqşên Sitanan, Wêne û Nigarên giranbuha têde dihatin bidîtin. Berên wan hemû nivîstan bi Çermên xweşik û pir giran hatibûn bidurustkirin.

Nivîsandinên vî Ebdal Xanî 76 bergên nivîsandîbûn û 105 Name bûn. Ew bi zimanê Erebî û Farisî (4 berg bûn) hatibûn binivîsandin.

Weha derdikeve, ku ev Mîrê Sitemxwar Serdarekî navdar bû, amojgar bû, Zanistvanekî bi nav bû û Şairekî jîr bû. Ew mîna Bavpîrê Şerefxan Zanistvan û zana bû. Wi dikarî gelekî kar bida kirin, belam Ehmed Paşa ew date nabûdkirin.

Mîrneşînîya Babanî li destpêkirina sedsalê heştdehemînê zayînê de li Şarbajêr de ji bal Sulêman Beg û yanjî Baba Sulêmanî Kurezayê Feqe Ehmed de hatîye bipêkanîn. Dirêjbûnên rûdanên vê mîrneşînîyê li (Mêjûwa Welatê Sulêmanîyê) de di bergê duwemî vê mêjîwê de li ser de hatîye bipeyivandin.

Kurdê Îraqê li zemanê Şah Husênê Bêhêz de di sala 1132 k.- 1720 z. de Hemedan çardorî lê date bigirtin û her wehajî bi xwe jî ve paytextê Îranîyan jî ber bi tirsê ve dane bixistin.

Li zemanê Şah Temasebê duwem de li sala 1135 k.- 1723 z. de ew orduwa, ya ku ew ji bona sitendina Isfehanê ji Mehmud Xanê Evxanî hatibû binardin, li jêr Komandarîya Mîr Ferîdonê Kurd bû. Ev Merovê bi hoyê mêrxasî û gernasîya xwe ve di dema hêrîşê de ji bona nava destên Evxanîyan ve hate bikevtin. Belam li dawî de bi soz û peyman ve ew berdan û ew ji bona nava cihê xwe hate bivegerandin û li paş de ew ji bona layê dewleta Osmanî ve hate biçûyîn. (Von Hammer).

Welîyê Bexdadê Hesen Paşa li sala 1127 k.- 1715 z. de hêzek ji bona ser Eşîrên Belbasê date binardin û wî ew datin bisertewandin.

Bekir Begê Baban, yê ku ew ji bona girtina Kerkukê xerîk bû, li dawîya şerekî giran de hate bigirtin û bikuştin; welatê Baban bi carekê ve ve bi jêr serpereştîya dewletê ve hate bikevtin.

Welatê Soranê jî ji bal vî Welîyê hanê de, yê ku siyaseta wî lidûçûna nabûdkirinê bû, hate bitalan û biwêrankirin. Wî leşkerê xwe jî ji bona ser Sincarê date binardin û vê carê jî wî kuştarekî zorî têde date bikirin.

Di sala 1129 k.- 1717 z. de Kurdên Îranê liwa Bacilanê[295] dane bizeftkirin.

---

[295]Ango melbenda Xaneqîn u Tozxormatoyî niha ye. (M. E.).

Li sala 1136 k.- 1723 z. de ceng di navbera dewleta Osmanî û Îranê de hate bivêxistin. Orduwa Hesen Paşa ruwê xwe ber bi Kermanşan-Kermanşah ve date bivekirin. hêzên Mîrên Kurd hemû ligel wî de bûn. Ebdul-Baqî Xanê Walîyê Kermanşan bê şer bajar bi cî ve date bihiştin.

Welaîyê Erdelanê Alî Qeli Xan bi hoyê derkirina wî ve ji bal Îranê de wî pêwendîya xwe ligel Bexdadê de date bikirin û daxwaza yarmetîdanê jê date bixwestin; di dema ku ji bal Komandarîya Bilindî Leşkerê Osmanî de Xene Paşayê Babanî ji bona zeftkirina Erdelanê hatibû bifermandarîkirin. Elî Qeli Xan ligel dam û destgehê xwe de serê xwe ji bona dewleta Osmanî date bitewandin. Bi vî rengî ve Erdelan ji bona jêr destîya dewleta Osmanî hate bikeytin.

Hêzeke tirjî ji bona ser Loristanê hatibû binardin. Walîyê wê Alî Merdan Xan bû. Pişta wî bi Şah Temaseb ve sitûr bû; jibervêjî wî guh bi dewleta Osmanî ve neda bidan. Komandarê Osmanî Ebdul-Rehman Paşa welatê Loristanê date bidagîrkirin û Elî Merdan Xan jî date bişikandin. Elî Merdan Xan di pêşî de date bibazdan; belam li dawî de ew jî bi neçarî sertewandinê xwe ve hate bikirin.

Orduwa Osmanî zivistan li Kermanşah de date birabuwardin û di sala duwayî de rû ji bona Hemedanê date bivekirin. Li dawîya dorlêgirtinê de bi zor ve wî ew date bizeftkirin û têde gelek kuştarî dane bikirin.

Orduwa Ecem ji bona sitendina vî Şarê hanê gelekî hewlî date bikirin; belam hîç pê nehate bikirin. Bi xwe jî ew orduwa, ku ew ji bal Şehzade Lutuf Mîrza de hatibû binardin, ji bal Xene Paşa û Ibrahîm Paş Komandarên Osmanî de bi carekê ve hate bişikenandin û bi serdejî ve Lutif Mîrza hate biberdestkirin. Vê biserketina hanê Eşîrên Zagrosê hemû bi jêrdestîya Xelîfe ve date bixistin. Bi dawîanîna vê biserketinê ve Walîyê Musilê ligel hêzeke baş de ji bona ser Eşîrên Bextiyarî hate binardin.

Di sala 1139 k.-1726 z. de demek bê şer derbas bû. Ehmed Paşa Walîyê Bexdadê bi Serleşker ve hate bikirin û leşker hate bihêzkirin.

Institut kurde de Paris

Serjimara wî bi sed hezar Serbaz ve hate bigihaştin; bi vê hêza hanê ve wî rûwê xwe ber bi paytextê Îranî ve date bivedan.

Di vê pêlê de Îran di nava destên Mîrên Evxanî de bû; bi xwe ve Eşref Xanê Evxanî, yê ku ew bi xwe ve xwedanê her tiştî bû, bi orduwekê ve ji bona pêşîya orduwa Osmanî çû. Wî di nava Kurdan û Mîrên Kurdan de gelekî date biragiyandinkirin, bi nebaşîya şerê Sunî ligel Sunî de û wî ji bona wan xwe jê vegirtin date bidaxwazkirin, herwehajî wî bi hêvîya bilindkirin û xelatkirinên wan ve Mîr dane bixapandin.

Bi vî rengê hanê ve li nava orduwa Osmanî de wî ji xwe re pir hevalbend dane bipeydakirin. Bi rastî jî ve, gav ku herdu Ordu berengarî hevbûn, beşekî ji Kurdan ji bona layê Evxaniyan hatin biçûyînn.

Layê Rastî orduwa Osmanî, ya ku ew li jêr serpereştîya yekekî ji Mîrên Baban bû[296], beramber bi orduwa Evxanî ve hîç şerî neda bikirin û bi hemû hêza xwe ve ber bi paş ve xwe date bivegerandin. Di dawî de ev zîneta hanê bi hoyê şikestina giştî ve hate biderkevtin. Nêzîka duwanzdeh hezar kes ji Turkan hatin bikuştin û beşek ji wan jî revîyan. Ew hêzên Kurdên, yên ku ew tanî wê demê hêştajî du dilî bûn, wan jî xwe bi orduwa Evxanî ve date bipêgihaştin. Ehmed Paşayê bedbext hemû barkiranên xwe datin bicîhiştin. Wî xwe bi Kermanşah ve date bigiyandin; belam Eşref Xan tanî dergehê wî bajarî jî li şûn wî de bû.

Ehmed Paş ji sala duwayî Orduwekî 60. 000 kesî date bipêkanîn, belam hajbûna di navbera Eşref Xan û dewleta Osmanî de nehişt şerekîtir bête bikirin. Li encamê vê hajbûna hanê de Hemedan, Kermanşah, Erdelan û Loristan ji bona dewleta Osmanî hatin bidan û beramberî bi vê ve Dergehê Bilind jî bi Şahitîya Eşref Xan pê hate birûniştin[297].

[296]Ev Mîrê Babane. Ew Xane Paşayê Kurê yanjî Birayê Bekir Beg bû, ye ku ew bi 20000 kes ji bona yarmetîya Ehmed Paşa de çûbû.

[297] Agehdarîyê di vir de û axivtina li ser Nadir Şah ji Nivista Four centuries of Modern Iraq S. H. Longrigg 1925, Oxford hatîye biwergirtin.

Mîrên Kurd di vî îşê hanê de ji bil şermezarîyê şitekî din pêve bi destên wan ve nehate bikevtin. Eşref Xan jî ji bona misogirkirina cihê xwe hemû dîsan ji bona dewleta Osmanî datin biberdestkirin.

## 2. Kurd Tanî Navîna Sedsalê Sêzdehemînî Koçî Ve - Nadirşah-

Li dawîya dewleta Sultan Ehmedê sêyem de zîneta navxweyî û siyaseta Îranê bi carekê ve hate biveguhertin; hoyê bingehîyî van veguhertinên giringî jî Tehmaseb Qeli Xan Ango Nadir bi xwe bû[298].
Tehmaseb Qeli li dawîya zeftkirina Esfehanê de Eşref Xan li Şîrazê de date bitengavkirin û wî ew date bigirtin û bikuştin. Bi vî rengê hanê ve dewleta Sefewî wî bi hêzên xwe ve ji nû ve date bivejandin. Li duwayî wî de dewleta Şah Tehmasebê duwem hate bidîtin û wî daxwaza wan welatên Rojavayî Îranê date bikirin, yên ku ew ji bal Eşref Xan de ji bona dewleta Osmanî hatibûn bidan.

Tehmaseb Qelî di sala 1143 k.- 1730 z. de ket û pir hêrîş bi ser orduwa Osmanî de datin bidadan, ya ku ew li jêr Komandarîya Osman Paşa de li Jor Hemedanê de bû û ew di nava ordugeh de bû. Li dawîya vê de wî orduwa Osmanî date bişikandin û hêza wîyî topdarî ligel hemû pêwistîyên wê û tişt û miştên cengê de jê date bizeftkirin. Bi asanî ve wî Hemedan jî date bigirtin û wî ruwê xwe ber bi Kermanşah

Institut kurde de Paris

298Nadir Şah di sala 1099 k.- 1688 z. de li Xuresanê de ji Maleke Destnîvxweş ji Eşira Efşarî bi nav û bang ji bona dunyayê hatîye. Wî Zarotîya xwe bi Şivanîtîyê û Rêbirînê ve dayite birabuhurandin. Di sala 1139 k.- 1727 z. de 5000 kesek ji Kurd û Efşarên dorhêla bajarê Xoyê li Zehaw de li dora xwe dane bikomkirin û daxwaza Mafeyê Binemala Sefewî ji Efxanan date bikirin. Zor pê necû wî Xuresan girt Şehzade Tehmaseb bi Şahî li ser Îranê de date bidanîn û xwe jî bi Tehmaseb Qelî Xan bi navkir. Di sala 1141 k.- 1729 z. de du carî Eşref Xan şikenand û di dawî de wî ew li Şirazê de girt û kuşt. Weha bi vî rengî dewleta Efxanî li Îranê de linavcû û ji nû ve dewleta Sefewî bi nav hate bivejandin; jiber di rastî de weha nebû; jiber dewleta Nadir destpekiri bû.

ve date bivedan. Wî Ostandarê vî bajarê hanê jî date bifirandin û hemû bargiranî jî lê datin bizeftkirin. Orduwa Turkî zîyanên wê zor bûn û ew bi perîşanî ve tanî pişti Sinor ango tanî Zehaw-Zehab û Xaneqîn ber bi baş ve hate bivegerandin.

Ev dest dawiştandina Nadir Qeli bi serûştî ve di navbera herdu dewletan de bi hoyê vêxistina cengê bû.

Ehmed Paşa Walîyê Bexdadê dîsan ew bi Serleşker bû û ligel Ordu de hate birêkevtin. Zehaw-Zehab wî bi bi wargehê cengê ve date bikirin û li duwîya çend rojan de wî Kermanşah date bigirtin. Vê biserketina hanê Serdarê Erdelan-Erdîlanê dîsan bi hevalbendê Turkan ve date bikirin. Ehmed Paşa di dawî de bi xwe û orduwa xwe ve tanî nêzîkî Hemedanê hate bigihandin.

Di kewçêrinka sala 1731 z. de li Qorîcan de, ya ku ew qonaxekê li Hemedanê de bi dûr ve tête biderkevtin, di navbera leşkerê Osmanî û leşkerê Şah Temaseb de şerekî giran hate bivêketin. Nîvê sipahê Îranê hate binabûdkirin û hemû topdarîya wî û barkiranên wî bi destên sipahê Osmanî ve hatin bikevtin. Bi bêvajî ve vê biserketina mezin ve Ehmed Paşa jiber hin zinetan neçarî daxwazkirina aşîtîyê bû, Belam Tehmaseb ev aşîtîya hanê date biredkirin. Li gora vê aşîtîyê de Tebrîz, Erdelan, Hemedan, Kermanşah, Huweyze[299] û hemû Loristan careke din ji bona Îranê dihate bivegerandin.

Tehmaseb Qeli di wê salê de bi xwe jî ve bi sipahekî sed hezar kesî ve dîsan ruwê xwe ber bi sînorê Osmanî ve date bivedan. Bi xwe ve wî ligel sipahê kokî de Bexdad date bilerizandin. Wî hêzek tirjî li jêr Komandarîya Nergis Xan de ji bona layê Kurkukê date binardin. Ev hêza hanê bi ser Tozxormatu re derbas bû û ew bi Kerkukê ve hate bigihaştin.

Her welatekî bi pêş wê ve dihate bikevtin, wê ew didate bitalan û biwêrankirin. Sitemkarî û şermezarîya vî Nêrgis Xanî ji sînor der bû;

[299] Ew bajarekî li Rojavayî Ahwaza de bi nav û bange di melbenda Xuzistana Îranê de li nêzîka sînorê Îraqêyî niha tête bikevtin.

Institut kurde de Paris

Jin û Mendal jî ji nava lepên wî rizgar nedibûn. Wî li dorhêla Kerkuk jî de ev derdên hanê dane bikirin. Li dawîya dawî de wî ruwê xwe ber bi Musilê ve date bivekirin. Li dawîya dorlêgirtinê û tengavkirina wê de hîç pê nehate bikirin. Ew poşî poşman vegerîya. Sipahê kokî li jêr serdarîya Nadir Qeli[300] de li sala 1146 k.- 1733 z. de li Behrozê de li çemê Sêrwanê[301] de hate bitêperîn û dora Bexdadê date bigirtin.

Ehemed Paşa Mîrê Koyesinceq û Herîrê beramber bi qolê Kerkukiyî Ecem ve date birêkirin, belam hêza Koye zor kêm bû ew hate bişikestin û Mîrê wê jî hate bikuştin.

Topal Osman Paşa ligel Orduwekê de ji bona yarmetîya Bexdadê hatibû binardin. Ew li 19 tîrmeha sala 1733 z.- 1146 k. de li nêzîka gihandina rûbarê Edhem de ligel Diclê de ligel Nadir Qeli de berengarî şer bû. Wî ew date bişikandin. Ziyanên sipahê Îranî di vî şerî de nêzîka 30. 000 Kuştî û 3.000 Dîl dihatin biderkevtin.

Li dawîya vê biserketina hanê de Ehmed Paşa Walîyê Bexdadê, ji keleha wê hate biderkevtin û wî hêrîş bi ser hêza Ecemî dorlêgirtî ve date bikişandin û wî ew dane bitarûmarkirin.

Nadir Qeli li dawîya vê biserketina hanê de wî zû xwe bi serhev de date bikomkirin û di demeke kêm de orduwekî bi hêz ve date bipêkanîn. Dîsan wî ruwê xwe bi Îraqê ve date bivedan.

Di wê pêlê de Serleşker Topal Osman Paşa li dora Kerkukê de bû.

Di dawîya dawî de herdu ordu li nêzîka Leylanê de di 26 cirya pêşîn de sala 1733 z. -1146 k. de berengarî yekbûn û şerekî pirî giran wan datin bikirin. Orduwa Nadir Qeli hem taze bû û hem jî xurt bû. Zîneta orduwa Osman Paşa hem hêlak û hem jî kêm bû. Li germîya şer de Osman Paşa ji hesep hate bikevtin û ew hate bimirdin; êtir serpereştî û mêrxasîya orduwê jî hate bitêkçûn û ew zor xerab hate

[300]Yani Nadir Şah, yê ku wî xwe di pêşî de bi Tehmaseb Qelî yanî Ebdul Tehmaseb bi Turkumanî date binavkirin. (M. E.).

[301]Ew navê Çemê Diyala li Kurdistanê de ye. (m. E.).

Institut kurde de Paris

bişikestin. Hemû hêza topdarî û bargiranîyên orduwa Turk bi destên Ecem ve hatin bikevtin. Belam Nadir Qeli ji vê biserketina hanêyî gewre kar neda biwergirtin û ew ji bona bêdengkirina hinên ji serhildanan li welatê Faris de xwest bête bivegerandin; jibervêjî wî ligel Waliyê Bexdadê Ehmed Paşa de li gora sînorê Sultan Muradê çarem de aşîtî date bikirin û ew ji bona Îranê di sala 1146 k.-733 z. de hate bivegerandin.

Di sala 1147 k.- 1734 z. de Nadir Qeli hêrîşî welatê Qefqasya date bkirin û Tevlîsê jî date bizeftkirin. Di nava Pasevanên keleha Tevlîsê de 6. 000 Kurd hebûn. (Isiklopêdîya Musulmantîyê).

Di wê salê bi xwe jî ve dîsan Nadir Qeli hin hêz ji bona ser Îraqê datin binardin, belam ev hêzên hanê sipahê Turkî bi yarmetîya Kurd û Ereb ew tanî Sine[302] datin bibezandin û li wê derê de ew datin bperîşanîkirin.

Şah Tehmasebê duwem li sala 1150 k.- 1737 z. de hate bimirin û Nadir Qelî Mendalekî Şah Tehmaseb bi navê Şah Ebasê sêyem ji bona cigehê wî date bianîn û xwe jî bi cîgir ve li ser de date bdanîn[303].

Di sala 1154 k.- 1741 z. de du qolên orduwê Îranî ji bona alîyên Mendelî û Şehrezorê dane bihêrîşkirin.

Di sala 1156 k.- 1743 z. de Nadir Şah dîsan ruwê xwe ber bi Îraqê ve date bivedan; belam Walîyê Bexdadê ew date bixapandin[304] û ew bi orduwê xweyî zor gewre ve bi ser Şarezorê ve ruwê xwe ber bi Musilê ve date bivedan.

Institut Kurde de Paris

[302]Paytexta Wilayeta Kurdistanê li welatê Îrana niha de ye. (M. E.).

[303]Ev Şah Ebas her bes Heşt Mehan li cihê Şah de ma. Li paş de Nadir Şah Qelî ew ji Şahîyî date xistin û wî xwe bi Şahîtî date bidanîn. Weha bi vî rengî Binemala Sefewî hate linavçûn.

[304]Ehmed Paşa Walîyê Bexdadê ji bona ku ew welatê xwe û sipahê xwe ji şerê Nadir Paşa bide biparastin, wî soz bi Nadir Şah date dan, ger ku ew Musilê bide bizetfkirin, dê ew Bexdadê jê re bide berdestkirin.

Şepolên xwînrijên Nadir Şah ewende bi hêzbûn, ku ne sipahê Turkî û nejî hêzên Mîr û Eşîran xwe dikarîbûn li ber wan de bidin bigirtin, ew hatin bitarûmarkirin.

Oorduwê Îranî li dawîya talankirina Şarezor de ew bi Kerkukê ve hate bigihiştin û dor lê date bigirtin û li dawîya tengavkirina hefteyekê de ew date bizeftkirin.

Ne bajar û nejî dorhêla wî ji talanîyê û wêrankirinê ve hate birizgarîkirin. Ji Xelkê û ji Liberxwedanvanên wî gelek hatin bikuştin. Nadir Şah li dawêya vêna de li Zeyê Koye-Zabê Biçûk de hate bitêperbûn û Hewlêr jî date bizeftkirin û ew bi Musilê ve hate bigihiştin. Ewên di rêya wî de bûn, tevde wî ew dane biwêranîkirin. Wî baregehê xwe li Yarmece de date bidamezirandin û li meha kewçêrîna sala 1156 k. -1743 Z de li Şarê Musilê de dor lê date bigirtin.

Di vê pêlê jî de qolekî tirî 40. 000 kesê Ecem li dora Bexdadê de bûn û ew nav wan dane bitalan û biwêrankirin.

Walîyê Musilê Celilê Hacî Hisên Paşa liberxwedaneke zor merdane û azayetî date bikirin. Nadir Şah jî bi hemû hinera tundbûna hêza xwe ve Musilê dida bitengavîkirin. Belam bê sûd bû. Li dawîya dawî de wî bi nêta xapandina Walîyê Musilê ve waz li dorlêgirtina wêna de date bianîn û wî ruwê xwe ji bona Cezîra Ibin Umer date bivedan. Wî li Xelkên wê de kuştarekî giştî date bikirin; Jin û Mendal jî ji vê bela hanê nehatin birizgarîkirin.

Li dawîya vê bêşermezarîyê û hovitîyê de Nadir Paşa ji bona ser Musilê hate bivegerandin û wî ser li nû de çend careke din hêrîşî ser bajêr date bikirin, belam netuwanî bide bizeftkirin. Wî wist, ku ew Walî bi hin mercên baş ve bide bixapandin, vê jî serî negirt. Ew neçar bû, ku ew bi xwe û leşkerê xwe ve ji bona layê Bexdadê bête bivegerandin.

Di deme vî şerê Îraq û Şarezorê de orduwekî tirî jî li layê Ezirbêcanê ligel sipah Turkî de didate bişerdikirin.

Institut kurde de Paris

Bi kurtî ve ev şerê hanê jî bi dirêjbûna xwe ve jî vê carê jî bi gift û goyên aşîtîyê ve hate birawestandin.

Nadir Şah li dawîya nardina Encumeneke gift û goyê ji bona Bexdadê de ew ji bona Îranê hate bivegerandin û gift û goyên aşîtîyê dirêjî datin bikişandin.

Dan û sitendina Nadir Şah ligel Kurd de zor xerab bû û Kurd ligel wî de bi kîn bûn. Di gava şerê wî de ligel Topal Osman Paşa de bi zaravayê Goranî helbestên devbiavêtinê pê hatin bigotin. Hoyê vê jî tevfirandina zor û xerabîya Nadir Şah bi xwe bû. Yekek ji pir bêbextîyên wî avêtina Subhan Werdi Xanê Serdarê Erdelanê bû û li cîgehê wî de danîna Birayê xwe bû, yê ku ew bi hoyê liberrabûna Kurdê wê navê ve dihate biderkevtin.

Li sala 1139 k.- 1727 z. de Nadir Şah wist, ku ew Kurdê Xuresanê Eşîrên Çemşigezk û Qereçorlo bi gij Turkumanan ve bide biberdan. Lêbelê Kurdan guh pê nedan. Li ser vê ji bona tawankarîkirina wan Nadir Şah ew ji bona Meşhedê datin biveguheztin.

Di 23 Yunyo yanjî 19 wê de sala 1747 z. -1160 k. de Nadir Şah di çûna xwe de ji bona ser Kurdên Xuresanê di rê de hate kuştin (Insiklopêdya musulmantîyê).

Li dawîya kuştina Nadir Şah de Îran hate bişîwandin û di wê navê de kirdarên Kurdên Îranê bêtir bûn. Dewleta Kurdîyî Zend di vê pêlê de hate bipêkhatin û ew ji sala 1166 k.-1753 z. de tanî sala (1209 k.-1794 z.) de ango 41 salê hate bidirêjkirin.

Ev dewleta Zend bi hoyê penebûna Mîrên Baban ji bona wê bi nêta parastina wan ve gelek carî ew ligel dewleta Osmanî de hatin bitêkçûn û wê jî gelek ceng û şer li devera Îraqê û Şarezorê de date bilidarxist. (Ev ceng û şerên hanê bi dirêjî ve li Mêjûwa Welatê Sulêmanyê de hatine binivîsandin).

Yekek li hoyê linavçûna dewleta Zend de bê hêzî û kêmbûna Eşîra Zend bû. Wan netuwanî bi tewawî ve yarmetîya Nevîyên Kerim Xan bidin bikirin.

Ji bona nehiştina van kêmasîyên hanê Kerim Xan hin ji Eşîrên Kurd ji bona Şîrazê date biveguhestin. Ehmede Wend, Goroni li wan Eşîran de bûn.

Institut kurde de Paris

Li dawîya nemana dewleta Zend de Axa Mihemed Xanê Qacarî derbare bi Eşîrên Kurd ve û bi taybetî ve Zend zordarîyeke bê endaze date bikirin û wî gelek Serok dane bikuştin, ji Xanedanê Kerim Xan ji bil Yekekî Ebdul- Lah Xan pêve kesekî din ji destên wî nehatin birizgarîkirin. Gelek jî ji van Eşîran ji bona cigehên dûrî Îranê dane bibarkirin û wî Eşîrên Turkmanî ji bona nava cihên wan date bihênanîn. (Mêjûwa Îranê, Malkolm).

Li sala 1193 k.- 1779 z. de Ebdul-Baqî Paşayê Waliyê Musilê, yê ku ew yekek ji Koleyên Bexdadê bû û bi zordarîya xwe ve bi nav û deng bû, bes û bi tenha ve bi nêta talankirinê ve leşkerek bi ser Amêdîyê ve date bidadan. Her yekî mala wî hebû, ew bi pêş xwe ve dane xistin û ew ji bona layê Musilê ve datin bianîn. Belam Xelkê Amêdîyê bi şûn wî ve hatin bikevtin û wan ew pir date bitengavkirin û ew dane bikuştin û talanên xwe jî dane bivegerandin.

Dewleta Qacarî, ya ku ew li dû Zend de li Îranê de hate bidamezirandin, di navbera bên û bênekê de ligel dewleta Osmanî de di şer û ceng de bû. Wê hêrîş bi ser welatên Kurd jî ve didate bikirin.

Eşîra Şikak li jêr sermiyandarîya Sadiq Xanê Serokê xwe de gelekî yarmetîya damezirandina dewleta Qacarî date bikirin.

Di pêşîya destpêkirina pêla Eli Xan de di sala 1211 k.- 1796 z.de Sadiq Xan li ber dewleta Îranê de hate birabûn, Belem ew hate bişikenandin.

Institut Kurde de Paris

## 3. Kurd Li Dawîya Sedsalê Heştdehemîn De û Di Sesdalê Nozdehemîn De

Walîyê Bexdadê ji bona bêdenkirina rûdanên Muntefek û serjêrkirina Şawî Zade di salên 1201, 1202, 1206 k.- 1787, 1788, 1792 z. de li hêzên Kurd de gelekî ji xwe re sûd date biwergirtin[305].

[305] Ji xwe re bi dirêjî li Kurtîya mêjûwa Bexdadê ya Şêx Osman Ibin Sened El-Besrî bide temaşekirin, ya ku ew ji bal Emîn Ibin Hesen El-Helwanî El-Medenî di sala 1290 k. de hatîye bikurtkirin û ew di sala 1304 k. de li Bombê de hatîye biçapkirin. (M. E.).

Li sala 1223 k.- 1812 z. de Baban Ebdul-Rehman Paşa li nêzîka Kufri de ligel orduwa Walîyê Bexda de date bişerkirin û ew hate bişikestin[306]. Li nava van rûdanên hanê de Kurdê Şehrezorê zîyanekî zorî dane bidan.

Bi hoyê penebûna Ebdul-Reham Paşa ji bona nik Iranê dewleta Îranî bi orduwekî ve Bexdad date bilerizandin û welatên nêzîkî ser sînor datin bitalankirin. Vê destdirêjîyê û hêrîşên Îranê bi hoyê Mîrên Babanî ve gelekî date bidirêjkirin.

Rûdanên Tîmor Paşayê Milî[307] jî di vê pêlê de lihev hatin birasthatin:

Dewleta Osmanî li ser hinek hoyên serpereştîyê de lîwa Mêrdinê bi ser Bexdadê ve date bixistin.

Xelkên vê heremê sê reng bûn: Beşê Turkuman li bajaran de dihatin birûdiniştin. Beşê şax û daxê Tor Abidînê û Qerece Daxê bi destên Eşîrên bi hinerî Kurd ve bûn. Layê biyabanê jî bi destê Êlên Ereb ve bû. Belam desthilatî û hinera Kurd bi ser herdu beşên din ve dihate bizalbûn.

Bi rastî jî ewan bi tenya ve Eşîrek nebûn. Belam çunge, ewende ligel biyanîyan de têkelîya wan nebû, wan paktîya xwîna xwe dabûn biparastin û hemûyan xwe bi Eşîra Milî ve didan bizanîn, yanjî xwe pêve didan bigirêdan û kombûna wan li dora Serokekî de zor asan bû. Li gora vê Komelê û yekdilê wan çi li nava orduwekê de û çi jî di dema tevlihevîyê de her û her dibû, ku ew bi libatekî kirdar û tirsdar ve bêtin biderkevtin.

Belam ew her û her pêwistî bi Serokekî kardar bûn, da ku ew wan bide birêxistin û bisermiyandarîkirin. Ev Serokê hanê jî li dawîya

[306]Navê wî Sulêman Paşa bû. mêjûwa Cewdeta Paşayê Turkî bergê 9, R. 226.

[307]Ev Şûreşên hanê di sala 1204 k.- 1790 z. de hatine vêketin. Ji xwe re li Cewdet Paşa, li Tomara Osmanî bergê 4, R. 377, li Kurtîya mêjûwa bajarê Bexdadê, R. 21 bide bitemaşekirin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

sedsalê duwanzdehemînî koçî de hate bipeydabûn û navê wî jî Tîmor Paşa bû.

Ev Paşayê hanê ji malbateke kurdîyî bi nav û deng bû û demekê wî li Istenbolê de pir karmendiyên gewre gewre dabûn bikirin. Li dawî de her çilo bû, ew jiber çavê wî hatin bikevtin. Wî kêsek ji xwe re date bidozandin û ew ji Istenbolê derçû û ew ji bona nava Eşîra Milî hate bivegerandin û ew bi Serokê wê ve hate bikirin[308].

Sêr Bokingam dibêje: "Tîmor Paşa her çend Cerde û Peyên Xerabên wê navê hebûn, hemû ji bona layê xwe wî ew dabûn bianîn. Bi vî rengî ve zor hêzeke baş wî date bipêkanîn û ew dane biçekkirin. Çûnge, ew di serûştîya xwe de bi xwe jî ve şarezayî jîyana serhildan û liberrabûnê bû. Ewende pê neçû, ku wî li wan navan de nav û deng date biderxistin. Ji bona nava dilên Walîyên Heleb û Diyarbekrê tirs û lerz wî date bixistin" (Mêzopotamya, r. 293).

Bi taybetî ve rêya Heleb, Diyarbekir û Musilê ew ji bal Tîmor Paşa de hatibû bibirîn. Pêrabûna pêşî ji bona vekirina rê bê encam hate bimayîn.

Di dawîya dawî de Walîyê Bexda Sulêman Paşayê Gewre, yê ku ew di sala 1205 k. de habtibû bidanîn, ji bal Istenbolê de ji bona linavbirina vê rêgirtina Tîmor Paşa ferman pê hate bidan. Ew li sala 1206 k.- 1791 z. de bi orduwekê ve ji bona Musilê hat bigihandin û li wêderê jî de nêzîka sî hezar Suwarekî date bikomkirin û beşê zorî vê orduwa hanê bi Kurd ve dihatin biderkevtin.

Walîyê Heleb Kose Mustefa Paşa (1), Walîyê Reqa Ozon Ibrahim Paşax(2) û Muteserifê Meletya Reşwan Zade Omer Paşa (3)[309] jî tev bi xwe û hêzên xwe ve di nava vê orduwê de hatin bitevlêkirin.

[308]Ev lêgerandina hanê ji Çar sedsalên Dawîyî Îraqe de û ji mêjûwa Cewdet Paşa hatîye biwergirtin.

[309]Ev her Sê nav di kokê de nebûn. Min ew ji mêjûwa Cewdet Paş dane biwergirtin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Sulêman Paşa ruwê xwe ber bi Mêrdinê ve date bivedan. Tîmor Paşa beramberî vê hêza gewre nehate biserkevtin. Ew bi hazar bela ve ji keleha Bok hate biderçûn û wî xwe ber bi layê Heleb ve date biculandin. Li dû wî de Sulêman Paşa Eşîrên Milî bi tundî ve datin biserjêrkirin.

Wî Serdarê Mêrdinê jî date bixistin; jiber ew bi jêrgûmanê ve hate bikevtin. Hevalbendên Tîmor Paşa wî dane bidarvekirin. Sadûn Begê Birayê Tîmor Paşa û Mehmud Begê Amoza jî di nava wan de bûn. Sulêman Paşa li paş de Ibrahim Begê Birayê Tîmor Paşa bi Serokê Eşîra Milî ve date binîşankirin.

Bingehê van hemû ceng û şeran lawazîya serpereştîyê bû. Cîgehekî weku Mêrdînê, yê ku ew li bin çengê Diyarbekir de bû, bi Bexdadê ve hatibû bigirêdan.

Pîsîtîya serpereştîyê, zor û sitem ji sînor der bû. Li bajarê Mêrdinê de bi xwe ve Paşa Gerdanî Enarşî bû. Çend caran Xelkê bajêr bi xwe ve beramber bi Şarevanî, bi Polîs û Serdarê serpereştîyê ve şûreş û serhildanî dane bikirin.

Daxwaza hewarê ji Eşîran, qayiş û berberîya di nava wan de, genîbûna serpereştîyê li Musil û Bexdadê de, dujminatîya di navbera Turk, Kolemen-Memalik û Milî de ...h d. krê serpereştîyê û bînvedana Xelkê têk û pêk dabûn.

Sulêman Paşa ji bona Bexdê hate bivegerandin. Tîmor Paşa bi ber destên wî ve nehate bikvetin. Li paş sê salan de di 1209 k.- 1794 z. de ew Bexdê hat û wî xwe ji bextê Sulêman Paşa date biavêtin. Sulêman Paşa lê hate birabuhurandin û li paş beynekê de ew bi Walîyî Reqa ve date bidanîn.

Belam li wêderê de, çunge, ligel dujminên xweyî kevin de bi qayiş û berberîyê ve hatibû bimijûlkirin, pê îş û karê sepereştîyê nehate bikirin; jibervêjî ew ji bona Walîyê Siwasî di Şubana 1218 k.- 1803 z. de hate biveguhestin.

Institut kurde de Paris

Li dû Ibrahim Beg de serokitîya Eşîrên Milî bi destê Eyub Beg ve hate bikevtin û ew demeke zor di destê wî de hate bimayîn. Wî bi serbixweyî de dida bikarkirin û dewleta Osmanî jî nedidate binasîn. Li dawî de dewleta Osmanî de leşkerek bi ser ve date binardin û li paş şerekî zor de ew hate bigirtin û ew ji bona Diyarbekrê hate bibirin û li wêderê de di zindanê de hate bimirin. Li duwayî de serokitî ji bona Tîmawî Begê Kurezayê-Nevîyê[310] Tîmor Paşa hate biveguhestin.

Vê Serokê Kurd li şer û cegên di navbera dewleta Osmanî û Misrê de kês ji xwe re date bidîtin û yarmetîya Ibrahim Paşa[311] date bikirin û wî tanî Mêrdinê jî ji xwe re date bizeftkirin.

Belam di pişt re li şerekî de hate kuştin. Li duwayî vî Merovê hanê de û li paş kişandina leşkerê Misrî de dewtela Osmanî dîsan ew nava hanê date bidagîrkirin.

Bi hoyê bê Xwedînîyê ve Eşîrên Milî tûşî bê hêzî û perîşanîyê bûn. Eşîrên Tey û Şemerên Ereb ew pir datin bitengavîkirin. Dêhat -Gund-û welatên wan dane bizeftkirin. Li paş beynekê de Mehmud Begê Kurê Temo-Têmawî Beg date bixwestin, ku ew Eşîra xwe bi serhev ve bide bikomkirin û Walîyê Şamê jî yarmetîya wî bi jimareke Serbaz ve date bikirin. Wî hêdî hêdî Eşîrên Ereb ji nava erdên Milî dane biderkirin. Wî Eşîra xwe bi serhev de date bikomkirin û li Wêranşehr[312] de wî kelehek date bidurûstkirin. Li paş de ew tûşî hêrîşa Umer Paşayê Diyarbekrê bû û ew hate bigirtin û ew ji bona zindana Diyarbekrê hate bibirin.

Ibrahim Begê Kurê wî ji bona Misrê pena bû, belam hîç li wêderê de pê nehate bikirin. Li duwayî de ew ji Istenbolê çû û bi yarmetîya Xudeywî Ismaîl Paşa ve lêbuhurandina Bavê xwe ji Sultan Ebdul-

---

[310]Diyare, ku Tîmawî û Temo ji Tîmor hatine biwergirtin.

[311]Serleşkerê Misrî yê ku wi Şam û Enedol di pêla Bavê xwe Xwe Mohemed Alî Paşa de date vekirin.

[312]Ew Bajereke di nîvê Rêya Ruha Mêrdînê de li Jorî Cezîrê de di welatê Kurd de di Wilayeta Diyarbekrê de tête bikevtin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Ezîz date biwergirtin û ew hate bivegerandin. Wî Bavê xwe ji zindana Diyarbekrê date birizgarkirin.

Belam demek pê neçû, Mehmud Beg hate mirin. Lêbelê wî di destpêkirina Selteneta Ebdul-Hemîdê duwem de ji bona Kurê xwe Ibrahim Paşa mîrneşînîyeke pir xurt li şûn xwe de jê re dabû bihiştin.

Li sala 1223 k.- 1808 z. de Serek Wezîr Gurcî Mohemed Reşîd Paşa bi orduwekê ve ji bona misogerkirina aramîyê tanî dora Musilê hate bigihandin û wî li welatê Badînanê de hinek şer dane bikirin. Wî Amêdî û kelehên din dane bizeftkirin û wî zor li Mîrên Kurd de dane bikuştin û zor li wan jî de wî dane bisingokirin. Her bi tenha ve Mîrê Erzen Derwêş Beg bi alîkarîya serjêrîya xwe ve jê re li şerî wî de hate birizgarkirin. (Mêjûwa Musilê).

Di vê pêlê de serpereştîya Kurdistanê zor perîşan bû. Xelk bi xwe ve bi mal û canên ve her û her li jêr tirs û nemanê de bûn. Çavên Mîr û Karmendan her û her li dû rûtandina Xelkê de bûn. Walî û Muteserifên dirawsên hev ji kînên hev malên Xelkê didan bitalandikirin.

Parêzvanê Wanê Mohemed Derwêş Paşa ligel Muteserifê Muşê Selim Paşa de berber û dujminê hebûn. Wî li sala 1233 k.- 1818 z. de Eşîra Sepkî lê dane bihandan û hin ji Eşîrên din jî ligel wan de dane birêkxistin û hin ji melbendên Muşê pê datin bitalankirin. Selim Paşa jî beramber bi vê yekek bi navê Çeplaq Şêx ligel hinek ji hêza Kurd de ji bona ser Ad El-Cewaz date binardin û ew alîyên hanê wî ser bi ser dane bitalankirin. Bi vî rengê hanê ve van Paşayên şûm ji bona wêrankirina welatê bi hev re didatin biberberîkirin û biqayîşkişandin. (Mêjûwa Cewdet, bergê 11, R. 20)[313].

Vî Derwêş Paşa bi xwe jî ve dewleta Osmanî ji dil nedida binaskirin. Car caran jî ji bona kara xwe wî hêrîşî ser welat û dirawsên

[313]Diyare, ku evaya di çapa nuh de ye. Di çapa kevin de ew bergê 11, R. 64 de ye. Ev Nûçeyên Rûdanên sala 1234 k.- 1819 z. ne. (M. E.).

Institut Kurde de Paris

xwe didate bikirin. Wî dewleta xwe û dewleta Îranê tûşî derdên siyasî didate bikirin.

. Li dawî de wî pûlên taybetî bi navê xwe ve li bajarê Wanê de date bilêdan. Li ser van kar û barên hanê de ew ji bona Qîr Şeher hate biveguhestin. Ew ji bona cihê xwe neçû û wî serê xwe date bihildan û Cîgirê nişankiri li şûna xwe de Yemni Paşa date bikuştin.

li dawî de Serleşker Haviz Elî Paşa bi hêzeke zor ve bi ser Wanê ve hate bidakevtin û ew date bigirtin û Derwêş Paşayê Serhildayî jî date bigirtin û ew date bidarvekirin.

Liberabûna Xelkê Diyarbekrê jî li ber Behram Paşa jî de di vê pêlê de bû. Behram Paşayê Walî neçarbû, ku ew hewarê ji Serokê Eşîra Milî Eyub Beg[314] bide bixwestin. Herwehajî ji Edena û Sîwasê jî hin yarmetî jê re hate bikirin û wî bi wan ve liberrabûn pê date biserkutkirin.

Li sala 1236 k.- 1821 z. de sînorê Rojhilatîyî Osmanî bi hoyê hêrîşên Eşîr û Çetên Îranî ve bi ber tirs û lerzê ve hatibû bikevtin. Rêya Bayzîdê - Erzeromê hatibû bibirandin.

Li layekîtir de 500 malên Eşîra Heyderanlî ji Îranê ji bona dora Muşê hatibûn bibarkirin[315]. Dewleta Îranê bi xurtî ve daxwaza wan didate bikirin.

Ev zîneta hanê bi hoyê pevçûneke siyasî ve di navbera herdu dewletan de bû. Bi xwe jî ve di vê pêlê hanê de zîneta navxweyî Îranê jî pir têk û pêk çûbû.

---

[314]Ji xwe re li mêjûwa Cewdet de bergê 11, R. 83 çapa kevin bide temaşekirin. (M. E.).

[315]Di mêjûwa Cewdet de bergê 12, R. 4 de hatîye: ku ev Eşîra Kurdîyî hanê di koka xwe de Tîrek ji Tîrên Şikakîyî dorhêla Miya Farqînê di Wilayeta Diyarbekrê de bû. Wê ji wir ji bona Muşê û Melazêgurd date bibarkirin. Ew di Havînan de ji bona ser sînorên diçû.

Mohemed Elî Mîrza Serdarê Kermanşah û Ebas Mîrza Serdarê Ezirbêcanê her wan serbixwe didatin bireftardikirin. Wan ji bona hêrîşê bi ser welatên sînorên Osmanî ve her mehne didatin bigirtin.

Rewş û tevgerên Mîrên Baban ji bona Mohemed Elî Mîrza her û her bi hoyên destdirêjyê ve dihatin biderkevtin. Rewşa Cîgerê Şah Ebas Mîrza derbarê Turkiyê de xerabtir bû. Wî hîç guh bi tu peyman û hajbûnan ve ne dida bikirin.

Ji bona nimûne em dibînin, Ku hêzeke Îranî ji nişkê ve li sînorê Wanê de tête biperandin û ew keleheke weku keleha Carê Osmanî dorê lê dide bigirtin[316]. Li layekî tirjî de qolek ji Çetên Îranî tanî Muşê hate bigihandin û ew ligel Selim Paşa Muteserifê wê de şerekî dûr û dirêj dane bikirin. (Mêjûwa Cewdet, bergê 11)[317].

Institut kurde de Paris

Ebas Mîrza ji kêsa mijîlbûna dewleta Osmanî ligel Yunanî de sûd date biwergirtin û wî ji nişkê ve di 12 Zul-Huce sala 1236 k.- 1821 z. de xwe li sînor de date bixistin û wî Topraq Qel-e û Beyazîdê date bizeftkirin.

Qolekî tirî orduwa Îranê bi dû Eşîra Heyderanli[318] ve ruwê xwe ji bona Diyabekrê date bivedan û wê Bedlîs date bizeftkirin û welatê wê date biwêrankirin û zor ji Xelkên wê dane bidîlkirin. Muteserifê Muşî jî Selim Paşa ji wan re serjêr bû. Qolekî tirjî ruwê xwe ber bi Ercîşê ve date bivedan û ew jî date bizeftkirin.

Ji alîyê Îraqê ve Şehzade Mohemed Elî Mîrza jî ruwê xwe ber bi Bexda ve date bivekirin û ew tanî Şehrebanê hate bigihaştin, Belam Dawud Paşayê Walî bi şarezayî û dûrbînîya xwe ve xwe ji zîyanan date bidûrkirin.

---

[316]Ew 12 Demjimaran li Jêri Wanê de li melbenda Hekarê de tête bikevtin.

[317]Di Dana li Istenbolê de çapkirî de ev Rûdanên sala 1301 k. de di bergê 12, R. 1-12 têtin bidîtin. (M. E.).

[318]Insiklopêdîya musulmantîyê dibêje: Ev Rûdanên hanê bi hoyê hera û şerên Eşîrên Xedranlo û Sipîkan hatine rûdan.

Di dawî de zivistan bi ser ve hate û orduwa Ecem ji bona Îranê hate bivegerandin. Sala duwayî jî Ebas Mîrza dîsan date bihêrîşkirin û orduwa Celal Paşa, ya ku ew ji bona sitendina Topraq Qel-e hatibû birêkirin, hate bişikandin. Li dawîya Nexweşîya Reş de orduwa Îranê xwe ber û paş ve date bivegerandin. (Mêjûwa Cewdet).

Bi kurtî ve sala duwayî li Erzeromê de dîsan aşîtî hate bikirin û li ser sînorê Sultan Murad de biryar hate bidan[319]. Belam dewleta Îranê herema Zehawê neda biçolkirin û pirsa destdirêjîya Sulêmanyê jî her wisa hate bimayîn.

Li sala 1246 k.- 1847 z. de dîsan di navbera dewleta Osmanî û Îranê de şer hate bihelgirsandin. Belam li ser navcîtîya dewleta Ingilîz û Rusya de herdu layan dest ji şer datin bihelgirtin û li Erzeromê de peymaneke taze wan datin bigirêdan. Li gora vê peymanê de welatê Zehawê bi du beş bû, beşek jê ligel liwaya Sulêmanîyê de ji bona dewleta Osmanî ve hate bihiştin.

Di navbera salên 1264 k.- 1848 z.- 1268 k.- 1852 z. de Encûmenek ji Wênerên Çar Dewletan ji bona nîşankirina sînor hate bipêkhatin.

Belam jiber serhişkîya Wênerê Turk Derwêş Paşa biryarîya dawî li ser de nehate bidan. Çunge, Derwêş Paşa nek her melbenda Qotor belkî daxwaza hemû welatê Jêrî gola Urmiyê didate bikirin.

Institut kurde de Paris

[319]Ango di sala 1238 k.- 1822 z. de. Mêjûwa Cewdet, bergê 12, R. 88.

Di navbera rûdanên sedsalê nozdehemîn de -her weku Mêcer Son dibêjê, (Gerek Veşartî li Mêzopotamya û Kurdistanê de, r. 37)- Von Minoriskî jî piştê lê dide bigirtin, hinek li mîrneşînîyên Kurd çend caran bi hestekî milî ve û bi hêvîya serxwebûnê ve bi serhiladan û şûreşan ve hatine birabûn. Kurtîya van serhildan û şûreşan weku li xwar de li ser de tête biaxivtin, wisaye:

Piranîya van serhildan û şûreşan ji bal Mîrên Baban de hatine bikirin.

Bekir Beg Kurê Sulêman Baban li sala 1228 k.- 1716 z. de berambcr bi dewleta Osmanî ve hate bihelsandin, Belam ew bi ser ve ne hate bikevtin û ew hate bikuştin.

Sulêman Paşayê Xalid Paşa jî li duwayî mirina Ebu Leylayê Walîyê Bexdadê de bi leşkerekî baş ve ruwê xwe ber bi Bexdê de date bivekirin û li nêzîka Kefrî de şerekî qurs û giran date bikirin, belam biserbikevtin ji bona wî nehat. Wî tanî dawîya jîna xwe jî bi xwe ve serdarêyeke serbixwe didate bikirin.

Daxwazên Osman Paşayê Mehmud Paşa

Her çend jî ew nehatin bicîhatin, belam ew zor gewrebûn. Wî ligel Mustefa Axayê Muteselimê Besra û Şêx Suweynî de peymanek dabû bigirêdan, remana wan zeftkirina welatê Bexdadê û Besra bû. Belam Sulêman Paşayê Walîyê Bexdê pê zanî û wî ew li wan de di sala 1203 k.- 1789 z. date bitêkdan.

Daxwazên Eb-Dul Rehman Paşayê Baban

Ev Mîrê Hanê Kurê Mehmud Paşayê Bebe=Baban bû. Li sala 1201 k.- 1788 z. de ew bi Serdarê welatê Baban ve hate bikirin. Ew zor huşyar, aza û zana bû. Şeş carî wî Fermandarîya mîrneşînîyê dayite bikirin. Li dû hev de û bê birîn wî kêm û zorî bîst û çar salan Serdarî dayite bikirin.
Ji bona pêkanîna dewleteke gewre û serbixwe wîna bi xwe ve zor hewl date bikirin û wî çend caran jî beramberî dewleta Osmanî

serêxwe dayite bihildan. Du caran jî li Derbendê Bazîyan de wî şer ligel orduwê Bexdê de dayite bikirin. Di herdu şeran de ji ber kêra Biryê xwe, yê ku ew ligel Walî de yekbû, nehate biserkevtin. Cara sêyem li zemanê Ebdul-Lah Paşayê Walîyê Bexdadê de dîsan wî ruwê xwe ber bi Bexdê de date bivedan. Li nêzîka Kefrî de wî ligel orduwa Bexdê de şerekî qurs date bikirin û ewende nemabû, ku ew orduwa Bexdê bide bişikenandin. Belam bextê cengê jê re yarî nekir û li encam de ew hate bişikestin.

Kîn û berberîya Bira û Xizmên wî nebûna, zor dibû, ku ew li ser Bexdê de bihate biserkevtin û wî dewleteke gewre li Îraqê de bida bidamezirandin. (Ji bona dirêjbûnan ji xwe re temaşeyî Mêjûwa Sulêmanîyê bidin bikirin).

Institut kurde de Paris

Daxwaza Mohemed Paşayê Rewanduzê

Daxwazeke tir di binê dilê Mohemed Paşayê Rewanduz de dihate bidîtin. Ev mîrneşînîya hanêyî biçûk li sala 1225 k.- 1810 z. de û li paş Oxoz Beg de ew bi destên Mustefa Beg ve hate bikevtin.

Ev Mîrê hanê bi pîrîtîya xwe ve ji bal Serdarên Baban de zor hate bitengavkirin. Kurekî wî bi navê Mohemed Beg ve, yanjî Mîr Mohemed ve dewleta wî ji destê wî date bisitendin û Bavê wî li sala 1241 k.- 1826 z. de hate mirin.

Mîr Mohemed bi Mîrê Gewre ve bi nav û deng bû. Bi rastî ve ew Mîrekî zor aza, tund û bi kar bû. Pesnên bilindî serdarîtîyê têde cihê gûmanê nebûn.

Di pêşîya pêşî de wî dirawseyên xweyî biçûk weku Şîrwan û Biradostê ji bona jêr serdarîya xwe ve dane bixistin.

Di sala 1246 k.- 1830 z. de wî serxwebûna xwe date bidazanîn. Sorçî û Xoşnav jî bi jêr serdarîya ve dane bixistin. Serdarê Babanîyî Herîrê date biderkirin û bajarê wî jî date bidagîrkirin. Li dawî de wî Leşker bi ser Hewlêrê de date bidadan û li dawîya dorlêgirtina wê de

ew jî date bigirtin. Di pişt re ew ji bona ser Koprî-Alton Koprî çû û wî ew jî date bizeftkirin.

Wî îş û karên serpereştîya van bajaran date birêkûpêkxistin û wî Peyayên xwe li ser wan date bidanîn. Li dawî de wî Koye û Ranyê jî ji dewleta Baban date bisitendin. Bi vî rengî ve wî sînorê dewleta xwe bi Zeyê Kuye ve date bigehandin.

Walîyê Bexdadê Elî Rida Paşa beramber bi hêz û xurtîya Mîr Mohemed netuwanî hîç bide bikirin. Bi neçarî ve wî îşê wî bi şîrînî ve date bibirîn û wî dewleta Mîr Mohemed jî bi Mîrîtîye date binasîn û nîşana Paşetîyê jî pê date bidan.

Mohemed Paşa di sala 1247 k.- 1831 z. de bi ser Yezîdîyên Rojhilatî Musilê ve çû. Hoyê vê çûna hanê jî eve bû, Ku Mîrê Yezîdî Elî Axa Balti bi bêbextî ve dabû bikuştin. Ev Elî Axa Gewreyê Eşîra Elqoşê bû, Birazyê wî, yê ku ew bi navê Mela Yehya bû, li Mizurê de bi zanistî û qencîya xwe ve bi nav û deng bû. Li dawîya kuştina Mamê xwe de wî li layê Mohemed Paşe de date bigilîkirin û jê dawxwaza mafe sitendinê date bikirin. Mîrê Rewanduzê bi leşkerekî gewre ve hate dakevtin û ew li Zeyê Badînan-Zabê Gewre de têperî û wî hêrîş bi ser Yezîdîyan ve date bibirin. Wî kuştarekî zorî lê kirin. Ewên ku qotar bûn, wan xwe ji bona nava çiyanên Cûdî, Tor Abdîn û Şingalê dane bikişandin. Hinekan ji wan jî xwe ji bona nava şax û daristanan datin biavêtin û beşek jî ji wan ji bona Musilê çûn, Belam Serdarê Musilê li tirsa leşkerê Rewanduz de pir dabû bibirîn.

Jibervêjî Yezêdî nema dikrîbûn jê der bihate biderçûn. Leşkerê Mohemed Paşa bi ser wan ve hate bigihiştin, li Girê Qopo Neceq de çardorîya wan date bigirtin. Li dawîya çend rojan de ew bi ser wan de hate bizalbûn û ew tev de dane bikuştin.

Mihemed Paşa sala duwayî ruwê xwe ber bi Cezîra Ibin Uner ve date bivekirin û wî ew nave hanê date bitalankirin û ew ji wê derê bi ser keleha Ezex-Erox ve çû, li duwayî şerekî qurs de ligel Xelkên wê de ew ji bona dora Musilê û ser Yezîdîyan ve hate bivegerandin. Wî li wê navê de kuştarekî zor date bikirin. Serdarê Misulê li ber bê leşkerî

û bê hêzbûna xwe de xurtbûn û sawa Mohemed Paşa lerz û tirs pê hatibûn bikevtin.

Mohemed Paşa sala duwayî ruwê xwe ber bi Akrê ve date bivedan. Li dawîya dorlêgirtineke kurt de wî ew date bizeftkirin û Ismaîl Paşayê Serdarê wê hate bibazdan. Li Paş de ew ji bona ser Zîbarê ve çû, ya ku ew bi destên Mîrê Amêdîyê Seîd Paşa de bû. Mohemed Paşa li paş şerekî dirêj û gewre de Seîd Paşa date bişikandin û ew ji welatê wî date biderkirin û wî Musa Paşa[320] bi Serdarê Amêdîyê ve date danîn. Ev Musa Paşayê hanê ji Malbata Mîrên Badînan bû û zor kîna wî li Seîd Paşa de dihate biderkevtin. Ew bi xwe jî ve li nik Mohemed Paşa de pena bû.

Mohemed Paşa li paş îşê Amêdîyê û Dihok de Zaxo jî date bigirtin û wî Karmendên xwe li ser de date bidanîn.

Li hemû welatê Badînan de aramî û serdanîneke wetov hatibû bipeydakirin, ku ew hêjî kesekî nedabû bibihîstin. Ji tirsa Mîr Mohemed Paşa kesekî newêrîbû xirbiyekê bide bikirin.

Ev Mîrê Gewreyî hanê zor dîndar bû û hîç karekî giring bi bê Fetwa û wergirtina bîr û bawerîya Ulema ne didate bikirin. Qanûna wî Qurana Gewreyî Bilind û Şerîeta Şerîf bû.

Weku Mêcer Longrik dibêje: rêk û pêkxistin, asayiş û aramîya welatê Mohemed Paşa bê nimûne bû û ew bi carekê ve bi bêvajîya welatên dirawsên xwe ve dihate biderkevtin. Weku Bexdê û dirawsên wîyî tir ji aanûn û ayînê bi bê pişk û par ve dihatin biderkevtin.

Li duwayî Zaxo de dîsan wî ruwê xwe ber bi Cezîrê û Hesen Kêfê de date bivekirin. Wî Cezîr û Bedirxanî ber bi tirs û lerzê ve datin bixistin. Mêrdîn û Nisêbîn jî wî datin bitengavkirin.

[320]Four centuries of Modern Iraq S. H. Longrig, Oxford 1925, R. 286 dibêje: ku Mohemed Paşa Birayê xwe Resul Beg bi ser Imadîyê de bi Serdar date bidanîn. mêjûwa Musilê dibêje, ku Musa Paşa bi Serdarî hatibû bidanîn. Rastî Musa Paşa bû; jiber Resul Beg cara duwem bi Serdarî ji Imadîyê hatine bidanîn.

Institut kurde de Paris

Li paş vergerandina wîna Xelkê Amêdîyê Musa Paşa dane biderkirin û wan dîsan Mohemed Seîd li cihê wî de dane bidanîn.

Ev xebera hanê bi Mohemed Paşa ve hate bigihaştin û wî ser li nû de bi leşkerkî pir ve ruwê xwe ber bi dora Musilê ve date bivedan.

Bi Xelkê vî bajarî ve tirs û lerz hate bipêkevtin. Belam Mohemed Paşa hêrîşî bajêr neda bikirin, Wî ruwê xwe ber bi Amêdîyê ve date bivekirin. Wî sê mehan dora wê date bigirtin û di dawî de bajar hate biberdestkirin û Seîd Paşa xwe berdestî Mohemed Paşayê Kore date bikirin. Mohemed Paşayê Kor kîna xwe di serê Xelkê bajêre de date biderxistin û zor lê datin bikuştin. Li paş de Resul Begê Birayê xwe bi Serdar ve li ser wan de date bidanîn û Amêdîyê jî bi Rewanduzê ve date bigirêdan.

Di vê bînê de Muteserifê Musilê Mohemed Paşa li nebûna Mîrê Kor li Rewanduzê de sûd date biwergirtin û wî xwest, ku ew navînîya wî ji xwe re bide bigirtin. Bi rastî jî ve Cîgerê Mîrê Kor Reşîd Beg xwe ji bona ser çiya date bikişandin, belam leşkerê Musilê jî hate bivegerandin.

Di vê demê de dewleta Osmanî Serek Wezîrê pêşî û Walîyê Sîwasê Mustefa Reşîd Paşa[321] ji bona bi bêdenkirina wan navan ve kar pê hate bisipartin û ji bona Walîyê Bexdê û Musilî jî ferman bi yarmetîya wan ve ji bona wî hate bidan. Mustefa Reşîd Paşa ji bona komkirina leşker date bisetpêkirin. Mohemed Paşayê Kor jî xwe ji bona navînîya xwe date bikişandin û çavdêrîya zînetê ddate bikirin.

Leşkerê Mustefa Reşîd Paşa bi ser Cezîrê û Zaxo re ji bona Musilê hate bigihatin û li wê derê de ligel leşkerê Înce Bayraqdar de ruwê xwe wan ber bi Rewanduzê ve dane bivedan. Leşkerê Bexdadê jî bi

[321]Ew Reşîd Mohemed Paşayê Gorcî ye, yê ku ew Serlêşkerê Turkîyî Rojhilat bû. Wî Rêberîya sipahê Turkî di şerê Qoya de ligel sipahê Misrî de di bin Rêberîya Ibrahim Paşa de di sala 1248 k.- 1832 z. de dikir. Ew di Wî şerî de hate girtin. Di paş de ew hate biberdan. Ew li bajarê Diyarbekrê de di sala 1252 k.- 1836 z. de mir. Mirina wî berî şerê Nesîb bû, yê ku ew di sala 1255 k.- 1839 z. de di nava sipahê Turkî û Misrî de rûda. (M. E.).

Institut kurde de Paris

wan ve hate bigihiştin û li deşta Herîrê de wan ew ligel xwe de dane bihilgirtin. Kor Mohemed Paşa gelîyê Elî Beg dabû bigirtin û bi pê ve têperîn li vî Derbendî de sext bû û ew ne dihate bikirin.

Mustefa Reşîd Paşa Kaxezek ji bona Mohemed Paşa date binivîsandin û gelek giraw bi namûs û şerefa xwe pê date bidan, heger ku ew xwe bavêjê dê ew li wî de bête bibuhurandin û ew dê ji bona cigehê wî bête binardin. Ev sozên hanê wî pê datin bidan[322].

Li ser vê Mohemed Paşa nexwest, ku xwîn di navbera wan de bête birijandin û li ser soz û peymanên Mustefa Reşîd de Mohemed Paşa ji bona nava orduwê wî xwe date biberdestkirin.

Bi rastî jî ve Reşîd Paşa ew ji bona Istenbolê date binardin û wî li wê derê de jêre lêbuhurandin date bisitend û alîkarîya wî date bikirin, ku ew ji bona Rewanduzê bête bivegerandin, belam di wê demê de Mustefa Reşîd Paşa hate bimirin.

Elî Rida Paşayê Walîyê Bexdadê, yê ku ew Berberê Reşîd Paşa û dujminê Mohemed Paşa bû, dest bi nivîsandinê ve ji bona Istenbolê date bikirin, heger ku Mohemed Paşa ji bona Rewanduzê bête binardin, êtir serdarî dujwar dibe û aramî jî li vê hêlê de nayête bimisogerkirin.

Li ser vêna de Istenbolê dest bi cî ve Teterek ligel fermana kuştîna wî bi dû wî ve date binardin û ew bi destê Walîyê Sîwasê ve Mohemed Paşa Nazil hate bigihaştin. Walîyê Sîwasê darvekirina Mohemed Paşa date bicîanîn[323].

Institut kurde de Paris

---

[322]Di Goyeke din de tête gotin, ku Roja Înê Peyvdarê Mizgefta Rewanduz, yê ku ew yekekî ji Zanistîvanan bû, di Peyva xweyî Înî de li ser bê Destûrbûna şer ligel orduwa Xelîfe de kir. Vê peyva hanê Leşkerê Mohemed Paşa sarkir. Mohemed Paşa li dawîya vê de çû û wî xwe berdestkir. Xurtbûna Ayîna wî nehişt, ku ew bide şerkirin.
Li Nameyeke destnivîsî de ji bîrwerîyên Esed Efendî Xêlanî Hecî Umer Efendî Zade hatîye biveguhestin, ew dibêje: ku Bavpîrê vê Malbatê Xetî Efendî bû. Ew li nik Mohemed Paşa de zor hêja bû wî şîret lêkir, ku ew here û xwe bide berdestkirin. Ew bi xwe jî ligel wî de di Demjimara Şeşê Êvarê de ji bona nik Serok Wezîr Reşîd Paşa çûn.

[323] li gora Goyeke din de, ku Mohemed Paşa li Gemeyê suwar bûye û ew hatîye

Li dawîya Mohemed Paşayê de welatê wî bere bere bi destên Turk ve hate bikevtin û mîrneşînîya Rewanduzê bi carekê ve hate bilinavçûn.

Bi vî rengî ve tavaya Selteneta Mîrê Kor, ya ku wê di dema çar salan de ji sînorê Îranê ve tanî Sincarê û Hesen Kêfê ve ronahî dida bikirin, hêdî hêdî hate bitemirandin.

Zor renge, Ku heger vî Mîrê gernas û mêrxas ewende guh bi qanûn û yasayê ve didate vidan, heger wî jî wehajî ewende guh bi siyasetê jî ve bida bidan, dê ew bi daxwazên xwe ve bihata bigihaştin û dê wî jî bi serdejî ve dewleteke bi hêz, hiner û serbixwe ve bida bidamezirandin.

Institut kurde de Paris

Pêrabûna Ismail Paşayê Badinan

Ev Ismaîl Paşa ye, li paş Resul Begê Birayê Mohemed Paşa de Amêdîyê bi jêr serdarêya xwe ve date bixist û gund û welatên nêzîk jî date bidagîrkirin û bi serbixweyî ve wî dest bi serdarîyê ve date bikirin. Li paş beynekê de li sala 1251 k.- 1835 z. de Ostandarê Musilê Înce Bayraqdar Mohemed Paşa leşker bi ser de date biraserkirin û wî li dawîya dorlêgirtineke dirêj de Amêdîyê date bizeftkirin, lêbelê Ismaîl Paşa bi xwe û hêza xwe ve hate biderçûn û wî xwe bi keleha Nîrwa ve hate bigihandin, ya ku ew li Jorî Rojhilatê Amêdîyê de tête bikevtin.

Ostandarê Musilê li dawîya cîbicîkirina îş karê Amêdîyê de hate bivegerandin û wî di rêya xwe de li gundê Ker Mohemed Ereb de Serok û Axayên Şêxanê dane bikomkirin û hemû dane bikuştin.

Terabzûn û ew li wêderê de hatîye girtin û hate kutşin.
(Di Tomara Osmanî de hatîye nivsaîndin, ku ew di sala 1252 k. de ji cihê wi ew hatîye daxistin û ew di wê salê de mirîye. M. E.).

Li paş peynekê de Ismaîl Paşa leşkerekî baş date bipêkanîn û wî ruwê xwe ber bi Musilê ve date bivedan û wî kaxezek ji bona Mohemed Paşa date binivîsandin û têde wî dawxaza vegerandina Amêdîyê date bikirin. Ostandar guh pêt pê neda bikirin. Li paş de Ismaîl Paşa ruwê xwe ber bi Cezîrê ve date bivedan û demekê ew li wê derê de hate bimayîn û dan û sitendin ligel Serokên Amêdîyê de date bikirin. Ew ligel wan de hate birêkevtin û li sala 1258 k.- 1842 z. de ji bona nava Amêdîyê ve hate biçûyîn.

Gava ev xebera hanê bi Ostandarê Musilê ve hate bigihaştin, dest û bir wî leşkerek date bikomkirin û wî ruwê xwe ber bi Amêdîyê ve date bivekirin. Îsmaîl Paşa jî bi leşkerekî ve li nêzîka gundê Eyn Tusa de pêrkî wî hate bikirin. Du leşker berengarî yekbûn. Li paş şerekî zor de leşkerê Amêdîyê -renge bi fêl ve- jihev hate bikevtin û ew bela wela bû. Li dawîya vegerandina orduawa Musilê de wê destbirkirin û li rêya çiya de wan ruwê xwe ber bi Musilê ve dane bivedan. Gundê Elqoşê, yê ku ew li rêya wan de bû, wan date bitalankirin û hin kuştin û kuştarî jî date birûdan. Li dawî de Ismaîl Paşa ji bona Amêdîyê hate bivegerandin.

Li dawîya berdestbûna Mohemed Paşayê Rewanduzê de orduwa Mustefa Reşîd Paşa bi ser Amêdîyê ve çû û li paş demekê de keleh hate biberdestkirin û Ismaîl Paşa hate bigirtin û ew ji bona Bexdê hate binardin û ew li wê derê de hate bizindanîkirin. Dewra vî Mîrê Badînanî jî bi ser ve çû.

Dewleta Osmanî ev pêrabûnên hanê yek li dû yan din de date bivemirandin. Gerek bû, ku van Mîrên hanê xwe bidana biyekkirin û bi hevpeymanî û biratî ve liberxwedaneke hevbeşî bidana bidurustkirin!

Li dawîya kevtina Amêdîyê de Akrê û Dihok jî hatin bizetfkirin û Serdarên Şûngirên van welatan yek li dû yê din de li Bexda û Musilê de bi zor ve hatin bidanîn.

Li hemû welatê Badînan û Soran de serpereştîya Turk hate bicîgîrîkirin. Li vê navê de bes û bi tenha ve mîrneşînîya Banan hatibû

Institut kurde de Paris

bimayîn û wê jî bi hoyê berberî û pevçûnên di navbera Begzadên Baban de ruwê xwe ber bi nemanê ve date bivedan.

## Ehmed Paşayê Baban

Derbarê tevgera wî de agehdarîyên baş bi destên me ve nehatine bikevtin. Belam Mêcer Son her ewende dibêjê: Ku Ehmed Paşa xwest, ku ew beramber bi Turk ve şûreşekî bide bilidarxistin.

Bi vê remana hanê ve wî pêkvexistina leşkerekî bi rêk û pêk ve date bilidarxist û ew li ser rêzanên taze de date bidanîn û ew date bihîn û biperwerdekirin.

Jimara vî leşkerê hanê çar tabur bûn û her taburek jî bi hêza topdarên xwe ve hezar Şervan bûn. Li paş de wî ruwê xwe li paşetîya Bexdadê de date biwergîrkirin û ew bi ser Koye de çû. Belam ew di vê de nehate biserkevtin.

Li bûyînên rûdanan de weha têtê biderkevtin, ku nehiştina biserketina wîna Mehmud Paşayê Mamê wî bû, yê ku ew ligel orduwê Ecem de bi ser Sulêmanyê ve hate dakevtin û wî ew date bizeftkirin û Ebdel-Lah Paşa Birayê wî jî ligel Walîyê Bexdê Necîb Paşa de biyekbûn.

Institut kurde de Paris

## Tevgera Mîr Bedirxan Beg[1]

Ev Mîrê hanê di sala 1127 k.- 1812 z. de bi Mîrê Cezîrê û Botan ve hate bikirin. Hêşta temenê wî heştdeh salî bû.

Li layekî de wî dayite bixwestin, ku ew li ber fer û fêlên Turk de li nava mîrneşînîya xwe de berbestîyê bide bikirin, li layekîtir jî de wî dayite bixwestinî, ku ew kar û xebatê bide bikirin, da ku ew hemû welatên Kurd ji destên Turk bide birizgarîkirin û peydakirina yektîyê û biratîyê di nava Mîr û Serokên Kurdan de bide bikirin.

Bi rastî jî ve Mîr û Eşîrên welatê Wanê, Hekarê, Xêzanê û Muşê ligel hin ji Şêxên bi nav û bang ve di vî warê hanê de ligel de hatibûn birêbikevtin.

Mîr Bedirxan dest bi karbûna xwe ve date bikirin. Wî karxaneyeke tiving û barûdê li Cezîrê de date bidurustkirin. Wî hêjîbêtir kar û xebat date bikirin, ku ew hin îşê baştir jî bide bikirin.

Di gava ku ew di van karbûnan de bû, Aşûrêyên Botan li dana Pêşên Mîrî de destên xwe girtin. Mîr Bedirxan Deh hezar kesek ji bona ser wan date binardin û ew datin bisertewandin[324].

Van pêrabûnê Mîr bi dilê dewleta Osmanî ve tirs û lerz date bixistin. Wê hin ji Karmendên xwe ji bona layê Mîr de date binardin. Soz û peyman wan pê dan bidan, heger ku ew çavên xwe ji yeketîya Kurdan bide biawîrandin.

Lêbelê îş di vê zîneta hanê de nema dihate bidîtin. Sertewandina Aşûrîyan ji bona dewletên Ewropî bi hoyekî baş ve hate biderkevtin, da ku ew siyaseta destdirêjîyê û tengavkirina dewleta Osmanî bidin bikirin.

Dergehê Bilind ji vê sûd date biwergirtin. Wê xwest, ku ew li Mîr Bedirxan de lêdaneke xurt bide bixistin. Wê feraman bi Muşîrê Enedolê Hafiz Paşa[325] ve date bikirin, ku ew xwe ji bona Mîr bide bilikarxistin û ew kar bide bikirin, da ku ew Mîr ji bona Istenbolê bde bianîn. Hafiz Paşa Karmendekî bi taybetî ve ji bona layê Mîr date binardin, belam ev pêrabûna hanê nehate biserkevtin.

Institut kurde de Paris

[324]Mêcer Son di vî warî de dibêje: ku ev tevgera han li ser dilbijandin û navtêdana Turkan de ji bona Aşûriyan ev tolwergirtin û nabûdkirina hanê ji bal Mîr de hate kirin. Rabûn û Rûniştina Miletê Kurd ligel Filan her û her pir baş bû Ew ligel wan de bi rêk û pêk bûn. (Gereke bi Veşartî li Kurdista û Mizopotamya de, R. 156.

[325]Ew Hafiz Paşayê Çerkesîyê Serleşkerê sipahê Turkî di şerê Nesîbê de bû. Ev şerê hanêyî bi nav û bang di Rebîê duwem de di sala 1255 k.- Yono sala 1839 z. de di navbera sipahê Turkî û sipahê Misrî de di bin Rêberîya Ibrahim Paşa de Walîyê Misrîyî di pişt re hatîye rûdan. (M. E.).

Li dawîya vêna de dewleta Osmanî leşkerek ji bona ser Mîr date birêkirin, Belam ev leşkerê hanê hate bişikestin. Bedirxan Beg êtir du dilî neda bikirin û wî serxwebûna xwe date bidazanîn[326].

Wî di sala 1258 k.- 1842 z. bi navê xwe ve Pûl datin bilêdan. Bazinê serdarî û desthilatîya xwe tanî ser sînorê Wanê, Sablaxê, Rewanduzê û Musilê date bibirin. Wî keleha Sincarê, Sêrtê, Wêranşeherê û Siwêrekê date bidagîrkirin û desthilatîya xwe wî tanî keleha Diyarbekirê date bibirin. Li dawîya serkutkirina liberrabûna dorhêla Musilê de wî Şino û Ormiyê jî date bidagîrkirin.

Dewleta Osmanî di navbera van bûyînan de leşkerekî zorî date bikomkirin û li jêrî fermandarîya Osman Paşa de ji bona ser Mîr Bedirxan date binardin û li Ormiyê-Wirmiyê de herdu leşker bi berengarî yekbûn.

Di gava tengav de Mîr Ize El-dînê xizmê Mîr Bedirxan, yê ku ew Komandarê destê çepêyî leşkerê Kurd bû, date bibêbextîkirin û ew bi dam û destgehê xwe ve ji bona layê orduwa Turk ve çû û wî bi yarmetîya leşkerê Turk ve navînîya mîrneşînîyê Cezîrê date bidagîrkirin.

Mîr Bedirxan gava ku wî weha date bizanîn, hin ji orduwa xwe beramber bi Osman Paşa ve date bicîhiştin û wî xwe ligel leşkerekî de ruwê xwe ber bi Cezîrê ve date bivedan.

Li dawîya ceng û şerkî zor de wî navînîya mîrneşînîya xwe ji Turk û Ize El-Dîn Şêr date bisitendin.

Bi kurtî ve bêbextîya Ize El-Dîn Şêr di encam de bi hoyê şikestina orduwa Mîr ve beramber bi Osman Paşa ve hate biderkevtin. Vê zîneta hanê Mîr Bedirxan date bineçarkirin, ku ew Cezîrê bide bicîhştin û ew xwe bi keleha Arox ve bide bigihandin.

[326]Li gora Çar Şedsalên dawîyî Îraqê de Dazanîna Serxwebûna Mîr Berdirxan di sala 1263 k.- 1847 z. de bû. Ger ku evaya rast be, renge, ku mêjûwa rûniştina vî Mîrî li ser Textê Mîrneşînîyê de di sala 1227 k.- 1812 rast nebe.

Institut kurde de Paris

Leşkerê Turk û Ize Eldîn ev keleha hanê heşt mehan dor lê dane bigirtin. Li dawîya nemana xwarin û vexwarinê de di Kelehê de Mîr Bedirxan hate bineçarkirin, ku ew bi şer ji kelehê bête biderkevtin. Belam ew di vî şerî de xerab hate bişikestin û hemû hebûna hêvîya wî hate biruxandin.

Ew û bi du Kurê xwe ve hatin bigirtin û ew ji bona Istenbolê di sala 1263 k.- 1848 z. de hatin binardin.

Di encamê vê biserketina hanê de dewleta Osmanî ji bona yadgarîya vê pîrozîya xwe Nîşana Cenga Kurdistanê date bidurustkirin[327].

Institut kurde de Paris

Li Duwayî Mîr Bedirxan De

1. Li sala 1294 k.- 1877 z. de di navbera dewleta Osmanî û Rusî de şerhate bihelgirsandin. Dewletê li Kurdistanê de Şervanên ji ber xwe bi zorî ve dane bikomkirin û wê Rêberîya wan bi destên Kurên Mîr Bedirxan ve date bixistin.

Ji van Rêberan jî Osman Paşa û Ken-an Paşa ji vê kêşî sûd dane biwergirtin û ew ligel Serok û Evseran de hatin bilihevhatin, ku ew ji bona Kurdistanê herin, da ku ew ji bona wê hêvîyê perest xebatê bidin bikirin, ya ku Mîr Bedirxan têde nehate biserkevtin.

Ev herdu Mîrzadeyên hanê li sala 1297 k.- 1879 z. de bi dizî ve ruwê xwe ber bi Kurdistanê ve datin bivedan û ket û per ew ji bona Cezîrê ve çûn û li dawî de wan serxwebûna xwe datin bidazanîn.

Çend baran dewletê leşkerê xwe bi ser wan ve date binardin, Belam bê sûd bû. Bi bêvajî vê jî wan bazinê desthilatîya xwe tanî Çolemerg, Zaxo, Amêdîyê, Mêrdînê Mêdyadê û Nisêbînê datin bibirin û Birayên

[327]Ev Nîşa Kurdistanê li gora salnama dewleta Osmanê sala 1322 k. R. 40 de di sala 1263 k.- 1827 z. de hate biderkevtin. Ev ji wergirtina Insiklopêdîya musulmantîyê tête bicudakirin, ya ku ew dibêje, ku ev Nîşana hanê li ser Şûreşa Izedîn Şêr de di sala 1281 k.- 1864 z. de hatîye biderkevtin. (M. E.).

xweyî Gewre Osman Paşa bi Mîrîtî ve datin bidazanîn û Xutbeyên Înê jî bi navê wî ve dane bixwedin.

Şikenandina yek li dû yek de ji leşkerên Turk de û bere bere belavbûna desthilatî û nav û bangê Mîr Osman Paşa di Kurdistanê de Sultan Ebdul-Hemîd duwem date bineçarkirin, ku ew siyaseta dewletê beramber bi Kurd û Xanedanê Bediraxanî ve bide biveguhertin.

Bi rasî jî de dewleta Osmanî li Xanedanên Bedirxanî de her kesê, yê ku ew girtî bû, wê ew datin biberdan û wê Peyakî bi taybetî ve ji bona layê Mîr Osman date binardin û pê date bigotin, ku bi bê rijandina xwîna Musulmanan ve ew amadeye, ku ew daxwazên Kurd bi aşîtî ve bide biwergirtin.

Mîr Osman û Mîr Husên bi van soz û pemanan ve di bin kêra pişgirtinê de ji bal Xizim û Merovên xwe de, yên ku ew li Istenbolê de bûn, datin bibawerkirin û ew ligel Karmendên Turk de bi gift û go hatin bikvetin.

Di xuyanî de dewleta Turk derbarê serpereştîya hundurê Kurdistanê de zor hêsanî dane bikirin. Bi xwe jî ve ev jî bes û bi tenha jî ve ji bona bawerpêkirina Mîr Osman û Mîr Husên bû.

Bi rastî jî ve di dawî de rojekê ev herdu Mîr jî ji bona gift û goyê hatin û ji nivşkê ve Turkan herdu jî datin bigirtin û ew ji bona Istenbolê datin binardin û li wêderê jî de ew dane bizindankirin.

Li paş demekê de wê ew dane biberdan, lêbelê ew dane bineçarkirin, ku ew li Istenbolê de bêtin bidanîştin.

2. Li sala 1306 k.- 1889 z. de ji Kurên Mîr Bedirxan Emîn Alî Beg û Medhet Beg her çilo bû, ew ji Istenbolê revîyan û wan xwe bi Terabzûn ve datin bigihandin. Li wê derê de wan ligel Serokên Kurdistanê de datin bidan û bisitendin. Biryar hate bidan, ku hêzeke çekdarîyî Kurd ji bona Ciwîzelk li nêzîka Terabzûnê de bête bigihandin û li wêderê de ew ligel van herdu Mîrzadeyan de bête bipêrgîkirin.

Institut kurde de Paris

Bi rastî jî ve ev hêza hanê hat û herdu Mîr jî bi dizî jî ve ji Terabzûnê hatin biderkevtin. Belam ev xebera hanê jî bi dewleta Turk ve hatibû bigihaştin û wê ji bona hemû layekî ferman dabû û leşkerekî zor jî rê li ber van herdu Mîrzadeyan de dabû bibirîn.

Bi rastî jî li jêrî bajarê Baybord de wan xwe di nava du hêzên Turk de datin bidîtin û li dawîya şerekî qurs de leşkerê biçûkî ligel herdu Mîran de hate bişikestin û wan xwe ji bona nava çiyayên Erxenê û Madenê datin biavêtin û demekê jî wan şerê xwe date bikirin. Belam herdu Mîr li dawî de hate bineçarkirin, ku ew xwe bidin biberdestkirin.

Institut kurde de Paris

Ize -Dîn Şêrê Botanê[1]

Ev Merovê hanê Mîrê Botan û Berberê Mîr Bedirxan bû. Bi hoyê bêbextîya wî ve Bedirxan Beg hate bilinavçûn. Li dawîya şerê Kirim-Qirim de li sala 1296 k.- 1853 z. de bi çend salan ve û li dawîya vê de, ku dewleta Osmanî serhildana Bedirxan Beg date bivemirandin û Kurdistana navînî jî ji leşker date bivalakirin, Ize El-Dîn Şêr li welatê Botan de beramber bi dewleta Osmanî ve hate helsandin. Wî demeke zor li wan navan de bi serbixweyî ve date bidirêjkirin. Dewleta Osmanî li paş beynekê de leşkerek ji bona ser wî date binardin, Belam ev leşkerê hanê wî xerab date bişerpezekirin û date bişikandin. Duwem car leşkerîkê gewreyê tir dewleta Osmanî ji bona ser date birêkirin û li dawîya şerekî zor de di sala 1281 k.- 1864 z. de dewleta Osmanî ev serhiladna hanê jî date bivemirandin[329].

Tevgera Şêx Ubeydul-Lah

[328]Ger ku ev Izedîn Şêr Xizmê Bedirxan Beg be, agehdarîyên Insiklopêdîya musulmantîyê ligel agehdarîyên Belec Şêrkoh de lihev nakin.

[329]Insiklopêdîya musulmantîyê dibêje, ke ev Nîşana hanê yadgarîya vê Şûreşê bû.

Li dawîya şerê Osmanî û Rusî de li salên 1294-1295 k.- 1877-1878 z. de li melebenda Şemdînan de şûreşeke gewre hate bidestpêkirin. Sermiyan û Pêrabûnvanê bi vê tevgerê hanê Şêxê Neqşebendîyî Şêx Ubeydul-lah bû -Xwedê lêdilovan be-.

Ev tevgera hanê mîna tevgerên kurdîyên tir nebû. Ew ji bal bîr û bawerî û mebesta xwe de bi carekê ve nala tevgera Şah Ismaîlê Sefewî bû, yê ku ew li Îranê de Bidanînînvanê Malbata Sefewî bû. herdu tevger bi rastî jî ve lihevdiçûn:

A. Vê tevgera hanê jî mîna tevgera Şah Ismaîl jî wê hêza xwe ji cudabûna ayînî ve dida bisitendin.

B. Aldar û Pêşruwên herdu tevgeran Derwêş û Mîrd bûn.

C. Mebesta herdu tevgeran pêkanîna dewleteke serbixwe bû.

D. Kirdarê bingehî di tevgera pêşîn de mêrxasî û hozanîya Şah Ismaîl bû, kirdarê bingehê di tevgera duwem de nîşanên bilindî Şêx Ubeydul-lah bû.

Heger zînetan û bext alîkarî bidana bikirin, heger mêraxsî û jîrbûna bilindî Şah Ismaîl di Şêx Ubeydul-lah de bi carekê ve bihata bidîtin, hîç gûman nebû, ku encamê vê tevgerê jî herweha dê nala tevgera Şah Ismaîl bihata biderçûn, belam Ax !

Tevgera Şêx Ubeydul-lah di sala 1297 k.- 1880 z. de û di wê gava hêlakî û bêhêzbûna dewleta Osmanî de date bidestpêkirin; jibervêjî ew weku tevgerên Mohemed Paşayê Rewanduzê û Mîr Bediraxnê Cezîrê tûşî beramberîyeke bi hêzî dewleta Osmanî ve nebû.

Wê zû xurtî û firefbûn ji xwe re date bisitendin[330] û Xelkê devera Şemdînan hemû Mirîd û Dilsozên Şêx bûn.

---

[330]Dr. Belec Şêrkoh di Nameya xwe de R. 48 dibêje, ku Şêx Ubeydula li Jêr desthilatîya Osmanî de daxwaza Xwedmoxtarîya- Ewtonomîya hemû Kurdistanê dida

Institut kurde de Paris

Ew di derbarê hunra şer û cege de bi rastî jî ve li Nayrîyên Bavpîrên xweyî kevnar de kêmtir nebûn.

Bi awirekê ji Rêberê xweyî xweşevist mîna lehîyeke xurt wan ruwên xwe ji bona welatên Urmiyê-Ormiyê û Mukri-Sablaxê dane bivedan.

Li çîrya pêşî de li sala 1880 z.- 1297 k. de wan welatê Mukriyî, yê ku ew hemû Kurd bûn û bawerîyeke wanî gewre bi Şêx hebû, bi sivkayî û asanî ve dane bidagîrkirin. Xelkê Mukri hemûyan bi dil û can ve yarmetîya Şêx dane bikirin û cenga ayînî beramber bi Şiîyan ve datin bidazanîn.

Vê dazanîna cenga rêçî li welatê Meraxa de kêreke zor date bikirin û di navbera Şie û Sunî de kuştarekî zor hate birûdan. Zîyana mal û canê Şiî bi serûştî ve gelekî zor bû. Saw û xurtbûna leşkerê Mirîdan bi xwe jî ve bajarê Tevrîz-Tebrîzê jî bi ber tirs û lerzê ve date bixistin.

Dewleta Rus (Mosqov) ji bona parastina welatê xwe û nehiştina têperbûna leşkerê Mirîdan di sînor re leşkerekî baş date bikomkirin û wê ew li ser sînor de date bidanîn.

Dewleta Îranê jî beramber bi hêza Şêx Ubeydul-lah ve hêza Suwarên Turkumanîyên Mako û gelek hêzên tirîjî date bikomkirin û bi serdejî ve wê ji dewleta Osmanî date bidaxwazkirin, ku ew jî hêzekê bide binardin, da ku bi yarmetîya herdu layan ve berbestî lafaw û şepolên Mirîdan bête bigirtin.

Bi kurtî ve li duwayî beynekê de leşkerê Şêx ji sê layan tûşî hêrîşê bû û li dawîya şerekî xwînavîyî dirêj de Şêx Ubeydul-lah hate bineçarkirin, ku ew ligel dam û destgehê xwe de ji bona Şemdînan bête bivekişandin û wî xwe ji bona dewleta Osmanî date biberdestkirin.

---

kirin.

Wê ew xweser ji bona Istenbolê date binardin. Ew demekê li Istenbolê de hate bimayîn. Belam wî hêşta li remana xweyî pêşî de wazî nehêna bû û ew her û her ji xwe re li dû kêsekê de dihate bigerandin.

Bext jê re ev kêsa hane date bilidarxistin û wî xwe ji Istenbolê date birizgarîkirin. Di ser Qefqasya re ew ji bona Şemdînan ve hate bivezîvirandin. Belam ewende pê neçû, tanî ku dewleta Osmanî leşkerek bi ser wî de date binardin û her çilobû, wê ew neçarî bi berdestbûnê û sertewandinê ve di sala 1300 k.- 1883 z. de date bikirin. Li Paş de ew ji bona Hicazê çû û ew li bajarê Tayif de hate bimirin[331].

---

Ev şûreş û tevgerên hanê, yên ku em berî niha li ser wan de hatin biaxivtin, ligel şûreşên Can Polad (derîyê 5, benda 2), Mîr Xanê Biradostî û Teymor Paşayê Milî û Nevîyên wî (derîyê 6, benda 3) û liberrabûna Ibrahim Paşayê Milîyî duwayî bi rengekî giştî ve em dibêjin, ku ew hemû ji bona yek mebest û armancê bûn. Belam bi hîçyan ve serî negirt û bîcge li vê jî de wan zîyeneke zor ji bona mal û can dane bikirin.

Heger em tozeke baş di van şûreşan de, di pêla dirêjkirina wan de û di temirandina wan de ji xwe re bidin biremankirin, dê emê ji xwe re bibînin, ku hoyên bisernekitinên wan ji hoyên derve bêtir ew di hoyên navxweyî de têtin bidîtin.

Hêşta jî ew ji bona îşên bi vî rengî pê nehatine bigihiştin û li zîneta siyasîyî dor û pişta xwe de ewende ewnehatibûn biagehdarîkirin.

Bi rastî jî ve Canpolad Mîr Elî di demeke kêm de binaxeyê dewleteke gewredate bidamezirandin. Di gava ku ew ligel Serek Wezir Qopoçi Murad Paşayê bi nav û deng ve di şer de bû, di cara pêşî de ew tûşî leşkerekî gewreyî 40.ooo kes Kurd bû.

Eve jî bi hoyê şikenadin û linavçûna wî bû!

---

[331]Dr. Belec Şêrkoh dibêje, ku Şêx li bajarê Medînêyî Pîroz de mirî ye.

Institut kurde de Paris

Şikenadina Ebdul-Rehman Paşayê Baban jî li Derbendê Bazîyan de bi kêra Xalid Paşayê Birayê wî bû. yê ku ew ligel Walîyê Bexdadê de biyekbû û di gaveke zor tengav de beşî zorî leşkerê Ebdul-Rehamna paşa jê date bicihêkirin û ew ji bona nava orduwa Kolemene-Memalîk ve date bianîn. Ev rengê hanê bi hoyê şikenandin û malwêranîya Ebdul-Rehman Paş bû. Ev destana hanê sê carî di salên 1220, 1223, 1227 k.- 805, 1808, 1812 z. de û li zemanê Walîyên Bexdadê Eli Paşa, Laz Sulêman Paşa û Ebdul-lah Paşa de û dû caran jî li Derbendê Bazîyan de û carekê jî li dora Kufrî de hate birûdan.

Dazanîna serbixweyî Mohemed Paşayê Rewanduzê li nava van şûreşan de cihekî wêyî berz tête biderkevtin. Heger baş em lêwird bibin, dê emê bibînin, ku hoyên bi serneketina vê şûreşa hanê ev bûn:

A. Pirbûna sergermbûna wan û zorbûna piştgirêdana wan bi Ayînvanên nezan ve di warê siyasetê de bû
B. di peyman û hevgirtinê de ligel Mîrên Dirawsên xwe de bê bal bûn.
C. Berberî û kîndarîya di navbera Mîrên Baban, Badînan û Cezîrê de bû.

Bi rastî jî ve heger Mohemed Paşa ewende bi paye nebûwa û Mîrên Dirawsên wî jî dev ji kîndarî û berberîya xwe bidana biberdan û wan di nava xwe de hevkarî bidana bikirin. Bi serûştî ve vê dewletê bi dujwarî ve dê bikarîba zora wan bida bibirin û belkî hemû jî bihatana biserkevtin. Belam duberî û berberîya di nava wan de bi hoyê nema hemûyan ve hate biderkevtin.

Bi rastî jî ve cîgehê amojgarîyê ye, ku Ismaîl Paşayê Badînanî, yê ku wî li dujminatîya Mohemed Paşa de kêmanî ne dida bikirin, di gava ku leşkerê dewletê ligel Mohemed Paşa xerîk bû, wî bi dilşadî ve seyrî linavçûna Mohemed Paşa didate bikirin. Belam ewende pê neçû, ku ew leşker bi xwe ve bi ser wî ve hate bidakevtin û ew li Amêdîyê de date bigirtin û dest û pîyên wî dane bizincîrkirin û ew ji bona Bexdadê date binardin. Bi vî rengî ve mîrneşînîyên Soran û Badînan hatin bilinavçûn.

Institut kurde de Paris

Şûreşa Ehmed Paşayê Baban jî dîsan li ruwê kîndarî û berberîya Mehmud Paşayê Mamê wî û Ebdul-lah Paşayê Birayê wî de serî negirt. Li encamê vê kîndarîyê û berberîyê de mîrneşînîya Baban jî li nav de hate bibirin.

De em careke din xwe ji bona bisernekevtina şûreşa Bedirxan Beg bidin bizîfirandin.

Hoyên bisemeketina vê şûreşê jî dîsan her navxweyî û Kurd bûn. Bi rastî jî ve di wê gavê de, ya ku ev Mîrê hanê beramber bi leşkerê Osman Paşa ve li şer de bû, Ize El-Dîn Şêrê xizmê wî ligel Turkan de lihevhatibû û wî Cezîrê date bidagîrkirin.

Di encam de evaya bi hoyê şikandin û linavbirdina Mîr Bedirxan bû. Ev Ize El-Dîn Şêre jî li paş demekê de wî şûreşek lidarxist.
Belam ew bê sûd bû. Çunge ew leşkerê Turkî, yê ku wî ji bona nabûdkirina Bedirxan Beg pêre lihevhatin dabû bikiribûn, her ewan li dawîya çend şerekî jî de ev jî date bilinavbirin.
Dîsan bi kêra vê berberî û duberîyê bû, ku li nîvê pêşîyî sedsalê nozdehê zayînê de dewleta Osmanî bi hêza Kurd ve mîrneşînîya Bedlîsê date bitengavkirin. Mîrê dawîyî vê dewletê Şeref Beg bû. Wî demeke zor şer ligel Turk de date bikirin û wî her xebat ji bona parastina mîrneşînîya xwe didate bikirin. Belam bê sûd bû. Li dawîyê de di sala 1260 k.- 1849 z. de ew bi xwe û mîrneşînîya xwe ve bi destên Turk ve hatin bikevtin.

Ew jî bi vî rengî ve û bi yarmetîya Kurd ve hate bilinavçûn.

Bi kurtî ve ev hemû tevgerên teka teka ji bona serxwebûnê yeke yeke sitewr hatin bimayîn. Hoyên bingehî jî bi xwe ve her û her dîsan kîndarî û berberî bûn.!

Bi xwe jî ve Merovekî bê layî û bê biserkesî ve nala Mêcer Son di vî barî de gazinan dide bikirin û ew dibêje: "Kurd her serkêş, nebez, serfiraz û dûr lisertewandinê bû. Bes û bi tenha ve ew bi şer û cengên navxweyî hatîye bişikenandin. Bi say vê jî ve desthilatîya vegirtvanên wî hatîye bibêtirkirin" (Cîhangerîyek bi dîzîbûn ve li Mozopêtamya û Kurdistanê de, r. 55).

Institut kurde de Paris

Bi rastî ve mêjû bi awêneyeke amojgarîyê ve tête biderkevtin. Merov û Milet divên her û her jê kar bidin biwergrtin û li hoyên bi sernekevtina hin kar û baran û rabûnan de baş û bi wirdî ve lê bidin bitemaşekirin, da ku ew careke din tûşî wê encamê û wê şikestînê bi xwe ve neyêtin bikevtin. Li ser ve me date bigotin, ku hoyên herî bingehîyî bi serneketina şûreş û tevgerên Kurd ve di pênegihştinê de têtin bidîtin. Donê weha bû û îro jî weha ye.

Ji bona pêkanîna serpereştîyeke serbixwe -bi taybetî ve di vê pêlê de- li pêş hemû de du şit zor bi pêwistî ve têtin biderkevt: Zanistî û himjî Dewlemendî.

Her Miletek li van herdu xiznan de bi bê pişk û par ve bête biderkevtin, serxwebûn bi bin çengên wî ve nayête bikevtin û her karekî ew ji bona wê bide bidan, ew ber bi ba ve tête biderkevtin û zîyana mal û can ji bona wî tête bipeydakirin.

Dibe, ku siyaseta giştî alîkarîya wî bide bikirin, da ku ew bi mebesta xwe ve bête bigihaştin, lêbelê ew ji armanca xwe başîyê nade bidîtin û ew wê nikare bide bihîmkirin. Ew bi rengekî tir ve tête biberdestkirin. Ji bona bicihkirina rastîya vê rêzana hanê nemûne li ser de bi zor ve têtin biderkevtin.

## Sûd Li Kurd De Wergirtin Û Bikaranîna Wan

Ji kevnar û tanî îro jî Miletê Kurd li kar û yarmetîya Serdarên baş û bi bext ve bi xwe ve wî tu kêmasî nedane bikirin.

Her Miletekî Serdar, ku wî guh bi mafeyê wî ve dabe bidan û bi dadwerî û mirovanî ve ligel wî de bi berpêş ve hatibe biderkevtin, her û her wî xêrî jê dayite bidîtin û wî ji karîn û mêrxasîya wîyî cengînî sûd zorî ji xwe re dayie biwergirtin.

Institut kurde de Paris

Her Miletekî Serdar, ku wî dayite bixwestin, ku ew zordarîyê lê bide bikirin û destdirêjîyê ji bona mafeyên wî û rûmeta wî bide bikirin, bibêvajî wî zîyaneke zorî jê dayite bdîtin.

Serdarên Payedarên Aşûrî, yên ku ew her û her mêldarên serdarkirinê ji bona ser wan bûn, di destpêkirina pêkanîna dewleta wan de tanî nema wê jî her û her ew ligel Kurd de xerîk şerbûn. Wan her û her bi wan û xwe jî ve zîyan dane bikirin.

Di şer û cengên di navbera dewleta Pars (Eşkanî), Sasanî û dewleta Rom de piranîya caran qada cengê Kurdistan bû û û perçê bikarî van şeran jî bi xwe jî ve her Kurd bû û ew ligel sipahê Îranê de bû.

Tanî destpêka musulmantîyê jî derbarê dewleta Îranî de her û her wan dilsozî û dostanîya xwe dane bicihanîn û leşkerê Musulman zor dane berbadkirin.

Miletê Kurd di pêkanîna Xilafeta Ebasî de karekî wîyî zor dihate bidîtin û ew di leşkerê Eba Muslim[332] de bi perçeyekî kirdar û bi kêr ve dihate biderkevtin.

Walîyê Kurdistan û Ezirbêcan Ebu Cafer El-Mensor hêrîşa sipahê Romê bi yarmetîya Eşîrên Kurd ve bi ber û paş ve date bivekişandin.

Melekşahê Silcoqî jî ji bona sertewandina Qaûrt û Sultan Modud ji bona vekirina Musilê, herwehajî Sultan Mohemed Kurê Melekşah jî ji bona zeftkirina Surî jî sûdwergirtineke zor wan li hêza Kurd de dane bigirtin.

Bi kurtî ve Kurd û Kurdistanê ji bona Xilafeta musulmantîyê zor kar û gorî dane bipêşkeşkirin. Yê ku wî ji bona sitendina mafe û desthilatîya Xelîfê Bexdê ji Malbata Eyubî daye bixebatkirin, ew bi xwe ve Baz Ebu Şucayê Kurd bû.

[332]Dr. Belec Şêrkoh dibêje, ku Eba Musulim bi xwe jî Kurd bû. Xweşxuwanên Ebu Delame, yê ku ew Xweşxuwanê Cafer El-Mensur bû, pîşta vê bawerîyê didin girtin.

Institut kurde de Paris

Lafawên Turkên Xeznevî, yên ku wan ruwê xwe ber bi welatên Islamê de dabûn bivekirin, li Kurdistanê û bi hinera Eşîrên Kurd û şarezaya Serdarên Merwanî ve hatin bierbestkirin.

Eşîra Hemêdî li ruwê karê xwe de ji bona Xelîfe Musterşidê Ebasî de tûşî hêrîşa Imad El-Dîn Zengî bû.

Hevalbendîtî, dostanîya Kurdistan û yarmetîya bi nerxî Kurd ve ji bona biserketina Sultan Selim li Çildêran de cîgehekî wêyî bilndî tête bidîtin.

Nevîyên Şah Ismaîlê Sefewî ji hêza Kurd zor zor ji xwe re sûd dane biwergirtin û Eşîrên Mukri her û her ew bi hîmê bingehîyî sipahê Îranî ve dihatin biderkevtin.

Li dawîya veçakkirinên Şah Ebas de li sala 1034 k. - 1624 z. de piranîya hêzên sipahê Îranî ji Kurd dihatin biderkevtinb û bi taybetî jî ve ji Kurdên Mukriyan dihatin biderkevtin.

Walîyên Osmanî beramber bi sipahê Îranî ve her û her li hêza Kurdê Turkî de ji xwe re sûd dane biwergirtin û herwehajî wan ji bona linavbirdina mîrneşînîyên Kurd jî ev hêza hanê ji xwe re dane bikaranîn.

Liberrabûnên Jêrî Îraqê li zemanî Osmanî de, bi taybetî ve li zemanî Walîyên Kolemen-Memalik de dîsan û bi pirî jî ve bi hêza Kurd ve dane biserkutkirin.

Kurtîya mêjûwê û bi teybetî ve di mêjûwa Îran û Osmanî de bi kar û gorîyên Kurd ve têtе bipirkirin.

Her Miletekî ku wî rê û rêzanên bi karanîn vî çekê tûj û bi hêz ve bidin bizanîn, wan xêr lê dane bidîtin, yên ku ew di vî barê hanê de nezan bûn, her û her ew tûşî şer û zîyanan hatine bikirin.

Dewleta Rus înca li şerê 1219, 1220 k.- 1804, 1805 z. de ligel Miletê Kurd de darrû sitendike bi pêgîrî ve date bikirin.

Institut kurde de Paris

Du şerê duwayî 1244, 1294-1295 k.- 1828, 1877-1878 z. de yên Rusî û Osmanî xwe tanî Kurdistana navînî datin bifirehkirin û Miletê Kurd jî bi wan şeran ve tûşî zîyanên zor bûn. Dewleta Rus zor bi hûrbûn ve li zînetên Kurd date bivenerandin û li dawîya vê jî de ku ew baş şarezayî karîna wanî cengînî bû, wê xwestî, ku ew ji wan ji xwe re sûd bide biwergirtin. Bi vê remanê jî ve wê di sala 1245- 1829 z. de Alayekî ji Kurd date bipêkanîn û wê Kurd ji bona çûna welatên Rusî dane bidilbijandîkirin. Bi rastî jî ve van dilbijandinên hanê kêra xwe dane bikirin û hin ji Eşîrên Kurd ruwê xwe ber bi welatê Qefqasya ve dane bivekirin.

Dewleta Rusî li dawîya şerê Kirim -Qirim de di sala (1269-1275 k.- 1853-1858 (1956 Cuma) z. de du Alayên tirjî ji Kurd date bipêkanîn.

Dewleta Osmanî tanî dawîya sedsalê nozdehemînî zayînê de bi tenha ve li hêzên Nerêxistîyên Eşîrên Kurd de ji xwe re sûd didate biwerdigirtin. Li gora wî zemanî de bi rengekîtir ve sûd ji Kurd wergirtin ne dikarîbû bihata bikirin.

Belam li dawîya vêna de, ku rêxistin û şêweyên şerkirinê di nava dewletan de hate biveguhertin, li ser şûna kevnar de rûştin bê sûd bû; jiber vê jî dewleta Osmanî date bixwestin, ku ew jî hawayê dewleta Rusya bide bikirin û ew hin ji pêkanînên Serbazîyê li nava Eşîrên Kurdan de bide bidurustkirin. Vê remana hanê li dawîya şerê sala 1294-1295 k.- 1877-1878 z. de bêtir hiner ji xwe re date bisitendin, çunge, dewlet zor bê hêz hatibû biketin, li nava Kurdistanê de asayî û girêdan û berdan jî pê nema dihate biparastin. Li gora Peymana Berlinê Benda 61 de divabû wê ji bona Parastina Ermenîyan beramber bi Kurd û Çerkesan ve di seranser welêt de veguhertinên bingehî û navxweyî bide bikirin.
Weha dewleta Osmanî ev rengê hanê bi kara qazancên Ermenî ve didate bidîtin û wê ew ji bona ayinda xwe bi başî ve nedida bizanîn.

Bi vê bawermendîya hanê ve wê ji bona bicihanîna vê benda hanê xwe jê dida biparastin û wê bi soz û mehnan ve dem ji xwe re pê dida bibuhurandin.

Institut kurde de Paris

Vê tefirandina dewletê di encam de ser li nû de Miletê Ermenî ber bi şûreşê ve date bikişandin. Liqên Komela Ermenî li Rusya, Siwêsra û London de hatin bifirehkirin û ew bi xame û çek ve bi kar û jêhatbûnan ve hatin bikevtin. Vê zîneta hanê hajbûn û aşîtî di nava Ermenî û Kurdan de date bitêkdan û Ermenîyên welatên Kurd ji bona parastina mal û canên xwe ew ji biona nik Gewreyên xwedanên desthilatên Kurd hatin penabûn.

Di dawî de dewleta Osmanî li sala 1302 k.-1885 z. de û li destpêkirina Seletneta Sultan Ebdul-Hemîdê duwem de bi remana duruskirdina rengekî jve i Serbazan ji Kurd nala Kozakên Moskovî û bi cîgîrkirina desthilatîya xwe ve di nava Kurdistanê de û nêzîkxistina Eşîran bi dewletê ve wê hinek ji Alayên Eşîran date bipêkanîn û ew bi navê Sultan Hemêdî Siwari Alayleri ve date binavkirin. Karmendê ji bona bicihanîna van pêkanînan Kurd bû û ew Şakir Paşa bû[333].

Hîç gûman têde niye, heger tirs û lerza dewletê ji bona bicihanîna veguhertinan nebûya, dê wê bi van pêkanînên hanê ve weha zû dest pê neda bikirin. Kar ji bona vê Serbazîyê bêtir serpereştî bû, çunge, li saya vêna de hevalbedîtîya Eşîran ji bona dewletê hate biserkişandin. Heger ev pêkanînên hanê li ser bingehekî bi hêz û zanistî de bihata bikirin, serûştî bû, ku dê kara wê ji bona dewletê bihata bibêtirkirin.

Lê dewleta Osmanî ew giringbûn, ya ku dewleta Rusî bi pêkanînên kokazî ve dabû bidan û ew canê Serbazî û rêk û pêkxistina di nava Alayên kokaz de hebûn, ew li van pêkaninên Kurd de nebûn û ew tanî dawîya xwe weha hatin bimayîn. Ne ji bona li karxistin û çekkirina wan û ne jî ji bona hînkirin û perwerdekirina wan hîç karekî bi nerx ve nehate bikirin, tanî ku dewleta Osmanî bikarîba, yê ku Rus li pêkanînên kokaz de hêvî dida bikirin, wê jî li van pêkanînan de bida bihêvîkirin.

[333]Ew Muşîr Şakir Paşa ye, yê ku ew li duwayî de peyda bû û ew bi Serokê Encûmena Veçakkirinên Enedolê bû.

Institut kurde de Paris

Serekê Eşîrên Milî Ibrahim Paşayê Nevîyê Tîymor Paşa bi xwe ve û bi hemû Eşîrên xwe ve ji bona nava pêkanînên Hemêdî hatin bikevtin.

Ev pêkanînên hanê tevî li bê dilîya dewletên dirawse jî de û bi taybetî ve dewleta Rusya her cilo bûn, wan tanî pêla Dazanîna Destûra Osmanî li ser vê rewşê datin bidirêjkirin û wan di nava Kurdistanê de ji bona parastina desthilatîya dewletê û parastina asayiş û aramîyê jî gelekî bi kelk ve dihatin biderkevtin û herwehajî ji bona parastina mafe û desthilatîyên Serokên Kurdan jî destekî wanî bi hiner û kêr ve dihate biderkevtin.

Weku ku me li ser de daye biraxistin, ji bona çakkirinên pêkanîyên Hemêdî hîç pare û kar nehatin bixerckirin; jiber vê jî bi bêvajîya zorbûna wan jî ve -weku ku li bîra min de maye, ew li şêst Alayî de bêtir bûn- hêjabûneke wanî cengînî nebû. Li derbarê çekdarî û likarxistina wan de ji bona dewletê cihê şermezarîyê bû.

Li paş Dazanîna Destûra Osmanî de navê van Alayan bi navê Xefif Suwari Alayelri ve hate biveguhertin û hin ji van Alayan jî hatin bihilanin. Ew tanî Cenga Gîştî bi navê Xefif Siwari Alayelri ve hatin bimayîn û li paş vêketina cengê de ev Şêweyê Serbazîyê bi Çar Firqe û Liwayekê ve yaxud 135 Bilokê Suwar bû. Di sala yekem de ji cengê ew bi carekê ve hatin bihilanîn.

## Pêwendîyên Kurd Ligel Ermenîyan De

Ev pêwendîyên hanê bi xwe ve di rewşa xwe de xerab nebû. Di pêşî de û di dawî de van Hevwelatîyan ligel yek de bi başî ve didatin birabuhurandin û heger handana Karmend û Karbidestên dewletê bidana biwazanînîn, ev têkelî û aşîtî her û her dê bihata bimayîn.

Belam çunge Miletê Serdar herdu bi Bêgane ve didate bidanîn, wî xwest, ku ew dujminayetîyê di nava wan de bide bivêxistin û wan bi gij yektir ve bide biberdan, tanî ku herdu la bi bê hêz ve bêtin biderkevtin û ew ji tirsa hev nema bikaribin xwe bidin bilivandin, da ku ew bi kêfa xwe ve li ser wan de bêtin bizalkirin.

Institut kurde de Paris

Ev siyaseta hanê bi rastî jî ve di dîtina dewletê de lihevhatî bû. Di encamê vê zînet û siyaseta hanê de di navbera van herdu Miletan de nexweşî, şer û ceng hatin bipeydabûn.

Di havîna sala 1312 k.- 1894 z. de li welatê Samsonê de gelek şer di navbera Kurd û Ermenî de hatin birûdan û wî li herdu aliyan de zîyanên zor hatin bikevtin û çend gund jî hatin biwêrankirin. Ev rûdana hanê ji bona rûdanên tir bi pêşekî ve dihate biderkevtin.

Li van hemû rûdanan de ji bal Kurd karên zor jêhatî dihati bikirin. Li sala 1313 k.- 1895 z. de bi xwe jî ve wî şer û ceng li Hekarê jî de date bidestpêkirin, belam ev tevgera hanê vê carê ew beramber bi dewletê ve û ew bi mebesteketir ve dihate biderkevtin.

Li dawî de ev dujminatîya hanê di navbera Kurd û Ermenîyan de bi zîneteke rawestyayî ve hate bigihaştin û vê zîneta hanê tanî pêşîya Şerê Gewre date bidirêjkirin.

Institut kurde de Paris

## 4. Kurd Di Sedsalên Bîstan De

### Ibrahim Paşayê Milî

Di destpêka sedsalên bîstan de li sala 1326 k.- 1908 z. de û li pêş Şerê Gewre de yekek li rûdanên Kurdistanê de bi rabûna Serekê Eşîra Milî Ibrahim Paşayê Kurê Mehmud Begê Tîmawî ve tête biderkevtin[334].

Ibrahim Paşa li dawîya ku ew bi Serokê Milî bû, ew li ser xwe rûnenişt û wî dest bi xerabkirinê ve date bikirin. Wî karwan dane

[334] Ev ji Peyva Kurdîyî Temo hatîye, ya ku Kurd ji Peyva Turkîyî Tîmor re dibêjin. (M. E.).

birûtkirin û li hemû layekî de Xerabkar lê hatin bikombûn û wî rêya Diyarbekir û Mêrdînê date bibirîn. Serûştî bû, ku dewletê leşkerek ji bona ser wî date binardin û ew date bigirtin û ji bona Sîwasê ew date bisorgonkirin.

Belam li paş demekê de wî date birakirin û pir bi dujwarî wî ve xwe ji bona Wêranşehrê date bigihandin.

Ewende pir neçû, ku Pêkanînên Hemêdî di nava Eşîrên Kurdan hatin bipêkhatin û Ibrahim Paşa jî ji bona nava van pêkanînan hate bikevtin û pê Nîşana Mîr Mîranî hate bidan.

Bere bere desthilatîya wî bêtir bû û ew bi ser hemû Eşîrên Erebîyî wan navan ve zal bû û wî li sala 1322 k.- 1904 z. de Eşîra Qerekçîli jî date bişikandin û ew bi jêrdesthilatîya xwe ve date bixistin. Wî desthilatîyeke bê qam ji xwe re date bipeydakirin. Navînîya wîyî kokî Wêranşeher bû û wî hemû herema di navbera Mêrdînê, Orfê û Qerece Dax de bi berdestên xwe ve bi carekê ve date bixistin.

Li dawîya Dazanîna Destûra Osmanî de wî li ber dewletê serêxwe date bihildan. Dewletê leşkerekî zorî bi ser ve date bikişandin û li dawî de li çiyayê Ebdul-Ezîzê de pir date bitengavkirin û ew date bigirtin û ew li wêderê de date binabûdkirin.

Rûdana duwem jî vegirtina welatê Mukri ji bal dewleta Osmanî de têtê biderkevtin. Ev beşê sînorê hanê di navbera herdu dewletan de nehatibû bisaxkirin.

Dewleta Osmanî li dawîya şerê Rus-Japon de (di sala 1905 Cuma) li hêlakî û bêhêzîya dewleta Rus de ji xwe re kês date biwergirtin. Wê di bin Rêberîya Mohemed Paşayê Daxistanî de hin ji hêzên sipahên xwe ji bona wan welatan date binardin û bi yarmetîya Eşîrên Kurdên wan navan de wê welatê Ormiyê, Şino û Sablaxê date bidagîrkirin. Ev pêrabûna hanê bi hoyê hin dujwarîyên siyasî bû û vê zîneta hanê tanî dawîya şerê Belkanê date bidirêjkirin. Dewleta Rusî jî bi nêta tirsfirandinê ve wê jî hin ji hêzên xwe date birêkirin û wan herema Xoy û Ormiyê datin bivegirtin û dewleta Osmanî date bineçarkirin, ku ew welatê Mukri bide biçolkirin.

Institut kurde de Paris

Di dawîya gift û goyên siyasîyî dirêj de Encûmenek tevlihev ji Ingilîz, Rus, Turk û Îran de hate bipêkhatin û bi yarmetîya vê Encûmena hanê ve di sala 1331 k.- 1913 z. de dest bi nîşankirina sînorê Osmanî û Îranê ve hate bikirin. Bi taybetî ve bi nîşankirina wan beşan hate bidestpêkirin, yên ku ew di nava wan de hoyên şer û cengê bûn. Li pêş bicihanîna vî îşê hanê de Şerê Gewre date bidestpêkirin.

Li pêş vêketina Cenga Cîhanî Yekem de beşekî ji Serbazên Kurd qola orduwê dehem ji bona Istenbolê hate binardin û wî beşdarî di şerê Balkan de date bikirin.

Serhildana Bedlîsê

Li pêş Şerê Gewre de bi salikê ve li welatê Bedlîsê de û li jêr Rêberîya Mele Selim de, Mele Şehab El-Dîn û Mele Elî de tevgereke şûreşîyî tir date birûdan û wê tanî nava bajarê Bedlîsê jî date bikêrkirin.

Belam hêza Turk zû pêgihişt û ev serhildana hanê date bitemirandin. Kirdarî vê tevgera hanê Mele Selim xwe ji bona Konsolxana Rusî date biavêtin û ew tanî vêxistina cengê li wêderê de hate bimayîn û li dawîya vêketina cengê de bi zor ve Turk ew ji wêderê dane biderxistin û ew date bikuştin.

Institut kurde de Paris

## Şerê Gewre 1332-1336 k.- 1914-1918 z.

Pirîskên agirê vî Şerê Gewreyî hanê mîna şerên pêşû di navbera dewleta Osmanî û Rusî de zû û li hemû şerên pêşîyî tir de bi tundtir ve ji bona ser welatên Kurdistanê hate biperandin. Şer û zîyana vê Pêsta Siyasî û Civakî ji bona Miletê Kurd çend şaxbûn.

### 1. Zîyanên Bidagirtina Giştî

Kurd weku Miletên tirî Osmanî belkî bêtir li wan jî de di vî Şerê Gewre de tûşî ziyan bû. Yekem herçî Xort û bi kêrdihat ve bi darê zorî ve ew ji bona hilgirtina çek hatin binardin.

Zor mal hebûn, ku ew ji bil Afret, Mendal, Pîre Mêrd kesî din têde nemabû, yên ku tozekê rewş û zîneta wan başbûn, bi navê Xwekirînê, bêş û xercên cengê, destekên biveguhestinê, yarmetî, bertîl ... hd. ve ew hatin birûtkirin.

Ew Xortên, yên ku ew ji bona jêr çek hatibûn binardin, piranîya wan ji bona berê Erzeromê û beşek jî ji wan ji bona Alîyên Heleb, Şam û Busra hatibûn birêkirin. Bi vî rengî ve beşê zorî kargirî ji destê Kurd çhate bideçûn.

Institut kurde de Paris

2. Zîyanên Şer

Miletê Kurd di vî Şerî de du leşker leşkerê 11 li Mamur El-Ezîz û leşkerê 12 Baregehê wî li Musilê de û 135 Bilok Suwarên Hilanînê (Çar Firqe û Liwayek) ligel hin pêkanînên sersînor û Candermerî bi carekê ve û beşekî giringî du qolê leşkerê tir jî (Leşkerê 9 Erzeromê. Leşkerê 10 Sîwasê) jî date bicihanîn.

Bi serûştî jî ve wî beşekî bil, berk, xwarin û vexwrin û hemû welax ligel pêwistîyên wan jî de dane bimisogerkirin û bi hoyê dirêjbûna kişandina şer ve wî çend caran jî bi can û malên xwe ve kêmanîyên şer dane bihilanîn.

Biçge li vê jî de di gava tengavîyê de li ser daxwaza Komandarê orduwa Îraqê de Kurd gelek gorî date bipêşkeşkirin û ew ligel Şêx Mehmud û Serokên Eşîr û Wênerên wan de ji bona şerê Şeîbe hatin biçûyîn û wan beramber bi vî karê hanê ve zor ezyet û zîyan datin bidîtin.

Kurd li Zarwên xweyî, yên ku ew ji bona şer hatibûn binardin, kêm ji wan bi destên wî ve hatin bikevtin.

Beşê zor zorî wan li şer de, li dîlbûnê de, li birçîbûnê û serma de û bi nexweşîyan ji destçûn. Serjimara zîyanên wî kes nizane. Belam heger bi texmînê ve bihêle bête bikirin, renge, ku jimara vanan li sêsed hezar kes bêtir de bêtin biderkevtin[335].

3. Zîyanên Ji Hêzên Cengînî Bi Xwe Ve

Dewleta Osmanî di destpêka Şerê Gewre de dîlê evsanên xwe bû. Wê weha dizanî, ku dê ev cenga hanê jê re kêsekê bide bidan, da ku ew Îranê, Toran û Hindistanê ji xwe re bide bivegirtin.

Bi vê xewin û evsanê ve li layekî de bi orduwê xweyî rêxistî ve beramber bi orduwê Rusî ve li Qefqasya de hate bişerkevtin, li layekîtirîjî de li jêr Komandarîya hin ji Evser û Wênerên xwe de hin hêzên Rêwîtî date bipêkanîn, yên ku ew ji pêkanîn sînor yanjî ji Xwendevanên Zanîngehên Bilind mîna Xwendevanên Advokatîyê û ji Eşîran date bilikarxistin û ew ji bona ser Îranê datin binardin.

Hêza Rêwîtîyî Omer Nacî, Reûf, Ibrahim û Xalid Beg bû. Li van hêzên Rêwîtîyî yekem û duwem de li Hewremanê û tanî Tevrîzê herdu layê sînor û bi taybetî ve welatê Mukri û Banê wan bi rastî ve dane bitalan û biwêrankirin û zor kes jî ji wan dane bikuştin.

Hisên Xanê Serdarê Mukri, yê ku ew Dawîvanê Şûngirê Xanedanê Binemala Babanê Mîrê Mukrî bû, ligel Heme Xanê Serdarê Banê de li layê hêza Rêwîtîyî Imrahim Beg de hatin bitalankirin û bidarvekirin.

Herdu hêzên mayî jî navbera Xaneqîn, Kerend, herema Rewanduz û Lacan jî tûşî zîyanên zorkirin. Belam hovîtî û dirîtîya hêzên Omer Nacî û Ibrahîmê Bedlîsî bi rastî jî ve nayêtin bipesinkirin.

Bicge li vanan jî de du hêzên Rêwîtîyî tirjî li welatên Bedlîsê û Wanê de ruwê xwe ber bi Îranê de dane bivekirin û wan li dora sînor de û li herema Dîlman de hin şerên bê sûd dane bikirin û ew li dawî de

[335]Li gora texmînê zîyana sipahê Turkî de di cenga Cîhanî Yekem de 10% ji tevaya Xelkê bû. (Ji xwe re li Herb Omomîde Osmalî Cebhelerî Weqayeî, Istenbol 1337 de bide temaşekirin). Jiber Serjimara Kurd di wê demê de li Turkî de Sê melyon dihate bibiderkevtin, divê zîyana wan bi Sêsed hezar bête jimartin.

Institut Kurde de Paris

li ser tengavkirina sipahê Rusî de ji bona Kurdistê hatin bivekişandin û zîyaneke zor wan ji bona Kurdên wan navan dane bikirin.

4. Zîyanên Ji Barkirinê Û Vegurandinê

Di destpêka şer de Çekdarên Milîyî Ermenî li pêş orduwa Rusî de li layê Bayezîdê, Alşukurd û Wanê de zîyanên zorî li mal û canên Kurd de dane bixistin. Bicge livêjî de Turk jî bi pir rengên mahnan ve li kuştina Kurd de tu kêmanî neda bikirin. Hinekan li Serokên hêza Rêwîtîya yekem de weku Xelîl Beg bi hemû payebûn ve bi van tawankarîyan ve dihatê bipêrûniştin.

Li gora Nameya (Pirsiyarîya Kurdistanê beramber bi Turk ve, rûpel 33) de li destpêka Şerê Gewre de û bi dîtina Serpereştîya Tomarkirina Giştîyî Barkirvanan li Turkîyê de heft sed hezar Kurd hatin bihilgirtin û ew ji bona welatên Rojavayî Enedolê hatin bibirin û piranîya wan li rê de li hêlakîtîyê, birçîtîyê û nexweşîyê de hatin bimirin.

Bicge livêjî de orduwa duwem, ya ku li sala sêyemî cengê de li Diyarbekir de ew hatibû bidagîrkirin, di payîza sala 1917 de ji bona xatirê vê, ku ew xwarin û vexwarina xwe bide bimisogerkirin û Xorak Xwerên ne Serbazan li wan navan de nehêlin, wê hemû Xelkên welatê Diyarbekir, Muş û Bedlîsê dane biderkirin.

Hinek ji van Belengazan ruwê wan ber bi Musilê ve dane bivedan û hinên din ji wan ber bi Edena û Helebê ve hatin biajotin.

Di dema zivistanê de zorî ji wan ji birçîbûna û serma hatin bimirin. Bi xwe jî ve ji vê birçîbûnê û sermayê hîç Mendal jî jê nehatin biderneçûn.

Ew bi rewşeke weha ve hatibûn bigihaştin, ku wan li kolanên Musilê de laşên Mirîyên xwe didatin bixwarin.

Bi kurtî ve ew derdên, yên ku ew di sala yekem û duwemî cengê de bi serê Ermeniyan ve hat bikirin, li dawîya salekê yanjî du salan de bi ser Kurdê perîşan jî ve ew hate bikirin..

### 5. Zîyanên Birçîtîyê Û Nexweşîyê

Etwanim bilêm, ku destana birçîbûnê kêreke wêyî herî gewre li Kurdistanê de hebû û ji derya Reş ve tanî Îraqê hemû welatên Rojhilatî Osmanî li jêr barê vê bela hanê de dihatin bidîtin.

Leşkerê Osmanî, çunge, destekên biveguhestinên wî zor kêmbûn û pêkhatinên wînayî xwarin, vexwarin û bi cihkirina wîna pirî xerabbûn, dixwest, ku ew destekên xwarin û vexwarina xwe di cihê xwe de bi buhayekî zor kêm ve yanjî beramber bi belge û perên kaz ve, yanjî bi darê zorê ve bidin bizetfkirin û bipeydakirin.

Serûştî bû, ku bi vî karê hanê ve sitemkarîyeke zor ne di cihê xwe de li Xelkê de dihate bikirin û Xelkê xwe ji bajarok û bajaran didane bidûrxistin û kesîkî nema Xurakî ji bona wan dida bianîn. Jibervêjî sipah jî weku Xelkên bajarok û bajaran jî tûşî birçîbûnê bûn.

Sipah bi pileyekî wehayî virçîbûnê ve hate bigihaştin, ku Serbaz hin caran neçar dibûn, ku ew giyê bixun û ew weku Ceneweran bi bin guhên hevkevin û ji bona parîkî nan ew hevdû li ser de bidin bikuştin. (Ji xwe re li Raportê Qolê Orduwa Heştdehemîn de bi mêjûwa 25. avdara sala 1334 k. de bide bitemaşekirin).

Li ruwê birçîbûnê, bazdanê û zîyanên du mehan de ev qola hanê bi 9000 kes ve dihate bigihaştin. (Raport bi xwe). Hêza cengînîyî orduwa Seşemîn jî li avadara sala 1334 k. de bi 6304 Tifingdar ve hate bigihaştin. (Rojnama Cengê ya Orduwa Şeşem).

Rewşa orduwa duwemî (Diyarbekir) û orduwa sêyem pir xerab bû. Serûştî bû, ku ew rewşa hanê bi hoyê zor nexweşî û pîsbûnê bû. Tîfos orduwa sêyem bi carekê ve date bişerpezekirin û ew jî li orduwa duwem û şeşem jî de dihate bidîtin û wê zîyaneke pir zor li herdu orduwan de date bixistin.

Perîşanî û şerpezetîya Xelkê bi serûştî ve ji ya orduwê bêtir bû, yên ku wan zivistana sala 1335/ 36 k. li Musilê de didane

birabuhurandin, wan bi xwe ve didatin bidîtinin yanjî didatin bibihîstin, ku Derketîyên Kurd li kolanan de ji serma û ji birçîbûnan çilo dihatin bimirin. Ev destana hanê bi taybetîyî Musilê ve nebû, herwehajî ew li welatê Edenê û Helêbê jî lidarbû.

Li şarê Sulêmanyê de di wê salê de bi xwe jî ve birçîtî bi pileyekî dawî ve hate bigihaştin. Huqeya ard bi lîreyekî zêr ve hate bigihaştin. Karmendên ser azoqe û malan zordarîyeke pir zor didatin bikirin[336]. Wan li orduwê de bi serpereştîya xweyî pirî ne baş û bi karên xweyî pirî xerab ve rêya hatina azoqe jêre ji gundan dane bibirîn. Li dawî de wan azoqa nava malan dane bizetfkirin.

Xelkên sitembar hîç bi destên wan ve tu azoqe neman. Li dawî de ji sedî heftê ji Xelkê ji birçîbûnan hatin bimirin.

Institut kurde de Paris

6. Zîyanên Wêrankirinên Cengê

Sînor û mezinbûna wêranîyê her Xwedê dizane. Ev zîyana hanê du renge:

Yekek ji bal dujmin hatîye bikirin. Evaya bi xwejî ve wan welatan ber bi xwe ve dide bigirtin, yên ku ew tûşî vegirtinê bûn, weku welatê Erzeromê, Erzencan, Wan, Bedlîs û beşekî ji welatê Musilê Rewanduz têtin biderkevtin. Dujmin li nava van welatan de bi serûştî ve wêrankirinên zor dane bikirin û bi taybetî ve Çetên Ermenî û hinên din jî gelek cîgeh bi remana tolwergirtinê ve dane biwêrankirin û bisûtandin.

Rengê duwem ji wêrankirinan ew ji bal sipahê Osmanî bûye. Beşekî ji van wêrankirinan li ser divayê û pêwistîyê de dihate bikirin. Belam beşekî jî li ser kêfê de dihate bikirin.

[336] Ew Sipartvanên Azoqebûn. Wan bi dizî sitendinên bi zor ji Xelkê ji bona Bazirganan didan firotin. Bi vî rengî bidestbikevtinên pir mezin bi destên wan li ser kîsên Sitembaran ji Hejar û Rebenên Xelkê û sipah hatin bikevtin.

Bi kurtî ve ve ew kesên ku di dema cengê de yanjî li duwayî wê de li wan deveran de hatibin bigerandin, pileyê vê wêrankirinê bi baştir ve ew dikarin bidin binerxkin. Li layê min de weha ye, ku ev welatên hanê tanî bîst salên dinjî bi ser doxê caran ve nayên bivegerandin.

Bi kurtî ve Miletê Kurd li Şerê Gewre de tuşî zîyanên mal u canên bê sînor bûn. Zîyanên madî li berî vê de li jor de hatin biraxistin; zor dibe, ku zîyanên canî nêzîka nîv melyon kes bêtin biderkevtin.

## Serpereştîyeke Cîhî li Sulêmanîyê de

Institut kurde de Paris

Li dawîya Cenga Cîhanîyî Yekem de li koşeke Kurdistana Jêrî de, ango li Sulêmanîyê de bi alîkarîya dewleta Ingilîz de Serpereştîyeke Cîhî hate bidamezirandin.

Belam ji dêlva baş serpereştîya wê bihata bikirin. Du carî ew ligel dewleta Ingilîz de hate bitêkûpêkçûn û ligel wê de bi şer ve hate bikevtin.

Di dawî de di sala 1345 k.- 1926 z. de bi carekê ve ev Serpereştîya Cîhî ji navê ew hate bihilanîn û ew bi rengê Liwayekê ve bi Îraqê ve hate bigirêdan. (Ji bona dûr û dirêjîyê li ser vê pirsê de ji xwe re li Mêjûwa Welatê Sulêmanîyî de bidin bitemaşekirin).

## Serhildana Ismaîl Axayê Simko

Di sala 1341 k.- 1922 z. de serhildana Ismaîl Axayê Simko Serekê Eşîra Şikaka date bidestpêkirin. Di pêşî de wî li Aşûrîyan de zor date bitengavîkirin[337] û li dawî de wî welatê Ormîyê date bidagîrkirin. Li paş de Îran leşkerekî zorî ji bona ser wî date birûkirin û wê ew date biderperandin û di encam de Simko ji bona Îraqê hate bibezandin û ew li Jorî Rewanduzê de hate bidanîştin.

[337]Ew Kurdên Fileyên ji Rêça Keşeyê Nesterosin. Ew jiber hoyên siyasi de vedibêjin, ku ew ji alîyê Tuxum û Xwînê de ne Kurdin, lêbelê ew ji Mayînên Nevîyên Aşûrî di Wilayeta Musilê de ne. Weha bi vî Rengî ew di Rojnamên Erebî û Ewropî de bi Navê Aşûrîyan bi nav û deng bûn. Tu zimanekî wanî Gelêrî ji bil zimanê Kurdî pêve niye.

Şûreşa Kurdên Dêrsimê

Yekek li serhildanên tirî di wayî Şerê Gewre de şûreşa Kurdên Dêrsimê bû, ku di bin fermandarîya Nur El-Dîn Paşa de bi leşkerekî gewre bi ser ve hate bidakevtin û wî ew date biserkutkirin û zîyanên wê pir gewre bûn

Li dawîya Şerê Gewre de û li paş vê de, ku nîşanên bêhêzbûna Hevalbendên Elmanya hatin biderkevtin, rewşa siyasî hate biveguhertin, Komelên Siyasîyî Kurdan li hemû layekî de bi kar ve dane bidestpêkirin.

Şerîf Paşa li Parîsê de Wênerîya Kurdî ji bona ser milên xwe date bihildan û li ser Mafe û Daxwazên Kurd de du Bibîrxistin û du Neqşên Kurdistanê ji bona Konferensê Aşîtîyê date bipêşkeşkirin.

Bibîrxistina pêşî di 25 cemade duwem de sala 1337 k.- 22 avdara sala 1919 z. de û Bibîrxistina duwem di sala 1338 k.- 1 avdara sala 1920 z. de bû.

Di 20 befirbara sala 1919 de di navbera Şerîf Paşa û Wênerê Ermeniyan Boxos Nubar Paşa de peymaneke hate bigirêdan.

Herdu La bi yek ve beramber bi Konfirensê Aşîtîyî ve Daxuyanîyeke Hevbeşî dane bidazanîn[338].

Di dawî de di 10 gelawêja sala 1920 de Peymana Severes-Sêvers hate bimorkirin. Li gora vê peymana hanê de divabû, ku li welatên Terabzun, Erzerom, Wan û Bedlîsê de Erministanek bête bipêkhatin. (Benda 88-93).

---

Ereban di destpêkirina musulmantîyê de ew û Yaqobî ji Fileyên Kurd datin bidanîn. (M. E.).

[338]Ev Daxuyanîya hanê di 24 Febrayer de di sala 1920 de di Peyam Sebahî de li Istenbolê de û di 10 Avdara sala 1920 de di Rojnama Tan de hate bibelavkirin.

Institut kurde de Paris

Di wê demê bi xwe jî ve ji bona Miletê bê kesê Kurd jî li ser Ewtonomî- Xwedmuxtarîyeke Serpereştîyê de hate bipeyivandin, ku ew divabû li Rojhilatê Furatê û li Jêrî Erministanê de bête bidîtin û ew di navbera sînorê Turkî, Surî û Îraqê de bête bikevtin.

Ev xelata Konfirensê Aşîtîyê bi hin merc û bendan ve hatibû bigirêdan. Divabû, ku li Kurdên vê herema biçûk de bihata bipirsiyarîkirin, aya ew ji Turk dixwazin bêtin bicihêkirin yanjî na û evjî ji bona ser Hevgirêdana Netewan bête biraxistin û ew lêk bide, aya li van Kurdên hanê de Serxwebûn bi wan ve dikeve, yanjî na?

Li dawîya vê de, ku Civata Hevgirêdana Netewan li ser Serxwbûna Kurdan de hate bidilhatin, ew vê biryariya hanê bi Turkî ve dide bigihandin û ev dewleta hanê jî divê wê biryarîya hanjî bide biwergirtin û li gora vê encamê de Dewletên Hevalbend ew li ser bipêvekirina Kurdên Musilê jî de bi Serpereştîya vê Xwedmoxtarîyê hanê de tu berî lênadin bigirtin. (Benda 62-64).

Bi kurtî ve Pirsiyarîya Kurd ji fen û xapandinê pêve bêtir tiştekîtir nebû. Konfirensê Aşîtîyê, yê ku peyva Dadwerîyê, Bext û Qotarkirdina Miletên Sitemxwar ji serê zimanê wî nedihat biderkevtin, vê carêjî beramber bi Komelên Merovanyê ve date bicîkirin, ku peyva Dadwerîyê û Bext vala bû û ew bi xwe ve ji bona xapandina merovanyê poşanek bû.

Hewara Reben û Sitemxwaran, Mafe û *Mafeyên* Bêkesan kêr di bextê Siyasetê de nedidan bikirin.

Bi pileyîkî weha bû, ku wan Çar Welatên Gewre Kurd ji bona yek du melyon Ermenî dane bipêşkeşkirin, wan welatê Kurd rast û rast ji bona çend melyon Kurd nedîtin.

Ev nizmbûna hanê ji bal Konfirensê Aşîtîyê de li rûwê Dadweryê û Bext de bi rastî ve mîna nemûneyekî mêjûyî têtê biderkevtin û ew ji bona Parsa Dadwerîyê û Bext amojgarîyeke tirîyî serpêhatîyê dide biderxistin!

**Peymana Lozanê**

Ev Peymana hanê di encamê de nehate biserkevtin. Zindubûna Turkê mirî û nabûdkirina orduwê Yunanî li Enedolê de, derçûna

orduwê Firensî jî ji Edena, rêkevtina vê dewletê jî ligel Enqera de Peymana Sêver date bilinavbirin û li gora Peymana Lozanê de di sala 1923 de Erministana gewre û Xwedmuxtarîya biçûkîyî Kurd jî mîna peqpeqokên ser avê hatin bivekujandin.

## Pirsiyarîya Musilê

Pirsiyarîya Kurd bi tenha ve bi ser welatê Musilê ve hate bivegivaştin, Ku ew bi kê ve bête bigirêdan, divabû ew ji bal Hevgirêdana Netewan de bihata binîşankirin.

Di dawî de Hevgirêdana Netewan ji bona lêgerandinê li daxwazên Ingilîzî, Turkî û Pirsyarîkirina Arezoyî Xelkê wê de bi pêkanîn û binardina Encûmenekî lêgerandinê di 30 kewçêrîka sala 1924 de date bibiryarîkirin.

Civata Hevgirêdanê di 13 çêrya duwem de di sala 1924 de ev Encûmena hanê date bipêkxistin. Ev pêkhatina hanê ji Peyayekî Gewreyî Meceristanê Kont Tîlîki, ji Siwêdê Misyo F. Wîrson û Kolonêl Bolis ji sipahê Belçîkî ve hate bipêkhatin.

Evan li dawîya çavpêketina wan de ligel dewleta Ingilîzî û Turk de di 16 rêbenda sala 1925 de bi Bexdê ve hatin bigihaştin.

Herwehajî Wênerê Turk jî ligel wan de bû. Li Bexdadê Wênerekî dewleta Îraqê jî tev li wan bû. Ew tev de ji bona lêgerandinê ji bona welatê Musilê û hemû cîgehekî geryan. Li dawîya bidawîanîna Karmendîya xwe de ew vegerîyan û di 16. tîrmeha sala 1925 de Raportekî dûr û dirêj ji bona Civata Hevgirêdana Netewan dane bipêşkeşkirin û wan di vî Raportê hanê de derbarî Kurd de û welatê Musilê de datin bigotin:

"Divê guhpêdan derbarê nîşakirina Karmendên Kurd ji bona serpereştîya welatê wan û xwendinê di dibustanan de, dadkirin û liberxwedan bi zimanê wan ve bi arezuwa Kurdan ve bête bikirin û zimanê Kurdî bi zimanê mîrî pê bête birûniştin. Encûmen di wê bîr û bawerîyê de ye, heger li dawîya çar salan de li paş wergirtina peymana Ingilîz û Îraqê de û helsana Çavdêrîya Hevgirêdana Netewan ji ser Îraqê de ji bona pêkanîna serpereştîyeke cihî peyman ji bona Kurd pê

Institut kurde de Paris

neyêtin bidan, beşê zor ji Kurdan serpereştîya Turkî di ser serdarîya Ereb de didin bigirtin" (P. 111, Benda 7. Movika 2 ji wergerandina Raportê Encûmenê).

Civata Hevgirêdanê li ser vî Raportê hanê de li 16 rênda sala 1925 de hin mercên hilanê dane bibiryarkirin. Welatê Musilê ji bona dewleta Îraqê date bidan. Wergerandina Benda Sêyemî vê biryaryê jî eve ye:

"Dewleta Ingilîzê ji ber ku ew dewleta dest li ser Îraqê de ye, divê ew bicihanînên pêrabûnên xwe beramber peymanên derbarê Serpereştîya Cihî de ji bona Kurdên Îraqê ji bal Encûmena Lêgerandinê û ji encamên dawîyî teminîyên wê de li ser Civata Hevgirêdanê de bide biraxistin".

Li ser daxwaza Wezîrê Koloniyan li 3 kewçêrînka 1926 de bi peyveke dirêj ve pêrabûnên başbûna nêta dewleta Îraqê derbarê Mafeyê Kurdê Îraqê de li ber Hevgirêdanê de date biraxistin û giraw wî ji bona wê ji bona bicîhanîna wan jê re date bikirin.

## Alîkarîya Kurd Ji Bona Turka Di Tevgerên Wanî Welatî De

Kurdên li Turkîyê de ji bona tevgera welatîyî Turkî karên pir mezin ji bona wê dane bipêşkeşkirin û ew karên hanê pêre di encamê dawî de bingehê Komara Turkîyî niha dane bidurustkirin, di wê gava ku Ermeniyên piştgirtî bi xurtî ve ji bal Ewropa de ji xwe re dane bibiryarîkirin, ku ew pişta berê şerê tevgera Turkîyî welatî bidin bita ûmarkirin; jiber ku ew li ser Ermînaya Gereyî de, ya ku ew ji bal Peymana Sêver de jêre hatibû bidiyarîkirin, tirs dida bipeydakirin.

Ji bona bicihanîna vê biryarîya hanê Komara Erîvanêyî Ermenî di nava nîvê sala 1920 de hêzên xweyî leşkerî li ser sînorên Turkîyî Rojhilatîyî Jorî de data bicivandin û bi hêrîşkirina xwe ve metirsî date bipeydakirin.

Jibervêjî bi lez û bez ve Kazim Qere Paşa bi leşkerekî ve piranîya wî ji Kurd ligel Ermenîyan de di meha gelawêja sala 1920 de bi şer ve hate bikevtin. Wî bajarê Qars date bigirtin û weha date bisengînkirin

Institut kurde de Paris

ku careke din Ermenî di girtina wê de nedin biremankirin. Gerjî ku dewleta Komara Sovyêtî destdirêjî nedaya bikirin, dê ji bona Komara Erîvanêyî Ermenî jî şop jê re nema bihate bidîtin.

Hîç gûman têde niye, ku ev biserketina hanêyî pirî gewre ji bona sipahê Rojhilatê hoyekî gewreyî bingehî ji bona hîmkirina Komara Turkîyî niha date pêkanîn.

Heger ku Leşkerê Eremenî biser bihate bikevtin, dê tevgera Turkî, ya ku ew di wê demê de bi xwe jî ji Rojava û Jêr de dihate hêrîşkirin û ew hêjî di Hundurê xwe de û bi taybetî di Wilayetên Rojhilat de pir lawaz bû, dibû biser nehat bikevtin û ew bi carekê ve bihata biruxandin.

Herwehajî li Kilîkya jî de hêzên Ermenîyî piştgirtî ji bal Firensa de ji bona pêkanîna Ermînya Gewre de beramber bi sipahê Selah El-Dîn Paşa ve, yê ku piranîya pir jê Kurd bûn, hatin bitarûmarkirin.

Weha Firensa neçar bû, ku ew ligel Turk de Peymana Enqerayî bi nav û deng ve di sala 1921 de bidin bigirêdan.

Nebes tenê alîkarîya Kurdên welatperwer ji bona Turk di qadên Rojhilat û Jêrî de dihatin bidîtin, lêbelê şopên wan alîkarîyên bi nerx jî ve pir bi diyarî ve di şerên Siqarya, Efyon Qere Hesar, În Onî û di şerê Gewre de hatin biderkevtin, di wî şerê gewreyî de, yê ku ew hate bihelbijartin, da ku biserketina dawî û nabûdkirina hêzên Yunaî bide bidîtin.

Heger ku mêjû bi dadwer ve bête biderkevtin û bi pakî ve rûdanên çûyî bide bitomarkirin, hîç gûman têde nayête bidîtini, ku dê ew van karên Kurdî hanê, berzbûna dilsozîyê û rûmetê di navbera wan rûdanên tomarkirî de bi dadwerî û pakî ve rûpelekî mayî bidin biderxistin, ku ew ji bal hilat û dahtên demê de nayêtin bihilanîn.

**Serhildanên Kurdistanîyî Vê Dawîyê**

Institut kurde de Paris

Di vê pêla de, ya ku têde Civata Hevgirêdana Netewan ligel Pirsiyarîya welatê Musil de xerik bû, li herema Xarputê û Diyarbekrê de şûreşeke gewreyî tir hate birûdan û Serokê wê jî Şêx Seîd bû. Xwedê lêdilovan be[339].

"Ev şûreşa hanê bi navê Şêx Seîdê Pîran ve bi nav deng bû[340]. Li jêr Rêberîya vî Ciwanmêrê hanê de û Komandarîya Evserên Kevin de pêncî hezar kes bi çek û mekên xwe ve hatibûn bilikarxistin û li hin cihan de ji bona ajotina leşker jî hin çek û teqemenî jî hatibûn biveşartin.

Biryar weha bû, ku 21. avdara sala 1925 de şûreş bête bilidarxistin û armanca wê jî derkirina Turk ji Kurdistanê bû.

dewleta Turkî kêm yanjî zor agehdar bû û ew ji xwe re di kar de bû.

Di 1. avadara 1925 de welatperwerekî Kurd bêyî guhpêdanê bi xwe ve ji bona layê Şêx Seîd çû û ew li vegerê de hate bigirtin û ew ji bona Baregehekî Turkî hate bibirin, ku ew çend mîl ji Şêx Seîd dûr bû.

Li vî welatperwerê hanê hate bipirsînkirin, lê wî perseva nayînê date bidan. Komandarê Turkî kaxezeke nazik ji bona Şêx Seîd date binivîsandin û ew ji bona Baregeh date bibangkirin.

Şêx li girtina welatperwerê Kurd de agehdar bû û wî bawerî bi Komandarê Turk ve nekir û wî ligel çend sed kesekî de li dora xwe şûreş date bilidarxitin.

Ev şûreşa hanê ne di dema xwe de hate bivêxistin. Bi vî rengî ve û dijî biryarîyê di 7. avdara sala 1925 de ev Şûreşa hanê hate bivêketin.

Çunke, di nava perçên Xelkê de têlên telêgraf û telefonê nebûn, ew zor dereng û bi wêneyekî tevlihev ve hatin biagehdarîkirin. Hêzên

[339] Ev Lêgerandina hanê ji Pirsiyarîya Kurdistan beramber bi Turk ve hatîye bikurtîkirin.

[340]Pîran gundekî nêzîkî Xinêze.

Institut kurde de Paris

Turk li vê de kar jê re dane bigirtin û hêzên Beramberên Kurd ew dane biçekkirin û dor li wan de datin bigirtin.

Dewleta Turk qolê orduwa nehemî Erzeromê, heştê Erzencanê û heftê Diyarbekrê bi pele ve ji bona ser hêzên Kurd dane biajotin[341].

Belam hêza Kurd ev hêza leşkerîyî Turk date bişikandin û wê rûwê xwe ji bona Orfa, Siwêrek û Diyarbekrê date bivekirin.

Zorî pê neçû, wê beşê Jêrî bajarê Diyarbekrê date bigirtin û li hemû layekî de wê leşkerê Turkî date bitengavîkirin. Belam pir pê neçû, zîneta welatperweran têkçû û ew pir tengav bûn. Çunke, hêzeke tazeyî Turk di Tirina Şiva Surî de hate bibarkirin û ew ji bona qada şer hate bigihaştin.

Vê hêza hanê hêza Kurd date bitawîkirin; ji ber hêvî weha bû, ku Îran, Îraq û Surî dê bê Hevalbendî be^ton birawestandin. Belam vê hêvîya hanê ser negirt û Kurd di nava du agiran de hatin bimayîn û ew bi şerekî bê hêvî ve hatin bikevtin.

Di vê pêlê jî de hinek hêzên Turkî tirîjî li Qars û Siwasê jî de hatin birêkevtin. Êtir çûn li ser vî şerê bi rêxistî ve ji bona kurd pir dujwar û bê kar bû. Jibervêjî hêzên Kurd xwe ji bona serên çiyan dane bikişandin û bi şêweyekî biçûk ve di şer de hatin bimayîn"[342].

Mebest ji vê şûreşa hanê -her weku li tomarkirinên Dadgeha Serxwebûnê de hatine bitomarkirin- sitendina Serxwebûna Milîyî Kurd û Pêkananîn Dewleteke Milî bû. Jibervêjî ji xwîngermbûna milî û aldarî de kar hate biwergirtin.

[341]Dibe, ku ev Qolên ordu bi lez ve û bi jimara xweyî hebû ve hatibin.

[342]Ew hêzên Kurd, yên ku ji bona rengekî bi rêxistî hatibûn dan, ew li heremên Agrî Dax, Dêrsim, Sason, Çapak, Ertan, Muş, Bedlîs, Melazgerd, Mazî Tax û Sîlwanda de 245000 kes bûn, Bicgeh li van jî hin Qolên cihê cihê jî ji bona nava şer hatibûn b-ikevtin.

Institut kurde de Paris

Mêjû ji van rengên şûreşan hin nemûneyan dide binîşanadan, ji bona nimûne şûreşa Ismaîlê Sefewê, ku Postê Meşyexetê bi Textê Seltenetê ve date bikirin û çend sedsalekî ew hate bijîyandin.

Şûreşa Şêx Ebeydulahê Şemdînan jî di destpêka xwe de hate biserkevtin, lêbelê ew di dawî de hate bikevtin. Wê bi xwe jî ve weku şûreşa Şêx Seîd dabû bidestpêkirin.

Serok û serpereştîyên vê şûreşa hanê bi rastî ve bi remaneke li ser hiş de Şêx Seîd bi Serikê vê şûreşê hanê date bidanîn û wan xwest, ku ew ji desthilatîya gewreyî vî Merovê Qencê hanê sûd bidin biwergirtin, çunke, -weku em baş dizanin- serjimara Mirîd û Hogirên wî çil pêncî hezarek bûn. Lêbelê vê sûreşa hanê ne li pê soz û biryara xwe de date bidestpêkirin û karîna bi yekkirina tevgerê ji bona wê nema hate bidîtin.

Bi kurtî ve li duwayî şer û kuştarekî zor de Şêx Seîd û hin ji Sergerdenê vê şûreşa hanê hatin bigirtin û li çend cîgehan de Dadwerîya Serxwebûnê hatin bidanîn û li paş dadkirineke tenik de hemû bi dar ve hatin bivekirin.

Herwehajî yên ku kêm yanjî zor gûman li wan de dihte bikirin yanjî dibû, ku ew li dawî de dikarin tiştekî bidin bikirinn, ew jî hatin bilinavbirin.

Kela dewletê bi vê jî nehate bisarkirin. Ji belavokên rojnaman û hin nameyên tir têtin biderkevtin, ku barkirinek û kuştarekî zor bi derd ve li hemû Kurdistana Turkiyê de û bi taybetî ve li heremên şûreşkirî de hatin bikirin[343].

Dîsan bi hin mehnên kevin û taze Şêx Abdul-Qadir Efendî Kurê Şêx Ebeydulah ligel Kurê wî de li Istenbolê de datin bigirtin û li dawîya dadkirina wan de ew dane bidarvekirin.

[343] Li gora Pirsiyarîya Kurd beramber bi Turk ve li zivistana salên 1926/27 de 213 gund bi 8612 malên xwe ve hatin sûtandin. Di nava van gundan de 15062 kes pir bi azar hatin kuştin. Di vê demê jî de nêzîka Yek Melyon Kurd pir bi derd û jan ew ji bona Rojavayi Enedolê dane barkirin.

Institut kurde de Paris

Li gora wê nameyê de bi xwe ve[344] şûreşên welatperwerên Kurd li salên duwawî jî de hatin bidirêjkirin. Li sala 1926 û li 15 befirbara sala 1927 de li devera Agri Daxê de û li 31 befirbara sala 1927 de li derbendê Bedlîsê de di nevbera hêzên Turk û hêzên milîyî Kurd de şer hate bivêkevtin û Turk hatin bişikestn gelek Dîl û bidestkevtin bi destên Kurd ve hatin bikevtin.

Li 4 reşmeha sala 1928 de hêzeke Esmanîyî Turkî hêrîşî ser navînîya hêzên milîyî Agrî Daxê date bikirin û du Balafir lê hatin bikevtin. Li 29 avdara sala 1928 de di navbera hêzên milî de û alaya 29 Turk de li devera Bayezîdê de şer hate bivêkevtin û Turk hate bişikenandin.

Li 3 kewçêrînka sala 1928 de hêzên milî desteyekî Candirmên Turkî li devera Çolemêrgê de datin bitefir û bitunakirin û Walîyê Beyazîdê jî ligel jimarekê ji Cadirman de dane bidîlkirin. Ev nameya hanê derbarê bi zîyanên Kurd de tu agehdarîyekê nade bidan.

Birastî çapemenîyên Turk derbarê van rûdanan de hîç nadin bigotin, bi bêvajî vê ve ew tanî radeyekî li ser bêdengbûnê de didin biaxivtin. Belam Belavokên Komelên Kurd bi dijî wan, weku ku me li serî de date bigotin, ew li ser dirêjbûna şûreşên Kurd de didin biaxivtin. Zor dibe, ku gotinên Kurdan rastirbin. Lêbelê jî dibe, ku hinek pirbûn jî têde bête bidîtin.

Institut kurde de Paris

[344]Pirsiyarîya Kurd beramber bi Turk ve.

Şûreşa 1930

Ev Şûreşa hanê li gora belavokên welatperwerên Kurd sûreşeke bi tenha xwe ve nebû, belkî ew dirêjbûna şûreşa milî bû, ya ku wê di sala 1925 date bidestpêkirin û hîjî ew bi carekê ve nehatîye bikujandin. Geh ew demekê bê deng bûye û gehjî ew gûr bûye.

Derbarê vê rûdana sala 1930 de hêştajî agehdarîyên rastî û pêbawerkirî nînin.

Belavokên kanîyên Turk û yên Miletperwerên Kurd, renge, li destkarîyê û pirîbûnê de vala niye; jibervêjî li belavokên herdu layan de remaneke rast û rewan peydakirina wê zor bi dijwar ve tête bidîtin.

Bi kurtî ve belavokên rojnaman weha didin biderxistin, ku bingehê vê şûreşa sala 1930 li alîyê çiyayê Araratê de, yê ku ew navînîya hêzên milîyî Kurd bû, date bidestpêkirin û Sermiyanê vê şûreşê Ihsan Nurî Paşa bû.

Li 13 axlêva sala 930 de wê nobûn datin biwergirtin û bi germî ve mehekê wê date birêjkirin û hin ji qolên wê jî tanî sînorê Surî jî didatin bikêrkirin. Dewleta Komara Turkî leşkerekî zor qolê ordowa nehem ji bona ser wê date binardin û li dora çiyayê Araratê û wê heremê de gelek şer hatin bikirin.

Dirêjîyên rastîyên van şerên hanê jî diyarî nînin. Di dawî de ji layekî ve Rusya sînorê xwe date biqayimkirin û dewleta Îranê jî li ser daxwazên dewleta Turkî de hin hêzên xwe ji bona wan navan date biajotin. Bi vî rengî ve hêzên milîyî Kurd li sê layan de hatin bitengavkirin.

Li dawîya hiner û mêrxasîyeke pirî zor de Serkirdaya Şûreşê bi xwe û hin ji Hevalên xwe ve bi neçarî ve xwe bi berdestê hêza Îranî ve dane bikirin û ew ji bona Tehranê hatin binardin.

Institut kurde de Paris

Weku ku me li jor de dayite bigotin, dirêjbûnên rûdanên vê şûreşê neyêtin bidiyarkirin yanjî ew tête bitelihevkirin. Ragiyandên kanîyên Turk û Miletperwerên Kurd yeknagirin.

Li gora Nameya Doktor Bilêc Şêrkoh (Pirsiyarîya Kurd) û daxuyanîyên Serokên Şûreşê de serjimara leşkerê Turk di pêşî de yanzdeh hezar bû û li dawî de bi pêncî hezar kes ve hate bigihaştin. Hêzên milîyî Kurd jî pêncî hezar kes bûn û bi serkevtinên Kurd jî zor bûn[345].

Li layekîtir de ragiyandinên Mîrîyî Turkî vê şûreşa hanê bi rengegîtir, kêrêntir û bi encamêntir ve didan biderxistin [346].
Li layê min de weha ye, ku ragiyandên herdula li pirbûnê û destkarîyê de vala nînin. Ligel vî jî de nayête binayînkirin, ku vê şûreşa hanê dewleta Turk date bişerpezekirin û zîyaneke zorî li pare û Serpazan de lê date bixistin[347].

Belam zîyanên Kurd bi serûştî ve gelekî bêtir bûn. Pêrabûnên xurtîyî dewletê malwêranîyên nebihistî bi Kurdistanê ve dane bixistin. Xelkên hin heraman bi derd û zîyanên zor ve di nava Endola xerîb de dane belawelakirin. Mal û mulkên wan jî ji kêsî wan hatin biçûyîn û ew tûşî xurbet û felaketê bûn.

Bi rastî ve ev destanên hanê bi zor cîgehê mexabinê ve têtin biderkevtin. Arezû dihate bikirin, ku dê herdu la ew bi hajbûn û aşîtî ve çareyekê ji bona van duberî û pevçûnan bidin bidozandin û xwe ji zîyanên malwêranîyê bidin biparastin.

[345]Daxuyanîyên Hesen Elî Beg di Rojnamên Surî de di sala 1930 de.

[346]Kurtîya Raportê salih Paşa û Mufetişi Giştîyê Kurdistanê Ibrahim Telî Beg ew di Rojnama Ehrarî Bêrûdê de di sala 1939 hate bibelavkirin.

[347]Li gora Pirsiyarîya Kurd de, R. 95 de dibêje, ku Zîyana Turkan di vî şerî de bi Çend hezar Kuştî, Birindar, Dîl, 12 Balafir, 60 Top, 50 Metiryaloz, 60000 Fişek, 3000 Tifing, 150 Çadir, 40 Bar Teqemenî dihatin bidîtin. Jimarên bazdayî ji sipah pirî zorbûn û Qolên orduwa heftem û heştem jî di vî şerî de beşdarbûn.

Institut kurde de Paris

Li layê min de weha ye, ku ev erkê hanê li Kurd de bêtir ew bi ser dewletê ve tête bigirêdan. Divabû, ku ew beramber bi karkirina çend sedsalan û bi taybetî ve gernasî û serbazîya ji bona pêkanîna dewleta Komarê çi di destpêka wê de û çi jî di cenga serxwebûnê de bi çavekî dadwerî û bext ve lêbihata bitemaşekirin û cî bi vê zor û sitemê û xwînriştinê ve nedaya bidan.

Ev mafeyên serûştîyî ji bona geşbûna pêşveketinê, zanebûnê û avanîyê dide pêwistkirin, ku dewleta Turkî lê dirêxî nede bikirin û serdarîya diravî xwe bi serdarîya xwe ve bi ser mejî û dilê Kurd de bida bixurtkirin.

Li layê min de weha ye, ku nasîn û dana van mafeyên serûştîyê zîyana wan ji bona desthilatîya Serdarîyê nnayête biderkevtin, belkî qazanceke wanî diravî û sincî têtd bête bidîtin.

Dilê Kurd li cihê kîn û zikreşîyê de beramber bi dewletê ve pir li xweşî sipasîyê de dibihate biderkevtin.

Ev miletê mêrxas û hêja[348] di dema aşîtîyê û aramîyê de bi karkerê xweşîtîyê û dewlemendîya dewletê ve dê bihate biderkevtin û ew dê di dema ceng û şer jî de ji bona dûrkirin û şikenandina dujminan çekekî pir bi xurt ve bihate biderkevtin.

kes nikare bide binayînîkirin, ku li hemû Miletekî de kêm yanjî zor mêla serbixweyî tête biderkevtin. Ev jî ji mafeyên bingehî û serûştîyî Merov û Miletan tête biderkevtin. Di vî warê hanê de hîç li kesekî de û hîç li Miletekî de şermezarî nabe lê bête bigirtin.

Ewende heye. ku ew Miletê hanê û bi taybetî ve Pêgihiştvanên wî Miletî divên li pêş hemû tiştekî de ji bona vê serxwebûnê çi bi pêwist ve bête bidîtin, wê ji xwe re bi armanc û mebest ve bidin bikirin û ew ji xwe re rêyeke maqol û bawermend bi pêş xwe ve bidin bixistin û ew

[348]Ji Zanistvanên bi nav û bangên Ereb di liberketina Ruh Elmeanî de bergê 8, R. 149 li gora têgihiştina xwe û yên din di Peyva Miletê, ku ew di Suret El-Fetih de hatîye, ku hunê beramberî Miletekî gernas mêrxas bibin... hd., ew bi xwe kurdin.

Institut kurde de Paris

li zanistîyê û hêşbûnê de hîç neyêtin biderkevin û can û malên xwe bi bê dem û hele jî û bi xorayî ve nedin birijandin. Divê ew hêmen û wiryabin, bi birayetî û dilsozî ve dest bi bist ve bidin biyekkirin û bi bê şer û hera ve bidin bixebatkirin, ku ew sitewandina xweyê civakî û siyasî bi perzbûna sincî, zanistî û dewlemendbûna xwe ve bidin bicîkirin. Çunke, Serxwebûn bi niyazmendîya van ve tête biderkevtin.

Divê bête bizanîn, ku di vî sedsalê hanê de Serxwebûn ligel Nezanîyê û Perîşanîyê de bi carekê jî ve nikare bête bijîyandin û ew li batî Xweşyê û Bextiyarîyê de ji bona Miletê xwe Sitemkarîyê û Felaketê dide bianànîn û ew wî di nava destên Bêgane û Zordaran de bi girtî û belengaz dide bihiştin.

Zîneta desthilatîya Serdar jî beramber bi rengên van Miletan jî ve divê wekî Bavekî dilovan bête bidîtin yanjî mîna Cîgerekî zor bi bext ve û ji Xwedê bi tirsbin.

Çawan Cîgerekî bêbext û mafexwer beramberî yasa û qanûnê de bi berpirsiyar ve tête biderkevtin, wehajî desthilatîya Serdar jî, heger ku ew guh bi mafeyên Miletên pêsipartî ve nede bikirin û li pêgihandin û xweşîya wan de terxemîn bide bikirin, ew beramber bi Xwedê û Merovanyê ve bi cihê gazin û sizayê ve tête biderkevtin û heger bi tenha ve çavên wê li dirêjbûna Serdarî û desthilatîya xwe de bêtin biderkevtin, evaya tanî dawî jêre nare biserî.

Di dema tengayê de li batî yarmetî û gorîkirinê de ji bal Miletên Sitemxwar de ew ji bil zikreşîyê û dujminatîyê pêve tiştekî tir nade bidîtin.

Institut kurde de Paris

# *Derîyê Heftem*

## 1. Reng, Reweşt Û Jîyana Civaka Kurd

Ew Zanistvanên Rojavayî, yên ku ew di vî babatê hanê de ji demekê xerîkî pirsiyar û serencdanê têtin biderkevtin, bigir hemû bi yek zimanî ve didin bigotin, ku ji bona reng û rûçikên Kurdî Fîzyonomî ve nemûneyeke giştî û tevayî nayête biderkevtin. Li gora wan lêgerandinên hanê de tanî êsta çar nimûne hatine bidozandin[349].

Li layê min de weha ye, ku ev zîneta hanê bi pileyekî ve dide biderxistin, ku Bav û Bavpîrên Kurdîyî îro -weku ku me di derîyê duwem de daye biaxivtin-, çend Bavik û Tîrên yek Reh û zimanin. Evanajî divê bi Goti, Kasa-Kaşo, Şobari, Nayri, Mada-Med û Lollo ve bêtin biderkevtin.

Insiklopêdîya Musulmantîyê dibêje, ku ew Reng û Rewşta Kurd, ya ku ew ji bal Karnasên Rojhilatnasan hatine bidaxuyanîkirin, bi tenha ve ew berên wanin, yên ku çavên wan pê hatine bikevtin û hîç yekekî ji van (weku Dohoset, Xanikov, Doktor Danîlo ... hd.) nikarîbûn, ku ew li ser bingehekî zanistîyî bi carekê ve serenc li hemû Kurd û Eşêrên Kurd be bidin bidan.

---

349 Ji bona van Modêlana ji xwe re li Nivista Mark Sayks Şopên Xulefayên Dawî û li Leynch-Lênc, Ermînya bidin temaşekirin.

Institut Kurde de Paris

Êsta lîsteyeke nêzîkkirîyî başî Eşîrên Kurd bi dest ve tête bikevtin. Li gora wê de rengê belavbûna Kurd û cihên Eşîrên wîyî cuda de tête biderkevtin. Belam ev jî nade bitêrkirin. Pêwistî bi lêgerandinên bi carekê ve û xwendekarîyake dûr û dirêj ve tête bikirin, ku ew li ser agehdarîyên bi rêk û pêk û hevgirtî ve li ser rûdanên mêjûyî baş de bêtin bikirin. Li servêjî de hin ji wan nivîstan weha nîye, ku ew wilo nebin, belam ev bi xwe jî ve bes niye[350].

Li rengê jîyana Civata Kurd de sê pesnê berz têtin bipeydakirin:

A. Girbûna wan li dora Serok de, gerjî ku ew Bêgane be. Ev zîneta hanê ji bona Kurd rewşte û ew jêre rewendeke mêjûyî ye.

B. Bi ya Serok kirin, ligel parastina hin ji rewendên mêjûyî de.

C. Hebûna Çîniyên cuda (Destkar û Cotkar) di nava wan de.

Eşîrên Gerok, yên ku ew di zivistanê de ji bona Deşta Germî Cezîrê têtin bihatinû li nêzîka Eşîrên Ereb de demê din biradibhurandin, êsta ew bi xwe ve pir kêm bûne. Piranîya Kurdên îro yan Nîvgerokên û yanjî bi carekê ve Danîştvanên.

Eşîrên Nîvgerok li gora ba û ava cîgeh û rêyan ve ew havînê ji bona nava Zosanan diçîn û li wêderê de zom û warê wanî nîşankirî têtin bidîtin. Ji bona mimûne Eşîra Caf em didin bianînt, ku Germiyanê wêyî Kurdistanî bi carekê ve bi diyar ve tête biderkevtin

Beşê danîştvan û cîgîr bûyê Kurd piranîya Xelkên wan navan dane biwergirtin, ango ew neşînvanên hanê bi kurd ve dane bikirin.

[350] Lênerînên Rojhilatnasan Dohost, Xanikov, Dr. Danilo ... hd. û herwehajî Nivista Misyo Fanter, ya ku ew li jêr nav nîşana Rûnkirinên li ser Serûştîya Ensarî Kurd hatîye binivîsandin û ew di sala 1302 k.- 1885 z. de hatîye çapkirin, ji xwe re li wan de bidin temaşekirin.

Institut kurde de Paris

Xelkên kokîyî wan cîyan, ji bona ku ew xwe ji şerên dirawsên xwe bidin biparstin, bi ser xwe de desthilatîya wan Eşîrên, yên ku ew taze hatine bicîkirin, ji xwe re dane biwergirtin.

Bi rengegî giştî ve kurd li jîyana daniştî de dide bihezkirin. Kurdên layê Jorî Cezîrê bi jêhatbûn û karînên xweyî candinîyê ve nav û deng veji xwe re dane biwergirtin û wan di vî warî de bi ser Erebên Beduyên wan navan ve biserkevtin dane biwergirtin. (Handbuk, Jimare 57).

Nivîsta Turk li Asya de, ya ku ew ji bal Wizareta Derveyî Dewleta Biritanya Gewre hatîye bibelavkirin, dibêje:
"Weha tête biderkevtin, ku Jorî Mêzopotamya bi welatê Kurd ve têtê bidîtin".

Nîşanên milîyî Eşîrên Kurd (weku kar, reweşt, yarî...hd.) bi tenha ve bi rengekî ve nayête biderkevtin. Bigir li her Eşîrekê de kêm û zor cudabûn têtê biderkevtin.

Jibervêjî axivtin li ser nîşaneke giştî de ji rastîyê dûr têtê biderkevtin. Divê ji bona her Eşîrekê axivtineke cihê bête bikirin. Ji bona nimûne, ji bona Kurdê welatê Erîvanê, yên ku ew ji Kurdistanê dûrin, Pirofisor Egiazarov lêgerandinên zanistîyî zor baş dane bikirin û herwehajî ji bona Kurdên Sulêmanyê jî lêgerandinên Doktor Rêç û nivîsta Mêcer Son û ji bona welatê Mukrî û Ormiyê jî nivîstên Arakelyan, Morgan û Nêkitin zor agehdarîyên baş di wan de têtin bidîtin.

Şerefname Li ser hin ji Afretên Kurd dide biaxivtin, ku li gelek îş û karên gewre de wan nav daye biderxistin. Bi taybetî ve li Eşîra Kelher-Kelwer de hin ji wan Afretan Gewreya Eşîra xwe bûn. Helîme Xana Hekarê, Adile Xana Helebçe bi nav û deng bûn. Koxa Nergiza Şûwanî-Şivanî jî nabe jibîr bête bikirin.

Derbarê bi reweşt, jiyan, rûçîk û nîşanên Miletê Kurd ve Rojhilatnasan nivîstên zor baş dane binivîsandin û piranîya wan jî zor bi bê layîn ve û bi dadwerîtî ve li ser wan de dane biaxivtin.

Institut kurde de Paris

Di vî babetî hanê de bi dûr û dirêjî ve pêdecûn, dê ew bi pêwistî nivîsteke cihê ve bête bikirin. Jibervêjî ji bona wan kesan divên, yên ku ew ji xwe re dixwazin agehdarîyên baş bidin bipeydakirin, ku ew ji bona nivîsta (Misyo Aliksender Çapa Komek ji Rûnkirinan û Xwendekarîyan li ser Kurdistanê de, sala 1276 k.- 1860 z. de, nivîsta Misyo Nîkîtîn, Hin Rûnkirin li ser Kurd de, bergê bîst û yekemî Insiklopêdîya Ingilîzîyî Gewre, nivîsta Misyo Hanri Bender Gerek li Welatê Kurd de, Kapêtin Hay, Du sal li Kurdistan de, Mêcer Son, Bi Veşartî ve li Mêsopotamya û Kurdistanê de, Sêr Mark Sayks, Şopên Dawîyî Xulefa, ji xwe re bidin bitemaşekirin û bixwendin.

Kurt û givaştî eveye: ku her Zanistvanekî û Cîhangerekî, ku wan Kurd dabe bidîtin û çend rojan ligel wan de dabe birabuhurandin, bê gitin wan jî nav û nîşan û sincîyên Kurd jî mîna Insilopêdîya Ingilîzîyî Gewre dane biderxistin, ya ku ew dibêje: "Kar û barên nav malê û zîneta malbatê di nava Miletê Kurd de zor bi pêş ve hatîye bikevtin. Ew rûxweşin, dilpakin, bi rûmet û rêwîperwerin.

Afretên wan ji Afretên Turk û yên Îranî serbestirin û ew bê çarçefin. Biçgeh li hin kesên Dewlemend pêve mêldarîya zor Jinanînê niye. Ew pir hez ji saz, govend, helperîn û semawendê didin bikirin..."

Institut kurde de Paris

## 2. Ayîn Û Oldarî

Xwedîyê Mêjûwa Îrana Kevnar[351] di warê ayînî û rêçên Arîyî Îran û airawsên wan de lêkolandinên baş dane bikirin. Li gora peyveyên wî de rêçên zorî kevnarî Miletên Arî mîna zimanên wî ligel Hindî de li dayik bûne û ew li dawî de di navbera sedsalên çardeh û nehemînî pêşî zayînê de ji hev cihêbûne. Ev mêjûwa pêşîyî texminkirî bi mêjûwa nivîsandina Vedas-Vêdasê ve, ango bi nivivîsta Perestî Hindî ve tête biderkevtin, ya ku ew bi zimanê Sansikrîtî ve hatîye binivîsandin.

Li vêderê de divê em cudabûna van lêkolandinên hanê bidin bizanîn, ku ayinên hin ji van Miletên Arî mîna Gotî, Lollo, Kasay û

[351] Ew Hesen Pîrînya ye, yê ku ew berê Mûşîrê Dewletê bû.

Êlamî (komelên Zagrosê) çunge di destpêkirina mêjûwê de ligel Somerî û Akadî zor hatine bitêkelkirin û di hemû warekî de di bin kêra wan de hatine bimayîn. Wehajî ayînên wan jî ji vê kêrê jî nihatine birizgarîkirin. Ji bona nemûne em dibînin, ku li nava van de Kasay mîna Babil bûye, ku ji bona hemû rengên hebûnê û kêrên seruştîyê nimûneyekîyî wanî Xwedanî dihate bipeydakirin. (Derîyê Sêyem).

Zend Avesta (nivîsta perestîyî Zerdeştî-Zarauster) di derbarê ayînên pêşîyî Miletên Arî de Mad, Pars û Tîrên wan de dibêje: "Ev Miletên hanê bawerîya wan bi du bingehan hebûn: bi Başî, Şer ve yanjî bi Ronahî û Tarîyê ve dihate biderkevtin.

"Yên ku ew bi kelkê Merov dihatin bidîtin û kara wan ji bona wî dihatin biderkevtin, mîna hatina wî, Ronahî, Baran evan li Xwedanê Başîyê û Çakîyê de dihatin bizanîn. Yên ku zîyan pê didan bigihandin, mîna Nexweşî, Mirdin. Hişkî, Tengavî, Giranî û Rengên Belan li Xwedanê Şer û Tarîyê de dihatin bizanîn". Ji Xwedanê xweyî pêşî re diperestin û jê hezdikirin û li Xwedanê xweyî duwem de ditirsiyan û ji bona vêjî, ku ew zîyanan bi wan neghîne, wan jêre hin xwestin dixwendin, ku ev xwestinên hanê li dawîya dawî de ji bona karê û barên Canbazan û Rêgerîyan dihate biderkevtin.

Biçge li vêjî de Musîre (Meher) yekek ji Xwedanê herî kevnarî Miletên Arî bû û ev Xwedanê hanê jî Avesta bi xwe jî ve di navbera Hormoz û Ehrimen de dida bidanîn. Li gora ayîna Zerdeştîyê de Roj ji bal Xwedê de ji bona hilgirtina Şer û Xerabîyê hatîye bikarmendîkirin.
Wehajî di dema Erdeşêrê duwemînî Axmenî de Roj Pasevanê Xanedanê Şahînşahêyê bû. Li dawîya Iskenderê Gewre de Ayîna Roj perestî seraserî Enadolê û Yunanê date bigirtin. (Mêjûwa Îrana Kevnar, r. 261).

Hin ji Mêjûvanan dibêjin: ku perestkirina Xwedanên mîna Hewrê Birûskî (Were Îregîna) û Roj (Musîre) di wî zemanî de li nava Arîyê Iranî de hebû. Weha wan dizanîbû, ku Roj bi çavê esman ve tête biderkevtin û Hewrê Birûskî bi Kurê wî ve tête biderkevtin.
Bi kurtî evanan jî mîna Arîyên Hindî hin ji Daxuyanîyên Serûştîyê û Perçeyên Hebûnê ji xwe re didan perestin û ew li pêş wan de di bin

Rêberîya (Zerdeşt-Zarauster) de bi Ayîna Yekbûna Xwedanî ve hatin vegihaştin.

Ayîna Zerdeştî

Zerdeşt li nik Miletê Arîyî kevnar de yan Pêxemberekî-Pêyamberekî rastî bû û yanjî Rêberekî pirî berz û bala bû.

Bi carekê ve diyar niye, ku ew kengî bi dunyayê ve hatîye, jîyaye, Xelkê kuye, ew li çi Miletî de tête biderkevtim û nivîsta Zend Avesta li çi demê de û bi çi zimanekî hatîye binivîsandin?

Di vî babetê hanê de Zanistvanan û Mêjûvanan hêjî nedaye bilihevkirin. Di nava van de Mister A. V. W. Jackson-Cakson li lêkolandinên Ayîna Zerdeştî de bi rastî ve bu Karşinas ve tête biderkevtin. Ew di vê bawerîyê de tête biderkevtin, ku Zerdeşt li nîvê duwemî sedsalê heftemî pêş zayînê de ji bona dunyayê hatîye bizayîn û ew li nîvê yekemî sedsalê şeşem de hatîye bimirin. Eve jî bi carekê ve niye.

Belam li gora goyên Zerdeştîyê de divê ev Peyamber û Rêberê hanê di sedsalê heftemîn de ji bona dunyayê hatibe û wî li kenarê gola Ormiyê de dest bi Ragiyandin û Rêberîyê ve dabe bkiriin û ew di nava nîvî sedsalê şeşem de hatibe bimirin.

Mister Hol dibêje, (Mêjûwa Rojhilata Nêzîk, r. 555): li gora goyên Zerdeştîyî kevnar de ew bi texmîn ve li sala 599 pêş zayînê de ji bona dunyayê hatîye bizayîn. Dîsan li gora goyên Zerdeştî de ew Kurê Pewarşesb bû. Li Mendalî de hin tiştên pir gewre lê hatine birûdan û li servêjî de Canbazan dayie bixwestin, ku ew wî bidin bikuşin. Belam ji bona wan ev nehate bikirin.

Li bîst salî de wî xwe ji bona cîgehekî bi tenya ve dayite bikişandin û ew ji bona xwe bi tenha xwe ve bi perwerdekirinê ve hatîye kevtin. Di sî salî de û li kenarê ava Daîtîya de, ku hinek jêre ava Aras-Arakis dibêjin, wî Xelek ji bona nasîna Xwedê dane bibangkirin.

Institut kurde de Paris

Çavdanê Perest Zerdeşt ji bona nik Ahormezd[352] date bibirin. Li dawîya vê de Zerdeşt li nava Xelkê Toran û Segistanê de bi Rêberîyê ve bi kar ve hate bikevtin. Belam sûd nebû, çunge Meganîyên wê demê bergîrbûn.

Li paş de li ser fermana Ahormezd de ji bona layê Wîştaspê Fermandarê Batir çû. Li dawîya xebat û keftîlefteke du salî de wî ew Patîşayê hanê ji bona ser oldarîya xwe date bianîn[353].

[352] Hormuz di koka xwe de Horemezd bû û ew ji Peyva Ahora û Mezd hatîye bipêkhatin. Ahora û yanjî Asore navê Xwedanê Arîyî Hindî û Îranî bû, (jiber demekê Rêça van Xelkên herdu welatan yekbû). Peyva Mezd bi Hiş tête liberketin.

[353]Mistêr Hall-Hol di Nivista xwe de bi vê kurtîyê dibêje:
Zerdeşt li çil salî de li Xuresanê de li bajarê Kîşmar de, yê ku ew li melbenda Torşîze li Jêrî Rojavayî Meşhed tête bikevtin, dest bi amojgarîya xwe kir. Bi yadgarbûna ketina Qeralê Wîştasep ji bona Oldarîya Zerdeştîyê darek Serûyî bi nav û bang hate çandin. Vedibêjin, ku Ev dara hanê tani sala 247 k.- 861 z. de mabû. Xelîfê Ebasî El-Mutewekil Ela-Elah di wê salê de fermana birîna wê darê û anîna darên wêna ji bona Samura da, da ku ew Sera xwe bi wan li wêder de bide avakirin.
Di pêla Zerdeşt de Wîştasep Bavê Daryos-Dara Serdarê Xuresanê bû. Renge, ku bi Daryos-Dara Qeralî pê hatibe gotin. Bi vî rengî dibe, ku ev Goya hanê bi ser Daryos-Dara de bête çûn, mîna ku goyên din jî dibêjin, ku Daryos-Dara ji bona nava Oldarîya Zerdeştîyê hatîye bikevtin. Heger mêjûwa vê goyê rast bete biderkevtin, divê temenê Zerdeşt ji Înekê ji mêjûwa rûniştina Kurê WîstesepHîstaspes li ser Textê Îranê kêmtir bête biderkevtin. Dibejî, ku Zerdeşt zor kêr bi ser reman û hesteyên Daryos-Dare de dabe kirin. Ev kêrên hanê bi diyarî li ser kêlên kevirên Behiston-Bîstsitun de têtin bidîtin. Dibejî, ku ev kêrên hanê jî ji kêrên Megusên-Mecusên kevnar hatibin, yên ku ew zor caran beramber bi Çakkirinên Zerdeşt ve hatine birabûn. Bi kurtî weha diyare, ku Daryos-Darayê Gewre Qeralê pêşîyî bi dûkevtîyê Zerdeştîyê niye. Tevlivêjî em dikarin bêjin, ku ola Zerdeştîyê, heger bi rastî jî ew di sedsalê Şeşê Pêş zayînê de hatîye bidîtin, kêra wê pir li ser reman û dildarîya Îraniyan dihate bikirin, tanî ku ew di sedsalê Şeşemî Pêş zayînê de li ser tevaya Rojhilatî Îranê de hate bizalkirin.
Bi kurtî ev şureş û biveguhertinên Civakîyî Oldarîya Zerdeştî divên ew berî pêla Daryos-Dara û bi demeke dirêj ve piştî pêla Mîtanî hatibin bikirin.
Diyare, ku Miletê Mîtanî Xwedanên Arî mîna Indra, Varuna û Acuin-Asuîn perest bûn. Wan ev Xwedanên hanê bi koka Perestên xwe didan bidanîn. Di zemanê Dara de Perestê Gewreyî Iranî Ahoremezd bû. Li Evesta de navên Xwedanên Îranî bi navên Indra, Acuin-Asuîn û Naonhaithya-Neûnhayta hatine binavkirin. Navê duwem di pişt re bi Daevas-Daevaz yaxud bi Dêw bûye, yê ku ew di nava Xelkên Îranî de bi têgihitşina Dêw yanjî bi têgihitşina Şeytan pê têtin liberbikevtin.

Institut kurde de Paris

Parastin û yarmetîya Camasebê Wezîr zor ji bona wî hate bikelkkin. Li paş de Zerdeşt Keçka vî Camasebê hanê ji xwe re date bixwestin.

Oldarîya Zerdeştîyê li dawîya kevtina Wîştasp de ji bona wê ew zor di nava Toran, Îran, Hind û Asya Biçûk de hate bibelavbûn. Zerdeşt di pîrbûna xwe de û li şerekî de ji bona belavkirina ola xwe ligel Miltê (Heyon) de date destpêkirin, ew hate bikuştin. Serdarê Leşkerê Heyon Ercasb bû[354]. (Îrana Kevnar, r. 254 - 455).

## Bîr Û Baweîyên Zerdeştî

Li gora nivîsta Avesta[355] û nivîstên tirîyî Pehlevî de ayîna Zerdeştî li ser vî bingehî de tête biderkevtin:

Institut kurde de Paris

---

[354]Li gora goyên Zerdeştî-Serdeştî ev Miletê hanê Torane.

[355]Li gora Nivista Pêrsîyon de "ku ev Nivista Zerdeştî di pêla Sasanîyan de hatîye binivîsandin. Ew Bîst û Yek Nivînsîn bûn. Ji wan bes û bi tenha Yek Nevîsîn û çend Dêrên ji Nivîsên din bi dest me ve hatin bikevtin".
Navê rasti vê Nivista Zerdeştî Zend û Evesta ye, ango bi têgihiştina Qanûn û Liberxistin têtê bidîtin. Ev Nivîsînên hanê bi pir zaravayên Îranîyî cuda ve û di demên cuda de hatin bicivadin û binivîsandin; jibervêjî ev Nivista hanê bi peyva Evesta hate binavkirin û zimanê pênivîsandî bi zimanê Evesta hate binavkirin. Tanî sedsalên Navînî de Şopên Iranîyî kevnar didin biderxistin, ku peyva Zend di Pehlevî de bi têgihiştina Liberketinê têtê bidîtin. Evana kurtîya perçên Evestane:
1. Kas: ew komemek ji Hêvî û Bangane. Diyare, ku zimanê vî Beşî ji zimanê Evesta bi xwe kevintire. Ew bi zaravayekî Giştîyî tevaya Îranê hatîye binivîsandin. Ew bi Xweşxuwan hatîye binivîsandin û ew ji hemû nivîstên din kevnartire. Têde li ser warên Oldarîyî hêsanî ji bil Hêvî û Bangan de herwehajî li ser Zerdeşt, Mala wî û Eşîra wî têtê biaxivtin. Lêbelê Xurde Evesta-Evesta Biçûk ew ser Fereştan û Beşên Bangan dide biaxivtin.
2.Wenîdad: ew li ser Rêyên berdana Şeytanan dide biaxivtin.
3.Wîseprîd: ew li ser Bangên, yên ku ew ji bona Gewreyê Xwedanan têtin berzkirin, dide biaxivtin.
4.Qurbayesta: ew Ev Bangên hanê di dema pêşkeşkirina Gorîyan de ji bona Agirê Perest têtin xwendin. Bi pirî ew di pişte re hatine binivîsandin. (Mîdya, Babilon, Pêrsiya).
Di Dema vekirinên musulmantîyê de Musulmanan ligel Zerdeştîyan de mîna Xwedîyên Nivistan reftarî dane bikirin. Evaya dide biderxistin, ku Evesta di Çavên

Ronahî û Tarîtî ev herdu hêzên hanê her û her ligel hev de di şer de têtin bidîtin. Car caran ew bi ser yek ve têtin bizalkirin.

Li ser vî bingehê hanê de cîhan bi du beş ve tête biderkevtin: Bi Leşkerê Ronahîyê ve û bi Leşkerê Tarîtîyê ve tête biderkevtin.

Serdarê Leşkerê yekem bi Hormuz-Ahormezd ve û Gewreyê Leşkerê dûwem bi Ahrîmen-Engeremeyniyo ve tête biderkevtin.

Hormuz şeş Yarîdarên wî hene, ku ji wan re Emeşespnetan-Cawîdanên Perest dibêjin; ew li ber Hormuz de têtin birawestandin û ew çavdêrîya fermanê didin bikirin. Hormuz bi alîkarîya van ve Sermiyandarîya dunyayê dide bikirin. Her yek li van jî de pasevanîya tişitekî didin bikirin. Ji bona nimûne Behmen Agir, Isfendarmez erdê dide biparastin.

Li dawîya Cawîdanên Perest jî de Canên Biserêxwe yên tir têtin bidîtin, ku ji wan re Yezt-Yezd-Îzd tête bigotin û ew jî pirî bi zor ve têtin biderkevtin.

Belam herî bi nav û dengên wan ve bi Siseyan ve 'têtin biderkevtin û her yek ji van Sisêyan jî ew ji bona rojekê ji mehê bi Berpirsiyar ve tête biderkevtin û ev Yeztên du beşin: Esmanî û Zemînî.

Hormuz li ser serê Qata esmanî de hatîye vidaniştin; here baştirîn Yeztê zemînî jî Zerdeşte bi xwe ve tête biderkevtin.

Ev Yeztên hanê heryekî ji wan parastina tiştekî didin bikirinn. Bicge li vanan jî de Komeke ji Canên yektirîyî dinî bi serêxwe ve têtin bipeydakirin.

Institut kurde de Paris

---

Musulmanan de mîna Vivîstokeke Esmanî lê tête bitemaşekirin. Peyva Pêxember dibêje: "Ligel wan mîna xwedîyên nivîstan reftarbikin. Ev ji bal Hêjayê Umer-Xwedê lêdilovan be- hatîye bixwendin û pê hatîye kirin. (Destpêkirina musulmantîyê, nivîsta Yekem, R. 120).

Beramber bi Leşkerê Hormuz[356] ve Xwedanê Tarîyê Ehrîmen jî leşkerekî wî jî tete bidîtin. Yarîderên wî jî bi navên Dêw-Deo têtin binavkirin. Ehrîmen li ser serên van de tête bidaniştin.

Beramber bi Cawîdanên Perest ve şeş Dêw têtin biderkevtin. Îşê Ehrîmen û van Dêwên hanê bi bergîrîya çakiyê ve tête biderkevtin. Tarîtî, Şer, Derew, Sitemkarî... hd. ji bal Ehrîmen de hatine bipeydakirin.

Hormuz Jiyan û Ehrîmen Mirin daye biafirandin.

Bi kurtî ve beramber bi hemû dam û destgehên Hormuz Ehrîmen jî dam û destgehên wîyî bi kêrdarî ve têtin bidîtin.

Avesta derbarê bi afirandina cîhanê ve dibêje:

Hormuz di pêşî de cîhana canan date biafirandin û wî sê hezar sal serdarî bi ser ve date bikirin. Li duwayî de Ehrîmen ji tarîtîyê hate biderkevtin û ew bi zor ve ji bona nava cîhana Ronahîyê hate bitevlêbûn...

Hormuz li paş de cîhana madî li şeş dewranan de û li sê hezar sal de date biafirandin. Merov wî li dewrana şeşem de date biafirandin.
Li Paş de Ehrîmen jî bi afirandina şer dide bidestpêkirin û ew ligel Hormuz de bi şer ve hate bikevtin. Wî şerî sê hezar salî date bidirêjkirin.

Gava ku Zerdeşt ji bona dunyayê hat bihatin, Ehrîmen hate bibêhêzkevtin û bi serkevtina Hormuz roj bi roj ve bêtir dihate biderkevtin û tanî Ehrîmen ji bona cîhana Tarîtîyê têtê biçûyîn, dê ev bi serketina hanê ve bête bidirêjkirin...

Li gora ayîna Zerdeştî de Canê Nemanê niye. Li dawîya Mirinê de bi sê rojan ve dîsan Can hestî derd û xweşîyê tête bikirin.

[356] Hormuz têgihiştineke tirîyî Yezdane.

Institut kurde de Paris

Li dawî de bi ax ox ve ew bi ser Pira Çînwet tête bigihaştin. Li wêderê de ew li ber sê Dadgeran de tête bidadkirin.

Ev Dadwerîya hanê karên wî Merovê hanêyî Çak û Bed bi Tirazû ve bi beramberîhev ve didin bikişandin û li gora vî encamê tirazuwa hanê de ew dadwerîkirina xwe didin bidan.

Li dawîya vê jî de divê ew Canê hanê di ser pirekê re bête biderbaskirin, ya ku ew ji Serê Çiyayê Berz û tanî Ava Daîtya tête bidirêjkirin.

Heger ku kar û barên wî Canî bi başve bêtin biderkevtin, Pir jê re tête bipankirin. Heger ku ew Canî hanê bi Gunehkar ve bête biderkevtin, ew pira hanê weha jêre her û her tête bitengkirin, tanî ku ew bi serberjêrî tarîyê ve têtin bikevtin.

Can heger kar û kirên wî bi baş ve bêtin biderkevtin û pê sê nîşan dabin biwergirtin, ew bi cîhaneke herî baş ve tête bigihaştin.

Ev hersê nîşanên hanê jî evin: Mebesta Pak, Peyva Pak û Karê Pak.

Ew cihana, ya ku Canê Pak ji bona nava wê tête bikevtin, Buhuşt-Enehwehîşt jê re tête bigotin.

Canê, yê ku ew bi Gunehkar ve tête biderkevtin, ew ji bona nava Cîhana Derd û Azarê ango Dujehê tête binardin.

Di navbera buhuştê û dujehê de cîgehekî navcî tête bidin, ku navê wî bi Hemestekan tête binavkirin[357] û ew bi Cîgehê wan Canan ve tête biderkevtin, yên ku karên wanî Baş û Bed bi mînahev ve têtin biderkevtin.

Li wêderê de divên ew çavdêrîya Roja Dawî bidin bikirin. Nêzîka hatina Roja Dawî Evesta li ser Merovekî dide biaxivtin, ku navê wî bi

[357]Li nik Musulmanan de beramber pê El-Araf tête bidîtin. (Mohemed Ewni-M. E.).

Institut kurde de Paris

navê Saoşyan dide binavkirin, yê ku ew bi Rizgarvanê Cîhanê ve tête biderkevtin. Ew tevaya Canan dide bizznîkirin û ew dest bi dadwerkirina dawî ve dide bikirin.

Di dawîya vê de Bahoza Toza Gule tête birabûn û ruwê erdê dide bigirtin.

Di wê dem û hingavê de ceng û şer di navbera Hormuz û Ehrîmen de dide bidestpêkirin û Hormuz bi carekê ve tête biserbikevtin.

Ji bona rizgarbûnê li dawîya mirinê de û ji bona ku her kes li gora karîna xwe de yarîya Hormuz bide bikirin, divê ku her kes li sê tiştan de neyête biderkevtin: Mebesta Pak, Peyva Pak û Karê Pak. (Îrana Kevnar, r. 252-258)[358].

Yekek li Bingehên Oldarîya Zeradeştî de eve ye, ku karê herî başî Merov bi Çandinîyê û pêgihandina Aburî ve tête biderkevtin; Jibervêjî Zeradeşt Rojîgirtin ji bona Coktkaran ber lê dida bigirtin; da ku ew bi bê hêz ve neyêtin bikirin.

Di Oldarîya Zeradeştîyê de Av, Ba, Agir û Xak bi Çar Perçeyên Perest û Pak ve têtin biderkevtin û nedibû, ku ew bihatana bipîskirin. Jibervêjî Agir bi nîşana Zerdeştî ve dihate biderkevtin û pîskirina Ava herikandî û Veşartina Miriyan li Xakê de dihate biqedexekirin.

Li gora bawermendên vê oldarîya hanê de Zeradeşt Pêxember bû û Xwedê ligel wî de dihate bipeyivandin û jêre Pêzanîn dida binardin. (Nivîsta Destpêkirina Musulmantîyê).

Karmendên ayînî li pêş derkevtina Zeradeşt de serdarî û desthilatîyeke wanî zor gewre dihate bipeydakirin. Hîç Neferekî Arî jî wehajî tanî li pêş cihêbûna Hindî û Îranî jî de nidikarû bi bê alîkarîya Mex-Magus gorîyekê ji bona Perestê xwe bide biserbirin.

---

[358] Bi zimanê Evesta ev Sê tişte bi Homete, Howexte û Howerşte têtin binavkirin.

Institut kurde de Paris

Mex bi nimûna Hiş û Sewda ve û bi Peyamberê Yekaneyî Perest ve dihate bidanîn. Weha tête biderektin, ku li zemanê Daryosê Gewre de bawermendî û ayîna pêş Zerdeştîyê bi carekê ve li nav de hatibî biçûyîn û oldarîya Zerdeştîyê bi oldarîya Mîrîyî Îranê ve hatibû bikirin .(Mêjûwa Kevnara Rojhilata Nêzîk, r. 557)[359].

Derbarê bi bawermendîya Miletê Med ve agehdarîyên bi carekê ve li nik me de nayêtin bidîtin. Hinek ji Karnasan dibêjin:

Renge, ku wan ayîna Hormuz diperestin û Mexan Canbazî û Evsanên zor têkelî nava wî dane bikirin û Zerdeşt, yê ku ew Xelkê Med bû, xwest, ku ew di nava wî de hin veguhertinan bide bikirin, Belam Mexan nehişt. Li ser vêjî de Zerdeşt dev ji welatê xwe date biberdan û ew ji bona welatê Baxter hate biçûyîn.

Belam di dawîya vê de ku Zerdeşt hate biserkevtin û ayîna wî di pêla dewleta Axemen de bi carekê ve hate bibelavkirin û ew bi ayîna Giştî ve hate bikirin. Serûştî bû, ku Miletê Med û Miletên Merovên wan û Dirawsên Kurdistanê jî ji vê kêra hanê nrhatin biqotarkirin û ew jî ji bona nava vê ayîna hanê hatin bikevtin.

Weha tête bidiyarkirin, Ku ayîna (Manî) û (Mezdek) kêr li Kurdistanê de nedane bikirin. Xelkên van welatan tanî derketina musulmantîyê li ser ayîna Zerdeştîyê de hatibûn bimayîn. Ligel vêjî de lêkolandinên hin Lêkolvanan weha didin binîşandan, ku hin bawermendîyên zor kevnar (weku Putperestî, Rojperestî, Derextperestî) jî demeke zor dirêj jî li Kurdistanê de hatine bimayîn.

Weha tête bidiyarkirin, ku Dînê Îsa jî li Kurdistanê de ewende nehate biserketin. Misyo Hofman di nivîsta xwe de dibêje, ku Marmariyên Orfa li Şahgerd de di navbera Hewlêr û Dakoka de dihatin biderkevtin û li sedsalê sêyemînî zayînê de hatin bifilekirin.

---

[359] mêjûwa Îrana Kevnar dibêje: di Dewra dewleta Exmen-Kiyani de Oldarîya Zerdeştî hêşta bi pileyekî weha nehatibû vegihatiştin, ku ew bi Oldarîya Mîrî bête bidanîn (R. 123).

Institut kurde de Paris

Li Pêş de Xelkên vî welatê hanê bi xwe û Qeralê xwe ve hemû Derextperest bûn wan Gorî ji bona Putê ji Sifirçêkirî didan bipêşkeşkirin.

Îşoyab navê Qeşeyekî li nêzîkî Semanîn de li nêzîkî Cezîra Ibin Umer bû. Li wî Cîgehî de wî dêrek dabû biavakiri, li yê ku Kurdên Kevnar de têde serên Gorîyên xwe didatin bibirin. Li gora bîr û bawerîyên Rojhilatnas Hofman de ew Kurdên hanê li ser destên Marsaba de hatin bifilekirin û ew berê bi Rojperest ve dihatin biderkevtin.

Li gora goyên vî Qeşê hanê de, ew Kurdên ku hatin bifilekirin, zor kêm bûn. Belam Mesudî dibêje, ku hemû Yaqobî û Filên Corkanên (belavbûyî di navbera Musil û Çiyayê Cudî de) bi Kurd ve têtin biderkevtin [360].

Weha Sêr Mark Sayks dibêje,
ku Kurd oldarîya Îsa ji xwe re nedane biwergirtin. (Dawîya Şopên Xelafa, r. 48). Li layekîtir de ew di lîsta xwe de û li nava Eşîrên Kurd de hinek Eşîran Nîv Musulman û File û yanjî Nîv Yezîdî û File dide binîşandan. (Çavîya Pêşî, Lîsta Eşîrên Kurd. Renge, A).

Miletê Kurd li dawî de ew hatîye bisulmankirin. Tanî demekê jî bi tewawî ve ew ligel de bi rêk ve nedihat biderkevtin. Bi dilbijandin û kêra hin ji Xwîngermên ayîna pêşî de car caran wan beramberî musulmantîyê serên xwe didan bihildan û ew jî ji bona nava şer û hera Taifa Xaricî dihatin bikevtin.
Belam di dawî de, ku ew baş têde bigehiştin û bizanîn, ku ew Dînekî zor pîroze û serûştî ye, bi hemû dildarîya xwe ve xwe pê girtin û ji hemû Miletên tir bêtir bi rastî û dilsozî ve li ser de çûn. Wan bi hemû hêz û hinera xwe ve liberdan û kar jêre dane bikirin.

Tevî ku Şêrefname dibêje, ku Miletê Kurd hemû li ser Rêça Şafiîne. Olya Çelebî jî piştа vê bîr û bawerîya hanê dide bigirtin.

[360]Li gora Mucem El-Buldan de ew Nivşekî Kurdin û ew li dorhêla Helwan dijîn.

Institut kurde de Paris

Belam nayête binayînîkirin, ku beşekî baş çi li hundurê Turkî de û yanjî li Îranê de Rêça Caferî jî ji xwe re dane biwergirtin û ew li ser de dirin û hinek ji Tîrên wanîyî Xwîngermî Ehlê Heq, Alî Ilahî di nava wan de hatin bipeydakirin. Hin Kurdên din jî li Wilayeta Musil û Rusya jî de ji xwe re bawermendîyeke tir dane biwergirtin, ku ji wan re Yezîdî dibêjin.

Bi vê lihevhatinê de em tozekî li ser Bawermendîya Alî Îlahî û Yezîdî de bidin biaxivitin, ev bi xwe jî ji qazancê bi vala ve nayête biderkevtin.

## Bawermendîya Elî Îlahî

Xelkên Kurdistana Rojhilat li Rojavayî Herat de li pêş musulmantîyê de hin ji bawermendîyên wanî pirî seyrî seyr hebûn. Li dawîya vê de, ku ew Musulman bûn, dîsan jî wan dev ji vê bawermendîya xwe bernedan, belkî bi kêm û zorî veguhertinê ve ew dane bihiştin.

Xelkên Arnîl û yanjî Rimal, yên ku ew li Kuristana Rojhilat de bûn, b awermendîya wan bi veguheztina Canan hebû û ew Roj perestbûn.

Li dawîya ku ew bi Sulmanbûn, wan bi Xwedanîya Qencê Elî didane bibawerkirin. Wan xwestin, ku ew bi vî ·rengî ve bawermendîya xweyî pêşî bidin bivegerandin. Ev Perestvanên Qencên Elî dibêjin:
"Li gora vê de ku Qencê Cibrîl li Wêneyê (Dehiyet El-Kelbi) de hatîye biderkevtin, wehajî derkevtina Can li rengê laş de dikare bête bidîtin. Heger ku evaya weha bû, Xwedanê Gewreyî Mezin jî dikare xwe di laşekî de bide biderxistin. Bi vê dîtina hanê Xwedanê Pîroz û Berz, da ku ew qencîyekê li ser merovanîyê de bide bikirin, xwe di Laşê Pîrozê Qencê Alî de date bidîtin".

Weha ev Nezanên hanê û bê Mejî di wê bîr û baweryê de ne, Ku Qencê Pêxember jî, (Xwedê lê dilşad be), ji bal Elî ve hatîye bikarmendîkirin.

Di nava vê Tîra hanê de Kerkî bi navê Ehemd ve dayite bigotin: ku ev Qurana nihayî, ya ku ew niha di nava destan de têtê biderkivtin, tu pişt pê nayête bigirêdan; jiber ku ew bi Quran ve nayête biderkevtin, ya ku ew ji bal Qencê Elî de ji bona Pêxember, (Xwedê lê dilşad be), dayite binardin, ew Quran hatîye bisûtandin û ev Qurana niha di nava destên Xelkê de ew ji bal Qencên Ebu Bekir, Umer û Osman de, (Xwedê li wan dilşad be), hatîye birêkûpêkxistin.

Bi kurtî ve li babetî Qurana berzî bilind de wan pir rengên derew û delese dane birêkxistin. Bi vî rengî ve wan Xelk ji Quranê dane bitefirandin û her Quranek bi destên wan ve hatîye bikevtin, wan ew daye bişewitandin.

Ev bawermendîya hanêyî çewt di pêşî de ji evîna Xelkên Malbatê ve-Ehl El-Beyt ve- hatîye bidestpêkirin. Bere bere ew bi ser Xwedanîya Qencê Elî ve hatîye bikevtin. Ew li ser van jî de ne mane û ew bi ser bawermendîya xweyî kevnar de (Rojperestî) hatine bivegerandin.

Bi rastî ve ev Bawermendên çewt lê wê bîr û baweryê de ne, ku Qencê Elî berz bûye û ew ji bona nava Rojê çûye. Li dawêya vê de, ku mebesta wan Tefirderan hate bicîhatin û encam bi ser (Rojperestyê) de hat bicihkirin, Ayîna vê bawermendîya kevnarî wan hate bijîyandin û wan navê xwe datin biguhertin û ew ji bona nava musulmantîyê dane bixistin[361].

Bi boxtanekê ve wan Xelk li xwarina goşt de dane biqedexekirin. Wan Xelk bi xwarina goştê Hogerên Qencên Ebu Bekir, Umer û Osaman, (Xwedê li wan de dilşad be), dane bidilbijandîkirin û ew vê

---

[361]Xwedîyê nivîsta Dibustan El-Mezab bi Farisî di mêjûwa Oldarî û Rêçan de dibêje: "bawerîya wan evaya ye, bê Cawa Canê Elîyê Xwedan bi Rojê gihişt. Ew niha Roje. Roj jî di pêşî de Çend Rojan bi hin Perçên din dihate bigewdekirin. Jibervêjî dibêjin, ku Roj bi Fermana wî tête bilivandin. Ew Çavê Rojê ye. Ji Rojê re ew Eli Xwedan dibêjin û ji Felka Çar re dudul dibêjin. Ew Rojperestin û ew dibêjin, ku Roj bi xwe ew Xwedanê Bilind bi xwe ye".

Institut kurde de Paris

bawermendîya xweyî genîyî hanê jî bi Quranê ve lê didin bipiştgirtin[362].

Bawermendîya vê Tîra hanê nebes tenê rêzanên rabûn û rûniştinê, herwahajî şêweyê perestkirina wêyî taybetî jî hene.

Di navbera bîr û bawerîyên Elî Ilahîyên Rûniştvanên alîyên Îran û Turkî de û van Rojperestan de tu wekhevbûn nayête bidîtin.

Mêcer (Rawilson) di gotara xwe de di bin nav û nîşana Ji Zehab tanî Xozistan de dibêje, gava ku ew li ser Bawermendên vê ayînê de ji Eşîrên Kulher û Goran dide biaxivtin: hinek ji beşên Eşîrên Kulher, Goran û Eşîrên Dorhêlên wan di vê yyîna hanê de ^tetin biderkevtin, ya ku di nava wê de hinek ji oldarîya Cihutîyê[363], hinek ji Sebeîyê û filetîyê têde tête bidîtin.

Baba Yadgarê veşartî li Derbendê Zerde de li herema Zuhab de bi Welîbûnê û Perestîyê ve hate binavûdengkirin, mîna bi nav û dengbûna Xidir Zende ango Seyiduna Xidir (li ser silav be) bi Welîbûnê û Pêşzanîbûnê ve di pêla Vekirinên musulmantîyê de dihate bidîtin.

Institut kurde de Paris

[362]Kanîya Pêşî "Li nik wan de kuştina Çandaran neraste û Goştxwarin neduruste; jiber Elî gotîye: Zikên xwe ji bona Caneweran bi Goristan nekin. Înca der Quranê de Kuştina hin Caneweran û xwarina Goştên wan mebest jê Goştê Ebu Bekir, Umer, Osman û Hevalbendên wanin. Ew ji hemû Muheremat re dibêjin, ku ew ji kar û barên van Hersê Neferanin. Ew dibêjin, ku Şeytan, Mar û Tawus ew bi xwe ev Hersê kesên hanin. Ew bi xwejî Şedad, Nemrud û Feronin. Ji bona Wênê Elîyê Xwedan Serên xwe dikarin bidin bitewandin. Putşikenandin û Putperestkirin ew bi xwe nîşana wan Hersê kesan bi xwe ye ...".
Ew Goştê Candar naxun û ev ji Oldarîya kevnaıî Hindî hatîye biwergirtin. Belam xwarina Goştê Merovan, Musulmanan û dilbijandina pê ji bil li nik Yam Yamê Efrîqya de pêve li hîç Cîhekî din de niye.

[363]Rawilson dibêje: "Di navbera Kala û Kulher de pêwendîyeke pir xurt tête bidîtin. Bi xwe jî Kulher vedibêjin, ku ew ji mêjî kevnar de li vê herema hanê de dijîn û ew ji Tuxmê Rehamin, yê ku ew bi xwe jî Buxtenesir bi xwe ye. Ev Buxtenesirê Vekirvanê dewleta Cuhû ye, ya ku ew pir bi nav û bang bû. Di nava van Kulheran de pir navên cihûyî xurû têtin bidîtin". Bi rastî jî gerjî cihê Sorgonkirina Cuhûwan ev herema hanê be. Jibervêjî nedûre, ku evaya bi hoyekî pir xurt bête bidîtin, bê çima weha pir ji Bawermendîyên cihûtîyê xwe ji bona nava Bawermendîyên Xelkên cih hatine bikevtin.

Li gora bawermendîya Elî Îlahî de "ku Canê Xwedê li dûhev de di Laşên hin Merovên nala (Binyamîn, Musa, Ilyas, Dawid, Îsa, Elî û Şûngirên wî, Selmanê Farisî, Îmam Hisên û Heft Ten din)[364] de hatîye bikevtin. Ev Merovên hanê bi xwe ve Canên Xwedayê didin bigewdekirin. Heft Ten ew bi xwe ve Şêxên di destpêka musulmantîyê de di nava Kurdistanê de bi perestî û qencîtîya xwe ve pir bi nav û dengbûn. Şêx (Baba Yadgar) jî ew bi xwe jî ve yekek ji wan Heft Tenan bû. Herwehajî (Binyamîn, Dawid û Elî) jî ew ji Canên Xwedêyî Gewdekirî bûn û Cîgehekî wanîyê taybetî hebû."

Weha di nava van de tête bidîtin, ku Binyamîn ji Cuhê Todîla-Tuleytila ji Sipanya bû. Ew li nik Cuhan de perest bû. Wehajî ew li nik van Eşîrên hanê jî de perestbû. Renge, ku Rêça Binyamînî Ayînî di pêla wî de weha bi vî rengî ve ne tevlihev û dijîhev bû.

Ne pir dûre, ku Çiyayê Heftûn, yê ku Pêxember Binyamîn li ser wî de li Sîna Gogoze Pêxemberîya xwe daye biwergirtin, ew bi xwe ve bi Çiyayê Zagrosê ve dibe bête biderkevtin. Wehajî netuwane bête binayînîkirin, ku Heft Tenên Elî Ilahîyan jî ne ji Heftûnên Binyamîn hatine biwergirtin, yê ku ew bi xwe ve pê tête birûniştin, ku wî bi çavên xwe (50. 000) malên Cuhûyî daniştî di vê herema hanê de dane bidîtin. Wehajî Çîroka Dawidî bi nav û deng ve li bajarê Helwanê de hatîye birûdan. Wisajî di navbera navê Helwan û cihê Sorgonkirina Hala Cuhayî bi nav û deng de ev lihevhatina xurt nayête biveşartin.

Rojhilatnas di gotara xwe de ji Zehaw tanî Xuzistanê li ser bawermendîya Lorê Bizurg ango Bextiyarî de dibêje:

Ew Merovên Musulmanên hanê di bawermendîya xwe de pir sadene û ew di ayîna xwe de pir lawazin. Hîç agehdarîyeke wan li ser bawermendîya Elî Îlahî de niye û ew hîç rêzlêgirtinê lê nadin bigirtin.

---

[364]Li gora bawerîya Insiklopêdîya musulmantîyê de Peyva Heft Ten ji bona Heft Lawên Sultan Ishaqê bi nav û bangê Danerê Rêça Ehil-Elheq tête gotin. Sultan Ishaq û herwehajî Zarokên wî ew xwedan Çar Melaîket-Fereşt bûn, ku navên wan Ferştan Binyamîn, Dawid, Mustefa Dawdan û Pîr Musa bûn. Goristana Ishaq li kenarê rastêyî Çemê Diyala li herema Hewremanî Lohom de tête bikevtin. (bergê 4).

Belam Lorê Biçûk bawermendîyên wan pir tevlihev û nediyarin. Ew pir nala bawermendîya Elî Îlahî ye û hîç pêwendî û guhpêdaneke wanî gewre bi musulmantîyê ve nayête bidîtinn. Li nik wan de kevintirîn û gewretirin Merov Welîyê bi navê Baba Bizurg ve têtê binavkirin. Wehajî li nik wan jî de ji vî pêve pir Welî hene, ku ew wan bi Wêner û Cîgirên Xwedanê Hebûnan didin bidanîn. Ew wan didin biperestkirin û ew ji bona wan serên xwe didin bitewandin û biserberjêrkirin.

Pêrabûnên wanî ayînîyî pir sêr hene. Tevlivêjî hîç gûman têde niye, ku ew di pirbûna bîr û bawerîyên xwe de û di zîneta xwe de bi musulmantîyê ve têtin bigirêdan. Weha Mistir Makdonêld Kênz agehdarîyên pir bi nerx ve li ser Govendên Şevan de dide bigotin, yên ku ji wan re Mûm kişandin dibêjin. Ez gûman nakim, ku niha di nava wan Merovan de dê mîna wan reweşt û govendan bêtin bidîtin.

Belê! Ev Êvarên hanê tanî nîvê sedsalê heştdehemîn hatibûn bimayîn. Ev semawend û şahîyên êvaran hawayê semawend û şahîyên Mîsra û Enaîtîs di heyamên kevnar de dihatin bidîtin.

## Bawermendîya Yezîdî

Xwedîyê nivîsta mêjûwa Musilî dibêje, ku hoyê navê Xwedîyên vê bawermendîya hanê bi Yezîdî bûye; jiber ku ew bi Xwedanekî bi navê Yezd yanjî Yezadan didin bibawerkirin.

Lihevhatina navê Yezîdî ligel Yezîd Ibin Selma û yanjî Yezîdê Xelifê Emewî de, mîna ku hinek ji Danervan dibêjin, ev pir ji hiş û rastîyê bi dûre ve têtê biderkevtin.

Li layekîtir de Mêjûvanê Yunanî Tiyofanês, yê ku ew li sedsalê heftemînî zayînê jî de dibêjê, ku Imperator Hiraklês li nêzîka bajarê Yezdem de ordugahê xwe date bidamezirandin.

Institut kurde de Paris

Li gora bîr û bawerîya Mêcer Rawilson de renge. ku ev Şarê Yezdem li nêzîka Hudyab -Musilê[365] de be û renge, ku Rêça Yezîdî ji vî bajarê hanê hatibe bibelavkirin.

Ew beşên Kurdên ku li vê bawermendîya hanê de ne, ew li alîyên Heleb, Wan û Erzeromê de ne û beşê herî zor ji wan li welatê Musilê de, li Sincar-Şingalê û melbenda Şêxan de têtin bijîyandin. Serjimara wan nêzîka 300. 000 kes tête biderkevtin .(Mêjûwa Musil)[366].

Hineke din jî dibêjin, ku li Çiyayê Qefqasya, li Qeraxa derya Qezwînê, li Çiyayê Altay, li Kamşatka û li Çinê jî de Yezîdî têtin bipeydakirin, belam navên wan rengekîtirin.

Bingehê vê oldarîya Yezîdî bi ayîna Manî ve tête biderkevtin. Hinek jî dibêjin, ku ew ji bona ser oldarîya Zerdeşt diçe, jiber ku ew bi hebûna du Xwedanan din bibawerkirin.

Li gora bawermendîya van de dîvê Roj û Şeytan bêtin biperestkirin û mîna ku çilo jî li oldarîya Zerdeştî de bawerî bi Xwedanê Qencîyê Hormuz û bi Xwedanê Şer Ehrîmen tête bikirin.

Yezîdîjî bawerîya wan bi Xwedanê Qencîyê ve tête bikirin, ku ew bi dawîya Dilovanîyê ve tête biderkevtin û ew bi Bilindtirînî hemû ve tête biderkevtin.

Bawerîya wan bi Şeytan ve tête biderkevtin, ku ew bi kirdarê Şer û Zîyan ve tête biderkevtinû ew li tirsa Şerê wî de lê didin birêzgirtin û biperestkirin. Lêbuhurandina wan jî eveye, ku Xwedayê Bilind ligel Afirdanan de Mehrevanî û Dilovanîyeke wînayî bê dawî tête bidîtin, çunke ku ew Qence, ew zîyan û şer bi Merov ve nade bigihandin.

[365] Weha di kokê de hatîye. Musil bi navê Hedba û ne bi navê Hedîdab tête binavkirin. (M. E.).

[366]Gervana Ingilîzî Xanima Rozina Forês di gotara xwe de dibêje, ku serjimara Yezîdîyan berî cenga Cîhanî Yekem Çaryek Melyon dihate biderkevtin. Belam êsta, renge, ew 60000 bêtin biderkevtin. Rojnama Siyaseta Mesrî 16 Febrayera sala 1930).

Institut kurde de Paris

Belam Şeytan bi serûştî ve bi Şerfroş û Zîyandar ve tête biderkevtin; jibervêjî heger ku Merov bi vê bi xweşî û dilxweş jî ve bêtin bijîyandin, divê ku ew perestîya Xwedanê Qenc devjê bide biberdan, çunke Şer û Zîyan jê nayêtin biderkevtin, divê ku ew dildarîya Şeytan ji xwe re bide bikişandin, tanî ku ew tûşî ezyetê neyêtin bikirin. Çunge ew bi xwe ve têtе biderkevtin, yê ku ew Merov tûşî şer dide bikirin û yanjî ew wî dide biparastin.

Bi navê Melekekî Gewre û bi hiner ve, lêbelêjî ji Bingehî Xêrê bezandî ew ji bona Şeytan didin biperestkirin. Ev Bingehê Xêrê hezar salî serdarîyê dide bikirin û dawîya vê serdarîya hanê sînor jêre nayête biderkevtin. Di dawîya vê demê de di navbera Xwedanê Xêr û Xwedanê Şer de şer tête bivêkevtin. Xwedanê Şer yan bi serdikeve û yanjî ew tête bineçarîkirin, ku ew ligel Xwedanê Xêrê bête bihajkirin. Di nava van herdu zînetan de Lêpêçûyên wî qazanceke gewre ji xwe re didin biwergirtin.

Ji bona van Xelkên hanê Gewreyekî wan tête biderkevtin, ku ji wî re Mîrê Şêxan dibêjin û ew li Şêxan tête bidaniştin û deshilatîyeke wîyî zor gewre bi ser hemû Xelkên wî ve tête biderkevtin. Li ber destên wî de Mîrên Biçûk ji têtin bipeydakirin, yên ku ew ji bona kirin û nekirinê didin bipêragiyandin.

Serokê wanî oldarîyî herî Gewre Baba Şêx jêre dibêjin û hin Şêxên din jî li ber destên wî de têtin bipeydakirin, ku ew ji bona pêragiyandina kirin û nekirinên Oldarî têtin birabûn. Her Baba Şêx bi tenha xwe ve dikare Fetwa ji bona sinorkirina Rojî û Limêjê-Nimêjê bide bidan û ji bo nîşankirina Heram û Helal jî bide bidan. Ev herdu cihên Gewreyî hanê Şûnî ve têtin biderkevtin û ew ji bav ji bona Kur têtin bihiştin.

Bigir bawermendîya wan bi hemû oldarîyekê ve tête biderkevtin. Ew bi rastîya ayîna Manî ve didin bigotin.

Ji bona Rojê ew Ga didin bigorîkirin. Kuştina Balinde û Cenawerên tir û birîna Darên Dola Pîroz li layên wan de bi guneh ve têtin biderkevtin. Di gava Hilatin û Avabûna Rojê de ew serjêr dibin.

Institut kurde de Paris

Jindan û Jinhînanin ji Xwedîyên ayînên tir li layên wan de bi gunehekî gewre ve tête biderkevtin. Ji xwe bi xwe û ji ayînvanên xwe ve pêve ji kesekîtir ew Bira nabêjin. Ew ji bêgane re Xwedî dibêjin. (Gotara Mis Rozîta Foris).

Hin reweştên wanî sêr têtin bidîtin. Rikê wan li rengê Şîne de û zor jî rikê wan li Kaho têtê biderkevtin. Ew xwe jí peyvîna tipên (Ş) û (T) didin bidûrkirin. Li layê wan de barkirina mahîn û hesp bi durust ve nayête biderkevtin. Her kesekî li van rabûn û rûniştinan de bête biderkevtin, ew xwe tûşî siza dike.

Rojên Cejin û Serdanên wan zorin, ji bona nimûne, hemû Çarşemên pêşîyî Nîsana Romî ew bi def û zurnan ji bona ser Goristanan diçin.

Li wê derê de ew dixun, vedixun û vexewdikin û ew nan ji bona ser Perîşanan didin biparvekirin. Wehajî li Roja duwemî pêncşembê de di her mehê jî de ew li Başîqê de ji bona Serdana Goristana Şêx Muhemd komdibin. Roja Înê li Başîqê de dîsan ji bona semawendîkirinê ew girdibin. Di Îna duwemî her mehê de dîsan ji bona Govend û Dîlanê ew li gundê Derawîş de li layê Goristana Hesen Ferdoş de komdibin. Di Îna Sêyemîn de di her mehê de bi def û zurnan ve ew Serdana Goristana Şêx Bekir dikin. Di salê de ew sê rojan rojî digrin.

Yezîdî ji bona Putekî li rengê balinde de jê re serjêr dibin, yê ku ew jê re Melek Tawûs[367] dibêjin.

Li layê wan de weha ye, ku ev Xwedanê hanê li pêş hemû Afirdaran de hebû. Ew li hemû cîgehekî de têtê bidîtin û ew Peyên xwe ji bona hemû layekî dide binardin, tanî ku di navbera Windabûnê û Bawermendîyê de ji hev bête bicudakirin.

[367]Gotina Tawus di koka xwe de Yunanî ye û ew ji Gotina Yunanîyî Sîos bi têgihiştina Xwedan tête liberkitin. Filan ev Gotina hanê ji Roman wergirtin û wan li Nivîstok û Bangên xwe de didan bikaranîn, tanî ku Gotina Tawus di cihê Gotina Xwedan de didan bikaranîn. Desteyê Yezîdî jî ji wan fêrbûn û navê Pûtê xwe bi Tawus dane binavkirin.

Bawermendîya wan bi biveguhestina **Canan** ve tête biderkevtin û jibervêjî ew di wê bîr û bawermendîyê de ne, ku Serokên wan di hemû heyamekî de hebûn.

Ew Şêx Edî[368] ligel Melek Tawûs de bi yek ve didin bidanîn. Ew bawer bi hebûna dujeh Şeytanan nakin.

Li layê wan de weha ye, ku Canên Bed mîna Nexweşî, Mirina Reş, Giranî, Mirin û Belên Serûştîyê ne.

Ji nivîstên oldarîyî wan nivîsta El-Celwe tête biderkevtin, ya ku ew ji bal Şêx Edî de hatîye binivîsandin. Ew li ser bingehên Yezîdîyî kevnar de dide biaxivtin[369]. Li dû vê de Mishefa Reş tête bidîtin, ya ku ew di sala 743 k.-1342 z. de hatîye binivîsandin û ew li ser reweşt û rewendên oldarîyî de li nik Yezîdîyên wê demê de dide biaxivtin[370].

## 3. Ziman

Derbarê zemanê Miletên Zagros de di derîyê duwem û sêyem de me çend peyv dane bikirin. Li gora lêkolandin û remana Dr. Sipayzer

Institut kurde de Paris

[368]Du Şêx Edi hene. Yekek ji gundekî nêzîkî Balebek ji bona nava Çiyayê Hekarê hatîye. Wi li wêderê de Koşek date pêkanîn û zor Xelek li dora wî de hatin civandin. Ew di sala 555 k. 1160 z. de mir. Di dawîya Şêx Edi Kurê Musafirê Emewî de Birazyê wî Ebu El-Berekat Ibin Sexir Ibin Musafir cihê wî wergirt û ew pir bi deng û nav bû. Li duwayî vî de Ebu El-Mefaxir Edi Ibin Ebu El-Berekatê Kurê wî hat, yê ku ew li Hekarê de ji Dêya xwe bûye. Renge, ku ev Merovê han be, yê ku wî Dêra dora xwe zeftkir û li ser vê jî Mîrê Megolî-Mexolî Bato di sala 620 k.- 1223 z. de ew date kuştin. Lêbelê Keşê Nestorî Ramîşo di nivîsta xwe de di sala 856 k.- 1452 z. de Misyo No dibêjin, ku Şêx Edi ji alî Milîbûna xwe de ew Kurd bû û ew ji alîyê Oldarîya xwe de Tîrahî-Zerdeştî- bû. (Ji xwe re li mêjûwa Musilê de bide temaşekirin).

[369] Di pêşgotina vê Nivîstokê de hatîye: "Ewê bû û Ewê bibe ezim û di Roja Dawî de ez bi ser hemû dunyayê de zalim. Bes û bi tenha Kar û barên Perestên min bi min ve têtin girdên".

[370]Ev nivîsta Reş bi rengekî giştî li ser koka hemû Afirandinan dide biaxivtin û bi taybetî li ser koka Yezîdî dide biaxivtin.

de tête bidîtin, ku herçar ji Miletên Zargosê Lollo, Gotî, Kasay, Sobari û yanjî Hori her yekek ji wan xwedan zimanekî bû.

Bi zikmakî ve hin ji navên van zimanan nêzîkî yektir bûn. Hin ji Rojhilatnasan dibêjin, ku zimanê van çar Miletan ji koma zimanê Arî bû. Belam Hinekîtir ji wan dibêjin, zor renge, ku zimanê Miletên Zagrosî kevnar bi zimanên Qefqasî ve pê têtin bigirêdan.

Bi kurtî ve şopên dozandî tanî êsta ji bona çarekirina vê pirsiyarîya hanê nedane bitêrkirin û ew hêjî kêmî belgeyên taze ne.

Li layekîtir jî ve kes nizane, bê ka zimanê Arîyî kevnar çi reng zimanek bû. Hoyê vê jî bi destneketina şopekî ye, ya ku ew bi zimanê Arîyî zor kevnar hatibe binivîsandin. Renge, ji vê û latir jî ew şopa hanê nehatîye bidestkevtin; çûnke mêjûwa nivîsîn û xwendina Arî li gora nivîstên Perestî Hindî de li 1400 Pêş zayînê de bi Jortir naçin [371].

Debera em ji bona ser Qata duwemî Bavpîrên Kurd ango Med û Tîrên wî bên. Mexabin, ku derbarê zimanê Miletê Med jî de agehdarîyên têr nayêtin biderkevtin.

Rojhilatnas Darmîs Tister[372] daye bigotin, ku Avestayî Zerdeşt bi zimanê Med hatîye binivîsandin. Belam bi zimanê Med ve şopek tanî niha nehatîye bidozandin, ta ku ligel Avesta de bête beramberkirin û rastî bête bidiyarkirin[373].

Mêjûvanê Kevnar Strabon-Sitrabo[374] dibêje, ku Parsî û Madî-Medî li zimanê yektirî de dihatin bitêghiştin. Li gora vê de divê zimanê Med cihê û nêzîkî zimanê Parsî bû. (Îrana Kevnar[375].

---

[371]Vêdas nivîsta Hindîyî pereste. (M. E.).

[372]Xwedîyê nivîsta Xwendekarîyên Îranî.

[373]Ji xwe re li Hêrodut, Mûşîr El-Dewlede li ser Nûçeyên Dirêj, Şopên Kevnar de bidin temaşekirin. (M. E.).

[374]Strabo Karşinasekî-Karnasekî Çiyografîyî Yunanî bû, yê ku ew di pêşîya sedsalê Yekemî zayînê de mirî ye.

Institut kurde de Paris

Pirofêsor Says[376] dibêje, ku Med Eşîrên Kurdbûn û derbarê zimanê xwe de ew bi Hindo-Ewropî ve dihatin biderkevtin.

Mîr Alayi Wilson, yê ku wî Cîgerê Wênerê Bilind li Îraqê de di sala 1920 dida bigirtin, di nivîsta xweyî bi nerx ve dibêje: "Miletê Kurd xweser bi Nevîyên Mîdya ve têtin biderkevtin û zimanê wî jî yekek ji zimanên Asya Rojava tête biderkevtin". (B. 2, r. 127).

Ligelvêjî de renge, ku peyva Darmîs Tister ligel rastîyê de bête biderkevtin.

Li gora remana Karşinasan de divê Zerdeşt bi Xelkê Mîdya ve bête biderkevtin û Nivista Avesta bi zimanê xwe ango bi zimanê Madî dabe binivîsandin.

Ev bi xwe jî ve zor ligel hiş de tête bidekevtin. Xwedîyê Mêjûwa Îranî Kevnar dibêje:

"ji belgeyên nivîsandî di pêla Axmenî de û ji Xwendekarîya zimanê Parsîyî Kevnar weha tête biderkevtin, ku zimanê Parsîyî kevnar ji bona nivîsandinê û nivîsandina Fermanan hatîye bikaranîn û di peyvînê de zimanê Pehlevî û yanjî zimanekî nêzîkî Pehlevî hatîye bikaranîn. Zimanê Parsê Kevnar û zimanê Sensikrîtî (zimanê nivîstên Perestî Hindî) û zimanê Avesta (nivîsta Perestî Zerdeştî) ji zimanê hevbeşî Arî ve hatine peydabûn. Ev zimanê hevbeşî bi diyar ve nayête biderkevtin, bê ka ew çi reng zimane."

Ev Mêjûvanê hanê bi xwe jî ve derbarî ziman û xêza Pehlevî gelek agehdarîyên baş dide bidan û ew dibêje, li encamkirinê de weha tête biderkevtin, ku zimanê Pehlevî di dawîya pêla Axmenî de peyvîn pê hatîye bikirin û herwehajî di pêla Pars û Sasanî jî de bi zimanê peyvîn û axivtinê ve dihate biderkevtin.

[375]Renge, ku zimanê Farisî bi xwe ew Zaraveyekî Mîdî be û ew ne zimanekî bi serêxwe dihate bidîtin. Vê yekê tanî pêla Sasanî date bidirêjkirin. Wî hêdî hêdî cihê Pehlevî yanjî Mîdî ji xwe re date biwergirtin.

[376] Xwedîyê mêjûwa Mêjûvanê Cîhanê. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Li duwayî nemana Malbata Sasanî de demeketir jî zimanê Pehlevî li Îranê de û bi taybetî ve li Teberistanê jî date bikarhatin.

Şopeke herî kevnarî nivîsandî bi vî zimanê hanê li Feyum de li Misrê de hatîye bidozandin. Karşinasê vî ziman West-Wêst) dibêjê: "divê ev şopa hanê bi sedsalê duwemî Koçî ve bête bigirêdan".

Hemû nivîsandinên pêla Sasanî bi vî zimanê hanê ve hatine binivîsandin û bitomarkirin. Ev Karşinasê hanê jî bi xwe ve dibêje, ji bil Avesta pêve.ew nivîstên hanêyî, yên ku ew bi zimanê Pehlevî ve hatine binivîsandin, hemû li duwayî pêla Sasanî de hatine binivîsandin û ev nivîstên hanêjî sê rengin: Wergerandin û Liberxistina Avesta (82 Nivîst yanjî Name ne), beşê duwem nivîstên Ayînîne û beşem sêyem nivîstên ne Ayînîne[377].

Nivîsandina zimanê Pehlevî zor dujwar bû, çunke nêzîka hezar tîp û nîşanên wî hebûn û ew ji tîpên Aramî hatibûn biwergirtin. (ji bona dûr û dirêjîya vê lêkolînê xwendina Mêjûwa Îrana Kevnar başe).

Xwedîyê nivîsta zimanê Faris, Tîpên wan û Bawermendîyên wan derbarê zimanê Pehlevî û Zend de bi kurtî ve dibêje:

"Zimanê dozandî di Rojavayî Îranê de piştî Iskenderê Gewre zimanê Pehlevî bû. Peyva Pehlevî nîşana ser Berd û Polên Sasanî bû.

Li ser peyva pehlevî de pir xwendekarî hatine bikirin. Hinekan digotin, ku ew ji peyva Pehlo ve hatîye biderkevtin, ya ku ew nîşana zimanekî bû, yê ku ew li ser tixûb û sînoran de zal bû, jiber li wê derê de pir tuxum û ziman têtin bikelîhevkirin.

Institut kurde de Paris

---

[377]Navnîşana van nivîstanan bi rastî Merov bi ser vê remanê de dide bixistin, ku zor dibe, Pehlevî koka zimanê Kurdîyî Iro be. Jiber peyvên wî zor li peyvên Kurdî de dirin. Ji bona nimûne: nivîsta Dîn Kert di sedsalê Sêyemî Koçî de hatîye binivîsandin. Ew li ser Mêjû, Wêje, Yasa û Rêça Zerdeştî di axive. Renge, ku ew ligel Oldarîya Kurd zor pêwendîdarî hebe, belkî jî ew Oldarîya Kurd bi xwe be. nivîsta Dastanî Dînîk, ya ku ew di sedsalê Sêyemî Koçi de hatîye bitomarkirin, çima Dastanî Dînîk niye, ku ew bi carekê ve zimanê Kurmancîyî êsta ye.
Ev nivîsta Şîgend Gomanîk wê car ji bona liberxwedana Rêça Zerdeştî hatîye binivîsandin. Ew zor li zimanê Kurdîyî niha de dire.

Hinên din dibînin, ku ew ji peyva Pehlewan hatîye biderkevtin. Hinên din jî dibînin, ku ew nîşana li ser zimanê deverekê yanjî bajarekî tête biderkevtin.

Ferdewsî dibêje, ku Pehlewî-Pehlevî zimanê gundîyan-Dehqanan bi xwe ye.

Bi rastî jî Xelkên welatên Isfehan, Rê, Hemedan, Ezirbêcan, Nehawend ango Şahîya Mîdya Kevnar bi vî zimanê hanê didatin biaxivtin. Lêbelê jî kesekî ne ji Mêjûvanên Faris û Ereb dane bigotin, ku ev welatên hanê bi peyva pehlevî ve hatine binavkirin"[378].

Ji gotinên Katermer têtê biderkevtin, ku Mêjûvanên Yunanî welatê Pars (Eşkan) bi navê pehlevî dane binavkirin. Herwehajî Mêjûvanên Ermenî jî didatin bigotin, ku ev navê hanê nav û nîşana Şahên Eşkanî bû.

Bi rastî ve ew Parsên hanê di nava Miletên Rojhilatî kevnar de pir bi mêrxasî û gernasî ve bi nav û deng bûn. Zimanê Pehlevî tevaya welêt ber bi xwe ve dabû bivegirtin, tanî ku wî jî welatê Hindê jî didate bivegirtin.

Bi kurtî ve hin ji belgeyan didin biderxistin, ku Pehlevî zimanê Miletekî xurtî ji Miletên Arî bû. Divê heger li ser koka têgihiştina vê gotinê de di herdu peyvên Parsya û Parswa Yunanî û Romanî de bête bidîtin. Renge, ku The Parthoi di wan de bi Tîpa (H) ve hate biveguhertin û Tîpa (R) jê hate biderkirin û ew bi Pahuwabû, weku ku ew bi ser Mithra-Mîsra ve hate bikirin, ya ku ew di Avesta de hatîye binavkirin, gava ku ew ji bona zimanê Farisî hate biveguhestin, ew bi Meher bû.

Cewhera gotinê bi pirî ve dibe bête biderkevtin, ku ev zimanê Pehlevî dibe, ku ew zimanê Miletê Aşkanî be, yê ku wî bêtir ji pênc sedslan şer legel Romanan de daye bikirin û pir caran jî wî zora wan daye bibirin.

[378]Ji xwe re Ibin Xerdazebe de di El-Mesalik û El-Memalik, R. 57 û li Elmeqdesi di Ehsen El-Teqasim, bergê 2, R. 384 bide temaşekirin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Ibin Hewqel di pesindana xwe de ji bona Îrana Kevnar de dibêje: "Li Îranê de sê ziman hebûn:

1. Zimanê Farisî, yê ku pê tevaya Xelkên Îranê dihatin biaxivtin.

2. Zimanê Pehlevî, yê ku ew di mêj de zimanê Îranîyî giştî bû; niha Axundeyên ayînîyî Megos rûdanên mêjûyî pê didin bitomarkirin. kesek ji Xelkê pê nayête biliberketin, heger ku ew ji bona zimanê giştî neyête biwergerandin.

3. Zimanê Erebî, yê ku ew ji bona nivîsandina belge û dan û sitendinên Mîrî tête bikaranîn."

Şopên kevnarî di pêla Ferdewsî de (di sedsalê dehemî zayînê de) û bi taybetî ve tevaya şopên Sasanîyî dozandî hemû bi zimanê Pehlevî hatibûn binivîsandin. Hîç gûman têde niye, ku ew di pêlên herçar Malbatên Şahên Îranî de dihate bikaranin û ew bi taybetî ve di pêla Sasanîyan de bi zimanê wêje û tomarkirinê ve dihate biderkevtin.

Weha di nava zimanê Pehlevîyî nivîsandî de pir ji gotinên Samî têtin bidîtin, yên ku ew pir ji gotinên Erebîyî nihayî di nava zimanê Farisîyî taze de têtin bicudakirin. Sêyr eve ye, ku gotinên Erebîyî heyî di nava Pehlevî de ew mîna di zimanê Erebî de nayên bipeyivandin; lê wergerandina wanî di zimanê wanî Farisî de tête bipeyivandin. Weha li ser cenga di navbera Kostentînos û Şaporê duwem de di nivîsta Amanos Marsîlinos de peyva Melekan Melek bi nivîsandina Pehlevî hatîye bitomarkirin, ya ku ew ji bal Îranîyan Sa ensa an yanjî Şahinşahan tête bixwendin.

Li ser rengê vî zimanê hanê navê Keldo-Pehlevî lêdigirin. Wehajîhêjî bi servêdejî ve Îranîyan hin ji gotinên Erebî bi pêvekirinê ve yanjî bi jêvekirinê ve dane biveguhertin û ew ji bona zimanê xwe dane bimaldarîkirin. Ji bona nimûne, wan Eb-Ebîder, Pîder-Peder, wehajî Um-Emîder-Mader dane biveguhertin.

Institut kurde de Paris

Ibin El-Muqefe di sala 133 k.- 750 z. de dibêje, ku rengekî peyvîna Farisî heye, ku jêre Zawarîş têtе bigotin, ew bigir xwedanê hezar Gotinê ye. Ev rengê peyvînê, hêjî rastir, ev zaravayê hanê di peyvîn û axivtina xwe de ji rengê nivîsandina xwe têtе bicudakirin. Ji bona nimîne Lehma-Lehem têtе binivîsandin û ew Goşt têtе bixwendin. Weha têtе biderkevtin, ku Îranîyên sedsalên heştemînî zayînê de mîna Axundeyên Parsên Hindîyî niha ne ew bi zimanekî ve didin binivîsandin û ew bi zimanekî din didin bixwendin. Weha heger ku goteneke Samî di xwedina Pehlevî de ber bi wan ve hate bikevtin, ew bi baramberî wê ji zimanê Îranê didin bipeyivandin. Vê zîneta hanê weha ji xwe re date bidirêjkirin, tanî ku tîpên Erberî di nava welatê Îranê de hatin biwergirtin û bibelavkirin.

Weha ji bona wergerandina Avesta ji bona zimanê Pehlevî peya Zend têtе bigotin. Wehajî Pazend ji bona Zawarîş yanjî Hozwarîş têtе bigotin.

Şop û berên cudayê nivîsandî di pêla Erdeşêrê yekem û Şaporê yekem de 226-270 pêş zayînê de ew bi sê zimanan hatine binivîsandin û ew jî evin: Pehlevîyê Sasanî-Kildoyê Pehlevî-Yunanî.

Di vî warî de Cîyografîya Meltebron di gotara xweyê (55) de di derbarê nasîna Asya de dibêje:

"Zimanê herî kevnarî Arî Zend û Pehlevî ye. Zimanê Zend ji bona nivîstên Oldarîyî Îranîyî Kevnar de mîna Avesta hatîye bikaranîn.

Li Rojavayî Buxara û tanî Ezirbêcanê de hemû welatên Jorî Îranê bi vî zimanê hanê dane bixeberdan. Êstajî ew weku zimanekî oldarî li nik Megosan de têtе bikaranîn. Ji vêjî têtе biderkevtin, ku di nava van herdu zimanan de gelek rêzanên hevbeşî têtin bidîtin".

Belam zimanê Pehlevî û yanjî Pehlewan weha diyare, ku ew li Îraqa Ecem de, li Mîdya Gewre de û li welatê Faris de pê hatîye biaxivtin.

Institut kurde de Paris

Hinekan gotîye, ku ev zimanê hanê li Eywan û Serayên Şahinşahên Nevîyên Qîros-Koroş-Keyxosruwê Gewre de[379] bi zimanê mîrî ve dihate biderkevtin.

Bi vî zimanê ve hin ji berên nivîsandî di pêla Sasanî de hatine bidozandin. Ji destpêka 211 tanî 632 zayînê de wirde wirde zimanê Pehlevî ji hêjabûn û bikaranîna xwe ve hatîye bikevtin.

Bi Fermana Şah ve zimanê Farîsî ango zaravayê devera Fars bi zimanê mîrî ve hatîye biwergirtin. Li duwayî vegirtina Ereb de û nemanbûna dewleta Sasanî de ev zimanê hanê jî hêdî hêdî jiber çav hatîye bikevtin.

Di sala 367 k.- 927 z. de di zemanê dewleta Dêlemî de zaravayê Farisîyî Kevnar hate bizindîkirin. Belam zor gotinên Erebê û yên din jî ji bona nava wî hatin bikevtin. Di dawî de Zanistvan û Wîjevanan hin ji gotinên tirjî ji zimanê Zend û Pehlevî dane biwergirtin û ew ji bona nava wî dane bixistin. Bi vî rengî ve zimanê Farisîyî îro hate bipeydakirin[380].

Sêr Malkolm di nivîsta xwyeî bi nerx ve (History of Persia, b. 2, r. 61) de dibêje:
"Ew Eşîrên, ku ew li herema Kerman, Faris, beşekî ji Îraqê û hemû Kurdistanê de têtin bijîyandin, nîşna herî bi hinerî ve ji bona yekbûna Ttuxmê wan û zimanê wan bi xwe ve tête biderkevtin, yê ku ew bi zaravayekî tundî Pehlevî ve têtê biderkevtin. Di nava zimanê van Eşîrên hanê de cudabûneke zor têtê bipeydakirin; belam ev cudabûna hanê bi pileyekî weha ve niye, ku ew li zimanê yektirî de têde neyêtin biliberkevtin".

Di vê berî de Sêr Sidni Simis Xwedîyê nivîsta Mêjûwa Aşûr dibêje: "Di vê demê de dîtina li ser koka zimanê Kurdî de zor hatîye

[379] Daninvanê Malbata Exmenî 559- 529 Pêş zayînê de. bîronî di Şopên Kevnar de dibêje, ku Korş ew Kîxosro ye. (M. E.).

[380]Pirsiyarîya Kurd, Dr. Belec Şêrkoh.

Institut kurde de Paris

biveguhertin. Li gora bîr û bawerîyên wan Karnasan, yên ku Merov dikare bi wan ve bide bibawerkirin, zimanê Kurdî Zaravekî derketî û yanjî tevlihevî Farisî niye. Belkî ew zimaneke, ku pêşkevtinên wîyî rastî û kevnarî hene. Ew li zimanê Farisîyî kevnarî de[381], yê ku ew li ser Berê Daryos-Daryoşê Yekem de[382] hatîye binivîsandin, kevnartire.

Heger ku ev remana hanê rast be, bi serûştî ve Zanistvanên mêjûwê dikarin bêjin, ku zimanê Kurdî di sedsalê şeşemî pêş zayînê de hebû û ew zimanekî biserêxwe bû".

Karşinasê di mêjûwa Kurd de Mêcer Êdmonds di gotara xwe de, ya ku ew di Kovara Komela Asya Navînî de, jimara 11 de hatîye bibelavkirin, dibêje:
"êtir bi carekê ve diyar bûye, ku zimanê Kurd zaravayekî Farisî niye, belkî ew zimanekî bi nav û denge ve û xurû ew Arî ye û taybetîyên wîyî pirî bilind hene".

Di warê pirsiyarîya zimanê Kurdî de divê tozekê jî em guhdarîyê li Mêcer Son de bidin bigirtin[383]. Ev Merovê Qencê hanê bi qed Kurdekî Kurdî didate bizanîn û ew li Zanistvanekî Kurd de gelekî bêtir şarezayî zimanê me bû. Bi Kurtî ve ew dibêje:
"Ev zimanê, yê ku Kurd peyvê pê dide bikirin, weku zorî Cîhangervanên di nava Kurdistanê de dane bigotin, rengekî têkel, seyr, bê rêzan û naşîrînî zaravayê Îranî ye. Bi bêvajî van gotinên hanê jî zimanê Kurdî bi zimanekî bilindî û xurûyî Arî ve tête biderkevtin. Ew hatîye bilinavçûn.

Institut kurde de Paris

[381]Ew zaravayê Farisîyî pêsîyî ji zaravayên zimanê Mîdî tevayî ye. Pê Şopên Şahên Exmenî bi Tîpên Mîxî hatin binivîsandin.

[382] Ew di sala 521-486 Pêş zayînê li ser Text ma. Ji xwe re li Muşirê El-Dewle, li Bîronî Şopên Kevnar, Çapa London, R. 99-133 û îbin El-Feqih di Muxteser El-Buldan, R. 259 de bide temaşekirin. (M. E.).

[383] Raportê derbarê Liwa Sulêmanyê de. Kelkuta 1918, R. 85).

Li wê gava ku mêjûwa Îranê ji hev hate biçirandin û li cîgehê wê de çirok, çîvanok û evsanan ji xwe re cih dane bigirtin, tanî îrojî li çiyayên sengînî Kurd de zimanê Kurdî zor bi başî ve hatîye biparastin.

Di nava zemanên Rojhilata Navînî de bi tenha xwe ev zimanê hae tête biderkevtin, yê ku wî ji bil wergirtina hin ji têgihiştinên oldarî pêve xwe ji tevlehevbûna zimanê Erebî daye biparastin.

Gotinên Arî ji me re didin binîşandan, ku ev gotinên hanê di bingehên xwe de li zimanê Îranî de hatine bikaranîn, belam ew demeke ji nava serên wan hatibûn biderkevtin, lêbelê Kurd êstajî peyvê bi wan ve dide bikirin.
Ligel vê jî de li gora rêk, pêk û peşveketina zimanan de wehajî zaravayên vî zimanî jî têtîn bilindkirin û bipêşveketin.

Da ku ew bi zimanekî giştîyî îro ve bête biderkevtin, divê ji bona zaravayên wîyî pêşkevtî du yanjî sê ji letê peyvîna tîpa pêşîyî gotinê bête biveguhertin. Li dawîya vê jî de rengê tîpan û rêzamana wîna bête biveguhertin û bibaştirkirin, bi pileyekî weha ve ku her kes, yê ku ew koka zimên yanjî yekekê ji zaravayên wî bide bizanîn, bikaribe di wî de bête biliberkevtin.

Çareyê başkirina beşê bingehîyî zimanê Arî, yê ku Farisî û Kurdî jê hatine bipeydakirin, eve ye. Agehdarîyên giştî ji me re weha didin bidiyarkirin, ku di demekê de zimanê Kurdî û Farisî herdu biyekbûn.

Hêdî hêdî heryekî ji van zimanan li ser xêzeke taybetî de tanî îro hatine bipêşvekevtin. Li gora vêna de em nikarin bêjin, ku Kurdî zaravayekî Farisî ye, her weku em netuwanin bêjin, ku zimanê Iskendinavî zaravayekî Ingilîzî ye.

Li gora vêna de Kurdî li zimanê Îranî de cihê bûye û li heryekî de ji van çend zaravak hatine bipeydabûn.

Em dibînin, ku li gora zaravayên welatên Îranî de Farisî çend zaravayekin û di navbera wan de cudabûneke zor tête biderkevtin. Belam hemû jî di bingeh de bi Farisî ve têin biderkevtin. Ew ne Lorî, ne Kurdî û nejî Bilucin.

Zimanê Kurdî jî zor zaravayên wî hene. Çunke ji bona bicihkirina wî zor kêm hatîye bikarkirin û ji bona nivîsandineke hevbeşî encûmeneke taybetî ligel wî de xerîk nebûye, bere bere belav bûye û hatîye biveguhertin. Ev zîneta hanê ji bona hoyên dujwarîyên zor ji bona Karşinasên zimanê Kurdî bû, çunke wan nedidatin bizanîn, ku kîjan ji van zaravan zor kêm cudabûna wêna ligel kok û rastîya zimanê Kurdî de tête biderkevtin û ew zaravayên din bi zaravayekî ve ji şaxên wî têtin biderkevtin.

Li gora etnogirafî, ciyografî, zimanzanistî, reweşt û rewend û evsanan de di Eşîra Mukrî)yî-Sablaxê de ev hemû merc û nîşan têde têtin bidîtin û lê tête bilihevhatin, ku ew îro ji bona nasîna reha zimanê Kurdî bi nimûne ve bête biderkevtin.

Bigir ku tev bi wê bawerîyê ve hatine bigihaştin, ku Zoroaster-Zerdeşt bi zimanê dawîyî Mad ve hatîye biaxivtin û ew li ser sînorê Jorîyî welatê xwe de hatîye bizayîn, yê ku ew Îranê bi Xakê Mukrî ve dide binasîn. Zimanê wî jî, weku ku em wî li Zende Avesta de didin bidîtin, bi herî nêzîkî zaravayê Mukrî ve tête biderkevtin û yanjî -weku ku emê dê wî di dawî de bidin binasîn- ew zimanê Mukrî bi xwe ve tête biderkevtin."

Ev dîtina hanêyî ji bal Hwart-Hewart, Dormesterter û hinên din ji Karnasan de zor hatîye bipêşvexistin û encamê wê jî eveye:
Ku zimanê Avestayî Zerdeşt zimanê Kurdîyî niha ye û zimanê Madîyî berê bû.

Zimanê Parsîyî wê pêlê jî ew ziman bû, yê ku pê li ser şopên Pêrs Polîs-Istexer de hatîye binivîsandin. Ew cihêbûn û cudabûna di navbera herdu zimanan de hatîye bikirin. ku Kurdî bi bêvajî zimanê Farisî ve jimareke zor ji gotinên Erebî ji xwe re nedaye biwergirtin û şêweyê kirdarên wê bêtir hatine bipêşvexistin û wan xwe dane biparastin.

Li ser bîr û bawerîya Lêmehrevanê Şems El-Dîn Samî Beg[384] de tête bidîtin,

"ku zimanê Kurdîyî niha ew bi xwe ve mîna zimanê Pehlevî têtê biderkevtin, yê ku hin ji zaravayên wî hêjî tanî roja nihajî xwe li Eyalatên Jorî Mîdya de nala zaravayî Tat li Eyalata Bako de, zaravayê Kurdên Talîş û Qerebax de û zaravayê Gîlek li Eyalata Gîlan de xwe dane biparastin".

Cihê mexabinê ye, ku derbarê zimanê Mad de zor kêm agehdarîyên me têtin biditin. Belam Zend Avestayî Zerdeşt, dibe, ku ew li pêla Şahinşahîya Xanedanên Axmenî de hatîye binivîsandin, zimanê wêna zor kêm li zimanê Mîdya de têtê bicudakirin.

Ji bona bicîkirina vêna, ku zinamê Kurdî parastina rengê xweyî kokî daye bikirin, numûne zorin. Ev çend gotinên hanê vê bicîkirina hanê didin biderxistin:

Bicîkirineke tirjî bi servekirina Tîpa (H) bi ser hinek ji gotinên Kurdî de ye, ku ew ji zimanê Farisî hatine biavêtin. Weha derdikeve, ku Farisî (H)yeke firêda ye û zimanê Kurî ew dayite bihiştin; hêjîbêtir bi serdejî ve wî bi ser hinek gotinên din jî ve daye bivekirin. Di zimanê Avesta û Pehlevî de hin ji gotinên weha têde têtin bipeydakirin. weku henecmen, han, hîn ku ew îro di zimanê Kurdî hene, Belam ew di zimanê Farisî de hatine bifirêdan. Hin ji van gotinan ji bona nimûne em ji bona we didin bipêşkeşkirin.

[384]Xwedîyê Qamusa El-Alam û Qamusa Turkî bi zimanê Osmanî. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Lîsta beramberkirina Kurdî ligel Avesta û Farîsî êsta de

| Kurdî | | Avesta | Farisîyî Êsta |
|---|---|---|---|
| zaravayê Sulêmanyê | Zaravayê Kurmancî û Zazayî | | |
| Gewre | Mazin | Maz | Sengîn-Bizurg |
| Berz | Berz | Bereza | Bilind |
| Masî | Masî, Mase | Masya | Mahî |
| Tît | Tîj, Tûj | Tîj | Tîz |
| Hoştir | Uştira | Uştira | Şutir |
| Purd | Purt, Pir | Pereta | Pil |
| Roj | Ro, Xur | Hor | Avitab |
| Mêş | Mêş | Mexşi | Megs |
| Berx | Berx | Weraxa | Bere |
| Qise | Kise, Qise | Xesa | Herf, Suxen |
| Wîstin | Wîso, Waştin | Wasi | Xwastin |
| Zanîn | Zanîn | Zan | Danistin |
| Men | Ez, Mi | Ezim | Men |

Institut kurde de Paris

Li vê venerîna kurt û givaştî dc em têde têtin biliberketin, ku zimanê Kurdî li Dirawsê xweyî bi nav û dengê Faris de bêtir pêwendîyeke wîyî bi hêz ve ligel koka zimanê Arî de daye biparastin.

Ev diyarîkirinên hanê ji bona wan kesan bi carekê ve didin bitêrkirin, yên ku ew bi çavên zimanekî Arîyî herî xurûyî temaşeyî

zimanê Farisî dikin. Ew kesên, ku ew di vê bîr û bawerîya hanê de têtin bidîtin, ew di veguhertinên zimanê Farisî de di pêla Vegirtina Îranê de bêxêrin.

Diyarîkirinên Case of Kurdistan against Turkey de di vî babetî de zor sêrin û ew bi xwe ve dijî remanên nuh têtin biderkevtin.

Kurtîya van diyarkirinên hanê weha ye:
"Zimanê Farisîyî kevnar ligel zimanê Zendê Îranî û Sansikrêtîyê Hindî de zor pêwendîyên wî hene. zimanê Farisîyî kevnar bigir li sedsalê çarî pêş zayînê de devjê hatîye biberdan.

Belam zimanên Farisîyî taze, Pehlevî yaxud Parsî, Mêdî û Kurdîyê iro jê hatinê bipeydabûn".

Li gora vê dîtina hanê de divê zimanê Mîdî şê çar sedsalan li duwayî linavçûna dewleta Mêdya de hatibe bipeydakirin. Ev jî bi xwe jî ve pir ji hiş dûre û ew bi xwe jî ve ligel bîr û bawerîya Zanistvanên zimanan de tête bicudakirin.

Li layekîtirîjî de heger zimanê Farisîyî êsta çar sedsalî li pêş zayînê de hatibe bipeydakirin, magelo ev gotinên Erebî, yên ku em wan têde dibînin, li ku û kengî de ew têde hatine bikevtin?

Rasatî eve ye, ku zimanê Farisîyî îro, mîna ku me li layê serî de dayite biaxivtin, li dawîya biserketina musulmantîyê de bi ser Îranê de û piştî derbasbûna sê sedsalî de hatîye bipeydabûn û evjî di pêla Xanedanên Al Boyê de bû, mîna ku ev di Pêşgotina Şerefname de hatîye binivîsandin, ya ku ew ji ciyografîya Meltebron hatîye biwergirtin.

Ev Kanîya hanê di rûpelê 23 de di perê wê de dibêje:
"Miletê Pars li sedsalê sêyemî pêş zayînê de welatên Kurdistanê date bizetfkirin. Wan Kurd dane bineçarkirin, ku ew zimanê wan ji xwe re bidin biwergirtin, yê ku ew Pehlevî bû û ew ji Farisî hatibû bipeydakirin.
Belam wan Kurdên, yên ku ligel Miletê Vegirtvanên Pars de zor pêwendîyên wan hebûn, ji xwe re zaravayekî nêzîkî bi Sansikrîtîyê

Hindostanî ve dane biparastin û ew beşê din, yê ku ew dûrtir û li Rojava bûn, wî ji xwe re zaravayekî nêzîkî Ermenî date biwergirtin.
Ji vê mêjûwê de sê zaravayê Kurdî, ango Kurmancî, Babanî û Zazayî hatin bipeydabûn".

Kanîya bi navkirî ve vê dîtina dawîyî hanê ji bona ser bîr û bawerîya Rojhilatnas (M. Grant-Madison Girant) dide bivegerandin.
Ev dîtina dawîyî hanê jî dîsan ligel dîtinên Insiklopêdîya musulmantîyê de hîç hevdûnagirin, yên ku ew kurtîya remanên Zanistvanên herî bi nav û dengin. Insiklopêdîya musulmantîyê hîç navê vî Rojhilatnasê hanê nedaye bianîn. Weha derdikeve, ku reman û dîtinên wî baş nayên bidîtin û ew ji rastîyî pirî dûrin[385].

Bi kurtî ve her çende zimanê Kurdî jî mîna zimanê Farisî ew jî zimanekî Rojavayî Îranî tête biderkevtin. Belam çi koka wî û çi jî bingehên wîyî zimanî li zimanê Farisî de bi carekê ve bi cihê ve tête biderkev: zimanê Rojavayî Îranî -li gora lêkolandinên hinekan ji Rojhilatnasan- du beşe: Serî û Jêrî.

Zimanê Kurdî tevîlivêjî de, ku ew li Farisî de têdighê û têkelîyeke wîyî zor jî ligel wî de tête bidîtin, cudabûna wî ligel zimanê Farisî jî de bi eşkere ve bi diyar ve tête biderkevtin.

Bi rastî ve, heger ku ew belgeyên zimanê Kurdî jî bihatana bidestkevtin û ew ji wê pêla, ya ku têde zimanê Farisî hebûn û geşbûna xwe dayite binuwandin, kevnartir baya, dê cudabûna bingehî di navbera van herdu zimanan de bi baştir ve bihata biderkevtin.

Cudabûnên eşkere di navbera Kurdî û Farisî de bigir pêncin: Pevîn, Bingehî, Reng, veguhertina Kirdaran û Rê ziman (Giramêr).

Institut kurde de Paris

[385]Yê ku ew me derbarê bawerîyên Grand bi gûmanê dide xistin, ew Pirsiyarîya derbarê Miletê Mad bi xwe ye. Jiber Grand dibêje, ku Mad berî 6000 sal Pêş zayînê de li Mîdya bûn. Di dema ku hemû Zanistvanên Mêjûwê û Lêgervanên bajartî û Çandinîya Kevnar de dibêjin, ku ev Miletê Mad 1000 salekî Pêş zayînê de ji bona Mîdya hatîye.

Cudabûna Peyvînê: di pirbûnê de li Tîpên (R), (L) û (D) yên Qelew û Sivik de tête bidîtin.

Cudabûna Bingehî: di guhertina Peyv û Gotinan de ye; weku: Ateş-Agir, Mahî-Masî, Nemaz-Nivêj tête bidîtin.

Cudabûna li Reng de, Veguhertina Kirdaran û Rê ziman de: ew di Reng, Veguhertin û suwarkirina Peyvan, Kirdaran û Pevikan de tête bidîtin: Fersitad-Nardi, Amed-Hat, Awerd-Hani (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

Be nezd o reftem-Çûme layê wî (Ji bona şarezabûna van cudabûnan ji xwe re temaşeyî: destûra zimanê Kurdî bikin. Ew zor bi kelk ve tête biderkevtin)[386].

Kurdî ji zimanê Farisî û Erebî û Farisî jî ji Erebî hin ji gotinan ji xwe re dane biwergirtin û bikaranîn. Biçge li vêjî de li zimanê Kurdî jî de hin ji gotinên Turkî, Aramî û Ermenî jî têtin bipeydakirin. Ev têkelbûna ziman bi serûştî ve bi encamê têkelbûna siyasî, civakî û serpereştîya çend hezar sala ve tête biderkevtin; kêr û zîyaneke wetov ji bona koka ziman nebûye û najîbe.

Bi xwe jî ve gerjî em ji xwe re temaşeyî zimanên Miletên tirjî bidin bikirin, emê dê bidin bidîtin, ku hemû zimanan bi xwe jî ve dane bikêrkirin û kêr jî li wan de hatîye bikirin. Kêm û zor jî gotinên zimanên din ji bona nava wan de hatin bitêkelbûn. Wehajî zimanê Erebî jî ji vê zîneta hanê jî nehatîye birizgarkirin. Ji bona nemûne zimanê Firensî jî zor ji têgihiştinên Yunanî û hin ji gotinên Erebî jî têde têtin bidîtin. Zimanê Ingilîzî jî, yê ku em hemû ji bona kar wergirtinê ji zanistîyê û zanebûnê ji bona fêrbûna wîna didin bikarkirin, li gotinên Latînî, Cermenî û Yunanî de bi pir ve tête bidîtin. Zimanê Farisîyî îro bi rengegî weha ve hatîyê bigihaştin, ku Merov nikare bide bigotin, ku ev zimanê hanê li Farisîyî kevnar de hatîye bizayîn; çunke, weku zimanê Turkîyî pêşû tenya veguhertina

[386] Nivîstokeke pir hêja ye. Ew ji bal Tewfîq Wehbî li ser Rêzimana Kurdî de bi zaravayê Sulêmanî hatîye binivîsandin.

Institut Kurde de Paris

Kirdar-Fiil û yanjî Xebereke ligel tek tek gotinên Farisî de tête bidîtin, mayîna wîyî din Erebî ye û hin ji gotinên Turkî, Bilocî, Hindî û Rusî jî têkelî nava wî bûne. Ev zîneta hanê jî, weku me li serî de daye biraxistin, encamê têkelbûnê ye û evjî karekî serûştî ye; jibervêjî ev ji bona ziman bi şermezarî ve nayête bidanîn.

Ligelvêjî de ez di wê bîr û bawerîyê de me, ku di rêya zorbûna xwendin û xwendekaryê de û bi yarmetîya hin ji nivîstên baş ve (weku Rêzimanekî lihevhatî, Ferhengekî giştî û yên din) zimanê Kurdî dê bikaribe ji xwe re rengekî siviktir û asantir bide bipeydakirin, nivîsandin û xwedina xwe dê bide biyekkirin û ew dê beşê zorî ji gotinên Erebî û Farisî jî bi alîkarîya dozandin û wergirtina beramberî wan bi Kurdî ve roj bi roj ve wan bide bikêmkirin. Ew têgihştin û gotinên bêgane, yên ku gorîna wan bi dujwar ve tête biderkevtin û yanjî gorîna wan bi hoyê tawîbûn ve, yanjî û serlêtêkçûnê dibe, weku ku Miletên dinjî dane bikirin, divê kurd jî bide bikirin, ku wan ji bona zimanê xwe bi mal ve bidebikirin. Herwehajî li gora pêwistîyê de bide bixebatkirin, zor başe, ku hin ji têgihiştinên taze jî ji wê navê bêtin biwergirtin. Bi vî rengî ve zimanê Kurdî bêtir dê bête bidewlemdkirin.

Institut kurde de Paris

Hinek kes jiber pirbûna zaravayên Kurdî didin bigotin, ku li ser bingehekî bicîkirî û giştî ve çûn ji bona pêşvexistina zimanê Kurdî bi dujwar ve tête biderkevtin; belkî ku ew nayête bikirin. Li layê min de ev bi wisa ve tête biderkevtin, ku ev remana hanê li ser du tiştan de hatîye biencamkirin:

1. Bi nezanîna pêşvekevtina zimanên zindî ve tête biderkevtin,
2. Bi neşarezabûna zimanê Kurdî ve tête biderkevtin.

A. Bi rastî ve, heger ku em temaşeyî zanistîya ziman bidin bikirin, dê emê bidin bidîtin, ku Miletên herî gewre di vî sedsalê hanê de, yê ku rengekî wanî hevgirtî tête bidîtin, ew didin binîşandan, ku di navbera zaravayên beş û gelên wî zimanî de pir cudabûn dihatin bidîtin.

Ji bona nimûne pê navê em pir dûr herin, îro di navbera Erebîyekî Misrî, Hêcazî, Surî û Îraqî' de ewende cudabûna Zarav bi zor ve tête biderkevtin, ku

Îraqîyek zor bi dujwarî ve ligel Erebekî Misrî û yanjî Surî de dikare bide biqisekirin û ew di pirbûna têgihştinên wan de nayête biliberketin.

Cudabûna regnên zaravayên Kurdî di hîç demekê de ew ji cudabûna zaravayên Erebî bêtir nayête biderkevtin. Çend zanebûn bêtir bêtin bibelavkirin, ev cudabûn û newekhevî têtin bikêmkirin. Baştirîn nimûne li ser vê bîr û baweriya min de têtê biderkevtin, yekbûna zimanê Ingilîzî, Firensî û Elamanîyê îro têtê bidîtin.

B. Heger xwedîyên wan rengên remanan derbarê bi rengên zaravayên Kurdî ve agehdarîyên wanî bi carekê ve bihatana bidîtin, hîç gûmana min li ser de nedida bikirin, ku dê wan ev remana xwe bidana birastkirin. Çunke, weku ew hatin bitêgihiştin, cudabûna di navbera zaravan de bi pileyekî wetov ve niye, ku Xelkên Sulêmanîyê netuwanibin ligel Kurdekî Lor yanjî Goran û yanjî Badînan de bidin biqisekirin.

Bi taybetî ve hin ji zaravan zor ew nêzîkî biyektirin. Ji bona nimûne, êsta zaravayê Kurdê Jorî Rojavayî û Jêrî Rojavayî Îranê bi carekê ve li yek de nayêtin bicudakirin. Diyare, ku Zaravyên Kurdî jî çend rengin û beşê herî zorî wî bi kurmancî ve têtê biderkevtin.

Li gora Şerefname de Miletê Kurd ji Çar Qolê Gewre Kurmanc, Lor, Kelhor û Goran têtê bipêkhatin.

Ji vanan jî beşê Lor zor dibe, ku ew li komela Jêrî Rojavayê Îranê bin. (O. Man), yan jî ew ji komeleke cihê bin.

Goranê Zehawê nala Hewramîyê Sine, Zaza...hd. ew bi zaravayê Jorî Rojavayî ve didin bipeyivandin û ev zaravayê hanê jî ligel zaravayê kurdîyî pir belavkirî cudabîneke wîyî gewre têtê biderkevtin. (Ji bona nimûne Goran Herê delên, Zaza Herey dibêjin, Belam Kurd Sê dibêjin).

Institut kurde de Paris

Li gora lêkolandinên Rojhilatnas Endris de zimanê zaza li zimanê Dêlimi de tête biderkevtin û ev danîna hanê jî li gora dîtina goyên Hewremanîyan divê rast bête biderkevtin. (Mêcer Soane-Son).

Dîsan Şerfname dibêje, ku Eşîrên Kelhor di navbera Sine, Kermanşah û Zehaw de têtin bidîtin. Têgihiştina Kelhor li gora Şerefname de divê li ser Komela Kurdên Ne Kurmancê welatên Sine û kermanşah de bête bigotin. Zaravayê Kelhor ji bal Rojhilatnasvan O. Man de li ser hatîye bilêkolandin, belam hêştajî ew nehatine bibelvkirin.

Li gora wan agehdarîyên Rojhilatnas, yê ku ew di nivîsta xwe de dibêje, divê bergê yekem ji nivîsta wîna derbarê zaravayên herema Jêrîyî Kermanşan de bête biderkevtin, ku ew jî zaravayên Kermanşanî; Kelhorî, Lekî, Pahrewandî, Nanekalî û golî di nava wî bergî de ne. bergê duwem li ser zaravayên Sine, kerend û Geros ango Bêcar û Rojhilatî Sine de ye.

Ew Xelkên bi van zaravan didin bipeyivandin, ew ji xwe re Kurd dibêjin û yanjî ew bi navê Eşîrên xwe ve têtin binavkirin. Li nêzîka Loristanê de (li Lekistanê de) zaravayê Jêrîyî Kurdî bi Lekî ve tête binavûdengkirin.
Li Selmas û Farisê jî de Eşîrên Lek htêtin bipeydakirin; belam zimanê Kurdîyî Eşîra kelon-Ebdoyî li Faris de- li gora lêkolandinên O. Man de bi Lekî ve nayête biderkevtin.

Zaravayê Jêrîyî Kurdê Rojavayî Îranê bigir li rengê zimanê Kurdî de hatîye biderkevtin. Hebûna vî zaravayê ne Kurmancî, renge, ji bona bicihkirina Pirsiyarîya Kardo-Kartîwîyî kevnar de kemî giringbûna wî bête bidîtin.

Em koka gotina Kurmancî nizanin. Gelo ew li suwarkirina Gotina Kurd û navê Eşîreke Mîdya de hatîye biderkevtin? Li welatên Kurmanc de, renge, li yek cihê de du komelê zimana hebûn:

1. Kurmancîya Rojhilatî yaxud Kurmancîya Jêrî Rojhilatî
2. Kurmancîya Rojavayî.

Institut kurde de Paris

Sersînorê van herdu beşan hiştajî bi tewawî ve nayêtin bdiyarkirin.

Kurmancîya Rojhilatî

Li welatê Mukri de û di nava Eşîrên Dicle de ango li herema Zêyê Kuye, rubarê Edhem de û li dora çemê Sîrwan de pê tête biqisekirin. Ev zaravayê hanê bi zaravayekî xurû û kûr ve tête biderkevtin û ew derbarê reng û jimara gotinên xwe jî de zor bi dewlemend ve têle biderkevtin.

Kurmancîya Rojavayî

Ev zaravayê hanê ligel hin ji veguhertinên cihî de bi xwe ve ew bikoka zimanê Kurmancî ve tête biderkevtin. Kurdên welatên Diyarbekrê, Mêrdînê, Botan, Badînan, Hekarê, Urmiyê, Erzeromê, Merîwanê, Enedolê û Kurdên welatê Xuresanê bi vî zimanî hanê ve didin bipeyivandin.

Wer diyare, ku Kurdên Jorî Surî jî bi pir rengên zaravan ve didin biaxivtin û di nava zimanê wan de hin ji gotinên Turkî jî têtin biderkevtin.

Olya Çelebî dibêje:
Zimanê Kurdî Panzde Rengê wî têtin biderkevtin: Zaza, Lolo, Hekarî, Onîkî, Mehmûdî, Şîrwanî, Cezîrî, Pesanî, Sincarî, Herîrî, Erdelanî, Soranî, Xaltî, Çugwanî, Amêdî û Rojekî. (B. 4, r. 75).

Nivîsta Giramatîka-Rezimana Kurdî Pirofêsor Garzonî zaravayê Amêdîyê li zaravayê Bedlîsê de û zaravayê Çolemergê li zaravayê Botan û Sulêmanîyê de dide bicihêkirin.

Mêcer Soane-Son jî li Giramêra-Rêzimana Kurdî de derbarê bi van zaravan ve lêkolandinên baş dane bikirin.

Ev bi parvekirinên xuwarê ve kurtîya lêkolandinên zimanê Kurdî têtin biderkevtin:

Institut kurde de Paris

1. Beşê Îranî

A. Zaravyê Sune-Kermanşah. Rojhilatnas Lerch-Lêrç di nivîsta xwe de[387] li ser danekê ji nivîsta Gulistan de dide biaxivtin, ya ku ew bi zaravayê Sune ve hatîye binivîsandin. Biçge li vîjî de gelek ji Rojhilatnasan[388] di derbarê vî zaravayê hanê de lêkolandin dane bikirin.

B. Zaravayê Çiyayî û Belave: zaravayê Gerosan ji Eşîra xwacewend li herema Mazenderan de, zaravayê Kalon Ebdo li devera Faris de û herwehajî zaravayê Kurdên Xuresan û Tehranê. zaravayê vî Beşê duwayî bi nêzîkî zaravayê Erzeromê ve tête bidîtin.

2. Kurmancîya Rojhilatî

Ew bi zaravayê Sulêmanîyê û Mukrî ve tête biderkevtin.

3. Kurmancîya Jorî û Rojavayî

Bi zaravayê Kurdên Arîvan-Arîwanê, Kurdên Barkulîyê dewr û berên Çiyayê Araratê û welatê Erzerom û Bayezîdê; Urmiyê, Hekarê, Şemdînan; Badînan, Botan, Tor Abidîn, Mêrdînê, Diyarbekrê û Jorî Sûryê ve tête biderkevtin[389].

387Forschungen über die Kurden-Lêgerandin li ser Kurdan de, San Peterburg 1857-1858.

388Ev Rojhilanasên hanê mîna Şêndler, Witer Betrag, Son, Morgan, Man û Zanistvanên tir.

389 Ji xwe re li nivîstên Ekyazarov, Xacatorof, Çapa, Muler, Mekaz, Hartman, Nîkîtîn, Nuêl, Ega Butros, Garzonî, Şerefname, Asosîn, Gardin, Fon Lokok û Son de bidin temaşekirin.

Institut kurde de Paris

Karşinasê zimanê Kurdî Mêcer Soane-Son li derbarê zorbûna zaravayên Kurdî û cudabûna wan de ligel yek de dibêje[390]:

"Biçge li zaravayê Mukrî û Qolên wîna de gelek zaravayên tirjî li Kurdistanê de têtin bipeydakirin. Ew kesên hanê, yên ku ew bi wan ve didin biaxivtin, ji xwe re Kurd dibêjin.

Ji van herî girintirî wan bi Zazayî ve têtê biderkevtin, ya ku pê Kurdekî zor ... Jorî Diyarbekrê de, li dor û berên Erzencanê de û li hin cîgehên tirî Endolê de didin biaxivtin. Ev bi Miletekî dir û kêvî ve têtin biderkevtin.

Kurdekî ser destarin û îsqan siturin. Ew bi zaravayekî wetov ve didin biaxivtin, ku ew bi xurû Arî ve têtin biderkevtin. Ew weku zaravayên Mukrî û yên mîna wî bi xwe ve nayêtin biderkevtin.

Ew zaravayeke, yê ku ew li zimanekî zor de têtê biderkevtin, yê ku ew ji zimanê Farisîyî Kevnar de hatîye bucihêbûn. Tev li vêjî de divê bi çavê zimanekî Arîyî xurû ve lê bête bitemaşekirin û ew li Farisî de bêtir nêzîkî bi Kurdî ve têtê biderkevtin. Ew ji bona zimanê Kurdzanekî zor sêr têtê bidîtin. Zazan bi xwe jî ve di koka xwe de ew bi xwedanê zimanekî dualî ve têtin biderkevtin.

Li diwayî van de Xelkê melbenda Sêrtê zaravayekî wanî sêr têtê bipeydakirin û di nava wî de zor gotinên Aramî têtin biderkevtin. Bi vî zaravayî Gavarnayî- Gavarnai û yanjî zimanê Geverê ve pê didin bigotin. Ev Gevera hanê li welatê Hekarê de bi melbendeke nêzîkî ser sînor ve têtê biderkevtin. Ev zaravayê hanê bi xwe ve bi tevlihevbûneke Kurdî û Kildanî ve têtê bierkevtin. Renge, ku ev zimanê Gawirên wan nava bin. yên ku ew di dawî de hatine bimusulmankirin.

Li nêzîka Sasonê de Eşîreke biçûk têtê bidîtin, ku jê re Balkî didin bigotin. Ew ne Musulmanin û nejî Gawirin. Ew bi zaravayekî Seyr dide biaxivtin, ku ewbi tevlihevbîneke Kurdî, Erebî û Ermenî ve têtê bierkevtin.

[390] Raportê li ser Liwa Sulêmanîyê li Kurdistan de, R. 88, 91.

Institut kurde de Paris

Li gelek cîgehên tirî Kurdistan de hin Eşîr û Xelkên Sêr têtin bidîtin, yên ku ew ji Netewên hin Bazdvanan têtin biderkevtin, yên ku ew ji bona serên çiyan hatine bibazdan û ew li ser xwe de bi Kurd ve hatine bikirin. Wan li zimanê xweyî kokî de hin gotin ji bona nava zaravayê xweyî taze dane bikurdkirin.

Bi kurtî ve zimanê kokî bi xwe ve ew zimane tête bidetkevtin, yê ku pê Kurd dide biaxivtin û ew ji berê Kurdî û Kurmancî tête bipêkhatin.

Ji van herdu zaravan deha baştirîn zarav bi xwe ve ew bi zaravê Sablaxê-Sawceblaqê ve tête biderkevtin.

Li pêşî de li Bayezîdê de hin ji Xweşxwevanên Hekarê hebûn û êstajî li wê derê de hin ji Nivîsvan û Wêjevanên Kurd têtin bidîtin, ji yên ku ew li dan û sitendinê de, li xweşxwevanîyê û wêje de bi zimanê kokîyî xwe ve didin binivîsandin.

Ev beşê layê Jorîyî Kurdistanê ew bi xwe ve li berê Jorî Wan û Urmiyê de tête bipêkhatin, ew li gora zimanê xwe de Isqoçiyayê Kurdin. Zimanê wan bi xwe yekin, belam tund û tûjîyek têde heye. Peyvên wan req û tundin û ew ji zaravayê Jêrî dûrin, Çunke, li layê van de (B) êyeke Arî heye, ya ku ew li bal Kurdên Jêrî de bi (W) aweke nerm ve hatîye biveguhertin. Li zaravayê Jorî de (P) bi xurtî ve tête bipeyvînîkirin û ew li hin cîgehên tirjî de xurtbûna peyvîna wî tête bidîtin.

Ligel vê cudabûna peyvînê de hin cihêbûna rêziman jî tête bidîtin û bi taybetî ve ew di kirdaran de tête biderkevtin. Ev cudabûna hanê bi pileyekî weha ve hatîye bigihaştin, ku her beşekî wî pêwîstî bi lêkolandinên cihê ve tête bidîtin.

Bi kurtî ve van cudabûnan wilo dane bilêkirin, ku Xelkê Sulêmanîyê bi dujwarî ve li zimanê Xelkê Erzeromê de têde têtin bigihaştin. Tevî ku herdu jî di bingeh de bi zimanê Kurmancî ve didin biaxivtin.

Institut kurde de Paris

Ev cihêbûn û cudabûnên hanê di rêya bikaranîna hin ji gotinên avêtî di zaravayên din de bêtir hatine bikirin. Zaravayê layê Jorî hin ji gotinan ji xwe re dane biparastin, ku ev gotinên hanê ji wan gotinên, ji yên ku zaravayê Mukrî ji xwe re ji wan zaravayên navîna Îranê de dane biwergirtin, bi kevnartir ve têtin biderkevtin. Di wê demê de bi xwe jî ve em dibînin, Ku Kurmancîya Jorî hin ji gotinên xwe dane biwindakirin û ew li cîgehên wan de hin gotinên din li Turkî û Kildanî de ji xwe re dane biwergirtin.

Ji bona nimûne:

Kurmancê Jorî bi Gomê ve Dengiz dibêjin. (Ew bi Turkî ye). Mukrî û yên din gol Awe dibêjin. Kuramancê Jorî ji bona Paporê Gemî dibêjin. (Gemî Turkî ye). Mukri û yên tir Keştî pê dibêjin. (Ew bi xwe jî Farisî ye). Kurmancî Jorî ji bona Zewî Erd dibêjin. (Ew bi Erebî û Turkî ye). Mukrî û yên tir pê Zewi-Zevî dibêjin. Kurmancê Jorî bi Qoqorage ve Kertik dibêjin. (Ew Tatarî-Teterî ye), Mukrî û yên tir Gelo Gero dibêjin.

Bi kurtî ve li batî bilê enûsim, dibêje Yarmiş ekem. Hoyê vê jî eveye: ku Xelkê gundan kirdara nivîsîn ji bîrakirine. Lêbelê Xelkên, yên ku ew li nava bajaran dijîn, kirdara nivîsin dizanin û ew wê jî bikartînin.

Institut Kurde de Paris

Beramberkirin di navbera zaravayê Jorî û Jêrî de

Van zînetên hanê û bikaranîna gotinên biyanî û cudabûna peyvînê di nava zaravayên Kurdî de cihêbûneke zor dane bikirin. Ev gotinê hanêyî xuwarê nimûneyeke li ser wan cihêbûn û cudabûnan de didin biderxistin:

| Gotin | Kurdê Jorî | Kurdê Sulêmanîyê |
|---|---|---|
| Aw | Ab(46) | Aw |
| Wefir | Berf | Befir |
| Horî-Xorî | Hirî | Xorî |
| Kakez | Kakît | Qaqîz |

| | | |
|---|---|---|
| Dan | Didan-Diran | Dan |
| Xwîşk | Xuwalîk | Xoşk |
| Keç | Xez-(Qîza Turkî) | Keç |
| Taw | Tav | Roj |
| Iwey | Ewîş | ewî |
| Piyaw | Mêr-Piya | Piyaw |
| Mil | Îsto | Esto |
| Niwîsto | Rakuwa-Razayî | Nosto |

Institut Kurde de Paris

li vî rengî de gotin zor hene.

Li vê û pêş de li Erdelanê de bi renegekî ziman dihate biaxivtin, ku ew zimanê hanê li zaravayê Hewramî diçû. Belam li duwayê vê de, ku Eşîran li Gerokîyê de waz hênanin, jimareke zor ji Kurdên Jorî ji bona ewlebûnê û xweşîyê bi ser Erdelanê ve hatin bikişandin û ew ji bona wê derê de hatin bibarkirin û ew li wir de hatin bidaniştin û zaravayê wan jî hate biveguhertin û zimanê Erdelanîyî îro lê hate bipeydakirin, ku ew tanî radeyekî bi zaravayekî Mukrî ve tête biderkevtin û zor cudabûn di nava wan de nayête biderkevtin. Li beşê layê Jorîyî Erdelanê jî de Xelkekî zor hebûn, ku hîç wan bi zaravayê Çiyayî Erdelanê ve ne didan biaxivtin û wan zimanê xweyî kevnar dabûn biparastin.

Zaravayê Sune û dorhêlên wê bi navê zaravayê Kurdistanî ve nav û deng ji xwe re daye bisitendin. Ew bi zaravayekî şêrîn ve tête biderkevtin û ew bi alîkarîya wergirtina hinek ji gotinên Farisî ve gelekî bi pêş ve hatîye bikevtin û bibelavbûn.

Beşê Xwendewarên Xelkê Sune û Sulêmanîyê di zaravayê kevnî Erdelan de têde dighin. Li ber cuwanîya şêwe û rêk û pêkbûna wîna de ew li Kurdistana Jêrî de ji bona zimanê Xweşxuwanîyê û Wêje hatîye bikirin. Di rastî de ew bi zaravayekî Kurdî ve nayête biderkevtin, belkî

ew bi hemberekî Goranî û Hewramî ve tête biderkevtin û ew ji pêşveketin û sitewandina Farisîya kevnar de hatîye bipeydabûn.

Zaravayê Hewremanî, renge, zaravayekî Tacîk be, yê ku ew di demekê de di nava Îrana Navînî de hatibûn bizalkirin. Wehajî dibe, ku ew zaravayê hanê li Kurdistana Jêrî de ji bal Miletêkî barkirîyî Îranî de û yanjî ji bal Miletekî cihîyî ne Kurd de pê dihate biaxivtin.

Hewremanî mîna Goranîyên gundan zimanê xwe dane biparastin. Îro ew bi zimanekî ve bi kêr, şêrin û ahengdar hatiye bikirin. Li Hewreman, Pawe, Pilingan û dorhêla wê de pê tête biaxivtin û Kurd bi hêsanî ve têde nayête bitêgihiştin.

Zaravayê Kermanşah ligel zaravayê Kelhor de zaravayekî bi tevayî ve bi Kurdî ve nayête biderkevtin û ew zor zor li zaravayê Lek de dirin û yên ku divên ew şaxên zimanê Îranî-Farisîbin. Li layekî tirîjî de zor cudabûna wan ligel Farisî de tête biderkevtin û ew ji bona Kurdî binêzîktirin. Merov dikare pê zimanê Kurd-Lek bide bigotin. Rengê kirdarên wî ne li veguhertinên Kirdarên Lek de û nejî li veguhertinên Kirdarên Kurdî de dirin. Her û her ew di Navan de Rengê pirbûnê tînin bikaranîn û nîvên wan jî bi xweve ew Lekin. Li rêk û pêkxistina Pevikan de pirî caran Rêzimana zaravayê Lek ew didin bikaranîn û car caran jî ew Rêzimana zaravayê Kurdî didin bikaranîn".

Institut kurde de Paris

## Lor

Zor pêwiste, ku ez li lêkolandina ser ziman de tozekî jî axivtinê li ser zaravayê Lor[391] de bidim bikirin. Çunke, Piranîya Rojhilatnasan jiber lihevhatina zaravayê wî ligel Farisî de Miletê Lor ji Miletên Îranî didin bidanîn. Jibervîjî Insiklopêdîya Musulmantîyê -weke me li serî de date bidîtin- li ser zaravayê Lor de nedaye biaxivtin. Bi rastî jî ve me li derîyê yekemî vê nivîstê de û li ser Kurdê Îranê de bi çend dêran ve lawazîya vê dîtina hanê daye binîşandan.

Miletê Lor bi xwe ve ew di koka xwe de bi çar beş ve têtin biderkevtin:

[391] Ev lêgerandina hanê ji bal min hatîye nivsaîndin.

1. Lorê kokî Lorê Biçûk-Feylî,
2. Mamesanî,
3. Kuwe Geloyî,
4. Bextiyrî

Zaravayê beşê yekem ango Feylî yanjî Lorê Biçûk bêgûman ew ji Farisî bêtir bi nêzîkî Kurmancîya Rojhilatî ve tête biderkevtin. Feylî bi xwejî ve vê dizanin û ew li Kurdbûna xwe de gûmanê nadin bikirin.

Di sala 1916 de bi karmendîyeke mîrî ve ez ji bona Loristanê çûm û ez demekê li nik Walîyê Pişkoh hatim bimayîn. Min li wêderê de hin lêkolandinên milî û civakî dane bikirin. Bi piranî min ligel Walî û dor û berên wî de bi Kurdî ve didate biqisekirin. Bi hêsanî ve ew li ber min de dihatin bikevtin û ez jî li ber wan de dihatim bikevtin. Li nik min de diyarbû, ku cudabûna zaravayê Kurmancîyî Rojhilatî ligel zaravayê Lorê kokî de li cudabûna zaravayê Kurmancîyî Rojava de zortir niye. (Ji xwe re termaşeyî Lista xuwarê bikin).

Em dixwazin ji bona ser sê zaravayên din bêtin bivegerandin. Insiklopêdîya Musulmantîyê dibêje:

ku di zaravayên van hersê beşên din de ji Miletê Lorî de hin ji gotinan hene, ku ew bi mîna Farisîyê îro ve têtin biderkevtin û li layekî tirjî de di peyvînî de hin suwarkirin û tîpên wî têtin bidîtin, ku ew ji Farisî dûrin.

Ji bona nimûne:

Beramberikirina Farîsî ligel Lorî de

| Gotina Farisî | Gotina Lorî |
|---|---|
| Mîkunem | Eykunem |
| Mîxurem | eyxurem |

Institut kurde de Paris

| | |
|---|---|
| Adem | Adom |
| Pil | Pîl |
| Midehem | Eydehem |
| Xane | Xona |
| Came | bi Bextiyarî Cewa |
| Îşan | Îsa |
| Anha | Îgal |
| Înra Gereft | Yona Got |

Institut kurde de Paris

Heger em hin ji gotanên Lorî de ligel zaravayê Sulêmanîyê de ji xwe re bidin biberamberîhevkirin, dê emê ji xwe re bidin bidîn, ku cudabûn di nava wan de bi kêmtir ve tête biderkevtin:

Beramberkirina Lorî ligel Kurmancîya Jêrî de

| Gotina Lorî | Gotina Sulêmanî |
|---|---|
| Eykunem | Eykem - Ekem |
| Eydehem | Eydem |
| Yona Got | Emey Girt |
| Eyaxurem | Eykirim |

Peyvîna Xane bi Xona -li layê min de weha ye- ku evaya encamê têkelbûna wanî her û her ligel Îranîyan de ye. Bi rastî jî ve hin caran

Faris di peyvê de hin Tîpa (A) bi (O) dikin. Ji bona nimûne: Nan-Non, Anha-Onha, Can-Con... hd.

Ev cudabûn û ev wekhevbûnên hanêyê kêm -li gora bîr û baweria min de- biryardan li ser wan de ji bona nîşankirin û bidanîna Milîbûna Miletekî nayêtin bitêrkirin. Çunke:

1. Zor dibe, ku ev Rojhilanasên hanê di gava pirs û bersevê de ligel Xelkê Loristanê de tûşî hin hele û şaşbûnan bûne. Ew bi başî ve nehatibin biliberketin û rengekî nerastî gotinan wan dane bigirtin û bitomarkirin.
2. Bi carekê ve ew şarezayê beşên zaravayên zimanê Kurdî nebûn û wan li ser zanistîyeke kêm de biryarîyên xwe dane bidan

Bi rastî ve, heger ku em li hin ji gotinên Farisî û Lorî de bidin bitemaşekirin û wan ligel şax û beşên zimanê Kurdî de bidin biberamberkirin, dê emê bidin bidîtin, ku mînabûna van şax û beşên zimanê Kurdî ligel gotinên Lorî de ji mînabûna wan ligel gotinên Farisî de bêtirin. Ji we re vê Lista hanê ji bona beramberkirinê em didin bipêşkeşkirin:

Institut kurde de Paris

Beramberkirina hemû zaravayên Kurdî ligel hevdû û Farisî de

| Farisî | Lorî Feylî | Lorî Lekî | Hewramî | Kurmancîyê Rojhilatî Sulêmanî | Kurmancîyê Rojavayî Behdînanî |
|---|---|---|---|---|---|
| Biro | Biço | Biço | Lowe | Biro | Here, Biçe |
| Binîşîn | Binîş | Binîş | Binîşîre | Danîşe | Rune, Runê |
| Bala | Ewban | Ban | Ser | Sero | Jor, Ser |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Engebîn | Esel | Esel | Hinguwîn | Hinguwîn | Rehengewî, Hingiv |
| Xerbuze | Şamî | Xeroze | Şotî | Şûtî | Zebeş, Şemtî,Zeyeş |
| Încîc | Încîr | Încîr | Hencîr | Hencîr | Hejîr |
| Armud | Ermud | Emrud | Hermê | Hermî | Hermê, Esgurk |
| Sêb | Sêw | Sêf | Sêf | Sêw | Sêv |
| Esp | Esp | Esp | Esp | Esp | Hesp |
| Co | Cewe | Cew | Yew | Co | Ceh, Co |
| Mêayim | Etîm | Eytim | Men mew | Yem | Deêm, Têm |
| Berxîz | Eles | Fîrê | Horze | Helese | Rabe, hulu, Werze |
| Engor | Engor | Enor | Hengor | Tirê | Tira, Tirê |
| Kosfend | Mê | Mê | Mer | Mer | Pez |
| Mêwîz | Mewîj | Mîwîj | Mêwij | Mêwij | Mêwîj |
| Mêfiroşim | Efroşim | Efroşim | Wereta | Efroşim | Firoşim, Difroşim |
| Imroz | Îmroj | Îmruwa | Aro | Îmro | Îro, Evro |
| Nemi danim | Nazanim | Nazanim | Mezanû | Nazanim | Nizanim, Nozanim |

Institut kurde de Paris

Weku me li vê lîsta hanê de date binîşandan, di navbera du beşê Kurmancî zaravayê Sulêmanî û Badînan de cudabûneke ewende niye; bi tenha ve li hin gotin û veguhertina kirinan de heye. Ji bona nimûne Kurmancê Rojhilat kirina Helsan weha didin biveguhertin: Helsa di Çûyîde, Helesî di Niha de, Helse di Fermanê de. Weha Badinan li cihê Helsan de Rabin dibêjin û ew weha didin biveguhertin: Rabû di Çûyî de, Derabit, Radibî di Niha de, Rabe-hulo di Fermanê de. Kurmancê Rojhilat dibêje:

Danîştin, danîşt, daenîşi, danîşe.
Badînanî dibêje: Rûniştin, dirûnit-rûdinê, rûne

Heger ku li vê Lîsta hanê de -ku ew nimûneyekî biçkole ye- baş lêbête binêrîn, Merov dide bidîtinb, ku mînabûna zaravayên Feylî û Lekî ligel beşên zaravayên Kurdî de ji mînabûna wan ligel zimanê Farisî de bi

bêtir ve tête biderkevtin. Jibervêjî bi tenya ve ji ber mînabûneke kêmî zaravayên wan ligel zimanê Farisî de tête biderkevtin, nabe ku Lor bi Farisî ve bêtin bidanîn. Bi xwe jî weku me li derîyê yekem de daye bigotin, beşekî ji Rohjhilatnasan Lor ji Miletê Kurd nadin bicihêkirin.

Rawilson derbarê zaravayên Lorê Gewre û Lorê Biçûk de dibêje, ku beşê yekem bi zaravayekî ve didin baxivtin, ku ew bi xwe jî ve bi zaravayekî Kurdî ve tête bierkevtin.

Lêbelê ew ligel zaravayên Kurdîyî din de di lihevhatina xwe de pir tête bicudakirin. Beşê duwem ew bi zaravayekî ve didin biaxivtin, ku ew nêzîkî zaravayê Kermanşahî tête biderkevtin. Lêbelê herdu beş, yên ku ew bi herdu zaravan ve didin biaxivtin, bi hêsanî ve ew di hevdû de têtin bigihandin. Bigir tevaya Lêgervanan û Zanistîvanan biyekdibin, ku zarava û zimanên Eşîrên Çiyayên Zagrosê bi xwe ve ew ji mayînên zimanê Pehlevîyî kevnar têtin biderkevtin. (Ji Zehaw tanî Xuzistan).

Derbarê zaravayê Sune û Hewremanî de Insiklopêdîya Musulmantîyê dibêje:

"Zaravayê Mukrîyî Kurmancî tanî bi Bane û Seqiz ve tête bidîtin û ji wê pêde û pêve ew nayête binardin. Li Jêrî ava Cefato, Xorxora û Tîleko de zaravayê Kurdistanî dide bidestpêkirin û ew tanî Jêrî welatê Sune tête biçûyîn.

Bi rastî ve divê li vî zaravayê hanê de bi rengekî zanistîyê zor baş lê bête bivenerandin. Zaravayê Merîwanî weku zaravayê Cafan bi carekê ve ew bi Kurmancî ve tête biderkevtin.

Zaravayekî ne Kurdî[392] li herdu Hewreman de tête bidîtin û pê tête biaxivtin û Hewramî pê tête bigotin û ew li layê Xelkê de bi (Maço-Ez dipeyivim) bi nav û deng ve tête biderkevtin.

Li hin dêhatên-gundên Pawe jî de her bi vî zaravayê hanê ve tête bipeyivandin.

[392]Nêt li vêderê de ku ew ne Kurmancî ye. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Li gundên Eşîrên Gewreyî Goran de li Jorî Zehaw de û li gundê Kandola de di navbera Dînawer û Kermanşah de, li hin gundên tirjî de û li Dêrsimê de zaravayê Zaza tête bidîtin, yê ku ew jî ji zaravayê Hewramî hatîye biwergirtin. Li gora lêkolandinên O. Man de ev hemû zaravayên hanê bi zaravayên Îranîyî Navî ve têtin biderkevtin û ew di rêza Samanî, Kohrodî Mahîlanî... hd. de divên bêtin bidanîn.

Derbarê zaravayê Sune de belgeyek bi destên me ve niye, belam zaravayê Hewramî-Goranî li gora evîn û destanên xweyî pir de gelekî bi dil şewat û kûr ve tête biderkevtin û hîç gûman têde niye, ku ew bi xwedanê wêjeyekî pir fireh û şêrîn ve tête biderkevtin.

Walîyê Erdelanê di Sera xwe de bi rengekî taybetî ve nav di piştgirtin û dilbijandina nivîsandina xweşxuwanîyê û wêje de bi vî zaravayê hanê ve dida bikirin. Hîç gûman têde niye, ku ev zaravayê xweşxuwanîyê li zaravayê Xelkê cihî de tête biderkevtin."

Institut kurde de Paris

Di vî babetê hanê de Mêcer Soane-Son dibêje:
"Li dora wê xêzê de, ya ku ew Loristanê û Kurdistanê ji hevdû dide bicihêkirin, hin ji Êşîrên Kurd têtin bidîtin, ku ew bi zaravayekî ve didin biaxivtin, yê ku ew li zaravayê Tacîkê kevnarî Îranê de tête biçûyîn.

Waha diyare, ku ev welatê Goran Xelkên wê damezrandî bûn û ew, weku me li serî de dayite bigotin, bi zaravayên cihê cihê dihatin biaxivtin.
Eşîrên Hewramî, Kandola û Rîzo jî bi cudabînekê kêm û zor jî bi van zaravayên hanê bi xwe jî ve dihatin biaxivtin.

Zaravayê Erdelanîyî bi nav û deng ve û zor zor di xweşxuwanîyî û wêje de hatîye bikarhatin û li Sune de Xelk bi vî Zaravî didin bixwendin û binivîsandin û ew pêjî zaravayê Hewramî û yanjî Şehrezorî dibêjin.

Li gora lêkolandinên hin ji dîtinên li ser vî zaravayê hanê de tête biderkevtin, ku beşê zorî Rûniştvanên Eşîra Goran bi vî zaravayê hanê didin biqisekirin û beşe Gerok-Kocer-Rêwend jê bi carekê ve bi Kurdî ve didin biaxivtin". (Gerandineke Veşartî li Kurdistanê û Cezîrê de, r. 381).

Eşîrên Kurdê Biraxoyî, yên ku beşekî zorî wan li Bilucistanê û beşekî jî li welatê Sindêyî Hindistanê de têtin bipeydakirin, bi zimanekî Kurdî ve didin biaxivtin, ku ew bi zimanê Biraxoyî ve bi nav û denge ve tête biderkevtin. Ev zaravayê hanê ji girûhê Dirawîdîyî Navînî û Jêrîyî Hindistanê tête biderkevtin û hin ji gotinên Bilucî û Farisî jî têkelî wî hatine bikirin. Ew tanî vê pêla dawîjî de her bes ji bona peyivandinê dihate bikarhatin. Belam êsta pê tête bixwendin û binivîsandin. Hin ji çîrok û xweşxuwanên nivîsandî bi vî zimanê ve hanê têtin bidîtin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê, B. 1, r. 630)

Institut kurde de Paris

## 4. Civat, Wêje Û Çapemenîyên Kurdî

### 1. Civat

Yekemîn Civata Siyasîyî Kurdî Kurd Tealî û Tereqî Cumîyetî-Civata Bilindbûn u Pêşveketina Kurdî tête bidîtin. Ew li Istenbolê de li sala 1326 k.- 1908 z. de hate bidamezirandin[393].

Bidanînvanên wêna Amîn Alî Begê Bedirxanî, Ferîq Mohemed Şerîf Paşa, Şêx Ebdulqadir Efendî Nevîyê Dilovavê Şêx Ubeydulahê Nehrî û Padşah Muşîr Ehmed Zul-Kufil Paşa bûn.

Bigir di wê demê jî de li Istenbolê de Kurd Neşir Mearif Cumîyetî-Civata Bibelavkirinên Zanyarîyên Kurdî hate bidanîn û wê li taxa Cenberlî Taşde Dibustan ji bona hînkirina Zarokên Kurd date bivekirin.

Belam pir bi ser van herdu Civatên hanê ve pê neçû, tanî ku ew ji bal Dewleta Itihad û Tereqî de hatin bihilanîn û dibustan jî hatin bigirtin.

[393]Weha evaya bi nav û denge. Belam ji nameyeke Turkî di bin nav û nîşana Mîr Bedirxan de ji bal Lutfî bi navê Civata Kurd di sala 1320 k. de di Çapxana Ictihad de li Misrê de, ku Xwedîy wê Dilovanê Dr. Eb-Dula Cedet bû, têtê biderkevtin, ku Civateke Kurd kevintir hatîye bidîtin; jiber ew di wê nameya xwe de dibêje, ku hatina wê ji bona Civata Destê Xurtî Kurdistanî diyare. (M. E.).

Belam Civata pêşî bi dizî ve dîsan dihate bikombûn û wê ji bona xebatê terxemî nedida bikirin.

Li sala 1328 k.- 1910 z. de li Istebolê de Civata Hêvî ji bal Xwedevanên Kurd hate bidanîn û wê tanî Şerê Gewre ddate biirêjkirin. Li dawîya Şerê Gewre de dîsan vê Civata hanê dest bi kombûnên xwe ve date bikirin û tanî berdestbûna Istenbolê ji bona dewleta Kemalî ve wê date bidirêjkirin.

Wehajî di piştî rawestandina Şerê Gewre de li Istenbolê de Civateke Siyasîyî din bi navê Kurd Istiqlal Cumîyetî-Civata Serxwebûna Kurd hate bidamezirandin û Serokê wê Nevîyê Şêx Ubeydulahê Nehrî Seyid Ebdulqadir Efendî bû û hemû Mîr û Serokên Kurd di nava wê de dihatin bidîtin.

Li duwayî demekê de Bedirxanî ji vê Civatê hatin bicihêbûn û wan Kurdistan Teşkîlat Ictimaîye Cumîyetî - Civata Pêkhatinên Civakî li Kurdistanê de dane bidamezirandin.

Ji bil van jî her di vê demê de û li Istenbolê de Civateke tir bi navê Cumîyetî Qewmi Kurd-Civata Miletê Kurd) hate bidamezirandin.

Ev Civatên hanê tanî hatina dewleta Kemalî li Istenbolê de hatin bidirêjkirin. Li duwayî de ew ji hev hatin bibelavkirin.

Li paş demekê de bi navê Xweyîbûn ve Civatek li derveyî Turkî de hate peydabûn û ew tanî êstajî di kar de tête bidîtin.

## 2. Wêje

Mexabin, ku em tu tiştî li ser Wêjeya Kurdîyî kevnar de nizanin. Hîç gûman jî têde niye, ku evaya jî ji guhpênedna Zanistvan û Mêjûvanên Kurd têtе biderkevtin; jiber ku wan ev alîyê hanê ji jîna Meletê xwe, ya ku ew bi bûyîn û kirinan ve pir têtе bidagirtin, bi carekê ve bi xwe ve dane bijibîrakirin.

Institut kurde de Paris

Tevî li van karên hanêyî pirî şermezar jî de ji bona Lêgervan û Lêkolanvanan tête bidiyarkirin, ku pir ji Wêjevan û Xweşxwevanên Kurd zor ji şopên Mêjûyîyî mayîn bi zimanên Biganan ve dane biafiridan. Jiber van karên wanî wêjeyî peyvdarên bi wan zimanan ve ew ji Miletê xwe dane binasîn.

Ez gûman dikim, ji wan Merovan em nikarin tu gazinê bidin bikirin; jiber ku guhpênedana Zanistvan û Wêjevanên Kurd bi zimanê xweyî mîlî ve û herwehajî di serguhê xwe re biavêtina guhpêdana bi wêjeya wî ve bi pileyekî weha ve hate bigihaştin, ku Mêjûvan û Zanistvanan, yê ku ew li rastîyan de dihatin bigerandin û ew didan bitomarkirin, nema wan dikarîbûn, di rastîya milîbûna wan Kurdan de bihatina bitêgihaştin.

Jibervêjî pir bi pêwist ve tête biderkevtin, ku em li wan Merovan de nedin bigirtin, yên ku ew li Kurdbûna wan Zanistvanan de didin bigûmankirin.

Ji bona nûme, em hinekan ji navên van Zanistvan û Wêjevanan li vê derê de didin bitomarkirin:

Melek Tac El-Miluk Ebu Seîd Borî ji Melekên Eyûbî ve, yê ku ew di sala 579 k.- 1183 z. de hatîye bimirin. Ibin El-Mistewfî El-Erbilî, yê ku ew di sala 637 k.- 1239 z.de hatîye bimirin. Ibin Xelkanê bi nav û deng, yê ku ew di sala 681 k.- 1282 z. de hatîye bimirin. Ebu Bekrê Eyûbî, yê ku ew di sala 727 k.- 1327 z. de hatîye bimirin. Ebû Elfidayê Eyûbî, yê ku ew di sala (732 k. - 1332 z. de hatîye bimirin. Mewlana Îdrîsê Bedlîsê, yê ku ew di sala 926 k.- 1519 z. de hatîye mirin. Muftîyê El-Siqleyin Ebu El-Suûd El- Êmadî, yê ku ew di sala 982 k.- 1574 z. de hatîye bimirin. Mah Şeref Xanima Erdelanî[394], ya ku ew di sala 1263 k.- 1847 z. de hatîye bimirin. Ayşa Teymurî, ya ku ew di sala 1320 k.- 1902 z. de hatîye bimirin. Herwehajî pirên din jî ji Zanistvanên Kurdên bi nav û deng, tevî ku ew Kurd bûn, wan pir ji nivîsînên xweyî mayîn bi zimanê xweyî Kurdî ve nedane binivîsandin.

[394]dîwana Xweşxuwanên wê Farisî li Tehranê di sala 1344 k. hatîye çapkirin. Nav û Nîşana wê Mestureya Kurdistanî bû. Ew li dor sala 1220 k. de li Kurdistana Îranê bi dunyayê ve hatîye. Wê bi Xusro Xanê Walîyê Kurdistanêyî Giştî mêrkir. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Weha wan bi vî rengî ve pir karên mezin ji bona Miletên din bi zimanên wan ve ji wan re dane bipêşkeşkirin, di gava ku wan zimanê xweyî milî û wêjeya xweyî gelêrî bi carekê ve di ser guhên xwe re dabûn biavêtin.

Jimara Zanistvanên Kurd ji Gewreyên Mêjûwê, yên ku wan zimanê xweyî milî ji nivîsandinên şopên xweyî hozanîyî pirî bilind dane bibêpişkûparkirin, li gora zanebûna min de bi sedan ve têtin bidîtin. Li vê derê de ez ji hin navên Zanistvanên Kurd didim bibîrxistin, ji yên ku wan bi pirbûn ve bi zimanê xweyî milî ve dane binivîsandin û wan ji me re xizneyeke wêyjeyî milîyî baş li dû xwe de dane bihiştin.

Institut kurde de Paris

**Hin ji Zanistvanên kurd, yên ku bi pirbûn ve bi Kurdî ve dane binivîsandin**

*1. Baba Tahir Hemedanî*

Şaêrekî Sofîyî Xwedanî ye. Weha tête bigûmankirin, ku ew li dora sala 401 k.- 1011 z. de hatîye bimirin. Xweşxuwanên wîyî evîndarî û xwedanî bi rengekî Sofitî ve hatine binivîsandin. Ew pir hevgirtî û dujwarin.

Ew bi zaravayê Goranî ve di wê pêlê de hatine bitomarkirin. Hinek wî ji destê Lor didin binasîn, lêbelê ew bi Hemedanî ve hatîye binavûdengkirin. Rojhilatnasan pir guhpêdanî dane bikirin û herwehajî wan pir kar ji bona civandin û belavkirina nivîsandinên wîyî wêjeyî dane bikirin.

Weha Xwedîyê Kovara Ermexanîyî Farisî li Tehranê de dîwana vî Şaêrê hanê di sala 1927 z. 1306 F. de date bibelavkirin. Ew ji 296

Çardêran, 4 Evîndaran û ji pêvekirineke ji 62 Çardêran tête bipêkhatin. Sî û Çar Çarînên ji Çarînên vê dîwana hanê pir bi berzûna xwe ve di wêneyên serên xwe de û sipehîbûna dahatinên bi serxwe ve têtin bidîtin û ew di bext û dildarîyê de nimûneyên agirîne.

Du Çarîn jê libergardin û bangkirinin. Ji wanên mayî hemû pesin û nîşandanin.

Felsefa Baba Tahir di Can û Jînê de bi carekê ve bi servajî Felsefa Umer Xeyame ve têtê biderkevtin. Ronahîya Sofîtîyê, ya ku pê xweşxuwanên Baba Tahir didin bironahîkirin, em wê di nivîsandinên Xeyam de nabînin. Baba Tahir ji beramberên xwe bi nermbûna pêhestbûna xwe ve, bi bilindbûna evîndarîya xwe ve, bi hêsanbûna şêwêyê xwe ve di pesnê derd û janan de têtê bicudakirin.

*2. Elî Termokî*

Ew yekeke ji du Mamostên Wêjevanên kevnarîyî Kurdin, yên ku mêjûwa wêjeya Kurdî navên wan daye bimayînkirin.
Ew ji gundê biçûkî Termokê ye, yê ku ew li navbera Mako û Hekarê de têtê bikevtin.

Ew Yekekî pêşî ye, yê ku wî rêzimana zimanê Kurdîyî niha daye bidanîn. Nivîsandineke wîyî din jî heye, ya ku wî têde bihîstin û bînên xwe di gerên xwe de di nava welêt de dane bitomarkirin.

Nivîsta Insiklopêdîya Musulmantîyê, ya ku me jê ev agehdarîyên hanê dane biwergirtin, nade bidiyarkirin, ku ev herdu nivîstên wîyî hêja li kûderê de têtin bidîtin.

Lêbelê nivîsta di Pendên Kurdî de ji bal Kamiran Beg û Luwis Pol Mergirêt de bi zimanê Firensî ve, ya ku ew di sala 1937 de li Parisê de hatîye biderkevtin, ew çend ji xweşxwanên vî Wêjevanê hanê bi xweşxuwanî ve bi zimanê Firensî ve dane biwergerandin.

Weha ev wergerandinên xweşxuwanîyî hanê bi bilindbûneke pirî berz ve ji me re didin biderxistin, ku wêjeya meyî kevnar xwedanê dilekî

Institut kurde de Paris

wêjeyî pirî mezin, xwedanê pêhestkirineke pirî nermî tenik û wêneyekî serîyî pirî fireh bû.

Xweşxuwanên wî bi navên Gotinek bi tenha ve, Xelkên welatê Min, Xişrê ji Yaqut û Jîyan Xweneke di wêjeya xwe de pir bilindin, di têgihştina xwe de pir bala û berzin û di pêhestbûna xweyî milî de pirî kûrin.

Ev Wêjevanê meyî hanê ji Zanistvan û Hêjayên sedsalê Çaremînî Koçî tête biderkevtin.

Institut kurde de Paris

### 3. Elî Herîrî

Ew ji Xelkê gundê Dêr Herîrê di herema Hewlêrê de tête biderkevtin. Ew di navbera salên 400 û 470 k.- 1010 û 1077 z. jî hatîye bizayîn. Ew di pêla Şaîrê Îranîyî bi nav û deng ve Ferdosî Tosî jî hatîye bijîyandin.

Dîwana wîyî bi nav û deng ve bi zaravayekî Kurdî ve hatîye binivîsandin, ku ew îro pir nêzîkî zaravayê gundê Dêr Herîrêyî niha tête biderkevtin. Ew ji bal piranîya Kurd de tête biliberketin.

Xweşxuwanên wî pir tenik û nermin û hêjî bi serdejî ve di nava wan de hogirî, tîn û jan têtin bidîtin.
Şêweyê nivîsandina wîna pir bi şeng û hoşeneg ve tête biderkevtin. Piranîya xweşxuwanên wî, yên ku min ew dane bixwendin, hemû li ser evîndaryê de têtin biderkevtin. Mebetsta wan bes û bi tenha ve evîndarîya bi serêxwe û xurû ve tête biderkevtin.

### 4. Meleyê Cezîrî

Navê wî Şêx Ehmede û ew li bajarê Cezîrê de hatîye bizayîn. Ew di nîvê dawî de ji sedsalê şeşemînî koçî de hatîye bijîyandin.

Pir tête bigûmankirin, ku ew di pêla Îmad El-Dîn Zengî Etabikê Musilîyî bi nav û deng ve dihate bidîtin. Wî ji bona li Dûxwevanan de dîwaneke pir bi nerx dayite bihiştin. Zaravayê wî pir li zaravayê herema Botanî niha de dire.

Ev dîwana hanê li Berlinê de di sala 1322 k.- 1904 z. de hate biçapkirin û jê Daneyek li Nivîstxana El-Eb Enstasî de li Bexdadê de tête bidîtin.

Xweşxuwanên wî ji alîyê bipêkhatina wan de şêweyekî wanî taybetî tête bidîtin û ji alîyê mebesta wan de ew di dawîya bilindbûna evîndarîyê de têtin bidîtin.

Institut kurde de Paris

Weha diyare, ku dilê vî Xweşgovanê Mezin ji bona Mîreke Kurdî ve dida bilêdan.

Wî tevaya jîna xweyî poşandî bi bêhêvîbûn û derd ve bi carekê ve date birîskirin û bi hunandina xweşxuwanên evîndarîya nimûneyî xurû ve date bitevinkirin û birabuhurandin.

*5. Fiqê Teyran*

Ew ji Xelkê Mako tête biderkevtin. Ew di nava salên 707 û 777 k.- 1307 û 1375 z. de hatîye bijîyandin. Wî di bin H. M. de dida binivîsandin. Navê wîyî rastî Mihemed bû.

Hin xweşxuwanên wî hene û bi serdejî ve du nivîstên wîyî bi nav û deng ve têtin bipeydakirin. Yek bi navê Çîroka Şêxê Senan, ya din bi navê Qolê Hespê Reş têtin bidîtin. Şêweyê nivîsandina wî bî şêweyê serûştîya cîhê wîyî taybetî ve tête bigirêdan.

Institut kurde de Paris

*6. Meleyê Batê*

Ew ji Xelkê gundê Batê li Ostana Hekarê de tête biderkevtin û navê wî Ehmede. Ew di navbera salên 820 û 900 k.- 1417 û 1495 z. de hatîye bijîyandin.

Dîwanek xweşxuwanê wîyî baş tête bidîtin. Wî çîroka Zayîna Pêxember bi zaravayê kurmancî daye binivîsandin. Von Logok ji mêj de wêneyên wê dabûn bigirtin û wî ew date bibelavkirin[395].

*7. Ehmedê Xanî*

[395]Ew ji bal Xwendevanê Rewaqa Kurd li Ezher de Kurdî Ehmed Zade, Xwedê lêdilovan be, di sala 1324 k. de hate Capkirin û bibelavkirin. (M. E.).

Ew Eşîra Xanî tête biderkevtin, ya ku ew li herema Bayezîdê de tête bidaniştin. Ew di navbera salên 1000 û 1063[396] k.- 1592 û 1653 z. de hatîye bijîyandin.

Ji nivîsandinên wî Destana Mem û Zînê tête bidîtin, ya ku ew bi gewretirîn xelata mayînê ve tête biderkevtin, ya ku ew tanî niha ji bona wêjeya kurdî hatîye bipêşkeşkirin.

Ew li Istenbolê de di sala 1340 k.- 1922 z. de hatîye biçapkirin. Ji bil vêjî de Ferhengek wîyî Kurdî Erebî tête bidîtin, ku ew bi navê Nûbuhar-Nûbuhara Biçûkan hate binavkirin. Ew di sala 1094 k.- 1623 z. de ji bal Diya Beg hatîye bibelavkirin? Ji bil van jî pir xweşxuwanên bi Kurdî, Erebî, Farisî û Turkî ve têtin bipeydakirin.

*8. Şerîf Xan*

Ew ji Xelkê Çolmergê tête biderkevtin û ew di navbera salên 1104 û 1161 k.- 1693 û 1748 z. de hatîye bijîyandin. Ew ji Binemala Mîrên Bedlîsê tête biderkevtin. Xweşxuwanên wî bi Kurd û Farisî ve têtin bipeydakirin û piranîya wan li ser evîndaryê de têtin bidîtin.

*9. Muradxanê Bayezîdî*

Ew di navbera salên 1150 û 1190 k.- 1740 û 1780 z. de hatîye bijîyandin. Hin ji xweşxuwanên wî li ser evîndarîyê û şûnê de têtin bidîtin.

*10. Şahpurtoyê Hekarî*

Institut kurde de Paris

[396] Di Pêşgotina Mem û Zîna çapkirî de li Istenbolê de di sala 1337 de hatîye, ku ew di sala 1063 k. de bi dunyê ve hatîye, wî nivîsta xwe di sala 1105 k. de daye binivîsandin û Temenî wî wê çaxê 44 salî bû, mîna ku wî ew di dawîya çîroka xwe de daye binivîsandin. Herwehajî têde hatîye, ku di sala 1094 k. de Nubuhar hatîye binivîsandin û ne ku ew hatîye çapkirin. (M. E.).

Di nava destên me de tu agehdarî barmaberî vî Şairê hanê ji bil goyekê pêve niye, ku ew dibêje, wî dîwana xwe di sala 1221 k.- 1806 z. de bi zimanê kurdî ve daye bidawîkirin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

*11. Şêx Marof Nurî*

Ew yekek ji Gewreyên Şêxên Berzencî tête biderkevtin û herwehajî ew ji gewretîrin Zanistvanan tête bidanîn. Ew di navbera salên 1116 û 1254 H.- 1753 û 1838 z. de li bajarê Sulêmanyê de hatîye bijîyandin.

Ji bil nivîsandinên wîyî pirî Oldarî bêtir ji Bîst nivîstan di wêje û xweşxuwanîyê de piranîya wan jî li ser evîndarîyê de bi zimanê Erebî û hinek ji wan jî ve bi zimanê Farisî ve têtin bidîtin. Nayemeyeke wîyî bi Erebî û Kurdî ve di bin navê Ehmedî de tête bidîtin. Min hêjî xweşxuwanên wîyî kurdî nedane bixwendin.

---

Nayête biveşartin, ku agehdarîyên me li ser Wêjevan û Şaîrên Kurd di sedsalês sêzdehemînî kocî de pirî kêmên. Jimara wan bigir ew jî mîna jimara wanî sedsalên dinin. Ev jî ji bona vî hoyê hanê tête bivegerandin:

1. Jiber ku navên wan û navên nivîsandinên wan nehatine bitomarkirin.
2. Jiber ku wan ji xwe re nivîsandin bi zimanên Bêganan ve di ser zimanê xweyî kurdî re didane biwergirtin.

Li vê derê de bes û bi tenha ve em bi navê wêjeya kurdî dikarin mexabûna xwe bidin biderxistin. Li ser vê zîneta hanê de em dikarin bi peyvên Şaîrê mêraxsê kurdîyê Lêdilovanî Hacî Qadirê Koyî bêjin:

Kitêb û Defter û Tarîx û Kaxez Be Kurdî Ger Binusraye zimanî ?
Mela û Mîr û Şêx û Padşan Heta Mehşer dema Nam û Nîşan?

cihê mexabînê ye, ku Wêjevanên Kurd ev deqa hanê bi carekê ve di ser guhên xwe re dane biavêtin û ew li ber wê de nehatin bikevtin.

Institut kurde de Paris

Bi serdejî ve wan zimanên Miletên din di ser zimanê Miletê xwe re dane birgirtin, da ku ew pê nivîsandinên xwe bidin biderxistin.

Jivêjî perîşanîya wêjeya kurdî û bedbextîya wêna hatîye biderkevtin. Wêjeya kurdî di pir sedsalan de ew ji berên hozanî û şarezabûna bilindî Zarwên xwe ve hatîye bibêpişkûparirin, lêbelê ji wan zimanên Bêganan pir sûd û qazanc ji xwe re dane biwergirtin.

Em nizanin, ew çi kirdar û hobûn, yên ku wan weha li wan Wêjevan û Zanistvanan de dane bikirin, ku ew wisa bidin bikirin?

Gelo emê wan di wê bîr û bawerîya wan de bibînin, ku zimanê Kurdî di qada wêje de dê nikaribû bi wî kar û barê giran ve bête birabûn, yanjî çima?

Li gora zanebûn û bextê me de zimanê kurdî ji mîna vê kêmanîyê bi bê guneh ve tête biderkevtin; jiber zimanê me pir bi maldar û dewlemend ve tête biderkevtin. Weha Lêdilovanê Hacî Qadirê Koyî ji vê zîneta hanê di çend malikên xweyî kurdî de dide bigazinkirin:

Kurdî Axir çiye eybî her kelamê heqe niye eybî?,
Lefzê Kurdî belaw nebû Girdibû wa li ma beyni ême de têk çû?,
Li fesahet belê mehrayî çe qiyamet bi Ermenîşî nabî ?,

Bi kurtî ve ew rêya guhpênedanê û pîskirinê, ya ku Wêjevanên Kurdan beramber bi zimanên xwe ve tanî destpêka sedsalê sêzdehemîn hatin bisedeçûn, hêdî hêdî ji wê mêjûwa hanê li hin perçên Kurdistanê de hate biveguhertin.

Weha Zanistvan, Wêjevan û Şairên Kurd bi derxistina nivîsandinên xwe bi zimanê kurdî ve dane bidestpêkirin. Wan didan bikarkirin, da ku ew wê valabûna wan hiştiyên Bav û kalên xwe di wêjeya milî de bidin bidagirtin.

Perçê ku herî pêşî bi vê valabûna mezin ve ji perçên Kurdistana gewre pê hate bişiyarkirin, ew bi xwe ve Kurdistana Îraqê bû û bi taybetî ve heremên Sulêmanyê, Hewlêr û Kerkûkê bûn. Herwehajî ligel jî de

Institut kurde de Paris

Wêjevan û Şairên Kurdistana Îranê jî bûn; nemaze devera Mukrî roleke ne kêm di vê şiyarbûna wêje de û di vejandina remanê de date bilîstin.

*12. Mihemed Axa*

Ew li gundê Derbend Feqere de li herema Sulêmanyê de mezin bûye. Ew Şairekî li nava gundan de di pêla Mîrneşînîya Evdul-Rehaman Paşa de di nava salên 1204-1227 k.- 1790-1812 z. hatîye bijîyandin.

Gûman têde niye, ku yweşxuwana wîyî bi navê Girîna li ser dildarî û evîne de, ya ku ew bi nava destên me ve hatîye bikevtin, pir di wêneyên serên xwe de, di başbûna kêra xwe de û di hozanîya pesnê xwe de bi berz û bala ve tête biderkevtin.

Wî xweşxuwanên xwe bi zaravayê Eşîra Caf ve daye binivîsandin. Ew pir hêsanin û di şêweyê xwe de ew têtin biherîkandin. Tevlivîjî de di nava wan de dilsoziya evîndarîya pir û kûr têtin biderkevtin.

Ji xweşxuwana wîyî Girîna li ser dildarî û evînê de tête biderkevtin, ku Berdila Şaîr ji bal Mîrê Baban de hatibû bianîn, bêyî ku ew bizanibe, ku ew Berdila Şair bû. Lêbelê gav mîr ev xweşxuwana hanê date bixwendin, wî Berdila Şair date biberdan û wî ew lê date bivegerandin.

*13. Nalî*

Navê vî Şairê hanê Mele Xidire û ew ji Xelkê Şehrezorê ye. Ew di navbera salên 1215 û 1273 k.- 1800 û 1856 z. de hatîye bijîyandin.

Di pêşî de wî dest bi hînbûn û xwendinê ve li Qeredaxê de dayite bikirin. Li paş de wî xwendina xwe li Sulêmanyê bi dawî ve dayite bianîn.

Du carî wî ji bona Istenbolê serdanî dayite bikirin û yek carê jî ew ji bona Mala Xwedê hatîye biçûyîn.

Institut kurde de Paris

Di cara pêşî de wî serdahatina xweyî xweşxuwanîyê û hatina xweyî wêjeyî ji evîndarîya Keçeke kurdî ji Qeredaxê di dema xwendina xwe de dayite biwergirtin.

Weha hatîye bilihevrasthatin, ku ew ji Dildarên bextiyar bête biderkevtin; jiber ku ew ligel Dilbera xwe û kanîya serdahatina xweşxuwanên xwe de hatîye bimehrkirin.

Di çûna xweyî duwem de ji bona Istenbolê çavên wî bi Ehmed Paşa ve hate bikevtin, yê ku ew Mîrê Babanî dawî bû. Ew ligel wî de li wêderê de tanî mirina xwe hate bimayîn. Piranîya xweşxuwanên wî ji rengên evînadrîyî nermî bi kêr ve têtin biderkevtin.

Xweşxuwana wîyî bi nav deng ve, ya ku wî ji Istebolê li ser hogirî û dildarîya xwe ji bona welatê xwe de dayite binivîsandin, ew baştirîn belge li ser tenikbûna dilê wî û evîndarîya wîyî pirî kûr de ji bona welatê wî dide biderxistin.
Dîwana wîyî civandî karîna wîyî yweşxuwanîyê bi hersê zimanan ve dide biderxistin. Ew bi xwe ve dibêje:

Faris û Kurd û Ereb hersêm be defter girtuwe
Nalî, Imro Hakimê Sê Mulke, Diwanî heye?

Ev dîwana wî ji bal Wêjevan Kurdî Meriwanî ve li Bexdadê de di sala 1931 z. de hate çapkirin.

Institut kurde de Paris

*14. Hacî Qadir*[397]

Bi Mîrê Xweşxwuvanên kurdî bê hember ve tête biderkevtin. Ew bi Xweşxwuvankî welatperwer û pirî xwîngerm ve dihate biderkevtin. Ew li gundê Gorqerç de (Mîjuwa Bi Nav û Bangên Kurd, b. 2, r. 47, Baba Marduxê Runahî, bi zimanê ve Farisê, Tehran 1987 de li ser Hacî qadir û herwehajî li ser Tevaya Navên dinê di vê mêjûwa hanê de hatine binivîsandin, ji xwe re li ser wan de bidin bitemaşekirin; jiber pir agehdarîyên bi nerx û nuh di nava wê de tête bidîtin. Bigir di vî warê hanê de ew pir valabûnan dide bidagirtin - Cuma) li nêzika Koyê de hatîye bizayîn. Ew di navbera salên 1232 û 1344 k. hatîye bijîyandin. Ew pir bi welat û Miletê xwe ve hatibû bigirêdan û wî pir jî ji zimanê xweyî milî didate bihezkirin û pê pir didate biguhdan. Wî tevaya evînadarî û pêhestbûna xwe di hemû xweşxwewanên xwe evîndaryê de dida biderxistin. Xweşxwewanên wîyî gilî û bi derd ve hemû bi carekê ve bi paşvemayîna Netewî wî ve di warên siyasî, civakî û abûrî de dihatin bigirêdan. Wan tevay berberî û duberîyê di nava Kurdan de dida biderxistin, yên ku ew hîç bi wan ve ne dihatin bipêwistîkirin:

Tembelî, karê hîz û bêxîre dest mando li ser zikê têre
Ehlê Cunet ne Şivan û Gavane Sahibê fen û Ilm û Irfane
Faide ger bidaya zikir û dua Dibuwe Qarun Gedayê ser Rêga
Ewê bê behreye li kesb û kemal Ebine Derwêş û Sewalker û Hemal

Şaîrê meyî Mezin ji alîyê bilindibûna remana wî, berzbûna xweşxuwanên wî û şêweyê wiyî xwîngermî de û bi kêr ve li Wêjevan û Şairê bi nav û bangê Turkî Namiq Kemal Beg de dire, yê ku armanca wîyî bilind di jînê di vê malika wîyî hanê de tête biderkevtin:

Olorsem kormeden miletde umîdyetdikem feydi
yazilson senk qebirmede Weten Muhzin webin mehzun

---

[397] Di Komek ji Xweşuwanên wîyî Kurdî de, yên ku ew li Bexdê de di sala 1344 k. - 1925 z. de hatîye çapkirin, têde hatîye, ku ew Kurê Mele Ehmed ji Eşira Zenge ye. (M. E.).

(Ger ez mirim, berî ez xweşbûm û pêşkevtina Miletê xwe bibînim debara li ser gora min bête binivîsandin ez û welat biderdin).

*15. Mustefa Beg*

Di pêşî de ew bi Hicrî ve û di paş de ew bi Kurdî ve dihate binavkirin. Ew ji Malbata Sahibqeranê Sulêmanyê tête biderkevtin. Vedibêjin. ku ew di navbera salên 1227 û 1267 k.- 1809 û 1849 z. de hatîye bijîyandin.

Ew Şaêrekî pir bi bal ve dihate biderkevtin. Li ahengan de ji ber xwe û li ser pîyan de wî xweşxuwan didatin bixwendin. Piranîya xweşxuwanên wî li ser evîndarîyê de têtin bidîtin. Lêbelê jî hin ji wan jî li ser warên civakî û mêjû de têtin bidîtin. Wî xweşxuwanî bi pirbûn ve bi kurdî ve didan binivîsandin û herwehajî wî car caran jî ew bi Farisî, Turkî û Erebî ve didan binivîsandin.

Wî demeke pirî dirêj li welatê Îranê de date bibuhurandin. Ew ji bona nava Civata Encûmen Edîbanê-Encûmena Wêjevanên Îranî hate bikevtin.

Vedibêjin, ku wî zora Şairê Îranîyî Qa Anî di xweşxuwanîyê û wêje de daye bibirin, ya ku ew di nava wan de demeke dirêj hatîye bikirin.

Hacî Qadir di van herdu malikên xwe de pesnê wî weha dide bikirin:

Şehsuwarê Belaxeti Kurdan Ye ke tazê fesahetî Baban
Mustefa ye Texelisî (Kurdî) Xezil kirde be rutbê Kurdi

Hinek ji dîwana xweşxuwanên wî li Bexdadê de di sala 1931 z. hate biçapkirin

*16. Ebdul-Rehman Beg*

Di pêşî de ew bi Rencor û Bîmar ve û di dawî de ew bi salim ve hate binavkirin. Ew ji Xelkê Sulmanyê tête biderkevtin û ew ji Binemala

Sahibqeranê bi nav û deng ve têtê biderkevtin. Ew Kurê Şairê kurdîyê bi nav û denge û herwehajî ew bi hemdemê wî ve têtê biderkevtin. Weku ku têtê bigotin, ku ew di sala 1220 k.- 1805 z. de ji bonadunyayê hatîye bipeydakirin.

Ew ji bona welatê Îranê çû, piştî ku mîrneşînîya Babanî hate binebûdkirin.

Ew demkê li wêder dehate bimayîn. Ev malika wîyî hanê ji me re hogirîya wîyî pir ji bona welatê wî û herwehajî bêzarbûna wîna li Îranê de dide biderxistin:

Ligel dil şerte salim ger, necatim bû, le Tehran dâ
Beheşti Ere bête Deştê Rê, be Îran da guzer nakim

Vedibêjin, ku salim ji Tehranê hate birizgarkirin û ew ji bona Sulêmanîyê hate bivegrandin û ew li wêderê de di sala 1286 k. de hate bimirin.

Ew Şairekî pir dilnerm û evînadar bû. Diwana wî li Bexdadê de di 106 pelan de li Çapxana Eytam de di sala 1933 z. de hate biçapkirin.

*17. Mewlewî*[398]

Navê wî Ebdul-Rehmane. Ew li Hewremanê bi dunyayê ve hatîye bipeydakirin. Ew Xelîfê Şêx Osmanê Tewîlêyî ji Şêxên Neqşebindîyî bi nav û deng bû.

Ew di dawîya sedsalê nozdehan de ji bona nik dilovanîya Xwedê çû. Ew Şairekî pir diltenik bû, ew di evîndarîya xwe de pir berz û bala bû. Ew Sofîyekî pirî dilsoz bû û ew di pêhestbûna xwe de pir rast bû.

[398]Di Dîwa Xweşxuwanîya wî de, ya ku ew li Sulêmanîyê de di sala 1354 k.- 1930 z. de hatîya çapkirin, hatîye, ku ew di sala 1222 k.- 1804 z. de li gundê Tawx Goz de ji gundên Ciwanro de bi dunyê ve hatîye û ew di sala 1300 k. 1882 z. de li gundê Ser Şate li pişt keleha Şemîran de mirî ye. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Şêweyekî wîyî taybetî pir vejandî di xweşxuwanîyê de hebû. Bi ser hêza wî di nûvejandin û hunerkinê de di xweşyuwanyê û dawîya wan jî de wî ji xwe re şweyekî Ewropîyî nuh di hunera xweşxuwanîyê û peyvdarîyê de di zimanê kurdî de date bivejandin; tevî ku dorhêla wî pir ji wan welatan dûr bû, ji yên ku ew bi Wêjeya Nuh ve hatibûn bikêrkirin; tev dûrbûna wî jî ji civakê û xelkê jî û tevî zanîbûna wîna bes bi zimanên kurd, Farisî û Erbî jî ve wî ew nuhvejandinên hanê dane bikirin.

Giringtirîn nuhvejandina wîna di rêxistin û nivîsandina xweşxuwanîyê de di yekkirina dawîya xêza pêşî ligel dawîya xêza sêyem de û dawîya xêza duwem ligel xêza çarem de daye bikirin.

Ev karê hanê tanî wê demê jî ew ne ji bal kesekî de ji Xweşxwuvanên Faris û Kurd hatibû bikaranîn.

Di nivîsandina xweşxuwanên xwe de her û her wî zaravayê Hewremanî dida bikaranîn. Bigir tevaya navroka xweşxuwanên wî bi carekê ve hemû li ser jêhêvîkirin û bangkirina Xwedê de tête biderkevtin û ew li ser evîndarîya Xwedêyî de bi kûr ve têtê biderkevtin. Ji xweşxuwanên wîyî pir diltenik em vê malika hanê didin bipêşkeşkirin:

Gul, Çon ruwê Azîzi nezaket poşan
Wefer Awan çon seylî dîdeyê min coşan

*18. Şêx Rida*

Ew Kurê Şêx Ebdul-Rehmanê Talebanîyî bi nav û denge, yê ku ew di şarezanebûna xwe de di Şiir û Wêje de hunervan bû. Ew li navçeya Baziyan de li melbenda Çemal de, li Parêzgeha kerkûkê de bi dunyayê ve hatîye bigihadin. Ew li bajarê Kerkûkê de mezin bû û wî li wêderê jî de xwendina xwe bi dawî ve dayite bianînan. li paş de ew ji bona welatê Hicazê ji bona Mala Xwedê çû.

Li paş vegera xwe ew ji bona Istenbolê çû û demekê ew li wêderê de hate bimayîn. Li Istenbolê de çavên wî bi Wêjevan û Xweşxuwanê bi

Institut kurde de Paris

nav û deng ve Namiq Kemal Beg ve hate bikevtin. Namiq Beg pir bi jîrbûna wîyî gûr ve û bi karîna wêyî pir bilind ve dilê wî biserveçû.

Bi her çar zimanan ve bi Kurdî, Farisî, Erebî û Turkî ve Şêx Rida pir xweşxuwanên zengilî dane binivîsandin. Xweşxuwanên wî zorin û ew pir cudane. Di nava wan de xweşxuwanên Gepê, Devbiavêtinê, Felsefê û Pesindarîyê têtin bidîtin.

Piranîya Xweşxuwan û Sirûdên wî li ser lingan de jêre dihatin biderkevtin. Ew pir di peyvîna xwe de hêsanin û ew di têgihştin û mebesta xwe de pir kûrin. Ew di Xeret El-Muherem sala 1328 k. 13. rêbenda sala 1910 z. de li Bexdadê hate bimirin û ew li kêleka Goristana Şêx Evdul-Qadirê Gêlanê de (Perestbûna Xwedê li ser Veşartiyên wî bin) hate biveşartin.
Li ser Kêla wî de ev Çarîna wîyî Farisî hatîye binivîsandin:

Ya Resole lah çe başed Çon Segê Eshabê Kehev
Daxilî Cunet şom der zemreyî Ehbabê to
O rod der cunet men der cenehem kî rewast
O Seg Eshabi Kehev û men Seg eshabî to

(Ho Peyamberî Xwedê çi bûye çawa Segê Hogirên Şikevtê
ew ji bo nava bihuştê bo nik Hogirên te tête bicihkirin ?
Ew ji bo Buhştê tête birêkirin, kê min ji bo dujehê date binardinin?
ew Segê Hogirên Şikevtê ye, ez jî bi xwe Segê Hogirê te me?)

Her wehajî vaye em ji we re malikeke dawî ji xweşxuwana wî di pesnê malbata xwe de û bi taybetî ve Birayê xwe Şêx Elî de didin bipêşkeşkirin:

Rida jî le ew nesle ye bi bexşe yarebî ke qet nabî
Gul bê xar û behir bê buxar û Ateş bê dod

Maxabin hêjî dîwana xwêşxuwanên wî tev ne hatîye bicivandin û biçapkirin[399].

[399]Mebest ji vê Diwana wî ye, ya ku ew ne bi giştî li Bexdê de di sala 1935 z. de hatîye çapkirin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

*19. Mele Mohemed*

Navnîşana wî Mihûyî ye. Ew li gundê Balx de li navçeya Mawet de li Parêzgeha Sulêmanyê de di sala 1252 H. de bi dunê ve hatîye bigihandin.

Ew Meroveki Zanistvan û Hêja ji Xelefayên Rêya Neqşebendîyê bû. Wî xwedina xweyî destpêkê li ser destê Bavê xwe Mele Osman de date bidawîkirin.
Li paş de ew ji bona Bexdê çû û li wêderê de wî ji zansitî û hînbûnên Muftî Zehawîyê bi nav û bang ve ji xwe re sûd date biwergirtin.

Ew ji bona serdana Mala Xwedê cû û li paş de wî serdana Istenbolê date bikirin.
Ew bi dîdara Sultan Ebdul-Hemîd duwem ve hate bixemilandin. Sulatan ferman pê date bidan, ku ew Tekyekê bi navê Şêx ve li bajarê Sulêmanîyê de bide biavakirin û jêre mehîyeke baş date bidanîn.

Ew di sala 1327 k.- 1909 z. de hate bimirin û temenê wî heftê û pênc salî bû. Dilovanîya Xwedê li ser be. Ew di nava Tekîya xwe de hate biveşartin.

Ji bil bilindbûna wî di zanistîyê û huner de karineke wîyî bê sinor di xweşxuwanîyê û hunera peyvînê de dihate bidîtin.

Xweşxuwan û Surûdên wîyî zengilî bi zimanê Erebî, Farisî û Kurdî ve têtin bipeydakirin. Navroka wan bi evîndarîya Xwedanî ve têtê biderkevtin. Ev Çarîna hanê nimûneyeke sipehî ji xweşxuwanên wîyî Sofîtîyê dide biderxistin:

Şêxê, Hemawendîki eda weez û nesihet
Ew qor be serey dabûwe ber fehş û fedîhet
Xweş hate cewab, û weti to heqye feqet min
Qutaî Terîqim, ne ko qutaî Terîqet

Institut kurde de Paris

Diwana xweşxuwanên wî li sala 1341 k.- 1922 z. de li bajarê Sulêmanyê de hate biçapkirin.

*20. Mewlana Xalid*

Ew ji Tîra Mîkaêlî ji Eşîra Cafî bi nav û denge. Navnîşana wî Diya El Dîn bû. Di sala 1197 k.- 1783 z. de ew hatîye bizayîn û ew di 4 Zil-Qude sala 1242 k.- 1826 z. de li bajarê Şamê de hatîye bimirin û ew têde li taxa Salihîyê de hatîye biveşartin. Wî li Sulêmanîyê de dest bi xwendina xwe ve daye bikirin.

Li paş de ew ji bona serdana Mala Xwedê çû û ew li paş vê serdana hanê de careke din ew ji bona Sulêmanîyê hate bivegerandin û hinekî têde ew hate bimayîn. Li paş vê jî de ew ji bona Hindê çû û ew li nik Merovê Pirozê Mezin Şah Ebdul-lah hate bimayîn û wî jê Rêya Neqşebendîyê ji xwe re date biwergirtin. Li paş vê de ew ji bona Sulêmanîyê hate bivegerandin. Piştî demekê ew ji bona Bexdadê û jê ew ji bona Şamê çû. Li wêderê de demekî wî dest bi xwendindanê û rêberkirinê ve date bikirin.

Wehajî destekî wîyî dirêj di zanistîyên wêjeyî jî de tête biderkevtin. Piranîya xweşxuwanên wî bi Farisî, Erebî ve û kêm jî ji wan bi Kurdî ve têtin bidîtin. Dîwana wî li bajarê Istenbolê de li ser Ferman Sultan Ebdul-Hemîd de hate biçapkirin.

*21. Muftî Zehawî*

Navê wî Mihemede û navnîşana wî jî Feydî ye. Ew ji Xelkê Sulêmanîyê ye û ew Xuwarzîyê Malbata Babanî ye.

Bavê wî Mîr Ehmed di Zarotîya wî de ligel Malê tev de ji bona Zehab -Zehawê çûn. Li wêderê de ew ji xwe re demekê hatin bimayîn û li paş de wan ji bona Bexdadê ji xwe re dane bibarkirin.

Institut Kurde de Paris

Li bajarê Bexdadê de di sala 1257 k.- 1841 z. de ji bona sî salî ew bi Muftîyê Bexdadê ve hate bikirin û ew di sala (1308 k.- 1890 z. de ji bona dunya din çû.

Ew di zanistî û hunerên dema xwe de Bêhempa bû. Ew kanîya xweşxuwanîyê û wêjeyê bû. Pir xweşxuwanên wî bi Erebî û Farisî ve têtin bidîtin, belam kêm ji wan bi Kurdî ve têtin bidîtin.
Ji hezar kesî bêtir bi nav û dengtirîn Zanistvanên Îraqê û welatên dorhêla wê li ser destên wî de hatine bifêr û biperwedekirin.

Ev Çarîna Farisîyî tê ji me re xweşxuwanîya wîyî bilind dide biderxistin:

Şîxa to ke der Alem zahiri ferdî in rutbe zedistar bedest Awerdî
Heyf est ke ew dor ser to gerd de Bayest ke to dor ser ew gerdî

(Ho Şêxê bêhempa di vê cîhana diyar de
te eve nav û nîşan bi şaşikê di dest de
heyfe ew li dor serê te têtê bigerandin
gerek tu li dor wê de bihata bisûrandin)

*22. Cemîl Sidqî Zehawî*

Ew Kurê Muftî Zehawî ye. Ew yekeke ji gewretirîn Wêjevan û Xweşxuwanên vê pêla hanê têtê biderkevtin. Dîwana Xweşxuwanên wîyî Erebî pir dewlemend û bi male. pir nîvîsandinên wîyî wêjeyî bi zimanê Erebî têtin biderkevtin. Xweşxuwanên wî bi zimanên Rojhilatî (Farisî, Kurdî û Turkî) jî ne kêmin. Xweşxuwana wîyî zengilî bi zimanê Farisî ve li Tehranê de di sala 1934 z. de bi hatina derbasbûna Cejna hezar salî ve li ser Şairê Îranîyî bi nav û bang ve Ferdosî pirbûna liberketina wî, berzbûna dûrbîna wî û kûrbûna têgihştinên wî dide biderxistin.

Berambûnên wîyî wêjeyî û Xweşxuwanên wîyî devbiavêtinê ligel Şairê Kurdîyî bi nav û deng ve Şêx Rida Talebanî têtin bidîtin. Ew di

Institut kurde de Paris

sala 1935 z. de li bajarê Bexdê de hate bimirin û ew li kêleka Îmamê Gewre Ebi Henîfe de, Xwedê lêdolovan be, hate biveşartin.

*23. Emîn Feydî Beg*

Ew ji Xelkê Sulêmaanyê tête biderkevtin û ji Evserên Topdaryê tête biderkevtin. Ew di rêza sipahyê de berz bû, tanî ku ew bi nîşana Mîr Alayê Topçî ve hate bigihaştin.

Destekî wîyî dirêj di zanistîya Metemarik de hebû. herdu nivîstên wîna Icmal Netayêc û Hewa Nesimi baştirîn belgên li ser wê zanebûna wîna de didin biderxistin.
Herwehajî herdu nivîstên wîna Şuaat û Encûmen Edîban li karîna wîyê wêjeyî de bi belgeyên pirî xurt ve têtin biderkevtin.

Di navbera wî û Lêdilovanê Şêx Rida Talebanî de dostanîyeke pirî xurt hebû û di nava wan de her û her pêwendî bi Şiir û Xweşxuwanîyê ve dihate boderkevtin. Şêx Rizayê Talebanî di komekê de ji xweşxuwanê xweyî xweş û di Çarînên xweyî pir bilinde pesnê wî daye bikirin.

Institut kurde de Paris

*24. Tahir Beg*[400]

Ew Kurê Osman Paşayê Kurê Mihemed Paşayê Gewreyê Eşîra Cafêtête biderkevtin. Ew li bajarê Helebçe ve bi dunyayê ve hatîye bigihandin û ew di sala 1337 k. de hatîye bimirin.

Wî Şiir bi sê zimanan ve dida binivi^sandin. Bi zimanê Farisî û Kurdî hin ve ji xweşxuwanên wîyî evîndarîyê pirî nerm û xweş têtin bidîtin.

*25. Ehmed Beg*

[400]Di dîwana wî de, ya ku ew li Sulêmanyê de di sala 1355 k.- 1936 z. de hatîye çapkirin, hatîye, ku li Şehrezorê de di sala 1295 k. de bi dunyê ve hatîye. (M. E. ).

Ev bi xwe jî Kurê Osman Paşayê Gewreyê Eşîra Cafe û ji Xelkê bajarê Helebçe ye. Ew di sala 1933 z. de ji vê dunya me çû. Hin ji xweşxuwanên wîyî pirî nerm û xweş bi zimanên Kurdî û farisî ve têtin bidîtin.

*26. Ehmed Beg*

Ew Kurê Fetah Bege û ew ji Malbata Sahibqeranê bi nav û bange. Şirên wîyî Kurdî û Farisî di berzbûna vejandina xweyî wêjeyî û pojînî de pirî bilindin. Bigir xweşxuwanên wî ew pir nêzîkî yên herdu Merovên wî Kurdî û salimin. Ew di sala 1935 z. de hate bimirin. Hêjî tanî nihajî dîwana wî nehatîye biçapkirin.

*27. Salar Seîd*

Ew ji gewretirîn Wêjevanê devera Mukrî tête bidîtin. Xweşxuwanên wîyî Kurdî û yên Farisî bi baştirîn Bînvanên zindînbûnê ve li ser karîna wîyî pirî bilind de di berê wîyî wîjeyî de têtin biderkevtin.

Tête bigotin, ku dîwaneke wîyî pir bi nerx ve têtê bipeydakirin. Ew li ser destên Peyên Dewleta Osmanîyî Vegirtîvanî de di destpêka cenga Yekemî Cîhanî de li bajarê Sablaxê-Mehebadê de hate bikuştin.

Weha ev xweşxuwanîya wîyî Kurdî li ser Şûna Serdarê Mukrî de ji me re hin ji bawerîyên wî dide biderxsitin. Em vê malika dawîya vê xweşxuwanîyê ji we re didin bipêşkeşkirin:

Ey Xweda Ekrad yexsîrî hemû Milet bûn
dey Elî, ta çak ne fewtawin, belê fikrî bikin.

*28. Ehmed Kor*

Ew ji Xelkê Sablaxê-Mehebadê têtê biderkevtin û ew ji Xweşxuvanên Mukrî têtê biderkevtin. Ew di sedsalê nozdehan de hatîye

Institut kurde de Paris

bijîyandin. Xweşxuwanên wî pirî nerm û bikêrin û bi taybetî ve xweşxuwana wîyî bi navê Pakîyê ve pir vejandî tête bidîtin.

---

Ji bil van Xweşxuvanan jî pirî din jî nala Ahî, Hesen Kinoş, Eb - Dulah Hesen, Elî Berdeşanî, Mihemed Fikrî, yê ku Hacî Qadir di xweşxuwanîya xweyî bi nav û deng ve daye bibîrxistin, Rencorê Kerkukî, Emîn Begê Dizeyî, Mişuwî, Xeste, Wefayî, Eb -Dul-Rehman Xalis, Melayê Beytûşî, Mele Mustefayê Beyarî, Mele Xidir, Mîrza Yaqub, Hesen Homer, Mele Mihemedê Komasê, Mele Ehmedê Derberd, Mele Qadir Şêx Wesanî, Mele Mihemedê Koyî, Mustefa Begê Caf, mele Rehûmê Mukrî, Kake Emînê Mukrî, Kak Mustefayê Îranî .... hd. têtin bidîtin.

Ev hemû di sedsalê nozdehan de hatine bijîyandin û wan pir nivîst û namên wêjeyîyî baş li dû xwe de ji me re dane bihiştin.

Ev Xweşxuvan û Wêjevanên Vejandina Wîjeyî hanê li Kurdistanan Jêrî de ew beşekin, ji yên ku em li ser şop û nivîsandinên wan de hatibûn biagehdarîkirin.

Hîç gûman têde niye, ku mîna vê vejandina wêjeyî hanê jî kêm yajî bêtir li perçeyên Kurdistanêyê din jî de hatîye bikirin.

Mexabin, rewş û zînatên zal li ser wan perçan de nahêlin, ku em bi rast û durustî ve agehdarîyan li ser şopên wê vejandina hanê de ji xwe re bidin biwergirtin.

Herwehajî cihê dilxweşyê ye, ku nihajî li Kurdistan Îraqê de tevgereke remanîyî bi nerx ve têtê bikirin. Nimûne li ser vê tevgera hanê de pirin û bînên zindî jî li ser vê şiyarkirina wêjeyî hanêyî xurû jî de peydabûna Xortên Zanevan ji Xweşxuvan û Wêjevanên xwîngerm têtin bidîtin.

Şêx Hacî Tewfîq Beg li bajarê Sulmanîyê de bi vîna Xortekî çenleg ve serê govenda vê vejandina wêjeyî hanê niha dide bigerandin.

Institut kurde de Paris

Li Nivîstxana Asya de li Pêters Borg de -Lenin Girad de- nivîsandin û şopên jimareke pir ji Xweşxuvanên Kurd hatîye bicivandin. Weha Miso Lerch-Lêrç nivîsteke bi taybetî ve li ser şopên wan Xweşxuvanan de dayite bidanîn. (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

3. Kovar û Rojnamên Kurdî

Weku em dizanin, ku yekemîn Rojnama Kurdî li jêr nav û nîşana Kurdistan de li Istenbolê de di sala 1315 k.- 1897 (1898 Cuma) z. de ji bal Medhet Beg Nevîyê Bedirxan Beg de hatîye biderkevtin.

Li duwayî Nexweşketina Xwedîyê wê de ev Rojnama hanê ji bal Birayê wî Eb-Dul-Rehman Beg de li Qahire, li Cinêv, li Volkiston, û li London de hate biderkevtin.

Belam li piştî Dazanîna Destûra Dewleta Osmanî de ev Rojnama hanê careke din li Istenbolê de ji bal Sureya Begê Bedirxanî de hate biderkevtin û ew di dema Cenga Cîhanîyî Yekem jî de dihate biderkertin[401].

Daneyek ji vê Rojnameya hanê ji jimara 1 tanî 31 de li Nivîstxana Piroysî de li Berlinê de tête bidîtin.

Ev Rojnama hanê ji Kovara Kurdistanêyî, ya ku ew ji bal Misyonervanên-Amojgarvanên Urmiyê ve dihate biderkevtin, bi cuda ve têtê bidîtin.

Li duwayî Dazanina Destûra Dewleta Osmanî de ji bala Cumiyetî Hîwî Kurd-Komela Hêvîya Kurd de Rojnameyeke Înî di bin nav û

[401]Nivîsvan li ser cihê derbikevtina wê de di wê dema teng de tu tiştî nade binivîsandin.
Weke ku ez dizanim, ku Xwedîyê wê Sureya Berdirxan Beg berî cenga Cîhani Yekem ji bona Qahire hat û wî ew bi zimanê Kurdî û Turkî bi Nîvmehî li Qahire de di navbera salên 1915 û 1916 de date biderxistin. Jê komek ji jimaran hatin biderkevtin. Wî xwe di bin nav û nîşana Ehmed Azîzî dida binavkirin; ev jî ber Malbata wîyî Ezizan bû. (M. E.).

nîşana Roja Kurd de li Istenbolê de di sala 1331 k.-1329 E. de hate bibelavkirin.

Di Dana pêşî û duwem de Wêneyê Selah El-Dîn û Kerim Xanê Zendî habû. Ev herdu Dane ji 6. axlevê û di 6. tîrmehê de di sala 1331 k.- 1329 E de ji bal Eb-dul-Kerim Efendîyê Xelkê Sulêmanîyê de hatin biderkevtin.

Li paş demekê de navê vê Rojnama hanê hate biveguhertin û ew bi navê Hetawê Kurd-Hetava Kurd) hate binavkirin.

Şiyarvan û Lawên Kurd li duwayî Cenga Cîhanîyî Yekem de jêhatbûnên xwe dane bibêtirkirin. Li Misrê, li Istenbolê û li Kurdistanê de wan gelek Rojnamên tir dane biderxistin û ji wan hemûyan bi nav û bangtir ve Rojnama Înîyî Jîn bû. Ew li Istenbolê de di sala 1919 z. de ji bal Hemze Beg, Memduh Selîm Beg û Kemal Fewzî Beg de dihate bibelavkirin.

Institut kurde de Paris

Mebest û armanca vê Rojnama hanê pêgihandin û têgihiştina vê destûrê bû: ku Kurdistan bi malê Kurda ve tête biderkevtin. Jimara sî û duwem jê li cemada yekemî sala 1338 k.- 22. rêbenda 1920 z. de hatîye biderkevtin.

Herwehajî Rojnameyeke Nîvmehîyî tir jî li jêr nav û nîşna Kurdistan de li Qahire de ji bal Bedirxan Ehmed Ezîz Beg de dihate bibelavkirin[402]. Jimara duwem jê di 5. zul-huce sala 1335 k. de hatîye biderkevtin.

Yekemîn Rojnama Kurdî li bajarê Sulêmanîyê de Pêşkewtin-Pêşbikevtin bû. Ew mehekê li pêş çolkirina Ingilîz de ji bona bajarayê Sulêmanyê ve hate bilinavçûn.

Li paş de di 2. gelawêja sala 1922 z. de Rojnama Bangi Kurdistan-Banga Kurdistan ji bal Hacî Mustefa Paşa de hate biderkirin û tanî befirbara wê salî jî 13 jimar jê derçûn û êtir ew nema hate biderkevtin.

[402]Ew bi xwe Kovara Kurdistane, ya ku ew ji bal Mîr Ehemed Sureya Kurê Emîn Ali Kurê Bedirxan Paşa di nava salên 1915 û 1916 de li Qahire de dihate bibelavkirin. Ew di sala 1938 de li Parisê de mir. Xwedê lêdilovan be. (M. E.).

Li duwayî vê jî de Rojnama Înîyî Roji Kurdistan -Roja Kurdistanê ji bal Mohemed Nurî Efendî dihate biderkevtin. Vê Rojnama hanê li gora arezû û fermana dewleta Şêx Mehmud dida binivîsandin û wê tanî 3. avadara sala 1923 z. de date bidirêjkirin û jê Panzdeh Dane hatin biderçûn.

Li duwayî vê de, ku Şêx Mehmud duwem car Sulêmanî date bicîhiştin, Rojnameyeke tirî Kurdî bi navê Bangî Heq-Denga Heq ve di sala 1923 de li bajarê Sulêmanyê de sê Dane jê hatin biderkevtin.

Li dawîya vê de Umîdi Istiqlal- Hêvîya Serxwebûnê derçû. Vê jî ewende dirêjnekir. Rojnama Heftrojî (Înî) Jiyanewe-Jiyaneve) di sala 1924 z. de ji bal dewleta Sulêmanyê de hate biderkirin. Ev Rojnama hanê di sala 1925 z. de[403] navê wê bi Jîyan ve hate biveguhertin û ew tanî êsta bi vî navê hanê tête biderkevtin.

Li sala 1925 de salih Zeki Begê Sahibqeran Zade Rojnameyeke Hefteyî bi navê Diyariyî Kurdistan-Diyarîya Kurdistanê bi sê zimanan Kurdî, Erebî û Turkî ve dida biderxistin û ew tanî gulana sala 1926 de date bidirêjkirin û jê şazdeh Dane hatin biderçûn.

Di piranîya wan de wêneyên bi nav û bangên Kurdan ve dihatin bibelavkirin. Bi rastî jî ve Xwedîyê wêyî hêja pir xwe didate biêşandin, da ku ew pir bi başî û qeşengî ve bête biderkevtin.

Di sala 1925 de bi xwe jî ve Hacî Mustefa Paşa Bangi Kurdistan-Banga Kurdistanê li Bexdadê de dîsan date biderxistin. Ew li dawîwya du sê Danan de hate birawestandin.

Di sala 1344 k.- 1926 z. de Mîrza Husên Mukriyanî li bajarê Rewanduzê de bi zaravayê Kurmancîyî Rojava -Badînanî- Botanî ve Rojnemeyek bi navê Zarê Kurmancî ve date biderxistin.

Ev Rojnama hanê Heftrojî ye. Xwedîyê wêyî hêja û bi Rûmet ve tevî hemû azar û dijwariyan jî hêjî ew li ser derkirina wê de dire.

[403]Ev sala 1931 z. ye, ya ku Daner têde ev nivîsta xwe daye çapkirin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Ev Merovê bi hiner û rûmet ve ji bil belavkirina wînayî Rojnama Zarê Kurmancî jî wî gelek lêkolandinên bi nerx û hêja ve li ser mêjûwa kurdîyî poşandî de dayite bibelavkirin û wî ji bona şiyarkirin û navtêdana Lawên Kurdên Îraqê hiner û rûmeteke pirî gewre dayite û dide bikaranîn.

Institut kurde de Paris

*Derîyê Heştem*

# Eşîrên Kurd

Institut kurde de Paris

## 1. Di Destpêka Musulmanîyê De

Li gora ciyografîya Sin Martin û nivîstên Zanistvanên Gurcî Eşîra Oranton-Orîti yaxud Rewandi bi vî navî tanî Nîvê sedsalê Nozdehan li herema Rewanduzê de hebû. Suryanan di sedsalên Navîn de Çiyayên tuxûbên herema Adyabin bi navê salak didan binavkirin. Eşîra bi vî navî ew niha li Loristanê de tête rûniştin".Rawilson hîc tiştekî ne li ser cih û Rewşa nihayî Eşîra Alonî dibêje. Lêbelê navekî mîna vî navî yanjî ew bi xwe ye, ew navê Heremeke bi nav û bange di navbera Sulêmanyê û Bane de têtê bikevtin û jê re Alan têtê gotin. Herwehajî Dola dirêjî ji gundê Kalîfan tanî Derbendê Rewanduz jê re Alona têtê gotin. Zor dibe, ku Xelkên gundên vê Dolê ji mayînên Alonî bin. Li gora ciyografîya Sin Martin û nivîstên Zanistvanên Gurcî Eşîra Oranton-Orîti yaxud Rewandi bi vî navî tanî Nîvê sedsalê Nozdehan li herema Rewanduzê de hebû. Suryanan di sedsalên Navîn de Çiyayên tuxûbên herema Adyabin bi navê salak didan binavkirin. Eşîra bi vî navî ew niha li Loristanê de têtê rûniştin".Rawilson hîc tiştekî ne li ser cih û Rewşa nihayî Eşîra Alonî dibêje. Lêbelê navekî mîna vî navî yanjî ew bi xwe ye, ew navê Heremeke bi nav û bange di navbera Sulêmanyê û Bane de têtê bikevtin û jê re Alan têtê gotin. Herwehajî Dola dirêjî ji gundê Kalîfan tanî Derbendê Rewanduz jê re Alona têtê gotin. Zor dibe, ku Xelkên gundên vê Dolê ji mayînên Alonî bin. Li gora ciyografîya Sin Martin û nivîstên Zanistvanên Gurcî Eşîra Oranton-Orîti yaxud Rewandi bi vî

navî tanî Nîvê sedsalê Nozdehan li herema Rewanduzê de hebû. Suryanan di sedsalên Navîn de Çiyayên tuxûbên herema Adyabin bi navê salak didan binavkirin. Eşîra bi vî navî ew niha li Loristanê de tête rûniştin".Rawilson hîc tiştekî ne li ser cih û Rewşa nihayî Eşîra Alonî dibêje. Lêbelê navekî mîna vî navî yanjî ew bi xwe ye, ew navê Heremeke bi nav û bange di navbera Sulêmanyê û Bane de têtê bikevtin û jê re Alan têtê gotin. Herwehajî Dola dirêjî ji gundê Kalîfan tanî Derbendê Rewanduz jê re Alona têtê gotin. Zor dibe, ku Xelkên gundên vê Dolê ji mayînên Alonî bin jê re Alona têtê gotin.

Li çend sedsalên pêla musulmantîyê de welatê Miletê Kurd li jêr nav nîşaneke bi taybetî ve nidihat binîşandan. Ew parçe parçe di nava parvekirinên serpereştîyî Xilafetê de mîna Zozan, Xêlat, Ermînya, Ezerbêcan, Cibal, Faris, Cezîrê, Îraq, Biladê Rom... hd. dihatin biderkevtin. (Ji xwe re li derîyê yekem de bidin bitemaşekirin).

Jiber vî hoyê hanê jî di wan pêlên çûyî de em lêkolandineke bi taybetî ve li ser Kurd û Kurdistanê de li nivîstên Cîhangervan û Mêjûvanên Ereb de nadin bidîtin. Di dawî de di pêla Selcoqiyan de beşek ji welatê Kurd Kermanşan û Şarezor li jêr nav û nîşana Kurdistanê de hatin binasîn û car caran jî bi taybetî ve li ser dihate biaxivtin.

Mêjûvanên Ereb li hin hatinên mêjûyî û ciyografî de kêm û zor derbarê Kurd de didatin bipeyivandin; ji bona nimûne Musûdî di sala 332 k.- 943 z. de û Istexrî di sala 340 k.- 951 z. de derbarê Kurd de li hemû yan bêtir de hin agehdarîyên bi rêk û pêk ve wan dane biderxistin. (Însiklopêdîya Musulmantîyê).

Mesûdî di Miroc El-Zeb de li ser navên van Eşîrên hanê de dide baxivtin:

> Li herema Kengawer de Eşîra Macoran;
> Li herema Ezerbêcan de Eşîrên Hazbeni û Sarat;
> Li herema Çiyan de Eşîrên Şadancan, Lazba, Madencan,
> Mezdankan, Parîsyan, Xali -Celai-, Cebarki, Cuwani Mostekan.
> Li herema Surî de Dababîla ... hd.
> Li herama Musilê û Şaxê Cûdî de Eşîrên Fileyên Kurd

weku Yaqubî û Cozkan.

Ev Mêjûvanê hanê di nivîsta El-tenbîh Wel-işrafa xwe de li ser Eşîra Bazîncan jî de didin biaxivtin.

Herwehajî Mêjûvanê Istexrî jî di nivîsta xwe de di (rûpelê 115) de li ser Eşîrên Naşawîra, Bozîkan û Kîkan de, ya ke ew êsta li nêzîkî Mereşî de tête bijîyandin, dide biaxivtin. Herwehajê ew listeyekê bi navê cî û warên Eşîrên Kurdî ve dide binîşandan, ku ew jî evin:

Faris, Kerman, Sucistan, Xuresan, Isfehan, Cibal, Mah El- Kofe, Mah El-Besre, Masabazan, Hemedan, Şarezor, Dar Abad, Semxan, Ezerbêcan, Ermînya Aran, Baylakan, Bab El-Ebwab, Cezîrê, Suryê, El Sixor (Xîza liberxwedana sinorê Kilikya ye).

Bi kurtî ve em dikarin bêjin, ku li hemû welatên Musulmanan de li gora van agehdarîyan de Eşîr û Xelkên Kurd hebûn. Ji bona nimûne yekekî li dergehên keleha Berzue de, ya ku ew li ser Çemê Ker de li Rojhilatê Teflîsê de tête bikevtin, bi navê Bab El-Ekrad ve bi deng bû.

Ibin Meskoye jî pişta vê dide bigirtin û ew dibêje, li dema girtina vê keleha hanê de ji bal Rusan de li nik Serdarê wê de Serbazên Kurd hebûn.

Yaqûbî li dora sala 275 k. de û Istexrî herdu dibêjin, ku li welatê Isfehanê de Tîreke ji Eşîra Kurdê Bazîncan hebû û bajarekî wanî baş jî têde hebû.

Muqedesî[404] di (r. 227) de dibêje, ku Kurdê Dewîn, (bajarê ku ew li ser ava Arasê tête bikevtin), di xanîyên ji çam û tîtikan durûstkirî de dihatin bijîyandin.

Istexrî di cîgehekî tirî de (rûpelê 98) de bi taybetî ve li ser pênc Rimomê Farisî de dide biaxivtin û ew dibêje, ku ev navên Rimom ji

[404]nivîsta Ehsen El-Teqasim di sala 375 k. de hatîye nivsaîndin, mîna ku Meqdesî bi xwe dibêje. (M. E.).

Institut kurde de Paris

bona heremên Kurd hatibûn bidanîn. Her Ram (Pirbûna wan Remom) bajarekî Kurdîyî navînî bû, Gewreyê Kurdê wê navê ew bi Karmendê komkirina bêşan ve dihate biderkevtin û wî temaşeyî ewlebûn û asayîşê jî didate bikirin. Ev pênc Ramên welatê Faris evene:

1. Ciloya yaxud Remîcan ew li ser tixûbê Isfehan û Xuzistanê de bû;
2. Lawalîcan ew di navbera Şîrazê û Kendava Farisî de bû;
3. Diyowan ew di Koreyê Şapûr de bû;
4. Kariyan ew li alîyê Kermanê de bû;
5. Şeheryar ew li layê Isfehanê de bû û ew ji bal Eşîra wêyî Bazîncan ve Bazincan pê dihate bigotin, ya ku Bavikekî wê jî li welatê Isfehanê de hatîbû bibelavbûn.

Institut kurde de Paris

Istexrî li duwayî van Rimom de li ser sî û sê Eşîrên Kurdê Faris de dide biaxivtin, yên ku ew jî ji bal Ibin Hewkal de li gora dîwana El-sedaqe de di (Laperê 185 - 187) de evana bûn û ew jî ji bal Meqedesî de têtin piştgirtin:

Kermanî, Ramanî, Mudser, Mohemed Kurê Beşer, Bakîlê -Meqdesî salayî pê dibêje-, Bendad Mehdî-Benda Mehrî, Mohemed Kurê Ishaq, Sebahî -sipahî-, Ishaqî, Adezkanî -Azerkanî-, Şehrakî, Tahmadahenî, Zayadî, Şehrawî, Bende Dakî, Xesrawî, Zayîxî, Sefarî, Şahyarî, Mehrakî, Mubarekî, Iştemharî -Işteharî-, Şahonî, Feratî, salmonî, Sîrî, Azad Doxtî, Baraz Doxtî, Metlebî, Mahalî, Şahkanî, Kacitî û Celîlî. Jimara malên van Eşîrên hanê bi pênçsed hezar mal ve dihatin bitexmînkirin.

Farisname[405], ya ku ew di 500 k. - 1106 z. de hatîye binivisandin, dibêje, Kurdên Ciloya, dîwan, Lawalîcan, Karyan, Bazincan, yên ku beşekî herî bi nav û dengê sipahê Farisîyî kevnar ji wan bû, bi carekê ve di şer û cengên vekirina musulmantîyê de ji bona Îranê hatin binabûdkirin.

[405] Nivîstokeke Farisi ye. Ew ji bal Kurê Belexî di pêla Sultan Ebi El-şuca Mohemed îbin Melekşahê Silcoqî de hatîye binivîsandin. Ew li Kembirêc de di sala 1339 k.- 1921 z. de hatîye çapkirin. (M. E. ).

Ji vanan tevan bes û bi tenha ve Eşîra Alak qotar bû û dînê musulmantîyê wê ji xwe re date biwergirtin[406].

Kurdên Isfehanê li duwayî de ji bal Eded Eldewle El- Bohî de ji bona welatê Faris hatin biveguhestin.

Bi rastî ev gotinên Farisname bi pêwistî lêkolandinê ve têtin biderkevtin, çunke, nabûdkirina pênçsed hazar mal bi dijwarî ve hiş vê ji xwe re dikare bide bigirtin.

Renge, ku ew Eşîrên hanê têkelî nava Eşîrên Faris bibûn û li duwayî de ji wan re nibûye, ku ew milîbûna xwe ji xwe re bidin biparastin.

Li Rama kevnarî Ciloya-Kowe Gulo de êsta Lor têde têti bijîyandin, Istexrî li duwayî lista Eşîrên Faris de li ser Eşîrekê de bi navê El-Lorya jî ve dide biaxivtin.

Farisname Eşîra Şibankareyî-Şiwankareyî Farisîyî gewre ji Kurd dide bicihêkirin[407].

Bi rastî ve El-Umrî jî di Mesalik El- Absare de bi cihê ve li ser Eşîra Şibankare-Şiwankare de nade biaxivtin û her wehajî Şerefname jî li nava Dewletên Kurd de li ser de nade biaxivtin.

Ligel vêjî de dibe, ku ew yekek ji Tîrên Reman bête biderkevtin, ya ku ew ji bal Istexrî de di nava Eşîrên Kurd de hatîye binîşandan. Ev jî dûr niye, ku ev jî ji wekhebûna nav bête biderkevtin.

Institut kurde de Paris

[406]Di Farisname de Merovekî bi navê Elek ji wan Kurdan ma û ew Musulman bû. Hêjî Malbata wî li Faris de dijî. Kurdên dinî niha li Faris de ew ji bal Eded El-Dewle ji ser sînorê Esfehanê ji bona Faris hatin biveguhestin. Dijbûna vê ligel Wergirtina Danervanê hêja de ji Insiklopêdîya musulmantîyê diyare. Ji re kês pêneket, ne ku ew Nivîstxana ciyografîya Erebî û nejî Farisname ji xwe re di vî warî de bide xwendin. (M. E.).

[407] Ev Eşîr di Mesalik El-Ebsar de hatîye. (M. E.).

Bi kurtî ve weha diyare, ku di navbera Kurdê Faris û Kurdê Kurdistanê de hin cudabûn tête biderkevtin.

Li herema zozan de, ya ku ew li gora Mecem El Buldan de di navbera Musil, Xîlat û Selmas de Eşîrên Başnawî û Boxtî-Botan hebûn û gelek Kelehên wan jî hebûn.

Bi kurtî ve li şopên heyî de weha tête biderkevtin, ku Kurdistana navînîyî îro di wê demê jî de bi welatê Kurd ve dihate biderkevtin.

Institut kurde de Paris

## 2. Di Pêla dewleta Kolemenî-Memalîkî Misrî de di sedsalê heştehemînî koçî de

Nivîsvanê Subih El-eşa[408] ji Mesalik El-Ebsar[409] û Tesqîf dide biwergirtin û dibêje[410]:

Eşîrên Kurdê Cibal El-Ekrad bîst û çar herem wan dabûn bidagîrkirin. Ev çiyayên Kurd ew çiyane, yên ku ew welatê Ecem û Ereban li yek de dane bicihêkirin. Ew ji çîyayên Hemedan û Şehrezorê didin bidestpêkirin û ew tanî Tixûbên welatê Tekfurê, yê ku ew memleketa sîs û pêvekirinên wêyî bi destên Xanedanên Lawan ve dide bipêkanîn, didin bidirêjkirin.

1. Diyaweşt[411]. Ew ji çiyayên Hemedan û Şarezorê ve tête bipêkhatin. Ew bi cihê Eşîra

[408] nivîsta Şêx Ebu Ebas Ehmedê Qelqeşendî di Çardeh bergan de ye. Ew di sala 814 k. de hatîye dawîkirin. bergê Çarem, Laperê 373-379 bi dirêjî li ser Eşîrên Kurd de dide biaxivtin. Di Çapxana nivîsta Qeralitîyê de li Qehire de hatîye biçapkirin.

[409]Ew ji bal Fedil El-La El-Umri hatîye binivîsandin. Ew Destnivîsa jimara 8 M di Nivîstxana Misrî de ye. Nivîstokeke wîyî din bi navê El-Tarif Bil-Musteleh El-Şerîf li Qahire hatîye çapkirin. (M. E.).

[410](Wergervan li vir de koka Binivîsandina Erebî dayite bidaxistn. Min bi başi nedit, ku ez ji nû ve careke din tevî li vir de bidim biwergerandin.- Cuma).

[411]Di Mesalik de Yadest hatîye. Diyare, ku ew ji Mahdeşt-Maydeşt hatîye

Kurdê Goranî ve tête biderkevtin, yê ku ew xwedan Mêrin.

2. Diran Teng[412]. Ev herema hanê bi cihekî Eşîreke tirîyî Goranî ve tête biderkevtin. Ev Eşîra hanê jî xwedan Mîrin. Ev herdu Eşîrên Goranî jî bi hev re bêtir ji pênç hezar Peyan nayêtin biderkevtin.

3. Li Danterk[413], Nehawend û tanî nêzîkî Şarezorê ew bi cihê Eşîrên Kelalî-Gelalî ve tête biderkevtin[414]. Ew zor Şervanin. hezar Şervanên wan têtin bidîtin û ew li ser Xêlatên Kurdê wan navan de têtin biserdarkirin.

4. Welateke ji çiyayên Hemedanê têtê biderkevtin û ew li nêzîkî herema Gelalî de tête bikevtin. Ew bi cî û rêya Eşîra Zengelî-Zengene ve tête biderkevtin?[415] Ew bi du hezar Peyan ve tête biderkevtin û ew zor bi aza û bi pêt ve têtin biderkevtin. Ew xwedan Mîrin û ew li ser welatê Kîkor û dorhêla wê de têtin biserdarkirin[416].

Institut kurde de Paris

---

biwergirtin. El-Mucem de dibêje, ku ew Kelehek û bajareke li nêzîka Xaneqînê tête bikevtin. (M. E.).

[412]Ew ji Derteng hatîye biwergirtin, mîna ku di Mesalik, Nivîstok û Neqşên nuh de tête bidîtin.

[413]Di Mesalik de Datserk hatîye. Me kokeke wêyî rast nedît. (M. E.).

[414]Dibe, ku ev Eşîra Celalîyî niha ye.

[415]Di Mesalik de Renkele hatîye. Herdu jî ji Eşira Zenkeneyî-Zengeneyî Kurdîyî niha hatine biwergirtin.

[416]Ew ji Kenkor hatîye biwergirtin, mîna ku ew di Mesalik de ye û jê re jî Koşka Diza dibêjin. (M. E.).

5. Dor û Berên Şarezorê. Mesalik El-Ebsar dibêje, ku li vî welatî de du Eşîrên Kurd hebûn: Lose û Baserîye[417]. Ew zor aza û birûmetbûn. li dawêya rûdana Bexdadê de ew ji bona Misir û Şamê çûn. Miletekî din ji bona nava cihê wan hate bibarkirin, ku jê re Huwêse[418] pêdigotin. Ew kurdên xurû nebûn.

6. Welatê di navbera Şarezor û Eşne-Şinoyê Ezerbêcan de Eşîra Soleya Kurdî[419] têde bû. Ew xwedan du hezar Peye bûn. Ew bi şerkerî ve bi nav û bang bûn. Ew du Bavik bûn û du Gewreyên wan hebûn.

7. welatê Bisqad[420]. Ew bi cihê Eşîrên Quryawî ve dihate biderkevtin[421] û hin ji alîyên welatê Ezbek[422]-Ozbek (Ezerbêcan) û cihên din bi destên wan ve bû. Çar hezar Peyên wan hebûn. Ew xwedan Mîr bûn.

Institut kurde de Paris

[417]Di Insilopêdîya Musulmantiyê de Kosadmabîr pê dibêjin. (Di Mesalik de pê Babîriye dibêjin. M. E.).

[418]Di Mesalik de Xole yaxud Xulose pê dibêjin.

[419]Di Mesalik de Siyole yaxud Siboleye pê tête gotin. Dûr niye, ku ew ji Şol hatibe biwergirtin.

[420] Di Insiklopêdîya musulmantîyê de Saboli û Kartawî hatîye. (Di Mesalik de Lîstar hatîye. Bêgûman ew ji Alîstar hatîye biwergirtin. M. E.).

[421]Ji Qertawî- Kertawî hatîye biwergirtin.

[422]Weha di Subuh El-Aşa de hatîye. Rastîya wê Erbile, Mîna ku ew ji Dana Mesalik Destnivîsa Jimar 8 di Nivîstxana Misrî de tête derbikevtin. Dibe, ku ev Şaşbûna hanê ji Tomarvan be. (M. E.).

8. Welatê Kerkar. Ew cihê Eşîrên Hesnaniye-Hesnanlo?[423] bû. Ew sê Ber bûn. Berê Îsa Kurê Şehab El-dîn, Berê Telye û Berê Cakîye. hezar Peyên wan hebûn û her Berekî ji wan Gewreyekî wan hebû.

9. Derbend Qerayer[424]. Li vê herema hanê de Eşîra Qereyawîye têde dihate bijîyandind û ew Pasevanên Derbend bûn. Serokê wan ligel Sultanê Misrê de dida binivîsandin û navê wî Seyf El-Dîn Kurê Sêr[425] Hesnanî bû.

10. Welatê Kerhîn û Deqoq El-Naqe. Eşîreke Kurdî[426] têde hebû û heftsed Peyên wê bûn û ew xwedan Mîr bû.

11. Beyn El-Cebeleyn bi Hewlêr ve girêdayî bû. Ew cihê Eşîreke Kurdî bû û jimara wan bi qed Gelaleyî ve dibû. Di pêla dewleta Mensorîyê Qelawin de Mîrekîyî wanî bi navê Xidirê Kurê Sulêman hebû. Ew Şair û mêrxas bû[427]. Wî serdana Melekê Misrê kir û zor lê hate birêzgirtin.

Institut kurde de Paris

[423]Di Insiklopêdîya Musulmatîyê de Ev Eşîra hanê Xoşnava niha ye. Ew Sê Bavin: Yekek ji wan di welatê Kartawi û li Derbendê Qerebolî de bû. Ev Derbendê hanê li gora Hofman de divê li Şaxekî nêzîkî Zeyê Biçûk de bête bidîtin.

[424]Di Mesalik de û herwehajî di Insiklopêdîya musulmantîyê de Qerabli tête bidîtin. (M. E.).

[425]Şêrkoh: bi têgihiştina Şêrê Çiya. (M. E.).

[426] Insiklopêdîya musulmantîyê dibêje, ku navê vê Eşîra hanê Tîrkarîn bû û ew di navbera Kerkuk û Tawiq dijya.

[427]Di Mesalik de ew Tac El-Dîn Ibin Sulêman ne. Wî Zasina û Lisan dane binivîsandin. (M. E.).

12. Welatê Mazinca, bîrwe, Semhe[428] û welatê Beranîyê. Ew cihê Berekî ji Mazincanîyê bû, ya ku ew pêncsed mal dihatin biderkevtin. Ev Berê hanê Berê Eşîra Mohemedî bû û ew bi navê Berê Mubariz Kak ve bi nav û bang bû.

Eşîra Hemêdîyî Kurdî jî têkelî wan bûn, ya ku jimara Şerkerên wan ji hezar kesî bêtir bûn. Mîrê Mubariz Kak ji Mîrên dewleta Ebasî bû. Nav û nîşana Mubariz El-Dîn ew ji bal Xelîfê Ebasî de pê hatibû bidan. Navê wî bi xwe ve Kek-Kak bû.

Li dawîya Xilafeta Ebasî jî de li dewleta Holako jî de cihekî wîyî bilind hebû û ew bi Serdarê Hewlêr û Pêvgirênanên wê ve hatîbû bidanîn. Li paş de Iqir Şoş, Herate[429] û Tel Heftonî jî pê hate bidan.

Ew Mîrê pêncsed Suwarî bû. Bîst salekî wî cihê xwe date biparastin[430]. Li temenekî bêtir ji not salî de ew hate bimirin.

Li duwayî wî de Ize Dîn Kurê wî li şûna wî de Mîritî date biwergirtin. Ev Qencê hanê jî li ser şûna Bavê xwe çû û nav û deng ji xwe re date bipeydakirin. Li duwayî Ize Dîn de Necme Dîn Xidirê Birayê wî Mirîtî date biwergirtin û ew bi dewleta Misrê ve girêdayî bû.

13. Welatê Şeelabad[431] tanî Xeftiyan[432]. Li vê herema hanê de Eşîreke dir bi navê Şehrîye[433]

[428] Di Insiklopêdîya Musulmatîyê de bi Bexme tête bidîtin.

[429] Di Mesalik û Kamil de bi Herar hatîye û ew jî rastîya wê ye. (M. E.).

[430] Weha di Subuh de hatîye. Belam di Mesalik de "... ew Kurê nêzîka Bîstan bû". (M. E.).

[431] Evaya ji wergirtina gotina Şeqlabad-Şeqlawe hatîye biwergirtin. Ew niha di Liwa Hewlêrê de tête bikevtin. Wehajî ew di Mesalik de hatîye. welatê Sehrîyê bi Dizîbûnê bi nav û bange û ew welatê Şeqlawe û Haftiyana Ebi Elî ye. Ev Haftiya Ebi Elî bi Heftiyana Biçûk tête binavkirin. Ew di navbera Deşta Derbendê Mezin de tête bikevtin. (M. E.).

[432] Renge, Ev Heftiyana hanê ew herema Heftiyanî nêzîkî Rewanduzê be.

Institut kurde de Paris

hebû. Ew bi xerabîyê û cerdeyitîyê ve bi nav û deng bû. Ew nêzîka hezar mal bûn û ew li nava Şaxan û Derbendên dora Zeyê Gewre de bûn.

14. Welatê Mazkurd[434], Rostaq[435], Meret û Cebel Cuncirîn, yê ku ew bi ser Oşno-Şino ve ji alîyê rastê ve tête bikevtin. Li vê herema hanê de Eşîra Zerzarî[436] hebû. Ew pênc hezar mel derdiçûn. Welatê wan zor sext û sar bû. Mîrê wan bi navê Necme Dîn Başak dihate binavkirin.[437]

Herwehajî hin Mîrên wanî tirjî mîna Husam Şêrê Biçûk û Kur wî Başak[438] hebûn. Eşîreke tirjî li nava Zerzarî de hebû, ku ew bi navê gundê xweyî Balekan ve bi nav bûn. Ev Eşîra hanê sêsed malbûn. Uqbe El-Han jî li jêr çavdêrîya Eşîra Balekan bû[439]. Mîrê Mazkurd Heneşê Kurê Ismaîl bû û ew bi Misrê ve dihahet bigirêdan.

15. Colemerk. Ev welatê hanê cihê Eşîrekê ye, ku ew bi wî navî bû. Ew ji sê hezar mal bêtir bûn. Di destpêka dewra Tatar de Serdarê wan Esed Kurê Mekelan bû. Li duwayê wî de Kurê wî Îmad Edîn şûna wî girt û li paş Îmad Edîn de Kurê wîyî dinjî Esed Edîn şûna wî girt. Welatê

Institut kurde de Paris

[433] Di Insiklopêdîya musulmantîyê de nêt ji Şehriyê-Sorîyê ango Soran yaxud Suhran yanjî Suhraniyê Kurdên bi nav û bangin.

[434]. Di Insiklopêdîya musulmantîyê de Rûrbarê Berazgerd pê hatîye gotin.

[435]Di Insiklopêdîya Musulmatîyê de pê Restaq hatîye gotin.

[436]Di Mesalik de Zirzari hatîye binivîsandin. Ew gotineke Farişî ye û ji Çêlîka Gur re tête gotin.(M. E.).

[437]Di Mesalik de Masak pê tête gotin.

[438] Pê Basakê Kurê Husamê Şêrê Gewre tête gitin. (M. E.).

[439]Renge, ev Uqbet El-Xan Derbendê Rewanduzêyî bi nav û bang be.

wî dewlemend bû û pir rengên Meadinan têde hebû. Welatê wî sext bû û ew bi kesekî ve nedihate bizetfkirin. Rêya Tevrîzê, Xoy û Nexcuwan di bin jêrdêrîya çavên wan de bû û ew bi dewleta Misrê ve dihate bigirêdan.

16. Welatê Merkewan[440]. Ew li nêzîkî Colemerkê de ye û ew cihê Eşîreke ye, ku sê hezar malên wêyî Kurd hebûn. Ew Dirawsê Urmê bû û ew ligel Eşîrên Colemerkê de Hevalbend bû.

17. Welatê Kewardat[441] Ev herema hanê jî li Rojavayê Colemerkê dikeve û ew zor bi xêr û berekete û sê hezar malên Kurd têde hene û Mîrekî wanî xwe bi xwe heye.

18. Welatê Dînar[442]. Ew li layê Colemerkê de tête bikevtin. Eşîra wî jî bi wî navî Dînarî ve tête binavkirin. Ew pêncsed malekin û ew du Berin. Berê Mîr Ibrahim Kurê Mîr Mohemed û Berê Mîr Şehab Kurê Bedir El-Dîn. Di navbera vê Eşîrê û Mazincanî de dujminayetî hebû.

19. Welatê Îmadîyê û Kelha Haron[443]. Ev welatê hanê jî Nêzîkî welatê Colemerkê ye û ew cihê Eşîra Hekarê ye û ew Çar hezar al dibin. Mîrneşînîyeke wan bi xwe ye. Li gora Mesalik El-Ebasar de ew Çavdêryê ji pir cîhan ji Buxarê

Institut kurde de Paris

---

[440]Di Mesalik de Merkewar pê tête gotin. Ew Mergewere-Mergevere û Xewşka Tergewere-Tergevere.(M. E.).

[441]Di Insiklopêdîya musulmantîyê pê welatê Gewer hatîye gotin.

[442]Di Insiklopêdîya musulmantîyê de Zêbarî pê tête gotin.

[443]Di Mesalik û Ibin El-Esîr de Heror pê hatîye gotin. (M. E.).

tanî bajarê Cezîrê ji xwe re didin biwerdigrin. Serdarê keleha Haronê bi dewleta Misrê ve tête bigirêdan.

20. Qemraniyê û Şikevta Daud. Ew cihê Eşîra Tenbekî[444] bû. Ew Eşîreke biçûk û dir bû.

Mesalik El-Ebsar li duwayî axivtinê de li ser van bist welatên cihên Eşîrên Kurd de ew li ser hin Eşîr û Komelên Kurdî tir de dide biaxivtin, yên ku ew bi hemû layekê ve hatine bibelavbûn û hinek ji wan jî evana ne:

Tehtîye-Bexîte-Bextîye-Boxtî-Buxtan[445]: Ev Eşîra hanê Dirwasê Êşîra Hemêdîyê bû û bi derbasbûna zeman ve ew linavçû û ew têkelî nava Eşîrên tirî Kurd bû. Ew çend Berbûn. Berê yekem ji wan Sindî bû, ku wî sê hezar Şervan derdixist. Berê duwem Mohemedî bû, ku wî şeşsed Şervan hebû. Berê sêyem Rasenî[446] bû. Ew bi hêz bû. Mîrê wan bi navê Ela Edîn Kork Ibrahim bû û ew li Akrê de rûdinişt. hezar malên wan li Musilê de cigîrbûn û pêncsed jî ji malên wan li Akrê cigîrbûn û mayîn jî ew di nava Eşîran de hatibûn bibelavbûn. Berê çarem Denîkî-Dînekî[447]. bû. Ew hezar malek dibû.

El-Tesqîf[448] bîçge li vanan de ew li ser bîst û pênc cîgehên din dide biaxivtin, ku ew cî û warên Kurd bûn. Her cîhekî ji wan jî Serekekî xwe hebû. Ev bîst û pênc cihên hanê jî ev bûn:

---

[444]Di Insiklopêdîya musulmantîyê de Bestekî pê tête gotin. Ew li dora Çiyayê Ermen û Şikevta Dawid tête bikevtin.

[445] Ji Bextîya Buxtan hatîye biwergirtin. (M. E.).

[446]Di Insiklopêdîya musulmantîyê de Dasenî pê tête gitin û navê Serokê wê bi Bedir El-Dîn dide bidanîn.

[447]Di Mesalik de dunbulî hatîye, ku ew Miletekî di Çiyayê Meqlub û Muxtar de dijin. Ji bal Bêganan Zaza ji wan re tête gitin û ew ji xwe re Dumilî-Dunbilî dibêjin. (M. E.).

[448] Ev nivîsta hanê ji bal Teqi El-Dîn di sala 748 k.- 1347 z. de hatîye binivîsandin.

Institut kurde de Paris

1. Berco, 2. Belhîse, 3. Kerem Lîs, 4. Andeşt, 5. Herdeqîl, 6. Sikrak, 7. Qeblîs, 8. Cermok, 9. Şinkos, 10. Behreman, 11. Husin Aran-Husin El- Melik, 12...., 13. Sonc, 14. Akrîsa, 15. Yezar Kurd, 16. Elzab, 17. Zîtîye, 18. Derbendat -Erabiliye, 19. Qelet El-Cebeleyn, 20. Sîdekan, 21, Sahim Remadan, 22. Şabanîye, 23. Nemrîye, 24. Mohemedîye, 25. Kezlîk.

Xwedîyê Tesqîf dibêje, ku wî navê van cigeh û Eşîrên Kurdî li ser belgeyên mîrîyî dewleta Misrî de dayite bidozandin.

Ev agehdarîyên hanê bi carekê ve bi Kurdistana navînî ve têtin bigirêdan, lêbelê jî hemû agehdarîyên li ser Kurdistana navînî jî de pê nehatine biwergirtin. Çend dê baştir biba, heger vî Ciwanmêrî yanjî yekekî tirjî derbarê Kurdê welatên tirjî de agehdarîyên wetov bidana bidan.

Insiklopêdîya Musulmantîyê di benda kurd de bergê 2 de û li ser Eşîrên Kurdê Rojhilatî Îranê de dibêje: Li herema Qerebaxê Qefqasya de bîst û çar Eşîrên Kurd hebûn û serjimara wan sê hezar kes bûn. Bîçge li vanan de li Xuresanê jî de Eşîrên Gul û Zenge hebûn. Eşîra Çîkanîyî Kurd jî ji bona Gurcistanê barkiribû.

Ibin Xeldun di nivîsta xwe Mêjûwa Berber[449] de li ser Eşîrên Lawîn û Badînê Kurd de li Cezaîrê de dide biaxivtin, Renge, ku van Eşîrên hanê di dema vegirtina Şarezorê de ji bal Mengolan de ew ji bona Cezaîr hatibin bibarkirin.

## Pêvekirin

Mêcer Rawilson li ser Eşîrên Kurdî li melbenda Şino û Rewanduzê de, di gava wî di çûna xwe de di sala 1252 k.- 1836 z. de ji bona xwendekarîyê li ser paytextê Mîdya kevnar de date bikirin, dibêje, ku

[449] mêjûwa wîyî bi nav û bang di bin nav û nîşana: Diwan El-Mubtede Wel-Xeber fî Exbar El-Ereb Wel-Ecem Wel-Berber. (M. E.). (Ibin Xeldon Danivanê Bingehê zanistîya Civakî. Cuma).

Institut kurde de Paris

Eşîra Belbas li herema Şino, Rewanduzê û Ranyê de ji bona sê perçê gewre (Pîran, Mengur û Mameş) tête biperçekirin. Tîrên van perçan jî evin:

Pîran: Moxane, Perçem, Sorik, Yisiv Xelîke, Sebrema, Seta, Westa Pîre, Weremziyar, Nane kalî, Hesen Axayî, Mend Şîne, Pawe.

Mengur: Qadir Weysî, Zorî, Baseke Pê, Baba Reşo, Mer nekene.

Mameş: Hemze Axayî, Mer Bok, Co xor, Belawend, Mer Babekire, Feqî Wismane, Sîn, Banîk.

Ev Rojhilatnasê li Jor de bi navkirî ve ew bi xwe ve derbarê Eşîrên Rewanduz de dibêje:

"Ew cîgehên di navbera Şino û Zabê Biçûk de di pêla Mohemed Paşa de Mîrê Rewanduzêyî dawî de tevde li jêr destî vî Mîrî de bûn, yê ku ew bi xwe jî ve ji Eşîra Soran bû.

Ev Eşîra bi nav û bang ve xwedan cihekî mîjûyî wê di bin rehberîya Rêberên xweyî Hozan de ji çend sedsalan de ev herema Rawanduzê ji xwe re dayite bigirtin. Jimara malên wê jî di kokê de bi nêzîka 800 malî ve dihate bitexmîn. Ev Eşîra hanê ji bal Eşîrên din de cihê rêzlêgirtin û hêjakirinê bû; jiber ku ew kanîya Xanedanên Serdar bû û ji mêj de wê ev hêlên hanê ji hêrîşîn Îranîyan û Turkan dida biparastin. Bigir tevaya Xeklê herema Rewanduzê ji Eşîra Rewandî[450] yaxud Rewanduzî têtin biderkevtin. Jimara vê Eşîra Rewanduzîyî mezin 12.000 mal tête biderkevtin û ew hemû jî li jêr desthilkatîya Mîrên Suhran-Soran de bû.

keleha Rewan yanjî Rewanduz[451] di tevaya dema mîrneşînîya Soran de her û her ew cihekî pirî xurtî parastî bû.

[450]Renge, ku ev Eşîra hanê Bavikekî Eşîra Rewadî be, ya ku ew bi nav û denge û ew di koka xwe de li Ezirbêcanê de rûniştîbû. Li wêderê de wê dewleta Rewadî date bidamizirandin û wê Rêberek nala Selah-El-Dîn ji bona dunyayê date dan û wê ew ji bona musulmantîyê date bidiyarîkirin.

[451]Peyva duz bi Farîsîya kevanar bi Keleh têtê gotin. Ev keleha Rewanduz tanî sala 1207 z. de Mêjûvanên Suryanî wê bi yek ji Sengîn Kelehên wan hêlan didin bidanîn. (Rawilson).

Navîna vê mîrneşînîya hanê bi pirbûn ve li Şa Ka Bad[452] û Herîrê jî bû. Kelha Rewanduz ew ji bona mîrneşînîyê nala navînê û paytext di pêla Mîrê dawî de ji Mîrên Soran de hate bidanîn[453].

Ev bajarê biçûkî hanê di nava xwe de du hezar mal dide bihilgirtin. Ew di nava wan deştan de tête bidîtin, yên ku ew di navbera Mîdya û Aşûr de dihatin bikevtin û ew ji herema Sîdek - Sîdekanê çiyayî tête bipêkhatin. Ew herema hanê ji çil gundên biçûk tête bipêkhatin û jimara malên wan nêzîka hezar malî têti biderkevtin û ew hemû jî ji Eşîrên Rewandek, Pîre Soyî, Rîsorî û Şirwanî têtin biderkevtin

Eşîra Bira Dostîyî xwenadan cihê mêjûyîyî bi nav û bang ve di navçeya Kanî Reş de di nava çiyayên Şino de tête bidanîştin.

Mîrneşînîya Somayî û Tergever di nav destên vê Eşîra hanê de dihatin bidîtin. Ev Eşîra hanê niha ew pir lawaz û bi bê kêr bûye. Jimara gundên wê nêzîka sed gundî tête biderkevtin û di nava wan de bes û bi tenha çend sed sal têtin bijîyandin.

Bi hêztirîn ji Eşîrên van hêlan ve ew Eşîra Balekî tête biderkevtin, ya ku jimara malên wêna bi deh hezar mal ve tête biderkevtin. Cih û warên vê Eşîra hanê heremeke çiyayî ye ew pir sextin; jiber ew li pişt çiyayê Qendîl û li ser tixûbên Şino û Lacanê de tête bikevtin. Navîna wêna bi bajarê Rayatê ve tête biderkevtin.

Institut kurde de Paris

---

[452]Ev Şakabad ku ew ji bal Rawilson tête binavkirin, dibe, ku ew gund be, yê ku ew ji bal Şah Qelî Beg Kurê Şah Elî Beg Mîrê Suhran-Soran di pêla Sultan Selimê Qanûnî de hatîye avakirin. Wî ew bi navê Şah Qelî Awa- Şah Qelî Abad daya binavkirin. Bi derbasbûna Rojan ve ew ji bal Xelkê bi Şaqlawa-Şeqlabad hate biveguhertin. Bi rastî jî Şerefname, gava ku ew li ser mêjûwa Şah Elî Beg Bavê Qelî Beg diaxive, dibêje, ku ew Serdarê Şeq Abad-Şefa Abad bû. Nedûre, ku Kurê wî Şah Qelî Beg ev gundê hanê dayite nuhkirin û ew bi Şah Qelî Abad dayite binavkirin.

[453]Ev bihîstîyên Rawilson ne rastin. Navînîya Mîrneşînîyê Elî Beg Mîrê Suhran-Soran di sala 1192 k.- 1778 z. de ji Herîrê ji bona Kalîfan date biveguhestin. Herwehajî Kurê wî Ogoz Beg Navînî di sala 1201 k.- 1787 z. de ji bona Rewanduzê date biveguhestin. (Kurtîya mêjûwa Kurd û Kurdistanê, bergê 2, R. 399-400).

Mîrên Soran ev hêlên hanê jî datin biserdarîkirin û wan ji her malekê Peyak ji bona sipahê xwe didan biwergirtin, Ji roja nabûdbûna mîmeşînîya Soranî de ev Eşîra hanê bi serêxwe ve hate bimayîn. Gewreyê wêyî niha ew bi navê Ezîz Beg tête binavkirin.

Eşîra Rewandî li herema Rewanduzê de ew ji bona duwanzdeh Beran tête biparvekirin:

Mam Gerd, Mam sal, Mam Sêl; Mam Xal, Mam Bal, Mam Lês, Mamoyî, Memke Kal, Mameskî, Pîr Bal, Kelo, Mame Sam.

Ligel van Beran de hin ji berên Eşîrên ne Rewandî hatin bitêkelkirin û ew jî evin:

Şêxab, Malîbas, Norek, Henareyî, Xêlanî, Kasan, Şêx Mehmudî, Ba Mamî, Dirêçkî, Sê Koyî, Hêr Bûyî, Şêkolî, Mendîk, Pîracî, Bîmar".

Institut kurde de Paris

## 3. Eşîrên Kurdî li Pêş Şerê Gewre 1914-1918 Zayînê de.

Derbarê zîneta Eşîrên Kurdî de di vê pêla hanê de ji bal Sêr Mark Sayks û Mêcer Soane-Son de hin agehdarîyên zor çak hatine bidan.

Bi rastî jî ve Sêr Mark Sayks her bes li ser Eşîrên Memleketa Osmanîyî kevnar de dayite biaxivtin û ew ewende li sînorê Îranê de têper nebûye.

Belam Mêcer Son derbarê Kurdistana navînî de, ya ku ew li herdu layê sînorên kevnarî Osmanî û Îranî de hatîye bikevtin, lêkolandinên baş daye bikirin û tanî radeyekî ew wan kêmanîyên, yên ku ew hebûn, dide bidagirtin.

Belam dîsan encamê karê van herdu Merovên Qenc agehdarîyên tewaw bi me ve nadin bidan û ew derbarê Kurdên dûr li navînê de baş me pê nadin bişiyarkirin; jiber vê ez neçarbûm, ku ez serî li hin nivîstên din de bidim bixistin, ta ku tanî radeyekî ez wan kêmanîyên hanê bidim bidagirtin.

Sêr Mar Sayks li jêr nav û nîşana Eşîrên Kurdî de di dewleta Osmanî de ew li ser Eşîrên Kurdîyî Turkî de hatîya biaxivtin. Ji bona dozandina

cihê wan û hin rûnkirinên din ew wan ji bona şeş hereman dide biparvekirin: A, B, C, D, E, F.

Ew di pêşgotina xwe de li ser Eşîrên File de dide biaxivtin û ew dibêje:
li gora goyên hinkan de ew di koka xwe de kurdin û hinekî tirjî bi bêvajî vêjî vedebêjin.

Belam ez weha dizanim, ku ev Filane ji Musil û Îraqê de ji bona nava Kurdên Hekarê ji xwe re dane bazandin.

Kurd bi xwe jî ve dibe, ku ew bi sê beş bête bikirin:

1. Kurdên Nîvgerokên Deşt û Çiyayên Jêrî Kurdistanê.

Eşîrên vî beşê hanê derbarê rabûn û rûniştên xwe de ew liyek zor nêzîkin. Xakê wan pir bi bêre û ew li gora pêwistîyên xwe de candinîyê didin bikirin.

Bi pirbûn ve ew ji bona Cotyarîyê, îş û karê Çandinîyê û bi veguhestinê bi hinin din ve ji xwe re didin bikirin.

Ew li Asingerî, Ber, Ferş û Reşmal durûstkirinê de şarezanin. Beramber bi piranîya Kurdên din ve ew zor bi pêş ve hatine bikevtin. Ew xwendewarin. Li îş û kar de ew wirya û jîrin û zor bi kêfin. Ew li jêr sermiyandarîya Sermiyandarên Bav û Kalên xwe de têtin bijîyandin. Ew şêr û mêrxasin. Ew Kurdên li jêr nav û nîşana Baban de hatine binav û bibangkirin. Ew Suwarên çakin û sincîya wan pir berze û ew pir mêrxasin û xwedan tivingên.

Li layê min de weha ye, ku sipahê Gewreyî Suwarên Pars-Aşkanî li vanan de hatibû bikomkirin.

Institut kurde de Paris

Gewreyê Perestê van Kurdên Baban Xalid Ibin Welîde û ew wî zor perestdikin û li gora goya wan bi xwe jî ve wî ew dane bimusulmankirin[454]. Eşîrên vî perçî hemû li ser rêça Sunî de ne.
Ew ji pêşîya çêrya pêş de tanî reşmeha her sal di nava gundên xwe de têtin birûniştin û ji avdarê de ew ji bona nava Konan têtin biderkevtin.

Hinek ji wan jî tanî deşta Weznê[455] diçin. Gelek ji Serokên vî beşî ligel Ereb de pêwendîyên dostanîyê û zavatîyê dane bidanîn. Jinên wan qeşeng û serbestin û zor ji wan dixwînin û ew jî mîna Peyan ji bona ravê dirin.

2. Eşîrên Rûniştî di nava Çiyan de.

Ev Eşîrên hanê li hemû barekî de ew ji beşê yek cihê ne. Ew di Cotkaryê de başin û ew zor ligel Çandinyê de xerîkin. Ew li avhelgirtinê û avparvekirinê de zor şarezanin. Ew pir rengên dan, genim û ceh didin biçandin û ew tûtinê pêdighînin.

Sermiyandarîya wan bi destê Serokê Eşîrê ve tête biderkevtine. Di piranîya caran de ew ligel heydû de di şer de têtin biderkevtin. Tevingên wan hene û ew Tivingdar û Ravkerên başin. Her gundekî wan xwedayê bi kelehekê ve tête biderkevtin û di dema liberxwedanê de ji xwe re jê kar didin biwergirtin.

Jîyana wanî nava malê ew jî bi carekê ve mîna jîyana beşê yekem tête bidîtin.

Hinek Cihû jî di nava wan de têtin bipeydakirin û ew ligel wan de çakin. Belam mafeyê helgirtina çek ji bona wan niye û ew xwe ji bona nava şerên Eşîran nadin bibeşdarîkirin. Ev cihûwên hanê her û her ew ji bona bi destketinê û bazirganîyê ve di nava Eşîran de xerîkin.

[454]Ev navnîşa wanî Xalidî dibe, ku ew ji Miletê Xaldi-Kaldiyî kevnari herema Wanê hatibe bipeydakirin.

[455]Ev bajarekî Biçûke. Ew li Rojhilatî Rewanduzê de li Hundurê Îranê tête bikevtin. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Ew Eşîrên Fileyî-Kawirîyî Nesturî, yên ku ew di nava Kurdan de têtin biderkevtin, bi carekê ve bi Kurdan ve têtin bigirêdan.

3. Eşîrên Nîvgerok û Çiyaneşîn

Hinek ji wan xwe ligel çandinîyê de û hinekî din jî ji wan xwe ligel xwedîkirina terş û pez de xerîkin û hinek ji wan jî berze welax pêdighînin.

Cil û bergên wan weku beşê duwem weha têtin biderkevtin. Şer û merên wan zorin. Afretên wan zor îşkerin. Wilaxên wan guhdirêj û Hêstirin.

Derabê reng û qelafetê wan ew li herdu beşên din de têtin bicudakirin. Ev beşê hanê bi xwe ve bi ter û gewdetir têtin biderkevtin.

Çekên wan baş niye û teqemenîya wan kême û ew dest tengin.

Derbarê Ol û Rêçê de agehdarîyên me li ser wan de kêmin. Belam bi giştî ve ew bi Musulman ve têtin biderkevtin.

Bi kurtî ve divê bête bizanîn, ku li Îraqê, Weznê û li dorhêla Musilê jî de Eşîrên Kurdîyî Gerok-Rêwend têtin bipeydakirin, Belam Xelkê çiyan, yên ku ew bi Koçer-Rêwend ve têtin bidanîn, ew nezan û rebenin.

## Herema A

Ev Herema hanê ew di navbera Sulêmanîyê, Gola Urmiyê, Gola Wanê, Sêrtê û Diclê de têtê kevtin.
Em ji bona we vê Lîsta Beşê Eşîrên Kurdîyî Iraqêyî Îsta didin pêşkeşkirin[456]

[456]Ev Agehdarîyên li ser Eşîrên Liwa Sulêmanîyê, Kerkukê û Liwaya Diyalê de ji Nivîstoka Mêcer Son (Agehdarîyên derbarê Eşîrên Kurdistana Jêrî de, Bexda, Sala 1918 de) hatine wergirtin. Agehdarîyên derbarê Eşîrên Liwa Hewlêrê ew ji Nivîstoka

Institut kurde de Paris

| Melbenda Mendelî | | | |
|---|---|---|---|
| Navê Eşîrê | Berên wê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
| Qere Elos | Geş, Kayton, Çar Mawendî, Kake Wend, Nefteçi Ga Suwarî, | 1917 | |
| li Herema A de Neft ser Sinor Tenge Somar de ye. Rûniştîne Werzvan, Şivan Çandinîyê dikin û Gavanin. Zaravê wan Kurmancîya Jêrî ye. Şiîne. Renge, ew di Koka xwe de Lorbin. | | | |
| Melbenda Xaneqîn | | | |
| Sore Mîrî | Kelhurî, Totîk Mamcan Îne, Entarî | 225 | Çar Berên wê li Gundên dorhêla Xaneqînin Rûniştine û Berê Pêncem li Şehreban û Ebu Cisre de ye. |
| Liwa Kerkukê-Melbenda Xaneqîn | | | |
| Navê Eşîrê | Berên wê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
| Seref Beyanî | Korekî, Emîr Xan Begî, Ezîz Begî, Gaxar, Nadirî. | 700 | Nîvgerokin Çandinîyê dikin |
| Ew di navbera ÇiyayêŞuwalder, Sîrwan deû li Navçeyên | | | |

Institut kurde de Paris

Kaptin Hay-Hê Du Sali Kurdistanê de hatine wergirtin. Agehdarîyên derbarê Liwa Musilê de ew ji Nivîstoka Taha Haşimî (Bi dirêjbûn Ciyografîya Iraqê) û ji Nivîstoka Mark Sayks hatine wergirtin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Xorato,Horîn û Şêxan de ne Havînan ew ji bona Çiyayê Bamo dirin. Renge, ku ew di koka xwe de Caf bin. | | | |
| Bacelan | Comerî, Qazanlo | 1300 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Ew li Navçeyên Xorato, Horîn û Şêxan de ne. Xelkên Derkezîn, Qesra Şêrîn û Qazanîyê Mendelî ew Berê Qazanlo ne. Zaravayê wan nêzîkî Pehlevî ye. Bacelanî Panzdeh Qolin. | | | |
| Delo | Camerzî, Pencankeştî, Gaş, | 600 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Koka Cihên wan Çiyayê Xeşk û Çemê Koçe Çiya ye. Li Gundê Sergule û Navçeya Xaneqîne de jî Qolekî1200 Kesî heye. Ew Sunî ne. | | | |
| Ka Xuwar | - | 200 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Li Nevçeya Qere Tepe de dijîn. Ew Şafiîne. | | | |
| Keze | Sedalah Beg Koxda, Baram Serkal | 300 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Li Gundên Sêdelan, Eski Kefrî û Çençaldan de dijîn | | | |
| Palanî | - | 350 | Rûniştîne Çandinîyê di-kin |
| Li nava Zenk Abad û Cihoka Qere Tepe de li Rojhialtî Sîrwan de dijîn. Li Dekeke jî Qolekî wê heye. | | | |
| Berzencî | - | 1500 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |

Institut kurde de Paris

| | | | |
|---|---|---|---|
| Li Navçeya Xaneqîn de ne. Ew Sunî ne. | | | |
| Umer Mîl | - | 150 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Ew di navbera Koçê Çiyan, Nalşikîna û Serkele de ne. | | | |
| Têlşanî | - | 50 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Ew li Eskî Kefrî û Zerd Aw de dijîn. | | | |
| Zengene | Faris Axa<br>Restem Axa | 450 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Li alîyên Kefrî, Ibrahîm Xancî û Somak de ew dijîn. Qolekî wê li dewrî Kermanşah de heye. | | | |
| Zende | Muhemed, Sali Axa, Elyan, Tahir Xan Xenî. | 600 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Di navbera Rêya Kefrî û Şîwan de ne. Li Dawîya li navçûna Dewleta Kerim Xan de ev Eşîr ji vêderê hatîye. Qolê Elyan ji Nevîyên Xenedanên Kerim Xane. | | | |
| Dawide | - | 1000 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Li alîyên Taûq, Kefrî, Gul û Zengene de dijîn. Ew aza û bi kare. Ew Sunî ne. | | | |
| Leylanî | - | 500 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Talebanî | - | 1050 | Rûniştîne Çandinîyê |

Institut kurde de Paris

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | dikin |
| Ji Kerkuk ta Xaneqînê belavin. Ladê cihê Xanedanê Talebanî ye. Sunine. | | | |
| Cebarî | - | 500 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Ew di navbera Çem Çemal, Kerkuk, Şewanê Xase û Leylanê de ne. Ew Sunîne. | | | |
| Liwa Kerkukê | | | |
| Şiwan | Şiwanê Xase Şiwanê Bazyan | 2000 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Di navbera Çemê Xase Şûwan û Zeyê Koye de ne. Hevsînorê Eşîrên Şêx Bizinî û Bîbanî ne. Ew Sunîne. Mêcer Son dibêje, ew 15000 Kesin. | | | |
| Salihi | - | 200 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Ew li alîyên Kerkuk, Qere Hesen û Gul de ne. Eşîra Salîhîyî Şamê jì ji vanin. Sunîne. | | | |
| Şêx Bizinî | - | 600 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Li Qeraxa Jêrî Zeyê Koye-Zabê Biçûk de ne. Ew Sunîne. | | | |
| Kakeyê Kaxanlo | - | 1500 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Li Liwa Kerkuk de û di navbera Huweyce û Zeyê Koye de ne. Li alîyên Qorato û Xaneqîn de jî Beşek heye. | | | |
| Bîbanî | - | 400 | Rûniştîne |

Institut kurde de Paris

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | Çandinîyê dikin |
| Ew li Jorî Kerkukê de ne û li Gundê xwe rûdinin. li Melbend Xaneqînê jî Qolekî wan heye. | | | |

Bîçge, li vanan de li Melbenda Xaneqîn de di Navçeya Qizil Rebat de Eşîrên Zer Goş û Xêlanî û di Navçeyê Xaneqînê de Feylî, Melekşahî, Kuwazî û li Navçeya Qorato de Kuwazî, Nîrencî, Qadir Mîr Wîs. Taşeyî hene.

| Liwa Sulêmanîyê | | | |
|---|---|---|---|
| Navê Eşîrê | Berên wê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
| Hewramî | Hewramanî text, Heramanî Lohon | 400 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Li Heraman de Beşek li Xakê Iraqê de û Beşek li Iran de ne. Ew Sunî ne. Xwîngermin. Bi Texmîna Son ew 20000 Kesin. | | | |
| Merîwanî | - | 1250 | Rûniştîne Çandinîyê dikin |
| Ew li Herema Merîwan û Beşek jî li Iranin ligel Navçeya Pencewîn de hevsînorin.. Ew Sunîne. Bi texmîna Son 1500 Kesin. | | | |
| Çenginî | - | 300 | Gerokin |
| Zivistanê li Melbenda Sulêmanyêde û li Havînê Li Merxê dema xwe ew didin buhurandin. Ew Sunî û Şafiîne. | | | |

Institut kurde de Paris

Eşîra Caf

| Berên wê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Haronî | 800 | Gerokin |
| Ezîzî | 1500 | Gerokin |
| Ismaîl | - | Gerokin |
| Mîkaîl | 2000 | Gerokin |
| Reşo | 1000 | Gerokin |
| Borî | - | Gerokin |
| Terxanî | 500 | Gerokin |
| Şaterî | 1800 | Beşek Grokin |
| Sadanî | 300 | Gerokin |
| Badaxî | 250 | Gerikin |
| Başkî | 300 | Gerokin |
| Amala | 400 | Gerokin |
| Yusivcanî | 500 | Gerokin |
| Newrolî | 1500 | Gerokin |
| Kemalî | 500 | Gerokin |
| Yezdan | 900 | Gerokin |
| Bexşî | - | Gerkin |
| Taw Gozî | 200 | Rûniştîne |
| Gelalî | 2000 | Gerokin |
| Piştmale | 50 | Gerikin |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Bêserî | 200 | Gerokin |
| Yarwîsî | 200 | Gerokin |
| Şêx Ismaîl | 1000 | Gerokin |
| Isanî | 300 | Gerokin |
| Sifiya | - | Gerokin |
| Wend | 60 | Rûniştîne |

Berên Gewre ji vê Eşîra mezin Zivistanê ji Banê Xêlanê tanî beramberî Qizibatê ji Beşek Rojavayî ji Çemê Sirwanê ji xwe re didin girtin. Li Buharê de ew ji bona Şarezorê tên û ew di ser Pencewîn re rûwê xwe bi Iranê vedidin û ew ji bona nêzîkî Sine diçin. Sadanî û Badaxî hin caran ew ji bo deşta Horîn û Şêxan diçin. Ev Eşîra hanê bi xwe ve pir bi paşveketî, xerabker û şerfiroşe. Xwe bi xwe ve hevgirtîne û di şerê derve de jî ew hemû yarmetîya hev dikin û hevdigrin.Jiber şer û merên wanî pir hin jiberên wê lêcihêbûn. Mîna: Qubadî, Babacanî, Weldebekî,Enaxî, Emamî Darwaş, Deletaze, Mîre Begî, Detîrî, Namzar Begî, Tayîşe, Qadir Wîsî, Nayirzî û Şeref Biyanî.
Ev Berên hanê êsta hemû hene û ew biserbixwe ne. Ev Eşîrên hanê hemû Sunî ne. Belam Xerafatên wan jî zorin.

Institut kurde de Paris

| Navê Eşîrî | Berên wê | Jimara Mala | Zîneta Civakî |
|---|---|---|---|
| Pişder | Babekir Axa<br>Ebas Mehmud Axa | 2000 | Rûniştîne |
| Bi xwe jî Beg Zadên Pişderî bi Mîraw Delî bi nav û bangin. Ew ji Eşîrên Mukrîne. Jimara wan kême. Belem ew li Sê Navçeyê Mwet, Merge û Qela Dize ne. Şarbajar bi Gundên xwe ve di bin destên wan de ne. Ew Sûnîne. | | | |
| Ismaîl | - | 600 | Gerokin |
| Ew Havînan di navbera Ezîzî. Dokan, Çiyayên Toqma, Sordaş û | | | |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Eşkewtê de dimînin. li paş de ew ji bo Iranê dirin. Ev Eşîr ne Ismaîlê Ezîzê Eşîra Cafe têtê biderkevtin. | | | |
| Hemawend | Begzade (Çelebî)Reşwend, Seferewend, Sîte Beser, Remawend | 1000 | Gerokin |
| Ev Beşê hanê ew koka Hemewendin. Cihê wanaziyane ye. Ev Eşîra hanê zor aza, dir û nebeze. Tanî van salên dawîjî her û her ew Serhildayîbûn. Wan zor Deleta Osmanî û Iranî bi ser êşkiribûn. Medhet Paşa nikarîbû serê wan bide tewandin. Ew Suniyê xwîngermin. Bigir li 1700 Z. de ji ranê ew hatine (Mêjûwa Sulêmanîya bi dirêjî li ser wan axivtî ye). | | | |
| Hemawend | Pîryayî, Sofîyewend, Çengînî | 480 | Rûniştîne |
| Ev Beşê hanê Xelkên Pîranî Gundîyên Kokî ne û ev jî bi Hemawendî ve têtin vegirêdan. Ew jî Sunîne. Çenginî navê wê hatîye. Jimara wê ne di nav de ye. | | | |

Institut kurde de Paris

| Liwa Hewlêrê | | | |
|---|---|---|---|
| Navê Eşîrî | Berên wê | Jimara Mala | Zîneta Civakî |
| Dizeyî | Pîra,Gontola, Maman | 600 | Rûniştîne |
| Ew li Liwa Hewlêr û Melbenda Mexmur de li dora Çiyê Qere Çoq û Kendînav de ne. Erdên wan bi xêr û bêrin. Zîneta wan zor çake. Bere bere ta Diclê hatine û Eşîrên Ereb derperanine. Ew zor bikar û jêhatîn. | | | |
| Gerdî[457] | - | 600 | Nîvgerokin |

[457]Mark Sayks Jimara vê Eşîrê bi pirî dide danîn, di dema ku Kapitin Hê dibêje, ku

<table>
<tr><td colspan="4">Li Jorî Berekî wê li Herema Koyesinceq de ye. Havînan ji bona Weznê ew diçin. Ew Eşîreke gewreyî li Jorî Hewlêrê de ye. 15 Dêyên wê hene.</td></tr>
<tr><td>Kora</td><td>-</td><td>-</td><td>Rûniştîne</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ew li Rojavavyî eqlawe de li çend Dêyan-Gundan de hene.</td></tr>
<tr><td>Xoşnaw</td><td>-</td><td>2000</td><td>Rîniştîne û çandinîyê dikin</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ew li Sed Gundî li Navçeya Şeqlawe de dijîn. Serjimara wan Baxevanin. Deh Hezar kesin. li Koyê û Ranya jî hinek Beşên wan hene.</td></tr>
<tr><td>Pîran</td><td>-</td><td>600</td><td>-</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ew ji Eşîra Ranya ye. Ew li Jorî Ranya de rûdinin. Ew di nava Êla Belbas de ye. Ew Eşîreke biçûke, lêbelê dire Bi navê Dize Pêş Berekî wê heye.</td></tr>
<tr><td>Ako</td><td>-</td><td>1000</td><td>Rûniştîne</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ew li Jorê Ranya de rûdinin. Çend Berên wê li Çiyayên layê Jorîyê Ranya hene. Li layê Qeladizê de Çil Pêncî Dêyên wan hene.</td></tr>
<tr><td>Zararî</td><td>-</td><td>300</td><td>Rûniştîne</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ew li Jorî Basture Çaye ne û Duwanzde Gundên wan hene.</td></tr>
<tr><td>Sorçî</td><td>-</td><td>3000</td><td>Rûniştîne</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ji qeraxê Zeyê Koye û tanî Rewanduzê belavbûne. Pêncî Gundên wan hene. Berek ji Mamekan ligel wê de tête bidîtin.</td></tr>
<tr><td>Balek</td><td>-</td><td>1200</td><td>Rûniştîne</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ew li Jorî Çemê Rewanduz ketine. Şest Gundên wan hene.</td></tr>
</table>

Yanzdeh Gundên wan li Melbenda Hewlêrê de ne û Berekî wê jî li Melbenda Koye de ne. Ku weha bû, renge, ew 600 Malek bête derketin.

Institut kurde de Paris

| | | | |
|---|---|---|---|
| Şîrwanî | - | 1500 | Rûniştîne |
| Di dawîtirîna Biradost Melbenda Rawenduz de ne. Şîrwanî ji Bira Dost bi hêztirin. Serjimara wan ji 8000 Keskî bêtir nabin[458]. | | | |
| Herkî | - | 5000 | - |
| Eşîreke zor bi hêze. Beşekî wê li Çiyên ser sinor de ne û Beşekî wê jî li Akra ne. 8000 Kesekên wê li Rawenduz û Bastorçemayî hene. Gişt 20000 Kes dibin. Beşek jê li Erezerom û Beşekjî li Wanê hene (Sayks) | | | |
| Xeylanî | - | 200 | - |
| Li Çiyayê Balek de ne. Hinek jî li dora Hewlêrin de ne. 1000 Kesekin. | | | |
| | | | |

Institut kurde de Paris

[458] Mark Sayks Jimara Malên vê Eşîrê bi 3300 dide danîn. Ev jî dijî danînên Kapitin Hê ye.

| Liwa Musilê | | | |
|---|---|---|---|
| Navê Eşîrê | Berê wê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
| Bolî | - | 150 | - |
| Li Jêrî Balek de ne. li Xeylanî kêmtirin. Zivistanan ew ji bona Melbenda Koye dirin. | | | |
| Berwarî | Berwarî Bala<br>Berwarî Jêrî | 700<br>1000 | Rûniştîne û çandinîyê di-kin |
| Berwarî Bala li Jorî Çemê Gare ne. yê ku bi ser Zeyê Gewre de tê. Ew pez didin bixwedêdikin. Berwarî Jêrî li Jêrî Çemê Gare de ne. Ew pez didin bixwedîdikin. | | | |
| Berzanî | - | 2750 | Rûniştîne û çandinîyê di-kin |
| Ew li Jorî Zeyê Gewre û Melbenda Zîbarî de ne. Ew Xwedan rezin û tûtinê diçînin. Ew bi Şêxên Berzan ve têtin girêdan. Pir xwînger û mêrxasin. | | | |
| Zîbarî | - | 1200 | Rûniştîne û çandinîyê di-kin |
| Ew di navbera Akrê û Zeye Gewre de û dora Pîre Keprin. Ew xwedan rezin[459]. | | | |
| Dosikî | - | 1200 | Rûniştîne û çandinîyê di-kin |
| Ew li Melbenda Dihokê de ne. Xwedan rezin. | | | |
| Mizurî-Mîsorî | - | 1700 | Rûniştîne û çandi nîyê dikin |

[459] Mark Sayks dibêje, ku Jimara Malên Zibarî bi Du Hezar Mal tête gihaştin.

Institut kurde de Paris

<table>
<tr><td colspan="4">Ew li Melbenda Dohokê Navçeyekê dadigrin. Xwedan rezin. Ew Eşîreke zor kevnare. Ligor Sêr Olmstêd de divê ew ji Nevîyên Mîsorî-Mîsirêyê pêla Aşûrî de hatibin xuwar.</td></tr>
<tr><td>Artoşî</td><td>-</td><td>4000</td><td>Gerok û Rûniştîne</td></tr>
<tr><td colspan="4">Du Beşê gewre ye û çend Berên wê jî hene. Beşekî wêyî Nîvgerok heye. Ew Zivistanê li dora El-Qoş, Zaxo û Dihokê dide rabuhurandin. Havînan ew ji bo Çiyayên Turkiyê dirin û Beşekî wê jî li Tukiyê de li Aliyên Beyt El-Şebab, Xoşab û Şitaxê de maye. Renege, ku Çar Hezar Malên wan li Iraqê hene.</td></tr>
<tr><td>Sindî û Gulî</td><td>-</td><td>2000</td><td>Rûniştîne</td></tr>
<tr><td colspan="4">Ew di navbera Çemê Hîzil û Xabûr de ne. Hinek File jî di nava wan de hene.</td></tr>
<tr><td>Eşîrên Sebe</td><td>-</td><td>900</td><td>Rûniştîne û çandinîyê dikin.</td></tr>
<tr><td colspan="4">li Navçeyekî Musil de di navbera Zabê Gewre û Çemê Gare de ne.</td></tr>
</table>

Institut kurde de Paris

Tevaya Malên Eşîrên Kurdên Iraqê nêzîka 72.000. Mal têtin derketin. Sêr Mark Syaks di Nivîsta xwe de Şopên Dawîyî Xulefa de di nava Eşîrên Musil de li ser Eşîrên Mendan, Jîr Hatî, Hacî, Nêrweyî, Heseniye, Celalî (ew li nîzîkî Îmadîyê ne), Dere, Kohan û li ser Eşîrên Yezîdî de Şêxan, Reşkan û Hawerî (ew li nêzîka Zaxo de ne) diaxive. Tevaya Malên van Eşîrên hanê ji 10.000 Mal bêtir derdikevin.

Em ji bona we Listeyekê bi navê Eşîrên Welatên din didin pêşkeşkirin:

<table>
<tr><td>Navê Eşîrê</td><td>Berên wê</td><td>Jimara Malan</td><td>Zîneta Civakî</td></tr>
<tr><td>Sîrtî</td><td>-</td><td>70</td><td>Gerokin</td></tr>
<tr><td colspan="4">Li Jorî Zaxo de dikevin. Li ser wan de agehdarî ninin.</td></tr>
<tr><td>Mîran</td><td>-</td><td>8000</td><td>Gerokin</td></tr>
</table>

| | | | |
|---|---|---|---|
| Zivistanan ew di beyna Cezîrê û Tel Rimêlan de rûdinin. Havînan ew li dora Sêrtê de dema xwe radibhurin. Ew Terş û Pez xwedîdikin. Dir û Şerkerin[460]. | | | |
| Goyan | Çend Birin | 2100 | Rûniştîne |
| Dir û Şerkerin. Hinek Nîvgerokin û Zaza jî di nava wan de hene. Ligel Eşîra Mîran de zor şer dikin. Şernaxî Berekî wê ne û ji Şernaxê ne. | | | |
| Hesênîyê | - | 500 | - |
| Ew li Jorî Cezîrê de ne. Pêwendîya wan ligel Eşîra Hesênîyî Rojavayê de diyar niye. | | | |
| Daxorî | - | - | Rûniştîne |
| Ew li Nêzîkî Şernaxê de ne. Renge, ew Qolekî Goyî bin. | | | |
| Şîrbekî | - | 200 | Rûniştîne |
| Ew dewlemendin. Renge, ew Qolekî Zîrkanlî ne. | | | |
| Balîyan | - | 70 | Nîvgerokin |
| Perîşanin. Ew li Xoyê ye. | | | |
| Eyro | - | 100 | - |
| Ew li Jorî Balîyanin. | | | |
| Etmanîkan | - | 5000 | Gerokin |
| Ew zor Dewlemendin. Bi pirbûn ew li Derbendê Bedlîsê û nêzîki Botanin û Navînîya wê jî li wêderê de ye. Havîna ew jibona Deşta Muşê dirin. | | | |
| Silîvkan | - | 900 | Gerokin |
| Havînan ew ji bona Deşta Mûşê dirin. | | | |

Institut kurde de Paris

[460]Evaya li gora bîr û bawerîya Bidirêjî Ciyografîya Iraqê ye. Belam Mark Sayks dibêje, ku Jimara Malên wan bi Hezar Mal têtin derkevtin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Giçîyan | - | 150 | Gerokin |
| Duderî | - | 400 | Gerokin |
| Havînan ew li Jêrî Gola Wanê de dibhêrin. | | | |
| Alîkanî | - | 150 | Gerokin |
| Helacî | - | 900 | Rûniştîne |
| Hinek Turk û Ermenî jî di nava wan de hene. Ew li Jêrî Gola Wanênin. | | | |
| Tayîyan | - | 300 | Gerokin |
| Navê wan baş niye. Ew li Jêrî Gol Wanênin. | | | |
| Hewtan | - | 300 | Rûniştîne |
| Ew Li Menbenda Botan de ne. | | | |
| Kekan | - | - | - |
| Ew li nêzîkê Colemerkin. | | | |
| Belîkar | - | 180 | Nîvgerokin |
| Li Jorî Colemerkin. | | | |
| Xanî | - | 180 | Rûniştîne |
| Ew li dora Xoşabin. | | | |
| Takoli | - | 450 | Rûniştîne |
| Renge, ew Berekî Zîlanê ye. Renge, ew ji 150 Salî de ji Erzeromê ji bona Wanê û ser sinor hatibe. | | | |
| Şikak | Şikevtî, Mokerî,Şewelî, Botan, Şikak | 6000 | Gerokin |
| Eşîreke bi dengin. Sê Mehan ew di Konan de dimînin. Li Rojavayî Urmiyê û li ser sinorin. Ismaîl Axayê Simkoyê bi nav û bang Serokê wê bû. | | | |

Institut kurde de Paris

| | | | |
|---|---|---|---|
| Zerzan | - | 1200 | - |
| Li Rojhilatî Urmiyê ne. | | | |
| Pînyanîslî | Zêdan, Barkêşan, Kenarberoş, Sore Tawan, Bîlîcan, Gelî, Geweci, Şewêlan, Musanan, Pînyanîşê Biçûk | 1200 | Rûniştîne û Gerokin wan hene |
| Ew Eşîreke zor gewre ye. Gerokên wan hene. EW li Rojhilatî jî hene. Li Urmiyê de û li ser sînorin. | | | |
| Kîweran | - | - | - |
| Ew biçûke û li alîyê Geverê ye. | | | |
| Şemsîkî | - | 900 | - |
| Ew li Nêzîkî Dize ye. | | | |
| Artoşî | - | 7000 | - |
| Ew Eşîreke pir gewre ye û Çar Hezar Malên wê li Iraqê ne. | | | |

Institut kurde de Paris

| Li Iraqê Artoşî[461] | | |
|---|---|---|
| Navê Eşirê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
| Ezedîna | - | |
| Merzegî | 900 | - Yezidîne |
| Mame Reş | 200 | - Yezîdîne |

[461] Nêzîka Çar Hezar Malên wan li Iraqê de rûdinin û yên mayî bi Sê Hezar mal li vir dimînin.

| | | |
|---|---|---|
| Mame Mend | 200 | Rûniştîne |
| Alan | - | - |
| Beroz | 60 | Rûniştîne, tûtunê diçînin |
| Çîrîkî | - | - |
| Sîdan | - | - |
| Maxmor | 400 | - |
| Xawîstan | - | - |
| Şerefan | 3000 | Gerokin, berê herî gewre ye.Buharan li jêrî Akrê ne. |
| Mame dan | 200 | Rûniştîne. Ew carna tanî çiyayê Beyxê nêzîka Zaxo dirin |
| Gawdan | 300 | Gerikin. Buharê nêzîkî Zaxo ne |
| Zîdek | - | - |
| Zevekî | 150 | - |
| Havîcan | 500 | Gerokin. Ew li alîyên Beyt Şebab, Xoşab û Şitakin. |

Institut kurde de Paris

## Herema B

Eşîrên vê Herema hanê li Eşîrên Heremên din de bi carekê ve cudane. Ew Xêza, ya ku ew wê li Heremên din cihê dike, eve ye: Derbendê Bedlîsê, Diclê, Çiyayên Torosê Rojhilat, Beşê Balayî Furatê ji Çiyayên Dirsimê û Herema (E) dide cihê kirin.

| Lîsta Eşîrên vê Heremê | | |
|---|---|---|
| Zevekî | 150 | Navê Eşîrê |
| Moşîk | - | - |

| | | |
|---|---|---|
| Ew Di navbera Sêrtê û Diyarbekir de û li Qeraxa Diclê deye. Me derbarê jimara Malan de agehdarî niye. Bi vî navî li Motikyan de Dêyek heye. Dibe, ku ev Eşîr ligel Miletê Moşkiyî Dewra Aşûr de pêwendar be. | | |
| Peçînan | 900 | - |
| Şerkerin. Yezîdî di nava wan de hene. Li Jorî Bajarê Sêrtê ne. | | |
| Poran | 200 | Nîvgerokin, çandinîyê dikin |
| Xwedan Terşin û ew di navbera Diyarbekir û Moşê de ne. | | |
| Şêx Dodanlî | 200 | - li Rojhilatî Diyarbekirê ne |
| Bîkeran | 500 | Gerokin |
| Zivistanan li nêzîka Diyarbekrê de ne. Havînan ew ji bona dora Sêrtê diçin. Ermenî dibêjin: Ev Eşîra hanê ji Miletê Bagratonyanê kevnare. Li nava Eşîrên Yezîdî jî navekî Bîkeran heye. Yezîdîyên Şingalê dibêjin, ku Bavên wan ji JorîDilcê ve hatine. | | |
| Reş Kotanlî | 500 | Gerokin |
| Ew li rojhilatê Diyarbekrê ne. Navekî mîna vî Reş Dinyan di Mêjûwa Ermenyan de heye. | | |
| Bişêrî | - | Rûniştîne |
| Ew di navbera Diyarbekir, Miya Farqîn û Sêrtê de ne. (Niha ew Navê Bajarekî ye û ne navê Êlê ye -Ewnî-) | | |
| Tîrîkan | 650 | Rûniştîne |
| Ew li Jor Diyarbekrê de ne. Şal û Şapên baş durûstdikin, Dewlemendin, tendurûstin. Ermenî di nava wan de tên dîtin ew xw bi Ermenî nabînin û dibêjin, em Kurdin. | | |
| Kozilîçan | - | - Eşîreke biçûke. Renge, ji Dêrsimê hatibe |
| Zekeremi | - | Di Bedlîsê de ne |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Musê | - | Di Diyabekrê de ne |
| Sarmê | 400 | - |
| Celal | 100 | - |
| Xezalê | 50 | - |
| Bedrê | - | - |
| Mala Şêrkoh | - | - |
| Bozîkan | 180 | - |
| Modekî | - | - |
| Ev navê Çiyayekî direjî Jorî Bedlîsê ye. Xelkên Kurdê vî Çiyayê hanê jî bi vî navî hanê ew têtin binavkirin. Weha têtediyarkirin, ku Beşê zorî Xelkê wê Zazane. | | |

Modekî-Motikyan

Berên wê evana ne:
Keyboran, Bobanlê, Koson, Roçabe. Ev her Çar Berên hanê Zaza ne.

Zêdanî Erîkî, Pîr Musî, ev Berên hanêher Sê jî Kurdin.
Ji van Beran tevan jî Bobanlê her kevnartire

---

| | | |
|---|---|---|
| Pênêcarî | 450 | - Beşekî wê bi Kurmancî diaxiv.Ew li Rojavayî Mûşî dijîn. |
| Silîwan | - | - Diyare, ku ew Zaza ne. Ew li ser ava Muradê û li Rojavayî Mûşê de dijîn. |
| Zaza | 1000 | Eşîr niye, Gundîye. Ew li Rojhlatî Xarpûtê de dijîn. |
| Kedak | 600 | Zazye û li şaxê Weşînin. |
| Aşmîsaret | 500 | Zaza ye, li dora Xarpûtê ye. |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Gulbîn | - | Zaza ye,li jêr Xarpûtê ye. |
| Goros | - | Dirawsê Gulbînin. |
| Sînan | - | Zaza ye, li Rojavayî Xarpûtê ye. |
| Eliyan | - | Gerokin, diyar niye, ku ew zazane yanjî Kurmancin, li jêrî Xarpûtê ne. |
| Behîrmarz | 500 | Zaza ye, li dora Xarpûtê ye. |
| Dêrsimlî | - | - |
| Navnîşana tevaya Xelkên Dêrsimê yanj ye. Hemû Elî-Îlahîne, Xwîngermin. Dêrsimî Zaravayekî wanî taybetî heye. E nêzîkî Zaza ye. Di Havînan de ew Gundên xwe bi cî dihêlin û ji bona Jor ji bona nava Çiyan ew dirin. | | |

Ber û Tîrên Dêrsimê evana ne:

Mîlan. Ev Koka Eşîra Milîyî bi nan û denge. Êsta jî Çûn û hatina wan ligel hevdû heye.

Keçel. 1000 Malekin. Ew li nêzîka Palo ne.

Şewak. Berekî Rûniştîne û ew Sinî ne.

Ferhad Ocaxlî. Ew li alîyên Sor Pinîkan de ne. Ew Berekî Kurmancin.

Bextiyarlî. Sê Gundên wan hene. Ew li nêzîka Çemşigezkin, Nîvgerokin.

Karabanlî. Ew li Asonîkin.

Mêrzanlî. Ew li nav Dêrsimê bi xwe ne.

Ebasanlî. Xalîçên zor ciwan ew durûstdikin.

Institut kurde de Paris

Bala Şaxî. 200 Malin û Rûniştîne.

Laçîn Ocaxî. Ew li Herema Amoxa de ye.

Kozilîçan. Ew navê Heremekê li Dêrsimê ye û têde çend Eşîr bi vî navî bi nav û dengin. Herwehajî Berek bi vî navî jî li Jorî Diyarbekrê henye. Renge, ku ew ji Dêrsimê bi xwe hatibin.
Giyoran. Renge, ku ew di nava Navîna Dêrsimê bi xwe de bin.

## Herema C

Ev Herema hanê bi carekê ve Welatê Jorîyî Cezîrê di Pêla Xulefayên Ebasî de bû. Kurdên vî Welatê hanê Çar Perçene:

Perçê Yekem: Ew Du Beşin.

Beşek jê bêgûman ew di zemanê Sultan Selîmê Yekem de ji Dêrsimê ji bona hêre hatîye û ew ligel Êlên Ereb, Eremenî û Kurd de têkelav bûye û wî ew bi carekê ve di nava xwe dayite daqurtandin.

Ew di Zivistanan de li deştên Jêrîyî Qerce Dax de ne. Nîsan û Gulanê ew li deştên Cezîrê de ne. Havînan ew li dora Diyarbekrin.
Beşê Duwem:
Ew li Rojavayî Furatê de kevtine. Piranîya wan mîna Dêrsîmê Elevîne. Di demên nîşankirî de Karmendên Rêça wan ji bona Pêrabûnên wanî Ayînî ji Dêrsimê ew tên. Cil û Bergên wan mîna yên Xelkên Enadolê ne.

Perçê Duwem:

Renge, ku ew di Koka xwe de Aramîbin û ew ligel Miletên cudayî wê navê kurd, Iranî, Turk Û Tatar de têkelî bûye. Hinek ji van Eşîrên wan Musulmanin, hinekî tirîjî Fileyê yaqobîne û hinekî din ji wan Ayînên

Institut kurde de Paris

wanî sêr û têkel û mêkel hene. Ew bi giştî ve îşkerin, Çêkirvan û Hostene, Avanîyê dizanin. Mey çêkirin, Şervan û Tol hilgirin.

Bangvanên Filetêyê ligel wan de xerîkin. Hinekan ji wan ji xwe re Filetî dane wergirtin, Belam jimara wan pir kême.

Perçê Sêyem:

Beşê zorî wan Yezîdîne. Beşê Yezîdîyê Şingalê bi carekê ve Kurdên xurûne. Derbarê Pêkahtinên wanî Serûştî de Yezîdîyê Şingalê bi xwe mîna Kurdên Dêrsimê ne. Ew Pirçên xwe dihêlin û ew wan dihûnin. Postên wan ew mîna yên Dirawsên wanin. Ligora peyvên xwe de wan ji bona hêre li zemanê Tîmorleng de dan barkirin. Ew di wê bîr û baweryî de ne, ku Ayîna Yezîdîyê li pêş wê mêjûwê de jî her hebû.

Perçê Çarem:

Ew Beşê herî bê nerxî Kurde. Renge, ku ew ligel Miletên Gerokî tirî de zorî têkel bûye. Dibe jî, ku ew ji Jorî Goma Wanê ji bona hêre hatibin.

Ev Herema C ew li Rojava û Jêrî Dicle de, li Jêrî Xêza Diyarbekir-Meletîyê de tanî Bîre Cek li ser kenarê Furatê de û li Jorî Xêza Musilê-Bîre Cek de ye.

Lîsta Eşîrên vê Heremê

Ev Eşîra Milîyî hanê bi 30 Bavikên xwe ve mîna Piştmalê Cafe û yanjî mîna Amileye beramber bi Êlên Piştko ve ye. Merevên vî navê hanê hildigrin, ew Peyên taybetîyî Serokên Eşîra Milîne.

Institut kurde de Paris

Eşîra Milî

| Berê wê | Jimara malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Wanan | 250 | Gerokin |
| Sîdan | 450 | Gerkin |
| Dodikan | - | Gerkin |
| Xelecan | 700 | Gerokin |
| Kelîş | - | Gerokin |
| Mendan | - | Gerokin |
| Koma Reş | 350 | Gerkin |
| Şerqiyan | 80 | Gerokin |
| Elkewat | - | Gerokin |
| Daşî | - | Gerkin |
| Meşkenlî | - | Gerokin |
| Kalendelan | - | Gerokin |
| Hacî Bay-ram | - | Gerkin |
| Isayadat | 85 | Gerokin |
| Tîrkan | 700 | Gerokin |
| Nasirîyan | 75 | Gerokin |
| çuwan | 210 | Gerokin |
| Sartan | 80 | Gerokin |
| Osba Xan | 70 | Gerokin |
| Matemîye | 800 | Gerokin |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Çemîkan | 250 | Gerokin |
| Bar Gewan | 150 | Gerokin |
| Hesoliye | 250 | Gerokin |
| Kîran | 550 | Gerokin |
| Hesekan | 260 | Gerokin |
| Elyan | - | Gerokin |
| Çiya Reş | - | Gerokin, (Renge, ku ew ji Eşîrên Çiyayê Qerec daxbin. Ewni) |
| Zebrovekan | 1000 | Gerokin, li Çiyayê Qerec daxbin |
| Taxbaşi | - | Nîvgeroken, li Rojhilatî Siwêrekê ne |
| Bocaq | - | Gerokin. (Ew ne gerokin, navê Bocaq navê Navçeyekê li Siwêrekê de ye. Ew gundên Çiyan rûdinên. Xuru Zaza ne. Ewni) |
| Hoşyan | - | Gerokin. (Rastîya wê Hoşîna ne. Ewnavê navçeyekî li Siwêrekê ye. Rûniştîne û Kurmancin. Ewni) |
| Besekî | 800 | Rûniştîne[462] |
| Cacî manlî | 500 | Gerokin |
| Kasyanî | 500 | Rûniştîne |
| Merdîsî | 1000 | Gerokin. (Bi rastî ve ew rûnistîne. Ewni) |
| Çeqalî | 1000 | Gerokin |
| Eter Keş | - | Gerokin |
| Can Beg | - | Rûnuştîne |

Institut kurde de Paris

[462]Goyeke sêr derbarê vî Berî de heye, ku ew di Koka xwe de Ingilîz yanjî Firensî bûn. Navê kevnarî wan "Salargan" bûye.

| | | |
|---|---|---|
| Begliyan | 500 | Rûniştîne |
| Derî Can | 800 | Gerikin |
| Kawê | 5000 | Nîvgerokin |
| Molîkan | 500 | - |
| Qere Kêç | 1700 | Nîvgerokin |

Ew li nêzîkî Siwêrekê de ne. Ew hov, kêvî û Xerabkarin. Zor ji wanan bi Zazayî dipeyivin. Di navbera Diyarbekir û Tor Abidîn de jî Kurdekî zor heye, ku ew bi diyarî li Qere Kêçin. Goyek delê, ku ev Eşîra hanê di Koka xwe de Turkuman bû. Ew ji bal Sultan Selîmê Yekem ve li Qerce Dax de hatîye rûniştin.

Ev veguhestina hanê bi hoyê Barkirina Eşîrên Zîrkî, Tîrîkan û hin Eşîrên tirî Kurd ji bo Rojavayî Enedolê hatîye kirin û Ev Eşîra Turkumanî jî ji bona Cihê wan hatîye anîn. Di dawî de vê Qere Kêçê ligel Kurdên wan navan de zor têkel bûye. Pir pê neçû, Qere Kêç Zimanê xwe jibîrkir û ew hate kurdkirin.

Institut kurde de Paris

| Navê Eşîrê | Berên wê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|---|
| Zaza | - | - | Rûniştîne |
| Ew Eşîr niye. Ew li Melbend Siwêrekê,(-Çermûk, Şankoş- Ewnî) û Gundîne. | | | |
| Şapkan | - | - | Li Siwêrekê de ne |
| Baran | - | - | - |
| Hesara | - | - | - |
| Ew li Siwêrekê de ye. (renge, ku ew Eşîra Hesêranî Zazayê be ya ku ew li Rojavayê Çermûkê ye. -Ewnî). | | | |
| Ebu Tahir | - | - | - |
| Renge, ku ev Eşîra hanê di Koka xwe de Erebûn. Belam hêsta ew bes bi Kurmancî diaxivin. Ew li Melbenda Siwêrekê de ne. | | | |
| Gîyoran | - | - | - |
| Ew li Siwêrekê de ne. (Renege, ku ew Eşîra Goran bin. - Ewnî) | | | |
| Emerzan | - | - | Li Siwêreke ne |
| Cîcî yanjî Kîkî | - | 1200 | Nîvgerokin |
| Hêsta ew li dora Çiyayê Qere Ce Daxê ye. Zivistanan ew ji bona Gundên dora Çemê Ceq Ceq dirin. Li gora Goya xwe de, ku Mîrekî wanî Ebasî hebû. Li paş nemana Dewleta Ebasî de Mêrên wan ji Nevîyên wî Mîrê Ebasî bûn. Bi Rûmet û Mêrxasîya xwe ve bi nav û dengin. Ew Çandinyê dikin. | | | |
| Daxorî-Daqorî | - | - | |
| Ew Eşîreke Biçûke û ji Şernexê ew hatine. Ew li Jêrî Tor Abidîn de ne. | | | |

Institut kurde de Paris

| | | | |
|---|---|---|---|
| mîrsinan-<br>Mîrsinî | - | - | |
| (Wergervanê Kurmancîyî vê Mêjûwa hanê ew Mîrsinî ye. Malbata wan di Koka xwe de Yezîdî ne. Ew ji Malbata Başokên Yezîdîyê Şingalê ne.<br>Di hêrî a Re îd Pa a de der 1946 de ji bona ser Kurdistanê de fermana Yezîdîyan ji bal Selteneta Osmanî de hate birakirin û bi darê zorê ve gumgume bi Bav û Kalên ve hate bihilgirtin, da ku ew ji bona nava buhu ta evsana Ereb bêtin biçûyîn. Ew di pêşî de ji Başokên Musulmanên Hevêrkî bûn û ew di pşit re bi Mîrsinî bûn.<br>Mîrsinî Berekî Pînar Elî bû. Tanî saxîya Bavê min jî Pêwendîya Yezîdîyên Mala Başokên Şingalê ligel me de hebûn. Dr. Cuma) | | | |
| Sor Kîşlî | | 900 | - |
| Ew li Rojhilatê Diyarbekrin. Bi Kurmancîya Rojhlatî dipeyivin Renge, ku ew Qolekî Sorçî be. | | | |
| Torabidîn | - | - | Rûniştîne |
| Li Çiyayên Tor Abidîn de hin Eşîrên Kurdên Musulman, Yezîdîû File hene. Li xuwarê de bi dirêjî têtin danîn: | | | |
| Mîzîzax | | 390 | Rûnistîne, Kurdên Musulmanin |

Eşîra Torabidîn

| Berên wê | Jimara malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Sawar | - | Rûniştîne |
| Musulman û File têkelin. (Ew Xelkên Keleha Sorin. - Ewnî). | | |
| Mohelmi | 800 | Rûniştîne |
| Li ser goya xwe ew ji Filetîyê Musulman bûne. Ew ji reha Kurd û Erebin. Hin mal File mane. | | |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Harone | 760 | Rûniştîne û 90 Mal jî Filê Yaqubîne |
| Dil Mamîkan | - | Rûniştîne, bi Erebî ve diaxivin. |
| Domane | 180 | Rûniştîne. File û Musulman tevlihevin. |
| Dorkan | 120 | Rûniştîne.Musulman û Yezîdî têkelin. |
| Moman | 600 | Rûniştîne |
| Ew Musulmanmin û bi Kurmancî dipeyivin û jê 90 Mal Filene. | | |
| Hawarka-Hevêrka | 1800 | Rûnistîne |
| Nîv Musulman û nîv Filene. Bi Kurmancî diaxivin. Renge, ligel Hawerê Yezîdî pêwendîya wan hebe. | | |
| Selahan | - | Rûniştîne |
| Gergerî | 500 | |
| Di nava Reşmalan de ne, ew Çandiniyê dikin û bi Kurdî ve diaxivin. | | |
| Dasîkan | 900 | Rûniştîne |
| Alîyan | 1200 | Rûniştîne |
| Ew Musulman, Yezîdî û Filene. Ew bi Kurmancî ve diaxivin. | | |
| Mêzîdax | - | - |

Institut kurde de Paris

Yezîdîyê Şingalê yanjî Sincarê Berên wan evin:

| | | |
|---|---|---|
| Mîrkan | - | Rûniştîne |
| Samoka | - | Din nava konan de ne, li nêzîka Şingalê ne. Renge, ku ew bi navê cihî ve hatibin binavkirin. |
| Beyt El Xulta | - | Rûniştîne |
| Hebabe | - | Rûniştîne |
| Kêran | - | Di nava konan de li Şingalê de têtin bijîyandin. |
| Beled | - | Rûniştîne, li nêzîka Bajarê Şingalê de ne. |
| Bîreran | - | Renge, ku ew Tîrekî Bîkeranê Diyarbekirê bin, |
| Medîkan | 300 | Di navbera Tel-Efer û Beled de ne. Hin ji wan Musulmanin. |
| Eloş | 209 | Bi Erebî dipeyivin. Serokê wê Kurde, li Rohilatê Heranê ye. |

Institut kurde de Paris

Berazî-El-Berazîye 9000 Gerokin

Ev Eşîra hanê Qolekî ji Eşîra Berêzanlîyî dora Serucê ye. Ew ligel van Beran yekin:

| | |
|---|---|
| Dîdan | 300 |
| Keytekan | 700 |
| Şêxan | 600 |
| Ukyan | 700 |
| Şedadan | 700 |

| | |
|---|---|
| Milê Dubilî | 700 |
| Meafan | 700 |
| Zerewan | 500 |
| Bêcan | 800 |
| Qete Kêçan | 500 |
| Dînan | 1000 |
| Mîr | 1000 |

Ev Berên hanê li gora goya wan bi xwe ve, ku di saleke giranyê de ji alîyê Goma Wanê ve dane bibarkirin. Hinek ji wan bi Ereb bûne û bi Erebî diaxivin. Beşek ji wan Gerokin û Beşek jî ji wan Rûniştîne.

Institut kurde de Paris

## Herema D

Ev Herema hanê bi sinorê kevnî Dewleta Osmanî û Rusî, Osmanî û Iranî, bi kenarê Jorî Goma Wanê bi Xêza Bedlîsê- Muşê-Erzencan û Çemê Çoroxê ve tête sinorkirin: Yanî Welatê Bayezîdê, Jorî Muşê, Welatê Erzeromê û Beşekî Erzencê.

Lîsta Eşîrên vê Heremê

| Navê Eşîrê | Jimara malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Pencînan | - | Gerokin |
| Sîlokan | - | - Li dorhêla Mûşê de ne |
| Şekelî | - | - Li dorhêla Mûşê de ne |
| Ezlî | - | - Li dorhêla Mûşê de ne |

| | | |
|---|---|---|
| Lolanlî | 480 | - Şiîne, li jorî Rijavayî Mûşê de ne |
| Hesenanlî | 4200 | Rûniştîne |
| Ew Eşîreke gewre ye û 110 Gundên wan li Hêla Xinês, Melazkurd û Warto de hene. | | |
| Berêzanlî | 900 | Rûniştîne |
| Isewî | - | - Li nêzîka Gola Wanê ne, Beklî Beekî Hesnanlî be. |
| Cibranlî | 2000 | Rûniştîne |
| | | |
| | | |

Institut kurde de Paris

Ew Komelek Êlin û Heşt Berin. Ew di navbera Bedlîsê û Muşê de ne:

Moxelî, Ereb Axa, Torînî Elîkî, Azwînî, Şêxekan, Mame Xan û Şaderlî

| | | |
|---|---|---|
| Belîkan | 6000 | Rûniştîne |

Ew Kurdin û bi Zazayî diaxivin. Şîene. Ew Sê Mehan di xaniyan de ne û Neh Mehan di nava Konan de ne.

Vedibêjin, ku ew ji bal Esed Paşa de ji bona hêla Bîngolê li nêzîkî Muşê de hatine nardin. Xelkên Cih bi bindestên xwe ve dane xistin û ew bi ser wan de zalbûn. Ev Belîkanî li Cibranlî cihêne û bi serê xwe ne. Cil û Bergên wanî taybetî hene.

| | | |
|---|---|---|
| Sipîkanlî | 3000 | - Ew li jorî gola Wanê de ne |
| Mamekanlî | - | - Renge, Nevîyên Maegonyanî kevî Ermenîbin. Li jorî Melazgird de ne. |
| Zîrîkanlî | 6000 | Rûnistîne, zor li Cibranlî dirin, li jorî Xinêzin. |

| | | |
|---|---|---|
| Reşwanî | 70 | Gerokin, li jêrî Erzeromê de ne. |
| Bazîklî | 70 | Gerokin, li jêrî Melazgerd de ne. |
| Gerdî | - | - Renge, ku ew Tîrekî ji Gerdîyên Hewlêrê bin. |
| Pîzyanlî | 70 | Rûniştîne, li rojavayî Erzeromê de têtin bikevtin. |

| | | |
|---|---|---|
| Şêx Bizinî | 450 | Rûniştîne |

Li nêzîka Erzeromê de Du Sê Gundên wan hene. Bi pirbûn dibe ku ew Berekî Eşîra Şêx Bizinîy Kerkukê be. Berekî vê li nêzîka Tortuwên heye. Ev jî Berekî ji Şêx Bizinîyî Kerkuke.

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Zîlanî | - | - Li Alşukurd de ne |
| Badelî | - | - Li Alşukurd de ne û Şiîne |
| Şaderli | - | Nîvgerokin. Di navbera Melazgerd û Alşukurd de ne |
| Başmanlî | - | - Di navbera Melazgerd û Alşukurd de ne |
| Hemîdekan | - | - Di navbera Melazgerd û Alşukurd de ne |
| Manoranlî | - | - Di navbera Melazgerd û Alşukurd de ne |
| Heyderanlî | 2000 0 | Gerokin. Eşîreke herî gewreyî Kurde. Di navbera Urmiyê û Muşê de li hemû cihekî de ew hene. |
| Admanlî | 180 | Nîvgerokin. Li dora Bayezîdê ne. Çândinîyê dikin û Xalîça durûstdikin. |
| Yezîdî | - | - Rûniştîne. Li Jorî Wanê ne. Jimara Mal û navên wan nizanin. Ew Terş û Pez xwedî dikin. |

Li Herema Qarsê de, ya ku ew li dawîya Cenga Cîhanîyî Yekem de bi destê Turkî ve hate kevtin, hin Êşîrên Kurd hene û herwehajî Bajarê Qarsê jî bi xwe ve beşekî wî Kurdin.

## Herema E

Li vê Herema de di navbera Çemê Qezîl Îrmaq-Halîs û Çemê Furatê de gelek Kurd hene. Belam bi hoyê dûrbûna wanan ji Kurdistanê ve ligel Kurdên din de hin cudabûn heye. Herwehajî Zimanê wanan jî zor têkçûye, bi radeyekî wetov ku Kurdekî Herema A bi dujwarî li ber wan tête kevtin. Ligel vê jî de hîç gûman têde niye, ku Zimanê wan Kurdî ye.
Mero dikare wan bi Çar Beşkin:

Beşê Yekem:
Koreşelî û Berên wî: EW hemû Rûniştîne, zor fêlbaz û xerabkarin. Ligel vê jî de ew zorin. Ew Eşîrên Gerok diparêzin. Ev Eşîrên Gerok ligel Xelkên Gundên wêderê de koka wan yekin.

Beşê Duwem:
Ew Eşîra Koçer û Pêvgirêdanên wê ne.

Beşê Sêyem:
Ew Eşîra Sinamenîlî û yên Dorhêla wê ne. Renege, ku wan ji Ezerbêcanê ji bona hêre dane barkirin. Hemû Şiene. Li Çandinyê de zor başin. Ew di Çêkirin û Avanîyê de pêşveketine. Ew henû Kurdin.

Beşê Çarem:
Ew tevaya mayînên Eşîrên vê Herema E ne. Ew ji Diyarbekrê û yanjî ji Herema Wanê hatine. Niha hemû ew Rûniştîne û çandinîyê dikin û Terş û Pez xwedîdikin. Yên ku ew Şivankarin, ew li nava Reşmalan de dijîn. Bi giştî ew Mêvanperwerin û ew xwedan nav û dengekî başin.

Institut Kurde de Paris

Lîsta Eşîrên vê Heremê

| Navê Eşîrê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Korşelî | 6260 | Rûniştîne, Şiîne, bi kormancî diaxivin |

Lewçakin û rehetin. Belam di nava wan de hin xerabkarî beramberî Xelkên din heye, ku ew di nava Kurdên din de niye. Ew di Çandinyê de başin.. Ligel Reweşt û Rewenda Kurdên tir de cudabûna wan heye. Ev Eşîra hanê li nêzîka Rojhalatê Erzencanê de ye.
Çend Qolekî wê hene:
Berên Eşîra Korşelî evin.

| | | |
|---|---|---|
| Bala Beranlîyê Biçûk | 60 | Rûniştîne, Şiîne. Ew li kenarê Rojavayî Furatê û dora Agîn de rûniştîne û ew bi Kurmancî diaxivin. |
| Bala Beranlîyê Gewre | 500 | Rûnistîne.Ew li Jêrî Erezencanê de rûdinin û bi Zazayî dipeyivin, Şiîne. |
| Şaderlî | 300 | Rûniştîne. Ew bi pirbûn li Jêr Zemînê de di Sardavan de dijîn. Werzevanên pir Perîşanin. Ew li Jorî Rojavayî Erzencanê de dijîn. |
| Badelî | 700 | Nîvgerokin. Kurmancê Şiîne û li Rojhilatî Zara ne. |
| Koçerî | 10400 | - |

Mirovên vê Eşîra hanê li Kurdên tir de pir cudane. Zimanê wan li Kurmançî ye, belam ew zor li Zaza û yanjî li Zaravayê Kurdên Diyarbekrê de diçe.
Oldarîya wan zor seyre û ew nêzîkî Panetiîstê-Biserêxwe ye. Zor Perîşan û Werzevanên. Piranîya wan di nava Sardavan de dijîn. Ermenî û Musulmanên Dirawsên wan li xanîyê Gundên baştir de dijîn. Ew zor tirsonek û rebenin. Piranîya wan li dora Rêya Sîwasê-Zara de ne.
Berên wê evin:
Saroler

Institut kurde de Paris

Barler
Garloaler
Îboler
Eskî Koçerî 400 Malin, li nêzîka Erzencanê de rudinin.

| | | |
|---|---|---|
| Sînamînlî | 2500 | - |

Ew Eşîreke Şiîyî gewreye û ew li nêzîka Meletyê ye. Zaravayê wan. Ji Kurdî bêtir ew nêzîkî Farisî ye. Navê Berên wê Jimara Zîneta Civakî Agehdarîyên derbarên wê Eşîrê kêmin.

| | | |
|---|---|---|
| Korecek | - | - |
| Elxelas | 500 | Gerokin. Li Jêrî Rojhilatî Helebê Çiyayek bi vî navî eye. Renge, ku wê ev navê hanê ji xwe re dabe hilgirtin. Ew di navbera Behsenê û Firatê de ye. |
| Koderzor | 600 | Gerokin. Ew li Jêrî Bajarê Behsenê de ne. |
| Qere Hesen | 300 | Gerokin. Renge, ku koka wan Turkumanî bin. Ew li Rojavayî Behsenê de ne. |
| Kokrîşalî | 500 | Rûnistîne. Ew li Jorî Mereş de ne. |
| Nerdelî | - | - Ew li Rojavayî Mereş de ne. |
| Doxanlî | 250 | Gerokin. Ew li Rojhilatî Mereş de ne. |
| Wilyanî | - | Gerokin. Ew biçûkin, li nêzîka Nereşê de ne. |
| Gelîkanî | - | Gerokin. Hinek ji wan li Herema wanê de ne. Beşêkî wê jî li nêzîka Mereşin. Ev Beşê dawî pir perîşanin. |
| Lek Kurdî | - | - Ew li nêzîka Edenê ne û biçûkin. Ew ji Eşîra Lekê li Iranê ne[463]. |

[463]Ev Sê Eşîrê hanê li gora cihê ser Neqşe de ew li dora Bajarê Islahîyê têtin kevtin. Bi xwe jî Nivîstoka Kurdler pişta vê jî dide girtin. Bi taybetî Eşîra Belîkanli li dora Islahîyê bi xwe ye. Navînîya vê Melbendê ji vê Eşîrê bi xwe ye. Serjimara vî Bajarî li gora pêrûnitşina Serpereştîya Barkirvan Turkîyî Gişti de bi Deh Hezar Kes tête derkevtin, ku ew hemû jî Kurdin û ew ji vê Eşîra hanê ne.

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Delî Qanlî | 200 | Gerkin. Li deşta Mereş de ew konên xwe hildidin. Havînan ew ji bona Torosê diçin. Zivistanan 30 Mîlî li Rojavayî Kilîs de ew konên xwe vedidin. |
| Belîkanî | 250 | Gerokin. Ew bi Kurmancî diaxivin û ew li Dola Mereş de ne. |

Ev hersên Eşîrên dawîyî hanê li gora cihê wanî ser Neqşê de divê ew li dora Bajarê Islahîyê bêtin dîtin. Bi xwe jî Nivîstoka Kurdler jî pişta vê dide girtin. Bi taybetî Belîkanî li dora Bajarê Islahîyê de ye, ev Bajarê ku ew Navîna Melbendê bi xwe ye û ew ji vê Eşîrê ye.

Li gora pêrûniştina Serpereştîya Giştîyî Parkirvanan li Turkîyê de Serjimarê vî Bajarê hanê bi Deh Hezar Kes têtê danîn.

Ji destpêka Islahiyê û tanî nêzîka Meslemîyê li Herdû layê Şiva Tirina Helebê de Eşîr û Gundên Kurd zor hene, ku Sêr Mark Sayks li ser wan de ne axivitî ye. Bicke li van jî de li Liwaya Helebê û li Rojavayê Helebê û li dorhêla Herîm de Eşîrên Ekradî Gom û Qeyser Ekradî hene.

Herwehajî li Melebenda Menbic de Eşîrên Kurdîyî Rûniştîyî Bezîk, Denayî û Bakek hene.

Herwehajî li vê Mebenda hanê jî Eşîra Êlbegî heye, ya ku ew di nava Konan de li qeraxê Furatê rûniştîne.

Li Çiyayê El-West û li kenarê Ava Asî de û li Jêrî Rojavayê Bajarê Şaxor de jî hin ji Eşîrên Kurd hene.

Li Bajarê Helebê bi xwe jî de zor Kurd hene. Di navbera Humis û Terablusa Şamê de û li dora Çiyayê Kurd Daxê de û Husin El-Ekrad jî de hin Eşîrên Kurd hene û ew zor kevnarin. Ev Bajar û Çiya bi navê wan hatîye binavkirin.

Institut kurde de Paris

Li Bajarê Şamê jî bi xwe jî Beşekî ji Eşîra Salihîyî dora Kevrî heye. Herwehajî Taxa Salihîyê li Şamê jî de bi navê wan hatîye binavkirin. (Kurdler).

## Herema F

Ev Herema hanê Deşta Çemê Qezîl Êrmaq û Sikarya Welatê kenvarî Sîwasê, Enqera û Qonyê ye. Ev Herema hanê bi carekê ve ji derveyî Kurdistanê ye û ew di encamê Barkirina bi darê zorê ji Kurdistanê ji bona van Welatan de ji bal Sultan Selîmê Yekem de hatîye kirin.

Li hêla Enqera de ez tûşî hin Kurd bûm, ku Cil, Berg û Qelafetên wan li hin Turkên dora Erzeromê de diçûn. Gava min ji Turkên Erzeromê li ser hoyê vê lihevhatina hanê de pirsî, wan ji min re gotin, ku em Nevêyên wan Inkişariyane, yên ku Sultan Selîme Yekem li vê Hêlê de ev Erdên hanê bi me daye.
Li vê weha tête derketin, ku ev Erdên hanê yên wan Eşîrên Barkirvanên Kurd bûn û ew ji bona Turkan hatine diyarîkirin.
Li layekî tirîjî de weha derdikeve, ku Kurd li duwayî Barkirinê de bi darê zorê pê Cil û Bergên wî bi Cil û Bergên Turkan ve hatine veguhertin. Ev Cil û Bergên hanê bi xwe jî yên dema Sultan Selîmê Yekem bi xwe ne (ji xwe re li Cil û Bergên Pêla Sultan Selîmê Yekem de bidin temaşekirin).

Lîsta Eşîrên vê Heremê

| Navê Eşîrê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Ax Çeşmî | 300 | Rûniştîne. Ew li Rojavayî Siwasê de ne |
| Erok çîlî | 400 | Rûniştîne. Renge, ew Yorok be - Eşîra Turkumanîyî Gerok be, ya ku ew di navbera Emasî û Toaqt de ye. |
| Milî | 20 | Rûniştîne. Ew li nêzîka Osmanceqin. Êleke biçûkin. Ew ji Dêrsimê û yanjî Qerece Dax de |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| | | hatine. |
| Şêx Bizinî | 120 | Gerokin. Li nêzîka Boye Abad de dijîn. Di Koka xwe de ew ji Şêx Bizînîyî Dorhêla Kerkukê ne. Ew ji bal Sultan Selîmê Yekem de ji bona van Hêlan hatîye barkirin. Ew bi Kurmancî diaxivin. |
| Şiyowelî | - | - Divê ev Eşîr jiberê Şiyowelîyê Eşîra Şikakî bin, ya ku wê ji bona Rojavayî Kenferî daye barkirin. |
| Badelî | 200 | Rûniştîne. Li nêzîka Yoxaz de ne. Divê ew Berê Koreşelîyê Herema E bin. |
| Hacî Banlî | 200 | Nîvgerokin. Divê ew li Hacîmanlîyê Milî bin û ji bona hêre hênrabin. Ew li Rojavayê Qeyserî û qeraxa Qezîl Îrmaq li Jorî Amanos dikevin. |
| Xatun Oxlî | 400 | Nîvgerokin. Berekî Milî ye. Ew ji Qere Ce Dax de hatine. Li Jêrî Yozxadin. |
| Mîxanlî | 300 | Nîvgerokin. Berekî Milî ye.Ew ji Qere Ce Dax hatine. Li nêzîka Qere Şehrin. |
| Umarnlî | 800 | Nîvgerokên Berekî Milî ye. Ew ji Qere Ce Daxê hatine. Li Rojavayî Qere Şehrin. |
| Bereketlî | 1000 | Nîvgerokin. Li Jêrî Qere Şehrin û li kenarê Qezîl Îrmaqin. |
| Tabor Oxlî | 300 | Nîvgerokin. Ew Li Jorî Qere Şehrin. |
| Şêx Bizinî | - | Nîvgerokin. Li Rojavayî Goma Qoçhesarê û li Çiyayê Qoce Dax de ne. Renge, ew li Berê Şêx Bizînîyî Al -Şukurd de bin û ew ji wê derê ji bona vir hatibe nardin. |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Cudîkanlî | 200 | Nîvgerokin. Renge, ku ew ji Hêla Çiyayê Cudî ve ji bona hêre hatibe barkirin. Ew li Jorî Goma Qoçhesarê de ne. |
| Xalkanî | 400 | Nîvgerokin. Renge, ku ew ji Hêla Kalîfanîyî Rewanduzê de hatibe. Niha ew li Rojavavyî Goma Qoçhesarê de ye. |
| Sîvkanî | . 00 | Nîvgerokin. Li Hêla Jorî Xalikanî de dikevin |
| Nasirlî | 600 | Nîvgerokin. Li Jêrî Enqera û nêzîka Qere Elî de ne. |
| Tîrîkan | 400 | Nîvgerokin. 24 Mîl li Rojavayî Enqera de û li ser şiva Tirênê de dikevin. Ji Tîrîkanê Herema B Barkirine. |
| Atmanîka n | - | Nîvgerokin. Li nêzîkî Enqera û di nava Konan de ne. Li Atmanîkanê Herema A dane barkirin. |
| Zîrîkanlî | 500 | Nîvgerokin.Li nêzîka Jorî Rojavayî Eneqera de ne. Li Zîrîkanlîyê Herema D de ji bona hêre hatine. |
| Cîhanbek lî | 5000 | Nîvgerokin. Ew ji bal Sultan Selim ji nava Milî hatiye derxistin û ew ji bona hêre hatîye barkirin. Ew di nava Efyon Qerehesar û Aqşeher de ne. Ew li Enedolê de dûrtirîn Kurdê Rovava ne[464]. |

Institut kurde de Paris

Evaya kurtbûna agehdarî û dirêjbûnên Sêr Mark Sayks in, yên ku wî li dawîya Nivîstoka xwe de Şûpa Xulefayê Dawî de derbarê bi Eşîrên Kurdîyî Dewleta Osmanî de daye.

[464]Serpereştvanê Giştîyî Barkirvanên Turkî di Nivîstoka Kurdler de dibêje, ku Eşira Cîhan Beklo li Melbenda Aqşeher de Navcîyekê dide pêkanîn. Herwehajî ew di nava Melbenda Xîmane de jî hene.

Li gora bîr û bawerîya Serpereştîya Giştîyî Barkirvanan li Turkîyê de divê Serjimara Kurdên vê Herema Navînîyî Enedolê de ji 50.000 Kes bêtirbin. (Kurdler, R. 80 Perî).

4. Hin Agehdarî derbarê Eşîrên ser kenarên Sînor de.

Mêcer Son, yê ku ew derbarê Kurd û Zimanê wî de bi rastî Mirovekî zor şareza û xeberdar bû, li raportê xwe de li ser Liwa Sulêmanyê de li Sala 1918 de kêmekî li ser Eşîrên kenarên Sînorên Turkî-Iranî û Iraqî-Iranî de diaxivê.
Weha min baş zanî, ku ez li ser wan agehdarîyan de jî kêmekî biaxivim:

1. Hesenanlo

Birên Hesonlo

| |
|---|
| Hederanlo |
| Heresanlo |
| Sipîkanlo |
| Cibranlo |
| Zîlanlo |
| Ademanlo |

Ev Sê Berên dawîyî vê Eşîra hanê li nêzîkî sînor de ne.

Institut kurde de Paris

2. Hekarî

Eşîrên Hekarî

| |
|---|
| Şîrwanan |
| Awramaran |
| Celo |
| Şemdînan |
| Amêdîyê |
| Mîsorîyan |
| Zîbarîyan |
| Hawêriyan |
| Berawariyan |
| Barçîlan |
| Sîwalan |
| Layêhonan |

Ev heşt Eşîrên Hekarîyî dawîyî hanê ji bona ser sînor nêzîkin.

3. Mukrî

Eşîrên Mukrî

| |
|---|
| Mameş |
| Mengor |
| Pişder |

---

Hesenlo

Institut kurde de Paris

Kêm Eşîrên Kurd hene, ku mêjûwa wan ji 500 Salî bêtir ber bi Jor diçe, çunke li pêş vê dema hanê de Kurdistan ji hêsta biçûktir û tengtir bû û ew di nava gelek Dewletên bi hiner û gewretir de bû.

Wan Dewletên hanê nedihiştin, ku Kesek Mulkên wan li destên wan de bistine û ew ji bona nava Welatên wan bên. Herwehajî ligeljî de di vê demê de jî Cîhangerên Biyanî jî di nava wan de nebûn.

Hesnanlo jî li vê rêzana hanê jî de bider niye. Wa diyare, ku wê mîna Kurdên Bedlîsê, Hekarê û Erdelanê ji xwe re Dewletek nedane damezrandin, her û her Eşîreke gerokîyî Serbixwe bû û ji kevnar de ew li Çiyayên nêzêka Bedlîsê de bû.
Li Pêla Sultan Selîmê Yekem de li Sala 1514 ev Eşîra hanê hate veguhestin û parastina sînorê Iranê û Rusyê pê hate dan.

Beşê bingehîyî vê Eşîra hanê li ser sînorê Iranê de hate danîn, ku ew Sipîkanlo û Heyderanlo bû. Çûnke, ku wan zor sergêjî dikir, Şah Ebas di zemanê xwe de di dema vekirinên xwe de wî ev Eşîra hanê jî ji bona jêr serdarîya xwe anî û hin jiberên wê mîna Zaferanlo, Adamanlo û Kîwanloyî ji bona Xoresanê dane veguhestin.

Peyman Sala 1049 K.- 1639 Z. de ev Eşîra hanê ji bona jêrdestîya Osmanî date vexistin. Belam Heyderanlo û Sipîkanlo ewende şerhelbest bûn û ewende mêldarîya talanîya Iranê bûn, li wê peymana di navbera Sultan Muhemedê Duwem[465] de û Şah Fetih Elî de Bendeke taybetî hate têxistin, ku heger ev Eşîra hanê ji bona nava Iranê bêtin kevtin, dê Dewleta Osmanî wan serkut bike.

Vê Eşîra hanê li Cengên Turk-Rusî de di Salên 1245, 1271 û 1294 K.- 1829, 1854 û 1877 Z. de beşadrbûn, belam wan bêbextî derbarê Turk kir û li ser hin sozan de yarmetîya Rus dan, ku Rus li Xakê wan de têperbin.

Di Cenga Cîhanî Yekem de ew bêsûdbûn.

[465]Weha hatîya, belam rastîya wê Mehmudê Duweme. (M. E.).

Institut kurde de Paris

Ev Eşîra hanê di nava Kurdên tir de nav û dengên wan baş nebû. Her û her wan ziyan bi Kurdên Jêr ve didan xistin.

Hekarî

Kurdên Hekarê bi xwe vedibêjin, ku ew li hemû Kurdan bêtir kevnartirin û xwîna wan ji hemûyan bêtir paktire, çunke, Welatê wan ji herî kevnar de Navîna Kurdistanê bû.

Li lîsta Ber û Tîrên wêna de yek duyek ji bona nava Xanedanên wêyî Bingehîyi Kurd mîna Amadîyê û Mîsorî kirine. Belam evana jî li gora Çil û Bergên xwe ve, Reweşt û Zaravê xwe ve mîna Berên tirî Eşîra Kokî bi xwe ne.

Di heyamê kevnarî Kurdistan de Mîrneşînîyeke bî hêz hebû, ku jê re Mîrneşînîya Bedlîsê digotin, ya ku jê Beşê Hekarîyî Miletê Kurd hatîye peydakirin. Ew bi Kurmancî diaxivtin û ev Zaravayê hanê jî li Zaravayê Mukrî de, -yê ku ew Zaravayekî herî xurû ye-, nêzîk bû.

Ev Xanedana Hekarîyî hanê ji Nevîyên Mîr Qere Osmanîyê Silcoqî bû, yê ku ew di dema vegirtina Têmorlemg de Walîyê Hekarê bû.

Mîrên vê Xanedana hanê û Merevên wê li Bedlîsê, Cezîrê, Amadîyê, Colemerk û Sulêmanîyê de Serdarê kirine.

Li Pêlên dawîyî van cihan de hêştajî Şop û bîrwerîyên wan mane. Ligel vê jî de, ku ev cihên hanê Hekarî nînin, belam Zimanê wan beşekî ji Zaravayê Hekarê ye.

Cezîrê, Colemerk û Amadîyê hêştajî ew di nava sinorên Herema Hekarê de ne û Xelekên wêjî ji Kurdên Hekarê ne.

Serdarî di vê Mîrneşînîya hanê de Şûngirî bû. Weku hemû Serdarên Kurdên tir dan û sitendina Mîrên wan ligel Dewletên Gewre û Biçûk de baş bû.

Institut kurde de Paris

Beramber bi Serdarên xweyî xerab ve reweşteke wanî sêr hebû. Civata wan, ya ku ew ji Yextiyar û Gewreyên Eşîrê dihate pêkdihatin, ji bona civînê dihate bangkirin û ew Serdarê ku wan ne dixwest, ew jî bangdikirin. Li dawîya gift û gokirinê de Civatê biryar bi nikarîbûna Serdar dida. Wan cotekî Kefş bi ber devî wî ve didan. Li dawîya vê de neçar dibû, ku ew biryara wan bide bicihanîn û cihî bide hiştin. Dibû, ku ev Serdarê hanê li paş demeke tir de careke din ji bona cîhê xwe bihata vegerandin.

Li pêş Sala 920 K.- 1514 Z. de, ku Dewleta Iranê li Çildêran de hate şikenandin, Mîrê Bedlîsê û Hekarê bi pêvegirêdana xwe bi Iranê ve pê dihate rûniştin.

Lêbelê li dawîya vê mêjûwa hanê de û bi alîkarîya Mewlana Îdrêsê Bedlîsî ve ew bi Turk ve hate vegirêdan.

Zorî pê neçû, wî Serxwebûna xwe date dazanin; çunke Cîgehekî wîyî sext û Orduwekî wîyî baş hebû.

Ligel vêjî de li zemanê Sultanê Muradê Çarem de 1060 K.- 1649 Z. de careke din bi pêvegirêdana xwe ve bi Turk ve pê hate rûniştin û vê tanî Zemanê nabûdbûna vê Mîrneşînîya hanê di Sala 1849 de date dirêjkirin.

Mîrê dawîyî bi nav û deng Şeref Beg bû, yê ku wî li dawîya dorlêgirtinê û bêbextîyekê de xwe ji bona Turk date berdestkirin.

Sînorê vê Mîrneşînîya hanê ew Çiyan bûn, yên ku li Sala 1049 K.- 1639 Z. de û tanî Sala 1325 K.-1907 Z. de xêza sînor bûn. Ev xêza hanê jî xêza parvekirina avê bû, ya ew ku di navbera Hekarê û Mukrî de bû.

Vê Eşîra Hekarê bi tenha ji me re nebes tenê Serdarên Gewre Gewre dane pêgihaştin û pêgihanddin, lêbelêjî bi serdejî Wejeyekî wêyî başî jî hebû; Ehmedê Xanî Şairekî bi nav û bangê Hekarî bû. Wî ji me re li dû xwe de gelek şopên nivîsandî dane hiştin.

Institut kurde de Paris

Li Sedsalê Nozdehemîn de vê Eşîra hanê nav û banga xwe bi kuştina giştîyî Filan ve di Sala 1255, 1259 K.- 1839, 1843 Z. de lekedarkir. Van rûdanên hanê di Serpereştîya Nur El-lah Beg û Bedirxan Begê Hekarê de rûdan.

Dewleta Amêdîyê ligel Ismaîl Paşa de dawî pêhat. Vî Mirovê hanê bi rastî zor bi mêrxasî beramberî Turk hate rawestandin. Li dawîya xistina bomban de ji bona jêrî Kelha wî de û berbakirina wêna de ew bi xwe jî hate girtin û ew ji bona Bexdadê hate birin.

Şêxê Sulêmanîyê ligel Qolê Amêdyê de pêwendîyên Jinanînê hebûn.

Li navçûna Mîrneşînîya Kurd de deshilatîya Eşîran nehişt. Serdarî û desthilatî ji bona nava destên Paşayên Turk ve hate veguhestin.

Mukrî-Mîkrî

Ev Eşîra hanê her dem û çaxê li Şaxên Sawçeblaq de bû û Serokê wê Xanî pê dihate gotin û ew her ji Eşîra xwe bûn.

Li gora Zimanê wan de, yê ku ew zor nêzîkî Zimanê Evesta ye û yê ku wî xwe dayite parastin, Rêzimana wîna û hin ji nîşanên wîyî tîrî de mîna Zimanê kevnarî Zerdeştî-Serdeştî tête dîtin.
Weha Mero dikare bêje. ku ev Eşîra hanê ji zor kevnar de her li vî Xakê hanê de bû yanî li Maqna-Magnayê Mîdya de rûniştîbû.

Pirofisor Wilyem Cakson, yê ku wî ji hemû Kesî bêtir likolandin li ser Zerdeştîyê de dayite kirin, cîhê zayîna vî Peyamberê hanê li Jêrî Ormiyê de dide nîşandan, ya ku ew li sînorê Jorîyî Mukrî de tête kevtin.

Evaya jî bi xwe jî wê Dîtinê xurtdike, ya ku ew dibêje, ku Mukrî raste û rast Netewê Made, çunke ew li nava Xelkê Iranê de li hemûyan bêtir li nêzîkî cihê serê Zerdeştî de hatine dîtin û ew bi Zimnanekî dixaivin, ku ew herî nêzîkî Zimanê Zerdeşt bû.

Gava ku Şah Ebas nêzîka Sala 1034 K.- 1624 Z. de li şerîkî de Turk şikandin, Beşekî zorî Sipahê wî ji Kurdên Mukrî bû.

Ev Eşîra hanê her û her li Sipahê Iranî de cihekî wêyî berz û hêja hebû; ligel vî jî de hîç ew mîna Erdelan bi hêz, hiner û bi nav û deng nebû. Hîç jî wê rojekê ji rojan jî mîna Eşîra Erdelanê Zanistvan û Şair pê nedane gihandin û gihaştin.

5. Hin agehdarî derbarên Eşîrên Kurdên Iranê

Tanî hêsta derbarên Eşîrên Kurdên Dewleta Osmanîyî kevnar de kêm û zor me agehdarî dane pêşkeşkirin. Li vê lêkolnadinê de tozekî li ser Eşîrên Kurdî tirî Iranê de diaxivin:

1. Eşîrên Welatê Kurdistana Iranê û yanjî Herema Sune (Insiklopêdîya Musulmantîyê, Bergê 4, Perê 226):

| Navê Eşîrê | Jimara malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Komasî | - | Rûniştîne. Li Gorewaz de ye. |
| Caf | 4000 | Li Ciwanro de ye. Havînan ew ji bona Çiyayê Çehel Heşîme dirin. Çend Berên wê hene:<br>Qubadî, Yenaxî, Kalaşî, Weldekî...Hd. 150 Malên wan jî li nêzîka Zehaw û li nav Goran de heye. |
| Mendemî | 2000 | Rûniştîne. Li nêzîka Hisên Abadin. |
| Gulbaxî | 3000 | - Li Hobato, Salar û Qeredewar de ne. |
| Şêx Ismaîl | 1600 | - Li dorhêla Isfend Abadin. |
| Pîr Pîşe | 1000 | - Li dorhêla Isfend Abadin. |
| Tamaztoza | 300 | Rûniştîne. Li Leylaq de ne |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Koraka | 1500 | Rûniştîne. Li Leylaq de ne. |
| Lala | 600 | Rûniştîne. Li Leylaq de ne. |
| Mehmud Cibraîlî | 400 | Rûniştîne. Li Leylaq de ne. |
| Balîwend | 1500 | Rûniştîne. Berekî wê li Zivistangeha Gawerud de ye |
| Derac | 1200 | Rûniştîne. Berekî wê li Zivistangeha Gawerud de ye |
| Boraka | 450 | Gerokin |
| Sakora | 300 | Gerokin |
| Lorê Ko-lahker | 1700 | Gerokin |
| Gîyo Gaşî | - | Gerokin |
| Xerat | - | Gerokin |

Institut kurde de Paris

2. Eşîrên Welatê Mukrî yanjî Herema Sablaxê[466]

Xelkên vî Welatî bi Kurdên Mukriyanî bi nav û dengin û ew ji Eşîrên Mukrî û Bolaqin. Hemû Sunîne[467].

| Navê Eşîrê | Jimara Malan | Cîneta Civakî |
|---|---|---|
| Mukrî û Bolaq | - | Rûniştîne. Xwedanê 297 Gundin. Rawilson dibêje, ku ev Eşîra hanê bi navê Babamîre ve bi nav û denge û ew xwedanê Nozdeh Bere. |
| Murîyê Gerok | 800 | Rûniştîne. Xwedanê 24 Gundin. Ew Xelkên Şino û dorhêla wêne. Hemû Sunîne. |
| Belbas | - | Rûniştîne. Havînan ew ji bona Seran-Çiyan diçin. |
| Mengor | 148 | Rûniştîne. Eşîreke zor dire. Li ser Çemê Sablax de ne. Ew Berekî ji Belbasî ye. |
| Pîran | 30 | Rûniştîne. Li Lacanê kevnin. Ew Berîkî Belbasin. |
| Mamêş | 100 | Rûniştîne. Li Lacanê nuhin. Navîna wêna Bajarê Peswê ye. Berdê Mîşe û Lawen jî didestên wê de ne. Li Seldoz û Şino jî Mameş hene. Ew Berekî Belbasin. |
| Ocaxê Kaxidirî | - | Gerokin. Havînan li Weznê û Zivistanan ew li Deşta Koye de ne. Xerîkin, ku ew li Iranê |

[466] Insiklopêdîya Musulmantîyê, Bergê 4, R. 188.

[467]Rojhilatnas Rawilson bicge li Belbas, Bane û Seqiz jimara Malên Liwa Mukri 12000 Mal dide danîn û ew Serjimara wan bi 100000 Kes dide texmînkirin. Belam ligel wan her Sên Beşên dawî de dibe, ku Serjimara wan bi Du Sed Hezar Kes bête gihaştin.

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| | | de cîgîrbibin. |
| Gerok | 100 | Rûniştîne. Li Herema Serdeştin. |
| Sosenî | 68 | Di navbera Weznê, Serdeşt û Çiyayê Qendîlê de ne. Berên wê evin: Biryacî, Melîkarî, Darmê, Hezalan û Alan. Beytuşî Navînîya Alan ne û ew 70 Malin |
| Bane | 3500 | Melbendeke bi Serbixwe ye. Heşt Navçeyên wê hene. 145 Gundên wê hene. Li Navîna Bane de 800 Mal hene. |

Institut kurde de Paris

3. Eşîrên Welatê Kermaşan, (Isiklopêdîya Musulmantîyê, B. 2, R. 1035)

| Navê Eşîrê | Jimara Malan | Cîneta Civakî |
|---|---|---|
| Sincabî | 2500 | - |

Li Deşta Mahîdeştû Ciwanro de ne. Havînan ew ji bona Serçavîya El-wend dirin. Ew xwedan 12. Berin: Çalabî, Dalyan, Seymewend, Sorxewend, Heq Nezer Xanî... hd. Sinacabîyê kokî 500 malin. Ewanên tir Erkewazî û Tekewend ji Lor, Berazî ji Caf û Tivingçî ji Goran li jêr parastina wan de ne. Serokê Sincabî ji bal Iranê Komandarê sersînore.

| | | |
|---|---|---|
| Goran | - | - |

Eşîra herî zor û bihêzî vî Welatî ye. Ew Şeş Beşe:
Guhware, Nîrîcî, Kalxanî Bêbiyanî, Kalîzincîrî û Rîzho. Navînîya vê Eşîrê Goran bi xwe ye. Dirawsên wê Şerefbeyanî, Bacelanî û Sincabî ne. Ew li Jorî Zehab de ye.

| | | |
|---|---|---|
| Yusifyar Ehmedî | - | |
| Kewekî | - | Berên wê: Gorgest û Nîrzehî ye. |
| Ehmedewend | - | Ew li Jêrî Rojavayî Çemê Gîlanin. |

| | | |
|---|---|---|
| Payrawend | - | |

Dibe, ku ew Nevîyên Eşîra Pahracî kevnar be. Êsta ew li Hevrazên Rojavayî Çiyayê Paro de dijîn, yê ku ew li Jêrî Dînor de tête ketin.

| | | |
|---|---|---|
| Kolyayî | - | |

Ew li Melbenda Songor de li 165 Gundan de dijîn. Ev Melbenda hanê bîcge li Navînîya wêna de, (ku ew Turkumanin) hemîyên mayî Kurdin. Ev Eşîra hanê bi Zaravayekî nêzîkî Kurmancî xeber dide û Zaravayê wêna Kermanşahî ye.

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Kulher | - | |

Ew li dora Rêya Qesra Şêrin-Kerend de têtin belavkirin û ew Eşîreke zore. Berekî ji bo Keleha Sayin date berkirin û wê li wêderê de Gundê Çokelî date avakirin. "Rawilson".

Mexabin, ku derbarên dirêjîyên Zîneta Eşîrên Kermanşahî de Kanîyek bi destên me nehate kevtin.

Bes û bi tenha Mêcer Son dibêje: ku Eşîra Goran û Kulher 8000 Siwar dikarin bidin derxistin. Bi gora vêna jimara Malên van Herdû Eşîran di navbera 6 û 8 Hezar Mal de tête derkevtin.

Rojhilatnas Rabîno dibêje: ku di vî Welatî de 44 Eşîr hene û piranîya wan jî Kurdin.

Nivîstokên Kurozon û Rawilson agehdarîyên dirêj li ser Êşîrên Kermanşah didin dan. Agehdarîyên Kurozon di Nivîstoka xwe Iran û pirsiyarîya Iranî, Bergê 2 de li ser Eşîrên Sune û Kermanşah de bi vî rengê tê têtе kurtîkirin:

Eşîrên Welatê Sune-Erdelan: (Ev di Çapa Kurdî de niye. -Dr. Cuma).

| Navê Eşîrê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Kulher | 300 | Rûniştîne. Li Melbenda Seqiz de ne |
| Tîleko | 600 | Rûniştîne. Li Melbenda Hawato de ne |
| Gulbaxî | 500 | Rûniştîne. Li Melbenda Hawato de ne |
| Şêx Ismaî | 300 | Rûniştîvanê Melbenda Evsender Abadin |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Porpoşî | 300 | Rûniştîvanê Melbenda Evsender Abadin |
| Mendemî | 500 | Rûniştîne. Li Melbenda Hesen Abad de |
| Mamûn Cebrasî | 300 | Rûniştîne. Li Melbenda Bîlewer de ne |
| Koşkî | 400 | Rûniştîne. Li Melbenda Hesen Abad de |
| Korgeyî | 300 | Rûniştîne. Li Melbenda Leylaq de ne |
| Lek | 1000 | Rûniştîne. Li Melbenda Leylaq de ne |
| Şemşîrî | 400 | Ew li ser Melbenda sînorin. |

Institut kurde de Paris

Eşîrên Welatê Kermanşah: _(Ev di Çapa Kurdî de niye. Cuma)

| Navê Eşîrê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Kulher | 5000 | Rûniştî û Gerokin.Ew Hevînan li Çiyaê Loristana Rojavayî de û Zivistanan ew li Herema Zuhab û Qesra Şêrîn de dijîn. |
| Sincabî | 1500 | Rûniştî û Gerokin. Ew li Deşta Mahîdeşt de û li Rojavayî Kermanşah de rûdinin. |
| Goran | 5000 | Rûniştî û Gerokin. Ew li Deşta Mahîdeşt de û li Rojavayî Kermanşah de rûdinin. |
| Kerendî | 2000 | Rûniştî û Gerokin. Ew li Herema Kerend û Harun Abad de dijîn |
| Bawepence | 1000 | Rûniştî û Gerokin. Li dorhêla Kerend û Celalewendin |
| Hemawend | 200 | Rûniştî û Gerokin |
| Zengene | 1500 | Rûniştî û Gerokin |
| Songor | 250 | Rûniştî û Gerokin. Li jorî Kermanşaha Kulahî de ne |
| Nane Kolî | 300 | Rûniştî û Gerokin. Ew li Kermanşaha Rojava de ne |
| Celalewend | 300 | Rûniştîne. Li Rojhilatî Kermanşah de ne |
| Mafî, Şiwankerî, Xazel | 2000 | Ev sê Eşîrîn |
| Hilîlan | 2000 | Gerokin. Li Jêrî Rojihilatî Kermanşah de û li ser Kanîyên Kerxa de dikevin |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| Ekur | 1000 | - |
| Hemû Serjimar | 22050 | |

Weha Rojhilatnasê bi navkirî Eşîra Helîlanî bi Berekî ji Lor dide danîn. Ew dibêje, ku Xelkên Bajarê Kermanşah nêzîka Çil Hezar Kes tête derketin û piranîya wan jî Kurdin.

Rawilson di Nivîstoka xwe de (ji Zehab tanî Xuzistan, R. 44) de derbarê Eşîra Kulher de dibêje, ku ev Eşîra hanê pirî pir kevnare û jimara mal û yanjî xanîyên wê Bist hezarin. Bigir nîvê wê di nava Welatê Iranî de dijî û nêvî wêyî tirî li cihê wêyî kevnarî kokê de di nava Çiyayên Zagrosê de dijî. Ew ji bona Du Beşên bingehî Şahbazî û Mensurî tête parvekirin. Beşê Yekem jimara malên wî 8000 hezarin û Beşê Duwem jimara malên 2000 hezarin. Beşê Yekem ew li Herema Mahîdeşt, Kermanşah û Mendelî de rûdinin û Beşê Duwem ew li dorhêla Gîlan de rûdinin.

Institut kurde de Paris

4. Eşîrên Kurd li Welatê Ezerbêcan de (Insiklopêdîya Musulmantîyê, B. 4-3, R. 80, 108)

| Navê Eşîrê | Jimara Malan | Zîneta Civakî |
|---|---|---|
| Celalî | - | - |
| Mîlan | - | - |
| Xedranlo | - | - |
| Reşewend | - | - |

Ev Herçar Eşîrên hanê li dorhêla Çiyayê Araratê de, di navbera Aras û Çiyayê Sokar de, li dorhêla Kalînî de li Melbenda Mako de dijîn dijîn

| | | |
|---|---|---|
| Seldoz | 2000 | - Ew ji Zaza, Mameş, Mukrî û Eşîrên dinin |
| Lek | - | - Ew li Melbenda Selams de ye û ew ji Şîrazê ji bona vê derê hatîye. |
| Kurdewerî | 1000 | - Ew ji hêla Alî Fetah Şah ve ji Şîrazê ji bona vê derê hatine veguhestin. |

5. Eşîrên Kurd li Loristanê de

Mêjûwa Gezîde dibêje, ku Gelê Lorî Du Beşin û Heşt Berin. Bicge li van Berên hanê jî de Hîjde-Heştdeh Eşîrên wî hene. Eşîrên Sahî, Arsan, Arkî û Behî bi Lorî dipeyivin; lêbelê ew ne Lorin.

Lorên êsta Çar Beşên gewreye: Mamasanî, Kohguloyî, Bextîyarî û Lorê Eslî.
Kurdê Lorî bi hoyê têkelbûna wanî zor ligel Iranîyan û Êşîrên Iranî de zimanê wan nêzîkî yê Farisî bûye; belam dîsan wan koka xwe dayite parastin û ew Kurd mane.

Ji van Herçar Beşan Beşê Mamasanî-Mam Hesen ji tevan gewretire. Ew Çar Qolin: Bakaş, Cawîdî, Duşminzarî û Werestemî.

Beşê Kohgulîyî jî Sê Beşin: Axecarî, Bawî û Çekî. Ev Beşên gewre jî her yekî ji wan çend Qolek lê bûye. Ji bona nimûne, Axecarî Neh Qolin û jê Çar Turkumanin, yanî Çar Eşîrên Turkumanî jî xwe ji bona nava Beşê Axecarî dayite xistin.

Beşê Bextiyarî Du Qole gewre lê bûye: Çar Ling û Heft Ling. Ev Qolê Duwem êsta zor bidesthilate. Qolê Yekem ew di navbera Birocerd û Golpaygan de dijî.

Rojhilatnas Roso cihê Xêlatê-Êlê Bextiyarî li dorhêla Sebezkoh, Zerdekoh, Şoster, Isfehan û Kermanşah de dide danîn. Ew jimara wan

Institut kurde de Paris

bi Sed Hezar Mal yanjî Serjimara wan bi Sêsed Hezar Kes dide danîn. (Nivîstoka Kurdler).

Beşê Lorî Eslî Çar Qol lê bûye: Tarxan, Delfan, Selsele û Balagîrîwa. Xêlatên-Êlên vê Qola dawî Lorên Xurû ne û jê hin Berên Giring bûne: Dîrîgewend, Segewend...hd.

Renge, ku Berê Dîrîgewend binaxê Gelê Lorî be û ew ji bona Gewrên xwe ve Mîr dibêjin.

Qolê Feylî-Lorê Eslî- di Loristana gewre de ne. ew Cotkar û Îşkerin.

Serjimara wan bi 50 tanî 80 Hezar Kes hatîye texmînkirin. Ew Du Beşin: Piştkoh û Pêşkoh. Heryekî ji vanan jî nêzîka Hivde-Heftdeh Êlan lê bûye (Roso).

Misyo Conyan jî ev Êlên hanê li Loristanê de dozîne:

Eb-Delawend, Şêxewend, Kakewend, Geros, Kîsewend, Wermezbar, Zehrewend, Baclowend, Cilîwend, Kelhur, Mafî, Qerezincîrî, Zengene û Sedewend.

Eşîra Lek jî yekek li Qolên gewreyê Beşên Lor de ye û ew kurdên xurû ne.

(Insiklopêdîya Musulmantîyê, Bergê 3. Rûpelê 11, 12) dibêje, ku ev Eşîrana hanê di koka xwe de Sed Hezar bû; jiber vî ew bi wî navî hatin binavkirin. -Lek bi Farîsî ji Sed Hezarî re tête gotin- . Ev Eşîrên êsta, yên ku ew li Loristana Jorî de ne û ew ligel Lor de têkelin, li gora mêjûwê divê ew Lek ji Welatên Jorî de ji bona van navan hatibin.

Rabîno dibêje, ku ev Eşîrên hanê ji bal Şah Ebas ve ji bona bergirtina Desthilatîya Walîyê Hisînxan ve ji bona van Navan hatîye nardin. Ev Rojhilatnas bi xwe jî dibêje: ku Selsele, Delfan, Bacelan, Zend, Mafî û Zendîyo Kale[468] hemû Berên Lek bûn.

[468]Rojhilatnas H. Schindler-Şindler dibêje, ku Kerîm Xanê Zend ji vî Berî ye. Ew li Gundê Parya de, yê ku ew niha bi Parî tête binavkirin, ji bona Dunyayê hatîye. Ev

Institut Kurde de Paris

Kerîm Xanî Zendî di Zimanê xwe de Berê Bayeranewendîyê Lek ji bona nik xwe li Şîrazê de date veguhestin. Vê Eşîra hanê ligel Eşîra Bacelan de di Sala 1212 K. de ji bona vejandina zindîkirina Dewleta Zend yarmetîya Muhemed Xanê Zend dane kirin.

Li Zemanê Selteneta Qacar de ev Eşîrên hanê zor hatin belav û perîşankirin. Bigir Eşîra Zend bi carekê ve hate linavbirin û bes hinek ji wan ji bona nava Eşîra Bacelan ve li dora Xaneqînê de çûn. Hinek Eşîrên Zend êsta li Navçeya Dor û Ferman de û li Jêrî Rojhilatê Kermanşah de ne.

Hin ji Eşîrên Mafîyî niha li Heremên Waramîn, Tehran û Qezwîn de dijîn.

Li gora O. Mann û Rabino Eşîrên Lek li Loristana êsta de ev çend Berin:
Selsele (9000 Malin), Delfan (1470 Malin), Tîrhan Umrayî (1582 Malin), Dalewend (1000 Malin). Hemû (19.000) Mal dibin.

Dalewend Beşekî Bayranewende. Ew ligel Mayîyê Bayranewend de li Rojhilatê Xurem Abadin.
Selsele û Delfan ew li Deştên Alîştar û Xaw de ne.
Terhan-Terxan ew li layê çepê Çemê Saymara de ne.
Bi kurtî Cih û Warên Lek Beşê Jorî û Jorî Rojhilatî Lorostane, ku jêre Lekistan jî dibêjin.
Niha (Sala 1914) Eşîrên Selsele, Delfan û Tîrxan di bin Serokitîya Nezer Elî Xan de tên sermiyandarîkirin.
Eşîra Duwem û Sêyem Ehlê Heqin û Şiîyên xwîngermin.
Isinklopêdîya Musulmantîyê derbarê Serjimara Eşîrên Loristanê de dibêje:
ku Kurozon di sala 1298 K.- 1881 Z. de ew bi 421999 Kes ve dane texmînkirin. Ji vanan 170000 Bextiyarîne, 140000 Kohguloyîne û(210000) Feylîne.

Institut kurde de Paris

---

Gundê hanê Sê Kîlomitran ji Dewlet Abad dûre û ew li ser Rêya Sultan Abad tête kevtin.

Di sala 1904 Rabino Beşê Pêşkohî bi 130000) Kes û Beşê Piştkohî bi 50000 Kes ve date texmînkirin.
Ev Kanîya hanê bi xwe jî bi gora Ziman ve Xelkê Loristanê bi Du Beş dike:

1. Lorên Gewre Mame Sanî, Kohguloyî, Bextiyarî

2. Lorê Biçûk yanî Feylî.

Zimanê van Hedrû Beşan li gora hin wekhevbûna peyvînê û alavên dawînê de bi Zimanê Farisî mîn dikin.

Lêbelê ev Dîtina hanê lawaz û zor pêwistî bi lokolandinê tête kirin. Bi diyarî Zimanê van Herdû Beşan beramber bi Farisî û Kurdî ve ew li Kurdî de nêzîktire.

Lor û Kurd, Herdu la li yek de dighin. (Ji xwe re li ser lêkolandina Ziman de bidin temaşekirin).
Jiber ku Lêkolandinên Mêcer Rawilson der Sala 1836 de li ser Loristanê de pir mezin û giringin, em wan bi kurtî li vir de didin daxistin: (Ev di ya Kurdî de niye. Dr. Cuma).

Institut kurde de Paris

Eşîrên Bextiyarî (lorê Buzurg)

1. Berên Eşîra Heft Ling

| | |
|---|---|
| Hemû Jimarên Malan | 7000 |

Ev Berên hanê Havînan li Capalkalo, Sîlaxor, Çar Mehel û Borborod de û Zividtanan
ji Serdeşt û Deştên Jêrî tanî Dêzfulê de têtin biciûwarkirin.
2. Berên Eşira Çar Ling

| | |
|---|---|
| Kunorsî | 1000 |
| Sehonî | 1500 |
| Mehmud Sala | 1000 |

| | |
|---|---|
| Mokolî | 500 |
| Memîwened Zelakî | 4000 |

Ev Berên hanê Havînam li Ferîdon û Zerdekoh de û Zivistanan li Deştên Jêrî de tanî (Ramê Hurmuz), Canpekî, Kermisî û Şuştir de têtin biciûwarkirin.

| | |
|---|---|
| Bawayî | 3000 |
| Orak û Şalo | 250 |
| Hemû Jimarên Malan | 5500 |

Ev Berên hanê havînan li Bazof de û Zivistanan li Susen û Mal Emîr de têtin biciûwarkirin.

3. Eşîrên bi Bextiyarî ve girêdayî

| | |
|---|---|
| Canokî | |
| Germesîr | 4000 |
| Xanokî | 2000 |
| Serdesîr | - |
| Gundezelo | 1500 |
| Hemû Serjimarên van Beran | 28000 |

Ev Berên hanê havînan li Çiyayê Monkuşt, Kandoman û Lordaxan de û di Zivistanê de li Baxê Melek, Tol, Gelyê Goran û Kolkîr de têtin biciûwarkirin. (Ji Zehabê tanî Xizistanê, R. 103).

---

Ev Rojhilatnasê hanê li ser Lêkolînên xwe de dire û ew li ser Bawermendî û Zîneta Civakîyî van Eşîran de dibêje:
Serekê giştîyî van Eşîrên hanê Muhemed Teqi Xan ji Nevîyê Alî Merdan Xanê bi nav û denge. Ew ji Eşîra Çanpeki ye.
Bavpîrê wîyî gewre li ser tevaya Iranê de piştî kuştina Nadir Şah zal bû.

Institut kurde de Paris

Muhemed Teqi Xan Merevekî zana û di tiştan de têgihiştî û pêgihiştî bû. Ew pir mêrxas gernas bû. Ew bi karê xweyî Serokitîyê pir bi başî pêradibû. Ji bal Xelkê ve ew pir evîndar bû. Di dema pêwistîyê de wî dikarîbû Duwanzde-Duwanzdeh Hezar Şervanan bide serbazkirin.
Welatê wî pir avedan û dewlemend bû. Eşiran têde dest bi rûniştin û avedanîyê kiribûn. Wan ji xwe re li Hêla Frîdon de pir Erdên fireh û dewlemend wergirtin û têda wan pir Gund dane avakirin. Hemû Tûtina Xuzistan jiberê vê Hêlê bû. Van Eşîrên hanê bazirganîyeke fireh ligel Esfehan didan dikirin.
Berberî û Duberî her û her di navbera Eşîrên Heft Ling û Çar Ling de lidarbû.
Bi giştî Zîneta Civakîyî vê Eşîrê bi gelekî baştir û bi pêşveketîtir ji ya Lorê Biçûk bû.
Di warê Oldarîya xwe de ev Eşîrên hanê Musulman bûn, lêbelê Musulmantîya wan lawaz bû. Tevlivêjî tu mêldarîya wan û hêjabûna wan ji bona Rêça Elî Îlahî nebû. Bigir tu agehdarîya wan pê nebû.
Zimanê van Eşîrên hanê Zaravekî Kurdî ye, lêbelê di navbera vî Zaravayê wan de û tevaya Zaravayên Kurdîyî din de cudabûneke peyvînê tête dîtin. Bi rastî jî ji bona her Eşîrekê ji van Eşîrên dorhêla Zagrosê de Zaravayekî wêyî taybetî heye.
Eşîrên Bextiyarî pir mêrxas û şerkerin û ew bi van rûçikên xweyî hanê ve bi nav û dengin.
Arnold Wilson di Gotara xwe de, ya ku ew di Kovara Civata Asya Navînî de di Sala 1926 de li ser Malbata Bextiyarî de hate belavkirin, dibêje:
Serekê Bextiyarîyî niha bi navê Xweda Kerem Xan tête binavkirin. Dara Malbata wî weha ye:
Xweda Kerem Xan Kurê Riza Xan Kurê Muhemed Teqi Xan, (yê ku ew Êlxanê Pêla Rawilson bû), kurê Hesen Xan Kurê Fetah Elî Xan Kurê Hesen Xan Kurê Zeman Xan, yê ku ew bi Kiyars bi nav û nîşanbû. Ev Kiyars yekek jiberên Çar Mehele bû: Çar Mehel, Mezawic, Lar û Keyar.
Ji Goyên Mehele tête wergirtin, ku ev Zeman Xan ji Nevîyên Cemşîdê Şahê Iranê ye, yê ku ew di nava Evsanên Iranê de têtê gotin. Mêjûwa vê Mîrneşînîya hanê bi vî rengî tête kurtkirin:
Muhemed Teqi Xan di demekê de serêxwe li ber Dewleta Iranê rakir. Dewleta Iranê Sipahekî zor bi ser de date rakişandin. Ew neçarî penabûnê ji bona nik Şêx Tamir Serekê Êla Benî Keeb bû. Belam bi

Institut kurde de Paris

bextîyeke mezin. ew ji bona Dewleta Iranê hate berdestkirin. Ew ji bona binê Zindanê li Tehranê de hate avêtin. Ew di Zindanê de di Sala 1841 Z. mir.
Piştî mirina wî Serokitîya Eşîrê û Mîrneşînîyê ji bona Lawê wî Mîrza Axa Can hate veguhestin. Di Pêla Axa Can de Desthilatîya Çar Ling hêdî hêdî hate hilanîn û ew ji bona nava destê Heft Ling di dawîya Serdarîya wî de hate kevtin.
Ev Mîrneşînîya hanê di Pêla Sêr Wilson de di nava destê Nevîyên Heyder Kor ji Tîra Papi( diyare, Pawayi) de bû. Piştî Heyder Kurê wî Xalib Serekitîya Tîreke din ji Tîrên Bextiyarî ji xwe re wergirt.
Salih Xan Yekek ji Nevîyên vî Xalib bû, ew ligel Nadir Şah de bû, gava wî Hindistan date vegirtin.
Piştî çend Bavan Cafer Qeli Xan Kurê Esed Xan-Azad Xan bi Serokê Eşîrên Bextiyarî bû.
Ev Esed Xanê hanê Bavpîrên wî ji Serokên Eşîrên Çar Ling û Heft Ling têtin dîtin. Hisên Qeli Xan û Imam Qeli Hacî Xan Kurên mêrxasên Cafer Qeli Xan pir bi başî piştî Bavên xwe bi kar û barên Serokitîyê rabûn. Di pişt wan re jî Kurên wan Isfendyar û Muhemed Hisên Xan bi Serokitîya Êlxanîyê ve rabûn, piştî ku Dewletê li ser date morkirin. Isfendyar Xan di Sala 1903 de mir, piştî ku Serokitîya wî Sî Salî date dirêjkirin. Herwehajî Muhemed Husên Xan piştî wî bi Du Salan ve mir.

Institut kurde de Paris

Eşirên Lorê Kuçûk-Biçûk

1. Pêşkoh
2. Eşîrên Pevekirinên Lorê Biçûk

Berên Pêşkoh:
Dîlfon, Sîselanî, Balagerîwe, Emile û Feylî.
Tîrên Delfînî Jimara Malên wan 15000

| |
|---|
| Navê Tîrê |
| Iwetîwend |
| Kakewend |
| Memoniwend |
| Reîsewend |
| Çuwarî |
| Becnewend |

Ev Eşîra hanê bi Tîrên xwe ve di Havînan de li Xawe û Herasim Xawe de û di Zivistan de di Helîlan, Domal Helîlan, Kohdeşt, Rûdbar, Çardewer û Tirhan de têtin bineşînîkirin.

Tîrên Sîselanî Jimara Malên wan 15000

| |
|---|
| Hesnewend |
| Qelewend |
| Yusifwend |

Ev Eşîra hanê bi Tîrên xwe ve di Havînan de li Elîştar û xaw de têtin bijîyandin.

Institut kurde de Paris

Tîrên Balagerîwe Jimara malên wan 6000

| |
|---|
| Reşno |
| Sakî |
| Papî |
| Dîrîkewend |

Ev Eşîra hanê bi Tîrên xwe ve di Havînan de li Tav -li nêzîka Xuremabad de-, Ebîstan, Serhormoz û Koh Heftad de û di Zivistanan de li Kîrab, Deşta Lor, Kerkî Mange, Rawe û Dost Rida de têtin bijiyandin.

Tîrên Emile Jimara malên wan 2000

| |
|---|
| Koşkî |
| Ziwehdar |
| Emrayî |
| Mîraxur |
| Qertecî |
| Xulam |
| Notmiyad |

Eşîra Emile li Gunadan de rûdinin û ew Çadinîyê di nava Erdên Dewletê de li Hêlên Xurem Abad, Sîmere, Tirhan û Kohdeşt dikin.

Tîrên Feylî Jimara malên wan 12000

| |
|---|
| Zole |
| Kurd |
| Şawhon |
| Mehakî |
| Çar Sitûn |
| Dînerawend |

Institut kurde de Paris

Ev Eşîra hanê bi Tîrên xwe ve di Havînan de li mêrgên dorhêla Kebîrkoh de û di Zovistanan de li Sîrwan, Cîstan, Bedre, Deşta Evdelan de têtin biwarkirin.

2. Eşîrên Pevekirinên Lorê Biçûk: Bacilanî, Bayranewend û Helîlanî.

Tîrên Bacilanî Jimarên malên wan 2000

| |
|---|
| Delawend |
| Sekewend |

Tîrên Bayranewend Jimarên Malên wan 2500

| |
|---|
| Elî Wend |
| Doşewend |

Tîrên Helîlanî Jimarên Malên wan 1500

| | |
|---|---|
| Osmanewend | 500 |
| Celewend | 500 |
| Balawend | 200 |
| Serxe | 100 |
| Merî | 200 |
| | Jimara hemû Eşîr û Pêvekirin Lorên Biçûk 56000 malin. |

Institut kurde de Paris

Rawilson li cihekî din de di Lîsta xwe de dibêje, ku ji Amara Eşîrnên Gewre tête derkevtin, ku jimara Malên wan li Pêşkoh 40000, li Piştkoh

15000 û yên Eşîrên Pêvekirî 5000 Malin. Weha tevaya Malên wan bi 60000 Mal dibin.

Li ser Bîr û Bawerîya vî Rojhilatnasê hanê Lorê Biçûk Serokekî wanî Serbixwe niye. Lêbelê jimareke ji Keyên Gundên Toşman ew bi hemû kar û barên Eşîrê ve radibin. Kar û bar û Serpereştîya vê Eşîra hanê bi carekê ve ji yên Eşîrn dinê de têtin cudakirin.

Ev Eşîra hanê bi şêweyekî Hevgirtî-Fiderasyon ligelhev dijî.

Walîyê Piştkoh nala Bav û Kalên xwe desthilatîyeke wîyî gewre nala Serdar û Şahan tête dîtin.

Di nava van Hêlan de Pîrek bi piranîya kar û barên Peyan pêradibin. Peye tevaya dema xwe bi jêkirina daran bi çêkirina Rijû û Şivanîya Pez û Terş didin rabuhurandin. (Ji Zehab tanî Xuzistan R. 106-111).

Beşê Lek bi Zaraveyekî nêzîk Kelhor ve qisedikin. Eşîra Mahekî li dorhêla sînorê Kermanşah û Helîlan de jî mîna Lek qisedikin. Lêbelê Eşîra Kurdî Şohan li Jêr Piştkoh de bi Kurmancî xeberdidin.

6. Li Iraqa Ecem de

Li Iraqa Ecem de Eşîra Enbarlo heye, ya ku ew nêzîkî Tazeme. Herwehajî li dor û berên Berocord jî de Eşîrên Beyat û Pîranewend heye.

7. Li Faris de

Li Faris de Eşîra Şuwankare-Şibankare-Şivankare heye. ew zore û herwehajî xurte.

Di Mêjûwa Welatên Faris û Kerman de zor xwe nîşan daye û di demekê de jî wê Dewletek damezrandiye.

Institut kurde de Paris

Herema wêyî hêsta Zarkan, Îstaban, Bork, Tarom, Xeyra, Terîz, Korom, Ronîz, Lar û Dara Bucerde. Ew ji Rojhilatî Şîrazê tanî Becnawerd diçe û tanî qeraxê Derya Farisî bi dest ve ye.

Ew di Bazirganîyê û Çandiniyê de baş ber bi pêşve hatine kevtin. Li gora firehbûna Cih û Warên wan divê Serjimareke wanî zor hebe, ku ew Bist Sî Hezar Malek derikevin.

Li pêş de Pênc Beşên wêyî gewre hebûn: Ismaîlî, Ramanî, Karzoyî, Mesudî û Şakanî.

Li gora Bêja wan ku Mîrên wan ji Nevîyên yekemînî Serdarê Sasanî Erdeşîr bû.

Beşê Şakanî li Hêla Kenarê Dilava Farisî de ye. Li gora Mêjûwê de Berê herî giring ji wan Remanî ye. Fedlewî Serdarê Dewleta Şiwankare û Kerman ji vî Berî bû (Insiklopêdîya Musulmantîyê, Bergê 2).

8. Li Welatê Kerman de

Li Welatê Kerman de Hin Eşîrên Kurd heye, belam derbarên wan de dirêjbûnek bi destên me nihate kevtin.

9. Li Welatê Tehranê de

Li Welatê Tehranê de Eşîra Bazokî heye. Herwehajî li Jêrî Iranê de jî hin jiberên vê Eşîra hanê hatine dîtin.

10. Li Welatê Gîlan de

Li Welatê Gîlanê de jî Eşîra Umerlo heye. Ew çend Berin: Qebeqeranlo, Şemkanlo, Behaderlo, Şahkolanlo û Beşanlo. Dibêjin, ku ew ji bal Nadir Şah ve ji Xuresanî ji bona hêre hatine nardin. (Kovara Asyayî Navînî R. 10).

11. Li Welatê Mazenderan de

Institut kurde de Paris

Li Wewlatê Mazenderan de Eşîra Modanlo heye, ya ku ew herî pêşketiyî Eşîrên Kurdê Iranê ye. (Kurdler)

12. Li Welatê Xuresan de

Li Welatê Xuresanê de di navbera Meşhed û Bocunord de Eşîrên Şadlo, Zeferanlo, û Umerlo hene. Eşîra Zeferanlo di nava Reşmala de ye û ew zor bi hêzin.

Mêjûwa Nadir Şah li ser Eşîra Çemşekezk û Qereçolîyê Kurd de diaxive, ku Nadir Şah xwestîye, ku wan bi gij Eşîrên Turkumanan de bide berdan.

13. Li Welatê Hemedan de

Li Welatê Hemedanê de Eşîra Cozîkan heye.

6. Kurd li Rusya de.

Li Komara Ermenîyê-Erîvanê de çend Berên Zîlanê Bayezîdê hene. Doktor Frech-Firêç dibêje:
ku li Eşîra Bazokî jî de 5000 Malek li nêzîka Erîvanê heye. (Kurdler, R. 35).

Bîcge li vanan jî de li nava Komara Ezerbêcanê jî de û li Ostana Elizabis Polî kevnar jî de yanî li Welatê Zenge zor de Ciwanşêr, Cibraîl û Araşê de hin ji Eşîrên Kurd heye û ew Melbedekê didin pêkanîn.
Li Herema Axesxe jî de Kurdekî zor heye û ew di nava Nozdeh Navçiyan de hatine belavkirin û ew hemû Cotkarin. (Kurdler).

Institut kurde de Paris

7. Kurdên Bilocistan û Hindistanê

Eşîra Beraxoyî here bi hêzitirîn Eşîrên vê derê ne. Navînîya pirbûna wan li dor û berên Kelatin.

Li Ketna û tanî Las Bela (Nêzîka 22o Mîl) Herema vê Eşîrê ye.
Ew Li Biloc kêmtirin, belam ji wan ew bi bihêz û dest hilatirin.

Serdaîya Navînîyî Bilocistanê Kelate, ku ew bi destên Serekê vê Eşîrê ye, ku ew li Berê Kamberanî de ye. Beşê Gewreyî vê Eşîra gewre: Serewan-Biraxoyê Serî, Calewan-Biraxoyê Xuwarê.
Derbarê pêvegirêdan vê Eşîra hanê bi Kurd ve hin gûman hatine kirin, belam li layê min de ev gûmanên hanê lawazin, Çunke, navê wan delîlekî bi hêze.

Bicge li vê jî de Eşîreke Kurdîyî Gewre û xurû di nava wan de heye, ku ew b Kurd Gelî bi nav û denge û ew bingehê Biraxoyî dide pêkanaîn. Renge, ku ew li Rojavayê Iranê de ji bona hêre hatibin. Bi xwe jî divê Eşîra Biryaxoyî jî ji wê derê de hatibin barkirin.

Serjimara vê Eşîra Biraxoyî 300. 000 Kesin (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

Li Hindistanê jî de hin Eşîr hene û ew li Welatê Sind de rûniştîne. Serjimara wan 48.180 Kesin.

Ev Eşîra Biraxoyî hemû Sunîne. Di nava Zimanê wan de hin ji gotintên Iranî û Bilocî têklebûye. Zaravayê wan nêzîkî Zaravayê Navînîyî Derî ye.

Ev Zîneta hanê bi rserûştîye. Ev di encamê têkelbûna wan de ligel Dirwasên wan de hatîye kirin. Rêzimana wan jî bigir ew mîna Rêzimana Bilocî ye.

Bicge li Eşîra Biraxoyî de di nava Eşîrên Bilocî de Du Eşîrên Kurd jî hene, ku ew bi Meme Senî-Mam Hesenî bi nav û dengin. Evanan jî disan divên ji Rojavayî Iranê ji bona êre hatibin (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

Institut kurde de Paris

8. Kurd Li Efxanistanê de

Li Gora Şerefnamê de li Efxanistanê de hin Eşîrên Zengene hene. Renge, ku ew ji Bilocistanê ji bona vê derê de hatibin.
Rojhilatnas Morgen Senern jî dibêje, Renge, ku hin Eşîrên Kurd li Efxanistanê de hebin. Belam ev ji bona wî hêjî nehatîye bicîhatin.

13. Avdara Sala 1931 de

Bergê Yekem

Mohemed Emîn Zekî

---

Li Berlînê de di 6. 6. 1991 de hatîye bidestpêkirin û di 12. 1. 1992 de ew hatîye bidawîkirin.

***

Wergerandina Kurmancîyî vê nivista hanê ji bona Mam Xenî Biloriyan didim bipêşkeşkirin. Wî bi dilsozîya xwe ve, bi qehremanîya xwe ve bi derbasbûna bêtir ji Bîstûpênc salan ve di binê zindanên Şahên Iranî de ji tevaya dunyayê re date biderxistin, ku Miletê Kurd tucarî dev ji xebata serxwebûna Kurdistanê bi şêweyekî bajartî, dadwerî û mirovanî ve nade biberdan.
Vî Qehremanê me Kec û Xortên bi evîndarîya Kurdistanê şev û rojê dide biperwerdekirin. Herwehajî divê li vêderê de bête bigotin, ku rêzlêgirtin û hêjakirina min ji bona Mam Xenî bi bê payîn ve tête bidîtin.

Dr. M. S. Cuma.

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHEQUE
Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



- Di dawîya gulana sala 1937 de li gundê kêstek de di herema Cezîrê de ez hatime bizayîn.
- Di dibustanên bajarê qamişlo de ji sala 1946 tanî sala 1956 de min date bixwendin.
- Di dibustanên bajarê şamê de ji sal 1956 tanî sala 1959 de min date bixwendin.
- Di sala 1959 de min dest bi xwendina xweyî zanistgehê ve li zanistgeha şamê de berê felsefê de date bikirin.
- Ji sersala 1960 de ez ji bona Elmanya hatim biçûyin Piştî xwendina zimanê Elmanî li bajarê Koxil de ez di buhara sala 1960 de ji bona bajarê Monîx hatim biçûyîn û li wir de di zanistgeha wê de min zanistîyên dewletê tanî sala 1964 de date bixwendin.
- Di sala 1963 de ez ji bona Elmanya Demokrasî hatim biçûyîn û li wir de li bajarê Berlin de di Kolêca Abûrî de zanistîya abûrî û siyasîmin date bixwendin, der sala 1967 de min Diplom di zanistîya abûrîya siyasî de date biwergirtin û der sala 1972 de têde jî min Nama Doktora di zanistîya mêjûya abûrîya siyasî de date biwergirtin.
- Ji sala 1975 tanî sala 1992 de min di zanistgeha Hombold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa abûrî siyasî de didate bikarkirin.

Dr. M.S.Cuma

Institut kurde de Paris